Rêber Hebûn

# Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

Raman



ZANYAR

Çapa yekem

# Evîn hebûn e
# û hebûn zanîn e

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

- **Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**
- **Raman**
- **Rêber Hebûn**

**Weşanên Rêber Hebûn**

**reber.hebun@gmail.com**

**Hejmara çapê:98 Berçele 2024**

**ISBN: 978-977-85964-2-7**
**Kombûna zanyarên azad**

**Whatsapp: 004915750867809**

**https://reberhebun.wordpress.com/**

**https://kulturforumdusseldorf.wordpress.com/**

**Çêkirina bergê: nivîskar bi xwe.**

**Çi tiştê di vê pirtûkê de, nerîn,raman û bawerî girêdayî daner e, hemî maf ji daner re parastî ne, çênabe pirtûk bête çapkirin hinekî an hemî bê erêkirina malxaneyê an erêkirina nivîskar.**

**Hemî maf ji daner re parastî ne**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

# Naverok

**Pêşgotin-------------------------------------------------------------------------------------6**
**Pêraxistin ----------------------------------------------------------------------------------11**
**Hişê zanyarî a rojhilat navînî di rûbirûbûna serkotkirinê de---------------------19**
**1-Rola medyaya serdest-------------------------------------------------------------------23**
**2-Dîtinekê li rastiya rêxistinên Kurdistanî-------------------------------------------26**
**3- Rastiya buhara Erebî--------------------------------------------------------------------27**
**4- Rabûna Mîkefîliyên nû-----------------------------------------------------------------29**
**5- Bişkuvîna rehên comî û nijadî-------------------------------------------------------31**
**Vîna zanyarî di rûbirûbûna zordariyê de--------------------------------------------34**
**1-Cotbûna xwe û din-----------------------------------------------------------------------37**
**2- Dîtinek felsefî li ser girtinheviyê---------------------------------------------------46**
**3- Nivîsa wêjeyî wek navgîneke rûbirûbûnê-----------------------------------------52**
**4- Dîtinek li mirinê--------------------------------------------------------------------------56**
**5-Desthilata bavîtiyê û fişara malgirtîbûnê-------------------------------------------63**
**Vîna zanyarî di rûbirûbûna Islama siyasî de-----------------------------------------88**
**1- Dîtinekê di têgihiştina êşê de----------------------------------------------------------89**
**2-Tundrewî û rûbirûbûna wê--------------------------------------------------------------90**
**3- Girêdana Islama siyasî û netewîbûna xwe bilindkirî----------------------------98**
**4-Encamên tundiyê û şopa wê li ser civakê----------------------------------------102**
**5-Gotûbêja evîn û cenga kurdistanî---------------------------------------------------120**
**6- Gotûbêja mirin û nefretê---------------------------------------------------------------128**
**7- Mirin-----------------------------------------------------------------------------------------133**
**8- Zorenga jiyan û mirinê------------------------------------------------------------------137**
**Aborî di karguzariya hebûnê de--------------------------------------------------------142**
**Avabûna zanyarî pêşeroja heyînê ye-------------------------------------------------149**
**Cîhangêriya zanyarî-----------------------------------------------------------------------158**
**Takekesiya zanyarî û cenga guhartinê------------------------------------------------164**
**Pirojeya zanyarî û reşpêşkirina rewşenbîrî-----------------------------------------168**
**Zanîn rastiyeke li bin siha hebûnê-----------------------------------------------------178**
**Zanyarî baweriya tek hebûnê ye--------------------------------------------------------182**
**Zanyar di rû tirsê de li rojavayê kurdistanê-----------------------------------------189**
**1- Sawêrbûna civakê-----------------------------------------------------------------------224**
**2-berve duristkirina takekesiya zanyarî----------------------------------------------236**
**3- totelîter derxistkerên aloziyan in----------------------------------------------------262**

# Evîn hebûn e û hebûn zanîn e


**Zanyar li Kurdistana bakur-------------------------------------------------------266**
**1- pêşgeh-------------------------------------------------------------------------267**
**2- Civak û terora navnetewî-------------------------------------------------------268**
**3- Di rexnekirina netewîbûna Tirkî de----------------------------------------------282**
**4- Medyaya netewî û reşkirina henas---------------------------------------------285**
**5- Gotûbêja zorengê ji bo tekeskirina nasnameyê--------------------------------297**
**6- Nerînekê li Tirkiya yê----------------------------------------------------------300**
**Zanyar û kêşeya azadiyê------------------------------------------------------------309**
**Zanyar û partiyên totelîter-------------------------------------------------------316**
**Zanyar û kêşeya pîrozbûnê------------------------------------------------------- 324**
**Zanyar û serokê nîşan--------------------------------------------------------------333**
**Zanyar û civak---------------------------------------------------------------------338**
**Zanyar û sazî----------------------------------------------------------------------342**
**Kombûna zanyaran ji bo parastina hebûnê-----------------------------------------348**
**Azadiya ramana zanyarî di rû nezanîkirina bi rêk û pêk ve de----------------362**
**1-Leylanbûn deronî-----------------------------------------------------------------363**
**2-Civak û gendeliya bîrdozî li Kurdistanê-----------------------------------------367**
**3- Gotûbêja mirov û cih-----------------------------------------------------------371**
**Li ser rojhilata navîn û rêyên çareseriyê-------------------------------------------377**
**Rêyên zanyarî ji tekoşîndariya nijadperestî, koçberîbûn û totelîteriyê------387**
**1- Xuristiya sîstemên rojhilatanavînî ---------------------------------------------388**
**2- Hewildanekê ji têgihiştina koçberîbûnê------------------------------------------390**
**3-Bandora cîgeha nû li ser ya niştecî------------------------------------------------392**
**4-Nasnameya serketî di rû nasnameyên barketî de--------------------------------395**
**5- Tekoşîndariya nijadperestiyê û berzbûna civaka zanyar---------------------399**
**6- Dîtinekê li ser awayên sazbûna sitemkariya siyasî-----------------------------407**
**7- Dîtinekê li ser girtina siyasî---------------------------------------------------425**
**Dûmahî-----------------------------------------------------------------------------433**
**Jiyangeriya Rêber Hebûn---------------------------------------------------------- 435**
**Jêder û çavkanî --------------------------------------------------------------------440**

# Diyarî

**Ji herdû gulên dilê min re**
**ên di Êlonê de vebûn**
**(Pêljîn û Pêlvîn)**

**ji a ji min re got:**
**li ser ( Evîn hebûn e û hebûn zanîn e )**
**binivîse.**
**ji Hebûn re**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

# pêşgotin

**Zêdetirî heft rojan min bi rastî nikarîbû vê pirtûka qayim teqle bikra, ê di navbera zanîn û evînê de tevinek zehmet nê derbaskirin rêsandibû.**

**(Evîn hebûn e û hebûn zanîn e) dûrî bask, dûrî tarîbûna rewş û desthilatbûna kirêtan ji hefsarên desthiladariyê re.**

**Jiyan her tiştî dide te, û kevçîkek e pepûkî bi merdî dide te , ew eynî wê yê derfeta axaftinek e ji dil dide te, di wê odeya ya li jor ezmana qirmizî de.**

**(Ji ber xewin û evîn destpêk in, û ewan serhevsarê zorengê ne li hember gendeliya karbendî, sincî û siyasî û herwisa)**

**(Şev û roj du nîşan in ji mirovan re, û xwedanê gund rêzanên wan in, mezinên gund heta azana serşevê dimînin pişt re dirazin, ciwan bi rewşitên xwe ve di şevbuhêrkê de heta katên berbangê dimeşin pişt re dikevin xewê, serseriyên kuran gund û derveyî wê derbas kirin e, çiyayên asê bi rêk û pêkbûnên xwe berfereh in, dibûn hêlîna Baz,Şahîn û Simyar, û hingiva reş a bejî li jor çiyê bû, xweşiya bi destxistina hingivê mistaxek bû di nav kuran de).**

**Ma xweşiya wergirtina hingivê di çarçoveya xweşiya a ku bidawî dibe de ye piştî bidawîkirina armancê û**

**bidestxistina xwestekê , an li ser wê berdewambûn, geşepêdan û pakiyê tê girêdan?**

**Zikmak ku geherîn rastir e, ji guhertinê û bêhtir dikare bimîne, ji ber ku guhertin me ji xala destpêkê ve vedigerîne,û geherîn çêbûna babêtên nû mebest dike û bi pergalên seyrtir û nû, û bi rêbzek e zanyar ku şikandina rewşê û rakirina bîrdoziyan hemî û heta yên gerdûnî mebest dike, ji ber ku bêsînorbûn nema zikmak e, a zikmak ewa: lêkolîn û şikandina bêsînorbûn û bîrdoziyên wê ne.**

**Lê balanamayên ramanî û zanistî banga çi dikin, yê li dû hatî û yê rexnegir ji devdana niha re, bi pêwîstîbûna damezrandinê ji ragirbûyên nû re li devdana mirovahî , ku karbînî û çalakiyên wê sînordar dikin, pişta xwe li ser rastiyên zanistî yê li dû hatî û hatiye naskirin girêdidin û ragirbûyên berê a devdana niha pişta xwe pê girêdidin dişkînin û diçewsînin e û li ser serê van rastiyan : Zanistiyên haqasî û tiştê ku biyolijiya jîndarî û zanistên cîwarî gîhabûnêkî , ji rastiyîn nû yên dijî rastiyên berê yê ku xwazayê xirakiribûn, çawaniya avabûna jiyanê di çarçoveya wê de , û şîrovên olî yê li dû hatî ,ji zikmakê gerdûnê û rola mirov û hevdîtina rastiyên zanistî û a li dû hev hatibû têde ye .**

**Nema êdî derfet heye ku ew bervepêşbûna niha bê berdewamkirin, ji ber ku hatinên sirûştî ew wê bi dawî kiribû û hilkirinekê di hevsengiya xwezayî de çêkiribû.**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**Tiştê ku bi rastî Rêber Hebûn têderdixîne ewa çawaniya duristkirina serdema rewşenbîrî cihê serdema aborî çi di warê avabûna tewrî û têgehî de ,an rol, peywir û bîrdoziyê , ji ber ku zanyar hest dikin bi kanîbûna çand ku tiştan bi pergalekî rast amade bike bi rêya zêdekirina wê di çarçoveyên karger de ji geşepêdanê yê bi eynî rêbazê çêdibe, zêdebûna destikên bêhtir karger ji bo pêkanîna hevsengî û lihevkirinê ye di navbera aborî û cîgehê û di navbera rikberîkirin û hevkariyê de û di navbera têçûn û parastina hatinan de û di navbera mirov û teknolojiyê de û di navbera zanistîbûn û mirovahiyê de û di navbera daringî û giyanîtiyê de.**

**Ji ber rola bingehîn ji zanîn û çand di hevbeşî û mayînê de ye û divê nekeve bin tevgerên bazarê, ji ber ku her karekî afrênerî li ser hevpariyên qerpolî tê avakirin, kokên wê ji hezarên salan ve vedigerin.**

**Û divê siyaset ji bo ku têkeve xizmeta berjewndiya giştî bi awayekî dînamîkî tevlî nakokiyan bibe û bête guhertin.**

**Ji ber ku pêdiviya demukratîkirina destihlatê bi xurtbûna kanîna tevgerê ve girêdayî ye di navbera nakokiyên herêmî û gerdûnî , takes û kom, mirovahî û bejî de pêktê.**

**Û pêdiviya reseniya kûr bi xwenasîn û gotûbêja vekirî ve heye ligel rûbirûbûna pisporiyên cuda bi awayekî vekirî û girêdana parçê bi tevahî ve û girêdana kirina erkdar bi dîmena mezintirîn ji bo diyarkirina xebata rast.**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Ji ber ku azadî naye dayîn bi tevahiya xwe, ewa mîna hemî başiyan e, dibe ku bibe dij, divê mirov li pey bikeve dûrî dijiya wê, ji ber ku bê civakek e saxlem û sînordar takekesekî azad nîne.**

**Wekî Enîştayin dibêje , xwediyê tewriya rêjeyî ( kêşeyek an pirsgirêkek naye çareserkirin bi eynî rêya ramandinê a ku mirov bi ser ve wê hatibû.)**
**Tenê divê em ji rêveberkirina zanînê li afrandina zanînê birêkevin, ewa xebata zanyarî berz dike.**

**Û eger em li dor cîhangêriyê dizîvirin, eva bi eynî wê ve kêmanî ye ne bêhemtayî ye, ji ber ku cîhangêrî wek ku pirtir lêgerîn encam dan li ser sê pîvanên bê liv hatibûne ajotin û ew: gerdûnî beranberî cîgehî, hemcisnî beranberî newekhevîbûnê û belavbûna kanînê beranberî cîgirtîbûna wê.**

**Û di vir de girîngiya Pêşkêşkirina zanyarî a geşepêdanî û vegûhêr diyar dibe ,ku ew piralî , azadîxwaz , rexnegir , û hişyargir û sincî ye, û pala xwe li ser çand û xwezayê dide, û tê nasîn ku ew gelemper û temambûyî ye, û li ser hemî riwên girîng di çêbûnên geşepêdanî, siyasî, civakî,aborî û rewşenbîrî digre, bi awayekî tevderbasbûyî, û herwiha riwên geşepêdanî bi eykolojiya siyasî ve tê girêdan, û pala xwe dide li ser bingehên dadmendî, yeksanî ,hevkarî û levakirina hevseng ji destkeftiyên geşepêdanê ve.**

**Hewildana berve guherînê bi pêşdebirina takekes ve têkildar e, li komel û civakan , divê bi awayekî temambûyî**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**bê rêvebirin, ji cinav û jîhatîbûna bi çand û sirûştê ve û bi dîtina ferehiyekî ji bo pêvejoya pêşxistinê, ji huner û sinc û zanist ve ji bo bilindbûna nirxên takekes û penda giştî û zanîna hunerî.**

**Û dema zanyar berztirîn kes bûn di hilgirtina berpirsariya rêbaza çand û geşepêdanê, yê zanînek e dagirtî bi xwe re tîne, ta karibe avaker û hertimî be ji têgihiştin , zîrekî û nasîna wana ji pêşerojê re, yê li dor wê hemî zoreng, nakokî, nirxên paşvero, zordarî, gotara nefretê û nexweşiya ramanî dizîvir e, û dema ramanyar Rêber Hebûn di pirtûka xwe de yê têde bêhtirî heşt salan derbas kiribû, hundirên rewşê vekolîn kiribû, bi rêbazek e ramanî û rexnegir, a balkêş hewil dabû ji bo çareserkirinê ne tenê diyarkirina rewşa bêdûnd e, lê bi kanîna xwe ku ramanên nû û afrêner dikarin ne tenê bijîn lêbelê tiştan biafirînin, û pêdivî ye ku em avahiyên civakî hizr bikin,ji ber ku ewan xwegêra bingehîn in an kelem in ji çi perwazek e geşepêdanî an çalakiyek e aborî an teknolojî re, ji ber vê yekê agehkirina guhertinên civakî pêwîst in ,ji bo pêkanîna çalakbûnekê di guhertinên teknolojî û amûrkarî de û hin hêlên diravî , ew mercek e sereke ye ji serkeftina pîlan, çalakî û straticiyan, bi berbawerî li ser çavkaniyên zanyarî û pêşxistina nimûneya amana zanînê.**

Rola Hisênat<br>19.06.2021

# Pêraxistin

**Yekem tiştê ku jîndar pêşî hizr dike têgihiştina wî ji heyînê re, mirov xwe nas dike bi rêya hebûnê , ji ber ew zemîn e yê li ser civak çêdibe, û jê nirx û pîvanên xwe werdigre, ji tek girêdanê ye yê mirov bi heyînê re girêdide, berî ku tiştan bi dest xwexîne, û ew têgihiştina evînê bi rêya çêbûna hest , ji ber ku hestkirina mirov bi derdorê ve bi têgihştina xwe ji gewdeyê re pêşî destpê dike, û têgihiştina wî ji henas re û baweriya wî bi jiyanê ve, û bawerî encamek e xwezayî ye çêdibe bi rêya qûnaxên yê kesê jîndar lê derbas dibe, taku ji rastiya nirxên ji evînê peydabûye piştrast be, a nûnertiya heyîna lihevhatî û bedew dike, û bi dûmahîka xurandinê bi wê ve zanîn encam da, zikmakiya evînê bi rêya zorengê binyad bû, ji bona serkeftina nirxên sirûştî,sîstem, û yasayên misoger ji heyîna komên mirovî re, û kedîkirina kiryarên wan, ji bo bidestxistina zanînê, û çawaniya bikaranîna alavên heyî, yên hatin e afirandin bi saya zanyar bi diyarbûna êgir û bikaranîna kevir, û avakirina mal û çandiniyê, bi afirandina elketrîk û telefonê derbas dibe, ta şoreşa Kompioter û internêtê, wisa têkiliya mirov bi xwesera xwe ve diyar bû, bi rêya a din û cîhanê bi giştî çêtirtir bû.**

**Mirov çi girêdan di navbera xwe û heyîn û zanînê de winda kiribû bi encama serwerîkirina suriştiya desthilatdariyê, wisa ji sabara zanînî dûrketibû, yê ewa nameya saxlem û**

**diyar e ji evîn û jiyankirina wê, û pir caran bi têgehên afirandî pêguhertibû, ew têgeha dijî zikmaka pak bû yê mirov lê vedigere bi sernavê evîn, ev girêdan ji dest xwe berdabû, pişt re têgehên zorengê ji bona şer destpê bûn, şûna weşandina nirxên evînê bi rêya şaristaniyê ve, yê cîhanê ji hatinên serdemên dirindetî û hovîtiyê rizgar kiribû.**

**Serdemên terorê destpê bûn, û li ser wê navê pîrozbûnê hat e danîn, û ew nixumek e paş wê ve naveroka şer a bingehîn tê veşartin, û ewa bidestxistin , bindestkirina aborî û gera li erdên nû û komkirina samanê .**
**Du şer mirovahî berhem dan, bi rêya xurandina bi heyînê re, zorenga zanînê yê tê nasîn bi zanist û sinc ve dijî nezaniyê yê tê nasîn bi girêdana zanist bi hilweşînê ve, ji ber ku desthilat nirx, ol û netew pikaranî, pê pergal û nerînên teng belav kiribû ta têgeha cîgirbûyî berhem bike, lê zanyar di sinc, vekolîna zanistî de guherînek e ji pêvajoka mirov berve başiyê ve dîtibûn, wisa zoreng di navbera çîgirbûn û guherînê, parastin û guhertinê, resenî û pêşveçûnê de çêbibû, û hemî bi zorenga herî mezin û rastqîn e ve girêdayî ne û ew : zorenga zanîn û nezaniyê.**
**Û heyîn ji van şerên xwînî talan bû, û êdî zêde berve parçebûn û gemarbûnê ve diçû û kambaxûna a ku ezeziya mirov berhem dabû, ji şer û qirkirin û bikaranîna çekên qedexebûyî ( Holokust.1, Hîroşîma.2, Helebçe.3).**
**Beranberî wê heyîn berve sivîlbûn, avakirin, bedewbûn, huner û bêr ve diçe bi pêgirtina nirxa giştî ji mirovahiyê re li ser piraliyên zimên û qam, û reftarên wê di evînê de û ew**

**rehjena zanîna nemir e, ji ber ku evîn  û zanîn cêwiyê hebûnê ne.
Hest, ageh, têgihiştin, hizr, ponijîn, ramanbûn û pirsîn ewan kilîtên nasîna hebûnê ne, û van kilîtan ji berhemê gir êdana jîndara mirovî bi hebûnê ve ne, bi rêya evînê, û bi wan mirov heyînê ji bo zanînê vekolîn dike.**

**Û pevxurîna şaristanî a ku mirovê zanyar afirandibû,gerentiyê dida  berdewabûna jiyana rast, ji zanîna wî bi alavan piştî zehmetiyekê, û bi encamê meraq û xwestina wî, li kelem û astengiyan de derbas dibû bi rêya pevxurîna wî ya berdewam bi hebûnê , û heta ku gîhabû nirxên rehniyê rastî gelek hewildanan hatibû, û berdewam hember rewrewka binkeftinê ,û mîkroba nezanî, xwebînî û ezeziyê rikberî dikir.**

**Û bi xwezaya xwe ya mirovî de têgihiştibû meyldariya xwe ji têrbûna tam ta ku ji birçbûna gewdeyî û zayendî azad bibe, û dest bi gerînê li  başiyan bike, ji vir em dikarin binav bikin ku têgehên devgemkirin û celewkirinê bûn sedemê mezinbûna girêkên hundirî li cem xelkê, û pê kanîna nameya evînê û vekolîna zanînê di heyînê de asteng kirin.
Zanîn ew zangoya ku bin de hemî mirov tevlî dibin, bi rêya wê nakokiyên wanî nijadî, cîgehî, zayendî û bîrdozî kêmtir dibin , dikeve  di berjewendiya çêkirina sazî û yekîtiyên yê n ji hemî netewan re derfetekê ji xweşî û cihbûnê  peyda**

**dikir, û bidestxistina pêdiviyan bi jinavbirina birçîbûn, teror, nexwendeyî,û çekên qedexebûyî, û qedexekirina kedxwariyê û bazirganiya bi mirov û pêkanîna xwestekên malbatê şad yê cihbûna deronî diyar dike û nûnertiya astên herî bilind ji rehetiya mirovahiyê dike.**

**Nameya evînê yê mirovê hişmend mizgîniyê pê dabû bi şaristaniya ramanî, avahî û hunerî ve hatibû diyar kirin, wek rastiya bêsînor û bîner e li ser keda zanyar, rastiya bê sînor ewa hebûn e di yekbûna xwe de.**

**Ji ber ku tewriyên derbiderkirinê rolek e neyînî û bive lîstibûn û  bi hevdû re li hember  mirovahiyê hevkarbûn û wê  berve qeyranên ceng û birçîbûnê bi hatinên serdemên nezanî û têkçûnê biribûn.**

**Û cengên mirovê ezez kaniyên evîn û zanînê bi hevdû re zuha kiribûn, û têgehên tundirewiyê di ol, rêgeh,com ,derd ên nijadperestî û liyangirtinê û mîna wan de belavbûn, û bûn e destikek çewisandin ji hatinrêzên rewanî û ramanî re li cem zanyar li hebûnê, û li ser mirovahiyê nezaniya giyanî û ramanî sepa kiribûn,  û windabûn, tevlîhevbûn û goşegirtinê di tewriyên erdnîgarî û herêmîbûna teng de zê debû.**

**Nasnama mirovê zanyar  a nû  zanîn e , nûnera jiyana nû dike, û destpêka radeya dawiya  derdkişandinê ye û pê birina azadiyan e, ta bibe zanîn civîndara giştî ,taku  bin de**

**taybetmendiyên gelan li ser zemîna heyînê de tevlî bibin, di nav de zanyar bi erk û mafê  xwe ve wekhev dibin, bi rêya danîna nimûneya Konfidresiyonê, ji bo pêkanîna bazara aborî a mezintirîn, a bi rêya wê pêkanînên zanyarên berhemdar yekgirtî dibin, ji bo pêkanîna hêz û xweşiyê û xwestekên mirovê bala û afrêner, û vejînkirina bedewbûn, zanist û wêjeyê, ji bo xizmetkirina hebûn û mayîna wê.**

**Evîn nûnertiya hêza veşartî ,afrêner û ne asayî dike, û kanînên xwe ji wê rêzkirina lihevhatî di hebûnê de bi xwe werdigre, û herwisa xweda diyar dibe, xwedawendê bedew û sermedî,  gorî navê wî yê kevin û naskirî, di dîmenên hebûn û xweşikbûnên wê de û di dabeşên sirûşta dilkêş de diyar dibe.**

**Ji ber vê yekê mirov eger bi çi xweşî û rindiyê hest bike, bi balabûn lê dinêre, ji ber ku evîn şadî û zelaliya henasa mirovahî ye ,yê di xwezaya xwe de meyladarê karê baş û hezkirina azadiyê ye , ji pileya pêbirina mirov ji taybetmendî û şanên yê ku ew ji sirûştê wergirtî distîne.**

**Mirovê zanyar hebûna sabar, netew û taybetmendiyan di jiyanê de betal nake, ji ber ku binema yekbûna hebûnê cûrebûn e, û gelemperîbûna dîtinekê têknabe bi pêwîstî dîtinê li cûrebûn û dewlemendiya heyî a ku zanyar jê gelek pêkanînên xwe werdigre, lêbelê li cem zanyar armanca herî dawî heye yê ew bi xurtî pêdigre paş wê cûrebûn e û**

**ewa hewildana ji bo zanîn û parastina hebûn ye, û liyangirtî nake ji ber ku zanîn bê sînor e, û dibîne li cûrebûna mirovî di ol ,kom û nijad de wek taybetmeniyên ku bi guherîn , serdem , tevlîhevbûna zayend, û bandorbûna cîgehan li ser reftarên koman ve darizandî ne, û li berdêl, çareserî û ramanên nû digere, û tu carî ji bo wana berz bike nakeve dudiliyê, û her digere û rastî zanyaran tê yên li hemî derên hebûna giştî de dijîn, hebûna a ku têgihiştina çêkerên sînor, erdnîgarî û qat derbas dike.**

**Mirovê zanyar nasnama xwe di zanînê de ye, ew di fêrbûna zimên de destikekê dibîne ji bo dan û standinê bi kesên yên di wana de rastiya wî ya nû û sermedî diyar dibe, a banga xizmetkirina heyîn û pêkanîna nameya wê di hezkirinê de dike, li ser olekî an partiyekê an netewekê an xêlekê nasekine, bi rêxistina xwezayî ve bawer e, xwe nake koleyekî kirêgirtî di xizmeta tofekê de bi xwe.**

**Mirovê zanyar li hember têgeha partîtiyê û qalibkirinê bi hemû pergalên wê şoreşger e, bi yekîtiyan re ye yên çê dibin ji bo binyadkirina nermbûnê di ramanbûnê de,û bi mirovê leşger û serok bi eynê demê ve bawer e, bi rexneyê ve tam bawer e, û têgehên gotubêj û guftogûyê bicî dike berve pêşvebirina ramanan û gihiştina tiştê herî baş , evîn û hunerên mirovî yên xizmeta hebûn û ramanbûna zanyarî dikin pîroz dike, û ji bona wan ji bo rêya pêgirtina zanînê kar dike , bi evînê wek rêbazekê ve girêdayî ye, û bi**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**zanebûnê mîna armancek e bi dawî, û bi hebûnê weke hatinrêzekê ve.**

**Û evîn ew kargêrîkirina sinc e yê nûnera yekm erkên mirovê zanyar di jiyanê de dike, ji ber ew nûnera netew û hezkirina wî ji jiyanê re dike.**

**Lidûhevhatinên hêz û tundiyê di mirov de balatir raberî û agehên  wî fetisandibûn, û wî hîştibû ku bikuje ji bo ku ziyan û pîsiyên xwe bi dû xwe ve bihêle, li hebûna a dibe penageyekê ji berdewamiya jiyanê re.**

**Û wisa têgehên wêranî û xerakirina ramanê belav bûn, û bûn e alavekî ji sexetebûna rastiyan  û lîstina bi baweriyan ve.**

**Ev kevirbûn hîşt  mirov darjêge , û mûmyabûyî be û nikaribe zanînê têbigihe,û yek ji erkên mirovê zanyar a rasteqîn e ewa jinavbirina hişmendiya tund û tûjiyê ta negihe gendelî,zordarî û ketina di xefkên têgehên teng de y ên dijatiya nirxên evîn , zanîn û roniyê dikin.**

**Zanîn liyangirtinek e bêsînor e ji evîn û bedewiyê re, û nev êtinek e ji kedxwarî û dûrxistinê, û rizgarkirina mirov ji her tiştê ku wî tengav dike an dibe kelem pêş pêvajoka wî ya berepêş bi rêya peyrewîkirina wî bi sinc ve, û bikaranîna wî ji hiş re û karxistina wî ji kanînê re di**

**xizmeta nirxên ku bi hebûnê ve girêdayî, û nirx jêderê xwe ji hogirbûna hiş bi zîzbûn ve ye di nav heyînê de.**

**Yek ji armancên zanînê di hebûnê de ewa berzbûna hevjiyan, jîrbûna bala û lêborînê di çarçoveya cûrebûna mirovî de, û geşkirina wê bi hevkarî, hezkirin , û qamkirina jiyanê bi rêya xebat û sazgehê.**

**---------------**

---

**1- Holokust:wateya xwe ji yonanî (hemî şewîtî ne) û bi ibrî wateya wê kembaxbûn e ,ew qirkirinek e giştî ye,dema cenga cîhaniya duyem de çêbû, şeş milyon cihû ji ewrûpayê hatin e kuştin li ser destê sîstema nazî a Edolf Hitler û yê pê re alîkar.**

**2- Hîroşîma: bajarek e li Yabanê ye, li girava Hunşo ye, li ser kendava Hîroşîmayê, paytexta parizgeha Hîroşîma,mezintirîn bajarê wê, li cîhanê de naskirî ye ji ber ku ew yekem bajar re bi ser de bumbeya dinokîhatibû, hijmara xelkê wê zêdetirî 1,136,684 serejmar (2003).**

**3-Helebçe : Bajarekî kurdî ye li başûrê kurdistanê ye(Îraq) .**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

# Hişê zanyarî a rojhilat navînî
# di rûbirûbûna serkotkirinê de

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Pêşçavbûna  mirov ji rûxiserên jiyana xwe  bi awayekî rêbazbûyî û bi şêwazekî ragîrbûyî  ewa pareke ji serlêdanê ye ji diyardeyên civakê ve û şopa wê li ser reftar û berepêşiyên wî, bi zimanekî berpirs dikare bi kêmaniyên xwe re bide û bistîne bi giyanê rexneyê, taku şopa cîgehê di xwe de diyar bike û şopa wê ya razber li ser destnîşankirinên wî  de jî.**

**Pêşçavbûna me ji rûxiserên rewşên me yên pêşdestbûyî re ewa di nav de çûnek e zindî  ji tiştê ku li civakê  tev diqewime di rêya pencereyên me yên xweser de, ji ber ku peywendiya takes û civakê peywendiyeke tevlîhev e ,  tiştê wek dîrok lê binavbûye berz dike,  reweşt , pêgirtin, û sîstemên desthilatbûnê kurt dike.**

**Ji ber ku civakên ên li pey hev hatin e paşgukirin û dûrxistin ewan civakên yên têde takes paşguh  û bêrol bibû , di çarçoveya paşgukirin û zorenga deronî  de û ligel hevparên  xwe yên lawaz hiş, sawîlk û têgihîştin dorpêç bibû.**

**Li gel wê ramana zanyarî bi temamî hatibû nediyarkirin ji komên yên bi peykeran bawer bibûn, û xwe  ji melle , welî , generalên leşgerî û kesayetên bavanî  re noq kiribûn, ev di rûxiserên civakên rojhilata navîn de diyar dibe, ji ber gelek derd kişandin ji serdestkirina ramana neberçav yê ji ol bi şaxê wê ya comî  û ji netew bi rengê wî yê dûrxistî û ji**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**şofînizmê derketibûn ,ew du destik in ji zordarî , neberçavkirin û  berfermankirinê re, li gel vê yekê jiyana demukrat di hizrên tofên wana de hatibû gunokirin, bi hişmendiya mildan û pêrewiya hertimî ve hatibû  batîkirin.**

**Û belavbûna sûdwergirtina  rojarbûyî di nav civakên yên derdê niqombûna gemiya xwe û windabûna hevsarê jiyana xwe kişandibûn bi encamê gedeliya siyasetmedarên xwe  ,hîştibûn rûberên erdê xwe bi temamî  hatinên wê paşmakek e nemir be ji ewê tê binavkirin mêtingeriya derveyî re, ji ber  tiştekî normal e ku ew valabûn  bê dagirtin hundirê civakên yên rêbaz û şêwazê ramana rexnekar windakiribûn, û herwisa di wan de giyanê alîgirtinê  ji rêberên rizgarker re hatibû cîgîr kirin.**

**Lêkolîna li ser çawaniya berhemdana xwedî hişmendan pêvajoyek e zor e, pêdiviya xwe bi bandorkirina zanyarî a hevrêzkirî heye di nav gelek zanyar de yên dixwazin şer  bi nezanîkirinê re bikin û  ew piştre têkrayek e ji destpêşxerî û karên curbicur in, di yek rêjgehê de dirjin, û ewa tekezî li dermankirina tiştê hatibû paşguhkirin û dan û standin bi aloziyan re, bi awayekî rêbazbûyî û bi giyanek e hevrêz, di navbera hemî  kesên ku li wateyê digerin ji gera mirovê hişmend yê sermedî di nav zorengên zehmet de ligel dadgehên sûraxkirinê ên riwên xwe bi şêweyên diyarbûyî aşkere kirin .**

**Û ev me dihlêle di ezmûnek e zehmet de, ku  çendîn em dikarin serkeftî bin ji bo rastiya berzbûyî di parastina destkeftiyan de û hemî kedên yên  ketibûn e di rûbirûbûna**

**hêzên serkotkirin û efsanê de ,beranberî dengên bangdayî ji bo ji sawîra cengê yên hevbendiyên wêranker encam dabûn rizgar bibin.**

**Ew hêzên yên li ser wêranî û parçebûna civakê dijîn, û mînaka diyar ew pêvajoya buhara Erebî, a ku mîna dûbarekirina nirxên hovîtî û dirindiyê bû û bi dîmenek e nûjen, bi xwe re bizdan, aloziyên aborî û koçberiyên dûhevhatî derxist.**

**Ji bilî aloziyên yên ji vê buhara xwînî ve derketibûn , bi nûkirina amûrên serkotkirinê beranberî dengên yên demukratî û azadiya derbirîn û nerînê di jiyana siyasî de dixwestibûn, ev bû sedem ji vegera hewayên tirsê ji pêşerojê ve , û bi awayekî mezin ji bo bicihkirina koçberiya takekesî alîkar bû, kêlek zanyarê bîrawer yê li benda dawîbûna jiyana serkotkir e, û vegera jiyana yê ji şaristaniyê gelek nirxên sirûştî werdigirtibû, yê deqanokeke ramanî berhem dabû, û civakê hîştibû berve avakirin û xweşiyê ve biçe, bi guherînê ji rêbaza ceng, û serkotkirina azadiyan,yên bi demê re teqandinê wek encamek e neyînî peyda kiribûn.**

**Ew teqandina gewre yê ji kombûna şaştiyên desthilatdariyê dermafê civakê encam dabû, tiştê ku hîşt bêserûberî bicih bibe bi hemî şêweyên xwe yên koçberîbûyî, ji nû ve çareserî û guhertina demukratîk binkeftî bû, ji bo ew gelên yên fêrî serkotkirin û çepikdanê ji kesê bi hêztir bûn ve, û dijberiyên xwe yên ku li kêlek dijminê welatên xwe sekînîbûn, dema em rikberiyekê di navbera desthelat**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**û dijberiyê de dibînin li ser ku kîjanî ji wan bêhtir xwe bi serve hêzên herêmî bide, li ser hesabê gelên xwe li rojhilata navîn , ji ber vê em desthelatiyek e rewa û hilbijartî nabînin û ne jî dijberiyek e rewa û civakê nûner dike dibînin,û ev jî xirabtirîn tişt e,û bi demê re gelek windabûn berhem dide, ji valahî û tunebûna çareseriyê , ji ber ew pirojeyên herêmî , aloziyên civakî bi xwe re anîn, û encamên neyînî li ser cîhanê bi giştî anîbûn, û hişyarî bi metirsiyên pêşrojê dabûn.**

**Van kêşeyên dûhevhatî , yên civakên girêdayî bi zîncîrên tirs û serkotkirinê dikşînin, ji encamê tengbûna hizrên serwer ji siberojê re, ji ber tiştek cîgirbûyî û qayîm nîne, û her ku serkotkirin zêde dibe , tirs jî zêde dibe,û ji vir em dikarin bêjin ku ev tişt ne tenê di çarçoveya tirsê desthelatdar e ku nemîne li desthilatê lêbelê ew tirs ketibû di hundirê hemî tofên civakê de.**

## 1- Rola medyaya serdest

**Dan û standina neçê bi civakê re dihêle bê bawerî û dûriyek e ewqas di navbera takes û berketiyên wî û nirxên zanyar de çêbibe, herwiha aloziya têgehan tê ancamdan bi encamê belavbûn, û bê peygerî û hûrbînî ve, wisa hêsan dibe li ser medyaya serdest ku civakên yên rastî gunokirina zanyarî bûn e kontrol bike, û hêsan dibe dîtina cemawerên bêharbûyî ji çi gotarek î li ser medyayê belav dibe, û bê guman ku ev bûye tiştekî devîbûyî, ji ber ku pirbûna destikên berhemdana nûçeyê , û kêm nasîna takes di**

hundirê civakê de, kiryarek e dudil û zorkar berhem dabû, nikare mêjiyekî jevkirî,rexnegir û şopîner çêbike, lêbelê hişmendiyek e li xwe danîn û hilxwarî ava dike, û dikare tiştê ku tê belav kirin dûbare bike, di dema ku medya berdewam nûçe û zanyariyên gelek çilwer û jîrbûyî çêdike, li rex berdewamkirina mêjiyan bi mêtina çi tiştê tê belavkirin bi rêya serdevk û perdeyek e qayim ji xwendina çêja gelêrî.

Ew rewrewk bi kûrbûn di kiryar de xwe cîgir dike, û dibe têgehên suriştî, û takesan pê bawer dibin, wisa mildan û radestbûn bi wan xweş dibe, û pişaftin û helandin têne pêkanîn.

Armanca pişaftinê çûna nirx û taybetmendiyê ye ji civakê ve , ji ber ku me gelek netew dîtin ku pişaftina bi zorê wana kirin bê ziman û bê taybetmendî , û hêdî hêdî netewk e bê erd, ji ber vê yekê helandin di çarçoveya nijadiya serdest de ewa dawî encamek e bi rêya wê tunekirina nasnameya rastîn biserdikeve , beranberî serkeftina çanda serdest û komên nirxên wê, ji ber ew çandek e bi hêza xwe serdest e, mînak serdestbûna zimanê Ingilîzî li ser cîhanê ta bibe zimanek e cîhanî pir belavbûyî, ji ber ku ev ziman kesên pê axivîn e pêşî Inglîz bûn, karîbûn bi derbasbûna çerxên qirkirin, pişaftin û mêtingeriyê ve zorpê bikin, û ziman bi rêya ol tê zorpêkirin, ew hîştibû serdestkirin li ser erd û ferehkirina semyanê hêsantir be bi rêya zimanê erebî û reweştên koçerî ve di ol de, û wisa erd bi xelkên xwe ve tê daqurtandin, û herwiha Osmaniyan hewil didan zimanê Tirkî zorpê bikin dema hebûna wan û herwisa, ji ber ku

**belavbûna zimên bi serdestbûnê ve girêdayî ye, û çûyîna çand bi bilindbûna yek çandê ye, û ewa desthilata serkotker e a serdestiyê xwe bi gelek awa û bihanan zorpê dike.**

**Di dema niha de , medya berz bû ,taku erkên jor destikên kevinşopî yên xwe li dor hêzê ve gilover kiribûn pêkbîne, ji bo zoreng bi eyînî gavê berdewam bibe, û bi rêya abonekirina hêza leşgerî , ji bo berdewambûna malgirtinê li ser çand,erd û takes û parastina çi tiştê ku dagirkerên berê zep kiribûn, (diyarbûna zorenga di navbera mîla sinî Turkiya- li hember mila şêî- Îran de) li kêlek xwesteka neviyên mêtingeriya kevin ( Emerêka,Rûsiya,Turkiya û Îran) û rabûna pêşbirkê berve çekdarîbûn û pêşbirka pêşsazî ( Koriya bakur, Çîn, Îran).**

**Û dema mekîna medyayî bibe destikekê ji bo kûrkirina qelşana civakî, û rêxistina jiyanê û têgehên wê yê sirûştî bê lêdan ji berjewendiya bazirganiyê bi nirx, dibe derbirînekê li ser cengek e giştî li hember nirxê jiyana pêşî yê timî zanyar parastibûn,lê ew bûye armanc ji xwediyên mafyaya aborî ve yê kar dikirin bi ked ji bo jiyana ku li ser bingeha dadperweriyê hatiye avakirin têk bibin, û pêş vê yekê li ser milên zanyar - lawên hebûnê- gelek erk hene bi rewanekî ramanî û sincî ve ji bo rûbirûbûna geştir biparêzin , ji ber ku zorenga sermedî di navbera alîgirên jiyana pak û alîgirên xirabî û kirêtiyê di her demê de diyar dibe,û eger me van zorengan kome ser hevdû bikra li ser cureyên sedem,encam,çawanî û pergalên wan ve wê me karîbû kurtas bikra bi yek zorenga giştî û diyar di navbera hêzên ronakbîriyê û hêzên çavkariyê de, û zanîn berdewam**

**e li kêlek ew hêza a ji bo vejîndana bedewbûn, maf û xêrê kar dike.**

**Em dikarin bibêjin ku eniyên ronahiyê radibin bi berzbûna xebata zanyar a zehmet û dirêj ve ji bo çêkirina jiyanek e li ser wekhevî û xweşiyê , bi rêya berdewamiya ked û duristbûna hewildanê, û rakirina zordariya a ku li pey mirovê afrêner dikeve bin siha sîstema serkotkirin û bêrolkirinê, û têkoşîn ji bo rakirina vê zordariyê û guhertina wê bi cîgehek e pak ve ji bo afirandinê herdemî ye û naye rawestan, û ne tenê di çarçoveya şûnekê de ye li hebûnê.**

## 2- Dîtinekê li rastiya rêxistinên Kurdistanî

**Xwedîkirina pepûkiya ramanî li cem piraniya rêxistinên qezencî makzayîyek e zordarî ye kevin e ,sîstemên bavanî berve dîrokê çêrandibûn, û ne seyr e ev tişt, ji ber ku piraniya rêxistinên kevinşopî a rojhilatnavînî yên di hembêza hevrista zordariyê de xwedîbûn e , karibû ew hevrist têkeve nav refên wan de bi rêya saloxgerî ve, û giyanê valahiyê têde biafirîne û wana bihêle bibin wek qalibên mîna hevdû bê rewan û afirandin.**

**Ji ber vê yekê hebûna van rêxistinên vala û sist ji bona berdewamiya lawazî û parçebûnê ye, ta civak ji koçberiya deronî rizgar nebe,ewê ku rêxistina nezanîbûnê cîgir kiribû bi rêya serkotkirinê û saxkirina pergalên nexweş.**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

Ew rêxistinan nikarîbûn tiştekî ava bikirana, lê erkên wan timî lezandinê belav bikin heta bê dawiyê, ji ber ku bi hêsanî nikarin van şêweyên işk ji holê rabikin, a desthilata serkotker di nav de çandibû,û bi vî rengî dibin destikek e gerentîkar ji parçebûna civakê re û valakirina wê ji ronakbîran ve û bê guman ev tişt pîlaneke li ser zanyar û civakê berve demek e dirêj û dûr û ne diyar , û ji sedema tunebûna baweriyê di nav tof û qatên civakê ta ew civak bibe tenê guheke vekirî ekranên medyaya reşker bandor dibe, yê mirin û cengên demdirêj belav dike ji bo berdewamiya serdestkirin û serweriyê.

Ew hêzên serwer bi rêya wan tofên ên gêre û kêşe di hundirê civakê de çandibûn temenê xwe dirêj dikin û ev tişt di hundirê civakên rojhilatnavîn de bi giştî û a Kurdistanî bi taybet ve diyar dibe.

## 3 – Rastiya buhara Erebî

Hemî cengên ku bi ser rojhilata navîn ve hatibûn ji dema danîna fermana guhertina ricîmên serkotker bi ricîmên nû ve, geftugo li ser çawaniya guhertina van ricîman bi ricîmên nû hatibû kirin ,li gorî xwestekên ew hêzên ên şerên aborî yek bi dû yekî ve durist kiribûn,taku rojhilata navîn neman bibe, navçeya xewin ji dîrokê ve, ewa ji kevin ve xewina serdestan bû, bi rêya desteserkirinên Islamî û cengên pîroz (xaçparêz) û talankirinên Mexûlî û piştre Osmanî û ma pêdiviyekê di serdema nûjen de li cem dewletên pêşesaz yên ji bo parvekirina wê ketibûn e

**pêşbirkê ji dema herdû cengan ve (mêtingeriya Ewrûpî) û imzekirina peymanan li ser wê mîna Saykis Bîko1, û ji destpêka serdema buhara Erebî2 ve hewildabûn ku rewş bi rewşek e din ve biguhêrin bi rêya mizgîndayîna bi cenga azadî û demokratiyê, û guhertina wê di dawiyê de bi şerê giştî a navdewletî ve li hember terora cîhadî, ev hemî ji bo armanca aborî a nediyarkirî û veşartî ê tê naskirin bi dîtina jêrder û hatinên wek ku timî hebin bi serdestkirina herdû hêzên aşkere ve Emerêka û Rosiya û yên bi wan ve girêdayî, ji dewletên herêmî ve ên Sûrî dîtibûn mîna mêrê nexweş ê di sekretê de, û pêdivî heye ku par têde bên dabeşkirin bi dawîkirina Saykis bîko a kevin û destpêkirina bi lihevhatinek e Rosî Emerêkî, û rewşa dakêşan û avdahatinê ji nêzikbûn û dûrketina herdû hêzan ji hevdû ve û her wisa em li pêş dîmena şerekî naye rawestandin tên , heta ku ew dan û standin çareser bibe, û ew bermayên kevin bêne levakirin, û li pêş vê yekê em hijmarekî girs ji pernaberan dibînin, ku berî xwe didin ewropayê dema ku Birîtaniya yê ji yekîtiya Ewrûpayê derikeve, û Raste gelêrî a dijî hatina penaberan radibe û em piştgiriyek e Tirkî û Qeterî ji komên cîhadî re dibînin ên biveyên xwe gîhandibûn e Ewropayê.**

**Ev hemî bi encamê derketina cenga aborî û gerîna li jêder û hatinan û deverên desthilatê, ku hemî dewletên li rex Sûrî hewil dabûn tiştekî bi dest xwebixînînin,taku cihê lingekî ji xwe re bigrin**

---

**1- Peymana Saykis Bîko di 1916 de : ew peymanek e veşartî ye di navbera Ferensa û Ingilîz de bi erêkirina şahînşahiya Rosiya û Îtaliya yê li ser parvekirina devera heyva nêdar di navbera Ferensa û Birîtaniya, ji bo diyarkirina deverên desthilatê li rojavayê Asiya de, û barçekirina dewleta Osmanî yê di cenga cîhanî a yekem de de serdest bû.**

2-Şoreşên Erebî an buhara Erebî an şoreşên buhara erebî li medyayê, ew tevgerên mehnegirtî ne aştyane ne girs in li hinek dewletên erebî de destpê bûn dawiya 2010 de û destpêka 2011 de,bi şoreşa Tunisê ve bandor bûn piştî ku Mihemed Elboizêzî xwe şewitand , û bi xistina serokê tunisê a berê Zên Dîn Abidîn lawê Elî serketibû.

---

**ji ber vê yekê mirovê rojhilat navînî bû penaber an qurban û pertalekî erzan ji destikên medyayê re, dema ku kedxwarî û wêranî bi kirêtirîn riwên xwe ve derketibû, ev tişt dihêle ku cîhan berve cengekî ne dûr here, ev yeka li ser hemî dewletên cîhanê neqşeyên guhirînekû hatibû sepandin , ne dûr e ku pêşbirka çekdarîbûnê destpê bibe bi dûbarebûna pêkanîna artêşan û amedebaşiyê ji bihevketinên mezin ênnayên rawestan lê berdewam berfirehtir dibin, bi berhemdana çekên ne kevinşopî û pêşbirkî li ser berhemdanên wana.**

## 4- Bilindbûna Mîkefîliyên nû

**Siyasetmedarên Rojhilatnavînî tevî ciyawaziya cîgehên wanî serkotker xwe radestî têgehên Mîkafîliyê beloq dikin, dema pala xwe li ser çandek e rêxistinî pîlebazîker û reşepêş didin, armanca wêna bernametiya cemawer li ser ropartek e gelêrî ,rê ji sabarkariya şaneyên qamebûyî û sermeşiqkirî re dûz dike , ji ramanên serwerê giyanî, pêşrewî bi kesayetên comî û lêvegerên olî ve, armanc ji vê yekê valakirina çi naverokek e bi wate ye, ji ber ku zanistdarî wek wateyekê ne wekî ku siyasetvanan li ser erdê wê bi cih tînin, û ev yeka bi giştî ve li ser xwedî lêvegerên olî pêkhatî dibe, ên hemî ropartên rêncbûyî hilanîbûn ji bo berjewendiya bikaranîna wê li cengan û ji bo armancên qezencî pêkbînin,di dema ku rêzanên buhara Erebî de**

**pêşbirkekê li ser berhemanîna tundirewiyê her kes li gor cihê xwe duristkiribûn, bi çêkirina milhûriyên lawaz, ta bibin nimûneya herî xirabtir, dema em li ser milhûriyên çerxa bîstan li cîhana Erebî biramin, ev yeka encamên nakok dide me, di hevokek e tam de dicive û ewa pêkanîna xwesteka teqîna gewre ji gelên ku fêrî tewandin û serkotkirinê bi dehan salan ve bûn e, tiştê ku wê hîştibû veguhêz bibe li serdemên milhûriyên nû yên li ser qerebalix û belavbûna erdnîgariyê ava bûn e, û karxistina tundirewiyê li nav bijardeyên ciwan , ji ber Rojhilata navîn bûye cihê komên çekdar û sedem vedigere ji serdesbûna siyasetvanên fêlbaz ve li ser movikên jiyana siyasî bi awayekî pir zêde ve, û ji dûrxistina xwedanê hizrên afrêner, dijminên Mîkafîliyên nû – ger derbirîn rast be - sûdê werdigrin.**

**Em dikarin bibêjin ku Mîkafîliyên nû ewên ku Mîkafîlî wekê ku me li ser xwendibû di pirtûka Mîr a Nîqola Mîkafîlî 1 de**

**-------------------**

**1- Nîkolo Dî Mîkiyafîlî 3 Gulanê 1469- 21 berçeleyê 1527, jiyan û mir li Filorensa, ramanyar û feylesofek î siyasî îtalî bû, di serdema rabûnê ye, pirtûka wî bi navê Mîr navdartirîn pirtûkên wî ye.**

**reşepêş kirin e , ewan rengekî reşker û beloq in ji wê, ji ber ku Mîkafîlî bi serdestbûnên xwe derbas kirin e û her tiştî bikaranîn bi awayekî xwînmij û pîs taku bighin armancê.**

**Bikaranîna her tiştî ji bo armancê xwe bi medyayê ve diyar dike, medyaya ku bûye ew aşa a cengên meydanî birêve dibe, û zorê li ser jêderên nûçe û bandorkirinê dike, ew**

**bûye hola ku têde siyasetvan li ser hemî meydan û derbaran de hevrikiyê dikin.
Zikmaka her paşçûyînek e civakî vedigere ji gendeliya sazkariya ramanî re û bîrdoziyê têde û mayîna vê sistbûnê bê çareserî an hewildana guhertinê.**

## 5- Bişkuvîna kokên comî û nijadî

**Kirina nijadperestî û dûrkariya olî û netewî ew ji bo cîgirkirina rizandina civakî ne û bidawîkirina destkeftiyên şaristaniya a ku bi destê zanyar ve hatibû diyarkirin , ta civak xwe bi ser hevdû ve nede, ji ber wek mînak şerê li Sûrî van pevçûnên civakî cîgir kiribûn, ku ji parçebûna civakî derhatibûn, bi encamê zorenga ragehî a dîrokî ve ku li meydanê hatibû gurkirin bi rêya çekdarîbûnê ve a bi xwe re ceng û nakokiyên berfireh û girêdayî bi aloziyên civakî ve anîbûn, ji derveyî sînorên Sûrî li dewletên tîjandina comî û li tevahiya Rojhilata navîn , û mînaka nêzik jê re başûr û nîvê Îraqê û zorenga comên Libnanî ên bi serweriyên cîgehî û xaçparêzî an Islamî ve ên navika heyva Şêîy1 nimûna dikirin, van tiştan hemî nîşan didin ku têvedaya zorengê bi rêya ol ve tê geş kirin, û şîrova vê yekê ji encamê ne diyarbûn û çewisandina ramana rexnegirî di nav bijardeyên ciwan de û parastina desthilatên serkotker ji reweştên tîjandinê re, ji bo civak yekgirtî nemînin û tenê agirdeyê cengên aborî bin, ji bo ku erd , hatin û saziyan talan bikin.**

**Dema ku medya gelek paşverû be û li ser zorkarî û girtinê xelkê bajo, bi awayên xwe yên diyarkirî yê mazoşiya**

**ramanî pîroz dike bi rêya reftarên partiya totalîter, cîgirê reftarên olî û xudayî, a cureyên mêtingeriya hişmendî pêkanîbûn û kedên zanyarên - ên bê lawazî û çîzbûn derbasbûn e- girêdabûn, zanyarên ku ewlehiya civakên xwe parastibûn, û wan ji hola cengên nerewayî ve derxistibûn, û ketibûn di rûbirûbûna binçavkirin, birçîkirin û pêlên nezanîkirin û reşkujiyê de.**

--------------------

**1- Heyva Şêîy: têgehek e siyasî ye , padîşahê Urdinî Ebdulillahê duyem lawê Hisên bikaranî bû di Waşinton post de dema serdana xwe ji Emerêka re di destpêkên meha Berçelê de;di sala 2004 an de , li ser metirsiyê xwe derbirin kiribû bi gihîştin hikûmetek e Îraqî bi Îranê re hevkar e li desthilatê li Bexdayê ku bi sîstema şoreşa Islamî re li Tehranê û ricîma Behs li Şamê re hevkar e ji bo çêkirina heyvekê bibe bin serweriya şîa dighe Libnanê.**

**Kêmasiyên vê civaka amadekar bi çêja xwe ya mêtandî ji reweştên pîrozbahiyê aşkerebûn, bibûn jî nimûneyekê ji her tundirewiyê re ji bilî ku bi hişmendiyê pêşkeve, û hevrista zordariya rojhilatî tiştê ku çandibû çinî kiribû bi dehên salan ve ji koletî, û cîgirkirina tenahiyê li civakên ku ji bilî çepikdan û gotina herbijî ve tiştekî din nizanîbûn, di gumaniya xwe de ku şoreş ji eywanên perestgehan û bangdariyên kesên jê derketin e ve derdikevin.**

**Pir caran armancên van şoreşên comî dikevin di pêgorandina desthilatê bê guhertina wê bi awayekî sereke ve.**

**Bi nediyarkirina dengê gelêrî, û mayîna bijardeyên wê bin topbaran û revê , çênabe em qala çi destpêkên avakirina sîstemên demûkrasiyê bi sînorên wê yên kêm ve bikin, an**

**qala çi pirojeyên ku palên xwe li ser felsefeyeke rastîn dide bikin, wê ev di çarçoveya hewildanê de bimîne ji bo vegerandina nasnameya rasteqîn e ji civaka Rojhilatnavînî re, û bi dûrxistina zanyar, xwedanê taybetiyên afrêner, û ne tevlîkirina wan  di pêvajoya guhertina demûkratî de, wê çi piroje di zemîna xwe ya tewrî de bimîne ,eger civakê tevlî nebe  bi taybet ve bijardeyên  wê ya ronakbîr  ên xwe  ji çi axaftinek e partîtî pasfinde  ve girav nekiribûn.**

# Vîna zanyarî
# di rûbirûbûna serkotkirinê de

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Rexne bi tevahiya xwe ne deriyek e ku bi rêya wê her tiştî li ser bê axaftin ,meraqa koşyar êrîş dike ta tiştê jiyan veşartiye bizanibe, li rex gelek aloziyên ên xwe bi reweşta merovî girêdidin, ji bo bibin destpêkekê ji ketina di hundirê gelek têgehan de yên di kûrahiya mirovahî de ne, li ser sehneya nakokiyê de derbas dibin.**

**Û di pêla serpêhatiya nivîsê de, rastî bi naverok, nirx û pîvana xwe di rêjeya xwe de hevjînbûyî dibin, ta ku ew awaza a huner û naveroka jiyanê armanc dike çêbikin, û huner ewa başbûna lîskê ye li gor derbirîna Kirotşe 1 .**

**Diyarkirina şopên nexweş di reweşta mirovî de ew tiştê herî ku li ser zanyar dixebite, dema ronî li ser mirov datîne, dan û standina wî bi diravê re, ne wekî destikekî ji bo hevjiyana aştiyane lê belê wekî armancekî ku nirxên mirov ê girêdayî bi başiyê ve ji holê rabike, ev nirx bi xwe yekem binemayekî sirûştî ye ji guhertina tevgera dîrokê re, ji bo mirovan bi aliya danîna çarenûsan ve diçe , ji bo dîtinek e riyalîst li ser avakirina mirov ji hundir ve, û danîna çarenûsên tekûz ne nîv çarenûs,ji bo weşîna nirxên mirovî ên dadmend ji nû ve di nav civakên mirovî de bi cidabûna qatên wan , di dema ku zorenga mirovî radeya parçebûna mirovî diyar dike, û cudahiya ku di nav civakên pêşketî de heyî berz dike,yên tiştan diafirînin û timî bi encamdana çareyên jiyanî diramin, di jiyan û pêvajokên xwe de bi giştî , û di nav civakên ên hînê bi awayekî sawîlke û destpêkî dijîn û hevjiyanî bi tiştan re dikin, û di nav xwe de, ji alavên hevjiyana nû û ji balabûna di ramandinê de bê**

**par in, û herwiha ferehiya kortalê di navbera dewlemendê azwer û xizanê jihevketî û peyrew de.**

**Ji ber ku girtîbûn li hember jîniya ramanê ye , û ewa kelem e pêş ew hêzên afrêner ji bo bi jiyanê re bilind û balatir bibin, ta ramanên bilind û pêşvero birêkevin û bi rêyên wê jiyana a bi hinirên tekesan ve diyar dibe rast bibe, lê reweşta zorengê di navbera fermandar û fermanber de dima kelemekî pêş amadakirina nifşekî ku bi nirxên rabûnê bawer bibe,bi awayekî hemtî, û ew kelema li pêş balabûna mirov bi jiyana xwe ve ye , ew ji milhurî û zorî çêdibe, ji ber mirov hinirekî bê dawî ye, eger bizanibe tiştê pêwîst bikarbîne, ji ber ku bedkariya rêberîkirin û karxistinê binkeftin û têkçûnê ancam dide, bervajî zarîkirinê ê encamên erênî bi dû xwe tîne ,dikare hevkêşeya jiyana zehmet teqle bike ji bo jiyanek e hêsanî, afrêner û bi hinir ve.**

**----------------------------**

**1- Binîdîto Kirotşe : Feylesofekî nimûnî ye,dîroknas û siyasetvanek î îtalî ye,behsa gelek mijar di nivîsên xwe de kir jê Felsefe, Dîrok, zanista Dîrokê û Bedewbûnê.**

**Divê kar li ser binema bandorkirina wijdanî hebe li kêlek berzbûna ramana geş ê di nav xwe de hêz û tojiyê radike, û dibe ku teqandina gelêrî pirsyarîkirinek be ji vaca guhertina misoger re , ji ber ku sertî moralên henas têk dibe,û dihêle ku di rewşa nemana deronî de bimîne.**

**Û bê guman ku bandora bîrdoziyên totelîter rolekî di leqandina aramiya civakê dilîzt, bi rêya serdestkirina wan ji takekes re, û dorpêçkirina wî bi slogan û bangeşîkirinê**

**û reftarên yên wî berve radestbûnê ji serwer û kêşeyên wî re biribûn , li rex diyarkirina rewana valabûnê di hundirê kesayet de dema tê qutîkirin û li gedûkên xwe yên efsanî de dijî, bê ku bi ziyana vê mayînê birame, û ligel bindestkirina hişê takes, dûrkirin û gunokirina hişmendiya wî, û herwiha valakirina hişmendiyê ta bibe yek ji keriyê, û ev tişt hîşt mivroyên deronî li rex belvbûnên dîmenên awante û penaberiya demdirêj derkevin.**

## 1- Cotbûna ez û din

**Sarter1 ji bo a din bike dojeh meqate dibe , ji ber ku mirov nikare xwe ji pirs û êşên xwe rizgar bike, li gel wê di hebûniyê de li nav deryayê diçe,ta a din ji takes re kelemek î bibîne ,û bi heman demê ve zanyar bin siha çi gotarî an deqekî kedekî dide, ji kesê wergirtî radike,ji bo kêşeya hebûnî a ku tevahî rêzên jiyana me kêmxewî dike bi belge bike, nexwe mirov tekî tenê ye ,bijareyên xwe li ber hebûna ragihandî radike, û encamên bijar e û sersaxiyên xwe li pêş tişt û dûxayan hildigre, û herwekî ku a din ji tevahî berdewamiya jiyana me kelemek e nimûnî saz dike,lê em jêre deyndar dibin, ji ber ewa xeleka giringtirîn e ji xwenasîna me re û çawaniya em bi destê wê di jiyanê de bibin.**
**Got û bêjiya heman û din di rêbaza gerînê de ye ji kêşeyên hebûnî re, û zanîna a em heta çi radeyê dikarin sûdê jê wergirin, û dibe ku hebûna êş di bîrê me de bi nerîna me ya got û bêjî ve tevderbasbûyî be, ji misogeriya rêza jiyana ku li ser pêşveçûnê berve dawiyê hatiye avakirin, lêbelê**

**mayîna demborînê di mirov de qayimtir e û li ser ban de tê xuyakirin, û dema em qala Sarter dikin û gotina wî tînin ziman ,dema dibêje ;ku a din ew dojeh e; , em nîşanên giring jê derdixînin , û li vir Sarter di şanoya xwe ya bi navê (Rûniştina nepenî) dibêje : “dojeh ew kesan in.“**

**-------------------------------**

**1- Jan Bul Îmard Sarter 21 Cehzeranê 1905 li Parîsê -15 Nîsanê li Parîsê 1980 , ew fêlesof ,romanivîs û niviskarekî şanogeriye , niviskarê sînariyoyê ye û rexnevanekî wêjeyî ye û çalekvanekî siyasî ferensî ye.**

**Ew kesên yên hewil didin ku rêbaza jiyana xwe bicîbînin , herwiha ji bo me bi kelem û zehmetiyan ve bitemirînin, û kedekî didin ku di rêya me de aloziyan biçînin, û herwisa hewildana afrênerî ê ku em di hundirên xwe de ronî dikin, rê dûz dike ji got û bêja ez û din bi awayekî pir diyarbûyî, wek mînak: dema em dibêjin ku dildar dixwaze henasa hezkiriya xwe bi henasê xwe ve tune bike, di dema ku di kiftika dîmena riyalist de em raman dibînin ku xwe li dû hev dike ji bo ku rêbaza xwe ya saxlem dûrî dîtinên wijdanî ên zindî çêbike, û bê guman meraq ji bo çareseriyê û nêzikbûna ji vac ve ye, ji ber ku jiyan têkelek e ji têgehên ne tebitî re , û ew xewinên ku têne mirov, û parekî ji ramanbûna wî dibin, dihêle ku henasa afrêner hewil bide jidil ta bi rastiya afrênerî bighêje xweşiya armancbûyî, û ewa sazkirina rêyên bikêr ji hevrazbûnê re, bi têgehîbûnek e bacgirtî, ji pisporî, ajok û kanîbûnan tê encamdan, em wana ji kelika vê girteheviyê pevdiguhêrin û di mijara hewildana evînkar de ku bi parçeyê xwe ya din ve bi yek dibe, ev mîna peywendiya afrêner e bi alavên heyîn ,cîgeh û kêşeyên wê ve û bi afrêneriya xwe re , û bê guman ev tişt**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**pêktê bi pêvajoya têkelbûna komelgî ligel van pirsgrêkan, ta bibin kedek e bi hêz ji bo afrandinê.**

**Têkelbûn bi bîr re ne wek ew têkelbûna pêkhatî ye di peywendiya evînî de, di nav jin û mêr de, lê dema ew têkelbûn pêk tê, evîndar kesayeta hezkiriya xwe winda dike, û tenahiya eza xwe vedigerîne.**

**Em dibînin ku ew ez , bijareyên henasê di parçebûn de diyar dike, û gera wê ya berdewam ji çarenûsan re ji bo rewşên yên demborînê nîvî dikin û wê berve pêşerojê ve dibin, eger ew evîn meraqa me be ,ji bo em hez bikin , ewa jî çûna me ye ji bo vekolîna heyîna pêşveçûnê ye ji baştirîn re , bi xwestina xêra dûrtir bi navê wê ya rastîn ve.**

**Û pêjna afrênerî bi tevahiya xwe bêhtir diponije li kêşeya henas û din , û wana bi eynî demê pesin dike, û hewildana henas ku xwe bi yê din re bi yek bike bi awayekî wijdanî ve, ango ewê din dixwaze hezkirina me bi wateyê ku pêdiviya xwe di wê de dibîne bijî, di vir de bedewiya hewildanê pêktê ,û herwiha mercê afrênerî bi gera li jiyana yê têde zanyar pêş dikeve , bi rêveçûna xwe bi vê pêla civakî re berve rastiya hebûna a ku bi bedewbûnê ve darizandî ye, tevî got û bêja pevçûna sazger li her koş e û derbarê û serdestkirina wî bi hemî rêgeh û meydanên cuda ve, êdî hebûna evîndar di pevçûnek e berdewam de ye, wek her hebûnek e din, û hindî em di henasê xwe de bi rêya eynikên hebûnê biramin , her ku wê rastiya me ya bedew bêhtir diyar bibe, û bi rêk û pêkbûn û lihevhatina xwe ligel sirûştê wê berfirhtir bibe,wisa wê hizrkirina bedewbûnê xwerû be,**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**û ji pend re nimandin be, ji ber ku pend lawê bedewbûna a ku di hebûnê de cîgir bûye, û pêzanîna me bi hebûnê pêknaye bê ku em derbasî rakêşeriyê nebin li vê cîhana ku bi nepeniyên xweşiya bi seyr cîtengbûye, bi gerîna di nav ferehiya wê ya bê sînor de, ji bo em xwe binasin, û herwiha hebûn yê ji me ve xuya dibe wek ku buhiştek e akincî, tiştên wê yên veşartî aşkere nabin ger ew pêzanîna takekesî nebe û ewa : ez e, eza a dixebite , ked dide, dixwîne û li çûnxwaran digere.**

**Ev rastiya pêketina zanyar çêdike ji bo rizgarkirinê ji baskên têgehên kevirbûyî, mirov bi xweşiya rêvebirinê ji xwesteka evînî re bîr nabe eger nerame bi bûyerên dem û cih ve ,ji ber ku nepeniya bedewtirîn bi vexwastina aliyên girêdayî bi huner û zanistên mirovî ve girêdayî ye, û her tişt bi rêya got û bêja takes û sirûştê di nav jîndaran de dibişkive, xuyakirina ew civak bi saya hevgirêdana qayim di navbera tevinên afirandina saxlem de ê di heyînê de niştecî ye, û di xwesteka henasa takesî de ji lêgerîn, afirandin û ketina hundir bi kûrahî berve bedewbûnê ve, rexne jî parek e biserîbûyî ye ji pêvajoya afrênerî , û ewa hevcisniyek e din e û riwek e beranber e ji got û bêja takes û sirûştê, hebûn û jîndar ve, afrênerê deq û pêdeçûyê deqê, felsefa û şîrovekarê wê, van cotbûnên beranberî hevdû demasalên hevdû yên kêm temam dikin, ji ber ku rexne ji deqa amadebûyî dixwe, û nirxa afrênerî bi giştî ve diyar dibe dema pêdeçûna şîrovî a ponijî di nava wan de cîgir dibe û herwisa..**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**Li vir nîşanek e girîng e ji kesên yên li pêş me û jiyan û ramanbûnên me de dibin kelem, ji ber hebûna wan dimîne ew dojeha fortdayî ji hemî tiştên yên di jiyana me de ku em wana bi rêk pêk dikin , bê guman ew kelem di navbera henas û ponijîna tam de dibe asteng, û her tim dibe dojeh û şerodî ,bi sedema hebûna kesên din, yên kedên mirov ji bo parastina rewanê û rêxistinkirina pêdivî û palnerên wî hizr nakin, û ne xem e ji bo wan ew bedewbûna a ku di çûna nav sirûştê de heyî, û sûdwergirtina ji taybetmendiyên bedewbûnê ve, ev hîşt ku hêrs û dilgiranî bibe encamek e a ku li hember hêzên kirêtî û reşepêşkirinê radiweste, ên beranberî raman , xewin û xwestekên me di rengînkirina jiyana me bi bedewbûn, ramanbûn û zanîna hewildar disekine.**

**Got û bêja hebûna afrêner li rex kelema mirovî de û derdê heyî li cem berdewambûna afirandinê û pakiya wî ye, dema em Sarter dibînin ku derd di yê din de dibîne, û hebûna me wek henas barekî bi ser de ye, ew li vir dibêje : (Bilî ew din e, eza ku ne ez e) û ji vir ew dîtina zanyarî pêktê berve hestkirina bedewbûnê, û ketina di nav nîşanên wê yên germ de, û rêvebirina ser alavên bergirî dide me, di meqatebûnê de tê kurtaskirin,li rex tofekê vê bedewbûnê bindest û dûr dike, çima girtenhevî ?!, li vir rastî mîna armancekê ji zorengê ye û ewa got û bêjiya hebûnî diyar dike, ji ber ku du tof hene, tofek e tenik û afrêner jiyana xwe bi rêve dibe bi rêya piştpêbestkirina xwe bi jiyana xuristî ve û tiştê ku di nav de ye mîna bawerî bi komek yase , bi rêya wê jiyana nimûnî tê rêxistinkirin û ev reftara lêkolînerên jiyana gelek aram û bi wate ve di kiftika xweser de beranberî wê tofa**

**qezenchez a bi malgirtin û desthilatiyê bawer e, ji ber ku ew bingeha vê tofê ye û cihê serpereştiya wê ye, û bedewbûn di sebaret wê ewa bidestxistina tiştan e , û diyarkirina bedewbûnê ewa di gezenckirin û desthilatiyê de ye.**

**Naxwe du ragehên ji hevdû cuda hen e,bi berbaweriya li ser bihaneyekê (şîrovekirinek e rêzimanî) bi şîrovekirin û ravekirina peyva (ne) em dibînin ku jiyan naye jiyankirin ji bilî li ser sergeha pêşbirk û bilîxwebûnê , bi pêşdebirina rêyek li ser rêyek ê ve, herwiha lîska aşkere li ser têla mayînê ji kesê hêjatirîn re.**

**Gurbûna afrênerî di hevketinê de ye ligel zîrekbûna qezencî û xwestekên tevahî zanistên mirovî ku em li mirov digerin ji derveyê hawîra zanistê ve ê girêdayî bi bendên hiş û wênegirtina wê, herwiha dûrî xûlbûna wijdanî bi hemetkirina li ser wijdanê wekî pîvanekî ji sererastkirina rêzên çewt ve ên mirovan li qonaxên xwe yên dîrok ên dagirtî wate û fêrkirin piştpêbest dikin, dema raman bikaranîn ji yek ji du wênegirtinan an bingehkirina hişmendiyê an wijdaniya bêsînor a ku bi zanînê bawer nabe, ku ew zanîn dikare di naverokê xwe de hemî tiştan têbigihe, û ji vir Sarter dighe encamekê ku tunebûn û veqetandin û dûrketin di navbera ez û din de heye.**

**Cengên bi ser ricîmên rojhilata navîn tên bi gotina guhertina sîstemên wê, di eynî demê de di naverokê xwe de guhertina êşê bi rewşek e dagirtî qerebalix, derew û tevhevî diraje, nîşan dide ku guhertin ji derve naye sepandin ,lê**

**vînek e cemawerî jîhatî li peye , ji ber ku têgihiştin bi pêwîstiya guhertinê ew pêdiviya civakan e, lê hêzên derveyî ew bi deziyên vê lîstokê weke diyar dibe dilîzin, bi gurkirina zorengên yên nayên rawestan û aram kirin , rewşa siyasî a bi agirên sitemkarî û destwerdana derveyî dorpêçbûyî ye.**

**Û berketina vê kêşeya qewimî di kokên civaka destgirêdayî de ye bi zincîrên serperestiyê û belavbûna derdên desthilatê di saziyên wê de, ewa cihê hêviyê ye di pêvajoya berhemdana deqa afrênerî, hatibû piştpêbestkirin, ta di jiyanê de berztir bibe bi rêya ramana a nûnertiya çareseriyê dike , ev ya parek î girîng e ji deqê ve, ji raberbûnên helweşîn û parçebûnê ve ye, û ne diyarbûna pêşker, û çi berketin li cem asta gewdehê û tiştê şanî, ligel wê a din dibe mîna çi mijarî an tiştekî, lêbelê di rewşa dîtina derdê civakê de divê em destê xwe deynin li ser dûriyên wê ya deronî û encamên ricîma zordar li ser hundirê avahiyên wê, û qerebalixa ku têde çêbûye ligel şerên derveyî, û axaftin li ser vê dirêj û aloz e, û di cengê de pêkanînên şahiya aram kêmtir dibin, û ramandin li cihên wêranbûyî zehmet dibe, û ji van mehnedîtina li ser binpêkirinên yên di dilê bîr de cîgir bûn e ,dibin hemî rojeva axaftinek e bi êş ve, û hemî rê ne ji dermankirina rûmeta binpêbûyî re bi destê qamçiyên serbir û carne jî ji sedema cenga ya destara xwe dizîvirîne taku dilaraman bikuj e, dema ku dîmenk tê girtin ji xirabtir gunehek e nuh dîtî, em dibînin ku li ser derdê jinê li cengê tê tîr kirin, ji ber ku ew hemî encam û bûyerên cengên yên mêr çêdikin dikşîne, û parastina jinê ji birîndarên şer re, bi ewlebûna**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**berzkirina peywendiya mirov bi cih re, têkiliya wî bi a din re, û dîtina civakê ji jinê re ji ber ku ew jîndara a herî ku sertbûna cengê hildigre, ev dihêle ku em li bûyerê binêrin bi paldana li ser dan û standina mirov pê re, wek wateyekê ji wê têkiliya di navbera ez û bilî, û Sarter li vir dibêje:**

**(Ew têkiliya di navbera ez û din peywendiyek e tiştbûyî ye, heta ku her yek ji wan bi a din re wek gewdeyekî an mijarekî dide û distîne , xwe bi wî ve bi ti awayî girênade.)**

**Û çavdarîkirina bûyerê ewa lêgerînek e ji vê got û bêjê re bigiştî, herwiha girêdana rûbirûbûnê di nav wan de berz dike, û wateyan ji van beranberbûnên wana ve bervajî dike, bi derxistina temaşevan ji panava ponijînê, ji ber mirov aliyê diramî nabîne ji bilî rêbaza got û bêja henas û a din , ji ber ew rewşên mirov û qonaxên wê yên cuda ligel yê beranber diyar dike ,û naveroka vê girêdana ramanî ê cîgirbûyî vedikole ,li paş berzbûna temaşevan, danîna helwestên zindî beranberî rûdanên çêbûyî li civakan û çarenûsên wan, awayên ramandina wan û alavên weşandina bîrdoziyên wana jî kontrol dike.**

**Û bê guman ku peywendiya cihî di navbera got û bêja cotbûnan de û tiştê di navbera wan de ji peywendî û kelemên dijberbûyî ve ye.**

**Lê nivîs vê gengeşa li ser encamên gotobêja berdewam li hebûnê diyar nake bi qasî ku hewil dide baca serpêhatiyên mirovan veguhêzîne, di çarçoveya rêbaza dan û standina hûrbînî ji zanistên mirovî re bi giştî.**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**De em bi gotina Yohena Ci Istosîncer biramin di pirtûka xwe de a bi sernavê : "çima navnetewan diçin şer" :**

**Herdû alî wê bibêjin ku sinc ew bihana şerê wan e, herwiha jî bingeha vacî ji destpêka cengê tê piştpêbestkirin li ser nirxandinek e pir pêdeçûyî ji geşbîniyê ve ji encamên şer, birîndarî û lêçûnê, û li ser wênegirtinên şaş ji niyazên dijmin re .)**
**bi roparteke wijdanî ew civak li tûnîla heldêrek e ne aşkerebûyî hatibû birin, bibû êzing ji çavkariya xwediyên aborî û serweriyê re, ev me dihêle ku em vegerin Sarter dema got : ( -Ez - : berketî a din nabe wek ew bûye,lê berketî wî dibe wek ew dibîne di çarçoveya werza serpêhatiya xwe ya taybet de, tê wê wateyê ku nerîna ez ji bilî re nerînek e kurtas e û têwerbûyî ye, tevî ku ew dîtinek e serveyî ye li ser gelek cureyên hestî cîgir dibe , û nakeve kûrahiyên bilî bi rêya nêzikbûnê jê re û hevsojî pê re.)**

**Naveroka pirsgirêkê ewa: berdewambûna zorengê ye, û pêşxistina devdanan li yên din in, di çarçoveya ne çareseriyê de, mirov wisa li dû hev tên ji bo bi baweriyan bigrin li ser hisabê damendelêtiya hindan, û wisa serdestan vê pevçûnê li gorî berjewendî û ecnîdeyên xwe gurtir kirin, wisa dîtin rûbirûbûna bilî birastî wekî ku Sarter dîtibû kurtasbûyî ye , bi wateyê ku ew tewere ye di sînora ezeziya kirdeyî de ye a di heya xwe de bi ew baweriyên ên wê bi rêve dibe ve girêdayî ye**

## 2-Dîtinek e felsefî li ser girtinheviyê

**Dijmin û bêgunehan hevdû dibînin ji bo bi hevdû re bibin alîkar ligel cenga wana dijî hevdû, ta başiya mirov di xwe de bê bicîkirin, ji ber ku ewa di artêşê de tenê fermanberek e, nakokiyek e dijwar dijî , ku bibe ewê hatî ta erkê xwe li gor ferman û xwestinê pêkbîne an ew mirovê yê li hember wê erkê bi duristî piştî şiyarbûnekê raweste , tê wateyê ku mirovahî di cengexwînî û sekretê de ye ji ber wan şerên vala yên tenê wêraniya giştî ji hemî aliyan re tîne.**

**Û hebûn gemiyek e, û wêranî parekî jê ye, eger çiqasî jî gengaz be, wateya wê tunekirina kesên yên li ser piştê ne, û serkeftin ji mirov re di naveroka xwe de çandek e pilebilind e, û bi rêya bermaya şaristaniya hişmendî ve berz dibe ,a ku zanyar ji kevin ve mizgîniya wê dabû, û karibû bi rêya piştpêbestinê li ser dan û standina ramanî, vekirina pêywendiyên evînê bi rêya bingehên wê yên qayim ve biparêze , ligel kiryarên desthilatê a ku bi ceng û malgirtina qezencî ve naskirî ye, ji ber girêdana peywendiyên ramanî bingeha xwe ji zanistên mirovî digre, û van xalên nîşan dide :**

**- Dîtina berdêlên rasteqîn e ji dîmenên girtinheviya bîrdozî ve ên ketibûn e di gotara netewî û ragehî de, bi diyarkirina nirxên jiyana kirdeyî ve û gera li başiya mirov û xuristiya niyazên wê yên yekem dema berz dibe, ji ber ku nivîsa zanînî li ser xuyakirina banga giyanî a bedewî piştpêbest dibe, ji derveyî berketinên mirovê zanyar ji dawîkirina bobelatên yên bi destê mirovê ezez ve hatibûn e kirin.**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**-Di nav xwe de kanînên kirdeyî ji mirov re danasîn dike, bi rûbirûbûna kelemên yên bûn e navber di navbera henas û baweriyên xuristî de, herwiha dan û standina mirovî ji hevgarî re û hemdilî pê re.**

**Ewa çalakiyek e rasteqîn û wijdanî ye ji kargêrîkirina piştrastiya ne diyar re ,di dema cengê û hevxistina dirindî de.**

**- Piştpêbestbûna li ser danasîna başiya kirdeya mirovî a ku ji giyanê sirûştê ve dertê û mirovê hewildar vê yekê diyar kiribû ji bo girêdana peywendiyên xuristî di navbera wî û qurbanî de ,bi rêya berzkirina dîmenên vê hemdiliyê , tiştê me hîşt ku em palnerên yên li paş pêvajoya çêkirina xêrê sekinîne şîrove bikin, û ewa pêkanîna bedewbûna heyî di hundirê mirovê xuristî de.**

**- Hewildana li pey çalakiya xuristiya xêrê li cem mirov û serxistina wê li ser palnerên xwestinê û serdestbûnê ,ew tê anîberkirin ji bo nemankirina hatinên gelan û malgirtina wan, û serkeftina bi qasî tê pêkanîn ji nirxê aştiya durist re.**

**- Diyarkirina rastiya aştîbûna xuristî a di henaseyên komên bazdayî de ji zordariyê cîgirbû ye re, jin tevina xwe ya sereke ye, bi her wêraniyê ve bandor dibe li ser asta pîvanên sincî li cengan de mafên wê tê binpêkirin, herwiha afirandina çareyên ên pêdiviya xwe bi kirinê ve hene, ji bo rizgarkirina civakan ji binveçûna rêxistina**

**qezencî ve, ewê bi dû sûdan ve ketibû bi wêrankirina xwe ji derdorê re .**

**Kambaxên ne dûr bi ser komên belengaz ve, ewan mîna êşa herî diyar e, û xwe di rûbirûbûna wê de bi tiştê herî cem wan ve heyî dixîne , lê tiştê herî bi êş e ewa hişmendiya rêveberkarên ên xwe bi ser sîngên wana ve danîbûn , li ser nan û pêdiviyên wana de xwe dernexûn kirin e, dewsa ku bi wan re bisekinin, û ev tişt me dihêle ku em zorenga qatên civakî û tevderbasbûnên wana di navbera hevdû de şîrove bikin, ên bi xwe re parçebûna aborî , civakî û girtinheviyê anîbûn .**

**Ji deriya felsefeya siyasî a marksî yê hewildabû bi awayê xwe ve kêşeyên ên bi civakan ve ketibû ji kevin ve derman bike,ji ber ku dugel destikên dijminatiyê ne ji jiyan û karên wana re, û Karil Marks 1 û Frîdêrk Encliz 2 li ser belavbûna cîhanî ji vê têgehê ve aşkere kirin, û pir caran anîbûnziman dema axaftina wana li ser vê mijara girs, dema gîhabûn e encamekê ku zorenga dijwar: ewa xwegêra guhertinên civakî û dîroka nûjen e.**

**------------------------------**

**1- Karil Hanrîk Marks feylesofekî Elman e , abornas , civaknas, dîroknas, rojnemavan û sosiyalîzmekî şoreşgerî ye 5 gulê 1818z-14 adarê 18883z, ramanên wî rolekî girîng lîstin bi damezrandina zanista civakê, û pêşxistina tevgerên sosiyalîst, Marks yek ji gewrtirîn aborînas in li dîrokê, gelek pirtûkên xwe di dema jiyana xwe de weşan kiribû, a girîngtir belavoka Partiya komînist 1848 û serê perê 1867.**

**2- Firîdêrk Fîlhêlm Nîtşa 15 çirya yekê 1844z- 25 Tebaxê 1900z, Feylesofekî Elman e, rexnegirekî rewşenbîrî ye, helbestvan, sazvan ,rêzimanvan, û lêkolîner e bi latînî û Yonanî ve, bandorek e wî ya kûr li ser felsefa ewrûpî û dîroka ramana nûjen de hebû.**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**Berzkirina rastiya vê girtinheviya sawdar di navbera xwediyên hêzê de û tofên barketî, ên derdê xizanî û zehemtiya jiyanê dikşînin, û dûrbûna qatî dide nîşan li ser rastiya ku dugela milhurî a heyî ewa yê ku sînoran di navbera qatan de xurt dike,dibe ew lîska li ser têla xapandina aşkerebûyî bi civakên barketî ve dihêle pîvan û nirxên sincî li hundirê civakan bi awayekî giştî bihejin, ji ber vê yekê em desthilatê dibînin ku kiryarên xwe yên neyînî di nav tofên civakê de belav û weşan dikin, hinek ji wan bûne girêdayî bi ên din, û van girêdayî bi erkekî kirêtir radibin.**

**ji ber ewan talankirin û diziyê ji xwe re kirin yaseyek e berdewam, û ev xirabtir û pîstirîn kar e di dîrokê civakan de, ligel xizaniyê bi encamên wê yên barketî li ser jiyana civakan .**

**Tiştê wan dihêle ku di rewşek e metirsîdar û koçberiyek e tam de bin, dûrî yasaya gerentor a ku mafên wana yên xuristî parastibû.**

**Gel ew berpirsyar e li ser gendelîbûna rêveberên xwe, û bêdengiya cemawer hîştibû bibe mîna kerî a bi dû şivanên xwe dikeve.**

**Ew desthilat yê li dûr wê dîmenên xal û xwarzê dizîvirin, tiştê dihêle tofên mayî azariyê bikşînin, bi belavbûna bertîl û pûrekirinê û bajar dibe jî wek parastgehek e mafiyawî, kesên yên bi karê xapandin û talankirinê radibin wê birêve dibin, bêguman ku ji aliyekî din ve bi**

çalakiyên mêrkujiyê radibin mîna bazirganiyê bi hişbirê û şuştina pereyan , kerxanetiyê,windabûna maf û ked li nav wan saziyên ji çi liv ,tevger , şiyarbûn û geşepêdanê ve vemirî , ji ber ku desthilatê hemî bijardeyên xwe bi hezkirina pêrewî û pesindîtiyê kedî kiribû, û hîştibû bi rêya mêrên ol bi awayekî kor pabendî wê bin , digotin ku pabendbûna ji rêveberan re parekî ji pabendbûna ji xwedê re, wisa sergeha pêrewiya tam di navbera cemawer û desthilatên wê de pêkhatibû, ji ber vê yekê civak gunehên zora ku bi ser tê sepandin hildigre, ji ber ku nikare derdên xwe fêm bike.

Ji ber wênegirtina stûxwariya berzbûyî bi xwe dergehek e ji dîtinek e rexnî re naye rawestandin, û armanca nivîsa rastîn ewa ajotina mêjî ye li ser serkêşî û xwe çekirina li pêş e, û binavbûna henas di kêmaniyên xwe de bi taybet dema ketibe di nav siyasetê û reweştên wê de, tiştekî hizr bi temamî dadigre, nexwaz dema ew henasa berketî jiyana xuristî be, bê xwarûmarbûna takekesî ji nirxê jiyana zelal re, ji ber ewa bêhtir rastî êşê tê, yê nifş berve qonaxên cuda di nav xwe de vediguhêzîne.

Gêrgeha zanîna Emerîkî navkokiyê danasîn dike ku ewa :( Rewşek e ji ne rehetiyê ye an fişara deronî ye bi encamê dijayetîkirinê ,an ne lihevkirinê ye, di navbera du xwestekan ,an du geregî an bêhtir ji meraqên takekes an pêdiviyên xwe .)

Lê ew li vir bi wateyê desthilatî ve girtinhevî û tîjandinê diyar dike, dema ku navkokî di navbera herdû aliyên

**pirsgirêkê de çêbibe, a têr û a birçî, nîşanek e qatî dûr berz dike, ji ber tunebûna lihevkirinê û hevsengiyê di jiyanê tofan de û parçebûnên wana li ser malgirtina nên ,ew wan gîhandibûn li rastiya vê girtinheviya bive, axaftin li ser pêşbirkê ji bo xelat û şanan  ve ew jî diyar e,**
**dema navkokî dûriyên din diyar bike , pir meraqan aşkere dike li dor hevdû dizîvirin, li deryaya têkoşîna cemawerî de û hin din armanca wana sûdegirtina helwestan in û balkişandina li ser kiryar û encamên wan di wateya siyasî a giştî de, ji ber ku takes û kom her diçin ji bo vê nakokiyê wek ragehekî cîgir bikin , û enyî wê pir bikin , hinek ji wana di rûbirûbûna derve ne, û hinek jî di hundirê partiya gelempereatî de ne , ji bilî gefên derveyî, û dibe jî ku herdû riwên cuda ji zorenga hundirî  û derveyî bin bi awayên dijwar û ciyawaz tevderbasbûyî dibin .**

 **Bi heman demê zoreng bi dawî ve di navbera du aliyan de cîgir dibe, bi hêz û bonga xwe abon e dibin, ji bo vê girtinheviyê berdewam bikin, û bi giştî zorengên qatan di warê siyasî, êlî û olî  ve aşkere dikin.**

**Û ne lihevbûn ewa a ku berz dibe li her meydanê de, û di ferhengê pirtûka cîhanî de -1 - zoreng tê danasîn wek ku ( Şerekî an pevçûnekî ye an têkoşîn û xebatekî ye, bi taybet ve dema ew zoreng dirêj û berfereh dibe.)**

**Warhîştin berve evîn û wijdaniyan bi giştî ve ,ewa wek lêkolîn e ji piştrastiya windayî re li felekekê girtinheviyan bê wate rabêj dike û dibe ku zoreng bê berhelistî bîne holê, tiştê ku ji mirov re meraqek î berdewam çêdike, ku ji vê**

**zorengê derbikevû li wateyek e din ji derveyî vê giroveriya dijawer ve bigere , pêgirtina bi evînê ve ewa penageya dawî ye a ku dikare mirov bikarbîne ji bo xwe ji sêwira hestbûna ji tehlî û tunebûna hêviyê ve biparêze.**

**-----------------**

**1- Ferhenga pirtûka cîhanî : ewa ferhengek e ingilîzî ye ji dû bergan pêktê, hatibû weşandin wek dubendekê ji firehnivîsa pirtûka cîhanî re, û hat e weşandin sala 1963 an bin çavdêrîkirina Kilarêns Barnihart.**

## 3- Nivîsa wêjeyî wek navgînek e rûbirûbûnê:

**Hevçûyîna berve rizgarkirina xwebûnê tiştekî divê pêkwere eger rê teng bû li pêş rûbirûbûna sextebûnê û kesên wê, ji ber ku bi saya zordariya desthilatiyên serkotker ve, çare li pêş civakê nîne ji bilî ku yek ji herdûkan bipejirîne, û ewa koletî an serhildanê.**

**Naxwe nivîsa wêjeyî ji metirsiyên ku têne kûrahiyan vala nabe, û mirov li ser ramandinê bi dîmenan ve dihêvojîne, hestên ku mirov bi zehemtiya rewş û tengbûna asoya çareseriyê tevlîhev dike, û herwiha libabûna di nav pêlên hestên wijdanî de ta bibin çirûsînek e heyî li çûna mirov berve rizgarîbûnê, ji ber ku tiştê tên e di rûbirbûna wî de ji hêza dadgehên hêrebûnê û samên wê ne, û wî dihêlin bêhtir bikeve di rûbirûbûna wana de,di hundirê wî de alavên hevxistinê bilind dibin, ji ber ku hêzên guhertinê bi hemî şêweyên xwe ve û tevî êş û bêhêviyê li berxwe didin li rex amadebûn û berdewamiya berxwedaniyê ji bo dîtina cîhanek e baştir di warê sinc û bedewiyê de.**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Û nivîs ewa pîrozkirina wateya hevxistinê ye û ji takekesan re derketineke li hember fişarê desthilata serkotker , ewa nirxê herî bilind e berevajî nivîskarên desthilatê yên dibezin li pey pîrozkirina serokan û pesindayîna wan.**

**Wate ji karê mirovî re ewa parastina kiryarên baş e, beranberî zor û serkotkirina pêkbûyî di hemî rewşên jiyanê de, ji ber daxwaziya zordariyê ewa valakirina civakan ji xugirtiyên wêna ye , ev jî dihêla ku cureyek e bive bê berhemdan û bê ser û ber diyar bibe , wisa parçebûn dikeve hemî aliyên jiyanê, ji ber ku cotbûna gendelî û zordariyê civakê hûrhûrî kiribû , ev yeka desthilatdariya bavanî ji dema hatiye damezrandin pêkanîbû, sinc ji civakê hêdî hêdî hatibû roxandin, ev yeka hîşt ev civak bindest bimîn e (civaka Kurd li bakûrê kurdistanê û ricîmên Tirkî) û herwiha pişaftin rolek e serek e dilîze ji bo giyana parçebûnê cîgir bike, û xelkê ji nirxên xuristî ve qut bike,ta ku sinc bikeve metirsiyê.**

**Wisa ricîma serdest berdewam hewil dide ku şêweyên qirkirin û dûrkirina xwe zêde bike, carne cilê olî li xwe dike û carne netewî bin navê parastina ol an netew an dewletê, û rastiya xwe tenê hebûna xwe diparêzê bi dewamkirina nezanî û tirsê, heyîna xwe bin gelek nav û dûrişman û bi hemî dezgehên ragihandinê diparêze , ji ber ku raghandin jê re destikek e serek e ye mîna alavên hêvotin û bandorkirinê ji hiş re, ta civak di zîndanên xwe de bimîn e , û çare pêş civakê kêm e, ji bo bi wê desthiladariyê re bikeve dan û standinê an têkeve di girtîgehên wê de û bikeve rewşa bêdengiyê heta dawiyê , helbet ew ricîm ji xwe**

re gelek xwefiroş rêxistin dike , ji ber ew bê nerîn û helwest in , tenê desthilat destûr dide wan ku bêdeng bimînin yan biaxivin, ev tişt dihêle ku pêşeroja hebûna wê ricîmê jî ne ewqas aram û cîgir be, bi sedemên aloziyên aborî û tîjandina cemaweran, ewê bi derbasbûna demê dibin êzing ji teqînekê re, bi valabûna ewqas di navbera mûçeya jiyana xelkê û dewlemendiya tofa gendel a ku hemî hatinên aborî û pereya giştî bi dest ve ye, ji ber ew tofa bi desthilatê re ketibû hevbendiyê , ji bo pere û semyanê hemî li cem bimîne,ligel wê ew desthilat bi yên mîna xwe cîran dikeve hevbendiyê ta li hember gelên xwe rawestin , ji ber çi teqîn li cem wê an li cem cîranê wê biqewime , bandora xwe rasterast li hebûna wê dike wek desthilatdar, tê wateyê ku xala hevbeş di navbera van desthilatan tevî çiqas nakokî di nav wana de hebe ewa dijminatiya gelan e û xwestekên wê ji demukrasî û dadmendiyê re, û van keleman ji civaka bavanî tên, ew civak bê guman riwek e ji desthilatiya serkotker e, û wisa cîhanên wijdanî ji pirsgirêka bingehîn naqetin , bi rizgarkirina mirov ji zorkarî û wêrankirinê , dûrketina ji mêjiya bavanî ve a ku ji rewş û reftarên zordar pêktê, herwiha desthilatiyên serkotker bi van tiştan hebûna xwe dibînin , dibin jêre destikek ji dewamkirina zor û bêcaniyê , dema mirov ji hizrê azadîbûn û sivîlbûnê tê dûrxistin, ji bo berjewendiya bindestî û xirakirina civakê bicî bikin, tê wateyê ku desthilata gelemper şerê civakê dike,rewanê pêşveçûn û ronakbîriyê armanc dike , û ewa di eynî demê şerê evînê di navbera mêr û jinê de dike bi rêya reweştên bavanî û reftarên kevin, herwiha dibe rêgir li pêş avakirina malbata a li ser evîn û xwestina xuristî çêbûye, bi rêya bilindkirina nêrîtiyê a li hember evîn û azadiyê bi

giştî ve radeweste, ew desthilat jî li ser azariya jinê û dûrkirina wê ji mêr ve dijî, ta nêrîtî bibe riwê diyar ji zorkariyê re û kokên wê yên dîrokî a cihê xwe di dîmena siyasî a rojhilata navîn de digre, wisa nêrîtî mîna sîstemekê (Îran-Turkiya-Îraq- Rûsiya-Efxanistan, Şîşan û her wisa….) diyar dibe, ku reftarên tunekirina civakî saz dike , dibe ew desthilata bilind û peykaner a civakê dorpêç dike, wisa ew civak dûrî evîn û zanînê dikeve, bi reftarên qatî ve tê dagirkirin, bi taybet ve li rojhilatê de pirsgirêka cenga li hember evîn û azadiyan bêhtir diqewim e, ji ber ku hebûna evînê nîşana mayîna malbat û civakê ye, lê şerê wê rastiya ricîmên serkotker a ku xwe daniye li ser singên civakê diyar dibe ,bi rêya tunebûna hezkirinê di nav takekesan de di pirên şaneyên malbatê de , hindikê wê xwe bi jiyana nûjen ve têr dike, an xwe bi yeksaniya naverokî ve bi rext dike, lê ji ber ku jiyana me bi winabûna mafan ve dagirtî bûye ji sedema serdesbûna berjewendiya diravî ve ,em dibînin evîn dûr dibe, û takekesan ji civakê ve dûr dikevin û di koçberiyek e deronî de dijîn, windabûn cihê xwe digre, di derbarê axaftina di navbera jin û mêr de li cîhana wijdanî de,û zehmetiya pejirandina jiyana azad û pêyketina bi dû banga kûrahiyê, û ne kanîna çêkirina xurtbûnê di malbatê de, ji ber ku ji çanda evînê dûr e, lê xwendina tiştê li hundir di şaxê dan û standinê de bi demborînê re ta jiyana niha bê nasîn û aloziyên wê bêne fehmkirin, ewa tiştekî gelek girîng e , ji bo berketina dîmenên jiyanê û diyarde û şopa wêna li ser henas û reftar de, bi rêyek e felsefî kûr, ji bo bidestxistina kêliya bazdayî ê ku mirovê xewindar pê mijol dibe û lê vedigere, heta ku di hundirê henasê xwe de be, û li pêş vê hewildanê hewildanek e bi derbaskirina tiştên yê

**mirov wê dijî bi hemî nalîna xwe ve di demê tenahiyê de, dema timî daxwazê sîstem, dad û şadiyê dike, li cîhanek e tev gurbûn û girtinhevî ye, wekî ku pêdiviye li ser afrêner ku li pey cîhanên hunerê bikeve û bi gula li sirûşta bedew hest bibe wekî çareseriyekê, dewsa şopandina derd û xemgîniyê, ji ber ku kêşeya heyînê bê çare ye, nepenî ye û zaroktî melhemek e dijî koçberiyê ye, bi nîşana xwestina berdewam ji tiştê dembuhirtî re û ramandina bi wê, herwiha jî pêgirtina ji naverokên mirovahiya rasteqîn e ve bi rêya hevbeşdariyê a nûnertiya bedewbûn, maf û xêrê dike, mîna nirxên pêdivî hebin ji bo bên e diyarkirin ligel gerdûnek î bê giyan di nav de ezezî, nezanî û sûdgirtîbûn diyar dibin, gelek lerzandin û cengan bi xwe re anîbûn , bê guman ku encamên wê azarîbûna perwer û tenahî û koçberiya wî nîşanî me dide, pir gengeşeyên zehmet aşkere dike , ji ber ku li paş pesindana nimûnî de jin e, li dûriyên bedewî ji evîn û hebûnê ve diyar dibe, û ewa para rehî ji civakê saz dike, û mêr di çarçova wê civakê de bi aliyê mîkanîkî ve têkildar dibe, û zorenga siyasî hinek taybetiyan dabû xuristiya civakê bin saya kirdeyê pêkhatî di hejandina sîstema wê ya xwazayî de .**

## 4- Dîtinek li mirinê

**Mirin di xwe de nepeniyê diyar dike, tevî ku carne bi bergê mirov berz dibe, û jiyanê bidawî dike bê agehdarî bi dîmenek e kirêt û pîs berz dibe, di nav de rastiya zayînê dibişkive, ji ber ku mirin pişta demê dişkîne, bîrnasê Ferensî Blaîze Paskal 1 di derbarê axaftina xwe de li ser mirinê wisa dibêje :(Ti xêr di jiyanê de nîne ji bilî ew**

**hêviya bi jiyanek e din ve, mirov bi qasî nêzî hêviyê dibe şad dibe jî,yên hevsarê baweriya xurt bi hemdemiyê ve kirin e destên xwe, bê şensî nabe parê wan, herwiha şahiya wan kesên ne meyldarê vê yekê wê nebe)**

**Paskal wisa dibîne ku mirov rizgar dibe dema bi tiştekî ve tê girêdan an pê bawer dibe an dema bîre hemdemiyê dike di jiyanek e din de, nîşan dide ku şahiyê bi rengê hilatina hêviyê tê xwezîkirin, lê mebesta Paskal gelo çibû ji vê baweriyê, mebesta wî meraqa yê naye temirandin , ewa mirov li şadiyê bi rêve dibe, bê ku têkeve xefka sekreta bi êş ve, ji ber ku ew henas namirin lê vedigerin pergalê xwe yê pêşîn, û xwe bi heyîn û jîndar ve dikin yek.**
**Lê bîrkar û bîrnasê Ferensî Rînêh Dîkart 2 vê rastiyê di xwe de dibîne û wisa dibêje:**

**( Ez baş dizanim ku li cem te hişek î gurbûyî heye, û tu hemî cureyên dermên nas dikî ji bo tu xemgîniya xwe aram bikî, lê ez nikarim ji te re nebêjim ku min dermanekî dît gelek bi bandor e , ne ji bo bi min re alîkar be , ta ku ez sebir bikim tenê mirina kesên yên kêfa min ji wana re tê lê ji bo ez ji mirina xwe nema bitirsim, tevî ku ez, ji wan kesên yên jiyanê gelekî hez dikin û ev derman ewa dîtina me ji xuristiya henasê me re ye, ew henasên yên wek ku ez baş dinasim ku piştî gewdeyê dimînin, ew ji bo şadî û kêfê re hene , gewretir in ji yên ku em pê kêfa xwe li vê cîhanê diqedînin, ez nikarim biramim ji derveyî ku ew kesên yên ji mirinê hatibûn e veguhêztin li jiyanek e aramtir û zelaltir ji jiyanê me ve , em e rojekê tevlî wana bibin , em e bi xwe re bîranînên berê rajin, ji min diyar dibe ku bîrek e**

**hişmendî li cem me de heye û ez piştrast im ku ew cuda ye ji gewdehê .)**

**Dema Dîkart behsa rewşa tirsê ji mirinê dike jiyan pê gelek zehemt dibe bi çûyîna kesê mirov jê hez dike, bi çendîn ku em jiyanê hez dikin û pê şad dibin, bi qasî em bêhtir li ser xwe ditirsin dema yê em jê hez dikin bar bike û bi çûyîna wî em dilzar dibin, wisa jî tenahî mîna hestbûna bi mirinê ye, me dihêle ku em Pê re rûnin.**

**------- --------**

**1- Blaise Pascal : (19 Cehzeranê 1623- 19 Tebaxê 1662), Fîzîkyar, Bîrkar û bîrnasek î Ferensî ye, ew yê ku jimarînkê afirandibû, şêwazek e nû ji pexşana Ferensî saz kiribû bi koma nameyên wî yên gundî.**
**2- Rênêh Dîkart : (31 Avdarê 1596- 11 Reşmehê 1650) Bîrnas, Bîrkar, Fîzîkarek î Ferensî ye, navdar e bi bavê felesefa nûjen, ew yek ji kesayetên bingehîn di dîroka şoreşa zanistî de.**

**Niha em werin li Bîrnasê Holendî Barux Ispînoze 1 binêrin, dema behsa mirinê dike, wisa wê pesindan dike û dibêje : ( Hişê mirovî naye wêrankirin bi rengek î tam bi laş re, lê tiştekî nemir têde dimîne.)**

**Li vir bîrnas Ispînoze li dor metirsiya nemiriyê ji nû ve dizîvire, guhertina ev laşê mirovî ji tiştekî berhest û din û wisa bi heyînê re temam dibe, ango jê re vedigere bi hêmanên wê yên tam ve û dibêjê : ( Me bi hişê mirovî ve tiştekî girêneda, ango berdewamiyek e em nikarin wê bi demê re diyar bikin, ji bilî ku ew tişt hebûnek î ji laş re derbirîn dike, bi rêya berdewamiyê şîrove dibe û em karin bi rêya demê ve nas bikin, ango em berdewamiyê pêve girênadin ji derveyî hebûna gewdehê, lê tevî vê yekê jî pêdiviyek e nemir heye bi hebûna xwedayekî bi xwe, û ev**

**tişt bi mêjî ve girêdayî ye û wê serdemî bimîne wekî pêdivîbûnekê.)**

**Li vir Ispînoza serdemiyê binav dike, nemiriya hiş, nemana laş û guhertina wî, ji ber ku mêjiya mirovî di çarçoveya vê wateyê de dimîne, di nav nifşan de digere, bi rêya ramanên yên ku bi nirxên jiyanê ve ne bi mirinê ve girêdayî ne.**

**1- Zarzariya mirovê zanyar ku reşbîniya reş hilkişîne a ku girîngiya ramanê û wijadanê bi hevdû ve girêdide, hewil dide ku bi hawara bêmadîbûyan ve here, yên xwe xistin e di binê dîtina a wêranî pîroz dike û tiştê pê girêdayî wek tundirewî, nijadperestî û heznekiriya a din.**

**2- Danasîna bi valahiya hestbûnê bi bê hêviyê ve, kar ji bo duristkirina dîmena jiyanê a ku li ser têgehên sirûştî fişarê dike, bi rêya gurkirina hestê afrênerî ji bo jiyankirina jiyanê bi awayekî baş û li ser afrêneriyên mirovê zanyar li hebûnê derbirîn dike .**

**3- Cengawerîya li hember paşverûtiyê, ji ber ew riwê herî kirêt e ji mirinê re, û xwe bi çekirin bi felsefa jiyanê ve di qonaxên mirovê cur bi cur de heta qonaxa dawî a wî dibe ramandin û çêjtina bi dawî encamê û bi kirdeya tevgera demdirêj ve hatiye naskirin.**

**4- Danasîn bi başiya ramandinê û nûbûna wê û ewa pergalek e tekane ye ji pergalên jiyana ne berçav re û xebatkirina wê bi dîmenek e gurbûyî bi rêya wêje, huner û ramanên azad ve.**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

----------------------

1- Barûx Ispînoze ( bi holendî Baruch Spinoza) ewa feylesofek î Holendî ye , ji girîngtirîn feylesofên çerxa hefdan, di 24 ê . meha 11, 1632 an de li Emistirdamê hatiye dinê, û di 21 ê meha 2. 1677 an de li Lahay de koça xwe kiribû.

**De em herin li cem feylesofê zanyar yê Elman Êmaniwêl Kent 1 ta em nas bikin pesindayîna wî ji mirinê re di çarçoveya hewildana wî ji tekeskirina nemiriyê ve û wisa dibêje : ( Mirin tenê ew maska ku li paş xwe çalakiyek e herî kûr û encamek e xurt vedişêre, tiştê ku yase wek mirinê bi nav dike, ewa dîmena berçav e ji jiyana min re , ev jiyan ewa jiyana sincî ye, û tiştê ku bi nav lê dibe mirin nikare tu carî karê min qut bike, ji ber ku karê min divê here serî û pêdivî ye li ser min ku ez bi erkê xwe rabim, ji ber ku ti sînor ji jiyana min re tune ye, ez nemir im.)**

**Nemiriya destkeftî li cem Kent tê binavkirin bi diyarkirina nirxên sincî yên perde radikin li ser wê hevanînê di navbera mirovê karker de û xebatên wî , bi wê çalakiya yê xurtiyê encam dide, û pişt re dibe karek î nimûneyî û tiştekî giranbuha, destkeftî bi wê berztir dibe, û pê mirov serbilind dibe, ta bibe ew hêza a bikartîne ji bo zanîna jiyana nemir a ku pê bawer dibe bi rêya berdewambûna tevgerê yê ji hewlidanê baş re rê vedike,wisa geşiyekê dide karên rast yên dûr ji dîmenên sextebûn û pankirinê, ji bo başkirina jiyanê û têgihiştina wê bi awayên cur bi cur, û li paş wê maskê yê ku Kent binavkiribû radiwest e, ewa maska a li paş wê çalakiya şerpîn û pêkanînên gelek dimîne û zimanê rewşa wî ewa ku gelek tişt hene li benda mirov in bi rêya berdewamiya hewildanê û nameya zanyarî ranaweste lê ji nifşek ta nifşek î din zêde dibe, em li vir Hîgil 2 dibînin**

**serkêşê felsefa nimûneyî ji me re behsa li hevhatina giyan bi henas re dike û dibêje : ( Mirin ew evîn bi xwe ye, di mirinê de evîna bê sînor aşkere dibe, ew yekbûna tiştê xwedayî, bi tiştê mirovî ve, xweda bi xwe re bi yek e di mirov de, di nav bê dawiyê de ye , bi rêya mirinê xweda xwe bi cîhanê re li hevanî, û bi xwe re heta hetayê li hev tê.)**

**Viyana heyî di jiyanê de a dibe çavkaniya çi afirandin û tevgerê berz dibe, dema nêzî rewrewka tunebûnê dibe, û dibe ku temamî di mirinê de ji hewildana mirov ji bo wî hinekî bê alî bike dertê, ji bo ku evîna mezin bibîne , bi axaftinkirina heyînê ve di kêlîkên berî dawiyê, ji ber ku peywendiya mirov bi jiyanê re ewa bi xwe jî rêyek e ji nasîna dijî wê ye , pirs ji hizr dûr naçin bi amadebûna mirinê an bi ne diyarbûna wê, ev ji me re evîna bê sînor diyar dike, yê ku di mirinê de li cem Hîgil berz dibe.**

---

**1- Imanowêl Kent : feylesofekî Elmanî ye ji çerxa 18 an e 1724- 1804, jiyana xwe hemî li bajarê Konîgisbêrg de derbas kiribû, ew yek ji feylesofên serdema ronakbîriyê ye.**

**2- Curc Flîlihm Firîdêriş Hîgil: 1770-1831 feylesofekî Elmanî ye, dameznerê felsefa nimûnî ye li dawiya çerxa 18 an de.**

**Lê ewa li cem Şopinhawir 1 nîşanek e li ser valahiya bê dunde ye, yê ku ji jiyanê û rastiya mirinê venaqete û li vir dibêje : ( Derd ewa çûyîna çarenûsa rastîn e ji mirov ve, wek ku divê em li mirinê meyze bikin mîna armancek e rastîn ji jiyanê re, ji ber ku ewa di kêlîka mirinê de çi mirov di derbarê rêza jiyanê de biryar dide , tenê dimîne danerkirin û pêşgotin, û têkoşîna a ku di jiyanê de diyar dibe bi awayekî vala û bê dunde û nakok ve bi xwe re mirov**

**dighîne encamekî ku  vegera ji cîhana wê  mîna rizgariyekê ye . )**
**Tiştê ku Şopînhawir gîhaye wê  li ser rastiya vê jiyana nakok û aloz, bi awayekî vala û puç ve mirov dighîne encamekê ku mirin mîna azadiyekê ye ji wan zehmetiyên xuyanîbûyî mîna paşverotiya kirêt, nexweşî  û zordariya belavbûyî li cîhana xelkê, ev hemî mirov reşbîn dike, lê tevî vê jî viyana xwestina jiyanê ferehtir dibe tevî rastiya wê ya berve wêraniyê diçe, ji ber vê yekê mirov pêdivî ye li ser wî di jiyanê de ku xwedî rolekî be, ji ber ku jiyan ji malzaroka mirinê  ve dibişkive, ne tenê mêjî dikare bersivê bibîne û ne jî takes dikare bi tenê zanistekî saz bike, ji ber ku kêmanî di her destkeftiyek e mirovî de ye bi giştî, ji ber vê yekê Nêtşe 2 dibêje : ( Ti dem di nav kêliya jêhatîbûna te yê dawî de derbas nabe û yekem tîrêjekê ji berbanga jiyana te yê nû re wekî çirûsîna birûskê wê diyar bibe,  tevî ku gelek jîndarên saxlem guman dibin ku milyarên salan derbas bûn e û nikarin wêna vegerînin, ji ber ku ne demî û dûbarekirina rojbûna zindî li hev tên dema mêjî xwe dide aliyekî)**

**-----------------------------------------------**

**1- Arser Şopînhawir: 1788- 1860 feylesofekî Elmanî ye, navdartirîn berhemên wî pirtûka : cîhan viyene û ramanek e sal 1818, li bajarê  Danzîgê hatiye dinê.**

**2-  Nêtşe : 1844- 1900  feylesof, helbestvan, rexnegir , rêzimanvan, lêkolîner û sazjenekî Elmanî ye, xebata wî bandorek î pir mezin li ser felsefa Ewrûpî û dîroka  ramanê nûjen  de çêkiribû**

## 5-Desthilatdariya bavîtiyê û fişara malgirtîbûnê:

**Tiştê ku pêdiviye em behsê bikin di derbarê koçberî, mirin, gendelî, zordarî, tengavî û kolekirina tekekesan, ew koletiya a ku movikên jiyana civakî dorpêç kirî ye, û ew jiyana a ku di geravê çepandinê de heta dema teqînê maye, û hevgariya rastîn bi temamî wateya vê peyvê ve ewa di serkotkirina berdewam e ji rûmet û azadiya mirov re, dezgehên ewlehiyê mîna jêderek e celewkirin û bizdanê ji mirov re dimînin, dewsa ku bibin e jêdera aramî û rehetiyê, dezgehên çavdêr têne bikaranîn ji bo serkotkirina jiyan û azadiyan bi hevdû re, tiştê hîştin ku hestên reşbîniyê, bê hêvî û tijandina dijwar encam bidin beranberî rewşek e naye guhertin, ev jî narvîna cemaweran e yên ketine bin serweriya tirs, bizdan û derbideriya serkotker, li dema ku kanîna mirovê zanyar a afrênerî zêdetir dibe ji yê li cem siyasetvanê desthilatdar, ewê yê bi bihane û sozan ve nêzî xelkê dibe , bihaneya xwe bi pêwîstiyên şer ve, li çaxê ku pêdivî bi aştî hebe û divê mirov ji bo wê kar bike bi berzkirina vaca avakirin, lêkirin û rawestandina li ser pêdiviyên mirov ên sereke, tevî ku ti sînor ji dayîn û kanîbûnên mirov re nîne eger ku li ser bê rawestan û ramandin, lê narvîna wan civakan e yên hatin e dorpêç kirin bi cêrgehên qayim ji ramana olî ve ji aliyekî û girêdankirina wê bi rêxistinên çewser a gelemper ve ji aliyekî din ve, mêjiya rojhilatnavînî hîştibû bê temirandin û hatinhevdin, ev mêjî hîştibû ku ew dîlgirtî dema borî bimîne, bi şerên comî û netewî ve, û ev hîşt ku tijandina desthilatdarî, rastiya girtinheviyê û malgirtina qezencî heta bê dawiyê cîgir bibe ,li kêlek fişara sermedariya**

**malgirtîger û çêkirina wî ji sîstemên zordar re ji aliyekî ve, û mehnegirtina bi azadîkirina gelan ji aliyekî din ve, ji bo ku armancên xwe yên rastîn yê ku ji bona wê şer dike veşêre , û ewa hewildana ji hatinên aborî yên yedek li ser hesabê gelan û xwestekên wêna bi ricîmên din yên dikarin rehetî, jiyana wekhev û rûmetê biparêzin, li dema ku gendelî beranberî rewşa tijandinê sekinî ye, û herdûyan hevdû di dîmenê cengê de temam dikin, û ji encamê temambûna herdûkan ve perçebûna civakê û metirsiya berdewam e yê hêdî hêdî radibe, ta bibe nîşana kirdeyî ji vê wêraniyê re.**
**Em van nîşanan meyze dikin di hundirên henasan û cudabûnên wana de, berpalebûna li ser tewriya nifşan , û li vir feylesof Karil Manhayim 1 nifş danasîn dike û dibêje: ( Bibîne ku hinekan têgeha komê pêşinyar kiribûn ku ew bêhtir saxlemtir e, ji bo cudabûnkirina nifşên civakî ji nifşên malbatî ve (malbatên yên bi xwînê ve dighêne hevdû**

**---------------**

**1- Karil Manhayim: 1893-1947 , civaknasek î cihû ye, mecerî ye bi zikmakê xwe, ji dameznerê zanista civaka kilasîk e , û herwiha jî dameznerê civakzanista zenbûnê ye.**

**Wekî komekê ji takekesên temen nêzî hevdû , endaman buyerek e dîrokî dîtibûn hêjaye binavkirinê ,di çarçoveya demek e diyar de.)**

**Ev ciyawazî di navbera degel û ramanan de bi awayekî bihevketî ve ji bo duristkirina rêwîtiyek e hûrtir û giştî ji naverokên dîtinan ve di navbera bav û lawik de bi şêweyek e metirsîdar ve ji me re navberbûna çêbûyî li nava cîhanên**

**yên nagihin hevdû diyar dike, bi xwestina nifş ku perdeyê rabikin ji ser metirsiyên felekê xwe ve, tevî fişara serweriya bavanî û sertbûnên wêna, ji ber ku çi tiştê nû naye pejirandin, û bi pîvanên sincî ve yê li ser rabûye tevderbas dibe, ji me re zorengek e heyî bi hişmendiya a ku tiştê nû navê berz dike, û dixwaze timî rewşa heyî wek e xwe bimîne, rewşa hêzên kevinşopî yên têkoşînê dikin ji bo ku rengê xwe biparêzin, li dema hilatina hêzên nû yên ew jî bi heman vînê têkoşînê dikin ji bo xwe li meydana siyasî cîgir bikin, û li gor Manhayim dibîne ku rabûna bîraweriya civakî a ku zemînekê ji bijardeya ciwan re yê bi buyerê ve bi giştî girêdayî ye çêdike, mîna erêkirinekî saz dike ji gehîbûnek e heyî re di dem û cihek î diyar de, bi berzbûna hêzên moralî ve yên radibin ji bo bibin e ew buyera bêhtir gurbûyî, ewa dibe ew tirsa a dike di dilê nifşê birêzik a guhertinê de bi hemî rengên xwe ve napejirîne, û di eynî demê de jî dibe nîşanek e veşartî ji ricîmên rojhilata navîn a bavanî û peto re, yên ji guhertin û pêşveçûnê ditirsin, bi hemî hêzên xwe ve li hember wê radiwestin.**

**Eva rastiya zorenga bi êş e di navbera hêzên heyî û rabûyî de, nîşanek e li ser girtina boriyên dan û standinê di nav herdû aliyan de, û bi dawî windabûn dibe encamek e diyarbûyî, koçberiya takekesî binyad dibe, bê bawerî belav dibe, ev tişt bandora xwe li ser pêvajoya guhertin û rabûnê dike, ji ber kelem hene li pêş nûjenkirinê ,û parastina tiştê nema bikêr tê û rizî di jiyanê de, ji ber ku razan di kurkê demborînê de ewa mendebûriyek e heyî ye, û bêzarbûnek e ji bo şopandina nûbûnê, ji ber ku hebûna belaweliyê û xweradestbûnê ji vaca çewserî û reqbûnê re hemî wan**

**hinirên yên sûdê ji kevinyê werdigrin têk birin, û mehnedîtin û berzbûna çareseriyê bi xurtî dibû encamekê ji dûrkirin û reqbûnê re, dibe ku ne bersivdayîn hişt ku hingema û pevçûn di nav xelkê de belav bibe.**

**Û guhertina civakî tiştek î misoger e divê pêkwere piştî hingeme û hevrikiya hevgariyê bervajî tiştê ku Manhayim binav kiribû dema dît ku guhertina civakî dibe pilepile çêbibe, bê pêdivî bi  berzbûnên rûdanên dîrokî  û desthilatdariyên serkotker zemînekî ji gelên xwe re peyda kirin ji bo wan bi rehetî biçewsînin û çi serê hildayî jêbikin, bê ku dakevin ji xwstekên gelên xwe ve, ev hîşt rêveberiyên gelemper di rewşek e hingemiyê de bimînin, wêna li berve parçebûnek e berdewam de biribû, ta bi demê re tune bibin, ji ber ku wêranî û şilîbûna heyî di saziyên wê de , bi lez dibin talaniyekê ji hêzên mezin re û çavkariya wêna , hûrgilyên zehmetiyê yên ketibûn e civakan, wan hîştibûn ku mîna keriya tîjandî bin ,yê dibe ku biteqe, bi awayek bi seyr berve wêranbûn û têkçûna her tiştî.**

**Ev celxandina mezin di navbera cemawer û berpirsan de hîştibû ew dîtina ku xelk mîna kerî be tenê li pey fermendaran bikeve  ava bibe, keriyekî bi a serokên xwe dike û pêve bi awayekî kor tê girêdan,lê ku carekê serî hildin an rexin e bikin, ev tişta ti carî fermandaran guman nakin, an bi çêbûna wê naramin, ji ber ku çênabe mirov bi keriyek î ajalî re gengeş   bike, gel tenê li pêş çavên wana ew keriya fermanber e, lê eger rojek ê ji kiryarên wê matmayî bûn, tê wateyê ku buyerek e herî giran roda, wisa biryara a dibe bê standin ewa qirkirina kerî ye, ji ber ku ji rengê xwe**

**yê hatiya pê nasîn derket, ew xuristiya pêdivî bû wekî xwe heta hetayê bimîne, ev li gor nerîna desthiladarên çewser in, ewan serhildanê wekî dînbûnek ê û derketina ji rêya rast binav kiribûn, wisa pevçûn gur dibû , ta her tiştî belav û derbider bike, wek î encamek î ji encamên serkotkirina zordar , ji ber ku rêxistina sitemkarî û gelemperatiyê di pergal û saziyên xwe de li ser wê girêdana di navbera takekesên yên fêrî tirs û bizdan û bê bawerî bûne de avabûye, nexwaz ev sitemkariya a dorpêçkirî bi takekesên yên di nav wan de peywendiyên malbatî hene û bi hevdû re wê desthilatiyê diparêzin û armanca wanî giştî parastina desthilatdariyê ye li hember biveya serkêşiya civakê ê ne dûr, û yê desthilatdar hewila çareseriyê ji bona wê nake, di baweriya wê de ku ew hewildana wekî mikûrhatinekê ye ji tirsa wêna ji gel re, eger tiştekî xwe deyne wateyê wê ew gelek tiştên li gor berjewndî û pêdiviyên gel wê deyne, bi taybet tofê ciwanên ronakbîr, desthilatdarî pala xwe li ser pîrozbahiya olî datîne , ji ber ku timî li bihaneyên olî ji deqên pîroz digere, jê re rê doz bike ji bo serkotkerî û çewseriya xwe berdewam bike, ji ber ku têkiliyek e hevcêwî heye di navbera desthilatdar û mêrên oln de, pêdiviyên xwe ji deqên pîroz dibînin ji bo ku kiryarên xwe yên zordar pêkbînin, ev deq desthildatariya zordar qayimtir kir û hîştibû xurtir bimîne, van deqan wê kirin e paşmayî li ser ol, reftar, jiyan û civakê hemî, bê guman ku zêdebûna komên mizgîndanê û pirbûna rêxistinên olî , nûnertiya pêwîstiya bi lez ji desthilatdaran re dikin ji bo xwe nû bikin, ji ber ewan dikarin kirdeyên gelan kedî bikin, ta desthildatar wisa bimînin,ji ber ku karîbûn baweriyên rewanî bikarbînin ji bo ku êrîşê li ser hemî xal û cihên yên divê**

**bêne tunekirin û parçekirin bikin ( Turkiya- Îran) û lingên xwe li deveran bi cih bikin, û civakê bi rêya ragihandinê (Radio- Tv) kontrol bikin, ji bo serkeftina bijardeya ciwan sînordar bikin, bi hemî awayan têkevin di nav xelkê de bi awayên nerm ve , bi awayê bikaranîna ol , mînak hewildana bandorkirina olî yê kevinşopî li ser civaka kurdî li başur û bakurê kurdistanê,armanc ji vê yekê , windabûna civakê û lawazkirina hest û bûçûnên netewî ne.**

**Banga ji bo cengê ewa karê desthilatdaran e (Rûsiya- Putîn li hember Ukraniya) (Turkiya- Erdoxan li hember Kurdan li başur, bakur û rojavayê kurdistanê)**
**lê gelo pêdiviya gel bi cengê çi ye?!, bihane û armancên wê ji bo gel û berjewndiyên wê çi ne?!, tiştê ku zorkarî û gendelî çêdike , ewa derbiderî û qerebalixî ye û parçekirina civakan e, û rêxistin yek ji alavên wê dûrxistinê di nav takekes û civakê de, feylesof Tomas Hubz yekem kes bû yê behsa vê qerebalixiyê kiribû, lê Eristo 1 got :**
**(Mirov ajalek î siyasî ye, hez dike li nav komek e siyasî rêxistinkirî bijî, û ewa helbet sivîl e .)**
**Lê ceng li vir di navbera cemawer û desthilatdarên serkotker de cenga hebûnê ye,û bi xwe re encamek e ne diyar tîne, naxwe dema serhildana cemawerî bi hêzên din ve tevderbas dibe bi vê cengê yê di navbera gel û desthilatê de diqewime û meydana hingemiyê tê veguhêztin û berfirehtir û gîştî dibe, di xwe de parçebûnên herêmî hildigre , mîna aloziya Sûrî wekî nimûneyekê, wisa cengê Nift û parvekirina hatinan awayek î xwînî distîne, bi beravêtina dîmena şoreşgerî û tevderbasbûnên berjewendiyên herêmî û guhertina wê bi hewildana**

**cemawerî berve rewşek e reş û hevgarî, armanc ji vê yekê ewa parçekirina civakê ye û wêrankirina kokên wêna ye ligel saziyên wê jî, Farabî 2 diyar kir ku ( Mirov civakhez e di xuristiya xwe de û ew nêzî temamiyê nabe eger xwe di civakekê de nebîne.)**

**Û wêrankirina takekes û girêdankirina wî bi talanî , wêranî û bêzarî ve ewa pêraxistinek e ta têkeve di rewşek e ji belaweliya bê dawî de, herwiha hewildana têkbirina hevgirêdana xuristî di nav koman de, bê guman ku pûrekirina cemaweran bi hêza wêna ve ewa nîşana talankirina helistên rabûna wêna ye û gefdankirina pîvanên wê yên civakî ne, dema Hubz tekes kir ku perwerdekirin stûnek e bingehîn e ji avakirina civaka siyasî a saxlem re û ev ceng bin saya hingemiyê tenê bersivek e ji armancên aliyên yên ketine cengê dijî hevdû, dewletên yên piştgiriyê wana dikin sûdê ji vê parçebûna civakî ve li gel penaberiya takekesan werdigrin, tiştê ku şerê takekesan dijî hev gurtir dike, ji bo berzkirina nîşanên şerê hemî li hember hemî, wisa awayên ew mirina tek cur bi cur dibin, ev jî me dihêle ku em guhê xwe bidin dîrokê û pê biramin, ta em wê bibînin ew bosta dagirtî bi şehnaziyên fermandaran û hewildanên wan ji bo hertimî serwerî li ser xwînên sawîlkeyan bikin.**

**----------------**

**1- Eristo: 322- 384 berî zayînê, Eristotalîs, an Eristotalis, ewa feylesofek î Yonanî ye û şagirtê Efletûn e û mamostê Iskenderê mezin e, û dameznerê dibistana Lisiyûmê ye û felsefa meşê û reftarên eristî ye, û yek ji gewrtirîn ramanyaran e,bi gelek aliyan ve nivîsên wê diçin, di Fîzîk û Mîtefîzîqiya ,Helbest, Şano, Awaz, Rewanbêjî, û Rêzimanvanî, Konî, û Serwerî, Sincî, zanista Biyolojî, û zanista Lawir .**

2- **Farabî : tê nasîn bi bavê Nesir, û navê wî ya bingehîn Mihemed e, sal 874 de ji dayik bûye, li Farabê li herêma Tirkistanê, Kazexistana niha, û di sala 950 de koç kirî ye,ew Feylesof e û yek ji giringtirîn kesayetên Islamî ye, yê gelek zanistan dizanî bû mîna Nojdarî, Fîziya, Felsef e, û Awazê û ji bilî wê .**

**Wekî ku mirov ti caran huner û avakirin nasnekiribe û negîhabe şaristaniyê ta bi henas ve bala bibe, ne mîna kolan be, ji ber ku çand û wêjeya cengê berzkirinek e ji wêraniyê re bi awayek î rastî û pir bi êş ve , herwiha hewildanek e ji bo livandina rewanê mirov yê metirsiyên girtinhevî û bi serxistinê dibîn e kelem li pêş wî û mirovahiyê ve, di dema ku gulistan dibin rewrewk li pêş gurbûna agirê dadayî û bumbebarankirinê ê ku ji hemî aliyan ve tên e bi ser mirovan , êş li vir ne li rex xweşiyê ye bi şopandina bedewbûna cîgehê, lê belê banga şaristaniyê û reseniyê bi hêztir e ji nihadiyên dirindî ve yê ku desthilatan dewlemendên cengê û bazirganên çekan ji xwe re wek taybetmendî dîtibûn.**

**- Vergera li rêyên zelaliyê û hînbûna çanda jiyanê dewsa fêrbûna mehfbûn û wêrankirina jîndarên mirovî û xuristî.**
**- Tekeskirina li ser gewrebûna jîndar, dema xwe bi pîvanên sincî ve girêbide, û bi erkê xwe rabibe, bi vî rengî aştî di navbera jîndaran de li ser bingeha aştiya mirovî pêktê.**
**-Standina amadekariyên bi nirx, di dema gurbûna girtinheviya nihadî de ji bo parvekirina hatin û desthilatiyê û berzkirina wêjeyekê ji bo aştiyê mîna rastiyekê ji hevjiyana aştîxwaz re serbixîne , di nav gelên yên li ser erdnîgariyekê de dijîn, bê dûrxistin û sertbûn , lê bi girêdanek e civakî hemî dîmenên zorkarî û nijadperestiyê di nav xwe de ji holê ve radike.**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**-Tekeskirina li ser aliyê baş ji mirov ve li pêş biberîkirinên dîmena bizdayî û banga ji bo celewkirina nêrîka sertiyê û hewildana li jiyanek e din dikeve dewsa wêranî û talaniyê, ji bo çêkirina serpêhatiya mirovî û belavkirina wê di jiyanê de.**

**Gurbûna van girtinheviyan heta astekê ku naye rawestandin an tikûzkirin nîşana babidestiyeke şaristanî ye, van aliyên yên pabendî cîgîrbûyên mirovî di mafê jiyanê de nabin barê wê parve dikin, lê diçin e dûr li cem çavbirçîbûn û zêdebûna aloziyan û xurtkirina wan li ser hesabê gelên yên derdê vê rewşa xirab dikşînin, di nav vepêçanên desthilatiya zordar û hingemiya har de, em nevêtinekê dibînin ji alavên serdesbûna a ku bi pîrozkirina peykerên xwedawend ve tê berz kirin, di vir de rageha bîzdandinê di navbera serok û alîkerên xwe de diyar dibe heta asta pejirandina çi binavkirinek e kirêt, ji ber ku seqayên reftarî a taybet bi rewşê biçûkirinê bi xweşî ve pê radibin di navbera kesê pile bilind û yên jêrî wan li gor rewşa bê bawerî û metirsiya berdewam , ji ferehiya malgirtinê an lephilanîna nişkavî, nexwaz ku periya pîrozkirinê yê li dor serokê nîşan ji derewiya bitûm û tirsa ji dest çûna kar ve bişkivî ye, ji bo rakirina encamên xuristî ji têkoşîna zanyaran a zehmet di rûbirûbûna hemî têkreçûnên yên di mirovan de belav bûn e û weha axaftina li ser kêşeya çand , ol û reweştan bi xwe hewildanek e ji bo cudabûna di navbera qenc û xirab de, tiştê jiyanê zelal dike û ê jiyanê ne xweş dike, û huner ji nirxê jiyan , bedewbûn û xêrê ve venaqete, nîşankirina li ser şermiyên desthilatiya gelemperî û rêyên xirakirina wê ji hemî saziyên dewletê re**

**û derbasbûna wê li hundirê civakê bi rêya nimûneya dewleta netewî a comî, yê armancên xwe ji bo hebûna li desthilatiyê vedişêre , bi têkbirina nirxên wekheviyê di nav gelan de, ta bibe kelem li pêş guhertina demukratîk, wisa em hewildanê dibînin li paş rexineya rewşanî , armanca wê amadekirina guhertinê mîna ramenekî bi rêk û pêk, ne wekî helçûnek e derketî ji kiryarê kuştinê ve, mînaheva rewşê li gor nerîna takekes di xewinê de li gel rewşa a ku mirov têde dijî bi rêya alav û tiştan û cudabûnên wana û eva rojeriyek e girîng e rewşên pevçûna mirovî hewildide ji pêkanîna meraqê ve bi rêya çalakiyê û weşana tevger û kar ji bo zayîna xewinê bi temamiya wê ,bi rewşê re û pêkanîna çawaniya lihevhatinê di navbera cîhanên takekes a xwebûnî û rewşanî ,bi rêya yekbûna henas ligel komê , dibe ku nirxa herî nimûne li cem mirov ewa kar be ji bo xewinek î xweş û temam û lihevhatî û berdewam , hişiyariyê vejîn dike, ji ber ku jiyan zoreng e , ti tevger nîne bê bersivek e berketî ji komên mirovî re ji bo bi erkên xwe rabin û biqedînin , bi vî awayî armanca şiyariyê guhertina rewşê ye ji bo xewin bê pêkanîn piştî kedayînê û hewildanekê ne bi qutbûna xewin ji tevgerê ve mîna kirdeyek e tekesbûnê û bicîkirina mirov ji xwe re, bi rêya derbasbûna wî li gelek rewşên deronî ku ji êşên siyasî û aborî ve dertên, bi gendeliya bi rêk û pêk ve girêdayî ne, û ev jî nîşan in gelek lêpirsîn didin e me di derbarê civakekê de têde kêmasî cîgir bûn e, pişt re fişara girs dikeve hundirê wê û nav lê dibe şoreş , wisa hingeme dibe jêre çarenûs, ev şoreş jêre dibe mîna zayînekî û bi gelek beravêtinên zor ve derbas dibe û bi dawî jiyana nû encam dide bi rêya wê yase li ser hemiyan bê awarte pêk tê.**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Evîn û xewin herdû destpêk in û ewan serhevsara zorengê ne li hember gendeliya pîşedarî, sincî û siyasî û herwisa, bi vî rengî nîşanîbûna evînê heta radeyekê bi dîtina hêzê ve girêdayî ye, li vir jî nîşanek e ku girtinhevî di navbera xewin û sertiyê de ye, ji ber ku jiyan li dû hev tên bi rêyên cuda û bi azar ve, û ji me re gotina Nîtşe berz dike dema go: (Tenahî tiştek î naçîne, lê tiştan gehî dike.)**

**Artêşkirina kesên yên li gor niyazên  xwe yên sawîlke kar dikin ewa destikek e ji hebûna kesên fermandar re ên li navendên girtinheviyê dimînin û di nav rûbirûbûnekê de dijîn, û li sengerên bihevketinê xwe serbaz dikin, ji bo tiştê ku çêkerê girtinheviyê xwestibûn pêkbînin,bi awayekî lihevhatî bi daxwaziyên wana û nirxên xuristî ve mîna destik ji bo  pêkanîna girtinheviyê bi awayekî berdewam, axaftin li ser gendelî û bertîlê û van pirsgirêkên herroyî li welatên ku nezanî wekî çand û serpêhatiyekê dijîn, ragerîna sadetiyê dike li ser binema qinyatê di sînorên wê ya nêzîktirîn  de diaxive , hebûna navikekê bi navê guhertin, çaksazî û şoreşa kokanî, ti karî ji bona wê li ser erdê nake tenê li ser rûpelan vê yekê datîne, takekesê derdkêş tenê bi nexweşiyên civakî ve guman dibe, van nexweşî ji binkeftiyên desthilatiya siyasî ve derdikevin , bi kiryarên ku dizane wê pêkwerin, ev jî nîşanek e ji belavbûna çewtî û binpêkirinên yên dighînin li wêraniya giştî, efsan ne biyan e ji narvîna civakên pepûk ve ,ên bi bendên olî ve hatibûn e dorpêçkirin, wan ji rizgariyê dûr dixînin, ji nepeniyên li paş sirûştê bi zanîna sedemên çêbûnên ceng û koçberiyên yên cîhanê hîştin, ku bi nihêniyên tarî ve fetisî bin, zimanê**

**nîşankirî me dihêle ku em rastî rastiyan bên, û li ser aloziyên desthilat û gendeliyê û xuristiya civakê û rêya sabarkariya wê a deronî û şopa cîgehê li ser wê , herwiha wergerîna wê ya dîrokî ,nîşanên girîng dide li ser çawaniya heyîn û warbûna desthilatiyek e kûr, di jiyana civakê de, ji ber ku pir caran kesê zindanvan ji nav gelek zindanî derdikeve û cihan peyda dike ji bo şopên lingê hilweşînan cîgir bike , ev yeka ligel pepûkiya ramandina civakî ya giştî ye bi pepûkiya qatî re bi yek dibe .**

**Alîgirî ji pêşiyan re, pêşbîniya bi tiştê ku çêdibe, tewriya Elfirêd Idler 1 tîne bîra me û ew ji şagirtên Firûyid 2 bû, lê bi wî re cidabû û ji xwe re nerînek î serbixwe ava kiribû, û ji wî re dibistanek î çêbû di zanista deronyar de bi navê sîkûlociya Edler an sîkoûlojiya takekes a civakî û peyrewên xwe jî hebûn, Edler bervenêriya bi rêya jiyana takekes dike dema ligel civakê dijî, û naveroka sîkûlojiya Edler li ser felsefeyeke berfireh tê sazkirin, cîhan berdewam tê guhertin, ew berdewam li pêş dikeve, ji jêr ve berve jor ve, ji lawaziyê ve berve hêzê ve , û li ser encamek e girîng derbirîn dike û ewa dîmena pêşveroyê yê bi heyîna mirov ve girêdayî ye, herwiha hestbûna bi veguhêztinê ji baweriyek e girêdayî bi karê xêrê ve li baweriyek e ku şerê gendelî, zor û derewê dike, xêr, bedewî û maf pîroz dike, ji ber ku nihadiya mirovî li cem mirov ewa nihadiya serdestbûnê ye, ewa cureya a ku civak naskirî dihêle , rolên dîlbûna xwe temam dike heta rizgarîbûna wê hêdî hêdî bi pêvajoya pêşveroyê têgirêdan, û wisa Edler dibêje:**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**(Girîngtirîn tişt di jiyana hişmendî de ewa hestbûna bi kêmaniyê û xebata berdewam ji bo rizgarkirinê ji wê ye û bi şêwazek î taybet bi kes ve, nav lê dibe cureya ku kesayeta takekes têde tê diyarkirin.)**

-------------------

**1- Elfirêd Edler: 7 Sibatê 1870- 28 Gulanê 1937, ewa pijijkek î nemsawî ye, dameznerê dibistana zanista deronyara takesî ye, bi Firûyid û Karil Yung lihev nekiribû li ser tekeskirina ku hêza piştgir di jiyana mirov de ewa hestbûna bi kêmaniyê ye, û ewa di dema ku zarok berdikeve hebûna xelkê din destpê dike, yên li cem wan kanîbûnek e baştir heye ji bo haja xwe hebin û bi cîgehê xwe re li hev werin.**

**2- Sîgmund Şelomo Firûyid bi kurtasî tê nasîn Sîgmund Firûyîd 6 Gulanê 1856- 23 Êlûnê 1939, ewa pijijkekî Nemsawî ye zikmakê xwe cihû ye, bi xwendina nojdariya rehî û ramanyarek î azad e, dameznerê zanista lêkdaneva deronyarî ye.**

**Nivîskarê Lubnanî a zanyar Emîn Malof 1 di pêşgotinê pirtûka xwe de –(Nasnameyên Kujer) di derbarê axaftina li ser kêşeya hatinrêzê ji aliyê siyasî ve**
**ku ew amanek e têde hemî sergehên tewrî bi cih dibin, yên azweriyan digrin û hewildidin ku bi hestê berpirsyariya civakî ve bi awayekî bilind bibin û weha dibêje :**

**( Dema em nûjenên xwe vedixunînin ji bo nasnameya xwe piştrast bikin wekî em dikin îro pir caran , mebesta me ji vê yekê ku hatinrêzê di kûrahiya xwe de rastî wê werin, ew hatinrêza bingehîn a naskirî, ewê pir caran olî an netewî an comî ye taku bi şehnazî li hember riwên kesên din rabikin.)**

**Lê ew hatinrêz yê ku siyasetmedarên rewanvala hewildabûn ku bikarbînin ji bo xwe li ser xwestek û**

**xewinên rewa hilbezin, yên girêdana hatinrêzê di kûrahiyê de bi hêz dike û a ku Emîn Malof li ser piştrast kiribû, ewa kêşeya hatinrêzê ji bîrdoziyê re û bikaranîna wê mîna destikekê ji zordarî û sertbûnê re .**

**Û zanyar li ser cudabûna cîgehên wana yên serkotker , rexne li desthilatdariya gelemperatî dikin û hilweşîna wê binav dikin, ji ber ku destêkelkirina mêrên desthilatê bi şaxên xwe yên salogêrî ligel mêrên partiyan yên xwe dikirin miqate li ser çand, bedewbûn, û keda karker, bi lez dibin mîna bendek î bijardeya ronakbûr kelepçe dikin, ew bijardeya ê bi derbasbûna dîrokê rastî paşguhkirin û derbideriyê dibin, û bê guman ku hişmendiya gelemperatî a zordar rolek î girîng bi hilweşîna civakê û valakirina wê ji nirxên xuistî ve dilîze dema xwe li ser civakê dike parêzer û nobedarek î ji nirx re.**

---

**1- Emîn Malof : wêjevan û rojnemavenek î lubnanî ye, li Beyrûtê jidayik bûye di sala 1949 de, û li Firanse dijî, gelek berhem daner kirî ye roman, û şanoya helbestî û siysetê , lê bêhtir bi berhemên xwe yên romanî ve navdar e, hinek ji berhemên wî bi çil zimanî ve hatiibûn e wergirandin.**

**Pêvajoya peygerandina li guhertina armancbûyî di nav cîhanek e li ser kêmanî û û bêzarbûna xuristî ve avakirî ye wekî ku mirov li pey nemiriyê bikeve ku cihê xwe dewsa nemana raghandbûyî bigre, û axaftin li ser nîşanan û peywendiyên wêna bi şaristaniya mirovî ve û girêdana wê bi şaristaniyên dûrî girtinheviya bîrdozî yê li ser çewisandin û şer hatiye avakirin, li pêş me kêşeya çand û zorengên wê di nav nakokiyên Ibrahîmî de diyar dibin, li**

**ser navendiya fermandariya olî û pirsgirêka girêdana jêhatîbûna afrênerî bi lihevpirsînê ve, û dihêle wergirtî be li pêş rewşek e ji wergirtin û matmayîbûnê ve, li vir gelek lêkolîn têne kirin û bi kûrbûn ve ,lê ne diyarbûn bi berzkirina rastiyan xalekî girîng naşî me dide, ji girtinheviya bîrdozî yê ol ji dîrokê ve bikartîne ji bo serwerî û çewseriyê, wisa ev tişt me dighîne rastiyekê ku pîrozî ewa cîgirkirina zordarî û girtinheviyê ye, ev tundirewî hîştibû şaristaniya mirovî di rewşek e neyînî û bêcan de bimîne , ji berjewendiya paşdemayîna ramanî yê egeriya pêkanîna xwesteka afrênerî qels kiribû di rêwiştina zanyar de û heta ew rola civakên rojhilata navîn asteng kiribû, bi peygerandinê li rêyên geşepêdana wê û rakirina aloziyê siyasî li ser wan, li vir zanyarê lêkolîner vê kêşeyê binav dike û xebatê dike ji bo bigere li kokên kêşeya wê bi paldana li ser nîşanên kevin yên li ser dîwêr û avahiyên dîrokî û şopî û mizgeft û perestgehên kevinar,ewa bi xwe pêvajoya vedîtinek e nimûnî ye ji mijarên felsefî û kêşeyên girêdayî bi aloziya ramandinê ve, di çarçova bijardeya fermanber de, û ked dide bi temamî ji bo civakên wêna bêcan û di tenahiyê de bimînin.**

**Û axaftin li ser zorenga Ibrahîmî di navbera olan de me dighîne rastiya rabûna dezgehên desthilatê bi serdestkirina xwe li ser rêxistina ne hestbûna giştî li cem civakên xwe, û wana bi awayekî ne zindî birêve biribû û dibû nobedar û cîgir li ser coma wanî zordar ,di desthilatiya wana li gor cîgirbûna hevgirtina naverokî de di navbera olan de li ser bingeha deqên pîroz, dîtina ku em berdewam li pey dikevin ewa kurtasiyek e ji gengeşeya a ku bi mirovan re dibe hogir**

**û hevgariya a ku bi wan re desbas dibe, û wisa çand di hembêzê xwe de danasîn û reweşt û serpêhatiyên gelan diyar dike, hewildana serweran ji bo bi hemî awayên serdestiya xwe dewam bikin, yek ji sertirîn awayê ewa ên bi rêya olan pêk tê, û ji me re deqa heyî gengeşa cudabûnê mîna rewşek e xursitî berz dike, di nav xwe de girtinhevî û ne lihevhatîbûn û piştre şer diyar dike, li ser têkiliya mirov bi nîşanan re radiweste,  nepeniyan berz dike, û bedewbûna hundirîn  diyar dike û ji me re naveroka sîstema endeziyarî xuyakirin dide , yê li dor wê hemî zanyar dicivin, ji bo sazkirina lihevhatina giştî di nav civakan de , di rêbaza dan û standin û hevnasîna wê, dûrî armancên malgirtîkaran yên hewil didan timî destê xwe li ser zanîn û bedewbûnê deynin, bi rêya berdana jehrên tundirewiyê, ev jî nîşanek ê diyar dike   û me li ser cîgeha şaristaniyê bi axaftina xwe bi hemî çêj, bijarde û astan , herwiha ji me re rastiya avakirinê rave dike,  avakirina a ku li ser bingeha zanîn û sûdwergirtina hevbeş tê duristkirin, dûrî diyardeyên tijandin û xirakirinê, li ser xalek e girîng tekes dike û ewa cîgeh e , li gor resenî û kevinya wê,  ev jî ji rabûnekê dertê, ne tenê di warê avakirin û reweştên wê , lêbelê şaristanî pêş diket ji bo keda diravî û moralî  li cem mirovê pêşeng,  ji bo rabûnek e saxlem bişopîne, ewa bi awayê xwe ve li hember efsan û gendeliyê şer dike û desthilatiyên tarî bi derbasbûna serdeman ve pala xwe li ser herdûkan dabûn, li vir em di derbarê nivîsandinê de ê  baweriya xwe bi lêgerîn û lêkolînê tîne diramin, ji bo zêdetir gengeş e û pêkanîna gurdanê li ser asta lihevpirsînan, li meydana vê zorengê em gurbûn  xwestinek e xurt dibînin,ligel gotûbêjkirina ramanên yên li dor rastiya lihevhatina gotin bi kiryar  re, û**

**di vir de jî çîrokek e têkçûyî heye, ji ber ku nirx ji naverokê xwe ve erzan û vala dikin ta keda zanyar vala biçe, kêmasiya a ku bi mirov ve diqemite ,ji bandora serdestbûna hevrista têkçûnî ve ye li ser jiyana civakan, ev tişt bandorê xwe li ser rêxistinên wêna dike, yên ala birina bi destê civakan ve danîbûn e li ser milê xwe , berve rizgarî û azadiyê, wisa hêsan yarîpêkirin bi pîvanên sincî dibe, dibe benîşt di devê gotarbêjan de, yên bi nivîştê rewanbêjiyê bi hişmendên xewindar lîstibûn, ew hişmend baş dizanin ku zoreng ji bo baştirînê zemînek e rêxistinkirî jêre dive, û ew zemîn divê bi nirxê xebat û xêrê ve bê girêdan, lê eger ew alavê rêxistinî lawaz bimîne û bibe siwar ji komên kedxwar re, wisa wê bêzarî rehet belav bibe û bê bawerî di nav xelkê de zêde bibe, serkeftina mirov armanca hemî baweriyan e,lê ew bê kar û rêbaz dimîne tenê xewinek , gendeliya belavbûyî ji lawazbûnekê ve di henas de pêktê ligel çewtiya ramandinê, koçberiyek ê ji pîvanên sincî ve û rewş perda radike li ser yaseya qezenckirin û ziyanê û bi xwe re helwestên bêzar û mayîna di cih de diyar dike, di vir de em neçar in ku vê rewşê bi dijwarî pesindan bikin, ji ber ku peyketina bi dû dirav û sicêfan ketibû dewsa têkoşînê, di vê rewşê de divê em li ser aloziyê rewestin , ne tenê takekes bi awayekî destanî pesin bikin, tevî ku pêwîstî heye ku em li pey kesên yên di destên wana de rizgarî tê peyda kirin bikevin, takesên yên li rastiya zanyarî digerin û dibînin ji xwe re armanca têkoşînê, tevî girsiya kêmasiyan û zehmetiya rêketinê di tariya girêdanê yê ketibû hestiyê de.**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Berketina me ji cîgehê re berzkirinek e diyar e ji peywendiyê me bi xelkê wê re, bê guman ku diyarkirina nirxên civakî û hewildana ji bo rizgariyê xwestekek e bedewî ye girêdayî ye bi piştgiriya nirxên şaristaniyê ye li hember nirxên şêwegorînê, bin saya gurbûna vê hevkêşeyê di jiyana civaka paşdebirî de.**

**Hewildana lehengiyên takekesî bi gîştî di çarçoveya rêbaza rûbirûbûna zordarî û sitemkariyê ye , piranî roman û nivîsên rewşanî li ser vê hewildanê derbirîn kiribûnû hewayê zorengê geş kiribûn, herwiha çareyan ji kêşeyên civakî re danîbûn, jiyana heyî kurtas kirin, yê têde lihevketin di navbera xwediyên berjewendî û xwediyên vînên ji xwe bawer û azad diyar kirin, bi danîna bingeha rûbirbûn û lêpirsînê mîna du bijar e , bi rêya wana takekesan rêbaza sîstemê armanc kirin.**

**Ji ber ku desthilatdariya siyasî ya sert çêja gîştî ji cemaweran xwar dikir li ser cudabûna qatên wana, hîştibû di tenahiyê de be û dûrî rastiyên jiyana dema niha be û xwestekên wê jiyanê ji ronakbîrî , zanîn û kedayîn û ramandina rexnî, û ev hevgirêdana di navbera desthilat û civakê de nifşekî xeniqî û ketî peyda kir, di cenaqên têgehên çewt û mîtafîzîqî yên ji olan derhatibûn berhem dabû, ligel nezanî û bilmeziya siyasî bi wateya wê ya berzbûyî ve, ev bê bawerî peyda kiribû û herwiha jî mazoşiya civakî yê em dikarin wê bi vî awayî pênase bikin:**

**( Rewşek e ji jihevketina nirxî ye , û bê bawerî ji pêşerojê ye û tewandina giştî ji bavîtiyê re, yê diyar dibe bi a kirina**

**kor ji serwer re,  û kesên mîna wana ji mêrên desthilatê ve , ewên bi bergê reşgerî diyar dibin, qatek î ji mêrên jêr bi wana re dibin alîkar, ewan bi awayekî xurt bi rêveberên yên aloziyan  di civakan de gurtir dikin ve girêdayî ne, dibin kelem li pêş wan ku ronakbîr bibin, ta bibe qêrîna wan li hember desthilatiya serdest diyaredeyek e dengî , di nav xwe de serhildanek e reşepêş û ragehî û dîtina bê dunde ji rûxandina ricîma sitemkariyê berz dike,û jêre dibe bihaneyekê ji bo bimîne), wek mînak :( Islamkirina şoreşa Sûrî, hebûna desthilatê, û belavkirina şerê li dijî terorê, mebest ji vê yekê bidawîkirina vê rabûna serberdayî ji berjewendiya berdewamkirina sitemkariyê.)**

**Nîşankirina tiredînî û tembelîkirina hişmendî diyar dibe bi rêya berzkirina dîmenên sextiyê bi zîrekî li ser çehrên ku ji bilî cûtina sloganan û xapandinê tiştekî nakin, ji ber ku ketibûn e bin desthilatiya serkotker û jê re bûn e  teriyek e erzan, û bê guman ku cîgirbûna sofîtiyê di reweştên partiyên gelemperatî hîştibû sawêrbûnên sitemkariyê piştre cîgir bibin,û wisa dibûn e kelem li pêş rabûna zanyaran û li pêş pêşveçûn û bilindbûna wan ji wan pergalên bîrdozî disekînin , ji ber ku zanyar xwe natewînin û wekî totî gotinan dûbare nakin, ji ber vê yekê ew timî li ber dadgehên partîtî berdewam gunehkar in, neyarên doz û rêbazê ne, ji ber vê yekê hewildana takekes ji bo avakirinê pêdiviya xwe bi piştek e civakî heye ligel  jêhatîbûnekê bi felsefa tevgerê , ji ber serhildan ne peqijokek e dengî ye lê ew berpirsyarî , berketin, û hevgirtinek e civakî ye, û  di bin saya serdestkirina desthilatiya sitmekar de û  bi rêya serweriya xwe, partiyên mîna xwe çêlik kiribû, û civakek e**

**tirsonek kedî kiribû, û herwiha ew civak jî bi kîn e, lê nizane bi çi awayî li hember wê desthilatdariyê serî hilde,ji ber gendeliya rêxistinên wê li ser cudabûnên nav û armancên wêna, tiştê ku hîştbû mîna encamekê ku koçberiya deronî di nav wê de cîgir bibe, ji ber dûrxistin û paşguhkirina afrênerên xwe û qermandina berketin û raberiyên wana, û wisa wêranî bi dawî bû riwê herî kirêt jêre, û wê gîhande encamên bive , tê diyar kirin bi nebûna baweriyê di nav xwe û cemaweran de, ta astek e metirsîdar ji tol û mehnegirtinê, tiştê ku hewaya awanteya girs durist kiribû, ji teqîna girs, ewê guhertina civakê aşkere kir ,dema ji qonaxa derbideriyê diçe radeya jêhatbûn û geşepêdanê ve.**

**Em dikarin vîna serberdayî danasîn bikin ku ewa : rêbazek e partiyên gelemperatî bikartîne ji destpêkên çerxa bîstan ve, ta ku li ser têla wijdanî yê li cem cemaweran bilîzin, ta vînek e kawikî demkî biafirînin, hawara xwe bi bijardeyên ciwanên bilmez tîne, ta ku bilmeziya siyasî cîgir bike, yê bi dûbarekirina sloganên şermezarkirinê ve diyar dibe û çewisandina wan sloganan bi awayekî tîrbûyî ligel dûrkirina giştî ji hişmendiya rexnegirî ve, dûrxistina tofa ronakbîr û şerê wê bi rêya pêngavên reşkirin û neyarkirinê, gunehkarkirina wê bi tembelîkirinê û dozkirina çaksaziyê bê ku tevlî şoreşê bibin, ta cemawer bimînin di tenahî , qerimandin û reqbûnê de ,ta bighin qam û pergalên cemidî û ji vaca kedîkirina bîrdozî ti car î dernekevin.**

**Û bi ketina me li hundirê vê danasînê em dikarin têbigihin alavê girêdanê di navbera resenî û baweriyên yên ji encamê reweşt û reftarên civakî ve çêbûne , vê sînorê di navbera**

**dewlet û gel berz dike, ji ber herdû zorengek e dijwar dijîn û ti carî ew girêdanên sincî çênabin di navbera rêxistinekê hemî kanîbûnên xwe ji bo qirkirina jiyana aram terxan dike û di nav civakê bi takekes û rêxistinên xwe de, misoger e wê vegirtina desthilatê li hundirê şaneya wê ya biçûk, partî û malbatê de bê veguhêztin, ji bo peywendiyên civakî bimînin bin saya tirs, bizdan û serweriya nirxên bavanî li ser awayê ramandinê bi giştî ve, serdestiya hişmendiya mafiyawî bi rêya dadiya civakî ve, ta takekesan deyndar li pêş çavê van desthilatiyên sert de bimînin, yên bi mafê mirovan , nirx û rûmeta wanî sirûştî ve dilîzin (Sûrî-Îraq) , tiştê ku hîştibû ev civak bibe mîna barûdekê hindik maye ku biteqe, her tiştî beranberî pereyan û destdanîna li ser pariyê birçiyan û zêdekirina xezaniya wan , û ev jî reweşta desthilatiya gelemperatî ye yê kêrên xwe tûj kirin li ser stûyên bijardeyên xizan, ji ber civakên barketî û dorpêçkirî bi baskên girêdanê ji rewrewkên desthilatê û piyên wê yên nimînandî bi ramandina mîtolocî, ew bi xwe têkelek e ji ramanên olî û mîtolocî ve, jiyanê biribû li pûçbûnek e giyanî û ramanî , pêvajoka jiyanê li cem komên yên dijî zor û sertiyê rawestiyan e bêxewî kiribûn, tu rê nîne ji bilî ketina li meydanên xewin û gumaniyê, li rex rewşek e dijwar derbas dibe berve aloziyê, û girtina pencereyên hêviyê.**

**Em li ser aloziya desthilatê , û li ser kokên wê yên dîrok lêkolînê dikin, peywendiya wê bi bergirtina ayînkarî ve li cem civakan ji reftar ,reweşt û ol , û şopandina kêşeyan bi çavê yê li ser gotûbêja civak û bi a din re lêgerînê dike, ewê ku guhertinê dixwaze , herwiha sûda çûnê ji bo**

**rûbirûbûna zora ragihandî û gendeliya a rengên pepûkiya diyarbûyî li xwe kiribû, di çarçoveya gotûbêja zorenga qayîm de di navbera hêzên parêzvanî û hêzên guhertinê de di paldebûna xwe li ser heyîna hevgirtina xuristî de di jiyana civakan de bi takekes û komên xwe ve, wekî encamek e dînamîkî ji sûda dîtina xweşiyê di çarçoveya sîstemek e rastîn bi destê civakan ve dibe û xwestekên wana bi cî tîne, û pêkanîna aşkerekirina ricîma damezrandî li ser têgihiştina pêdiviyên civakê ê xuristî bin saya hişmendiya rajorbûyî û dehfandina wê li guhertinek e rastîn ,rêbazên wêna yên rewşanî hene, ji hel û mercê cîgehê ve zayîn bûn e, ji ber têgihiştina xuristiya xelkê û kiryarên wê ewa rêyek e ji dehfandina wê li berve baştirînê û aşkerekirina hevgariya civakê bin saya rêxistina devgirtinê, ewa diyarkirina rastiya ku civakan rastî bahatîn û bê baweriyê di nav xwe de tên, civaka xuristî (gund) û civaka bajarên mezintirîn aşkere dike bi rêya du şepêlên nakok ve nagihin hevdû, ji ber ku hêsanbûn û sadebûna mirovê xuristî sertiya sitemkariyê û gendeliya rêveberkarên wêna napejirîne, zehmetiya jiyanê li gund, bi sedemê xizanî û pêdivî, ew heta radeyekî dûr hîşt ku mirovê xuristî dûrî jiyana xwe ya heroj be, yê li ser bingeha peywendiyê ve saz dibû, ev jiyana gelerî û baweriyên yên bi dûlaneyîya mirov gemarî ne bû ye,di çarçoveya reftarên yên rêxistina têçûn û çavkariyê çêkiribûn.**

**Têgihiştina rêbaza xuristiyê û kirina wê mîna bingehekî ji her pêşveçûnê re bi sûdtir e, ji ber ku gera li mirovê zanyar ewa armanca balkêş e ji hizran re, li gor berdewamkirina rodanên dûrêzîhevdû û yên ji me re xuristiya hebûna**

**berfireh li meydanên wê yên cuda bervajî dike û ji me re rehet şerê girtinheviya rastîn di navbera hêzên avakirin û wêrankirinê diyar dike, ew ramanên yên bi hurgilî derbasî henasê pêşwazîkerê bûn e, di xwestekê serkeftinê ji heyîna xuristî re yê bi hebûna welat ve berz dibe û gotûbêja bandorkirina wê bi heyîna giştî ve di çarçoveya diyarkirina rastiya tam li gor tekeskirina naveroka ku evîn hebûn e û hebûn zanîn e, ji ber ku kirdeya rabûnê yê hewil dide ku sitemkariyê rake bi wan kedkirinên armanckirî ji bo dîtina cureyekê ji azadî û nemûneyî û livandina çevanên xuristî ji mirov re ji bo berketina kiryarê xêrê û kar ji bo wê, û tekeskirina li ser girêdana di navbera mirovê afrêner û reseniyê de di cih de, û girêdana peywendiyên xurt di navbera yên hewil didin destkeftiyên mirovê zanyar biparêzin, wekî binavkirinekê ji nîşanên dîrokî ve yên li ser gewrbûna kiryarê çêker piştrast dike, xwedîtina wî li ser her xirabî an çewtiyekê, ewa berve rêbaza lêgerînê li nirxên xuristî dike di rewşek e windayî û aloz de, hemî takekesên wê derdan dikşînin, ji zehmetiya ramandinê ji ber zordariya desthilatdariya siyasî û bêzariya wê ji şopandina guhertinên demê niha ve bi sedema têkçûna wê ya sincî , tiştê ku hîşt civak li meydanên koçberiyê bijîn, û bê bandor bin li ser wê sîstema yê jiyana wanî rojan e bi rêve diribû, wisa kesên ên daxwaza guhertinê dikin zêdetir rastî işkence û qirkirinê tên, bi rêya derdê bilavbûye li hemî rojhilata navîn , yê bi sitemkarî û hişmendiya gelemperatî ve hatiye naskirin,ji pîrozkirina peykerên serbiran û pabendbûna kor ji wan re, tiştê ku di hundirê wan de tijandinek e hêdî hêdî wê biteqe peyda kiribû, û aloziyên sincî diyar kiribû, yên di civak û saziyên wêna de**

**derbasbûn, tiştê me dihêle ku em dîrokê vegerînin ta em encamên wê yên bi bêtar nas bikin, pevçûnên yên di navbera desthilatan de rû didann civakê hiştin ku di penaberiyek e xirab de bijîn, jiyana wê û berhemdanê û gerentiya mafan ji hevdû ve cuda kirin, ji ber ku di nîvê ew girtinheviya biv de di nav desthilatan de, em berhemkirina zordariyên cur bi cur dibînin, civakê hîştibûn bibe êzingên timî ji meydanên pevçûnê re, kesên çaksaz û bangdayên guhertina ji kokê ve reftar û bingehên rabûyî saz kirin , ji bo bi hevsarê bigrin, lê van kedan ti sûdê nedan, nebûn e rêgir li pêş bêtarê gewr e, ji ber ku sitemkarî ew derdê mezintirîn e yê di riwê civakan de sekinî bû, ta negihe rabûna hevjiyanê di bin yaseyek e dadmend de, berdewamkirina alava serkotker bi kiryarên xwe ve dihêle war bê ser û ber be,û pêşeroj tarî û nediyar be, ji ber pepbûkiya desthilatê û bêzariya wê ku xwestekên heyî û pêdiviyên serek e ji bo jiyana civakê bicî bîne, bi binavkirina vê zorenga mezin di navbera sîtemkarên yên tim dibêjin ku em hene ji bo bergiriyê bikin li hember dijminê ê ji derve tê, gotina wê ku ew li beranberî pîlana gerdûnî radiweste û ala sosiyalîzmê radike û zordarî her û her di hundirê saziyên xwe de binyad dibe, bi xurtî reftarên serweriya olî diparêze bi navê zanistdariya sexte, hewil dide herwiha tovên tîjandinê di nav bijardeyên civakê de biçîne, dema bijardeya rewşenbîran kelepçe dike, û dihêle beşekî mezin ji wan bibin e kole ji wê re û beşê din di zîndan û girtîgehan de bin, bi rêya weşandina tirs û penaberiyê di nav wan de û kirina cuyeryên azariya gewdehî û deronî dermafê wê, ji bo ew desthilat mîna zengilê wêraniyê di nav civakê de bimîne, ji ber ku kêmbûna kirdeya tevgerî yê ku**

**hêmanên guhertinê tîne , ji bo berjewndiya rabûna sertiya desthilatê û zêdebûna serweriya wê , û cenga wê ya rastîn li hember cîgehê , dihêle ziyan û gemarbûn belav bibe li her derê , dema hatinên sirûştê bibe pirojeyên bazirganî qezencê bi xwe re tîne , ev rê ji çavkariya bê sînor re vedike herwiha gumanek e bive derdixîne ji diyardeyên cengên sermedarî û nemana hatinên dewletan û wêranbûna wê û ketina di aloziyên metirsîdar ji serkotkirinê ve pêktîn e.**

**Ew serkotkirina yên desthilatên sitemkar pêktînin ji bo nemana gelan ligel birina hatinên wê yên xuristî, ji ber ku ew ceng , cenga li hember vînê ye, cengek e li hember reseniyê, nirxên sirûştî, û evînê ye, û çareya mirovê pêşvero ku di rûbirûbûna de be bi xurtî û bawerî, bi rêbazek e armancbûyî naveroka wê ku dema pergalkirin û kedîkirina bîrdozî hindik maye bi dawî bibe û serkeftina tenê a armancbûyî ewa di saxlemkirina civaka xuristî bi nirx û takekesên wêna ye yên hewildidin berve baştirînê biçin.**

# Vîna zanyarî di rûbirûbûna Islama siyasî de

## 1- Dîtinekê ji têgihiştina êşê ve

**Hewildana mirov ji bo êşê têbigihe û aşkere bike ne hatiye avakirin li ser meraqek e xweser , ku nîgaş û çêja afrêner an xewindar meyldarî wê bibe, eger bîrnas an hunermend be, lê qemitandina takekes bi derdên xwe yê girêdayî bi komê ve ew hîştibû ku di nav êşê de bifire, ji ber ku henas kedekî dide bin saya cengê, ta bi bar û giraniyên xwe rabe û xemsariyê derbas bike,lê timî bi zinarê kelemê dikeve û mirin buyerek î şopedar e di sazîkirina hunerê de, û hêmanek î sereke ye, takekes dihêle kedekî bide ji bo berketî tiştê ku di jiyanê de çêdibin bibe, ji girtinhevî û berjewendiyan lê têgihiştina henasê mirovî bi evîna jiyanê ve têkildar e, bi tevderbasbûna dijwar bi xwestek, hezkirin û dilxwaziyên mirovî ve jî girêdayî ye, dibe ku rastiya zorenga heyî, têgeha dijwateyan cîgir bike yê bi mafê jiyanê re dewsa çanda mirin û tundirewiya olî, girîngtirîn navdêr ji bo berdewamkirina vê zorengê ewa evîna erdê ye û berzbûna wê di wijdan û huş û sewda de a taybet û giştî mîna nirxek komelî, dûrî tiştê ku bîrdoziyên siyasî dibêjin,lê bi armanckirina damezrandina jêhatîbûnek e mirovî, pêdivî ye li ser afrêner ku bi hemî çêjên cuda re biaxive bi banga wijdana berketî û ne wek tiştê ku gotarên siyasî yên kedî dibêjin û bandorên zimanî û mirovî ji bo çareserkirina kêşeya hebûnê, û hevgariya takekes di hizrê wêjevan an ramanyar de ne tenê buyerk e, lê pir caran pêkenok bi hevgarî ve cîteng dibe, û dibin komek hest ji**

**tenazî, laqirdî û hêrs pêktên, me dihêlin ku em berketî alavek e rexnî bin ji bo çareserkirina lerzên jiyanê û qelişiyên wêna, sixêf tenê bersivek e deronî ye ji hêrs û dudiliyê re ,ji kesayeta takekes ve dertê, ji ber ku evîn çêbû ji bo bergiriya henasê me bike di şer de, herwiha demukartîkirinê saz dibû ta ku li dijî sitemkarî,tundî û hovîtiya destpêkê raweste.**

## 2- Tudirewî û rûbirûbûna wê

**Kurd li rojavayê kurdistanê (Sûrî) û başûrê wê (Îraq) karîbûn serkeftinê li ser Daişê pêkbînin bi piştevaniya hevbendiya navdewletî, bi rêya sergirtina ezmanî û bombebarankirina şûngehên Daişê û rêyên piştgirtinên wê, di heman demê de ligel pêşveçûna yekîniyan, û piştî serkeftina leşgerî , moralên xelkê helbet xurtir bûn, ev yeka wê serneketa eger ajotinkek e zanînî neba, û diyar bû bi jêhatîbûna şervanan bi neyîniyên tundirewiyê û encamên wêna yê bobelat li ser mirov û jiyana wî, ev jêhatîbûna nîşan dide xebata zanyaran a zehmet ji bona zanîn, avakirin û jiyanê, beranberî hêzên yên bê hampa kar dikin ji bo kuştin û wêraniyê, ji ber ku tundirewî ziyanbexşiyek e li ser raman, civak û nifşê çêbûyî, li dijî çi pêşveçûnek e civakî , zanînî û rast, ji ber vê yekê pêdivîbû rûtkirina pîrozî û baş têgihiştina wê, û dan û standin li ser bi rêyên din, ji ber ku ceng, û girtinheviyên olî yên comî destikek e ji zorkariya civakê û nemankirina wê, ev tişt dikeve di çarçoveya nezanîkirina takekes, û alavên olî yên bi rehetî ev tiştan pêktînin dema valahiyekê di navbera civak û xwendinê çêbibe li ser cudabûna aliyên ramanî, û yek ji**

**sedemên yên betal dikin rûbirûbûna tundirewiya olî bi awayekî ramanî ewa hewildana aliyên siyasî a navdewletî ên şerê hevdû dikin bi rêya bikaranîna olperestan mîna kaxezek e fişarê li ser hinek dewlet û aliyên siyasî bi wana re ne li hev in, bi vî rengî paşguh dikin guhdana xwe ji rûbirûbûna ramanî ji tundirewiyê re, ji ber ku ewan girîngiyê pêşî didin e berjewendî û sûdên xwe, û dijwariya girtinheviyê ji encamê destjêberdanek e navdewletî diyar di rûbirûbûna terora olperestî, ji ber ku jinavbirina terorê bi awayekî ramanî ti guhdan nedîtibû ji ber vê yekê gelên rojhilata navîn bibûn ji qurbaniyên vê terorê û zimanê berjewendiyên malgirtîbûyî bi serketibû ta asta ku bi terorê re bû destêkelkirî, ji ber teror ne tenê mala hin koman e, lê hinek dewlet aşkere pê radibin û kedî dikin û bi xwe jî endamek in li Nato 1 (Tirkî) û herwiha em rola neyînî ya Îranê dibînin bi piştevaniya wê ya bê sînor ji gelek komên terrorist re mîna Heşd Elşebî 2 û Hizbullah 3 û Elfatimiyon 4 û komên Ebû Fedil Elebbas 5 û Elhusîyon 6 ji ber ku ti jidilî li cem Encûmana ewlehî an Netewên yekbûyî nîne di rawestandina tewan û binpêkirinan , lê li gor berjewendiyên dewletên bi bandor tevdigere û li gor Vîtoya 7 ya di riwê hin dewletan tê bikaranîn ta bibe rêgir li pêş çi hewlidanê ji bo parastina sivîlan.**

**- Lagiriya olî a comî bi lez derbasî civakên yên rastî zorkariya dewletî bûn e dibe, ji ber ku ricîmên serkotker timî gefê dibarînin û dibêjin eger em nebin wê dewsa me olperest cih bigrin, û herwiha peywendiyeke xuristî heye di navbera terora dewletê û terorên komê ji ber ku dewleta teror timî rê vedike ji şerên navxweyî re, û ev yeka rê**

**vedike ji hatina terorîstan û çekan , wekî Efxanistan û Îraq, û Yemen û Sûrî.**

---

**1- Rêxistina hevbendiya bakûrê Etlesî bi sernavê Nato : ew rêxistinek e leşgerî ye navdewletî ye sala 1949 an de hatibû damezrandin , li gor peymana bakûrê Etlesî yê hatibû îmzekirin li Waşitonê di 4 Nîsanê de sal 1949 an de.**
**2- Heşd Elşeabî : ew yekîneyên bi rêk û pêk in Îraqî ne, û beşek in ji yekîneyên çekdar a Îraqî, bin fermana rêberê giştî ji hêzên çekdar ve ne, û ji 69 yekînî pêktên ,piştî fitwa tekoşînê yê ku lêvgera olî li Necefê hatibû avakirin, piştî kontirolkirina Daişê li ser bostên fereh ji hineh hijmar ji parêzgehên Îraqî re yê nêzî bakûrê Bexdayê.**
**3- Hizbûllah: ew komek e Şêî ye Islamî û çekdar e û partiyek î Lubnanî ye navenda wî li Lubananê ye.**
**4- Fatimiyon: ewa komek e Efxanî ye Şêî ye Elî Riza Toslî a navdar bi bavê Hamid damezrandibû sala 2014 dan de ji bo şerê dijberiya Sûrî.**
**5-Bavê Fedil Elebbas : komek e Şêî ye çekdar e ji çekdarên Îraqî pêktê û bi xwe ji çeteyên Ehil elheq û şepêla Sedir û ketîbeyên Hizbullahê li Îraqê ne.**
**6- Tevgera Ensar Ellah navê wê tevgera xortên bawermend bû, ew tevgerek e siyasî olî ye çekdar e, ji bajarê Seide bakûrê Yemenê navendeka bingehîn ji xwe re li wir çêkirin e, û navê wê ya siyasî û ragihandinî Hosî, ji dameznerê wî Bedir El Dîn elhosî, rêzanê olî ji komê re.**
**7- Mafê peyvşikînê yê tê naskirin bi mafê Vîtoyê , û wateya wê mafê pêşgirtinê li ser çi biryarê ji aliyê Encûmana Ewlehiyê bê standin bê ku sedemên wê pêşgirtinê bên ravekirin, û tê dayîn ji pênc encamên timî di encûmana ewlehî û ewan : Rosiya, Sîn,Ingêltira, Ferensa û Iyaletên Yekgirtî.**

**-Bajarên wêrankirî , nediyarbûna ewlehiyê û mirina ciwanan, herwiha birina destkurtan ji leşgeriya neçar re , ev hemî mîkrob in ji şerên hundirî ve encam dane, rewakirina dînbûnê di rastiya rêxistinên yên pîrozbûnê bikaranîne wekî bihaneyekî ji berferebûnê re , sûdê ji nezanîkirina yê ku ricîmên serkotker bi dehên salan ve kedîkirin e digrin, bi rêya lephilanînên leşgerî û rewşên bê ewlehiyê yê bi serkotkirina desthilatdarî ve bûn e heval û nediyarbûna dadmendî û yaseyê, û bûyîna welat meydanek e ji qerebalixiyê, xêzên wê berpirs û mêrên ewlehî û**

**saloxgiriyê dabeş dikin, ji bo lêdana aramiya deronî li cem takes û xeniqandina dengên yên daxwaza guhertin û rabûna awirteyan û fermanên zordar dikin, tiştê ku tîjandinek e gelerî encam da û nezanîbûnek e rastîn zêde berfereh bû bi belavbûna xizanî û bêkariyê û gendelî û xal û xwarzê û belavbûna reweşt û reftarên nêrîtî , ji ber ku tundirewan tevî ku dawiya xwe jî dizanin lê ji kuştinê û serqutkirinê paşve naçin, ji ber ev tişt di baweriyên wana de heye, ji ber ku qeyran misoger e, û rêbazên wê bi parçekirina civaka kurdistanî ve girêdayî ne, derdên wê ya siyasî, bi sedema hişmendiya desthilatê bi awayekî bîrdozî û sert serkêşiyê dike , taybetmediya xwe ezezî û dûrxistina kesê li dijî nerîna wê ye, herwiha hebûna aloziyekê di hişmendiya dijberiyê de, ji ber ew jî bi kar û barên dijmin ve peywendîdar in û bi awayekî zindî dikevin bin saya wêna ,û ev jî li ser civakê de dibe giranî û dihêle ku dûrî ewlehiyê be, wisa niştecîbûn, mirin û şerên li ber rêbendan de dîmenek e hevgarî encam dabû, û Daiş dema tewanê dike şad dibe, tolhildan ewa xweşiyek e veşartî ye, hewildana tundirew ku hovîtî û tewankirinê nepenî bike, ji bo deroniya xwe ya têkçûyî rehet bike.**

**- Pêdivîbûna berketina kêşeya diyar bi paşdemayîna alavên rûbirûbûna olperestiyê û herwiha qirkirina çandî û dûrketina ji rewanê netewî a kom dike bi rêya nêzikbûna ji rewrewkên pirojeyên nepenî ve di naverokê xwe de hilma koletiyê dihêle û avakirina desthilatiyên  lephilanîker yên nû û ew bi xwe ji encamên ricîmên serkotker in yên ketine sekretê, lê hêviya tenê di giyanê berxwedaniya a ji vînek e**

gelerî û ciwan ve tê, yê ked dide ji bona bimîne bi zikmakiya xwe ya netewî û rengê xwe yê şaristanî ve.

- Meraqa gelan ji berxwedaniyê û girêdana bi bermayê rewşenbîrî û heyînî bi hêztir e ji pîlanên ricîmên serkotker yên hewil didin cihê wana bistînin, evîn ew hevsenga rastîn e ji heyîna mirovî re di dema ceng û aloziyan de, yê tên e milletan, ev hemî hestiyariyên germ di rewşê niştecîbûn û şerên navxweyî de nîşan didin li ser cureyekê ji berxwedaniyan ve , tê bikaranînin ji bo derd berdewam be, ji ber ku kedîkirina bêhişî ji kiryarê kesên yên dixwazin cengên navxweyî gurtir bikin û qutîkirina civakê jî , herwiha hêsan dibe li ser tundirewan ku derbasî civakan bibin û wana bixirxirînin li cem xwe, ji ber ku radîkalên çep û oldar, xalên hevbeş dinav wan de hene dema herdû serwerên xwe ji xwe re dikin xwedawend, herwiha girîngiyê didin e warê piropûgendeyê bin navê perwerdê an dewra şereî ( şuştina mêjiyê 1) û Islama siyasî vê yekê piştrast kiribû wek ku sosialîzma Sofiyêtî û yên li dor wana dizîvirin vê yekê li hin dewletan de piştrast kirin, ev dibe cîgehek e rehet ji afirandina ricîmên saloxgirî û zordar bi gendelî û zordariyê ve dagirtî ye , herwiha bi dijminatiya zanyaran ve, û li vir em dibînin ku Sosialîzmên rojhilatnavînî bûn e dû beş yek netewî û yê din bi çepîtiyê bawer in, di dema destpêkên tevgera gelerî bi navê buhara Erebî xwe ji wê dûr xistin, ji dîtin û pirojeyên wan bi guman bûn, û xema wan tenê bighêjin desthilatê, me ti cudahî di navbera wana û desthilatên heyî de nedîtin, herwiha Islamî jî li ser têla sazkirina ricîmek e Islamî lêdan û li dijî zanistdariyê derketin, û tevgera gelerî bi vî awayî

**têk birin, bûn e alavekê di destên dewletên herêmî de yên bûn e piştgir ji wan re  mîna Erebistana Siûdî û Turkiya û Qeter û Îran, û berrabûna ji biveya tundirewan bûye berberîkirinekê ji hemî pêkhatiyên deverê re, nexwaz biryardana Turkiya  a heynat di lêdana çi rewşek e rêxistinî kurdistanî hewildide ji bo jiyanek e azad û demukrat bi dest xwe xîne, ji ber vê yekê em aloziyek e serdest  li ser dîmenê dibînin di dema berdewambûna şer û têkalên bidûhevdû ve, û sedema nebûna azadiya bingehîn  vedigere ji sitemkariya ricîma siyasî  û hîştina wî ji paşdemayînê re , tiştê  dihêle  ku civakan rastî çarenûsek e nediyar werin, bi jihevkirina hevpeymana siyasî û belavbûna wê û berzbûna berberîkirina yê girêdayî bi hingemeyê û şerên hundirî ve, mînak rûbirûbûna  rêxistina Daiş yê teror , ew asta bilind ji sertbûnê bi ser civakê bikaranî , û di vir de em dibînin sûda hunera ravekirinê ku çendî karîbe berhem ji asta xwe yî teng ve derbikeve û berfireh bibe , ji bo berketina rewşa civakî li rojavayê Kurdistanê , herwiha têgihiştina boblatên mirovî  yên bi dûhevdû ji ber êrîşê Daişê li Kobanî û pêhelistina wî ji komkûjiya bi ser navê Şeva xedirê 2 piştî rizgarkirina bajêr bi çend mehan ve  û hovîtiya malbatî , û kînên navçeyî yên ku di giyanê civakê de cîgir bûne , di nîşanên xwe de paşketinek e xuristî veşartî dihêle, hatibû kêmkirin piştî 2011 ,ji ber ku rewşa civakê hatibû guhertin dema jinê bi mêr re erd  û destkeftiyan parastibû, ji ber civakên yên ku serpêhatiyên xwe tunebin ji afirandina rêxistinên sert wê nikaribin bergiriyê xwe bikin, heta ricîmên siyasî dikarin astên amadebaşiyê ji bo rûbirûbûna zordariyê li cem civakan de piştrast bikin.**

**--------------------------------**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

1- **Şuştina mêjiyê : mebest ji wê yekê ewa guhertina takes , alî, nirx, ,awayên kiryarên wî û baweriyên wî, û pêgirtina nirxên din û nû ji aliyekî ve çi takes be an kom an sazî an dewlet be, û têgeha şuştina mêjiyê bin dikeve bin navên cuda, yek têgihiştinê radike mîna dûbare çêkirin, û avakirina ramanan, û guhertin û rizgarkirina ragehî û ramanî, û qayîlkirina nepenî , û bernana ragehî, û guhertina aliyan.**
2- **Şeva Xedrê : komkûjiya reş li Kobanî , rojavayê Kurdistanê de çêbû di 25.06.2015 an de û têde 239 kes jiyana xwe ji dest dan di nav de 33 zarok û 79 jin, 289 birîndar jê 78 zarok û 81 jinê ji aliyê rêxistina Dewleta Islamî a teror ve bi sernavê Daişê ev komkûjiya pêkhat.**

**Û dema ji kar û dayîna nerînê û hînkirina baş tên e rûtkirin vê yekê li cem wana rewşek e ji nifretbûn ,dijminkarî û amadebûna ji zorkariyê dema jêre derfet çêbe durist dike û ewan çalak dibin bi hebûna hingemiyê ,û li gor bawerî û rewştan tên e guhertin , û zehmet dibe celewkirina kelçûyîna cemaweran û zeftkirina wêna eger ji xwe re bostekî ku têde karibin tevbigerin bibînin, û dema desthilat bi rûbirûbûna gefên derveyî yê li dijî wê tê mijol dibe, cemawerên hêsrdar û dijber jêre hemî hêzên xwe kom dikin ta bi awayekî hovane hewil bidin ji bo xuristiya ricîmê biguhêrin, tevî ku rastî serkotkirinê bi awayekî berfireh tên, lê ew şer dikin, û hemî destikan bikartînin ji bo hingemiya xwe bihêlin heta ku di nav xwe de desthilatiyek e nû dewsa wê bigre bê sazkirin, û wisa em pirbûna tiliyên derveyî dibînin yên vê yekî zeft dikin, taku bingehên ricîmek e siyasî nû deynin, ji ya a berê hatibû zayin, û hewil dide di yaseyên xwe de di navbera ricîma tunekar û a heyî de hevsengiyê çêke,wekî ku Nîqola Mîkafîlî 1 di vê derbarê de dibêje ku çi desthilatek e nû hinek zagonên yên desthilata berê wêna bikaranî dihîlîne, ji bo zeftkirina civakê,(Pirtûka Mîr)**

**ji ber sîstema siyasî a goşegirî li ser rojavayê Kurdistanê danîbû bi awayekî pir zêde , û navçeyên wêna ji hevdû bi tenê kiribû, û navçeyatî di nav kurdan de cîgir kiribû, xwest ku tiştê parçe bûye parçetir bike, û netewa kurdî têk bibe, û rê li ber bigre, lê çanda vejînbûnê jêre hertimî şiyar bû ,û rewşa yekîtî û hestbûna civakî karîbû taya jiyana demukrasî rabike, beranberî jiyana nêrîtî yê naye pêşdebirin,yê kêmtir dibe bi pêşdebûna qonax û astên serçûna moralî, sincî û zanyarî.**

-----------------------------------

**1- Mîkafîlî li Florensayê jidayik bû ji parêzgehek î ewa Birnado Dî Nîkola Mîkafîlî û Bartolomî Dî Istifano Nîlî, û herdû jî ji malbatek e Toskanî ne resen in, û bavê wî ji kesên pile bilind in, lê Mîkafîlî hînkirinek e berfereh nedîtibû, lê zîrekiyek e xurt diyar kiribû, pêşî Mîkafîlî li pey mêrê ol û siyasetvanê Îtalî Cîrûlamû Safonalrûla yê bi xwe ji ricîma keşevanên Domînîkanê bû , û bi navdariya kizîrê xwedê hatibû xelatkirin, û Safonalrûla gotar digotibû ji bo ciwanên Îtalî ta bi başiyê bigrin, lê Mîkafîlî jê dûr ketibû, ji ber kû ew mêrê siyasetê bû, û hewil dida ku ol ji siyasetê veqetîne, bi kirina bajarê Florensa mîna komarek ê.**

## 3- Girêdana Islama siyasî û netewîbûna xwe bilindkirî:

**Islama siyasî a ku bi ricîma siyasî a netewî re hevbend e, li Sûrî hemî simtên civakî kûr kirin, sertî kiribû nanek î ji jiyanê re û sixêf jê re dibû ferhengkek e rêzimanî lê cîgirbûna çareseriyê bi kûrbûnî ve di rewşa lihevhatinek e avabûyî de saz dibe, herwiha li ser rûtbûna aloziyan û rawestandina li ser wê ne ava dibe .**

**Û civakên çevsênîbûyî ew civakên ku diljêçûnê kedî kirin e û wêna mîna newxweşiyên pejîk vediguhêzînin, em vê yekê li deverên ku ricîmên serkotker têde hene dibînin, cureyê ramandinê li cem takekes yên saziyên perwerde, fêrkirin, û xuristiya ricîma malbatî piştrast kirin, em civakên çewsandî dibînin bêhtir meyldarê sertbûn û girtinheviyê ne bi awayekî têkçûyî, sedemên vê yekê vedigere ji sitemkariya rêxistina siyasî û gendeliya wê , herwiha gendeliya şaxên perwerde û hînkirinê.**

**Eristw dîtibû ku sedemên cengê vedigerin ji ramana girtinhevî û bihevketinê di henasê mirov de li rex cîgirbûna vê xwestekê di cîgeha civakî de,û dewleta serkotker bi vê yekê rabû û serket, herwisa divê em bînin ziman li ser ew kesên sûdkar ji hişmendiya girtinhevî û bihevketinê û kedîkirina wana, cîgirkirina wan ta bibin e destika serdestbûn û zorkariyê, bi lez jî dibin jêdera teror û jihevkirinê bi taybetî ve di dema cengên navxweyî de, sînor**

**dibin rewrewk , bi temamî vedibin ji bo rê vekin ji dewletên herêmî re ên kêlek ji bo destwerdana dewleta ku li ber sekretê de ye bikin, çek ji her alî ve tên û çetîtî dibe rewşek e sirûştî, civakan meyldarî tevgerên komikên biçûk dibin, di dan û standinên xwe yên rojan e de, bi nediyarbûna dadmendiya saziyê an yaseyên piştgir bi hêza ricîma siyasî ve, ew dikare vê valahiyê dagre û jiyanê li dema xwe ya berê vegerîne .**

**Û wekî ku dawiya çi pevçûnê aştbûn e , ji ber vê yekê tê gotin ku lihevhatin serwerê biryaran e, herwiha encamê cengê eger çendîn dirêj bike ewa bervehatin e ji aştî re, lê ev tişt li ser hêza ku meyldarî yek ji aliyên zorengê ve radiwest e,lê êş rastî bêguneh û sivîlan tenê tê.**

**Û Can Cak Roso dibîne ku xuristiya gerdûnê pêdiviya xwe heye bi hebûna zorengên timî ve , ango wê cihên fereh hebin ji zayîna roman û berhemên hunerî û ramanî ve, ji ber ku afirandin ji cengê jidayîk dibe, raman ji zorengan dizê, wek Tomas Hubz dibîne ku rewşa sirûştê ewa cengek î timî ye, ev heyîna awaz û hunerên din şîrove dike , ev min dighîne bi awayekî ramanî bi hebûna vê zorenga sert ve di navbera hêzên afirandin û hêzên malgirtina siyasî a qezencî de, tevî ku kedên xaziyan li ser berferehbûnê tîr dibin, serdestkirina li ser mîrnişîn , mal û milletan û tevlîkirina wana ji neqşeyê xwe yên fereh re.**

**Lê kedên zanyaran kom dibûn ji bo avakirinê û çêkirina tiştê ku hatibûn e armanckirin mîna dîtinek e şaristanî, hewilda timî ku mirov rabike, tevî ceng û pevçûnên rodayî**

**yên bandorê kiribûn li ser komên nirxên ên ku xelk û bêgunehan pê bawer bûn e , hevsaniyê ji xwe re kirin e rêbaz û jiyanê bi şiyarî xwestin e , bê desberdan û rapirî, di peyketina bi dû xweşiyan û hewildana wê bi çavekî birçî.**

**Û rewşa rojavayê Kurdistanê dema hêzên ricîma Sûrî jê vekişiya ,bibû sehneyekê ji zorenga heyînê re di navbera lawên welêt û komên tundirew de , ev girtinhevî bibû gengeşeyek e wêjeyî zanînî , zemînên bingehîn amade kiribû ji rabûna civaka Kurdistanî û pêşengiya wê di rûbirûbûna tundirewî û nexweşiyên takekesî yên jê hatin, rol hatin dabeş kirin bi awayekî xwegêrî, ji ber tundirewan hemî di yek xelekê de kom dibûn û di nav wana de yên ji cudabûnên ragehî destikekê bikar tînin ji bo gunekarîkirina sertbûnê.**

**Ev tişta li ser komên din pêktê , xelk bihaneyan her dibînin ji bo derî ji wan re vebe ji gurkirin û girtinheviyê re , bi hebûna hatinên diravî û gurkirina ragihandî , ev zoreng berdewam dibe ji bo gurkirina navçeyê û anîna çekan, û armanc jê serdestbûna li ser hatin û xêran, dûbare dabeşkirina rol û erdan e, ji ber nûkirina zorengên olî û dûbarekirina vejînbûna wê li paş wê bi xurtî Tirkî û Îranê radiwest e, ew berzkirina xewinên kujer di malgirtina navçeya a derdê temarek e zanînî dikşîne.**

**heta pêvajoya çekan berdewam be, wê qezenc pêkbên, bazirganên çengê tiştê dixwazin wê wergirin, divê bajar wêran bibin, divê mirov bimre, wisa beravêtin û alozî çêdibin, ji bo kûr û binyad bibin, ta beranberî wê**

**bangeşpêçên mafê mirovan û ewlehiya navdewletî rabin, giyanê ragehî û Islamnetewî cîgir bibin ji berjewendiya hejandina nirx û parçebûnên wêna , ta em pêlên derbideriyê bibînin bi encamê wêrankirina mal û xaniyan bi ser xelkên wêna ve, û çêwirandina mirovê destboş û dorpêçkirina wê , ta pariyê nên ji dest wî bê girtin.**

**Ev hemî li pêş çavê cîhana sivîlbûyî, tundirew ji her cihî ji deverên cîhanê ve tên , ji Tirkiyê re derbas dibin, û paseporta xwe li wir pencemor dikin, bi rêyên sînorên ên ji çûn û hatinên wana re vekirî derbas dibin, ev hemî ji bo qirkirina gelê Kurdistanê û jêbirina hebûna wî ji neqşeyê ve, ji berjewendiya bilindbûna Tirkî bi bihna xwe ya Islamî ve , ji ber çarenûsên ku bi hibirê hatibûye nivîsîn ti cih ji pêkanîna wê re nîne, di rewşek e lawaz wêranî û xirabiya rewşê dibîne, ta demukrasî bibe xewinek î sexte, mafên binpêbûyî bibe bangeşpêçek e li ber bê daliqandî, çêkirina pîlanan bi navê parastina penaberan tên e kirin, wan li malên yên xelkê wêna yên resen qewitandin e tên e bicîkirin, mîna Efrîn, Serê Kaniyê û Girê sipî, beranberî Xoteya Şamê, bi pîlanek e Rûs û Tirka ve, wisa jimarên qezencî tên e kirin yên girêdayî bi desthilatiyê ve li ser hesabê qurbaniyan, derxistina xelkê ji malên wana , bombebarankirina wan bi bermîlên teqemeniyê, dizî û talankirina mal û milkan, ta em destêkelkirina navdewletî aşkere bibînin ji berjewendiya kujerbûnê yê li ser hatiye lihevanîn, ji ber vê ev tişt li cem civakê de nefretek e bi rêk bû pêk û çavsoriyek e rêbazbûyî afirand, wê dibe ji kenarê tolê li kenara serhildana dirindî yê ji encamê bêdengiyek e bi dirûnên ji rêsandina pindepîrê ve lozbûyî encam dide.**

## 4- Encamên tunidyê û şopê wê li ser civakê:

**Karil Marks 1 çepandinê di naveroka xwe de dîtibû ji encamê nakokiyên di navbera pêdiviya bi pêşveçûna giştî ji mirov re û zikmaka civakê a sînordar ve (R133- li paş leylanan-Îyrêş Firom) ji ber ku mirin ji bona guhertinê di binemala xwe de vedigere ji wan nakokiyan ve, li ser civakê rewşên hevgarî û lawaziyê tivî dike, ji ber civak bi leylana guhertinê ve girêdayî ye.**

**Mirinek heye mirov di hundirê xwe de amade dike, eger bi êrîşkirina xwe li dijî din be an bergiriya xwe ji xwe re be li hemberî êrîşên din ên bi ricîma xwe yê taybet ve çekdarbûyî ye, di vir de em dikarin tundiya xwînî têbighin ku ew girtinheviyek e malgirtî ye, di nav xwe de baweriya takekes bi pakiya bîrdoziya xwe ve û mafê wî bi kuştina rikber ve ji aliyê din ve saz dibe, raman pêdiviya xwe bi dabançe û bombeyê ve heye ta bimîne, kêm nîşan ji vê yekê re tiştê ku me di dîrokê de dîtibû ji cengên pîroz û komên ên şerê hevdû dikin û bîrdoziyan diafirînin wek bihaneyan ji kuştin û dizî û talankirinê ve, em vê rewşa heyî têdighin, ku ew nemana hatinên heyînê bi bihaneyên pûç bi şîrovekirina maf û nirxê sincî ve girêdayî dibînin, cengên ji bo parastina nirxên xwedê an welêt, û li paş wêna destê gemşoyan dirêj dibin, yên mîtingerî û ferehbûnê kirin û şanişîn û şahînşahiyan ava kirin beranberî wêrankirina şanişîn û aboriyên din yên ew hebûn.**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**-Wêje li vir radiweste ji bo piştgiriya aliyê xirbûyî li hember yê li dijî xwe, û baroda bandorkirina rewanbêjî di vir de beşek e naye parçekirin ji şerê şîrovekirina maf û piştgiriya bawerî a bi ezberkirina pakiya rehî û bîrdozî ve têkilbûyî ye, ev yeka bi bermayê komê ve girêdayî ye.**

**-------------------------**

**1- Karil Marks: ji malbatek e ciho qata navîn jidayîk dibe, li bajarê Tirîl li Rayinland a Birûsî, û ew a duyem e ji malbatek e ku ji 8 zarokan pêktê, Hayinrîş Marks (1777-1838) ew parizgehek bû, ji malbatek e ji cihoyên Işkinaz bû, lê Marks ne oldar bû, tenê di rihê xwe de ciho bû, dapîrê wî oldarek î Holendî bû.**

**- Xemgînî û mirin şêwaza jiyanê di dema cengên hundirê de binav dikin, di cîgeha ne de bi ewle dibin, ti kes nikare jiyana xwe ewle bike, di çarçoveya rewşa amadebaşiya deronî de, em dibînin komên xelkê tevlîhev in, timî di rewşa amadebûnê de ne ji buyerek e dibe ku çêbe, dema sivîl dibin leşger (Rojavayê Kurdistanê û gefên Turkiyê) û hewayên civakê tên e guhertin, êdî bi aramiyê rehet nabin ,ji ber ku dibe aramî li paş wê bahozek, û merasîmên mirinê bûn e tiştekî asayî, merasîmên li ser vedenga stranên şoreşgerî ên xemgîn, mirin dibe ahengek û dîmenên mirinê dibin e rêyek e ji rikberiyê re û beşdarbûna di ceng û girtinheviyê de, ev dibe hewayek e bi cengê ve têkildar e , hevgirtin di riwê berekerê maf û yê hêrîşbirê li ser erdê, şêweyên bergiriyê rewayî berz dibin, gel li vir biryar didin ji bo bimînin û li nasnameya xwe xwedî derkevin, ta cîgirbûyî li hember pişaftin û nemanê bimînin, mirin ew baca jiyana bi rûmet e,û berzkirina vê yekê girîng e, dihêle mirov di hundirê xwe de bi vê bawer be, bi rêya wê pêdanê,**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

û dema xweşî pêkwere, aramî cîgir bibe, divê mirov hemî rikberî û zehmetiyên yên rastî ew rêya tev kelem û barên giran tên  derbas bike, ji ber azadî pêdiviya xwe bi perwerde û şênkirinek e ramanî û giyanî ve heye, ta takekes ji xwe re misoger bike ew rewana a kar û rabûnê desteber dike, ji ber nirxên şirûştî ne tenê gotinên tewrî ne li deryayên rewanbêjiyê de avjeniyê dikin, lê ew çawaniyek e jiyanî ye ji bo bi serxistina wê û berzkirina wê di jiyana rojan e de, mîna rewşekê ye, gumanî û nediyarkirinê napejirîne.

Û romana niştîmanî komên nirxên zanînî kurtas dike ta bibe mertalek e ase di riwê jevketin û tirsê yên ku ricîmên serkotker li hember cemaweran didomînin, ta wê ji rikberî û baweriyê rût bikin, ev yeka di riwê dayik û bavan de disekine, dema zarokên xwe, kezebên xwe dibînin,  ref du ref berve mirinê dikevin pêşbirkê, ji bo xelata şehîdbûnê wergrin ji bona welatê xewin (Kurdistan), herwiha ji bo pirsgirêka demukrasiyê wek hevyekek e babetî bi serkeve, ev yeka dikeve dewsa koletî û milhurîkirina civakî.

Û hewila cemawerên hêrsdar ji bona azadîbûna qatî  û wekheviyê ye, beranberî bijardeyekê destê xwe datîne li ser pere û desthilatê beranberê li rex bijardeyên yên birçîbûn, xizanî û nezanî wana dorpêç dikin, li kêlek binçavkirin ,mirin û girtina dev.

Û derçûna endamên laş bi encamê şer dibû buhayek e giran beranberî ewlekirina nirxê gorîdanê û derxistina wê wekî nirxek e rêzimanî û veguhêztina wê li rewşa jiyanî de.

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**- Çîroka girêdana zanyar bi heyîna xwe ya niştîmanî ve roman û destanên kevin ji dîrokê ve wêna diyar kirin, ewa gotûbêjek e endamî ye di felsefeyan de, ji ber vê yekê rehnîkirina li ser dibe pêkhata karê afrênerî û ji yê wergirtî re ajotinekê dide ji bo şiyarbûna giyanî a bi kêşeyên erdê ve girêdayî û bergiriya li ser cudabûn û taybetmendiya civakên pir reh, alî û nasname.**

**Şerê yê ku piştgiriya demukrasî û wekheviyê dike , cengek î mafdar û girîng e, çênabe bi tenê ji derveyî pêtbûyîna wêjeyî, hunerî û awazî ve, mirin sebaret evîndar dûrketina xwe ji welêt û yar e, ewa yek ji rengên mirinê ê pirtirîn neman e ji rewanê takekes re, ji ber nikare di penaberiyê de welatek î çêbike, tevî ku heyîn yek e û ceng yek e, lê ji erdnîgariyê re taybetiyek e rewanî heye li cem takekesê afrêner bi rengek î taybet ve, penaberî ewa hilkirina mirov e ji kokê xwe ve, hilkirina tovekî jiyankirî li erdek e nangîr, veguhêztina wê li cihek î din ji derveyî welêt û hewayê wê, dibe ku mezin bibe û dibe ku mezin jî nebe, dibe ku tama wê cuda be eger şîn bibe, ev jî rave dike hebûna hinek çandiniyan li deverekê û nebûna wan li deverek e din, ev yeka li ser hestiyaran jî pêktê, ne merc e ku ew ji derveyî cîgehên xwe ve berheman biafirînin tevî ku ew dever Ewrûpa be wekî mînak, ji ber ew cihek e ewle û piştgir e ji afirinadina zanyarê rojhilatnavînî, yê wê nikaribe jêre rehetiya rewanî pêkbîne, herwiha rehetiya civakî, ji ber takekes li vir di cihekî biyan de dijî ne li cihê xwe, wisa em dibînin şerê hundirî tirsek e xuristî bi xwe re tîne, ji ber koçberî dibe bijara gelekan li rex mirinê di sengerên şer de,**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**ji destçûna bêhtirî 11 hezar şehîd di şerên lawên rojavayê Kurdistanê li hember rêxistina dewleta Islamî yê ku Turkiya û Qeter piştgiriya wê dikirin, ev hijamr lêdan e, ji bilî koçberiya berve bakûrê dewlemend (Ewrûpa) herwiha dewletên cîran bi taybet ve herêma Kurdistanê , jimarnameya vê cenga hundirî ji 8 sala giran û bi êş e ji derveyî wêraniya dilêma jêrîn ji ber lêdana bajaran,dawiya wê dagirkirina Efrîn 1 û gundewarên wêna , û Girê sipî 2 û Serê kaniyê3 ji aliyê dagirkeriya Tirkî û çeteyên bi serve , yên navê xwe kiribûn dijberê Sûrî bi pergalê xwe yê Ixwanî , û encamên wê wêraniyê li ser deroniyê û jiyana xuristî di civakê de , cîgehek e ne aram durist kiribûn, cîgehek e tije laş û bihna xwînê, mayîn û malên wêranbûyî, avahiyên yên dibûn e navendên nîşançiyan û dîwarên jihevketî yên dibûn e tunêlên derbasbûna çekdaran ji kenarek li kenarek î .**

**Cîgehek e tev nexweşî ye, ev yeka vedigere ji rewşa têkçûna dûbarebûyî ve di nav kêlîk û kêlîkekê de, amadebaşiya deronî a timî ji bazdanê re li ber dergehan e, ji ber gefdana bi operesiyonek e Tirkî nêzik, pêşerojek e nepenî û aloziyek e mirovî ye diyar e li pêş çav û kamîreyên cîhanê.**

**-------------------------------**

**1- Efrîn: bajarek î kurdî ye li rojavayê kurdistanê ye, li bakûrê rojavayê Sûrî dikeve, û beşek e ji parizgeha Helebê ye.**
**2- Girê Sipî: bajarek î kurdî ye nêzik Kobanî ye, li rojavayê kurdsitanê bakûrê sûrî ye.**
**3- Serê Kaniyê , bajarek î kurdî ye, beşek e ji herêma cizîrê ye li rojavayê Kurdistanê bakûrê Sûrî.**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Baca berferehbûn û zeftkirina li ser hatinan bi sedema kontirolkirina navendî li ser erdê,ew koçberkirina hezaran û bicihkirina kesên din durist kiribû, ligel guhertina xelkên cîgehî bi kesên nûhatî ve, helbet sûda vê yekê vedigere li ser aliya yên ku aloziyên xwe yên hundirî derdixîne, ev ceng ji aliyê dewletên kêlek Sûrî û bi rêya xelkên wêna yên cîgehî têne rêvebirkirin, ên hatibûne xapandin, li kêlek hatina biyanan ji her derê ve, wekî ku di dema cenga Ispanî a navxweyî de sala 1936-1939 qewimî , Hiltler 1 di wê çaxê de ji Ispaniyayê kiribû meydanekî ji bo bikaranîna çekên xwe wek ku li Sûrî diqewime, ji ber ku bazara çekan ranewestiya , jêderên hatina wan nesekinî, eger ji aliyê Rûsiya be an Îran an Elmaniya an Emerêka, an wek ku li Yonanê qewimî 1944-1949 , dema ku Elmanya û Ingêltra xelkê Yonanî bikaranîn û cenga navxweyî hezarên qurbaniyan çinandin,ji ber ku raman û bîrdozî bandor û girîngiya xwe winda dikin, eger rewşên tarî newin û qebsûna wê venebin, ta pê xelkê bi rêya wêna giyanên xwe vêxînin û moralên xwe şiyar bikin, axaftina li ser bîrdoziya zanyarî bi wate ye dema xelkên zêde ziyan ji cengê dîtin e wê armanc bikin, li vir dibe ku huner xwe bi afirandina ramanî ve zelal bike û balindeyên ramanê ji derveyî refên xwe difirin, ta şiyarbûna ronavêj bigre û yê wek xwe çêbike,ta bi rêya wê hurgiliyên xema mirovî bi rêk û pêk bibeû metirsiyan ji holê rabike û zimanê ramanê bi hêsanî hildgre, rêbaza deronî li vir gerentî dide têgihiştina xuristiya takekesî û meyla wê ji hestiyarî û tenahiyê re, dema çi rodanê têde xelk dimrin, rengê mirov têde winda dibe, rûtalî henas dadigre, nivîsa deronî gavên yekemîn davêje ji bo nasîna hundir û xem û nepenî di nav xwe de**

**bihêle, li ser çawaniya dan û standinê bi bûyerê re dema diqewime û pêdiviye baweriyek e felsefî li hember pirojeya Islama siyasî bi layanên wê yên ragehî, ev bîrdoziya ji ramanê rêxistinek e kurdistanî ye, pispor e bi girtinheviya heyînî ji bo kurdistanê û navê wê netewa demukratîk e , yê Ocelan 2 danîbû, li gor tewriya Markîzmê diyar bibû, tiştê ku olperest dihêle xwe biteqîne û serên dijminê xwe bibire , destê xwe deyne li ser jinên wana ewa bandora wijdan û nihadiya hêrs û zayendê ne, herdû tişt wî dihêlin ku mîna gayekî be li pey cilê sor bikeve , ji ber paşxistina hiş û temirandina wêna wateya wê meş bê çav û peyketina bi dû zorkariya bê berketin e bi ziyanê kuştinê û ev tişt pêdiviya sazkerên mirinê bi kesên bêhiş ji bo bibin êzing ji berjewendî û sûdên wanî dûr şîrove dike .**

---

**1- Edolf Hitler: 20Nîsan 1889- 30Nîsan 1945, fermandarê Elmaniya ya nazî ye.**
**2-Ebdûlah Ocelan bi navê Apo tê naskirin, 4 Nîsanê Orfe- 1948, dameznerê Partiya Karkerên Kurdistan e sala 1978.**

**- Mirina ji cengê encam dideew bêhtir giran û bi ziyan e li ser deroniya civakî de, hundir talan dike, giyanan binpê dike û wana li ser sehneyên bêdengî û nalînê datîne, wê bi cefayên demborîn û rodanên kevin ve dadigre, êşên ku bi zehmet têne derbaskirin sihên xwe bi giranî datîne, mil pê jan dide, û kûrahî dibe şikeftek e koçbûyî, ji bilî bi sîberên miriyan û bangên wanî diyarbûyî di hizr de yên di hundir de cîgir bû ne,ji ber ku ol mîna sihwanek e giştî û lihevhatî ye, li dor wê xelk bi awayekî aştiyan e û bê sertî dizîvirin, rewrewk û efsan di hişên xelkê de cîgir dibin, yên ku demê**

**wan nebû bi sedema rewşên wana ku bixwînin û lêkolînê bikin taku henasê xwe ji zanînê re amade bikin , tiştekî xuristî ye ku ol bala wan bikşîne bi awayekî xwezayî , bê ku baş pirtûkê wê bixwînin, lê nêzî xwedê dibin bi awayekî hêsan û bê rêbaz, ne meyldarê sertbûnê ne, kêşeya wan bi kesên din re nîne, dikarin bi lez fêr bibin, ji ber ew bi awayekî bîrdozî siyasî nêzî baweriyên xwe yên xuristî nabin, bervajî kesên hanî li cîgehên sert dijîn, ol di wan de bi rengekî sert mezin bû, nikarîbûn bi kesên din re bi awayekî aram jiyan bikin , ev nîşan dide çawa ku Daiş bi hêsanî dikarîbû xwe bi cih bike di hinek deverên ku têde pêkhatiya Ereb dijîn, ji ber ku hembêzkirinek e gelerî ji wana re di wir de hebû û bingehek e dijminatî wan dihêle ku karibin sertiyê vexwin û ramana Qaîde yê çekdarî wergirin, di wir de cudahiyek heye di navbera oldariya kurdistanî û oldariya Erebî, ji ber ku a yekê ne hatiye îdiyolojîkirin û a din sert e îdiyolojîk e ketibûye di kiryar de, cudabûna cîgehê nîşan dide , ta ev olbûna bê belavkirin li ser bijardeyekê şerê tundirewiyê dike û a din wê berhemdan û hembêzkirin dike, lê tundirewiya olî bê layan e û hembêzkirinek e rastîn jêre nîne, ji ber pişta xwe li ser belavkirina kuştin û pîrozkirina wê datîne, zorkirina xelkê ji bo dîmena jêkirina serî û qutkirina endaman û xaçkirinê tameşe bikin, ta tirs û bizdan belav bibe ligel xwîn û fêrkirina xelkê ji tirsê re bi awayek î rasterast û tal ve, ji ber ku ew destikek e baştirîn e ji bo celewkirina xelkê û zorkirina wan li ser stûxwariyê heta demekê , ji ber ku teror bandora xwe ji vaca Islama Siyasî a dîrokî distîne, ev ji serdemên cuda derketin, siyasetvanên desthilatdar bi hevgirtina xwe bi  mêrên aboriyê ve vê yekê pêkanîn mîna**

rêyek e ji rodankirina aloziyan  re û bikaranîn deqên olî ji bo armancên xwe, ta ku hişmendiya takekesî têxin e di girtîgehê de û lê bêdengiyê deynin bi zor û fişarê ve, ta bibe ew takekes beşekî beşdar ji pêvajoya terorê re, herwisa ev girtinhevî tê afirandin, ji bo mezinan sûdê jê bigrin, yên xwestin ku rojhilata navîn bibe meydana zoreng û pêşbirkê di navbera Ros,Emrîkî,Tirk û Îranî de, wisa cîhana sivîl tiştekî negirtibû ji cengên berê ,yên têde milyonên mirov jiyana xwe ji dest dabûn, gelek avahiyên welatan têkçûbûn, û milyonên din jî mişext dibûn, şerên dewsa hinekan xerabtirîn şer in di derbarê mirovî de, herwisa xuristiya zorengê û alavên wêna tê guhertin dema civak fêrî asta pêdiviyê xwe bibe bi berzbûna   bi qayimî li ser sehneya buyeran.

Çêkirina rewşek e baştir pêvajoyek e bi aloz û zehmet e, pêdiviya xwe bi yekgirtin û beşdarkirina çarenûsî heye di berzbûna bi hêz beranberî êrîşa dirindî yê rasterast, bi diyarkirin hevgirtina du hêzan yek kevin e di zikê dîrokê de ye û armanca wê dûbarekirina dîroka xwedîtî di dema niha de û bi rêya tewankirinê, a din bi nirxên jiyana aştiyan e û evîna jiyanê ve girêdayî ye,  hilma rizgarkirinê ji koletiyê tê xuyanîkirin bi nirxên vebûna civakî li ser hevdû di çaxê cenga hundirî yê bi hevgirêdana takesan li dor çarenûsên xwe ve û parastina wêna berz dibe, yekem nîşanên berzbûnê li pêş diyar dibe bi rêya derketinê li ser ricîma dewleta serkotker, ev derketina bi dîmena serhildêr ve xuya dibe , lê ne bi rengekî hêsan û bê ser û ber e , lê bi rêyek e rêxistinbûyî û dikare ku tevgerê bixe di rewşek e bala û zana de, redkirina tewriya fermandarê  tekekesî an

**desthilatdariya gelemperatî a bê dunde , yê ji bilî awante û wêranî tiştekî bi dû xwe ne anî, wisa serpêhatiyên mirovî radibin bin siha girtinheviyê ta ku komên ên bi guhertinê bawermend in bibin bîngeha çaksaziyê, ev yeka bê piştrastkirin bi rêya jêbirina tirsê ji dilê civakê ve û çandina baweriyê di henasê takekes de diyar dibe, dîtina wê wek bineyek e rast tê li ser piştpêbestkirin ji guhertin û avakirinê re.**

**Û bê guman ku serhildan di nav xwe de qonaxên binkeftin û destkeftiyan hembêz dike, hemî ji bona civakê ne, eger çiqas bihaneyek e giran bide ji bo fêrî girtinheviyê bi hêzên sertbûn û paşveçûnê re bibe, divê têgeha şoreşgerîbûnê bê nûkirin, ji bo nebe destikekê ji desthilatiyek e metirsîdar re, ji ber ku piraniyên sosialîstan yên benîşê têgeha şoreşê cûtibûn , li ser pariyê nanê gelan hilkişiyan û xewinên wê bi azadî û demukrasîbûnê dizîn, bi encamê jî xwediyên şoreşê encûmana rêvebirina şoreşê (Seddam Husên 1) berhem dan, û piştî lêdanên leşgerî hatin desthilatê (Hafiz El Esed 2) û zanyaran işkence kirin, û cemaweran kiribûn e di tenahiyek e dijwar de (Qezafî 3).**

**Paleya sosialîzma şoreşgerî di rojhilata navîn de pepûk e, ji ber vê yekê em dibînin ku rojavayê kurdistanê bi gelek sancan ve derbas dibe, jê ew metirsiya ji gefdana derveyî , herwiha parçebûna hundirî a Kurdistanî, di navberê ew şepêla sosialîzm , û şepêla yê ketî bin biryarên istixbaratên Tirkî , em ti rehnî di asoyê de nabînin, û dibe ku fişara navdewletî a Ewrûpî Emrîkî serpêhatiya Rojavayê**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Kurdistanê cîgir bike eger li ser vê yekê li hev bikin , wek ku li başûr çêkirin, lê ev yeka wê bi zehmetiyên herêmî derbas bibin,tevî gewrtirîn şoreş**
**---------------------**

**1- Seddam Husên: 28Nîsanê1937- 30 berçel e2006 serokê çarem ya komara Îraqê.**
**2-Hafiz Elesed: 06.10.1930 – 10-06.2000 serokê berê ya Komara Erebî Sûrî .**
**3- Moemer Muhemed Ebdilselam Elqezafî: 07.06.1942 – 20.10.2011, bi navê Egît Elqezafî tê naskirin, fermandarê Lîbiya bû bêhtirî 42 sal.**

**berz dibe bi wêrankirina wêneya xwedayê xwînî di rêxistina Dewleta Islamî de herwiha bi rêya rûbirûbûna herdû cîgehên Islama siyasî bi herdû baskên wêna Sinî û Şîeî yên tên e naskirin bi dewleta Îran û Turkiya ve, ev yeka nakeve tenê li ser milê kurdan, tevî ku ew serê rima hevbendiya navnetewî 1 ne li Rojhilata navîn, lê gellên deverê ew jî di dîrokê de derdê Osmanî 2 û Sefewiyan 3 kişandibûn, darê zorê ji wan xwarin e, niha jî neynûkên xwe di her cihî de berdidin, di hemî xewinên civakê û xwestekê wêna bi dîtina pergalek e baş ji jiyana xwe re, wê ji sitemkariya netewî rizgar bike û meşa bê rawestandin destpê dike ji bo pêkanîna vê armancê.**

**Guhertina cîhanê û bûyîna wê mîna gundekî biçûk bi saya zîrekbûna zanyar bû a teknîkî, ev hîşt ku her tişt bê dîtin bi rêya kamîreyê û ajansên ragihandinê a cur bi cur, bê guman ev yeka tê kirin bi çêbûna şoreşên hişmendî û pêngavên cuda, ji ber ku ti rê ji pergalên gelemperatî nîne ji bilî ku wê bişkên li pêş vebûna cîhanê bi ser hevdû ve.**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Zanyar cîhangêrî ne di giyan û dîtinê xwe ji jiyanê re, û rêxistinê wan serdemek e nû ji guhertina neqşe û têgehan ve diafirîne, lê ew li ser rêya rast in di wêrankirina peykera partîtiya gelemperatî û rawestandina harbûna sermedariya bê sînor, tevî ku cîhan gundekî biçûk e, lê tim hinek hene ji derveyî refê wê fîxan didin, bi sêwirê xwe yên dîrokî ve diçin ji bo dîtina şahînşahiyên olî û a din netewî,bê ku guhên xwe bidin bi rewşa a ku meyladarî ewlehiyê û jiyana baş dibe, wisa hestên nijadperest li ser ragihandinê dihêvojin û gotarbêja nefretê vejîn dikin, lê oldarên fetwan zêde mêjiyên zaroyan  û bijardeyên xizan û bêkar dişuştin, û wan li ser şerên har û xwînî dehf didan, li rex belavbûna firotina çekan ji aliyê dewletên mezin mîna Rosiya, Emerê ka, û Elmanya, bê ku gerestrka ku têde milyonên mirovan dijîn  ji wana re xem be, ev ji encamên bê pirsyariya sincî li cem wan dewletan ne bi bazarkirina wêraniyê û sûdwergirtina ji aloziyên gellan ji bo çavkariya xwe yê qezencî têr bikin.**
**Û koletî ne narvîn e , lê ewa rikberiyek e di riwê mirovê zanyar de disekine, yê afirêner û bi hebûnê ve girêdayî, bi serhişkiya xwe yê ramanî û derbaskirina xwe ji bendan re, hebûna xwe meyze dike bi awayekî cuda û bi bandor di çarçoveya warê civakî de, ew bawerî bi zanîn û evînê û bilindkirina henasê jêre vedigere, ev yeka wê dihêle ku dûrî windabûn û koçberiyê be.**

----------------------

**1- Hevbendiya navdewletî : çêkirinek e navnetewî Ewrûpî ye bi rêvebirina Eyaletên yekgirtî a Emrîkî ji bo şerê rêxistina Dewleta Islamî.**
**2- Dewleta Osmanî: dewletek e Islamî ye, Osman kurê Ertixil damezrandibû, û nêzî 600 salî berdewam kiribû, ji 27.07.1299 heta 29.10.1923 ve .**

**3- Dewleta Sefewî: Dewletek e Islamî ye Şîeî ye li Îranê hatibû damezrandin, û xwe li rojhilat û rojava de fereh kiribû bi aliyê Xuresan,Efxanistan, Ezrebîcan,Îraq , Diyar bekir, û welatên Kerc di bakûr de, fermandarî li Îranî kiribû di navbera 1501 heta 1763 de.**

**Û serkeftin li ser rewrewk û koletiyê dibe mîna qonaxa rehetbûnek e tam, dikare bi rêya wê ew jîndarê bi bandor rehet tevbigere, û li hember demên zehmet raweste ,ev yeka wî dihêle ku pêşkeve û zehmetiyan derbas bike, bê ku dûrî sincên girêdayî bi zanînê bikeve,ji ber nirx bostekî kûr û fereh e di hundirê henasê mirovî de, wî dihêle ku karibe erkên xwe bi serî bike, ji bo ronakbîrî û geşepêdana kûr ji yên din re ên hewil didan ku ji dîlbûna ezeziyê rizgar bibin, bê guman ku ricîma siyasî a sitemkar ew durengî,pepûkî û nehezê kiribû rengên ên civakê reşepêş dikirin, ew civaka yê ku ji jiyana baş û xweşiya armancbûyî hez dike, bi vî awayî serkeftina rastîn di nav bedewbûnan e de, ta bibe beşek î ji kiyanê takekesê çalak û şopedar ve, wisa aso hêdî hêdî li ser pêvajoya afirandin û têgihiştina jiyanê vedibin, ji ber ku nediyarbûna şaristaniyê û pêşbirka zanyarî bi sedema peyketina qezencî û helweşîna nirxî ye,ew banga hişmendiya mirovî hîşt ku ava bibe beranberî berjewendiya dirindiya sermedarî a hişk, yê nîşanên jiyana civakî sersima kiribû û hîştibû li hember gefê jihevketin û parçekirinê bisekine, ta bibe êzingên çetîtî ji dewletên herêmî re.**

**Sehneya mirovî a Kurdistanî bi awanteya ciyawazîbûyî ve dagirtî ye, tevî hebûna şepêla avabûn û gorîdanê, yê hewil dide bi civakê ve biçe ji bo pêkanîna mêzekirinên wê ji jiyana baştirîn re, tevî narînbenda binkeftiyan yên bi**

**axaftinê serkeftî ne, bi sloganan moralan bilind kirin e, ji ber vê em dibînin ku şoreş li cîhanê me çêçikkerê sitemkar û gendelan e.**

**bijara nebûniyan ku mîna darên bêber bimrin, bibin e kelem di riwê guhertin û ramanên nû de ên li dijî ramanên wanî kevin û bijareyên wanî kevinşopî derdikevin.**

**Nexşe li navçeyê dûber tên e nîgarkirin û gerege lêbûna demugrafî wisa bê guhertin, ji bo jiyan têkçûyî be, civak neçar e ku bergiriyê bike û xwe jî rêxistin bike, li hember pêlên guhertina demugrafî, heyîna dijminatiyek e herêmî diyar ji gelê Kurdistanê re, ev wê li ser yekgirtinê datîne, bi heyîna serwerên rewanî bernameyên xwe yên bîrdozî datînin li ser hesabê ewlehiya Kurdistanê a stratîcîk, lêbelê şerê li hember rêxistina tundirew, bijareya rûbirûbûna meydanî pêş dabû dewsa mijolbûna bi rêk û pêkbûna mala hundirî, li ber derbasbûna komên tundirew li hundir bajêr, yên şûrên xwe toj kiribûn ji bo jêkirina seriyan bê dilovanî, li her qurzîk, tax û gundekê, çi rastî wan dihatin wêran dikirin, di wan rewşan de , xelk bi heman qat û temenên xwe amade dibin ji bo rûbirûbûna wê cenga har, bi hezaran xwe ji bo vê êrîşa bêbext amadekirin, hin din li ser axa xwe mabûn bê ku ji welêt derkevin, hinek jî çek hilgirtin û tevlî hêzên şerker bûn ev yeka dibû ji wan re erkek e pîroz û pêgirtin bi nihada hebûn û bixudankirinê li ser xelkê misoger dike ku beşdarî şerê bergiriyê bibin, di wê rewşê de tiştekî di asoyê de xuya nabe ji bilî tiştê girêdayî bi parastina jiyan , gerentiya heyîn û bixudankirinê.**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**Herdû alî hevdû dibînin, di hundirê xwe de bîrdoziyekê radikin, yek jê dîrokî û hewşvedatî ye , di ol de û dûbarekirina vejînkirina wê bi awayek î siyasî wekî erkek e misoger ji xwe re dibîne û pêdivî ye ku şerê her kesekî dijberiya wê dike bike, û a din ji bo erd, û hebûna a di bin gefa tunekirin û nemanê de ji dîrokê ve maye şer dike, ev tişt bi hebûna kurdan ve wek pêkhatiyek e kevin li rojhilata navîn girêdayî ye.**

**Û saxkirina leşgeriya Islamî ango berzkirina Islama cîhadî , ji ber ku ew destikek e baştir e ji bo tevlîhevkirina kaxezan û zeftkirina hatinên avî û niftî , ji ber ku Osmaniya Erdoxanî hatibû cîgirkirin piştî diyarkirina rêxistina Dewleta Islamî 1 û bi lez fereh û belav bû, herwiha dijberiya Sûrî bû pariyek rehet ji Islama Erdoxanî re yê li ser hatibû danîn, herwiha Îran sûdê ji vê yekê girt û pêkhatiya Sinî reş kir û wê bi awayekî ragehî armanc kir û bi rengekî zindî bi rêya Daişê yê Şîe an hîmanên ricîma Sûrî armanc nekir lê bêhtir berî xwe dabû Erebên Sinî û Kurdan, berî vê rêxistinê dabûn deverên Kurdî li başûr (Îraq) û rojavayê Kurdistanê (Sûrî) herwiha armanckirina Kurdên Êzîdî 2 .**

**Û wisa Daiş wek alavek e bingehîn diyar bû ji bo nîgarkirina nîşanên rojhilata navîn bi rabûnek e Kurdistanî bi seyr, wekî berhelistek e bîngehîn û hevalbendek î xurt ji hevbendiya navdewletî re di operesiyonên xwe de li hember wan, piştî şerê rizgarkirina Kobanî bi taybet ve.**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**Van neqşeyan bi xwînê tên e nîgarkirin , bê ku ji lîstikvanê n mezin re wêraniya bajaran û ji destçûna bijareya xort xem be, wisa bidawîkirina şerê Daiş beranberî zêdetirî 11 hezar şehîd, buhayê Efrînê Xoteya 1 şamê bû, û Serê Kaniyê û Girê Sipî beranberî Idlibê bû, û wisa navçeyên desthilatiyê hatibûn e parvekirin , û pêdivî ye li ser lîstikvanên biçûk ku wê sînaroyê bê gengeş e pêkbînin.**

**------------------**

**1- Rêxistina Dewleta Islamî an Dewleta Islamî li Îraq û Şamê, tê naskirin bi Daiş , ew rêxistinek î çekdar e bi ramana komên selefî û cîhadî ve girêdayî ye, û endamên wêna li gor baweriya xwe dûbarekirina xîlafeta Islamî û pêkanîna şerîetê armanc dikin.**

**2- Êzîdî an Êzdiyatî: ew komek e rehî olî Kurdî ye, bi kokê xwe ve arî ye û zarava Kurmancî diaxive, li Kurdistanê dijî.**

**Û dewletên mezin lîstoka xwe dilîzin bi rêya hêzên cîgehî yên şer dewsa wana dikin, armanc jê destkeftî û berbijariyan li dewletek e çêkirî mîna Sûrî, ew bû meydanekî ji dawîkirina jimaryariyan, ew pêşbirka navdewletî tenê li dewletên westiyayî parçebûyî pêktên, ev ferehiya Tirkî – Îranî li ser pêşbirkek e rabûyî di navbera wana de aşkere dibe, Rosiya û Emerêka vê girtinheviyê bi rêve dibin, bi rêya wan diyardeya niştecîbûn û revê ji dojeha qewimî ve mezin dibe.**

**Û aloziyên desthilatdarî êdî diyar bûn e, heriftina aborî mîna reştariyek e tirsnak wekî encemek e aşkere diyar dibe (Yaseya Qeyser) , dibe destika bi dawîkirina bi cih anîna**

**pîlanên navdewletî yê dibe dawiya rê piştî parçekirina civakê û duristkirina navberên kûr di nav de, piştî nimûneya dewleta saloxgêrî hûrhûrîkirin û herifandin çêbû, li ser civaka pelixî eger xwest bimîne ku li hember gendelî û sitmekariya mafiyawî raweste, yê ku desthilatên yên - ji xirakirina dewletê û helweşîna wê derketî-
kargêr dike.**

**Em qurbanên mirovî dibînin  ku zêde dibin û der bi derî berdewam dibe, bêzariya aborî mîna reştariyek e tirsnak diyar dibe  û peyketin bi dû zorengê dibe tiştek î naye rawestandin, ji ber ku dewletên aborî nikarin li pêş çavkarî û xwestina xwe ji berferehkirina desthilatiyên xwe bisekinin, ji ber vê yekê kî agir pêxe wê nikaribe vemrîne, di çaxê ew bixwaze, ji ber vê yekê bû erk li ser dewletên yên awante aloziyan xwedî dikin û li ser rêya xwe de biçin û bi rolên xwe bê veger  bilîzin, berketina Kurdistanî bi kêşeyê xwe ve ji demê buhirtî  qayimtir bû, netewan ranabin eger rikberiyên ku li dijî hebûna wana tê derbaskirin nekin, ji bona ku vejînbûn para wan be divê bi harbûn bergiriyê li ser pîroziyên xwe bikin û cihek î bilind bigrin di goçeriya zorengê ji bo baştirînê .**

**Ramandin di navika zorenga deronî de  ku di henasê mirovî de cih digre, me dihêle ku em zorenga nakokiyên girêdayî bi rewş û huş  û sewda ve meyze bikin, ji bilî ramanên yên di hiş de tevdigerin,  ev hemî  nîgara rêya takekes û guhertinên wî diyar dikin, dema kelem li her der ê dimîne, têgihiştina kiryar dikeve di çarçoveya reweştên y**

**ên ku ji cîgehekê ve dertên û dan û standina takekes bi derdorê xwe re, bi paldana li ser komek bandorkirinên civakî.**

**Şerê li hember terorê karekî zehmet e, metirsî, bive û ziyana xwe li ser hatin û reftara jorîn û jêrîn a civakê dike , dema em civaka Kurdistanî meyze dikin, em wê dibînin westiyayî ye bi kiryarê alavên qirkirina rewşenbîrî û gewdehî ,yê li ser hatibû meşandin ji aliyê desthilatiyên netewî a serkotker, li ser milê wê erkek ji xwe**

**----------------**

**1- Xoteya Şamê: ew xelkên ku ji xoteyê derketin û li Efrînê hatin bicîkirin, bi pîlanek e Tirkî – Rosî.**

**mezintir heye , ewa rûbirûbûna rêxistina dewleta Islamî, çendîn kanîbûna wê rêxistinê li dan û standina bi hişmendiyan re bi gotarek e dîrokî Islamî dihêle cemawerên tijebûyî bi derziyên olbûna kevinşopî ve bandor bibin , wê bangê bibersivînin, di hundirê xwe de kîn û dînbûnê kom bikin, wekî ku Armando Tornû 1 di pirtûka xwe de bi ser navê sincîbûna zordariyê R19 got:**

**( Mirov ew lawirê tek e ji bilî mişk û hinek kêzên civakî, lawê zayendê xwe bi rêk û pêk dikuje, li gor nerînên hinek Interbiyolciyan, mirov bû dilogerê hemî ajalan, ji ber ew kujer e berî her tiştî .)**

**Em li vir aliyek din dibînin ji danasînek e ne nû re, mirov pê tê naskirin ,ewa bi bêhêvî û zikreşî ve hatiye têr kirin,**

**dixwaze bibe li ser derdora civakî bi çi awayî serwerek , ji ber vê desthilatdar ji zordarî û bîrdoziyê du destik dibîne ji bo desteserkirin û avakirina ricîmek e taybet ji xwe re, tê naskirin ku ne lêborînhez e dema dighe armanca xwe û şerê hemî dengên ku ji nerîn û aliyên xwe cuda ve dike, ji ber li gor nerîna xwe ew deng kirêt dibîne, tiştê misogeriya hebûna deverên zordariyê nîşan dide  ta dewletên yên çekan dişînin  ji vê yekê sûdê wergirin, guhê xwe nadin nirx û sinc lêbelê tenê qezenca diravî , ti wate ji mirovahiyê re nîne ji derveyî wêjeyên ku zayar bi derbasbûna serdeman afirandin e , herku zanyarê ramanyar, an hunermend, an çêker xwestibû pir di navbera çand û netewan de ava bike, desthilatiyên serkotker hatin û van pir hilweşandin, rewanê şaristaniyê a di hebûnê de heyî têkdibirin, yekem şop ji afirandinê hatibû diyarkirin bi endeziyariya hebûnê yê li pêş çavên me diyar  e û sîstema a ku di jîndaran de cîgirbûyî.**

## 5-Diyalektîka evîn û cenga Kurdistanî:

**Hatina Pêşmerga 1 taku bi hêzên parastina gel 2 re hemahengiyê bikin nîşanek î ji nirxê yekîtiya Kurdistanî çê kiribû, û hatibû duristkirin dema li hember rêxistina Dewleta Islamî sekînin, dema ew rêxistin xwest Kobanî 3 zeft bike, û têgihiştina deroniya civakî û çawaniya tê gihiştina wê ji rêveberkirina aloziyên mirovî re û naskirina wê bi rahijtina zorbedî û bobelatên yên ji cengên serkarîtiy**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**ê ve tên, ew ceng mîna kelem û rikberiyekê radiweste li pê ş jiyana rojan e, û dihêle mirov bêhtir bi mirinê ve birame, ji ber ji destçûna nêzikan ve bendek heye, bi berketina nirx ê jiyan û jiyankirinê ve girêdayî ye, û herwiha nirxê tê gihiştina ligel mirovan ,û tiştê ku di heyînê de heyî mîna rasthatin û nişkaviyan, guhertina çarenûs û hişmendî û vebûna hizran.**

**------------------**

**Armando Tornû : 23 Avdarê- 20 Avdarê 1992 sozbiryarkerek î wênekêş e Îtalî ye û şêwekarek î karîketêrist e û şêwekarê nîgarên bi liv û tevger , li Rornû hatî ye jiyanê.**

**Ji ber ku bûyer nerînê bi derbasbûna demê ve saz dike ,herçi kelem û zehmetî tên e mirov jî wî berve ramanbûn û mijolbûnê dibin, herwiha tirs derbasî hundirê wî dibe,ji bilî tirs,ew evîna a ku piştrast dike berxwedanîbûnê û dûrxistina biveyê û dayîna ked ji bo berketina rêya jiyanê, li vir mêjîşuştin diyar dibe û dagirtina mêjiyê pûç bi bandorên gotara olî a tundirew çalak dibe, ta takekes piştî wê mîna dirindeyekî bi pergalek î mîna mirovan derkeve , li gor wê pergalê gelek nîşan hene ji ferehbûna bedkariyê û bi tundirewiyê ve tije bûn e, mîna dewar û lawirên çolan tên e rêvebirin ta bibin alavekî ji bo guhertina neqşe û ricîman û sehneyekê ji bidawîkirina jimarkirina mezinan re .**

**Ev ceng evîn diperitî ne, û evîndaran cerg şewitî dihêle, pişt re wana dike firtik, ji civakê re dibin helbest,stran û roman, ji ber ewên dîrokcî bi hemî kîn û çekên xwe yên jehrkirî ji rewanbêjî û têgihiştin ji deqa pîrozbûnê re bi**

**tîpdarî Quranê li gor berketin û aliyê xwe pêkanîn, perjeng û bizdanê li derê ku berî xwe dabûnê belav kirin , em meyze dikin ku tundirewî hewil dide wateya hevjiyanê, hestbûna bi aşîbûnê li cem civak û jiyanê bikuj e.**

**Ev olperestî di çarçoveya axaftina hinek çekdarên kurd li ser tê gengeşekirin, li şerê Kobanî, dema çekdarên Daiş ji tlilîliyê jinan bazdidin , ji ber di baweriya wan de wê nekevin buhiştê eger bi qurşîna jinekê ve bêne kuştin,ev yeka asta têgihiştinê li cem cîhadiyan aşkere dike, di vir de ramanê bergiriyê ji ramanê ku ji tariya dîroka dirindî ve derketî ji hevdû ve cuda dibe, û siyaset dibe destikek î ji derxistina zordariyê û gefdana mirovên dilaram.**

**Ev paşmaviya olî siyasî bi dewlemendî û hêza xwe yê rewanbêjî ve navdar e û xistina wê di gotara a ji ajotinê li ser zordariyê ve pêkahtî ye, li ser rewanbêjiya a başiyê maldigrê, berî xwe dide cengê ,li ser bîngeha ku ê şer dike ew nûnerê xwedê ye û hatî ye ewlekar ji weşana rêbazên w êna yên ku di Quranê de heyî, ne tenê di pirtûkê de lêbelê mezinên oldaran dibînin bi cîhad û pêkanîna ayînetê bi zor ê ve destikek e pîroz e divê hebe ji bo weşana Islamê li ser r êbaza pêşiyan, yên gîhiştin gelek deveran û talaniyên xwe bi vekirinê ve binav kirin.**

---------------

**1- Pêşmerge ango hêzên Pêşmerge yê kurdî, hêzên leşgerî ne, ev têgeh li cem kurdan şervnên kurd nîşan dide, û wateya wê ya tîpdarî (yên di rûbirûbûna mirinê tên)**

**2- Yekîniyên parastina gel YPG ewan yekîniyên çakdar kurdî ne, û dibin movikê hêzên Sûriya demukratî HSD.**
**3- Kobanî û bi Erebî Eyn el Ereb, bajarek î kurda ye li bakûrê Sûrî ye - rojavay ê Kurdistanê.**

**Û girêdana pîrozbûn bi sertbûnê ve ew bi xwe zikmaka bedkariyê ye û ew baweriya kor hişmendiyê xistibû girtîgehê, xîlkê tariya xwînî û temara giran lêkiribû, bergirî li nirxên hebûnê û hevjiyana civakî karekî bi rêk û pêk û girîng e li hember dîrokciyan , ew bi xwe dibe mijara romana niştîmanî, yê diyar dibe bi tekoşîna civakê û rizgarbûna wê ji serdestbûna desthilatî û olî û cîgirkirina jêhatîbûna a li dijî tarîbûna Islamî zor girîng e û rê li pê şiya Islamkirina civakê û windabûna wê di dîrokê de digre, dema dikeve di nav reftaran de, yên hişmendiyê biribûn e valahî û derbaskirina li dîlbûn û pêreviyê.**

**Şer bi tundirewan re ne hêsan e , vegerandina navenda bajarê Kobanî piştî şerên dijwar, nîşanên nû ji hevgirtinek e nû re nîgar dikir, hatibû nîşandan bi serkeftina xwediyên erdê û nûkirina girêdana wan bi welêt reû pêşbirka gêncan ji bo wergirtina şehadetê, ev tişt nîşanek e girîng e di jiyana gelan de, bi paldana li ser mînakek e Kurdî gelerî ( ga dimre çerm dimîne, mêr dimre nav dimîne).**

**Wergirtina xelata nirxan armanceke buha ye , bergerên welatan didin e pêş çavên xwe û dibînin ew kêfxweşiyek e hundirî ye dema bi dest xwe dixînin, kêfek e serkeftinê derbas dikin, di dîrokê de gotin û ravekirina heyî bi kêr naye bibe destikek ji zanîna demê re bi qasî wêjeyên**

**mirovî û bi taybetî ve roman, ji ber ew rewan, hest û raman pêşkêş dike, û ji ber ku bi huner ve girêdayî ye, ji dîlbûna qezenckirina siyasî û bîrdozî ve rizgar bûye, û ti felsefe di tiştek î hatî ye pîrozkirin de nîne, ji ber dibe pût û destikekê ji bo çewsandina nasname û ramanên kesên din, deswa ku bête geşebêdankirin,û zordarî ji pîrozbûnê re bi xwe pê tê hilandin , ji ber kesê bawermend ji bîrdoziya xwe pêve tiştek î nabîne, xalê metirsiyê di vir de diyar dibe, ji ber yê bawermend cuda nake di navbera hatinrêza xwe û hatinrêzên kesên din, û di baweriyên xwe de dibîne mîna kêrên birrek dijminatî dikşîne û herwiha serjê dike, ev tişt di seriyê tundirew de tevdigere, tiştê ku di hizrê wî de dizîvire ewa meyldariya xwe ji dîroka dirindî re û rêyên azarkirin û bikaranîna baweriya olî di wêzimkariya berferehkirin û serdestbûnê de li ser çarenûs û hatinan û ketina di serpêhatiyê de çalakbûna ramanî li cem cîhadî bin guhê hevdû xistibû, wî bi rêve biribû li girtîbûn û radestbûnê ji beraxaftina olî û danîbû li pêş çavên xwe mirinê ji bona dîtina buhişt û periyan, û şerê çi dijminkarek î an cudakarek î û wî binav dike hevrîçêker an ol berdayî, ev gotar ketibû di ramana sosialîzma şoreşgerî de, yê reweşta xwe ji hinek reftarên gotara olî ve wergirtibû, ew jî pala xwe dide li ser mêjîşuştinê û balkişandina bijareya zigurd ji gêncan ve, li kêlek xwedawendîkirina serok û kirina wî mîna Mehdiyek î libendmayî, rewşa êlî hîşt ku civak amade be ji çêbûna hinek pêngav di jiyana xwe de di derbarê jiyanî de, lê di warê ramanan de ew pêngav sîndordar in bi hebûna desthilateke siyasî ramanê takekes radiwestîne û wî neçar dike ku tiştê desthilat dixwaze ew bêje ne tiştê ku ew dixwaze bêje, li vir**

**hişmendiyên destajo pir dibin û berketiyên cuda kêmtir dibin, diyarkirina lehengiyên cemawerî ew jêhatîbûna netewî û mirovî geş dike, piştrastkirina tekoşîna gelê rojava û başûrê Kurdistanê ji rûbirûbûna tundirewiya olî ve girîngiyeke xwe cîhanî heye, ji ber tekoşîndariya terorê ji dergeha welatê bindest ve pirsgirêka kurdî dûriyek e diyar dabûyêkî , û bi rêya wê hestên nefret û heznekiriyê ji aliyê Tirkan ve gur kiribû, karê siyaseta Tirkî ketibû di çarçoveya rûbirûbûna çirûsîna berzbûyî ji pirsgirêkê re, kêşeya demukrasî û vebûnê li ser azadiyan, ev tişt jî siyaseta dewletên herêmî sersima kiribû û hîştibû têkeve di rewşa bizdan û çavsoriyê de, rabû dest bi êrîşê bike li hember wê terora a ku sînoran derbas dike li gor pesindayîna wê (Tirkî û Pkk e) bi çavê metirsî û jdiliyê,ji ber vê yekê tomarkirina wan lehengiyan û kirina wê di hişmendiya mirovê Rojhilatnavînî de bi giştî û yê Kurdiatanî bi taybet ve alîkariyê dike gelek bi tevlîkirina cudahiyên bijardeyan ve di pêvajoya pêşesaziya jêhatîbûnê a li dijî ricîmên bizdan û gelemperatiyê , komên cîhadiyan (mîr ji wan) hinek ji girtîgehên cuda a ricîmên herîmî yên serkotker derketibûn, û bi awyekî taybet ve hatibûn kedîkirin ,derketibûn bi mebesta ku bibin e destikên gef û fişar û bizdankirina xelkên cîgehî û pişt re destikên bandor li ser xortên zigurd ji hemî deverên cîhanê ve, ji Ewrûpa, Asiya , Efrîqa bigre ta Isturaliya û Emerêka ve tevlî vê rêxistinê bibûn, ev teroraek e cîhanî û bi rêk û pêk e, kesên sûdwergirtî ji guhertina nexşeyan wêna bi rêve dibin, bi danîna nexşeyên din li gor azwer û berjewendiyên xwe yên dûr, Ewrûpa karîbû ( Elmaniya wek nimûne) bi rêya levanîna xwe bi Turkiya re xwediyên hevsengî û şiyan**

**bikşîne cem xwe (pêlên penaberan 2015) û ji wana re bernameyên têkelbûnê danîbûn ta karibin bi rêya koçberî û mayîna xwe bibin e destên karker, pêdivî û kêmaniyê dewletên xwe bigrin, ev yeka tam girêdayî ye bi pêwîstiya gurvedana cengan li derverên mîna Sûrî,Îraq ,Efxanistanê , Lîbiya û Yemenê û ji bilî wana ji deverên belengaz û têkçûyî ve, ev yeka jî gerentiyê dide wê ku çekên xwe bifroşe û hemî van pirsgirêkan , firotina çek, penaberan, û terora a ku sînoran derbas dike girêdayî ne bi pêdiviya dewletên serdest di warê aborî de taku sûdê ji bobelatên bijardeyên xizan wergirin, ewên ku derdên fişara ricîmên xwe yên serkotker kişandibûn û hebûna komên tundirew yên ewlehiya wêna berdewam dixin e di bin gef û metirsiyê de û wana dihêlin koçber bibin, ji bo dîtina pêşerojek e baştir ji nifşan re.**

**Siyaseta şandina aloziyan û gerentiya hebûna wan gerentiyê dide hebûna hêza wê û bazara çekên wê ta demek e dirêj.**

**Ev e sermdariya bê sînor , Islama siyasî bi rêve dibe û Îran û Turkiya dihêle bibin e herdû bive di rojhilata navîn de miqayît dibe li ser mabûna rengê kevinşopî a sosialîst bi wêneyê xwe yê lawaz û nîgaşî ve, yê tevger û rêveberkirina pîs wê kurmî kiribû, herwiha belavbûna gendelî û dûrkirina ji saziyên xwe ve heta pileya helweşîn û jihevketinê, ji ber tiştê pereya siyasî a hevbend bi aborî re pêktîne, nikare bîrdoziyên heyî û a ku li ser pirupogendeya hêvotinê û reftarên gelemperatî çêbûye pêkbîne û zorenga îro tê nasîn li ser gefxwarina aboriya dewletê.**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Terora pîroz tê birûkeftin bi terorek e dij, cudabûn di navbera herdû teroran de ku a yekê dirinde ye, jiyanê jê dibe,û ya din pêdiviyek e , bergiriyê li jiyanê dike û hertim daxwaza wê dike, Daiş nûnera Turkiya bû di şerê xwe de li hember Kurdistaniyan, siware bû ji bo şerê kurdan.**

**Û nakokiyê li mala Kurdî diqewime , bi rêya danîna gazindan li ser hevdû , û xwe şiştina ji berpirsiyariyê di warê gel de û rewşa parçebûna siyasî , zehmetiyên bi dû hevdû ve anîbû , tiştê qewimî bû sedemek e ne zindî ji parçebûna siyasî û hebûna valahiyên civakî û nezanîkirina bîrdozî re, bi xwedawendîkirina serkêşên giyanî diyar dibe, dewsa cîgirkirina ramenek e netewî rast , sereke û diyar, bi hinek kes û nîşan ve naye kurtaskirin .**

**Ev pevçûna xwînî nezanî û nezanîkirin girstir kiribû û ji cîhanê re tekes kir ku heta roja îro kanîn heye ku şerên mezin bi navê xwedê bê lidarxistin, ji ber ev yeka hîn çêdibe û bi xurtî tê xwestin, bi sedan ekranên olî, sazî, û komelên nepenî û aşkere hene, ev ragihandina ku jehrê berdide hişmendiyan, ev gotara olî nehatibû guhertin, û ta roja îro lêvegera Islamî bi sernavê El Ezher tu car mukir ne kir ku Daiş dûrî mislimantiyê ye, tenê got ew misliman in û çênabe em wan gunehkar bikin, ev jî wate dide bi berdewamiya qurbaniyan û cîgirbûna zordariyê mîna çandek e pîroz e di hundirê civakên rojhilata navîn de, yên ku li deverên xizan, û barketî dijîn , bi şer û girtinheviyên berdewam ve tên e gefdankirin.**

## 6-Diyalektîka mirin û nefretê:

**Mirin nîşana vemirandinê ye, berevajî çalakiya tevgerê ye,xewindaran nîşan dike, ên bi dû jiyanek e kêmderd ketibûn, çêkerê mirinê kuştinê fêrbûn, xwe bi baweriya olî ve bi çek û rext kiribûn, pêşiyên wana baş zordariyê bi xelata xwedayî ve girêdidan, dema wana deqê fêr kiribûn, wana kiribûn e ji ol re pasvanek î û ji erdê re têbirên xwed ê, em meyze dikin çawa bawerî dibin e şûrek î dirêjkirî bi destên yên pê bawer ve, wana ji mirovahî û dilnermiyê ve rizgar kiribûn, hîştibûn e bibin hewesdarê xwînê, çawa dîroka dirindî bi**

------------------

**1- El Ezher: yek ji girîngtirîn mizgeftên Misrê ye , û yek ji navendên dîrokî ne ji bo weşandin û fêrkirina Islamê, û herwiha yek ji navdartirîn mizgeftên şopî ne li Misir û cîhana Islamî de.**

**pirbûna sînaryoyên xwe ve dûbare dibe, şanoya pêkhatî bi kiryarê lîstikvanên xwe yên rastîn ve li ser erdê dijwar dibe, çawa ol dibe sînaryoyek î li ser depê rewşê bi tîpdarî tê pêkanîn, bi rêya lîstikvan , qurbanî û kujeran ve, li vir huner beranberî bûyera a tê jiyankirin bindikeve, roman jî li pêş kesên yên êş kişandin bindikeve, nivîskar jî li rex hevgariya kesên din bindikevin, ji bilî yê ku rewş bi hurgiliyên wêna ve jiyan kiribûn, di wan de bîngehên hevgarî û lîstina afrênerî bi heman demê ve temam dibûn, bi ewqasî kîn mêjiyên takekesê tundirew hatibû birin, ji rewşa wî ya mirovî hatibû dûrxistin, ê bi sirûştiya xwe ve ji**

**dîtina xwîn û laş ve dilerize, wî ji her tiştê ku bi cinav ve hatiye girêdan rût dike, dibe ku gotara nefretê bi derbasbûna dîrokê ve hatibe bikaranîn ji bo ku mirov ji mirovahiya xwe dûrbikeve, û bi baweriyê ve bi koratî ve bê girêdan, ta ji bo wî re bibe ew bawerî li ser her tiştî, ji ber vê yekê qurbanî zêde dibin, ligel berdana ragihandinê ji vê cureyê ji gotar re , bi berdana jehriyê bi taybetî li ser pirbûna şêweyên peywendiya civakî.**

**Bikaranîna ol di kuştinê de bûye bazirganiyek e belavbûyî, qezencê tîne û pêkanîna ecnîdeyan bêhtir hêsan dibe bi rêya perekirina komên olî û rûmendariya wan bi rêya mîrên wana ve û kanîbûna wanî rewanbêjî ji kişandina bijardeyê xortan bi hemî şêweyên heyî ve.**

**Peywendiya bandora rewanbêjî bi gotara olî ve, li ser bidestxistina ramana takekesê bilmez dixebitin, misoger ku ew bandor dibe kevintirîn alav li ser hizr û hişmendiyan ji kevinê dîrokê ve, hemî bîrdoziyên gelemperatî li ser şopê rewanbêjiya olî meşîn, di pîrozkirina xwe û bervepêşkirina hînckarên xwe ji bo nefretê li hember aliyê dijî xwe ve vê rewanbêjiyê pêkanîbûn, bihane dabûn e wan bi kuştin û çavtirsandina kesên yên ne li gorî bîrdoziyên wana ve, gelek kes bi navê ol miribûn, wek ku gelek kes jî bi navê zorenga qatî ve miribûn , di vir de em dibînin ku sivîlbûn tenê bergeke beranberî yên hişmendî û hatinan zeft kiribûn , dijminatî û nakokiyên bê dawî di nav xelkê de gurtir kiribûn.**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**Û em dikarin agehdar bin ku pêşsazîkirina çavtirsandina olî li ser bingeha nefreta pîroz hatiyê duristkirin, eger mirovekî oldar bi dest xistibû û hizrê wî vegirtibû wê di her derfetê de amade be , ku êrîşê kesê ji wan nefret dibe bike, ev tişt hebûna sivîlbûna rastîn mandele dike, lê li paş hevokên bedew kêmbûna evîn û pirbûna axaftina hingivîn vedişêre, dûlaneyî wisa dibe nexweşiyeke bilez belavbûyî, di vir de helbestvanê Birîtanî Corc Gordûn Bayrun 1 dibêje : ( Nefret ew hestê herî demdirêj û bê sînor e, xelk di kêlîkek e bi lez de hezdikin , lê bi hêminî û bênfirehî nefret dikin.)**

**Tiştê ku em li dor wê dizîvirin , ew peygerandina li ser qonaxên nefretê û cîgirbûna wê di nehest de , pişt re rabûna ragihandina raberkirî bi lezdayîna xelkê li ser nefretê bi cureyên wê û dananê wê mîna azadiya derbirînê.**

**Çi terorek pêkbûyî ku bi rêya wê hestê setembarî di hundirê hizr de gur dibe, ev yeka bi demê re tê guhertin û dibe vexwendinekê ji tolhildanê re, berî wê tê birin bi lêdanên zorkar ve ji aliyê armancbûyî re, ji ber vê yekê çespandina raman û cîgirkirina wî di hundirê takekesê bawermend de, destê wî tê berdan û barê wî ya mayînbûyî tê danîn.**

**Û çendîn komên bikarhatî ji kuştin û wêraniyê ve pir in, ji ber tim zemîneke dewlemend ji mezinbûn û zayîna wan re heye, bi taybetî hebûna ekranên ragihandinê û rêya pargirtina wê ye layangirtî, ji ber cengên navxweyî pişta xwe dide artêşbûna ragihandinî, ( Sûrî û Kurdistanê wek nimûne) bi dûbarkirina zorenga (Sinî – Şîiî) bi rêya**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**( Biraderên Misliman û ricîma Elesed) û Kurdistanî bi rêya ( Nefretbûna Ocelanî2 – Barzanî3) an ( Barzanî – Talbanî4).**

**Dewlet hene wê çênebana eger roparta nefretê ne li dû wan aba ji dema damezrandina wê, wek nimûne Tirkî, ji ber pala xwe bê sînor dabû li ser nijadperestiyê, ta piştên hêza xwe bi wê damezrîn e ,bi rêya nefretbûna hêmana Tirkî ji çi kesê ne Tirkekî pak be re, kuştina mirovê Kurd ji ber ku bi netewa xwe ve girêdayî ye, ji bilî ew kurdê yê kurdîtiya xwe mandele bike û bi bibêje ez Tirkekî baş im, tevî ku ew zanin ku ne Tirkekî pak.**

**Bi rêya girêdana Erebîtiyê bi Islamê ve dewletên Erebî ava bûn û netewa wê ya liyangirtî bû mîna şûrekî dirêjkirî li ser stûyên kêm netew û netewên ne Ereb, li Ewrûpa û cîhanê heta niha nefretbûnek e hundirî ji Cihûyan re heye û dijminatiya Samiyan rewşek e jiyanbûyî ye, nikare ewê Cihû Cihûtiya xwe aşkere bike, ji ber ku li ser xwe ji kuştin û êrîşê ve ditirse, herwiha rabûna rastê tundirew û vegera bîrdoziyên netewî.**
**Em di cîhanekê de ne li ser nefretê avabûye, ev tişt mîna tiştek e xuristî binav bû ye, çavkaniyên terorê tên e kedîkirin bi serpereştiya gelek dewletan bi awayekî nepenî, bi taybet ve dewletên yên dibêjin ku em şerê terorê dikin, armanca ew terora a ku sînoran derbas dike ew bîrbûna dîroka dirindî yê ku nehatibû dîtin.**

-----------------

**1- Corc Gordûn Bayrun , an Lord Byron: ( 22 .01.1788 Ingêltra -19.04.1824 li Yonanê) helbestvanek î Ingilîzî ye, ji pêşdarê helbesta Romantîk e.**
**2- Ocelanî : ji paşnavê dameznerê partiya Karkerên Kurdistanê Ebdûlah Ocelan hatibûye wergirtin.**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**3-Barzanî: ji paçnavê şoreşgerê kurd Mella Mustefa Mihemed Evdul Selam Ebdûlah Barzanî 1903-1979 hatibûye wergirtin.**
**4- ji paşnavê dameznerê yekîtiya niştîmanî Kurdistan Celal Husam Edîn Nor Elah Norî Talbanî hatibûye wergirtin.12.11.1933- 03.10.2017.**

**Li vir jî feylesûfê helbestvanan Bavê Ela Elmarrî 1 ol dîtibû xapandin û endeze ye, desthilatdaran bikaranîbûn ji bo armancên xwe yên bi qezencê ve girêdayî, û hişmendiyan serdest kiribûn, ji bo bên e kedîkirin ji devê roparta nefretbûnê dema got:**

**Şiyar bin ,şiyar bin**
**ji ber ku**
**olên we ji pêşiyên we ve ne**
**xapandinek in**

**Em li vir meyze dikin ku her nefretekê mînakên wê ji dîrok û bûyerên xwînî ve hene, ji dergehên ew demborîna hatibûye siyasetkirin dibînin.**
**Ew roparta ragehî ji bo neferetkirina ragehê beranber derketibû ,ji ber hîn bermayên xwe hene li cîhana sivîl berî cîhana paşdemayî, ji ber dirêjbûna Rastê tundirew û dijminatiya Samiyan hembêzkirineke pêşî ye ji her girtinheviyek re li deriyan dixîne bi derbasbûna demê ve, em dikarin nefretê mînandin bikin bi wê xwarina yê li ser agirek e hêdîka tê kelandin, li rex rewşên ku raman û nerînan diafirînin û wana jî zeft dikin, ew rewş bi erdnîgariyê ve darizandî ye, bi taybet ve ew navçeyên gurbûyî bandora xwe li ser sînorên yên hatin e danîn dikin, rewşa guherbar qameyên ji kuştin û sazkirina dirindîtiyê li pêş kamêreyan de aşkere dikir, ricîmên zanistdarî li**

**rojhilata navîn bi serneketin û nikarîbûn rewanê ragehî qut bikin, tenê xwe bi bergê zanistdariyê û sîstema komarî ve veşartibûn, lê bi rastî ve xwe li paş têgehên parçebûn û nakokiyên olî parastibûn, herwiha pala xwe dabûn e li ser paşmayiyê ji dîtina wana ji ricîma fermendariyê re ,ew bi xwe ji qeraliyê ve nêziktir e, ji ricîma komarî û yaseya sivîlî ve dûr e, çi ramangirên xwedan cergê bilind nedîtibûn ta ku bikaribin ew ramangir bi zîrekî û wêrekî mîna Nêtşe 2, Rênêh Dîkart 3, Hîdger 4 û Can Bul Sarter 5 berz bibin, sedem ew e ku roparta ragehî a tundirew û bîrdoziya gelemperatî a sosialîzim li hemberî çi pêngav ,an şoreşeke zanyarî de sekinîbûn.**

## 7- Mirin :

**Di derbarê mirinê de wisa Firûyd 1 di pirtûka xwe de Evîn, şaristanî û mirinê R27 diaxive:**

---------------

**1- Bavê Ela Elmarrî: (973-1057 ) ew Ehmed e kurê Ebdulah e kurê Silêmanî Qudayî a Tenoxî a Marrî, helbestvan,ramangir , wêjevan û rêzimanvanek î ji sedema dewleta Ebbasî ye.**

**2- Nêtşe: ( 15.10.1844- 25.08.1900) Firêdêrîş Fîlhêlm Nêtşe bîrnas, rexnegir , helbestvan û awazjenek î Elmanî ye.**

**3-Rênêh Dîkart : ( 31.03.1596-11.02.1650) Bîrkar, bîrnas, û fîzîkvanek î Ferensî ye bi bavê Felsefa nûjen navdar e**

**4- Hîdger: Martin Hîdger (20.09.1889- 26.06.1976) Feylesofek î Elmanî ye.**

**5- Can Bul Sarter: (21.06.1905- 15.04.1980) feylesof, romannivîs, nivîskarek î şanogerî ye Ferensî ye.**

**( Mirin tiştekî xuristî ye, mirin ew mirina me ye, tevî wisa jî em pê naramin ji bilî ku em wî bi mirina kesên din pesindan dikin, a girîng tu melevaniyê berdewam bikî, ceng bi mirinê dikeve rûbirû mirov, wî neçar dike ku bi wî**

**mikûr bibe, mirin mirov dajo ramandinê , mirin li cem berpêşkî ramana giyan, nemirî û hestbûna bi gunehbûnê ye, ceng ne hestbûna me yê berpêşkî riswa dike.)**

**Firûyd sedema çêbûna şer vedigerîne rewşa nehestbûna berpêşkî a ku rastî mirov tê û di hiş û sewdayê wî de cih digre, ji ber ku dirindîtiya a ku di takekes de cîgir dibe sedemeke di cî xwe de ji wêrankirinê re, ev tişta em di hişmendiya cîhadî de dibînin, ji ber ku rê vekiribû ji bijînên takekesan re ta derkevin û şer bidomînin, li gel wê Islama Siyasî zayend û hezkirina mirinê bikaranî, zayend wek destikekê ji arandinê re li rex diravê, peydakirina kêfê bi rêya Cîhada Nekehê û buhişta xwedayî a wek sozekî hatî ye birrîn, ev yeka gerentî dide berdewamkirina doz û ferehbûnê ji bo desteserkirina erdan.**

**Mirin konê xwe li ser henas vedigre, di kêliya hatina wî ya bê sînor de, çawa mirov hevsengiya xwe ya hişmendî di dijwartirîn kêliyên jiyana xwe yê germ û şîn de ji dest dide, bi taybet dema bi mirina kesekî nêzik û hêja ve tê girêdan an dema nûçeyekî giran wê çarenûsa wî tam biguhêre dibhîse, hêza huş û sewda nahêle hiş bi azadî birame, ji ber mirov li pêş lêxistinê bi matmayîbûn , seyr û ziman hevgerandî dimîne, ev têkçûna hundirî wî dihêvoje ji kiryarên ne vacî, wek ku biqêre an bêdeng be bê ku karekî bi vac bike li pêş helwestê, ji ber vê yekê huner û wêje li kêlek tevgera siyasî û leşgerî dixebitin ji bo li berxwe bidin li hember metirsiyên qirkirina nijadî a ku rastî kurdan tê li başûr û rojavayê Kurdistanê, yekîtiya Kurdistanî bû rewrewkekî bin siha girêdana tevgera Kurdistanî bi herdû**

aliyên xwe ve ji ecnîdeyên Tirkî û Îranî ve, ev yeka tîna li bîr girêdana Kurdistanî ji kevin ve ji wan herdû şahînşahiyên yên şerî hevdû dikirin Sefewî û Osmanî, di vir de dîrok xwe ji nû ve dûbare dike bi rengekî bi êş ve, gel têde buha dide ji xwînê lawên xwe ve,ta bibe qurbana bîrdoziya partîtî û roparta wê ya taybet a bi wêje û nerîna xwe yê sofîtî ve girtî.

Ew gotar ji rêbaza netewî a demûkrasî dûr e, wisa her partiyekî şehîdên xwe ji yê din ve cuda dibin herwiha nîşan û nirxên xwe , partiyê din a dijber pê mikûr nabe û wê jevan jî tên e dabeşkirin li ser wan herdû aliyan û desthilata partîtî wêje û hunerê xira dike, cemaweran parve dike,ta ew parçebûna şilîbûyî siyasî, leşgerî ,wêjeyî û hunerî bicî bibe.

---------------

1- Firûyd : di 6 Gulanê sala 1856 de jidayîk bûye ji malbatek e cihû li bajaroka Birîbûrê bi zimanê Tişîkî di navçeya Morafiya yê a di wê deme de bi şahînşahiya Nemsayê ve girêdayî bû .

Ev bû sedema koçberîbûna cemawerî, hebûna gotara netewî nediyar kir , herwiha stratîciya niştîmanî a ku Kurdistaniyan li ser heman cudabûnên xwe dicivîne, bi sedema girêdana bi ecnîdeyên dewletên yên Kurdistanê dagir kirin e, ev dibin rêgir li pêş yekbûna siyasî, tiştê ku dihêle destkeftiyên niştîmanî a pêkhatî bi saya xwînên şehîdan û vîna şervanan ve di metirsiyeke timî de bin, ku bêne jinavbirin, mînak tiştê ku bi ketina Kerkokê ve qewimî bi destê Heşd Eşabî ve di dema rêferendomê de, ji encamê xiniziya aliyekî Kurdistanî bi Îranê ve girêdayî û ketina Şengalê bi destê Daişê ve bi encamê vekişandina

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Pêşmergeyan bê şer jê wê deverê û ketina Efrînê bi encamê serişkbûna bîrdozî ve, wisa wêje berûvajî van tiştan hewil dide kelemên giyanî di navbera cemawer de jinav bibe, dema tekes dike li ser wijdana niştîmanî ,herwiha hembêzkirina xwîna rijî ji bo erdê, parekî mezin dide vê yekê ji bo girêdanên yekgirtî di navbera civaka Kurdistanî de bên e parastin, tiştê ku huner û wêje pê serkeftî bûye ji komkirina dîroka Kurdî û yekbûna cemawer ve , nikarîbû siyaseta Kurdistanî vê yekê bi dehên salên xwe ve pêkbîne ,wêjeya azad û vejînkirina ew kelepûr û paşmayê dîroka niştîmanî ji neman û windabûnê ve.**

**Û dibe ku rewrewkên komî ji rastiyekê ve hatibin , ewa lawaziya jîndarê mirovî û pêdiviya xwe yê dijwar bi serxweşkirinek e deronî ve, berhinde Firûyd dibîne : di pirtûka xwe de R 51 – bi sernavê: Evîn, şaristanî û mirinê : (Olên ezmanî tenê rewrewkên komî ne, pêwîstî nake em bêjin ku kesên yên bi wan bawer dibin bi rewrewkan ve beşdar in, ne şiyane ku mikûr bibin ku ew bawerî rewrewk in.)**

**Ji ber vê jî ew ceng pêdiviya xwe bi çekdarîbûnekê ve heye di her tiştî de , bi ol û bîrdoziya partîtî an baweriya bi erdê ve û pêwîstiya bergiriya li wê, herwiha ketina di evînê de ew pergalekî ji pergalên mandelekirina êşa jiyanbûyî ye, ewa pêwîstiyeke niştîmanî ye dihêle pêvemanekî bi veşargehên bedewbûn, maf û xêrê ve çêbibe, berhinde roparta nefreta kor ji kurdan re dibe êzinga vê cengê û bi destêkelbûnek e Tirkî diyar ve , ji ber Erdoxaniyet Daişê nijde kir , hemî derfet dayêkî ji bo xwe berfereh bike û**

**karê wê bibe ji berjewendiya pirojeya (Biraderên Misliman) a cîhanî re , ji gihîştina desthilatê li cîhana Erebî û bi sazkirina lêdanên xwînî têde, nexasim ku li paş Daişê akran hene , hêz û sertiya wê belav dikin bi awayekî ne zindî ve û bi taybet Ekrana Eccezîra a Qeterî , bêhtir hêza komên cîhadî mezin kiribû, berûvajî ekranên din yên wê rêxistinê bi navê wê ya navdar Daiş binav kiribûn, hemî destwerdanên derveyî di dewletan de ne ji sedemên sincî ne, lê ji bo berjewendiyê ne, cîhan rehnî dabû li ser Kobanî û xwe jîbîrkirin kiribû şewatên hinek bajar mînak Nisîbîn û Amedê li bakûrê Kurdistanê û wêrankirina wê ji aliyê toraniya Tirkî ve, em vê sextebûnê dibînin di vê mirovatiya a ku diyar dibe li ser Telefiziyon, rojname û acansên cîhanî, ji ber ku faşîzma olî Erdoxaniyetê belav kiribû mîna rewşeke cîgirbûyî berferehbûyî, dibû destikekê ji parçebûna dewletan û windabûna wan, û wisa cenga olî hatibû nojenkirin taku bi komê kêşeyên aloz ve li rojhilata navîn lihevhatî be, ta bibe destikekê taku gelek dewletan bihêle hesabên xwe û awayê ramandina xwe vegerînin, ji ber hatina biyanan mîna penaberan li Ewrûpayê dibû gurkirinekî ji roparta nefretê a ku netewperestên nû li Ewrûpayê rahijtibûn û sînora 15 ji sedî ji rêjeya cemawerên alîgir derbas kiribûn, ev rêjeya gumanî heye ji nişkêve bilind bibe, eger tundirwiya olî çalak be , herwiha eger cengên navxweyî bimînin.**

## 8- Zorenga jiyan û mirinê :

**Kuştarên pêkbûyî rewşa çavkariyê aşkere kirin ta biqasî jê tên erd desteser bikin û têde xelkên nû bên e bicîkirin piştî**

**qirkirina xelkên wêna yên resen (Efrîn), ev yeka tê duristkirin bi rêya dagirtina takeksan bi roparta nefretê, bihaneyên baş ji bo pêkanîna kuştina dirindî bedrest in, berhinde kombûna kujeran bi dorhevdû ve li ser bîngeha bîrdoziyek e sert li dijî rengê jiyanekê bi xwe tê sazkirin, ev jî dihêle reftara tewanbar bibe kiryarek î bi mebest û dibe mîna erkek î divê bê kirin, wisa endamên Daişê bi bîrdoziyê ve hatibûn dagirtin, ta tewanbariyê bi awayekî pîşegirî pêkbînin, hatibûn e fêrkirin ku tewanbariya yên ew pêktînin wekî sizabûneke xwedayî ji mirovan re bi destên wana ve tê kirin, pala xwe didin li ser ayetek e ji Quranê mînak Soret Elenfal 1 : (we wana nekuşt, lêbelê xwedê wana kuşt,te ne avêt eger te avêtibe , lêbelê xwedê avêt, ji bo bawermendan felaketeke baş bi ser wana ve bê, xweda guhdarvan e zana ye.)**

**Berhinde ev ayet ji cîhadiyan re binav dike ku xweda bi destên we dikuje, cîhadî bi rengekî deronî bi rêya wê ve tên e dagirtin, li ser reftara tewanbariyê tên e hêvotin, ji ber ew deq ji wana re vê yekê bêbend dike, zordariya pîroz sertiyek e heyî ye, pişta xwe li ser şîrovekirinên pîroz dide, bêdengiya saziya Elezher şanek e bes e ku ew ol sert dibînin, bi tirsê ve naskirî ye, nefretbûna wê ji çi tiştê dijberî wê re, wêrekiyê li cem nîne ta ayetan rave bike, ji ber ew rastiya wê dibêje, bê ku hewil bide xwe ji ber bade an bi rengek î pepûk xapandinê bike, ji ber dagirtina sertbûnê ji rêbazên hemî ol û bîrdoziyên siyasî ve ne,ku dixwazin bighêjin desthilatek e cîgirbûyî , ol pêdiviyek e desthilatî ye di astên xwe yî herî bilind de, ewa sersaxkirina xizan û çevsênkaran e, ji fişar û zora dewlemendan bi derbasbûna dîrokê ve, em**

**dikarin di vir de du Islaman ji hevdû cuda bikin Islama dirindî û a din xuristî.**

**--------------**

**1- Soret Elenfal: soretek e bajarî ye ji bilî ayetên ji 30 î heta 36 mekî ne, û ev ji heftê soretên dirêj in, hijmara ayetên wêna 75 ayet in, û ew soreta heyştemîn e li gor rêpêketina quranê.**

**Û Hîdger dibîne ku mirin bilindtirîn derfet e ji derfetên heyînê , ew tirs,goşegîrkirin û lêdanê tîne, ji jîndar ve hestê wî bi jiyanê ve û çêja wî dibe, berhinde gavên mirinê gelek li ser henas giran in, û mirî di bîrê jîndaran de nemir e heta ku ew sax in, sihwa mirinê li ser henas cuda dibe li gor pile û cihê mirî di dil de.**

**Destrastên mirinê dixwazin bi kuştina mirovan xelatê wergrin ta bikevin buhiştê û zayendê bi 72 perî re pêkbînin, lê destrastên jiyanê ji bo pirsgirêkê dimrin, ji ber ku welat ewa evrayî , nirxa resen û bîngeha nasnameya mirovî ye.**

**Û ji ber têkreçûna ramanî û mezinbûna sertiyê ceng zêde bûn û çirûskên wêna berfereh bûn û li hemî deran belav bûn, jiyan bi derdorê re tune dibe, ev yeka tundiyê di hundirê takekes de cîgir kiribû, wî hîşt sert û tewanbar be, ji ber ku cîgehên zordar yên ji aliyên desthilatiyên wêna yên gendel ve saz bûn , di bijardeyên xwe yên xizan de hestên nerazîbûn û heyfê xwedî kirin ( Pakistan- Efxanistan) û bi encamê ve: tundirewiya olî belav bû bi zêdebûna pêdiviyê bi kar, wekhevî û hînkirina baş ve, bin saya**

**desthilatiyên olî a ragehî, tiştekî xuristî ye ku qafîkerî berve sertiyê mezin bibe, dugelên herêmî (Îran, Turkiya) wana bi rêve bibin, herdû bi lagirtina netewî, ragehî ve navdar in, nikarin destwerdanê bi awayekî zindî bi kar û barên dewletên kêlek nekin (Sûrî-Îraq) , berî xwe didin li cenga serkarîtî ta pîlanên xwe pêkbînin.**

**Û pir caran tundirewî bersivek e, ji ber ku tundirwiya netewî bersivek e li ser sitemkariya di dermafê gellek î bi xwe, tiştê ku dihêle gel berî xwe bide tund û tojiyê mîna destikek ê ji bo vegerandina suhndarî û heyînê û pir caran dibe bersiveke têkreçûyî û sert heta asta tolhildanê, rabûna Naziyê hat bi sedema zora ku Elman dîtibûn piştî ku ji şerê cîhanî a yekem ve derketin, hevpeymana Feresayî 1 di sala 1919 de emzekirin , ev dibû mîna tivîkirina mercên dewletên serkeftî li ser yên binkeftî, ev yeka tundirewiya netewî gurtir kiribû, bi vî awayî Nazîbûn jidayik bû, dibe ku tundirewiya olî nûnertiya liyangirtiya kevinşopî bike, ewa bîngeha çi tundirewiyê ye, ji ber ku kevintirîn e di dîrokê de, berhinde zanistvanê rehî Dûglas Fîldiz 2 dibîne : (Kêşe di giroverên sertiya rehî de ne, yên me dihêlin ku em di hêrs û sertiyê de biteqin, evna kûr in di mejî de ,binê qalika mêjî de ne, di wir de têgeh çêdibe.)**

------------------------------

**1- Hevpeymana Feresayî hatibû emzekirin di Hizêranê de 1919 de di koçka Feresayî de li Parîs di dawiya cenga cîhanî a yekem de, naveroka wêna mercên aştiyê di navbera hevalbendên serkeftî û Elmanya de.**

**2- Dûglas Fîldiz : diktûr, zanistvanê rehî û danerek î Emrîkî ye, di zangoya Karlîfurneyê li Sandîgo de xebitî û di û zanîngeha Stanfûrdê, zanîngeha Bîl û amojgehên niştîmanî a tendirustiyê de.**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Ev yeka nîşan e ku sertî navenda xwe mêjî ye, dema ku takekes bi ramanekî ve bawer dibe, gelek pê seyr dibe, ji çi tiştê ku li dijî wê radiweste nefret dibe, wisa raman dibin têkelekî di nav xwe de palderên piştgiriya bîrdoziyê li hember dijî wê an kesê ku dixwaze wêna dûr bike hembêz dikin, herwiha nihandên dijminatî û setmeayînê heta paya girtîbûnê.**

# Aborî di karguzariya hebûnê de

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Bawerkirin di heman cudahiyên xwe de naveroka girtinheviyan ji bo parvekirina desthilatiya diravî berz dike, hemî ji bona parastina desthilatê ne û cîgirkirina wê bi maskên cur bi cur ve , gelek caran bihane didin e cengan bi buyaxên pirreng di navbera têgeha maf û parastinê de kûr tevderbas dibin, dirnaxên xwe di hemî warên jiyanê de berdidin, ta civaka dûrketinê berhem bidin, ji ber hindî nîşanên koçberiyê di hundirê civakê de cîgir bibin, hindî aloziyên desthilatê wê ferehtir bibin, maskên ku desthilatê li paş wê xwe vedişêrin radibin, diyar dibe çendîn ew mask kevin û rizî ne, her baweriyekê li bawermend sertbûnê bi heman rengên xwe ve sepa dike,ji ber bandorek e neyînî li ser wergirtiyê gênc dike, ta wî darjêdank bike û bibe pasvanekî li ser komek sawêr wêna tebitî dibîne , bîrdoziyên totiyelîter di bijardeyên ciwanan yên perîşan de bicî dibin ne li ser qatên ku jêre xweşiya diravî peyda dibin, wateya vê yekê ku ew bîrdozî xwarineke dewsa xwarina rojane yên qatên perîşan li pey diketin û têne derzîkirin bi hezkirina mirinê ji bo serkeftina ramanên ên bûn e ji wan re mîna jiyanek e bi xwe.**

**Eger me li bawerî hinekî dît mîna nihrandinek e aştiyan e, naye bazar an siyasetkirin em dikarin lê binêrin wekî komek nirx, jiyana civakê û takekesên wêna rêxistin dike, tiştê em dikarin lê meyze bikin ku ewa tevina pirreng e yê rengê xweşik dide jiyanê , em dikarin wê têbighin li gor felsefeya cihêbûnê, naveroka wê yê gerentiyê dide hevjiyana aştiyane û armanca wê sînorkirina ceng û aloziyan ne, mebestên wêna ji bo danîna çareseriyên ên ku sûdwergirtinek e pevguhertî û hevbeş dadimezrîne, zanyar**

**di civakên xwe de bi rêya rêxistinên xwe yên civakî dadimezrînin, ji ber hebûna wana li rojhilata navîn nîn in, bi encamê bidûhatina desthilatên totiyelîter , ew ji zikmakê serweriya partiyan derketibûn û cilê hevciviya êlî li xwe kiribûn ( Lubnan) , em wêna dibînin bervajî bangeşiyê xwe dixebitin , ji bo hebûna desthilatiya xwe yên tofî têkoşînê dikin , aliyên herêmî wêna xwarin didin ji bo ew bimînin û gerentiyê wergirin ji hebûna serweriyên xwe li ser hatin û samanên sirûştî, berdêlên van ricîman tên e dîtin, ji yên berê ne baştir in , têne danîn bi rêya pêvajoya zordar bi sernavê -buhara Erebî -, bi encamê wêna aloziyên penaberiyê qewimîn û navçe ji xelkên xwe valabûn, hevşar nû hatin avakirin û bazarên firotina çekan vebûn, gerentiya sertbûnê durist bû ji bona sûdwergirtinê, ta bi çi rengî be pergalek î ji pergalên aştiyê saz nebe di nav wê navçeya gurbûyî de , di warê mirovî de barketî, em dibînin partî û rêxistin ji xwe re dirûşma yekbûn û demukratiyê mîna navekî rêxistinî bikartînin, a rastî jî ku bîngeha hebûna wan ji bo li hemberî yekbûn û demukratiyê rawestin, beranberî vê yekê jî em rêxistinên olî ragehî dibînin , hatin ku ramanê Qaîda nû û nojen bikin, ta rojhilata navîn bikin derbegî û bi bazarê çek ve lihevhatî be, dirûşma herî aşkere dimîne ceng û pişt re ceng, ji bo qezenc û destkeftiyê, berdêla penaber ewa pêşniyara aştiyane ye di derbarê vegerandina jiyanê û danasîna komela a ku bi komên mirovî bala dibe ji bo çalakirina diyardeyên cihêbûn û gotûbêjê û banga li wê mîna berdêlek î ji zoreng û tîjandinê bi rengên wêna yên gelek, ji bo bicîkirina nirxê babetî ji komên yên çêdibin û dizên di çarçoveya rewşa aviskirina ramanî yên nêzî şaristaniyê dibe dûrî binpêkirinên bobelatî**

**ên bi encamê sertbûnê û kesên yên wêna belav dikin pêktên .**

**Li gor wê têkoşîna rastîn ji mirovê zanyar tê naskirin li rex jina zanyar ji geşepêdana tovên hevjiyanê ji bo pêkanîna zêde ji afirandinê re bi awayekî berdewam û li gor rêbaza babetî têgihiştina xwestekên zanyaran berve jiyanek e baş çêdibe , hişmendiya a ku ji mirov re bikaranîna afirandinên xwe bêbend dike ew tenê dikare kokê jiyanê qayîm bike ji bo pêkanîna pîvanên rewiştî yên naxwazin hebûnan bi awayekî wêrankirî tune bikin, ji ber vê yekê pêdivî ye pêkanîna jiyana mirovî yê zanista babetî pêşde dibe û bîngeha xwe pêkanîna sûdgirtina giştî ye a ku Stîwart Mêl 1 dîtibû mîna rêyekê ye ji bo xêra hemiyan û dayîna çanda aştiyê dewsa çanda desthilata dûrkar.**

**Berhinde zanyar xwe radestî kiryarên xwediyên aboriyê yên çavkar nekiribûn , yê bîngeha xwe malgirtin û kedxwarîbûn, xwesteka zanyar ew e cîgirkirina nirxên jiyanê bi rêya tewriyek e aborî bi parvekirin û hemtayî erê dike bi rengekî dawiyê li cureyên aloziyên cîhanî tîne , rê digre li pêş gurkirin û derketina wêna ji derveyî girovera xwe yên bîngehîn li deverên din, berhinde divê faytona aborî bê livandin, ji bo afirandina xweşiyê û bidawîkirina awanteyê û girtina gedanê ta rê li pêş gemarbûn, xizanî, û bêkariyê bê girtin, rawestandin li ser nexweşiyên giran , ji encamê xizanî, birçîbûn û cengên yên mirov çêdikin belav dibin, li gor pîlanekê ji civakan re çand û nirxên wêna ezber dike, tiştê ku dibe rêgir li pêş ku çandek xwe li ser a din sepa bike, ji bo kok newin hilkirin , ji ber hewildanên**

**çandekê serdestiya xwe li ser çanda komekî ji gelan bi xwe ranewestiya , pişaftina çanda wê bi çanda zimanekî bi xwe, xwediyên wê bi zorê û bi navê ol û girêdana olî û bin navê desteserkirinan ( desteserkirina Erebî- Osmanî) hewildabûn durist bikin, ji ber vê yekê lihevkirin li ser rageha aborî ji wêzimkariya hebûnê ve ewa destikek e gerentor e ji bo bidawîkirina aloziyên peywendîdar bi ceng û pevçûnên çekdar ve, tenê aborî destikeke ji bo weşandina hewildanan bi sazkirina gelektirîn pirojeyên geşepêdanî û gezencî, dikarin pêdiviyên gel pêkbînin, anîberkirina bostên erdê wan ta berhem bervajî lê vegere bi dîmenekî bi hêztir û baştir, berve xêrek e giştî, dema em li ser kêşeya şerodiya mirovan ji şer re rawestin li gor aliyekî ku hinek feylesof wisa di xweda de kedî dikin, zanyar vê kêşeyê dibînin ku ew a şerodiya takekesan ji bo şer derbas dike, bi qasî ku rêbazên ji dil û rastîn nebûn ji bo perwerdekirina henas li ser rêbaza sîstemê.**

**---------------------**

1- **Stîwart Mîl : Feylesof û aborînasek î Ingilîzî ye, li Lendonê sal 1806 de jidayik bû, û di 08.Hizêranê sal 1873 de koça xwe yê dawî kiribû.**

**Sîstema cîgir li ser bikaranîna pêkanînan û rêxistinkirina wana li gor pêwîstiyên civakê û geşepêdana wê, ji ber ku mirovê yê xwe fêrî çavkariyê dike ji xwe re rageha çavkariyê diafirîne , ji ber ku rewayî li ser kuştin û gendelî û tundirewiyê zêde bû , ew a bi xwe bergeke mirovê desthilatdar xwe bi wê nixûmandibû , armanc jê bidestxistina tiştan û zeftkirina hatinan bi zordariyê , herwiha mirov bibû hoste di veşartina xwestekên xwe de di çarçoveya darjêgek e nimûnî de , bê guman ol di xêzên xwe yên siyasî de û cihêbûna bandora xwe bi sirûştiya kiryarên**

**bawermendên xwe civakan hîştibûn di rewşeke de ji nakokî, tevlîhevî û bêcaniyê ve bimînin, bi sedemên bobelat û aloziyên aborî û diravî yên sermedariyê berhem dabûn, bi rêya qonaxên malgirtina wê ya dîrokî û li hember dîmenên serbizaftina ramanî rawestiyan, diyar dibin bi têkoşîna zanyar a dirêj li hemberî dadgehên soraxê li hemî cihên ku ew têdebûn, ji ber ku li cem zanyaran serpêhatiyên giştî hene, ew karê zanyarî berz dibe li ser her komeleke rehî, zimanî, an olî eger di serdema me yê niha de bê xwedîkirin . Ew komkar balatirîn e , zanyaran li hevdû dicivîne, ew komkara hişmendî ye ne ya xwînî ye, a ku şer û pevçûn bi dû xwe ve anîbû, ji ber komkara hişmendî komkarek e bijarî ye, bijardeya berketî hildibjêre ji ber li cem taybetmendî hene xwe pê ji komên mirovên din ve cuda dibîne ji ber ew komên din bi afirandina, raman , wêje û hunerê û sazkirina bi armanc kêm berdikevin , ji ber ev komkar hemî ramanyar,afrêner,wêjevan û hunermendan kom dike, û bi heyîna mirov bala dibe, ramanên nijadperest nahebîne, guh nade tiştê ku afirandinê li cem mêjiyê afrêner dikuje, an belavbûnên destkeftiyê lawaz dike.**

**Ew komkar afirandinê berhem dide, bedewbûn û xêra a ku namiçiqe, evînê armanc dike, ji ber ew biservehatinek e bîngehîn e ji bo duristkirina karê mirovî , saya xwe li ser hemî hebûnê digre , berve rêbaza aborî ji wêzimkariya hebûnê ve, ew aboriya bi hêz , ewlehî û aştiyê li warên gurbûyî bi sedemên ceng û pevçûnên çekdar cîgir dike, ew aboriya a ji daxwazên gelan berve aştî û azadiyê bi serdikeve.**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Pêvajoyên firotina çek û hişbiriyê û derxistina aloziyan jiyana mirovî tevlîhev kiribûn, ji vê bobelatê heta civakên sivîlbûyî (Ewrûpa) ewle nebû, wek nimûne aloziya Sûrî pişt re Okranî dijwertir zorengek î çekdar in di riwê cîhanê de afirandibûn, hatibû derxistin li cihên cuda , destpêka wê li kêlek û veguhêztina wê bi rêya pêlên koçberî û nîştecîbûnê li cudabûnên welatên Ewrûpî, tiştê ku aloziyên cuda ji wan welatan re diafirîne, ji wan dewletên yên koçberan xwedî dike, bi sedema rewşa bihevketina aborî di navbera xwediyên diravê, bi dawî  ve şerê Okraniya û Rosiya derket û pêlên koçberiyê berve welatên kêlek û ewrûpayê hatin ji bilî aloziya gazê , û ji vir banga min ji bo yekbûna zanyaran li cîhanê pêdiviyek e lezgîn e ji bo pêkanîna rabûna mirovî a sozdar bi pêşerojek e baştir ji hebûnê re.**

# Avabûna zanyarî pêşeroja heyînê ye

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**Zanyar îro bêhtir dikarin rewşa çavbirçîbûnê a ku çavên xelkê kor kiribû kedî bikin , ev wana li sirûştiya malgirtin û desteserkirinê dihêvoje, bi rêya li peyketina bi dû banga zanînê a mirov dihêle ku rastîn be, ewa pêşî û berî her tiştî berketina xêrê ye û xebat e ji bo dehfandina wê mîna erkekî zanyar aramanca wêna başkirina dîmenên jiyanê ye.**

**Û zanîna a em wê binav dikin ewa tekûzkirina têgehî ye , bîrnasê xuristî pê mijol dibe, di pêraxistinê de , ji bo pêkanîna xwestekên xwe yên berketî, yên meyldariyek e dijwar ji guhertinê re aşkere dikin, bi dûrketin ji çi tiştê ku mêjî tevlîhev dike û dihêle ku bi şerûdiyên sertiyê bê kelepçekirin, bandorkirina ne berketî bi kesên din ve, ewên ku bi belavkirina nirxên neyînî a ziyander mijol dibin û rewayî dan e bihaneyên bêkêran beranberî dûrketinê ji giyana tevgerê ve , berhinde alava mediykar dixebite, ji bo belavkirina raman û ecnîdeyên xwe yên taybet ,bi kontirolkirina mêjî û kedîkirina wî, bi encamê wêna mêjiyek stûxwar dikeve dewsa mêjiya şîrovekar, yê guman dibe û dikare tiştan ji hevdû ve veke, mêjiya ku tiştê alava mediya bi zîrekbûn û jîrbûn belav dike werdigre, rastiya ku zanyar berz dikin di henas de cîgir dibe, dikare tiştê ji derveyî gumanbûnê pêkbîne, eger ji henas re zemînek e sirûştî û hêsan bête peydakirin, ta bibe rêgir li pêş girêdankirina berketinê bi nediyarkirinan, desthilata serkotker li ser sepandina wê li ser bijardeya ciwan xebitî , ta wan têxe di xefka tembelîbûnê û pêşwazkirina ramanên ku xizmeta wê dike û nakeve di karguzariya mirovê yê**

**berve baştirînê bi hemî raberî û berketiyên xwe ve diçe, berhinde ew li zanîn û pileyên wê ya xuristî digre, bêhtir dikare wateyên xwesteka sirûştî têbighe, ew tê berzkirin bi seyrana derbasbûnê berve baştirînê, û malgirtina bedewbûnê bi rêya ramandinê rehetiyek e mezintir li pey heye, nêzikbûna ji nû ve û şoreşê li ser her tiştek î tebitî û asêmayî ewa bîngeha zayîna ramanên baş û nû ye, bi rêya hebûn û evînê em xwedê nas dikin, em dinasin çawa bi erka mirovî rabin, di zanînê de armancên bilind pêktên û koçeriya xelkê û dirindeya wan tê jêbirin, bi dîtinên wana balatir dibin berve jiyana sozdayî bi hemî xêr, maf û bedewbûnê ve.**

**Tiştê herî ku ziyanê dide mêjiya xuristî dema bi hebûnê dirame ewa tiredînkirina tiştê nû ji ramanan û biçûkirina nirxê karkeran ji bo tevgera guhertinê li pêş dehfdin.**

**Û pêvajoya girêdana xebat bi nirxê ve, beranberî wê ye girêdana di navbera zanista a ku ranaweste heta sînorekî û rewişta a ku nêriya çavbirçîbûn û xwedîtinê li cem afrêner kedî û celew dike û bi awayekî xuristî ve bi xwe wî berhelist dike, ta guman neke ku tiştê ew diafirîne nikarbûnek e wekî wê çênabe.**

**Tiştê baştir timî armanckirî ye ji komên ên ji rêbazbûna lêkolîner ve xizan in, ev tişt ji lêkolînerê meraqdar re jiyanîbûnê distîne, dema bi tilîlî û çepikan tê xapandin, bê li berçav bigre ku afirandina zanyarî geregiya wê bi bêalîbûn û babetiyê ve heye ,wî dihêle bighe li tiştê ku ji maf derdikeve, herwiha destkeftî bi serdikeve ligel**

**berdewambûna nameya hiş di ronakbûnê de, bê ku xwe deyne ji mirovên yên ku ti nirxî nadin başiya afrêner û bi nirxê afirandinê û berdewamiya wê bi derbasbûnê felekan ve hest nabin .**

**Û zanîn bîngeha wê tûxim û giyan e ji bo afirandinê yekgirtî, herdû jî evînê pêktînin di henasê mirovê hişmend de, wisa em dibînin evîn ew xwegêra ku pêradixîne ji bo afirandina rêxistina nirxên rewiştî bi giştî ve, rola mirovê zanyar ku bibe yek ji berzbûnên şaristaniya gerdûnî avadanî û giyanî ve ji bo rizgarbûnê ji perestî, efsanîbûn û bêcaniyê ve.**

**Têgihiştina rewşa mirovî bi pêdivî û sazîbûnên xwe yên civakî, dîrokî û aborî peywerek e pêşî ye ji hurmetbûna hemî taybetmendiyên mirovî û bi zanînê çêdibe ku hatinrêz bên e çalakirin ne qelskirin û dorpêçkirin bi rêya zorengên berdewam ên nayên rawestandin an cîgirkirin, bi rola a ku li ser milê zanyar, dikeve ku girtinhevî tenê di çarçoveya têkoşînkirina paşdemayîn, sertî û nexweşiyê de be.**

**Zanyar dibînin ku yasekirin karekî berketî û xuristî ye ji hebûn , evîn û zanînê re, berhinde yaseyên xuristî a ku ji pêdiviya pêşîn hatiye wergirtin beşdar dibin di binyadkirina jiyana bi armanc ve ê ku xelkê dihêlin heyînê nas bikin û pişt re berketkirina xwedê bi rêya evîn û vekolîna daçûnên wê.**

**Û ramanên herî kirdeyî ew ramanên ku ji rewşek e cawîne zayîn dibe, kêşeya mezintirîn ku li pêş zanyaran disekine**

**ew biveya a ku gef li ser pêşeroja hebûnê dixe bi sedema cengên ku xwediyên diravê û hatina diravî saz dikin, encam bi diyardeyê ve girêdayî ye, tiştê diqewime di destpêka çêbûna diyardeyekê bi encamê ve guhertin çêdibin li ser cîhanê teva û pêşî ji parçeyên wêna destpê dibin, armanca erênî a bi encamê ve felsefeya cudabûnê derdikeve, ew tiştê ku zanyar hewildidênê taku encamê wê çinî bikin mîna têgehên nû dewsa têgehên têkdan, dûrkirin, gelemperatî û setemkariya zordar pêktên, alava sincî a tebitî li ser saxkirina giyana hezkirinê a ku di berketina baş de cîgirbûyî ye , ewa raya zanînê di jiyankirina hebûn û avakirinê ye, ne bi talankirin û gemarkirina heyînê , parastina rêbaza zanyar ew tek hêvî ye ji bo rizgarkirina destkeftiyên şaristaniyê , zanyar mizgînî pê dan ji kevinê kevin ve.**

**Û jiyan heye bi rêya berketina mirov jêre û zanîna wî, peywendiyê bi a din re ewa destikek e ji têgihiştina pêwîstiyan bi giştî û pêkanîna wan.**

**Û lêgerîn ji henas bi rêya zanîna hebûna dewlemend ve ye , ew şaxdayî ye bi bedewbûn , pirsîn û mijolbûnê ve pêktê, ew ji taybetmendiyên zanînê ne a bi rêya wê mirov encamê ji rêyên jiyankirina hebûnê ve digre, ji ber vê yekê yekem diyarbûnên mirov bi qonaxa meyînê ve destpêbûn e an ketina ramanê ji bo diyarkirina tiştan û ligel mijolbûnê mirov gîhiştibû diyarbûna êgir û bi rêya ji xwe pirsînê felsefa xuristî çêbû ,bi nasîna her çar hêmanên hebûnê ji av,ba,agir û ax ve , xweda nas kiribû piştî ku bi hebûnê ve ramiya bi rêya naskirina parçeyên wê ta gîhişt e tek**

**xwedayekî, cîhanê afirandibû, bi rêya mijolbûna a ku rê vekir ji bizaftina tevger û yekîtiya jîrbûna dîtinî bi a kirdeyî ve.**

**Û zanyar evînê dibînin rastiya xweda di hebûnê de, ewa xwestek û dilhilavêtin, û hêvî ye, bi guhertina tiştan ve û şoreşê li dijî hestbûna bi mirin, reşbînî û radestbûnê , afirandina jiyanê her car ji bo naskirina zêde ji nepeniyên heyînê û nehêneyên wê bi rêya zanînê û xwe bi çekirinê bi evînê ve, ev yeka aloziya a ku ji tevlîhevîbûn û rewrewkan encam dide qelstir dikir, hezkirin encamekê tîne holê ku mirov rehet e û hebûn jî rehet e eger armanc wergirtina pileya rabûna lutkeya a ku naqede be û ewa zanîn e.**

**zanyar berve xewinê diçin taku pêkbînin , ji ber ku ewa bîngeh e ji tiştê ku pêdivî çêbibe, dibînin ku ti rê ji bo jiyanek e nû nîne ji bilî azadiya xwestin û xewinê ji bo pêşveçûnê, ji ber evîn nirxekî bê sînor e ji hebûnê re tê standin wekî zanînê , û rêjeyî di hinira a sînordar de ye li cem takekesan in bi gîhiştina rastiya hebûnî ve, rastîbûn ewa yek ji mezintirîn çêkirinên mirov yên tewrî ne, tişt peyda dibin bi rêya baweriya a ku mirov bi rêya wê nîşan dide koka yê ku rastiyê dîtiye û pê bawer bû yeû madem mirov pîvanan diafirîne û hinekan jê nevêtî dike tê wateyê ku ew dikare çareyan berdewam bîne ziman û pirsînan bi rehetî berde, taku sazbûnek e nû ji ramanên nû û zanînî re piştrast bike, ji ber ku zanyar ji kevin ve cîgirbûna çi ramanê bê a din nikarîbû piştrast bikra, ramandin û afirandin li cem pêxemberek an ramanyarek an feylesofekî ranewestiya, hebûn timî perde radike ji ser tiştê veşartî ve**

**bi dîmenekî pilepilebûyî, zanyar hewil didin berdewam wêna aşkere bikin.**

**Rewşaniya a ku gelek têgehên gotûbêjî berhem dabûn, dibû encama hewildana mirov ji bo rizgarbûnê ji kedxwarî û mizgîndanê bi rola evînê di berhemdana têgehên hêza zanyarî a bi armanc e ji bo vekolîna navdariyên heyînê ji bo rabûna bi bermaya şarîştaniyên dewlemend ve bi herdû hêzên xwe yên tûximî û ramanî ve yên li dor wê zanyar dicivin mîna sînacekê li dor hebûnê, bi rêya rêxistinkirina a ku mirov ji belavbûn û windabûnê diparêze, encamgirtin ne ji nivîsandina şîretnameyan li ser depan e bi qasî ku em bi rêya wê gewrebûna hebûnê dibînin bi herdû şaxên wê yên beranberî hevdû : evîn û zanîn .**

**Gelek caran em dibînin pêkanîna rêgezek e rewiştî an hînkerî dadmendiyê dide tiştê ku em pê bawer dibin, ji ber vê pêwîst dîtin û kar hebe, zanyar kerkerê jiyanê ne bê dep û xemilandin, ji ber ew bawer dibin ku mirov hinirek e sîndordar bin siha civaka a ku bi xwe pêkanînek e bin sihwana hebûnê , û xwestin ew zanîna hewildar e berve parastina heyînê ,divê hemî zanyar ji bo wêna bikevin pêşbirkê ta ku bihêlin bedew bimîne, ev pêşbirka dan û standina xweş berve sivîlbûnê diyar dibe , bi pêkanîna hemî pêdiviyan ji bo qurbaniyên şer û bobelatan , herwiha ji bo avakirina bîngehên şaristaniya zanînî li hemî deverên cîhanê..**

**Xwesteka zanînî her dimîne bi berdewamkirin û hewildana zanyaran berve têkoşîna li hember sitemkar û tundirewan**

**yên wêranî û çavbirçîbûna wan gîhabû her avabûnê, lê çi tişt ji bermaya bedew ji neviyan re li hebûnê hiştin ?!**

**Û hebûn şopa hewildaran ji bo avakirina wê ezber dike, hemî bergirê erdê ji destpêka dîrokê ve mirin ji bo wê biparêzin, ewên diyardeya zanînî a wateya wê serxwebûn û azadî ragihandibûn , serxwebûna ramandinê, taybetmendî û rengê civakî berve pêşveçûn û cudabûnê ye li ser hemî komên mirovî tê sepandin, mercên jiyana rastîn piştrast dike,ji ber pêşdebirin diyardeyek e xuristî ye bi hemî jindaran ve peywendîdar e, ji derve û naverok de ,di çarçoveya pêvejoyek e giştî geşepêdana biyolocîk û deronî li xwe digre bi pergalê yekgirtina rewan bi naverokê re.**

**Û bawerî bi jiyanê nîşana xwe perwerdekirina henas e li ser nûnertiya yeksanî û jinavbirina têgehên pevçûn û durûtiyê û afirandina rêgeza jiyana nûjen e di bawerkirina evînê mîna ku Zerdeştê kal li pey ketibû, û sofîkar Mihyadîn lawê Erebî 1 navdartirîn mizgînvan e bi diyarkirina bîrdoziya ketîbûnê a tê naskirin bi yekîtiya hebûnê , ew dibêje:**

**Ez bi ola evînê bawer im eger li ku be**
**gavên wê ewa ol û baweriya min e**

**----------------------**

**1- Mehemed kurê Elî kurê Erebî a Hatimî Etaeî Endelûsî , û navdar e bi Mihya dîn bin Erebî, yek ji navdartirîn sofîvanan e , û bi Eşêx Elekber ji aliyê alîgirên xwe ve hatibû naskirin.**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Hemî zanyar bin siha hebûnê pabendî evînê mîna olek e giştî dibin, ew ola a ku pêdiviyên ramandin û mijolbûnê ji hebûn û zanîna wê re kome dike, bi rêya felsefa tevgerê, ji ber jîndarê mirovî di nav de berketî rewş û sazîbûnên civakî dibe, li gor gengeşeya jiyan û zorengê berve baştirînê , bi rêya pêgirtinê bi rastiya hatinrêzê ji welatê mezin re a tê diyarkirin bi heyînê û jêbirina şerodiyên zordariyê.**
**Ji ber vê yekê divê tolhildanîbûn û rewanê tolhildanê bête jêbirin, bawerî bi zanînê bê kirin ji ber ew derman e , me ji wêranî, talankirin, û cengên vala rizgar dike, ewê bi sedema wê gelek qurbaniyên belengaz jiyana xwe ji dest dan, bicîkirina têgeha jiyanê û parastina wê ji bo hêza a ku jiyanê dike piştgir ji bo têkbirina sazîkarên mirinê û tunekirina wan bi rêya şerê dijî wan bi eynî alavên yên ew bikartînin, bi rêyên wê stonên jiyana şad wêran dikin, belavkirina azadiyê bi jiyankirina çi tiştê ku jîndarê mirovî razî dike, bi rêya jinavbirina kedxwariya saziyên fermandar bi navê ol, berjewendiyên aborî, û parastina pir netew û pêkhatiyan, ji wan hêzên yên ceng û aloziyan ji dewletan re dişînin taku destê xwe deynin li ser wan, xebatê ji bo cîgirkirina nasnameya zanînî a cîgir di naveroka şaristaniya zanînî de li cem gelan bi rêya çalakirina hinirên wan ji bo karguzariya jiyanê , qonaxa a ku bi rêya wêna zanyar mizgîniyê didin ew qonaxa a ku sînordarkirina hişmendiyê bidawî dike , ji bo belavkirina zanînê bê malgirtin an cudakirin di navbera civakê de ji bo dewlemendkirina jiyanê û pirrenga têgehên bala , ev yeka avakirina bîngehên nasînê diyar dike û pêşeroja hebûnê binav dike.**

# Cîhangêriya zanyarî

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**Armanca a ku divê bi rêya wî hinirên zanyarî ji bo hebûnê bi yek bin ewa bi dîtina şêweya rêxistinî a giştî ye, û ewa destika gerentor e ji berdewamiya pêşveçûnê bi rêya berdana cîhangêriya zanyarî, ji ber ew destpêka zengila dawiya aloziyan e , ên gelan dorpêç dikin , wana di warê aborî de diwestînin, û li cengên vala û berdewam dehf didin û rêxistina sertî ,birçîbûn û zordariyê bi rêya cîhangêriya zanyarî wêran dibe, kelem di nav zanyar de li warên hebûnê bi dawî dibin, di bin siha vê cîhangêriyê de jiyana hevbeş û destdanhevî di navbera cudahiya desteyên dewlet û herêman de pêktê , ji bo pîlankirina pêşerojek e gulî ji hebûna bedew re, bi tunekirina malgirtin û têgehên wê, ê bi aliyê ezezî, nezanî û zorê diçe.**

**Çanda cudabûnê kedek e zanyarî ye biciyawazî û berzkirinek e bedew e ji pinca hatinrêziyên bala û afirandinên bi nirx re , derpirandinek e bêtir e ji dayîn û pêkanînan re û parastina jêgirtiyê , bi rêya wê qameyên jiyanê li cem gelan bi afirandinê aşkere û pirreng dibe, bidawîkirina sitemkariyê û parastina mafê mirovan.**

**Û ramandin ji navdariya berketvan e ji henas re û ji gewrebûna hebûn û hinirên bedewbûnê , çi rê ji bo yekbûn û yegirtina civakan re nîne ji derveyî bin siha zanînê , yekbûna a ku em binav dikin wateya wê nemana sedemên awante û wêraniya nirxî ye, ne watekirina wê, rakirina rolên bijarde ,reng û pêkhatiyên civakî ên bi taybetmendiyên xwe ve ligel hevdû jiyan dikin.**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Ew bend dihêlin ku barê jiyanî bêhtir bibe, ji ber ku tof, rageh ,ol û netew rengên ku dilxwazê dadmendî û rehetiyê dikin , eger ku em sedemên çêbûna wana  li nav xelkê bi rastî vekolînin, ji ber vê yekê zanyar dixebitin li ser aşkerekirina zanînê  mîna tevinekê van rengan dinixumîn e ta bihêle bêhtir bedew, çirûsîn û zelal be.**

**Fermandariya comî zêde sitemkarî û bindestkirinê ji bo bijardeyên civakî re diçîne, fermandariya ragehî nezanî û gelaciyê tîne, fermandariya olî tund û tojî û sertiyê tîne, rê ji bo azadîbûna vînan ewa zanîn e, zanyar dikevin  pêşbirkê ji bo gîhandina evînê a ku nûnertiya zanîn, hebûn û doza hezkirina wê dike.**

**Zanyar li ser hizirkirina hebûnê, vekolîna zanînê û berdana hezkirinê di nav xelkê de li hev dikin, ji ber ew rêyek e ji bo vegera mirovê hişmend li şaristaniyê, cudabûn û hatinrêzê, ji ber ewa tek tiştekî lihevhatî ye, berhinde xêr ji hebûnê ye û bedewbûna zanînê ji evînê ye .**

**Nexwe evîn perestoya nirx e û ji hebûnê re vedigere , zanîn jê dibişkive û zanyar armanca wê dikin.**

**Zanyar têkilek e ji cotbûna evîn bi hebûnê re bi rêya mirovê berketî  û çaxê ku alavên xwe bikarbîne ji têgihiştina vê felsefê wê bi mirovê zanyar bê naskirin , wê bibe ji rêxistina zanînê, ji ber hinirek e naye tunekirin ji avakirinê û sîstemê saz dike.**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Mirovê niha baweriya xwe bi evînê nema, ji ber wê dest bi darêjdankirina wê kiribû, lê zanîna a ku li ser hezkirina heyînê avakirî ye me dihêle ku em bi dû ramanên nû bikevin ji bo jiyana me, ji ber bîngeha a em ji xwe re ava dikin bîngehek e rastîn e.**

**Baweriya a ku bêcanî û winda nabe û yê timî diyar dimîne bi ferehiya gerdûn û jiyanê: ewa zanîn e a ku asoyên mirov vedike û dihêle rewanê wî nêzî sirûştê bibe, sirûşta a ku Zeredeşt 1 hezkiribû û vê yekê Nîtşa qalê kiribû di pirtûka xwe ya ciwan de bi navê ( wisa Zerdeşt axivî) , evîn nemir e, nemiriya yekbûna tûximê bi giyanê ve, ew di zanînê de cîgir e ,bi yekbûna hebûnê diyar e .**

**Zanîn ew nirxa bilind e, bi rêya wî bangên mirovahiyê teva bi yek dibin, ew bîrdoziya gelemper e ji ber guherbar û guherî ye, lê bîrdoziyên cîgîrbûyî dîlgirtî serdem, kom, û bijardeyê xwe ve ye , di berjewendiyên xwe de girtî ne, ew bîrdozî tim rastî xirakirin û xarbûnê tê.**

**Binema li ser zanînê radibin, zanebûna a ku hinira guhertinê sînordar nake, ne mebest bi binemayan helwestên niha ne , a cîgirbûyî di evînê de ewa dayîn e, ji ber ewa navdariya hebûnê ji me re ye, em fêrî dayînê bi zanîn û evînê dibin.**

**Evîn ew zanîna a ku namiçiqe, û rê ji bo jiyana nû li gor dîtina zanyaran ewa lêkolînkirina mirov e û xwarinkirina wî bi sedemên hezkirina wî ji hebûnê re, heta ku mirovê zanyar eger naverokî an zanyarekî giyanî be , herdû jî bi**

**xuristî û lihevhatina evîn û xweda bawer in ji ber ew dûmahîka têgihiştina gerdûnê ye, zanîn di henasê zanyaran de lagirtin, goşegîrkirin û bikevirbûnê têkoşîn dike.**

**Zanebûn mirov ji lawazbûnê balatir dike , ew şoreşek e li hember darêjdankan, afirandina alavên yên pêşketina karbînîbûyî diafirîne, ji mirovahiyê re ragehên jiyanê û reftarên wê berhem dide, lêbelê beranberî vê yekê ramandin û dagihêjî kiribû jêre bîngehekê ji berdewamkirina jiyanê re û ewa felsefa bi**

**--------------------------**

**1- Zerdeşt li navçeyek e ji rojhilatê kurdistanê ji 3500 sal jidayik bûye, û pirtûka pîroz ji ol re binavê Ebistaq an Evista ye, bi zimanê kevin hatibû nivîsandin û jê zimanê Kurdî pêkhat.**

**armanc e ji azadiya mirov û diyarkirina rastiya şadiya wî bi rêya yekgirtina mêjî û dil ,herdû ramanên pak tînin.**

**Û bawerî bi evîn, hebûn û zanînê ji bo zanyaran e û her zanyarek î ji xwe re rêbazek î hildibjêre ji bo bişanhildana evînê.**

**Ji ber zanîn ji berhemê keda mirovahiya hişmend e û pergalên netewî ne û li ser rêbazek e ronakbîrî diçin , bîngeha xwe li ser dûrkirinê cîgirbûye, netewbûna erdnîgarî lawaz e di hundirê kesên xwe de tiştekî neçandibû ji bilî dûbarekirina sloganan û razana li ser xewinên lawaz û pesinvaniyên donkîşotî , rewanê zanînî girstirîn hinirek e , dikare jiyanê ji nû ve  weşan bike di giyanê netewên**

**radestkirî de ewên bi temara serberjêrbûnê bindestbûyî ne.**

**Şofînizma netewperestan û nijadperestiya wan ziyanên bi du hevdû ve ji netewan re anîn , ew netew ranabin bê hezkirin û hevnasînê li vê hebûnê, zanîn xwenasînek e zanyar e ne ya netewek î bi xwe ye ji bilî ya din, ewa xebatek e bi rêk û pêk e û şoreşek e keftikî ye dijî ropartên derewîn bi hatinrêzên sexte ve, rabûna netewan bi serhildana wana li hember binaxkirin , mirin û sitemkariyê ye, dijwartirîn girêdan ew a , girêdana bi zordarekî ve , sertirîn kolebûn , kolebûnên me ji bo gurandina gelên yên berketî şiyarbûnê bûn piştî serdemên razan û xumamiyê.**

# Takekesiya zanyarî û cenga guhartinê

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**Bîrnasê zanyar Karil Yasbirz dibêje 1 : ( bîraweriya dîrokî û rodanên dîrokî lehengiyên takekesî biryarê wana didin, rodanên şoreşa Ferensî ne gelê ferensî û ne jî alavên hundirî  û derveyî biryarê wana dabûn , ên ew çaxê dîrokî dorpêç kiribûn û bibûn sedemekê ji rodana şoreşa Ferensî re, lêbelê ew wê lidarxistibû lehengiyên takekesî ji rêveberên şoreşa Ferensî bi radedanî, xwendina me ji salê dîrokî bi rodanên wêna ve, tenê hewildanek e ji bo zelalkirina çi tiştê takekesî û lehengî di van rodanan de.)**

**Bi rêya ramandina me ji vê veqetandinê re di rêbaza takekesîbûnê de û dîtina wê li gor sergehek e zanyarî , li ser girîngtirîn navdarî û nîşaneyên kesayetiya taqilker û vekoler ji êşên derdorê ,hingeme û nakokiyên wan  binecî dike, dibe em di çarçoveya axaftina Yasbirz sînora girîngiya van lehengiyên takekesî piştrast bikin, yên efasnên kevin, Yonanî,Romanî û ji bilî wan wek nimûne anîbûn e ziman, ji me re nişaneyên lehengiya takekesî û rola wê ji pêşesazîkirina dîrokê û guhertina nîşaneyên wê piştrast kirin, ji sînora baweriya me ve pêşî bi sazîkirina takekes  û avakirina wî avakirinek e qayîm, ji ber ku pêşesazîkirina takekes ji sazîkirina civakê teva ye.**
**Û dibe ku em di çarçoveya wateya lehengiyê lêkolînê bikin, ta em bibînin ku ew guhertin bîngeha wê ye, û guhertin jêderên xwe ji vîn werdigre û vîn ji berketin û bîraweriya bi girîngiya zanînê re vedigere, zanîn ji civakê re dewlemendiya naverokî û giyanî bi awayekî beranber û lihevhatî pêktîne, dibe ku hebûn ji tevger û lihevhatinê û tevderbasbûna hemî alavên hewayî û ciyolocîk bi awayekî tevlîhev  hatibe li hevdû siwarkirin, pêdivî ye ku em rêgeza**

**wî a pê hatî ye naskirin bi guhertinê têbighin , madem her tiştî li hebûnê di guhertinek e timî de ye, nexwe tiştekî li pêş pêlên guhertina har bi dijwarî xwe nagre, wekî harbûna bavlîsok û lehî ye, henas tê belavkirin bi rengê vînên pirreng ve , bi pêş de tên ji bo karguzariya zanebûnê bi lêkolîn û kedên avakirî , ên pişta xwe didin e li ser alava tevgerê.**
**Û feylesofê zanyar Karil Yasbirz berdewam dike û dibêje : ( Hebûna rastîn pêktê dema henas xwe bixe di ezmûnekê de, ji xwe re tiştekî wê ji bilî xwe cuda dike çêbike, cîhan ji henas re sedemên rodanan pêşkêş dike, henas ew rodanan saz dike, eger ne henas be nirx ji çi rodanî re nîne, di sînorekê de pêwîstîbûna bi rodana dîrokî bi azadiya takekesî ve girêdayî ye ta rodan bê sazkirin.)**

**-----------------------**

**1- Karil Tiyudûr Yasbirz : ew priofîsorek î di pijişka deronî de ye, û yek ji bîrnasên Elmanya ye yên di çerxa bîstan detên e hijmartin li Oldinburgê Elmanya yê di 23.02.1883 de jidayik bûye, û li Bazil Siwîsre di 26.02.1969 de koç kiribû.**

**Û peywendiya zanyar bi alavên rewşê ve peywendiyek e berdewam û misoger e ji hestbûna bi pêdivî, talîbûn û xwesteka mezin bi dawîkirina belengaziyê , û ji pêkanîna rehetîbûnê û hestbûna bi xweşiya destkeftiyê piştî kedek î mezin re vedigere, û di vir de dîrok tê sazkirin û şopên wê li ser deroniya xelkê diyar dibe ta bên e girêdan bi girîngtirîn nirxên yên ji bona wê alavên jiyana bala pêktên, û gera zehmet û tekoşîna bi rêk û pêk a zanyaran evqasiya bedewî û rastiya parastina nirx piştrast dike, û wateya wê parastina erk û mafan e bi derbasbûna dem û dewranan ,û guhdankirina bi pêşesaziya takekesê zanyar naye wê**

**wateyê dorpêçkirina wî bi reftarên sextebûn û pesindayînê û aşkerekirina wî mîna nîşanek î desthilatdar , lêbelê beşdarîkirina wî di jiyanê û nirxên pêşveçûna civakî de, di çarçoveya rewşên wê yên dîrok û babetî de, û li ser rehniya wê çêdibe têgihiştina rewişt ku ew hinek regezên rêjeyî ne di civakên guherbar û girtinhev de li ser taybetmendî û çandên xwe ,yên malgirtîbûna wê dikin û xwe jê re dikin nûner, û pabendî pirrengiyê nabin, û di encamê de civakên ne diyar ji dîrokê saz dibin, û ên din barê girtîbûn û qutbûna ji dîrok û dema niha yê dikşînin, û ji bilî ku bihevketina aborî di navbera xwediyên diravê gîhabû asta xwe yê herî bilind , û di vir de zanyar rewişt û parastina wê piştrast dikin, bi rêya parastina xêr,maf û bedewbûnê, û piştgiriya takekesan û xwendinkirina wan ji bo geşepêdana malbatê bi awayek î nûjen ve, hemî reweştên pergalî û girêdanên xwînî derbas dike, berve malbatek e ku zanebûn mîna komkarek e rastîn û pêşketî wana dicivîne, evîn, çanda lêborîn û aştîxwaziyê armanc dike dewsa malbata êlî a bi êl, siyaset, rageh, netew û partîtiyê ve liyangirtî ye di nav hebûnek e ku bi her avabûn an wêranî bandor dibe, û tiştekî xuristî ye ku em bi zanebûnê bawer bibin mîna hêzek e rûbirûbûnê li hember reşbîniyê û nirxên wêna yê wîranker, yê ku xwediyên diravê bi çavbirçîbûn cîgir kiribûn , û jiyanê pê guhertin bin siha hingemebûnê yê wateya wê ne yasebûn e, û yê ku ji ser hebûnê ve bergê şaristaniya zanyarî rakiribû.**

# Pirojeya zanyarî û reşpêşkirina rewşenbîrî

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Vînên takekesan hel û mercên navdewletî diafirînin, bandor û kiryarên wana tevgera civakê û bûyînên wê bi derbasbûna dîrokê zeft dikin, berhinde takekesan civakê saz dikin, dema takekes çênebin civak jî natebite, ti sûd ji pîrozkirin û rehetiya me ya bi guman bi civakê ve wek diyardeyek e mirovî wê nebe ji ber ew bi rengekî ji rengan gef li ser heye,ên bergiriyê li nirxên wê dikin dîsa jî zanyar in, xwediyên name û tewriyan, kesên ku xîlika wênegirtinên nimûnî li xwe kiribûn û bi dû pesinvaniyên kesayetî ezezî ketibûn wana riswa kirin, dema ti rastiyeke bêsînor nebe ji bilî di hebûna bêsînor û zanebûna bêbend de, gîhiştina mirov ji hewildanê xwe re ji bo baştirînê bi rêjeyîyê ve girêdayî ye eger çiqas kedên mirovî bên e hevdan, peyketin bi dû zanînê rizgariyeke ji cîhanê re ye ji çaxên zorengan , têgehên perçekirinan kedî kiribûn, civakan tar û mar kiribûn, sîstemên şaristaniyê berve dîrokê hilweşandibûn.**

**Ew sîstemên avaker balabûnê saz kiribûn, bibûn rûnîgeheke tîrêjî pêşdar, berhinde kesên ku ramanên nû wana tengas dikirin nikarîbûn kiryarê baş û nû bipejirînin, ji ber hezkirin qepûşka nihadî li paş hinek têgehan e ,ew timî hêviyên zanyaran ji bo jiyanek e nûjen asteng kirin.**

**Zanyar îro parizvanê çi avabûnek e hindik maye hilweşe an wê bê xwarê û dema diyar li ser celebdarî hatiye bicîkirin, ne li ser tengbûna dîtinê li gelên navçeya dewlemend, berhinde hebûnek ji netewekî re nîne bi wateyê xwe yê rastir, yê a rast ku rastiyek heye netewan aşkere dike ,**

**girêdanên wana bi cîgehê, zimên, ol û cîranbûna dîrokî û nijadperestiyê ji encamê ramanek î dûrker e, goşegîrbûn ji berhemê ramanek î naye guhertin û bi girêdanbûnê ve dorpêçkirî ye, hebûn welatê mirovê zanyar e, evîn nasnameya xwe ye û zanebûn jî doza xwe ye berve ramandinek e saxlem rê dide ji karek î saxlem re, û dibe ku derdê gelên paşdemayî ji têgeh û nezaniya wana be, dijminatiya wê bi pêşveçûnê re, berhinde Vîktur Hîgu 1 dibêje : (Dema nezanî diqede, azadî destpê dike.) wateya hebûna nezaniyê berdewamiya sîstema serkotkirinê ye û cîgirkirina sitemkariyê û layanên wêna ji gendelî û hilweşîna rewiştî ye , ev yeka baş di sîstmên cîhana Erebî û rojhilata navîn de diyar dibe**

**---------------------------**

1- **Vîktur Hîgu: rojbûn 26.02.1802, koçkirin 22.05.1885, wêjevan, helbestvan û romannivîsek î Ferensî ye, ji navdartirîn wêjevanên Ferensa ye di qonaxa romensî de.**

**Hilavêtina zanyarî bêtire bi ramandin û tevgerê ve û di jiyanê de hinek rawestgeh hene di diyarkirina gotûbêjê , ji bo ku zanîn di me de biserkeve , divê em bi nirxên hişmendî û hezkirinê ve wekî yekgirtinekê bêne girêdan , hevdilî bê pîvanên hişmendî dergeha lawaziyek e serkêş e mîna pêla xwestekên har , mêjî bê hevdilî û rageha wijdanî pira ezezîtiyekê ye bi mirov ve diçe berve tunekirina destkeftiyan , alavên kiryara tevgerî a ku mirovê çêker afirandibû, şaristaniyên mirovî şîn kiribû, hatibû naskirin bi rastiya civakî a jêderê xwe heyîna ku em jê ne, bi rêya dan û standinê ye ,ewa pêşveçûnek e gewdehî ji pergalê alavên hebûnê ne ta ku gîhabû pergalê xwe yê naskirî û bîngeha avabûnê ew hebûna karlêkir e bi pergalê xwe ve.**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Zanyar ew mêrên meydanên cuda ne, û xwesteka wan ku hêza giyan bi berdewamiya hiş û laş ve bê qemitandin di afirandina kiryarê dezgehî de yê kiryarê serkeftî tîne, bi rêya sûdwergirtinê ji rêbaza bizaftinî û zayanvanî , li ser vac  û çalakirina wê cîgir dibin.**

**Naxwe zanyar: ew mirovê ê bi dîtina xwe  ji kesayetkirin û têgehên teng û dorpêçkirî di parçeyên pirsgirêkan de pêşketî ye , binemayên wî ji yekbûna hebûn û pêwîstîbûna parastina wê dibişkivin, bi rêya belavkirina felsefeya evîn û guhertinê, guhartina mirovan ta bibin nîşanên zanyarî bi rêya têkbirina nezanîkirina xelkê, bi avakirina Konfedresiyonan ên , partî,rêxistin , komele û saziyên civaka sivîl li xwe digrin, bi jêbirina cudahiya keleman ve di navbera gelan de ji bo gîhiştina ji komên zanyarî  taku bîngehekî saxlem ji sîstema zanîna mirovî re saz bikin .**

**Ji ber vê yekê girîngî û pêwîstiya damezrandina hêzek e leşgerî heye dewletan li xwe digre ji ên terorê pêkneanîn  ta bibin mertalekî bi hêz li hember teror û tundiyê ,destkeftiyên mirovê hişmend ji neman û têkçûnê diparêzin , bi tekoşînkirina rêxistinên terorîst bi heman rengên xwe, berhinde artêşa zanyarî dixebite bi hêzên xwe yên pisporî û teknolojî li ser têkbirina sazîkerê mirinê û bergiriyê ji mafê mirovan û belavkirina aştiya cîhanî.**

**Artêşa zanyarî ew birca spêrkar e , serkeftinek e ji mirov re ye, ewê rastî binpêkirin, birçîbûn û dorpêçkirinê  li gelek deveran tê, parastina zarokbûnê ji ber ewa bedewtirîn tişt e**

**li hebûnê, saziyên ku beşdarbûyînê di çêkirina biryarê hildigrin beranberî wê pêdiviya xwe bi ageheke zanyarî û bedew hene ji bo rêvebirina jiyanê ,ev yeka geregiya xwe bi kanîbûna bargirtina berpirsyariyê heye ,ku dikare kanîbûnên xwe yên ne normal piştrast bike, ji bo peywendiya rewiştî û pêkanîna hostetiyên dawîn ji komkirina zanyariyan ,ên alîkariya me dikin ji bo rastkirina kêşeyan, qedandina wan bi rêya danîna çare û berdêlan.**

**Û baweriyên bîrdozkirî li pêş afirandinên nû kelem in û zanyarîbûnî nûtir û bi hêztir e ji zanistdariya sexte ve ewên li binên wêranbûyîn û bê regeziyê bîrovebûyî mabûn, zanyar di kiryar û dîtinê xwe de xwe aşkere dikin ,ew riwê sipîtirîn in ji berdewamiya ramanên jîr ve , rastî di reseniya xwe de berdewam nûbûyî ye bi hebûnê ve yekgirtî ye, encamê rastiyê bi zanînê tê naskirin, zorenga rastîn ewa di vekolîna gotûbêjên jiyanê ne , zanîna her tiştê ku tê li ser lêkolînkirin bin rehniya lêkolîna zanistî a ku naveroka heyînê aşkere dike, diyarkirina jêderên vîna a ku zanyar distîn e ta ku ramanan sererast bike nifşek dû nifşekî, pere destikek e di destê zanyar de , ew jêre nabe kole, ji ber ku ew dirav di avakirina bedewbûnê de anîber dike, hişyariya zanîbûyînê bê guman li rê de ye, li dergehên şaristaniyê dixe ,ên vedibin ji bo mizgîndana bi rizgarbûna cîhanê ji qonaxên sitemkarî û koletiya ji pere re, zanîn ew armanca bilindirîn e a ku bi mirov ve bilind dibe ta nekeve bin riswabûn û girtîbûnê , ji ber herdûka bed in, ewa berketina bedewbûna berzbûyî di zimanan de ye , dibûn destpêka vekolîna danesînên evînê di nav gelan de, bi diyarkirina**

**wan ji maf, erk û azadiyê re, rizgarîbûn ji dîlgirtina demborîna sert erkek î zanyarî ye , azadî ji bo têgihiştina hebûn û qestkirina bedewiya wê ewa hewildanek e ji bo rabûnê bi şaristaniya hişmend ve.**

**Naxwe evîn, hebûn û zanîn ji encama rizgarbûnê ye ji gelek têgehên dijminkar û teng ve , wateya hebûnê timî hebûna evînê, hebûna zemînê, hebûna xwedê , bi rêya van berpalkan seyrana mirovê hişmend li bajarên zanînê destpê kirin , eger aloziyên gelan di nebaşiya rêvebirinê û gendeliya bijardeyan de dorpêç kirî be lê zanyarîbûn vexwendinek e ji bo damezrandina bijardeyên şarezakar ji bo rawestandina ev aloziya lerifandî û hatinên ên di hebûna bedew de pêdiviyek e xurt e divê ji vînên zanyar û beşdarîbûyî re bi dadmendiyê bawer bibe wek bingehekî ji bo gerentiya mafan, ew jî mercên sereke ne ji bo guhertina demukratîk .**

**Pirjimarî bîngeha cûrebûnê ye , tiştekî ji pêrewiya bi xubînîkirinê çavkar ve nebaştir nîne bi guhertina mîrên cengê û çeteyên wêrankirinê ji hêzên desthilatdar hurmetê nadin e çi binema an yaseyê , tenê jêre girîng in di fermandariya xwe de serdest bimînin û malgirtin û kedxwariya hatinan bikin bi berdewambûna pêşkêşkirina qurbaniyan ji laşên zanyaran ên qurbankar ji bona tevahiya hebûnê, ji ber desthilatdar bi kiryarê xwe yên çetîtî mezintirîn emraz ji serkotkirinê di dîrokê de berz kirin, bi dadgehên sûraxkirinê li hemî deverên heyînê hatibûn e diyarkirin , di dema zanyaran her timî dibûn e**

**beranên qurbaniyê ji bo pêşveçûna gelan û afirandina geşepêdanê di pêvajoka wê ji bo xweşî û pêşveçûnê .**

**Bergê zanyarî ew berga balatirîn e ji bo dûbarekirina samanên heyînî ji nişteciyên wê re bi têkbirina hişmendiya malgirtin û jihevxistinê , ev bi rêya saxkirina rêveberiyên zanyarî pirjimarî destpê dibe , li ser hevparîbûn û lidûheviyê hatibe damezrandin, taku bijardeyên gendel negihin hevdû, ji vir  em dikarin bînin ziman ku rabûna bijardeyên tundirew a olî , ku hinek dewletên mezin piştgiriya wana dikirin li cîhana Erebî dewsa siyaseta piştgiriya xwe yên berê ji xuseriyên wêna re ewa mîna belavkirina nezanî û tundiyê ye li ser wê , ta civak ji paşverotiyek ta paşveçûnekê ve bêne veguhêztin, ev yeka dibe ziyanbexşiyek e giştî li ser tevahî cîhanê .**

**Metirsî gefê xwe li ser hebûnê teva ye, herwiha rabûna vîna gelêrî a zanyar rodana terorê kêmtir dikir , taku ji derveyî giroveriya zorenga pêşî  dernekeve û belav nebe û li deverên din ji cîhanê newe veguhêztin .**
**Û serdariya cîgirbûyî di sîstemên fermandariyê de bi encamê bihevketin û tundîkirinê li sertî û desteserkirinê û girtina dev cîhanê birêvebiribû ji zêdetir ji girtinheviyan ên ku gelek pêvejoya gelan dereng xistibû û jêre dibû kelem ta bigha nimûneya cîhana sivîlbûyî a ku zanîn, avabûn û bîraweriya aştiyan e xuyanîkiribû, ev yeka bi heman rewşê xweşiyeke herdemî diafirîne.**

**Dûbare berhemkirina hişmendiya serdar ji kêşeyekê dertê bi pêmabûna hişmendiyek e bêcan naye mezinkirin, ji ber ji**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**ageha zanyarî dûr e , ev bi xwe hinirek e hestiyarî navenda wê hezkirin e berhem dide , ramana zanyarî têgehên yên jîniya ramanê çalak û afrêner kelepçekirî dike jêdibe, siyaset li cem zanyar piştmêrencamgirtin, raman û xwazeyên wê ne, û ne bervajî.**

**Nexwe zanîn a ew zanista kargêrîkirina evîn e , ew yê ku em wêna binav dikin parastina rewişta xuristî ango vegera li sirûştê ye.**

**Û nebaştirîn tiştê ku kiryarê ramanî a nûjen bicî kir ku ew şîrova evîn biçûk û qelstir kir , ta hîştibû tenê huş û sewda be di henas de wek hez be, lêbelê evîn nûnertiya tevger û têgerînê li hebûn dike, em ligel wê têgerîn û bandor dibin, ev pêvajoyana evîn saz dikin, ev yeka dihêle mirov hez bike biafirîne û nas û pirsan bike, evîn yekem dergehên zanebûnê ye dema felsefeya mirovî ronî da bi nivîsekê li ser deriyê yek perestgehan li Esîna : ( Ey mirov xwe nas bike) .**

**Û evîn diyar bû bi rêya zanebûn, guhertin ,vebûn û pêşveçûnê, bi encama ketina me di xefkê çêbûyîyan û tijîkirina sixbûyî û têkalîna li dor dûbarkirina ramanan û danîna pîrozkirinê li ser wêna , ev yeka hîşt ku em berve bêcanî,kevirbûn û parisvanî û girtinê biçin, ev deroniya afrêner û çêja wî têkbir, herwiha rêber û dilgermiya wî, siyasetvan û dîtina wê, afrêner birêve biribû li xwebînîbûnê ji bo lawaziya xwe berdewam bike, bi beza li pey leylankirina hênikên vala ji bijardeyên gelan bi rêya pêşkêşkirina wê ji pesin û sloganên pûç re, tiştê ku hîşt pêvajoya ramanyar sersima bibe, wî hîştibû di rewşa**

**sernugûnkirin , pozbilindî,sitemkarî de bijî , hestbûna bi xwedanbûna takekesî a diyar dibe bi dîmenek e xuyanî di ricîmên fermandariya gelemper de, hundirê rêveberiyên partiyên radîkal , encamên bobelatên wêna bêhtir di çaxê herdû cengên cîhanî de diyar dibû bi hilweşîna yekîtiya Sofiyêt û bi dawî hewildanên roxandina milhûriyên cîhana Erebî di pêla buhara Erebî de.**

**Pirojeya zanyarî ne ji vînek e derveyî tê sepandin taku bikeve di berjewendiya hêzên mezintirîn yên ku di warê siyasî û aborî de serdest in bin dirûşmên azadiyan û guhertina demukratîk lê ev piroje ji pêkhata şaristaniya rewşenbîrî ve ye di destê gelan de destpê dibe, bi çend taybetmendiyên cihêbûnî vîna zanyarî a saxlem li cem gellan berz dike , bi parastina taybetmendiyên xwe bi zanînê û parastina hebûna welêt û hezkirina xuristî a ku stona wê zanebûn e ji bo sermediya hebûna bedew û lihevhatî.**

**Û civak li gor ezmûn û serpêhatiyên wêna dikarin zenebûyînê belav bikin dema bi pêkhateyên xwe yên rewşenbîr re radibin, ji bo sazkirina bîngeha xuristî ji rabûna saziyan , bi vî awayî hemî takekesên xwe yên karker dibin e hêzên zanyarî berhemdar bi erk û mafên xwe li ser hemî ast û derbaran yeksan dibin.**

**Pirojeya zanînî ji aliyê hêzên mezintirîn û serdest naya sepa kirin, wê wisa bibe pirojeyekî waranker li ser nedadî û serdestbûna li mêjî tê cîgirkirin , ev jî rê vedike ji malgirtina hatinan, lê zanebûn kilîta wê bawerî bi**

**guhertinê ye pêşî, dehfdana wê mîna binemayeke kirdeyî, serdariya nirxên takekesî yên teng sînordar dike, ji ber ew nirxên teng li pêş azadiya xuristî û dadmendiyê dibûn e kelem , hatibûn e naskirin bi lîbraliya kevinşopî ewê serdestkirin û kedxwariyê cîgir kiribû , bidestxistina hatinên gel û gertentiya nezanîkirina wana ji bo di aloziyên bidûhevdû de dorpêçkirî bimînin .**

**Zanyar hebûn welatek î giştî ji xwe re dibînin, hebûn ne tenê erdnîgariyeke sînordar e bi sînorên nîgarkirî bi sedema ceng û hevpeymanên dîrokî û bûyerên talankirin û serdestkirinê li ser navendên sitratîcîk de, lê ew hebûn a bedewbûn, vejînbûn û geşepêdanê hembêz dikir, di felsefeya a evîn û zanînê armanc dike de diyar dike û ji yekîtiya kiryarê ramanî bi kiryarê kirdeyî ve destpê dike, ew raperîneke li ser têgehên erdnîgarî a cîgirbûyî , diyarkirineke ji nirxên yekbûna hebûn û zanebûna sade ve, ew mêjiyeke giştî û pêşverû ye ji mirovatiya saxlem re,başiya ramandinê binyad dike , ev yeka mirov birêve dibe li armanc, pêkanîn , jêbirina dûrkirinê,desthilatdariya tam û nezanîkirinê ên bêcaniya raman û reşpêşkirina rewşenbîrî peyda kiribûn.**

# Zanîn rastiyeke li  bin siha hebûnê

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Kombûna gendeliyê hîşt tofên pelixî di heyecaneke berdewam de bimînin, taku ji baskên hêzên nezanî û ezezî rizgar bibin, dema dadmendî û maf di saziyên dewletan de nebin bangên şoreş û xwepêşandanê dibin destikeke bi sûd ji bo danasîna bi zordarî û sertiya a ku wêranî xistin li hebûna welat, dîrok li ser serdemên mirinê yên desthiladaran wekî vekirokan wê binav kirin dibû baş çavbînekî , van pêngavan wekî talankirinên bêdad bûn ji bona lêdana hevrista nirxî û reftara jêrîn ji civakan re ên rastî pelixandinê hatibûn , wisa ziyan gîha heyîn û hatinên wê yên jîndar, van talankirinan dibûn asteng li pêş gîhabûna civakan li zanînê, bi nebûna dadmendî û ewlehiyê hebûn rastî gefê tê ,herwiha bangên zordariyê belav dibin bi vexwendina wê û bidestxistina tofên barketî ji mafên xwe yên xuristî re a ku hebûn ji wan re parastibû, rêya ku bêdadî û nezanî li ser be tu car nabe rêyekê ji evîn û zanînê re.**

**Û talankirina Mexolî 1 bandorekî xwezayî li şaristaniyên ku li Bexdayê û li dorê wê hebûn kiribû, bi encamê têkbirina Mexol ji gelek pirtûkên girîng re , ku zanyarên wê serdemê berhemdabûn, wateya vê yekê ku ceng timî li pêş netewan dibû kelem û astengekî ji bo pêşveçûna zanyarî.**

**Û diyardeya zorengê diyardeyekî pêşîn e ketibû di yek rêzên lutkeya lêpirsîn û bîraweriya mirov de ji henas û hebûna wî û a din re , nexwaz peywendiyek heye di navbera henas û a din de wek peywendiyek nakok li ser zorengê ji**

bo gîhandibûna qezenc û xêra ezez , zanyar dibîne ku divê têkiliyeke bêhtir wekhev, hevseng û hevsanî hebe di navbera henas û kesên din de, felsefeyên ên ku ez dewsa kom pêşde birin û jiyana mirovî hîştibûn li ser zorengê cîgir bibe, rê vekiribûn ji vekirina dergehên zordarî, sertbûn û hêzê re, zanyar gelek dixwazin bighin şadiyê , şadîbûna takekes û a din bin siha komê û di çarçoveya lihevhatin û lihevkirinê û hewildana berve hevberîna zanyarî.

Û amadebûna henas di komê de û bervajî ji berhema zanîna mirov û dîtina wî ya hevseng e li kêlek hebûn û cîhanê.

Zanyar bi vebûnê ve niyazbûyî ne ji bo zanîna rêyên rizgariyê ji hebûn re, û girtîbûn reştariyeke ,kesên nezan û zorkar wêna bikartînin ji astengkirina rola gellan ji pêşveçûn û balabûna wê berve baştirînê ve , diyardeya zorengê diyardeyeke divê erêniya wê ji neyîniya wê bê zelalkirin, dehfandina berve erêniyê ji bo jêbirina neyîniyê li ser rêbîra zorengê ji bo baştirîn û balabûnê

---------------------------

1- Mexol: ew gelê bakûrê rojhilata Asiya ne, û ji gelên êlî ne bi zimanekî hevbeş û reftarên koçerî ve beşdar in,welatê wan niha dabeşkirî ye di navbera dewleta Mengoliya a serbixwe û navçeya Mengoliya a hundirî bin siha dewleta Çînê ye û başûrê Rosiya y.

timî, zanyar ji xwe bawer e, ji bo zanebûnê dixebite ,bê ku bi bar an bi
astengî û bêcaniyê hest bibe, ji ber ku çi takekesekî zanyar xwe pêşde dibe bi rêya bandorkirinê bi a din

**ve,bandorkirineke karguzariya bîrawerî û balabûna wî dike bi piştpêbestbûna wî li ser henasê xwe.**

**Rêvebirina zanyaran ji henasên xwe re li ser peywendiya erênî bi xelkê re cîgirbû ye, dan û standina cîgirbûyî li ser têgeha tevgerê û li peyketina bi dû hemî rewşên hestyar li cem cemaweran û zanîna kiryarê gewdehî û rewanî herwiha têkiliya gizorîbûyî di navbera zanyaran de pêktê, zanîna rastîn di çarçoveya  rewşa civakî û rewiştî ji civakan re ye, bi nêzikbûna xwe bi a din re, civandina heldêra civakî di nav wan de.**

**Û di hevaltiyê de balatir derbirîn dibînin li ser hebûna xelkê bin siha hebûnê hebûneke rastîn pêdiviyên bîngehîn ji mirov re  têr dike, ji ber vê ew ji rizgarbûnê ji desthilata goşegîrbûyî di hêwirên ezeziyê û qezenca teng yê bi hezan ve  girêdayî ye xwestekeke jîndarî ye û vekolîna li ser hevaltiya cîgirbûyî a bi rengekî zindî bi pêdiviyên hiş û dil ve ji raman,başî û rewiştî girêdayî ye.**

**Û gotin bi ramana dademend wateya wê ew ramana a ku bi pêdivî û xwestekên gellan re dimeşe, pêwîstiya xwe bi ewlehî,xweşî û zanebûnê ve, xwestina wê ji aştiya cîhanî û qezenca cîhanî re .**

**Hebûn îro ji zanyaran re ye ewên  bin siha ramanekî berfireh ,ferebûyî, resen û  vekişayî geş dibin, reseniya xwe ji endîza nêdar û şaristanî ji gellan ve werdigre, ne teng û desteyî ye.**

# Zanyarî baweriya tek hebûnê ye

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Rastiya zanyarî tune dibe dema em xwe radestî tundirwiyê dikin, ew kelem metirsîdar e , dibe asteng pêş zanyaran ta negihin hebûneke ji wêranî vala, tundirewî ji navdariya pîrozbûnê ve hatî ye, hêzên xwedî berjewendî di civakên devgirtî de wêna belav dikin , hêzên serdest sûdê ji vê digrin bi rêya siyaseta afirandina alozoyên bidûhevdû ve , belavkirina tundirewiyê bi rengekî kirdeyî ve xizmeta berjewendiyên diravî û malgirtina sermedarî dike, derfeta qezenc û kedxwariyê zêde dike, ligel bicîkirina ne aramî û zorenga comî an partîtî an netewî , ev yeka berdewam rê vedike ji mîrên cengê û dewlemendên wê re bi rêya mijolkirina gellên paşdemayî bi awayekî siyasî ve ,herwisa dûrxistina wan ji rêxistina civakî ve ji bo afirandina kortên kûr û berdewam, wisa jêre hêsan dibe pêvajoyên malgirtin û sepandina raspêrîkirin û destwerdana biyanî, ev tişt zelal dike dewlemendiya deveran bi hatinên aborî, ev yeka nîşan dide li ser pêwîstiya dewletên serdest ji desteserkirina van hatinan bi rêya danîna neqşeya parçekirin, hûrhûrîkirin û bicîkirina girtinheviyên ragehî netewî li van deveran, û nimûneya tundirewiyê dikeve endîzên sazî û partiyên ên nirxên sitmekarî, dûrkirin û gendeliyê diparêzin, jinavbirina hemî zanyaran ên şerê partîbûna pûç dikin , herwiha şerê nediyarbûna sîstema rastîn ,a ew bi xwe rewanê heyînê ye.**

**Berhinde zanyar dibînin ji damezrandina komên giştî gelek partî, şepêl û komeleyan li xwe digere mîna çareyeke misoger e ji bo rizgarkirinê ji bêcaniya hişmendiya gelemper û navendiya bedenketî a dûrkar ji vîna zanyaran ên gera li rastiya cûrbicûr û hevgirtin û kar li gorî**

rêbazeke rastîn dikin, bi rêya danîna binemaya hevjiyana aştiyane ji bo berhemanîna bijardeyên zanyarî û rawestandina cengan ên bibûn nîşanên babidestiyê, gewirîna afirandinê bi heza çavkurî û têdeçûna li pey aloziyan , ev jî mirovan li çaxên cengan vegerandibûn ,dîrok ji me re ravekiribû, û baş mînak ji vê yekê re Romeya şaristanî, desthilatdarî û zorkarî û pişt re roxandina wê bi sedema hêlînên hevgirtinên wê yên desthilatî , divê zoreng li hember hêzên nezanî bê rêvebirin, ew têne naskirin bi vexwenderên pêşesaziya mirinê, ev erka zanyarî dibe kilîta têgihiştina hemî ol ,hizirbûn, şepêl û baweriyên ji bo parastina mirov û hebûnê bi rêya qayimkirina nirxan.

Û zanyar parizvana her bîrdoziyeke saxlem in, ew bi nameyê xwe (Evîn hebûn e û hebûn zanîn e) ve rêbendên kûr di navbera ol û felsefeyan de radikin,û bi taybetmendiyên gellan û cudabûna wan şehnaz dibin, hewil didin rêyên rêxistinî nû di têkiliyên mirovan bi hevdû re bibînin, naxwazin nakokî durist bibe, ew mertalekî parêz in ji cureyên bîrdoziyan in ên ji bo jiyan û mirovan biserdikevin.

Û ta em hebûna a em têde yeksan dibin bi rêya berketin, bîrawerî û baweriyê têbighin, pêdivî ye em bibin naverokekê ji rêxistina zanîna bi bandor re di henasan de, ewên bi sedema pêvajoya şîretbûnê beravêtîbûn, nirxên takekesên xwexwedakirî cîgir kirin ji berjewendiya qezencvanan ,ewên xwe li paş maskê rabûnê berjewendiyên xwe yên teng vedişartin, kiryarê tevgerê kiryarekî misoger

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**e hebûn bi xuristiya xwe ve li ser jîndaran teva pêşkêş dike, hişmendiya dûrkar bi lawaziya xwe ve diyar e, ramanê zanyar a ji yekbûna hebûnê dibişkive bi rêya belavkirina felsefeya evînê, li ser vê dîtina jîr û bi hêz derbirînê dike , ewên zanyaran pê navdar in berve mirov û jiyanê.**

**Ji ber vê yekê xelk bi naveroka xwe hest nabin tenê dema ku xwe di kombûnên zanyarî de yekgirtina xwe çêbikin , li ser şikestina bendan dixebitin, berhinde bawerkirin bi zorenga a di nav dewletan an hundirê çi dewletê de diqewime bîngeha xwe sewadîkirina dabeşkirina hatinan an malgirtina desthilatê bi rêya berdewamkirina şûnmayîbûnê, herdû jî ji berhema zordariyeke dîrokî qerpol e li pêş nezaniyeke sedema wê çavkarî û sertbûn e .**

**Û zanyar bi evînê weke felsefeyekê banga guhertinê dike bawer in, ji bo bidestxistina asta herî bilind ji pileyên şahî û xweşiyê ve û pêkanîna nirxê mirovan û parastina hebûnê wek pêwîstiyekî ji berdewamkirina jiyanê.**

**Û bedewbûna hestyarî zo dihelle û li vir jî hêza evînê diyar dibe di afirandina meya jiyanê, zanyar dibînin di mirinê de wekî nemana herdû hêzên giyanî û daringî an tunebûna herdû hêzan li cem mirov û ketina wî di talîzoka windabûn, nezanî û girtîbûnê de.**

**Û Istratîcîka zanyarî xelekeke gîhandinê ye xurt e berjewendiyên netewan bi hevdû ve girêdide li ser bîngeha hatinrêzê ji tek hebûnê re, ew netewekî hişmendî yekgirtî ye, bi rêya helwestên zanyaran li hember zorbedî û**

hevgariyan yên ku ricîma dadgeha soraxvaniya nû li her cih û demê pêkanîbûn, û hebûn welatê wanî giştî ye.

Hêza rastîn yê ku em pê dikarin mirovan biparêzin, hêza rewiştî di nav xwe de hembêz dike  a ku ji evîn dibişkive, bi rêya wê em dikarin gerentiyê ji berdewamiya baweriyê di nav xelkê de bidin, behirkirina hebûnê ji bo encamgirtina zanîna a ku milyonan ji nezanî, sertî û perîşaniyê rizgar dike, bi xirabûna nîvî hemî jî xira dibe, bi rêya heyîna bedew  em jiyanê û bedewbûna peyketinê berve rastiya bê sînor di zanebûnê de hizir dikin , gavên kirdeyî destpê dike pêşî bi baweriya bi yekbûna hebûnê û yekbûna mêjiya mirovî a giştî bi nûnertiya zanînê , em nikarin bi çi tevgera guhertinê destpê bikin eger em bawernebin bi wê rastiyê yê ku zanyar wê ji rizgarbûnê  re weke hêviyekê dibînin, herwiha zanyar bi vejînbûna mirovê nû bawer dibin, beranberî vê yekê kedên pêşiyên berê hurmet dikin ji bo lêkolîkirina şerên hebûn û parastina wê ji biveyên mirovê ezez ve, ji bo serkeftina rastiya zanyarî a cîgirbûyî li ser azadîxwaziya niştîmanî a li ser gelên kêlek û cîhanê teva vebûye, berhinde zanyar dibînin ji sazîkirina netewa zanyarî a yekgirtî dewsa sînorên erdnîgarî yên desthiladarên dijmin wêna avakiribûn û bibûn li hember çi aştîbûneke mirovî, tiştê ku mirovahiyê li ser heman bername û cudahiyên xwe dicivîne ew hebûna ku rastî gefxwarina bi nemanê tê ji  bobelatên bi encamê cengên ku bi destê mirovan çêbûne û dîrok wekî ciwankariya kesên heyî dibînin ji bo sengerandina ezeziyê weke rêgeheke cîhanî, lê a diyar û xuya ji her kesekî berketî re ku tiştê mirov gîhabûyê bi saya bikaranîna hişê afrêner , perwer û

**zanyar ve, hebûna welat ewa palpişta hebûna giştî ye û zanyar di her cihî de ji wana tê xwestin ku welatên xwe ava bikin , ji kesên wêranker û nezan paqij bikin, taku lawên heyînê bijîn, ji ber ew hêjayî jiyanê ne ji ber ku normalbûnê derbas kirin .**
**Zanyar Nîtşe bi mirovê serkeftî bawer dibû, ji mirovê normal nefret dibû, ji ber ewê serkeftî hêjayî afirandinê ye, lê ewê normal nêzî mivroyî û çilekbûnê ye, tenê heyîn bi saya tiliyên zanyaran bala dib .**

**Xwedî çareyan ew çi kesên ku jiyana xwe dabûn ji bo pêşveçûna nifşên nû , hemî nivîs û kedên xwedî çareyan bi aliyê evîn, hebûn û zanebûnê ve diçûn, li pêş ewqas sitemkar mînak Fereon 1, Neyron 2, Hitler , Stalîn 3 û Seddam Husên û kesên mîna wan û her ew zoreng diyar e timî bi derbasbûna dîrokê ve, serkeftina misoger ew ji hêzên zanînê re ye, rêber pêdiviyên xwe bi serkeftina leşgeran hene ta dîrok wan bi bîr bîne, leşger eger hiş û dilên xwe bikarbînin bi awayekî kirdeyî ve bi wan serokên ên li navendên xwe rûniştî re yeksan dibin,**
**ew serwer bi sazkirina hevpeyman û mercan ve mijol in , bi dayîna fermanan û şopandina çewsandina dozdaran ,ên cihên wan xistin bin gefan û hin ji wan zanyar bûn li hember sitemkarî, gendeliya wan rawestiyan, di vir de ji zanyaran armancekî bala heye ji têkbirina nezanîbûna xelkê û bêhişkirina wan bi sloganan, guhertina mirovan wekî nîşanên zanyarî bi rêya jêbirina hişmendiya xwedawendîbûna serok, armanca a zanyaran doza wê dikin ji pirsgirêkên bîrdozî û partîtî mezintir e , ji kiftika sazî , şepêl û partiyan di her dewlet an yekîtiyê de destpê dike bi**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**rêya xwebiçekirina bi ramana Evîn hebûn e û hebûn zanîn e û geşkirina rabûn û geşepêdanê di giyanê van sazî û partiyan li her deverên cîhanê û herbilîna li ser xalên hevbeş yên dikarin rêbendan rakin û aloziyên demborînê derbas bikin û vebûnekê li pêş pêşeroja cîhanî saz bikin.**

------------------------

1- Feron : navê fermandar e li Misra kevin li gor reftara ya di serdema nûjen de hatibûye naskirin.

2- Şahînşah Neyron 15.12.37 – 09.06.68 pencemîn û dawî şahînşahê şahînşahiya Romanî .

3- Stalîn : serokê dûyem a yekîtiya Sofiyêt a berê 18.12.1878 – 05.03.1953 .

# Zanyar di rû tirsê de li rojavayê Kurdistanê

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Nexweşî ew nîşana lawaziyê ye û bi xwe jî ji xuristiya mirovan e ji dema rêyên cuda girtin ji bo jiyanakirina kêliya demî ta roja mirinê hembêz bikin, tirs mîna baweriyeke qayim e ji xelekeke ji reftar û reweştên civakî hatî ye, mirov birêve dibe ji bo nehestbûna xwe bikarbîne, bermayê civakî bimije, ji çaxê zaroktiyê ve , ji ber zarok pêsîra diya xwe dimêtê û tiliyê xwe jî pişt re û bes nake, lê bi hizr û hestê xwe ve bi derbasbûna mezinbûna ramanê xwe dimije, ji ber vê yekê em keda afrênerî dibînin bi rehjenên mirov û berketiyên wî re bi heman demê derbas dibe, ji bo vegirtina nirxa herî baş di rûbirûbûnê de , diyarbûna rastiya wê a daxwaza jiyaneke bêhtir dadmendî û xweşî dike, bi piştrastina li ser hinira a ku bê cudabûn an armanc hewil dide tiştekî bi serxîne lê bi dawî karguzariya desthilatdarî û armancên wê dike, wisa em wateya ji gera mirovê zanyar li nav hebûnê dibînin pêşî ji erdnîgariya xwe yê ku di xwe de , di kiryar, helwest û çanda xwe de radike, ev yeka me dihêle ku em li pêş rastiya xwestekên bê hampa rawestin , ji bo dîtina jiyaneke baştir bê koletî û serdestbûn , herdû ji encamê mêtina nezaniyê derdikevin, herwiha ji komek reweştên**
**desthilatî ji perestiya cemaweran ji bizdana cîgir re ,di jiyan û saziyên wê de cihgirtî, dema em têkevin di nîşanbûna tirsê bi derbekê dikevin di xefka pirsên vekirî de li ser gelek egeran rodanan li ser maseya dem û cih a bi hevdû ve qemitî pelge dikin, dibe ku tirs nûnertiya bîngeha girtinheviyê di nav mirovan de bike, herwiha serdestbûna cîgir a ku bi rengekî neyînî bandora xwe li ser jiyan û civakê bi heman pîvan û nirxên xwe dike, çawa ku**

**tirs li ser hizr bê vegirtin , nirx têne guhertin bi rêya bandora bizdana ku li ser hemiyan hatiye sepandin, tirs nûnertiya destpêka girêdana bi rewrewkê dike, civakên talanbûyî yên ji hiş û azadiya xwe bê par mane hest dibin ku tirs tiştekî divê hebe, hebûna wî bi xwedayekî ve girêdayî ye, divê ew xweda bê perestkirin û qurbanên mirovî ji bo wî bên e danîn, herwiha guhdana fermandar ji guhdana wî ye, çi tiştê diqewime ji gendelî û bobelat ewa xwesteka ew xwedayê zorbaz e, ji ber vê em tirsê dibînin mîna ricîmekê ye ji berhema gana xwestekên desthilatdar bi tiştê dibin e sedem ji hebûna wî re mîna fermandarekî bi deqekî pîroz, kesên sana wê radikin bi hênikiyekê û zordariyeke bi rêk û pêk ve.**

**Tirs xwe bi cih, dem, perwerde û zanînê ve qemitand û ev tişt şagirt li dibistanan werdigrin, hîştibû gewrî dagirtî ahîn û dilzarî bibe bi ketina tirsê bi awayekî husteyî di henasan de, û ta çanda gelêrî a ji şaxên perwerde û hînkirinê hatibû wergirtin bibû riwekî ji xuristiya civakê re, ji ber vê wêrekî di roparta rojhilatnavînî de tenê destikeke ji xwekirina demborîneke ji derew û pêrawestina sawêrî tewşbûyî û mirov nikare bextê xwe bidêkî ji bo avakirina wêrekiyeke ji rewşa tarî hatibûye wergirtin, ango bi dema niha ve a bi bend û baskên desthilatê û kiryarên wê yên zorbed ve li hember civak û takeksan dorpêçkirî ye û li pêş vê fişara dîrokî û bermayê desthilatî civakan xwe dibînin di rewşeke ji koçberiyê ji henasên xwe re û bi awayekî bêcan,piştpêbestin û bi tirs ji siberojê ve dijîn , tirs bi awayên ramanî naye berhelistin, ji ber nediyarbûna ramanê, û xweradestbûna ji rastiya tiştê rodayî , nav lê**

**dibe bêdestî li gor têgeha olî a amadebûyî ji bo pêşwazkirina tirsê, çavê ku ji tirsa xwedê digrî ew eynê wê li gor derbirîna olî çavê yê ku digrî ji ber zorkariya fermandar û xwediyê malbatê û mamosteyê dibistanê, nabe di rastiyê de veqetandina bermayê olî ji ya desthilatî ve ,ji ber herdû du alavên kûr in ji têkbirina ronakbîriya civakî ne , ji ber vê yekê komên tirsê di xwepêşandina a ku banga bi jiyana serokê nemir dike tije dibin, lawê xwedê li erdê, ewê ku xwedayê padîşah serweriyê dabûyêkî bi bêdestî û vîna wî, ji ber vê divê xelk bang bi jiyana wî bikin, tirsê xwe dirajin mîna navdariyên dikevin kûrahî û hizrên wana, herwisa wê kilîtên tirsê bi hêsanî neşkin, berhinde kolan dibin talîzok û serdav têde laperînekên ademî derbas dibin, rewiştên komî tenê dibin pîvanên ji cotbûna fermandar û fermanber ve li ser rêça afrêner û aferandek hatî ye wergirtin , ji ber vê hişmendî vala dibin ,jibilî ji hinek tewî û gotinên kesên hênik ,wana nifş dû nifşekî vediguhêzînin, ji bo xemilandina jiyana wanî weke henekeke reş, ev dibe nîşana jiyana wan û nepeniya sertbûn û reşbîniya wana, ta xewinên demukrasî û vebûna li ser civakê tenê çîrok bin ,giyanên vala danagrin, tenê ji hinek xewinên bi windabûn û koçberiya giran ve ,dorpêçbûyî dimînin.**

**Vexwarina takekes ji tirs re wekî dûrketina wî ji henas re, veşartina dîmenên aştîbûnê ligel hemî tiştên taybet bi navdariyên afrandina takekesî ve li heyînê , ji ber vê desthilatdar li ser têrbûna civakê ji tirsa ji wan dixebitin, ta ku jiyana civakî bihêlin di çarçoveya dîmenên pabendbûnê ji xwediyê parî û serokê hemdemî re , bang jêre û cangoriya wî bi rewanê xwe û tiştê girêdayî bi van sloganan, zarok**

**rastî vê cureyê ji gunokirina ramanî û zanyarî tên ji destpêka çûna wan li dibistanê û rakirina wan ji dîmenên serokê xwe yî cangorî re.**

**Ricîmên totelîter takekes hîştibû bibe duriwekî çavşikestî , heznake bibe rexnegir, lê tenê mirovekî rewşa xwe dipejirîne, ji çi kêliyeke tirsê re giravkirî, xwe dike hînckarekî genî di rewşên herî hêsantir, tiştê ku li ser maseya wî bê danîn dipejirîne, bi bandora tirs , serkotkirin û xewkirineke rêbazkirî, ta bibe tenê karkerekî an peymanderekî li kargeha milkeçî ji fermanan re û bixwegirtinên bêreng yên ji reftarên tiyoqratî olî hatibûn e wergirtin , li gor hişmendiya partî û bîrdoziya xwe hatibû guhertin , ji bo bibe olekî giştî bi tirs û rajêrbûna kotekar ve cîtengbûye, û tirs ji hêzên ewlehiyê dewsa dilrehetiyê ji hebûna wê, ji ber dezgeha ewlehî çekekî dirêjkirî ye li ser cemaweran taku bitirsin, xwestina wê ji jiyaneke baştir, cîhaneke têde çanda nakokî, û azadbûna derbirînê cîgir dibe sînordar bibe , rastiya peyketinê bi dû serhildan û raperînê mirov dehf dide lêpirsînê li ser nepeniya çûna xwe li erdnîgariya tires, ewê ku ji cîhanên dilzarî û sertiyê pêktê, herdû jî henas diwestînin, berhinde ti vîneke azad bin saya metirsiyê nîne , mirov tiştekî nahilînê ji ferehiya berketinê beranberî dûrkirinê ji jiyana xuristî re , berhinde tirs dihêle mirov bêhiş be di derbarê rewanî û hizrî de, berhinede berketin tune dibe bi nediyarbûna azadî û derbirîna li ser nerînê, û berketin û raberiyên zanyar têkdiçin , xwe di nav dorpêçkirineke tam de dibîne, berhinde rewrewk û reweştên têkçûyî di henasên takekesan de berz dibin.**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**Tirs bi encamê zordarî û êşandina henas e, bi sedema bêhêvî û êşên kombûyî, tirs cenga navxweyî derdixîne, û takekesan tirsa xwe ji desthilatê aşkere dikin bi rêya pevçûn û tîjanê wana li hember hevdû ve, berhinde birçî dibin û ji bilî sertiyê ti destikî nabînin ji valakirina hinira tirsa heyî ve di hundirê wan de, wisa em dibînin ku ev hemî dihêlin mirov bi rastiya desthilatê birame a bi şev û roj civakê xwe girêdide bi awayên hûnîjandin û kirtankirina zanyarî, peywendiyek heye di navbera zordar û mêrê ewlehiyê a zorkar de ji ber herdû bin siha serokê xweda dixebitin , bi dû wî ve keriyek mirovî tirsnak dikeve, navdariyên wî sexte dike li gor xwesteka rêxistina serkotkirinê, a ku mayîna wî rewa kir û serperestiya gellên ên timî xwe bi rengekî bêcan û piştpêbest ditewînin, berhinde ji tirs re nîşanek mezin heye bandora xwe gewre ye li ser civakê û qonaxên takekesên wê, ew bîngeha çi vebuhujîneke giyanî an ramanî ye, û dibe jî ew pencereyeke vekirî be ji aşkerekirina çi tiştê heyî ji hevgarî û bobelatan ve, ji ber ji zikê tirsê ve ew pankirin derdikeve a ku bû ji lajeyên netewên bêdestiyê, ew civakên yên fêrî stuxwariyê ,çanda keriyê û zimandana solên serok ,hemdest û oldaran xwediyên qenciyê bûn e , ji wêjeyên serokê xêvzana vexwarin, ewê ku dewsa pir kesên stûxwar dirame, ji ber vê yekê rasayî ye jinavbirina ev kula deronî ê cîgir bibû û deqên pîroz alîkarbû bi cîgirkirin û bicihkirina wê bi rengekî kûr ve, ji ber pîrozî bandorekî xwe deronî heye li ser çêja takekes û li ser bîngeha rabûna desthilata serkotker a gendel û ava dibe dema gede bi mêjî re mijol dibe bi gerê ji bo pariya jiyanê her roj, di hizrê kesê peyketî**

**de tiştekî diyar nabe tenê razîbûna kesê ê di destê wî de kilîtin her tiştî heye û ew li ser her tiştî dikare, ev ji aliyekî , ji aliyê beranber ve desthilatekî heye ked û xebatê wî desteser dike û yê bi dû ketî pêdiviye ku dîmenên derewîkirin û bêdengiyê diyar bike ta jê re sînora herî jêrîn ji jiyana baş hêsan bibe, di vir de yekem bîngehên tirsê saz dibe.**

**Û dibe ku dilheyîna me ji jevkirinê re û vegerandina sedeman ji çavkaniyên wêna re ewa dilheyîna me ji çêkirina rêyên rûkirina wergirtinê berve baştirînê be, ji bo aşkerekirina çi tiştê hatibû ye veşartin bin navên nimûnî sexte, mebest ji vê nimûnekirinê nîşanên erênî bi ser tirs û desthilatê ve, hewildana bergiriyê ji yek xwedayî re, yê dîmenên wî li her derê belav dibin, xelk derdikevin dîmenên wî radikin ji bo hezkirina xwe yê sloganî jêre diyar bikin.**

**Çi kesê hewil dide ku van reweştên totelîter û efsanî di zikmakê xwe de senger bike, dixwaze mehnedanê bide tirs û pîrozbûnê, ciwankirina wan bi awayekî aşkere û bêreng , çênabe avakirina felsefeyekê li ser tehtên xêzeke pîroz pala xwe dide li ser mildan û xweradestbûnê ji ramanê rêberê bîrnas re,û qet çênabe desthilatdar bîrnasekî serkeftî be, an bîrnas desthilatdarekî rastîn be, û hîn valahiyeke rastîn heye di navbera nerînên bîrnasan û xwediyên desthilat û tewrîvanan di derbarê vê yekê de, tewriyên wan ji mehnedanên xapînok derbas nekirin , armanca wan nûkirina çanda kerî , sînordarkirina berzbûna mirovê zanyar a serkeftî, berhinde tirs çêbû di hembêzê nezaniyê**

**de , bibû pêkhatiyeke rastîn ji pêkhatiyên belavkirina zorbedî û pîrozbûna a bi xwînê têrbûyî, ji bo bi riwê xwe yê xalîrengî pepûkiya xwe yê ketiye heyînê xêz bike, wisa ji mirov re diyar bû ku efsan beşekî ji jiyana wî ne, divê rêza wê bigre , ji ber ew beşeke ji ola wî ye ê ku pê bawer dibe, erk e li ser wî ku bawerî pê bîne û pêre bide û bistîne mîna nivîştê , ji bo ser û pariyê xwe bin siha rêxistinekê pêre her tiştî parve dike biparêze .**

**Ligel tirsê cihgirtin tune dibe, pêdivî ji bo tebatê tiştekî misoger dibe bin siha jiyaneke hejiyayî, takekes di nav de li pey tiştekî wî dilniya bike dikeve, berhinde alîgirên efsanê tenaziya xwe bi raberî û berketiyên zanyaran dikin, girtinheviya têkçûyî di nav wana de gewretir dibe, ta bibe dirêjiyeke dîrokî ji pevçûnên dihû re,ne ji bo desteserkirina li ser erdnîgariyê tenê lêbelê ji bo rewakirina ricîma a bi hêz ji ber ew hêjayî mayînê ye beranberî jimara kesê lawaz yê ku têne jêbirin û tunekirin.**

**Em dilheyî berfirehkirina danasînan dibin li ser gelek têgehên yên em pê bawer dibin ligel pirbûna dûbarekirina ezberkirin û bernanên wêna, ji ber ku mirov bi awayekî qayîm dilheyî tiştê xwe yî ramanî û hizrî dibe, ji ber vê yekê sinorkirin wekî dorpêçkirinê ye, ev dorpêçkirin mîna pêdiviyekê ye bi rengekî bê wate girtinheviya zimanî di navbera du koman de diyar dike, yek ji wan dibêje ku ew baş fêrî raman û wateyan bûye ji nêz ve bervajî yê li beranberî xwe.**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Em ne bi darjêgekirin û bêcanîkirinê re ne di çarçoveya komek bawerî de, ev tişt bû sedema harbûna dirindîtiyê li cem mirovê rojhilatnavînî, bi rêya ayîndariya xwe yê olî û partîtî , ew dimêtê , bi koratî bawer dibe, bê zanibe ku her giravkirinekê li ser darjêgekirina ramaneke pê bawer mîna serseriyeke kawikî ye, ji ber vê yekê em berdikevin zanîna ê me weke zanyaran li pey dikevin ew bi xwe jî ji nivîşka ronakbîrî û rizgariyê ye ji baskê bedenketiya ramanî û dûzbûna bîrdozî ve , ji bo nuhvekirina nîşaneyên bawerî û rabûnê li hember qonaxên tirsê ê ku rêxistina bavanî bi herdû baskên xwe yên malbatî û desthilatî wêna çîgir kiribû.**

**Berhinde her nivîsekî liyangirtî ye û bîrdozî wekî danasînekê komek raman in em pê bawer dibin , em ji pêşiyên xwe werdigrin an em wêna bi rêya nehestbûnê digrin, ji me qut nabin, tevî gumaniya me ku em dikarin xwe jê rizgar bikin, lê şopên wêna li ser rewiştê diyar in ,tevî girtinên ramanên nû, ji ber vê yekê doza azadbûnê ji her tiştî rêjeyî ye û tenê wekî xwestekekê dimîne , em bi çi tiştê ku di hundirê xwe de cîgir pê re didin û distînin, ji bo çêkirina peywendiyeke baş di derbarê raman û şîretan de, ji ber raman ji nişkêve dibin e alî , lê oldarîbûn û bêcanî li biniyên xwe de ne, ew kêşeyek rawestiyayî ne, mîna kelemekê ne li pêş rêya rabûna zanyaran, tirs me dihêle em bi lêpirsînên mirov di derbarê ezmûna jiyanê yên em têde dijî biramin ji qonaxa canîbûnê ta qonaxa gehîbûn û pişt re kalbûnê, ji ber tirs ne tenê di çarçoveya têkiliya di navbera desthilat û cemawer de ye lê wê derbas dike , jiyana takekes nîşan dike, metirsiya wî ji pêşerojê ve, ev**

**nediyarbûna yê xuristiya jiyan û kirdeyan dorpêç dike, li cem mirov rewşeke ji dudilî û ramanbûna ji nediyariyê peyda dike, ji ber tiştekî li paş tunebûnê nîne, berhinde felsefa saxleman dema jîndar dimre li cem wî qut dibe, ji rêza jiyana tevgerî derdikeve, ta genî û rizî bibe û vegere axê, bibe tiştekî din û tevlî heyînê bibe bi rengekî yekgirtî bi hemî dinokên jiyanê û jêderên wê ve.**

**Ramandina bi heyînê divê pêşî ji dergeha metirsiyê derbas bibe, çima mirov bin siha hebûna şaxdayî a berve bedenketîbûn û tunebûnê diçe ditirse?!**
**Çima mirovan kelemên zêde li rêya hevdû datînin?!**

**Ji bo bi xweşiya jiyanê şad nebin, li rex tunebûnê , a ew çarenûsa hemî jîndaran e, mirov di riwê kesê beranberî xwe de bê berhelistiyeke zanyarî disekine , lê li ser têkbirina ya din cîgir e, ji bo pêşdebirina henasê.**

**Rijandina xwînê wekî lezbûnekê ye ji hatina tunebûnê re, ji bo destê xwe li ser çi tiştekî bi lebat deyne, dibe ku ew awanteya a ji zorbaziyê encamdayî tiştê bêhtir mirov ditirsîne, di nav cîhanekî mirin têde bê bend e di heman aliyên jiyanê de, ji ber serkotkirin û kuştina evînê û wêrankirina peywendiyên xuristî, û gemarkirina sirûştê bi rêya cengê ev hemî hîştin ku tirs bêhtir nêzî mirov û jîndaran be, berhinde bedewbûna berzbûyî di mirov de rizî dibe û dibe leylan û doman, bi encamê têkbirinên mezin bi destê mirovê çavkar û ezez ve, danîna mehnedanên pîroz û vala li ser xuristiya cenga wî li hember kesên din.**

**------------**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**1- Nîkolay Eliksenderofêliş Bîrdîv bi Ferensî: Nicolas Berdiaev 18.03.1874-24.03.1948 Bîrnasekî Olî, siyasî Rosî ye**

---

**Zehmetiyên gelek di rû civakên ku hewil didin azad bibin derdikevin, di nav gelek qedexeyan ên tevgerên wêna bi sedema zorbedî û bêdadiyê hatibûn e têkbirin, ev di nav kesê bindest de şoreşek girseyî avakiribû, li hember wek neman û mirinê, berhinde Nîkolas Bîrdîv 1 dibêje: ( Mirin ew rastiya kûrtir e û bêhtir di jiyanê de bi nîşan e, ji ber mirov bi ser diyardeyên jiyana xwe yê rojan e û serveyî tê û ev tek tiştê yê ku me dihêle em bi wateyê jiyanê biramin, jiyan ji derveyî nîşana mirinê bê wateye. )**

**Warên ku di talîzoka xewin û hêviyên namiçiqin de dijîn, ji ber timî di rewşeke ji rûbirûbûn û pêdagirtinê de ne li hember zorkariya dîrokî ya gelê Kurdistanî li parçeyên welatê xwe yê dagirkirî dijî, bergirî û rikberî mîna serkeftinekê ye li ser asta raman û hêviyan, dibe mîna derbasbûnekî ji jiyana gîreyî re yê mirovê Kurdistanî wêna dijî, berhinde welat ew wateya jiyana serkeftî ye li ser têgehên mirin û nemanê, berhinde pêgirtina mirov û pêdiviya xwe bi girtina kokê encameke xuristî ye ji hestbûna wî bi zorbedî û mafxwarî , herwiha ew pêdivî mîna naverokeke qayim e ,mirovê zanyar armanca wê dike, di dema ceng û dûrkariya sepandîbûyî û berdewambûna ricîmên serkotker û kirdeyê xwe li hember gelên xwe mîna mirina pirreng e , tê kirin ji bo zêdetir tîjan, hilweşîn û awanteya qerpol, dema jiyan bibe meydanekê ji kirina mirinê re, berketin û raberiyên kêferatkirî ji bo xurtkirina**

**peywendiyên xuristî xeradibin, sazî û ricîm dibin çekekî li hember gelan, rûdana demî û cihî bi cûreyên qirkirinên rewşenbîrî û civakî cîteng dibin, jiyan mîna mirinekî sirûştî dibe,dimîne metirsiyekî, ji hûrgiliyên jiyan û nerehetiya me qut nabe, li pey wê ragihandina yê êş ,sertî û xwînê belav dike ta jiyan bibe dîmenên mirinê, li her cihekê ji cihên jiyanê cîgir dibe ,xwe bi wêneyên totelîterî, dûrkarî ,serkotkirina kêmnetewan , cengên olî û jihevketina civakî diyar dibe, divê di vê derbarê de nasîna riwên mirina pîroz di têgeha ricîmên sitemkar a serkotker, ên zorbediyê bi awayekî bi rêk û pêk sepa dikin ji derveyî heyîna reştariya tirsa hebûnî li cem mirov, berhinde tirsekî siyasî, deronî û civakî peyda dibe, dikeve hûrgiliyên jiyanê, mirov nikare xwe li ser helbeze an wêna paşguh bike di siha ew kedxwariya sepabûyî de, ev dûrbûna di nav komên yên ji her girtinheviyeke xwînî re amade dibin, tirs mîna gîhayekî baş bi destê ricîman dibînin, tê pikaranîn ji bo xwarindina keriya mirovî a nemabûyî bi derbasbûna qonaxên jiyan û hatina nifşên wê.**

**Ew tirsa a ku maye mîna metirsiyekî girs û di hiş û dilan de cîgir dibe û navdariyên xelkê , reweşt û reftarên wan zeft dike, jiyan û rêya nifşên wê rêxistin dike, mirin destê xwe danî li ser çareyên wê ji bo azadî û serxwebûnê, berhinde mirin dikeve dewsa jiyana tirsê, mirin dibe mîna şahiya xewinê ji bo gihîştina jiyana baştir, wisa pêşeroj nepenî û nediyar dibe bin siha wêraniya a ku berfereh û şaxdayî dibe bêhtir bi nediyarbûna awayên hezkirin û dostaniya civakî.**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**Ev lîstina ku ricîmên zordar bi rêve dibirin ji dîtina wê yên teng ve dibişkivin, ji nezaniya bi hevjiyanê û berhemên wê yên erênî tên, û bi tirsê re didin û distînîn mîna pêwîstiyekê divê hebe ji bo kedîkirina hêrsa cemawer û xwestekên takekesên wêna ji bo jiyana xweşî û pirrengiyê .**

**Ew ricîm li rojhilata navîn bi şerfiroşî û zorkariyan ve dagirtî ne.**

**Turkiya ya Osmanî a li pey wê bermayek giran heye ji desthilatî , bêdadî ,qirkirina gellan û pişaftina wan di xwe de, Îrana Farisî ya dildarê şehnaziyên demborîna tije desthilatî û mirin , Sûrî û Îraqa Bassî ên li paş wana Erebûnekî Islamî disekine, bi xwînê li ser çand û gellan hatibû sepandibû, mora xwe yê Erebî Islamî li ser wan danîbû, ev ricîmên sitemkar xwe bi bermaya belavkirina tirs û mirinê ,ta dema îro xwebicî dikin, wekî dirêjiyekê ji çax û serdemên berê, Kurdistana dagirkirî ji aliyên van ricîman ew nîşanekî ronakbîrî ye ji vegerandina çanda netewekê re û hişyariya gellekî ji çepelên pişaftin û qirkirinê ve, nîşana berxwedanekî piştrast dike, hebûna netewên ên kêferata azadiya xwe dikin bi xwîn û hesin, tirs ji yek dîmenê xwe ve têkiliya xwe bi mafxwarî û bêdadiyê re , bi talankirin û diziya erdên Kurdistanî li Sûrî bi navê çaksaziya çandinî, ev yeka mîna pepûkiyekê ji aliyê dewleta şofînizma a serkotker ve hatibû sepandin, bi palpişta xwe li ser pişaftin û helandina hemî pêkhatiyên netewî di nav darêjga xwe yê Erebî de, ev lîstina bi maf û destdayîna li ser semyan û jiyana civakî mîna mezintirîn rewşeke zorbaziyê ye li Rojavayê Kurdistanê li gel wê Erebkirina**

**gund û bajarên Kurdî bi navên Erebî , qewitandina Kurdan ji navçeyên wan ve ji bo berjewendiya bicihkirina Ereban şûna wan û wisa jî dijberiya Sûrî bi piştgiriya Turkiya vê siyasetê li Girê Sipî, Serê Kaniyê û bi taybet li Efrînê bi rêk û pêk bicihanîbû, pirojeyên nijadperestî mirovê rojhilatnavînî ê Kurd şaşkiribû, ev bawerî bi sazî,dewlet û yase têkbiribû, jiyan kiribû holekî ji neyîniya dagirtî tîjandin û bêdadiya bi rêk û pêk ve.**

**Tirs ne tenê bûyereke, lê nîşaneke rastîn e bi jiyan,xuristî û rûgeyên wê ve têkildar e, bû rengekî naskirî di jiyana civakê de a ku bi ricîma bavanî maskirî  û mirin têkiliya xwe pê re heye, metirsiya nemanê, nemana ewlehiyê, û metirsiya desthilatdar ji kesên ku daxwazên azadiyê dikin ,ew tirsa ji nemana serdestbûn û cih e , ji ber vê hemî ji bo girtinheviyê hewil didin ta reştariya tirsê qasî tê xwestin dûrbixin, berhinde bîrnasê Elmanî Haydger bawer dibe : divê mirin nebe ew metirsiya a ku nivîna me bihejîne.**

**Lê ew bi xwe metirsiyek rastîn e nivîna takekesên yên civakê  bi alavên serkotkirin û tirsê kontirol dikin dihejîne, ewa jî jiyaneke jiyanbûyî ye li cem gelekan yên nikarin mafên xwe yên sirûştî bi dest xwe bixin û çalakirina yaseya binpêbûyî a pala xwe dide li ser dadmendiyê û diyarkirina nirxê piraliyê siyasî û aborî û çendîn di xwe de encamên erênî berz dike li ser dewlet û civakan  bi giştî ve, berhinde desthilatên sitemkar rê nadin ku hişên takekesên wê ji derveyî kêmanî û binpêbûnên wê biramin, ji ber reftar û karê mirovê bindest tenê birame bi serkotkirin û pepûkiyê ve yê ku di jiyan û qonaxên xwe yên cuda de wêna dijî,**

rojeva axaftinan dibe tenê li ser binpêkirin û xweziyên nediyar , yên nayên pêkanîn, wisa em dibînin çendîn peywendî di nav gotara olî û desthilatî de heye .

Ev koçberiya rastîn hîştibû jiyan raweste, berhem tenê kedekî bê beranber be,tê pêşkêşkirin ji xwediyên berîkên fereh û yên jiyan û saziyên wê di destê wan de ye, desthilatiya serkotker kiryarên xwe di hizrên gelên xwe de bicî kiribûn, ji bo gel li hember wê raperînê lidarnexîne, gel bi vî awayî bi pir hijmarên xwe dibû alav bi destê wê desthilatê ,wê berdide hevdû û gel bi rêve dibe çawa bixwaze û kengî bixwaze, di demekê ew kerî ji nav hevşiyên xwe rabûn , di baweriya xwe de wê karibin li ser serkotkirinê serbikevin, lê qurşînên wê bervajî wê hatin, bi xwe zemînekê ji desthilatiyeke tarîtir re ava kirin mebesta min bê guman serhildana yê tê naskirin bi gelê Sûrî ê ku Mark Sayksê Ingilîzî û Cûrc Bîkoyê Ferensî sînorê wê danîbûn, ew berve demborînekê ve diçe li gor xwestekên wan desthilatan bi hişmendî û nehestbûna xwe ve, berhinde desthilata dûrkar êdî piştrastbû ku berdewambûn û hebûna wê girêdayî ye bi çendîn serkeftina cîgirkirina ricîma xwe yê desthilatdar ve di hiş û dilên civakên yên wê kontrol dike, bi vî awayî guman kir wê ji bergê gelê bindest ji aliyê hiş û giyanê derkeve xwe nû dike mîna dema mar an xemgurî eyarê xwe diguhêre, derketina Daiş û berî wê Elqaîde û Elixwan û van komên pêşîn ji van bijardeyên ên rastî nezaniyeke bi rêk û pêk ve hatibûn û hişbirinekî giştî ji aliyê mêrên ol û desthilatê ve, civakê hîştibûn bibe zinarekî teqemenî û mayînên bi hev ve girêdayî, li ku biteqe wê hemî ferehiyê bigre, ev ji me re piştrast dike ku desthilat

**bi hevkariya xwe bi mêrên ol û bi palpiştbûn li ser deqên pîroz giştî serketin di dagirtina cemawer de li gorî armancên xwe, û bi girtina zanyaran bi serketibûn, kuştin an dûrkirina wan ji derveyê vê bixêrîkê.**

**Wêrankirina hatinên heyînê û sînordankirina rengirtina jiyan û mirov çêdibe li gel kiryarên serkotkirin û nûjenkirina koletiyê bi heman awayên wê ji bo cengên nû û qelişên bi dû hevdû ve , buhayê wê tenê sawîlkan didin, berhinde alozkirina cureyê jiyanê ji reng û kiryarê desthilatê û serdestbûna wê derdikeve, mîna dezgehekî tirsê di nav bijardeyên cemawerên ciwan de, lêbelê dijminatiya aşkere bi sirûştê xwe riwê xwe aşkere dike li hember çi dengekî bi bandor bernameya guhertin û serhildanê di hizrê xwe de danîbû û kiribû pêşî hizrê xwe ve, berhinde zanyar mirin û serkotkirinê bi riwekî bi ken pêşwaz dikin, bergiriyê li hember hêzên nezanîkirin û serkotkirinê nîşan didin , li ser pabendîbûnê xwe bi naveroka bedewbûn, dadmendî û nirxê xweşiyê di jiyanê de derbirîn dikin, dema hatin û hinirên xelkê bi awayekê ji awayan hêviyên wê di guhertina demukratî de wêzim dikin.**

**Nimûna mirina sepandîbûyî li ser van civakan serkotkirineke bê dawî ye, û cîgirkirina wê mîna binemayeke olî pîroz ji xwedê hatiye sepandin bi rêya pasvanên wî li erdê, ev bû tiştekî li ser guftogo nabe, tenê ronakbîr dibe jêre qurban, yê li gemiya rizgariyê digere ji bo mirovên yên bi lehiyê ve bar dikin, û ev yeka hevgariya Suqrat tîne bîra me, dema koça jiyanê bi rûkenî kiribû û ji**

şagirtê xwe re digot: ( Divê mirov mirinê bi geşbînî û şadî pêşwaz bike ji ber vê divê hûn aram û hevseng bin.)

Mirina gewdehî jêra ne meraq bû lê tirsa wî li ser takekes û xelkê bû, ku li şikeftên nezanî û tirsa ji serkotkirin û malgirtina desthilatî ji her tiştekî bedew re koç bikin , metirsiya wî bi asta tiştê ku ji raman û pirsê radikir, ji ber vê ricîma fermandariya totelîter hêza xwe ji qirkirina zanyaran û zanînên ku mêjî dilivînin wergirtibû, û cemaweran dihêlin ku ji aloziyên xwe yên ramanî bi awayekî taybet ve li çareyan bigerin, ji ber ku tirs dihêle şoreşger milhûr be û wêjevan hînckarekî hov be û civak peykerên wêrankirî be, ev diyarbûneke ji dijminatiya jiyana nû re ye, an rizgarî ji serdestbûna efsaniya ya ku zordarî ji kunên destpêktiyê anîbû, tiştê ku civak hîştibû awanteyê bijî ew sertiya desthilatiyê ye û zorkariya wê li hember civakê, ji ber ku êş,derd û windabûn bûn e binemaya civaka barketî bin siha ricîmekî serkotker, dadmendî û dadperweriyê rakiribû, pêşeroj li gor vê yekê nediyar bû, ev dojeha ezmanî rewş dagirtî ye, mirin yek ji bedtirîn riwê wê ye, serdestbûna koletiyê mîna ricîmekî ewlehî li ser movikên jiyanê, mirovan hîştibûn di rewşeke ji tirsekî berdewam de bimînin, sedema wê ezeziya malgirtîkaran e ji hatinan re û nediyarbûna rengên bîraweriya bi hevjiyana aştiyan e ve , li rex serdestbûna ramana olî li ser bijardeyên civakê li gor têgeha Islama siyasî yê ricîma serkotker biserket ku ew raman bibe bîrdozî, berhinde wêjeyên partiya Baas ya fermandar pişta xwe dabû li ser dîtina Islamî olî ji fermandariyê re, û Erebûnê dîtibû bîngehekî ji ol re, li gor wê fermandariya

**xwe ji civakê re û serkotkirina xwe ji kêmnetewan re rewa kiribû, ew jî xwe li paş maf û taybetmendiyên xwe yên netewî veşartibûn mîna bersivekê ji paşguhkirin û dûrkariyê rêbazbûyî re, li gel wê bi dijwarî li pêş xwesteka guhertin û hevberînê tê rawestandin û herdû beşek in ji tevgera dîrok û jiyanê bi giştî ve, li pêş nebûn û mehfbûna a ew binemaya her jîndarekî saxlem e derbasî qonaxên cuda dibe ta bedenketîbûn û nexweşiyê têgehên fêzbûn û mirinê rawestîne ,em ricîma serkotker dibînin bi aliyê mirinê bêhtirî jiyanê ve diçe, ji ber desthilatdaran helkelkî bi dû guhertina jiyanê dikevin ji bo bibe meydana azarbûn û kuştinê, ji ber ku ji gel ditirsin,û cemawer jiyana xwe diqedînin di razaneke veguhêz ji tirsekî ta hêrsekê, û ji encamê wê bi lez kiryarek dijwar encam dide bi bayên hingemeya bê dawî re, li gel wê civakan di zîndanên xwe yên mezin de dijîn li ser dirêjî pîneya warên xwe, û rewşeke ji koçberiya hundirî dijîn, û ji bilî penaberiyê çareyekî tal nabînin bi dawî neçar dibin bipejirînin, ji ber vê yekê mirina di navbera erdnîgarî û bazdanê de tirsekî berdewam e ji pêşerojeke nepenî re, zêdetir derd û dilzariya reş pêşbînî dike, li gel wê henasan li piştrastiyeke windayî digerin bi sedema serkotkirina bi rêk û pêk yê ew dijîn bin siha ricîmên fermandar yê çi axaftineke sawîrî nahilînê ji bo kedîkirin û mêtina hêrsa cemawer, li gel wê civak, kom û rêxistinên ji hevdû re dijhev tên e dabeşkirin.**

**Hevxistina Baasî wek nimûne li ser bîngeha dijminatiya ji bilî Ereban li Sûrî an Îraqê pêktê û li wan dinêrin ku ew şaneyên razayî ne dibe ku dijminên li derve wana dema ew bixwazin bikarbînin, ji ber vê yekê pêdivî ye li wan bê**

**tengavkirin, ev ji derveyî tirsa desthilatê ji gel ve bi giştî, ji ber ku zîndanvan ji zîndaniyan ditirse tevî ku li zîndanê ne, li gel wê berdewam kelem di navbera netewan têne çandin, û di navbera rageh û ragehekî de, di navbera qatan de jî, aliyê bi ricîmê re û aliyê bi dijberiyê re, zoreng di navbera vîna guhertin û tirs bibû feraqekî di nav de nirx û têgehên rojhilata navîn ya ku bi xwe ji wê girtinheviyê hatibû cîgirkirin, têgihiştina me jêre pala xwe dide li ser derbasbûna me bi sirûştiya têkiliya nişteciyê derveyî bi erdnîgariya wê deverê û xwedîkirina wê bi dîmenên hewesdarî bi desthilat û sitemkariyê ji bo hebûnê, û mîtingerî hatibû kirin bi rêya tirs û serkotkirinê, û bi rêya herdûkan ve rolên afrênerê azad hatibû têkbirin, li şûna wê lîstoka desthilatê cihê xwe girt bi qutîkirin û reşkirina her sirûştiyekê û rewşeke cîgir hewil dide tiştekî ava bike ku karibe vê wêraniya a ku peywendiyên civakî wêran kiribûn jêbibe , bi rêya çandina tovên tîjandinê yê bi sirûştiya xwe tevgera civak û takekes sînordar dike, şiyana berzbûna tevgera ronakbîrî ya bi armanc li paş dixe , ji bo jêbirina mayînên desthilatî li dor mêjî, û paşêxistina tevgera civakê yek ji erkên desthilata serkotker e, ji bo rûbirûbûna maf û xwe şimitandina ji erk beranberî gel, tirs namîne cîgir di demeke dirêj de, û bi lez belav û pûç dibe , di serhildanekê her tirsekê hildikşîne,wekî dema bajarên Kurdistanî li Sûrî rabûn taku sozê bi gel,xwîna şehîdên xwe û xwediyên xwe yên aram li Qamişlo nûbikin, herwiha em tirsê dibînin bi hêrs û hebûna vînê neman dibe , ji ber vê her çare li pêş komê gelê westiyayî dima ew bergirî di rû bêhêvî û piştsariyê, berve vejînkirina şiyarbûna mirov, cenga wî ji bo azadî û dadmendiyê, li gel wê gel ew kelevajiya sexte bi**

**navê welatîbûnê danezanîkirin bin siha desthilatiyeke ji wan re ti soz an peyman nedabû, ev rabûna gelerî derbirînek bû ji yekîtiya gelê Kurdistanî re li hemî bajar û gundên wêna, hewildanek bû ji bo binaxkirina tirsê heta dawiyê, tevî sertiya sitemkar û şêweyên serkotkirina wî lê vîna gellan saweke dikarê wana bin guhê hevdû bixe, tirs dibe destmaya desthilatdar yê pala xwe dide li ser ji bo li desthilatê bimîne û qezenc û hatina xwe zêde bike, herwiha nanê civakên oldar û tîjandî ye bi awayê siyasî, ricîmên sitemkar li ser binemaya tirsê wek şêweyeke gerentor ji serdestbûna wê re dijîn, ricîma tirsê damezrandin li ser binema gefa bi dojehê wekî encamekê serpêçî bi xwedê re û şîretên yê di deqên pîroz de hatî, ev yeka cureyekî ji hevkariya bed di navbera mêrên ol û desthilatê de çêkiribû, wekî du pêkhatiyên çalak ji bo têkbirina çavkaniyên şoreşa hişmendî a hatibû cîgirkirina li ser pêşdebirina dan û standina ramanî, rê li pêşiya gotûbêjê bi siyaset, ol û zayend ve hate girtin, zayen bibû efyon li paş perdan tê duristkirin, ji bo mijolkirina xortan bi wê ligel ol, û razandina hişmeniyê ta demeke dirêj, bi belavkirina bêkariyê û rêbaza bêxwendiniyê bi awayekî hişk û vala ji hînkirina naverokî ew nezanîkirin tê sazkirin bi rêya mijolkirina xortên zanîngehan ji bo tenê bi dawîkirina xwendinê û kardîtinê piştî qedandinê biramin bi siha tenêbûneke aborî xenqoyî, gendeliyeke giştî perîşan û hilweşîneke paş perdeyê tê kirin, bişanhildana diravê ewê rê ji mirov re vedike ji bo dizî û tembelîkirinê, ev hemî tê birêvebirin ji bo tek encamê û ewa berşûnbûna rewiştî û paşxistina deronî ya henasî û têkbirina qezencên xelkê, li gel wê ricîmên sitemkar li ser çandina gumaniyê di nav**

**bijardeyên civakê de dixebitin, ji bo bawerî di nav xelkê de tune bibe, awante bibe pergalê giştî ji hemî nakokiyên sert ên dikarin stonên saziyan hemî hilweşînin, ev zorenga har di navbera alîgirên guhertina zanyarî û sertiya desthilatdariyê kevin e kevinê dîrokê, kevinê têkiliya reşepêş di navbera fermandar û cemaweran de, di navbera mêrê ol û cemawer de, di navbera bav û kuran de, ji ber vê berdewam pirsên gelek berdide , ji ber vê tê veqetandin di kêliya hêrs de ji çi tiştê ku hatibû cîgirkirin di jiyaneke pala xwe dide li ser sertî û neçariyê, ev raperîn qonaxên bê nîşan didan nerîna gel taku gotina wî li pêş be li jor ricîma sertbûn û zorê, ji bo sînorekî bê danîn ji wan lîstina yê giyanên sawîlke têkbiribû, civakê hîştibû rizî bibe, ev qelşandin bicî kiribû û kelemekî kûr durist kiribû, ji ber vê em desthilata serkotker dibînin ku ew jî di gezencê de ne ji dûrketina xelkê ji bîraweriya ronakbîrî û felsefeyê ve bi rêya belavkirina wê ji raman û efsanan re bi rêya dezgehên ragihandina wê herwiha bi rêya rêbaza olî, ji bilî ramanên tek netewê û bicîkirina têkelbûna bi zorê ve, ji ber vê ew girtinheviya di navbera netewan de hatibû belavkirin, netewa herî bi hêz û bi zimanê olî xwe bi çek dike û jêre desthilat û serdestbûna li ser çand û şaristaniyan vedigere , ew şaristanî û çandên yên taybetmendiyên xwe diparêzin ,têkoşînê dikin li hember hewildanên setimandin û qirkirina rewşenbîrî, li gel wê Baas bi bîrdoziya xwe yê reş baş nûnertiya qirkirina rewşenbîrî kiribû , armancên wê ji bo Erebkirina navçeyên Kurdistanî li rojavayê kurdistanê derbirîneke ji sertbûna rewşenbîrî re û nediyarkirina nasnameyên gellên deverê ji bo bicîkirina dûrkarî û ne aramiyê ji bo hemî pêkhatiyan ligel pêkhatiya**

fermandar yê ew jî zorkarî û gendeliyê dibîne ji aliyê wê desthilata yê ku hemî destik bikaranî li hember qezen,ewlehî û azadiya gelê xwe, ew bawer kiribû ku bi rêya tewriya pilanê û dijminê derveyî (Israil), wê bihane bide ji bo bimîne destpak li ser xewinên netewî lawaz li dor eywanên rewrewk û xapandina cemaweran dizivîrî ( herdû Baasên li Sûrî û Îraqê) ji bo dûrxistina wê ji xuristiya dema niha û hewildana netewên demukratîk û guhertina naverokî ji desthilat û ricîma fermandariyê, li gel wê mijûlkirina mêjiyên wê bi navê şerê dijminê li derve, hîştibû xelk xwe radestî lîstin û binpêkirinên ku li dijî wê hatibûn e kirin bibe, û deverê hemî hîştibû dagirtî girtinheviyên aşkere û hundirî bibe, wisa em dikarin bêjin ku ew bi duristkirina hingemeyê heta demekî dûr  bi serketibû.

Çanda dûrxistinê ji berhema şaştiyên desthilatî ne, civakan di rewşeke ji girtinheviya giştî û bê dawî hîştibûn, di baweriya xwe de wê bi vî rengî cihên hebûn û serdestbûna xwe  li ser hatinan biparêze, li gel wê her awanteyekê bi karên derveyî ve girêdayî ye ji bo rewakirina hebûna xwe,li gel wê tekçand pala xwe dabû hêzê û pişaftina pêkhateyên din di xwe de mîna pêdiviyeke desthilatî didît, bîrdoziyeke dîrokî  sertî û pizbûn piştgiriya wê dike, ta bibe asteng li pêş afirandin û dostaniya civakî a şaristan , taku mirovahî hemî buhayên gendeliya desthilatê û xwarbûna wê bide.

Ev hemî jiyan hîştibû di windabûn û jevketina giyanî û ramanî de bîzivire, ji girawbirinê re hewşekî fereh dîtibû ji bo xistina çi ramanekî azad an pêşveçûnekî sozdar, li gel wê

**sepandina çand û reftarên ku ji ol dertên ji çawaniya hîştina xelkê ku bi rêya bijandin û tirsandinê ve di eynî demê de bandor bibin, ev rêyeke baştir e ji bo çewsandina rengên civakî û kireberîkirina wê bi yek reng, çand û tek zimanî ve , pişt re erdnîgariyekî têde yek fermandarî cîgir bibe, desthilatiya xwe ji serdestbûna ola Islamî werdigre, rêya ku xwediyên belavbûna wê ji talankirina hemî deverên din bikaranîn û sepandina ol bi rengekî zordar li ser gel û çandan ji bo pişaftin û helandina wan di pergalê zimanê Erebî de, berdêla amade wekî ku di van lêpirsînên rewa û vekirî de ye ewa di pêşkêşkirina berdêla berzbûyî di pêgirtina bi kok , çand û ziman ve taku neman û bi dawî nebe, li gel wê nemana vê êrîşa rewşenbîrî ya siyasî mîna destpêka hevjiyanê ye di nav gellan de , bi nemana navê kêmnetew û pirnetew ji bo jiyanek bêhtir cûrebûn û lihevhatin, dibe ku talana rewşenbîrî li hember nasname û çandên din hingemeyê kiribû zimanê rewşa wê, herwiha navendîbûna olî û netewî bi zor û pizbûna xwe ve li ser bijardeyan her tiştî derbaskiribûn.**

**Ew bijarde tehliya girtinheviyê xwar, û di xwe de kesayetek nizim derxistibû bi taybetmendiyên nefretê ji serwerî û desthilatiya hêztirîn ve hatibû naskirin, yê ku zorê dikir bin balkêşeya pîrozbûna bîrdozî an olî.**

**Û li gel wê Ewrûpî zorkariya xwe li ser Efrîqiyan kirin, ev dîtina dûrkar ji bo çewsandina nîşanên şaristaniyên mirovî ji gellên Efrîqiyayê, wek dema Ereb bi rêya ola Islamî zorkariyê berdewam kirin bi bihaneya cîhanîbûna ol û li zimanê Erebî dûriyekî olî pîroz danîbûn, wekî kiryarê**

yekîtiya Sofiyêt û hewildana wî ji sepandina zimanê Rosî li ser gelê din ên li ser wan serweriyê kiribûn, ji ber vê ziman hatibûn weşandin bi kuştin û mêtingeriyê û pişaftina gelan ,hinek ziman dewsa gelek zimanan girtin, piştî ew gel zimanê xwe jibîrakiribûn û dev ji ziman û nasnameyê xwe berdabûn, dema rastî işkence û azariyê hatibûn, ev yeka rengekî berdarbûyî ji qirkirina rewşenbîrî diyar kir.

Wisa serkotkirina siyasî rex li rex li gel alavên pişaftin û helandinê dixebite, ev yeka şerên girtinheviya navxweyî durist kiribû, ol siwareyekî dîrokî û bîngehîn bû li ser bîngeha wê helandin di pergalê netewî a fermandar de hatibû pêkanîn, mîna gotûbêja Islam û Erebûnê , bi rêya wê sitemkariyên netewî di hundirê erdên xwe de karîbûn şerê gelên resen bikin , ev yeka di ramana Elqayîde1 û Elixwan2 de şaxdayî û berz bû, alavên cengê xwe ji dîrok û talanên Islamî wergirtibûn, ji ber vê em dibînin ku cenga desthilatî gelek xalên hevbeş di navbera gelan de jinavbirin, her kargêrekî şaristanî bi destê mirovê zanyar ji kevin ve hatibû pêkanîn, ev tişt gotinê Ishaq Niyotin 3 1727 tîne bîra me : ( Em gelek dîwar ava dikin lê em têr piran ava nakin.)

Û ev wêrankirina bi rêk û pêk ji peywendiyên hevjiyan û dostaniyê ye, di navbera gelan de tirsê hîştibû xwedayekî fermandar be li ser erdê û di kesayeta rêber û peykerên yên ku li her goşeyê de ava bûn e xuya dibe.

Li gel wê berzbûna vîna çanda sade ya ku mayîna li ser kenarê , pişaftin û destdayînê napejirîne ,bi berhelistbûna tirsê ve a ku peyker nûnertiya wê dike diyar dibe,

**berxwdaniya li hember qirkirina rêbazbûyî jiyana civakî û siyasî li xwe digre, li gel wê li gelên yên bi nasnameya xwe ve girêdayî tê nêrandin ku wekî metirsiyekê ne, ferehbûn û serdestbûna wê li ser movikên dewletê bi saziyên xwe vê bi awayekê giştî asteng dike,**

---------------------

**1- Elqaîda : an rêxistina Elqaîde an bingeha tekoşînê : ew rêxistin û tevgerekî pir regeznamî ye, di dema Tebaxa 1988 û dawiya 1989 de hatibû damezrandin, banga tekoşîna navdewletî dike.**
**2- Elixwan Elmuslîmon: komeleyeke Islamî ye û ew tevgera dijberiyeke siyasî ye li gelek dewletên Erebî.**
**3- Esêr Ishaq Niyotin 25 Berçele 1642- 20 Adarê 1727, zanisvanekî Ingilîzî ye , yek ji navdartirîn zanistvanên Fîzîk û bîrkarî ye bi derbasbûna serdeman û yek ji nîşanên şoreşa zanistî ne.**

**li gel wê wêrankirina peyker nîşaneke ji şikestina sihwa tirsê û serkotkirina desthilatî û şopandina zorengê û tiştê wekî nirx di çarçoveyê wê de di girêdana azadîxwazan bi jiyanê ve tê kurtaskirin li hember hêzên yên ku li ser wêrankirina çi avakirin an destketiyê ve dijîn, erka wê piştrast bû li ser hilweşînê û weşandina bizdanê di nav henasan de.**

**Zanîn wekî rewşekî ronakbîrî diyar bû , metirsî û bedkariyên kiryarên desthilata serkotker celew dike ji ber ziyanê dighîne jiyan û pêşeroja gellan û pêkvejiyana wan bi hevdû re, herwiha bandora xwe bi awayekî neyînî li ser başiya ramandina wê dike û ji ber vê pêdivî çêdibe ji bo li hember wê bê rawestandin li ser bîngeha bicîkirina têgeha**

**raperîna cemawerî, ew nîşana zengila dawîbûna wê desthilat û alîgirên wê ye.**

**Tiştê ku desthilat ji vekirina peywendiyên sirûştî di navbera civakên serkotbûyî kiribû bi rêya çandina tirsê wekî efyonê , hêza dij xwe li hember amade dike bi rêya civandina bijardeyê ciwan yê dikare jiyanek nû bide û dikare li hember binpêkirin û aşkerekirina wê bi gelek şêweyan raweste, dibe ku xebata çekdarî jêre çareyekî dawî be, berî wê bîraweriyek cemawerî bi jiyana rêxistinî pêşde tê ,bîngeha wê xebatê beşadarîbûnê ne dûrkarî ye, navendiya netewî a olî di pergalê xwe yê desthilatî de tenahiya civakê durist dike û wêna ji her bihinberdanekî ve dûrdixîne, taku ramanên erênî dernekevin , ewên ji kiryarekî afrênerî dertên, gelek berketî û raberî hembêz dikin û nûnertiya rewana civak û bedewbûna wê di heyînê de dikin, li gel wê mijolbûna gellên serkotbûyî wek nimûne gelê Kurdistanî bi parastina nasnameyê û di berdewambûna zorengê ji bo parastina ramandina wê , li gel wê bin siha serkotkirinê mirov nikare bi tiştekî cuda û nû birame , berhinde naverokên desthilata serkotker a totelîter bi derbasbûna demê ve û ji hundirê ve genî dibin, û destên çavkar dikevin pêşbirkê ji bo bêhtir destê xwe li ser movikên serdestbûn û fermandariyê deynin, ta bihevkevin û ji hev dûr bikevin û qerbalixiyeke rastîn biqewime bi wê û civakê ve bibin e heldêrê, li gel wê hişmendiya gelemperatî di amûrîtiya xwe ya bijardî de ji fermandariyê re metirsiyekî li ser hebûna mirovî û aştiya xuristî çêkiribû, herwiha jî dibû bîngehekî ji cengên bê re, sirûştê wêran dike, ji ber ku dema nefret belav dibe**

**tîjandin jî di navbera civakê de belav dibe, kesayeta takekes pelixî dibe, ev girtinhevî û zoreng çêdibin , armanca wan pevçûnê: têkbirina çi rabûnekî hişmendî ye , ji yekîtiya zanyar û xwediyên raberiyan çêdibe , yên ku hewil didin bi rolên xwe lihevhatinekê ji bo siberoja gellan û demûkrasîbûna wan çêbikin, ta zêdetir ewle ,aram û di xweşiyê de bin.**

**Bêkariya xortan û tengavkirina wan, herwiha sînordarkirina raberî û berketiyên nêdar a gelên barketî ji aliyê milhûriyên wê ve jiyanekî gelek metirsîdar aşkere dike , bi rêya wê ceng û aloziyên yên şîn û işk çinî dikin bêhtir dibe, parçebûna sawdar ji gelên rojhilata navîn netewî , olî û ragehî perdeyê aşkere kiribû ji komek cengên bi dû hevdû ve dikeve di wêzima hêzên desthilat û qezencê de, berhinde windabûna nasname û şerê mirov ji hatinrêz an ziman û baweriyê wî re nûnertiya siha xweda li ser erdê kiribû, berhinde bermaya olan ew bermaya hunera serdestbûna li ser cemaweran e, tê wateyê ku ol ew roparta desthilatê ji xelkê re ye, dibe tiştê ku hîşt têkelê reftar û reweştan çêbibin û ji aliyê xelkê ve bi heman bijardeyên xwe bên e mêtin ew desthilatdar û hevbendiya xwe bi mêrên ol re, bi derbasbûna demê ve ricîma tirsa pîroz saz kirin.**

**Ew ricîm bi raman û dîtinan re bi awayekî hişyar dide û distîne, timî pêre dikeve di ciyawazbûn û lihevketinê, tenê ji raman û dîtinan sûd wedigere di warê pêşveçûna ricîm û cîgirkirina tirsê mîna rewşeke pêwîst û divê bê jiyankirin, herwiha nûnertiya siha desthilata ronakbîr li ser erdê dike**

**ji ber ku ol rêya jiyanekê ye, ew amaneke nirx û reweştên desthilatê hembêz dike herwiha bermayê gelerî û efsanî bi awyekî gurayî, li gel wê baweriyên kisilgirtî bûn e peyker û nîşanekî samê û şikestina vîna cemawer bi rêya şerê ramanên rabûyî, dibe ku guhertina jiyana xortan bi rengekî pûç bîngeha xwe pişûdan e hîştibû desthilat bêhtir dêwtir be bi rêya pencereya bêkariyê .**

**Ji tirsê re dest û nepirçekên toj çêbûn, herwiha jê ricîma bawerî bi çarenivîsê çêbû û mal û semyan ya xwedê ye dide kesê dixwaze, wisa roparta olî bi mêrê desthilatê re destêkel bû , şaxên saloxgêrî bi rengê koma firiştan hatibû sazkirin, firişteyekî giyan distîne û yek li zurneyê dide, û yek bi miriyan re di gorê de diaxive û bi awayê wê şaxên tirsê hatin sazkirin li warên ku ji derveyî bêdengî û sertî di şîret û deqên xwe yên pîroz tiştekî pîroz ranekirin, berhinde desthilat reweştên xwe yên li ser binçavkirin û reşkujiyê danîn, ji bo armanca xwe ji belavkirina tirsê pêkbîne, çi kesê ku mafên xwe bixwaze wê bê qirkirin, bi taybetî kesayetên yên navderiyek wana li cem xelkê hene, berhinde reşkujî dibe yek çirûsînin tolê li ser tirsê, xelkê bi zorê dihêvoje ku raperînê bikin, ew ne wekî ku Tomas Mor dibêje 1 : (Alavekî ji alavên hunera fermandariyê ye , destikekî ji bo dûrxistina welatiyên asayî ji zehmetiyên cengê ve yên ku rêberên wan li ser wê berpirs bûn.)**

**---------**

**1-Tomas Mor : 07.02.1478- 06.07.1535 , rêberekî siysî bû û daner û zanistvanekî Ingilîzî bû, di çerxa 15 de jiyabû**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Reşkujî dibe destika rikberiya pêla hêza cemawerî ,bi dijminatîbûnê hest dibe dema desthilat ronakbîrên wê dikuje, ev tişt zengila dawiya wê desthilatê ye bi demê re , reşkujiya siyasî hingemiya deronî li cem xelkê dadimezrîne, bi awayekî ji bo berzbûna hêza dij û bi armanc ve dixebite ta bikeve dewsa desthilata heyî , berhinde çendîn reşkujî wekî veguhêztinekê ye li qonaxeke metirsîdar têde bê aramî û ceng durist dibe, ew mîna nîşanekê ye ji veguhê ztina desthilatî ji ber ku riwê qonaxê bi temamî diguhêre, li gel wê reşkujî dibe diyardeyeke dirindî dighîne kaşkirina pêlên hêrs û tolê, yê bi awayê xwe ve desthilata heyî li ser deriyên rodanek e movikî datîne, reşkujî guhertina bedxwaziyê ye taku bibe rageh û bîrdoziyekî di nav xelk û ciwanan de bi taybet ve.**

**Ev yek ji me re evqasiya wêraniya giyanî diyar dike ên ku hêzên reşkujiyan wêna ligel xwe parve kiribûn ji bo wêrankirina têkiliyên sazîker û bicîkirina tirs û hêrsê mîna du sedeman ji awanteya giştî re.**

**Desthilata netewî mezinayî û hûnîjandin bi xewinên Erebûn , yekbûn û serdestiyê belav kir , herwiha binyadkirina Islama siyasî û rewakirina reşkujî û binçavkirinê, desteberkirina wî ji olekî desthilatî xwedan bermayekî dîrokî û rastîn, civakan hîştibû bi demê re xwe pê bibînin ji berjewendiya guhdana wê ji wêje, huner û raberiyan, tam bervajî vê yekê şerekî dijwar durist kiribûn li hember meydanên bedewbûn, raman û hunerê, van tiştan hatibûn paşguhkirin û dewsa wan hişmendiya saloxgêrî**

**yên vîna cemawer têkibirin hatibû bicîkirin, ji bo bêne belavkirin û rolên zanyarên wê bêne gunokirin, ta wan bihêlin di zîndanan de nediyarbûyî bin an ew zanyar ji wan re destgîr bin.**

**Diyarkirina hevrêzîkirina zanyarî ji vê pevxistinê mîna nîşanekî diyar e li ser zehmetiya bûyerê û jiyankirina wêna, ji ber ku gel ti carî nabe kirêkarekî li cem bijardeyekî desthilatî bi wê serdest ve, eger fermandar nebe li cem gel kirêkarekî, ji ber vê tirs dibe mîna efyonekî heyî di navbera fermandar û fermanber de, ji ber hemî fêrî wê bûn e ta sînorê yê ku ew ricîm danîbû rizî bibe bi sedema harbûna tirs û sertiyê û pirbûna sitemkarî û gendeliyan ta her tiştekî bedew wêran bibe , ji ber ku bîngeha mayîna milhûriyê tevî ku li ser bê gotin ku ew jêdera aramî û ewlehiyê ye û bijardeyên hûrbûyî bihecandina xwe heta demekê celew bike, lê ew nizane ku ew celewkirin li hember hatina bavlîzoka mezintirîn bê sûd e.**

**Û ji vir rastiya girtinheviya desthilatî li ser berjewendiya mirovê aştiyane xuya dibe , ji cîgeh û bi rêya xuristiya hatinrêza wî û rêya têgihiştina wî ji çi tiştê ku di jiyana wî de diqewime, ji binpêkirin û derbaskirinên yên li hember wî durist dibin, ew bi vî awayî li ser misoger e ku wê zorengê bijî bin siha sîstemeke totelîter netewî bi hebûna civekeke pirreng ji pêkhate û şartistanî mikûr nabe, ji ber vê serkotkirin û reşkujiyê destikekin ji bo gerentiya serdestbûnê, ji ber vê civaka sertbûnê hatibû afirandin, ew ji pêwîstiyên hebûna desthilata netewislamî, di eynî demê de nîşanekî ji roxandina wê ye, berhinde bikaranîna**

nasnameya netewî bîngeheke ji hilweşandina hatinrêzan e ,mîna derbasbûna di talîzoka hingemiyeke bê dawî de , bandora xwe li dewlet û kêleka wê dike .

Dibe rewşa Sûrî ji 2011 ve teqînek bijardî diyar kir di hundirê wê desthilatê de, desthilatekî rizî navê wê dijberî berhem dabû, mîna wê desthilatê bi rengê xwe yê rizî diyar bû ,bi gel û alîgirên xwe re ji devê roparta ragehî axivî , hişmendiya desthilatiya heyî parastibû , bi şerê xwe li hember netew û kêmnetewan , ji derveyî bergê xwe yî Erebî derneketibû, ev rikberî xwe bi hevkariyeke herêmî biçek kiribû,dewsa  desthilatiya cîgirbûyî, em zorenga desthilatî dibînin, li gel hevkariyek hebeş di navbera wan de û ew nûjenkirina hişmendiya netewperest bi moreke Islamî tarî ,ramanekî bi kîn li hember filetiya Ewrûpî rahijtibû, ew bi navê cengên dîrokî û mîna dirêjeyekê jê re talan û kuştinê dikirin (komên li rojavayê bakûrê Sûrî), û civakê parçe kirin ji bo armancên xwe ji rewakirina teror û hingemiyê pêkbînin û  li desthilatiyê  bimînin.

Ji ber vê em bersivdan û kargêrîkirina azarkirinê li girtîgehan  dibînin diyardeyekî desthilatî ye ji wêrankirina deroniya civakî ve û ajotina wê  li hengemeyê û nemanê, herwiha hîştina tirs bibe nanê civakên serkotbûyî ,bi rêya girtinheviya bijardî, yê bedkarî û derdên xwe di nav bijardeyên civakê de aşkere kirin bi rêya lîstina li ser têla hobebûn an netewbûnê.

Ev hemî bûn e sedem ji hilweşîna bîngehên hevjiyana aştiyane  di nav civakan de û pêwîstiyên wê bi derbasbûna

**demê ve hatibûn e windakirin, desthilatiyeke sexte hatibû damezrandin ,li gel wê takekes bi slogan û xewinên mezin û vala ve hatibû niquçandin, mîna xewinên yeksaniyê di nav qatan de , herwiha yekbûna welatê mezin, binavkirina çi kesê ku ji derveyî sirûda netewî û hatinrêza partîtî ve fîxan bide mîna ajanekî divê were jinavbirin li gel hunerbaziya bi reşkujiyê ve û mehfkirina taybetiyên şaristanî û helandina wê di çarçoveya pişaftina nijadî de, ev takekesan hîştibûn e di rewşeke ji koçberî û pepûkiyê ve, xelkê bi rêvebiribûn ji dûbarkirina dûrişmên vala, herwiha diyardeya qutbûna civakê ji demê niha cîgir bibû, herwisa qutbûna wê ji geşepêdan û pêşveçûnê ve, berhinde desthilata bîrdozî a netewî berzbû mîna dirêjiyekê ji bermaya talanan û daqurtandina erdan û kargêrîkirina qirkirina rewşenbîrî û siyasî bi rêya paşêxistina karbîniya mêjî bi rêya danîna xet û qedexeyan ve , herwiha hişbirkirina cemaweran bi xewinên yekbûnê û binavkirina kêmnetewan mîna nexweşî di hundirê desthilatê de belav dibin û dibin e kelemekê li pêş pêkanîna xewinê li gor pesindana wan, herwiha rawestandina di riwê pêşverûtiya kokî a ku roparta Islamî tundirewî hîştibû bibe naveroka herî sert û bi saw û yê tê bikaranîn ta bikeve dewsa serdema desthilatiya netewî , wisa ew bihaneyekê dîtin ji bo mayîna xwe û rojbûna kufletekê ji wan kirêtir , bi rengekî aşkere bi rêya ola tundirew sitemkariya xwe li hember wan berdewam kirin, ji ber vê pîrozbûna deqa olî ji pîrzobûna hewildana desthilatî dertê , bi serdesbûna xwe li ser rewan û çêja xelkê, ji ber vê zehmet dibe ku ew bermaya bê binkeftîkirin, ji wê têkiliya cêwîtî di navbera ol û desthilatê de, ji ber vê pêdivî heye bi dîtina berdêlekê ji wê hilkirinê, ji kêşeya**

**veguhêztina demukrasî ya rastîn û li ser rabûna zanyarî cîgir û geşkirina takekesan bi rengekî hişmendî bi rêya veqetandina bawerî ji dewlet û saziyan ve, xistina wê di çarçoveya henas de, bîrdoziya netewî a totelîter li ser şopa pêşiyên xwe meşîn, yên ku dara ol û deqa pîroz rahijtibûn ji bo bi rêya herdûkan xwîna hênikan birjînin, welatan hatibûn e hûrhûrîkirin û gelê Kurdistanî ji mafên xwe yên li ser erdê, ziman,taybetîbûna a ku bi dewletê ve tê naskirin hatibû bêparkirin, ji ber vê em birçîbûn, bêparbûn ji netewî mîna destikeke bergiriyê li hember desthilatên yên netewbûnê mîna rewşeke êrîşker hewşvedatî û hilkişandî bikaranîn, armanca wan kok û nîşanên yên gellekî ji ya din û zimanekî ji ya din cuda dike binpêbikin, li vir divê em li ser bandora aloziyên cîhanî û siyasî li ser sirûşta civakê, raman ,bawerî û guhertinên wêna bipirsin, herwiha bandora vê girtinheviyê li ser ricîma wê ya ramanî û bîrdozî?!**

**Hewayên milhûrî û zorkariyê cûreyên zorbazî û serkotkirinê berhemdan ji encamê wê raperînên gelek derkertin, li dor rêyên bidestxistina maf tevdigeriyan, şerê maf piştîneke dîrokî jêre dibû piştgir, bîrdoziyên nûjen wêna ciwan û sererast dikin, bi wateyeke din aloziyên herêmî û navdewletî riwekî nû ji erdnîgariyeke nehevcisnbûyî diyar kir, di çarçoveya gellên ên ji nû ve ji bindestbûna desthilata navendî ya gelemperatî derketin, ji ber vê şerê maf nerewayîya vê têgehê û rewrewka wê bi demê re aşkere bûn, mîna destikekê ji bo rewabûnekî rewiştî û nirxî ji serdestbûna desthilatî re diyar dibû, li ser bîngeha sawêrkirina cemaweran û xapandina wan bi**

**dirûşman û hêzên desthilatî vê yekê birêvbiribû, yên ku mezin û binyad dibûn û li ser binemayên bangeşiya deronî xwe jiyankirindan bi rêya dîroka a pala xwe li ser ezmûnên cengên yên li ser berferehbûnê cîgir bûn e dabû ji bo berjewendiya vekişîn û berfirhbûna aliyê beranber û hatinhevê wê, pişt re ew hatinrêz ji artêşkirinê re diyar bû .**

**Ew di sirûştiya xwe de gerentiyeke ji berdewambûna cengên yên li ser qirkirinê cîgirbûn e li ser binemaya malgirtina erdnîgarî, çand û pêşerojê, bi vî rengî ew bawermend bibûn êzing ji cengên ku riwê gewretir ji cîhanê nixûmandibûn, bi gellên bazdayî ên bê welat hatin aşkerekirin, ji ber vê yekê em du zorengên rastîn û qayim ji nîvê dîrokê dibînin, di navbera çandên xwîn û serdestbûnê de û hêzên şaristanî a têkelbûyî ên karîbûn bermayê zanyaran têkel bikin li hemî hebûnê bin siha cîhangeriyeke rewşenbîrî qerpolî rastiya xwe ji têgeha pêkvejiyan, dostanî û hevberîna zanyariyan werdigre, ji ber vê çêdibe ku em bi serketina hevjiyana beşdarîbûyî ya dadmend di nav gelaln de pêşbîn bibin li gor bîngehên hemwelatiya naverokî li ser hesabê vekişîna hişmendiya wêdekar, sedem ji ber ku ew qurbanî û pîşekarên xwe hînbûnên sert û bi êş dabûn, bi serdemên cengên olî û pîroz û herdû cengên cîhanî li Ewrûpayê diyar dibin, dawiya wê ew cenga gerdûnî bi ser navê şoreşên buhara Erebî bû .**

**Veqetandina Kurdistanî ji ziman û çanda wî ve ew cîgirkirina parçebûna welatê wî ye bi rêya pişaftina wî bi Erebûn, Toranîbûn û Farisbûnê ve.**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Ez li vir behsa nasnameyekê dikim ku dikare xwe bide diyarkirin bin siha hingemiya desthilatê, dikare hatinrêza xwe ji welatê xwe re nû bike, herwiha vegerandina jiyanê ji derverê xwe yî rastîn re, tevî ku wekhevî di maf û erkan de wê tiştekî dûr be bin siha peyketina desthilatên nû (Dijberî) ji bo parvekirina desthilata ya ku bi roxandinê ve hatiye gefdan, dijberî hewil dide bibe cîgirekî ji ricîma sertbûn û dûrkariyê, taku rewşekî dirûşma wê hingeme û parçekirin damezrîne, nediyarbûna pirrengiya rewşenbîrî û bêvînkirina rolên bijardeyan û ciyawazbûna wan ji hevdû ve mîna ragihandina cengekî bêhûdeyî ye li ser civaka rojhilatnavînî bi giştî, cengekî li hember vînan e, rêzên piraliyê xwar dike, ji ber vê armanca çi rabûnekî gelerî an raperînekî cemawerî ew afirandina civaka xweşiyê ye, û bîngeha vê xweşiyê pala xwe dide li ser rizgarkirina vînan ji cûreyên koletiya nerm , ya ku desthilata serkotker bi rêya ragihandin, perwerde û fêrkirinê sepandibû, ji bilî pirrengiya şaxên ewlehî û bikaranîna wan ji bo girtina dev û bidûketina li pey xwediyên nerînê.**

**Çawa mirov vê girêkê dikare derbas bike , a ku ricîma desthilatî wêna dibîne gerentiyekî ji bo li desthilatê bimîne û avahiyên gendelî û sitemkariyê saz bike, ji ber ew bê serokê nîşan û xwedawendiya wî rastî gefa roxandinê tê, çima cîhana sivîlbûyî bi serketibû bi roxandina kesên yên bibûn sedem ji ziyandîtina wê bi rêya milhûriya tek rêberî , ji ber ku Ewrûpa gelek talî çêj kiribû ji Musolînî 1, Firanko 2 û Hitler, û ji kesên hatibûn û destê xwe li ser azadî û xweşiyê danîbûn,**

**--------------**

**1- Bînto Endiriya Musolînî 29.07.1883- 28.04.1945 fermandarê Îtaliya ye di navbera 1922 û 1943 , serokê dewleta Îtaliya yê û serokwezîrên wê ye, û li hinek qonaxan de wezîrê derve û hundir bû, ew ji dameznerê tevgera faşî a Îtalî ye û serwerên wê ye, bi navê Dûtşî hatibû naskirin ango rêber ji sal 1930 ve heta 1943 . ew yek ji kesayetên bîngehîn bû ji avakirina faşizmê.**

**2 – Firatîsko Firanko Bûmhamund, 04.12 1892 – 20.11-1975 ew General û milhûrekî Ispanî bû, yek ji rêvebirê lêdanê bû sal 1936, ji bo roxandina komara Ispanî a duyem, yê bi encamê cenga navxweyî a Ispanî encam dabû, pişte fermandariya Ispaniya fermandariyeke milhûr kiribû ji 1939 heta 1975, navê kodiyo an serwer li xwe kiribû, serokê dewletê ye heta mirina wî sala 1975.**

**û çi kesê li hember wan rawestiyan bi hesin û êgir hatibûn t êkbirin, lê li Rojhilata navîn riwê xwe yî kirêt bi reng û pergalên cûr bi cûr diyar kiribû, û cemawer li hember wê tiştekî nakin ji bilî çepiklêdanê heta pileyekî dîn, liv û lebatên serok dişopînin , ew mîna dirêjiyekî tiyoqratîk e ji tewriya mirovê xweda an pêxemberê yê bi derhozan ve sertacbûy ye.**

## 1- Sawêrbûna civakê

**Ma em li pêş sawêrbûna civakê ne, ma em dikarin bêjin ku civak ew sawêreke di hişên me de, ma hebûnek jêre heye?! Em nîşanên takekesî bi gelek tiştan ve dibînin , li pêş me biservediçin, mirov li dijî wan derdikeve, tevî ku me civakê mîna hêzekê bi rêya mirovê takekes dîtibû, qet çênabe em wê bi pergalê takekesên cudatemen û alî bibînin, di nav girtinheviyên ku dizên û ranawestin de, ji ber vê em wan deziyên tevderabasbûyî û di jiyanê de ne li hev dibînin, di çarçoveya bîrdoziyeke sînordar de naye qalibkirin, ji ber**

**ku dikeve di perwaza belavkirina gotinan û veşartina niyazan de, ji ber armanca girtinheviyan û binema civakê li ser ramana zeftkirin û serdestbûnê hatiye damezrandin, desthilata serwer ji bo dûrxistina berbozan pêktîne, civak tenê encameke ji desthilatê, ufkufiya nexwastiyan hewildaneke ne zindî ye ji desthilateke hevrrik re ,berhinde civak berz dibe ji ber ew lêvrêja berhemdana alozî û desthilatane li gor sînora bîrawerî,ezmûn û pêkanîna wê ji têkelbûna bi kêlek re, li gel wê nirx û çanda civakê têne têkbirin bi sedema alavên qirkirinê û pêkanîna têkbirina rolên takekesên wêna yên zanyar û dikarin civakê ji qonaxa aloziyan ve ta qonaxa geşepêdanê û têkelbûna rabûnî bi çandên cîran re birêve bibin, herwiha bi rêya ragihandin û hevberîna zanyarî bidawîkirina malgirtina qezencî pêktê, ew timî hewil dide civakê bike lêvrêjekê ,takekesan amade dike ji berjewendiya niyazên kesên ku her tiştî kirin e di destên xwe de, ma em dikarin bêjin ku du civak hene berdewam şerê hevdû dikin, ew civaka desthilatê, a nûnertiya şaneyê biçûk dike,civaka mezintirîn kontirol dike, ew civaka mezintirîn bijarde û takekesên yên bi hevdû re dijîn , ji hevdû nêzik û dûr dibin li gorî bandorên civaka jorîn ya desthilatdar li ser reweşt û çûna bijardeyên civakî bi awayekî rêbazbûyî, ma ew binavkirina bijardeya fermandar bi civaka biçûk gelo rastir e, bi bandorên xwe yên diyar bi serdestbûnê navdar e, destê wî ya serdest îro li ser ragihandin , artêş û saloxgiriyan, mîna gûncanekî ger ew rast e tê wateyê ku ew zoreng nûnertiya rastiya hebûnê dike, bedewî ji vê zorengê re nîne tenê ew nemana hinirên mirov û heyînê teva ye.**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**Û em guhertina henas mîna derbirînekî ji guhertina jiyan û derdên wê bin siha civakên têkçûyî dibînin, derdên sitemkarî û gendeliyê bi heman demê dikşînin, dibe ku peywendî di navbera qatekî barketî de û a din ku di biniyê de dijî hebe, ew qatê binî tenê xweşiya gewdehî dide ji bo êşa heyî bê jibîrkirin, naye hişbirkirin lê li ser banî diyar dibe ta bi êşa derve re bibe yek, ji ber vê em ne diyarbûna di axaftinê de dibînin, girî pêşî û pişt re xwestin, di nav wan de cîhanekî ji laşên livok e, çendîn tirs ji jiyanê me re dibû metirsî, hemî şîmanên hebûna me êrîş dike, wana dihêle ku rastî talanî û nemanê bin, herwiha windabûna nasnameyan, nûnertiya metirsiya bêhtir girs dike li cem gelên ku fêrî pişaftin, qirkirin û serkotkirinê bi derbasbûna rewşên wêna yên dîrokî û guhertinên wê yên civakî bûn e, herwiha radestbûna ji tirsê re û bawerî bi berzbûna wê di jiyana mirov de ew cûreyekî nerm e ji bobelatê mirovî û hevgariyê re,mirov tenê wê dijî di çarova gerdûnekî virmor û şaxdayî de, ji ber destkeftiya mirovê zanyar naye nemankirin, tirs nûnertiya ketina a ku rastî wê tê di çi karî de dike , dibe tirs di xwe de hestbûna bi tirsê rabike, herwiha mirov dihêvoje ku gelek şiyar be ta asta bêcergiyê, bêcergî di vir de di nirxê xwe de orispîtî û binketinê hembêz dike bi qasî jîndar û nirxên wan di jiyana takekes de, tiştê ku komên mirovî dehf dide ji bo parçe û herifî bibin, ew alava tirsê ye ,çi xebat an raperîn dihêle ew berve wêraniyê biçe , bi encamê têkiliyên têkçûyî di navbera mirovê Kurdistanî û narvîna wî durist dibin ,ev yeka bi çaxê parçekirinê ve , di sala 1916 de girêdayî ye.**

---

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Dibe pahatina Saykis Bîko 1 ji hizrên Kurdan ve neçûbe, ji ber bi rêya wê peymanê ve Kurdistan hatibû parçekirin, ji bo yekbûn ti carî çênebe, li gel wê şehnazî bi taybetmendî, erd û ziman bi derbasbûna dîrokê ve bîngeha tevgera şaristanî ji her gellekî re ye , ji ber vê em şer dibînin ku li hember çi sawa tirs û mirinê herdû , serkeftin li ser sawê bîraweriyeke her xuyanî dike, pizbûna çêkerên mirinê nikarin li hember wê bi alavên xwe yên bi nav û deng di dîrokê de rawestin, ligel hunerên azarkirin û binçavkirina wan, rikberiya mezintirîn ji bijardeya zanyarî a ronakbîrî re ye di bergiriya li hember reşbînî û koçberiyê de, ev ji koletî û serdesbûna cemaweran pêktê, bandorkirina li ser awayê ramandin û çêja wan, tiştê diyar ku berhemên desthilata serkotker û xapandina wê ji cemawer re ew serkeftina mirinê li ser jiyanê ye, herwiha radestbûna ji mirinê re, ji ber ku zindanvan û zîndanî herdû ditirsin, di rewşeke ji bêbawerî û nefretbûna berdêl ve hevbeş dibin, ji ber vê em serkeftina hişmendiya mirinê bi hişyarî rawestiyayî li hember xwestek û xweziyên zanyaran ji bo armanckirina jiyana baştirîn ve dibînin, ev serkeftin rastiya xwe ji komek çavkurî û gelacî digre .**

**------------**

**1- Hevpeyvînên destpêkê çêbûn û ji encamê ve di navbera 23.11.1915 û 03.01.1916 de, û ev dîrok a ku duplomatîkê Ferensî Firansiwa Curc Bîko û a Birîtanî Mark Saykis li ser belgeyên bîraweriyên lihevkirinê di navbera şaryariyên derveyê Ferensa, Birîtaniya û Rosiyayê şahînşahî di wê demê de imzekiribûn û desthilatên wan dewletan li ser vê hevpeymanê di 9 û 16.05 de qayîlbûn.**

**Li aliya ezeziya reş disekinin ji bo talankirina hişmendî û erdnîgariyê herwiha wêrankirina giyanê hatinrêzê ji erdê re, jibilî bobelatên ku ji gemarbûna cîgehê dertên û**

**reşepêşkirina yê ku di naveroka heyîn û jîndar de ye, lêbelê em mirinê dibînin ji derveyî ku ew xwestek û bangeke desthilatî ye, ji serdestbûn û qirkirinê ve wateyekî felsefî digre, di çarçoveya peywendiya mirov bi nediyarbûnê re , ji ber mirov ji tiştên ku jê hinir ,vîn û jîndariyê distîne ditirse, ji ber vê em mirin û tirsê dîbînin ku bi mirov ve gelekî qemitî ne.**

**Dema tirs aliyên jiyanê kontirol dike ,ji mirov vîna tevger û hebûnê dikşîne, ev reweştê desthilatdaran e ji hunerkariya wan bi şêweyên weşandina wan ji sawkirinê re , bi derbaskirina tirsê mirin û hestbûna wî di kêliyên jiyanê de, li gel wê berxwedanî tê derbirînkirin ji ber ew nevêtîbûneke ji reftarên desthilatdaran e ji pêşesazîkirin mirinê re, dibe ew nûnertiya tek ji xwestekên wêje, huner û raman re ji ber ew hersê li dijî nezanî, koletî û serdestbûnê ne .**

**Bi rehnîkirina me li ser cotbûna tirs û mirinê bi rêya rexinekirina me ji desthilata serkotker re, em dikarin bizanibin bihaneyên bîrdozkirina wê ji bo bikaranîna cemaweran û guhertina wan ta bibin alavên bişanhildankirina desthilatê û veşartina niyazên wêna, herwiha dema wana xewkirin didin bi rêya gurkirina xewinên wan û lîstina bi hestên wan bi binyadkirina tirs û mirinê, dema cemawer ji erkên xwe yên sirûştî ve ji rexinekirina desthilatê derdikevin, tenê pesinê desthilatê dide , ev yeka yekem erke ku desthilat ji yên ji berê wê bişkivî û bi wê yekê biserketibû, ligel wê mirin ji têgehê xwe yê kevinşopî hatibû veguhêztin , ne tenê ew mirina kesekî**

**ye , lê ew mirina ku ez behsa wê dikim diyardeyeke bi temara xelkê ve bêhtir girêdayî ye, dizîkirina xewinên wê û xwestekên wê ji xweşiyê re û pêkanîna cîhaneke baştir û civakeke zanyar, berhinde hevpeymana Saykis Bîko bandorekî xwe yê neyînî hebû li ser gellê Kurdistanê, ji ber ew zemîneke baş durist kiribû ji desthilatên yên di ferhengê wan de tenê ceng, jinavbirina kokê û pêkanîna qirkirinan , herwiha bikaranîna mirin û tirsê mîna du destik ji binyadkirina hebûna wê re li ser berjewendiya wêrankirina civakê û belavkirina takekesên wê û tunekirina wan.**

**Şopa hevpeymanên navdewletî ji encamê dema herdû cengên cîhanî ve derketibûn heta radeyekî mezin cengên navxweyî ku civakên rojhilata navîn wêna dijîn durist kiribûn, ji ber vê dûbarekirina amadekirina civakan ji hewayên bêhtir bîrawerî û ronakbîrî dem û çaxekî dûr jêre divê ji bo dûbare amadekirina peywendiyan û geşepêdana wê bi awayên rast, lê ev yeka qet çênabe ji ber binyadkirina bermayê reftarên desthilatê di çêja cemawer û bîraweriya wanî gîştî de ne, ji ber vê yekê tirs û mirin di wê hişmendiyê de zabûn, herdû bedtirîn in di warê jiyana hevbeş de ,a bîngeha xwe çanda lêborîn, cudabûn û pejirandina din e , berhinde tirs nîşan e ji metirsiyên sibê re û qet mirov nikare xwe jê dûrbixe eger dereng be demê derbaskirina an rêgiriya wê berî ku ji nişkê ve gur bibe û wêranî bike, berhinde vîna mirov li pêş awanteya ku bê ta rewşa zorengê bêhtir bi nîşan bike ji bo têgihiştina cenga a ku bedewbûna hebûn û destkeftiyên mirovê zanyar armanc dike , zanyarê ê ku diafirîne û berhem dide li pêş**

**hewildanên ên warên jiyanê bi rêya cengên xwe yên vala têkbiribûn.**

**Birçîbûna mirov û bêpariya wî mîna kelemekî radiweste ta negihe biserîkirinê, birçîbûna rojhilatî ji ewlehî û ji laş re, herwiha birçîbûna xwe ji evînê re,ev hemî wî kirin cihê mirovê har yê li tiştên ku êş û bêpariya wî kedî dikin digere.**

**Ebîqor 1 zanînê bi rehetiya henas ve pesindan kir, de em biramin heta çi sînorî civakên me yên rojhilatnavînî pêwîstiya xwe bi vê cûreyê ji rehetbûnê ve heye.**

**Ev tirs bi hatina deman ve bûbû bîrdoziya mirinekê û têkbirina henasê takekes û koçberiya wî ji dema niha ve.**

**Firûyd dibîne ji serdesbûna mirovê sitemkar li ser mêyan bi rengekî zayendî hîştibû zarokên mêyan ew bavê zorkar bikujin, pişt re wî xwarin û dû re hest bi poşmaniyê bûn ji ber vê yekê û li ser xwe qedexe kirin mêyên komê yên bûn sedemeke bîngehîn ji kuştina bav re, ev Efsana dêwperestî qayîm bû di naveroka jiyanê de û di reftarên malê desthilatê de, bi awayekî rewşenbîrî û civakî civakan hîştibûn bi encamên zordarî û sedemên wê bandor bibin, ev mora sawêrkirî ji cureyê têkiliya civakê bi desthilata jorîn re destpêka megirtiyeke wekhev e, di wêje û huneran de xuya dibe,jibilî ew xugêr û serhevsarê zorengên desthilatê ne bi destdayîna li ser xelkê ,herwiha kiryarê wê ku pişt re gelek guhertin di cureyê ramandin ,şêwaz û hişmendiyê de saz bikin, ma em li tirsê meyzînin wekî zikmakiyekî sirûştî mîna em li serdestbûnê dinêrin?!, bi vî awayî em vê zorenga**

**wêranbûyî rewa dikin , li aliyê dij ji afirandin û xweşiyê radiweste , kesên ku curebûna rewşenbîrî û hevjiyana aştiyane naxwazin ew kelemê qayîm in di rû guhertina civakî de, ne xuyabûna xwestin û dilxwaziyê tê wateyê serkeftina desthilatê ye di pêkanîna hebûna wê de, ev tiştê ku ricîmên rojhilata navîn nîşan didanê , ev yeka dihêle ku ew ricîm li şûna xwe bimîne bin siha nediyarbûna dilxwestina cemaweran di batîkirin û guhertinê wê de an çaksazîkirina wê, tiştê ku li pêş xwestin û dilxwaziyê disekine ew tirs e di rengên xwe yên sar de yê mîna mirinê, berhinde zanyar Ebîqor dibêje:**

**--------------**

**1- Ebîqor : bîrnasekî Yonanî kevin e di navbera salên 270- 341 berî zayînê de jiyabû,dibistanekî felsefî damezrandibû bi navê wî hatibû naskirin bi ser navê : dibistana Ebîqorî.**

**( Dema em bêjin xweşî ew armanc e, mebesta me ji vê yekê ne xweşiya kesên cerisî û xweşiyên hestyarî ne ,wekî hinek kes ku bi nezanîbûnê navdar in  guman dikin, an li dijî me di nerînê de ne,an  têneghin, lê mebesta me  ji vê yekê rizgarkirina ji êşa ku di gewdehê de ye an têkçûna di hizir de.)**

**Ji ber vê em qelşandinê  dibînin ku hatibû vejînkirin û tiştê em dibînin ji koçkirina rojhilatiyan berve Ewrûpayê ew berzbûna tirsekî ewrûpî ji encamê vê koçberiyê ve , tirsekî rewa li ser çand û perwerdekirina Ewrûpî , ji çandeke têkçûyî tundirew jêre dibû nan û naverokeke sade , berhinde rewşekî ase û naye derbaskirin heye bi xuristiya ricîmên rojhilatî yên sitemkar berz dibe, tirs hîştibû bibe**

**stona çi perwerdeyekî mirovê paşdeçûyî werdigre, mirovê rojhilatnavînî tenê wek jîndarekî tirsandî di xewinê de dimîne, di birca xwe yê bilind û xenqoyî de dijî, ti bermayekî berçav nîne xwe pê bipêçe tenê demborînekî ji nêz ve nasnekirî ye li gor dîtineke rastî, tirs tê naskirin bi rêya pîrozkirinê ku takekes ji dema zaroktiyê ve dorpêç dike, ji ber perwerdeyekî li ser girêdana bi demborînê û nirxên wê werdigre,bê nexwestina vê rastiya cîgirbûyî û dibe ku bi xwe re derd bîne, pîrozbûn gemarî dibe naye hezkirin an jiyankirin,tevî vê yekê cureya ramana kerîtî û bernametiya dezgehî ji cemaweran re mêjiyên wan hîştbûn bêhtir bimête dewsa ku biramê û tiştan birêve bibe, ji ber ku çi ropartî dipejirîne eger ji ku derbikeve ji aliyê ku tê pîrozkirin û serwerîkirin, ji ber vê em wê qelşandina rastîn dibînin ne tenê kulekî tê jinavbirin, xuristiya bermayê rewşenbîrî li cem mirovê rojhilatnavînî li ser tirs û tundirewiyê qayîm e, di vî warî de rikberî nikare li ser bermayekî neyînî cîgir biserbikeve li ser pêşwazkirina şîret, hîn û ramanan û parastina wê bê ku rehnî li ser naverok û encamên wê li ser jiyana nûjen bête danîn.**

**Ev tenahiya civakî bi sertirîn dîmenên xwe ye, dibe bi takekes re li her deverî were gerandin, ji ber mirovê niştecî li cem civakên netewên azad di destpêka niştecîbûna xwe de girtinheviyeke kindar dijî di nav xwe de di navbera derdê dihû û taliya îro, nikare bi jiyana xwe yî niha ve şad bibe, herwiha penaberê rojhilatnavînî giyanê cîgeha xwe dijî li her derê ku têde niştecî dibe, sedema wê tenahiyê ji henasê ku gelek derdan kişandî re vedigere , gelek bêhêvî bidûhevdû ve jiyankirî ye, ew di warên nû de nikaribû**

derbasbikrayî, bê guman ku diyardeya koçberîbûnê mîna revekê ye ji tirs û mirinê re di eynî demê de, ji ber vê yekê encamên xwe li ser welatê pêşwazkirî heye, di xwe de lihevpirsînan li ser wan bijardeyên bazdayî hildigre, ma wê gelo têkel bibin , bibin sedemekî ji sedemên geşepêdana aborî û cûrebûnê re ,an wê bibin li ser wê barekî, bê guman diyardeya koçberiyê kevin e, kevinê ceng û qirkirnên dîrokî, bi rêya wê civak têne guhertin û çêdibin, bi demê re kesên niştecî dibin beşekî ji xelkê resen ve û dibin beşekî ji vê nasnameya guherbar re li cihek ta cihekî din.

Bermayê olî çêja rojhilanavînî nixumandibû, jiyana takekes bi gelek rêyan xistibû gefdanê, roparta netewî ya serketî serdestbû li rex roparta comî bi rengê ricîmên fermandariyê, welatan li tûnîleke tarî biribû.

Sirûştiya ricîma siyasî  ya ewlehî civakan hîştibû jihevketî bin, tiştek bi wan li hevdû nacivîne tenê girêdana tirs û sawbûna ji binçavkirin an reşepêşkirinê, ew peywendiya di navbera takekes  û dema xwe yê niha bi dehên salan di navbera têkçûna deronî rikberiya ne li rê de hejiyabû, bi lez ew rikberîbûn hatibû jinavbirin bi rêya lîstina pê û xistina wê di nav karên herêmî û navdewletî de, bi gelek rolan lîstibû di mayîna bijardeya gendelî û zorkariyê ta wekî xwe bimînin, tirs wisa dibû pêdiviyekî li ser milê takekes, ji ber ku di ola wî de hinek deq hene wî berve tirs û sawkirinê dehf dide  ,taku melleyên mizgeftan bên  û pêvajoya stûxwarbûnê hêsantir bikin taku bibe tirsa ji fermandar ji tirsa ji xwedê, wisa bi mirov û rûmeta wî hat e lîstin û sivkayî bi mêjiyê wî hat e kirin, di dema ku Ewrûpa

**li ser lawir miqate dibe û nasnameyekî taybet ji bo wî saz dike, berhinde hinek gel hene hişmendiya dûrkarî û paşdemayînê derbas kirin li rex gelên koçber yên bi xwe re paşdemayîn û dûrkariyê radikin ji bo wêna jiyan bikin , ji zarokên xwe re veguhêzînin, ev naveroka tirsa Ewrûpa ji koçberiyên yên ji deverên cengan li Efrîqiya , Rojhilata navîn û Efxanistanê tên, naxwe ji ber çi di reftarên desthilatiyên Erebî,Tirkî û Îranî de serxwebûna Kurdistanê an ricîma Fîdralî li ser yekbûna serweriya xwe ew mîna metirsiyekê dibîne û ew sabara Kurdî dihêle van ricîman bên e roxandin!, di dema ku desthilatiya Birîtanî yê ku li çandan miqate dibe 250 milyon Cinê xerc dikir ji bo zimanekî mîna zimanê Gal newe jinavbirin 1, gelo ji çi ew tirs tê ,ewê dihêle dever hemî di têkçûn û pepûkiyekê de be!?, bi encamê wê qirkirin û dûrkarî, ji ber vê yekê tirsa Ewrûpayê li ser gellên xwe bîngeha jiyan û gulbûna wê ye lê tirsa ya li rojhilata navîn zengila bavlîsoka mezintirîn e, di xwe de nimûneyên ji zorkarî û dînbûna mirovî dihêle ,tirsa ku li mirovahiyê derbas bû kurtas dike , di dema nûjen de ji cengên cîhanî û vir de, ji ber vê em dîtina zanyarî dibînin ji şîrovekirina van bûyeran e , ew valebûna îro dadigre ,ew dîtina zanyarî bersivdayînek e ji girtina hizr û pêşwazîkirina wî ji hemî alavên gurkirinê re ye bi rengên xwe yên ragehî û netewî, ji ber ku gurkirina nûnertiya binkeftina rewiştî dike ew binkeftin van ricîman dikşînin, û kar û barên navnetewî wêna birêve dibin, narvînên wan gelan kontirol dikin, berhinde dewlet parçe dibin hêzên navçeyî dabeş dibin, aloziyên girêdayî bi gendelî û sitemkariyê diyar dibin**

**dewsa ricîmên berî wê , herwisa sertbûn belav dibe û li dijî xwe nayine wekî ku gotûbêja zorenga Mariksî dibêje dema sertiyê şîrove dike , wê dibîne rengekî ji rengên xêra neyînî, sertî ji xuristiya peyketina bi dû xwedî berjewendiyan e ji bo qezenc û serdestbûna li semyanê, bi encamê hinirên xortan belav dibin ji bo bibin êzing ji şerên vala re.**

---------------------

**1- Gal: bi Ferensî Gaule, bi latînî Gallia, ew navê yê ku Rom li ser navçeyê danîbû yê ku Gal têde dijîn û ew gelên Keltî ne li ferehiya bakûrê Îtaliya, Ferensa û Belcîka yê dijîn.**

**Dewlet dikevin li pêşbirka xwebiçekirinê ji bo amade bin ji şerên derveyî ,vaca ronakbîrî tenê bihaneye ji bo xwestina serdestbûn û malgirtina qezencê bê ku barê berpirsiyariyên rewiştî rabikin, aloziyên îro hemî lihev dikin ji bo roxandina aboriyên dewletan û alozkirina wan û sepandina serdestbûnê li ser wana.**

**Agirgirkirina piraniyan li ser kêmahiyan bi rêya hevpeymanên yên ku civakan parçe kirin û xwestibûn bikevin bin dilovaniya ricîmên ên ku tenê serkotkirin û terorê pêkanîbûn, ji bo gûrîkirina kêmahiyan li ser piraniyan , ji bo avakirina sîstema hûrhûrîkirina nû , ew jî derdê kêşe û aloziyan dikşîne bi demê re zêde dibin, berhinde sêyîneya zorbazî ,teror û desthilatê tê bikaranîn ji ber ew darêjdankekî nû dibe li warên cîhana paşguhkirî li gel wê û bi rêya wê sînor dûbare têne nîgarkirin li gor xwestek û pêdiviyên dewletên bihêz.**

## 2-Berve duristkirina takekesiya zanyarî

**Bûyîna vê penaberiyê windabûneke cûda dûz kiribû ji civakên ên bi sivîlbûnê ve navdar in.**

**warhîştî îro pêdiviya wî bi derfeta ewlehiya winda ve heye li welatên ku têde piştrastbûn tune dibe û tundî têde belav dibe, ew bû nanê van civakan, berhinde peywendiya di navbera tundî û desthilatê de rê dûz kiribû li pêş çêbûna sabara tirsê li ser dirêjî neqşeya rojhilata navîn , ev nîşanekî diyar e ji sirûştiya jiyana rabûyî li ser windabûn, bahatîn û awanteyê.**

**Berhinde kêşeya mirinê di vê çatê de ne tenê bi gerdûn, erd û ezmanê vê navçeyê ve girêdayî ye û ne tenê ji ber ku vê deverê buxçeya ezmûnan e ji cureyê çekan lê ji ber mirin asta xwe yî xuristî derbas kiribû, êdî di wijdana komî û bîraweriyên wê de bicih bubû, va şagirt û ayîndariyên partiyan serok û serweran dikiribûn e xweda li rex şagirtên rêbazên olî û oldarên bexşînkirinê, di vir de dirindiya mirinê û kanîbûna wê ya zorkuj xuya dibe ji bo belavkirina tirsê bi awayên nûjen , ji ber vê felsefe bi xwestekên desthilatdar ve ji bo kuntirolkirina hişên cemaweran nameşe, zanîna serkêş bi namesazên kevirbûyî re nameşin , bi baweriyên bîrdozbûyî re lihevnakin ên armanca wana sawkarîkirina bijardeyên ciwan û dijminatî bi zaroktiyê re û anîberkirina wan bi awayekî zorbed ve di rewşên cengan de, tevî wan hewildanên hov ji bo lîstina bi têgehan û lêkirina wêna bi bihaneyên girêdayî bi başiyê ve, zanîna kêşeyê di hewildana xwendina destpêkên wêna ye,**

**dibe bikaraîna derdên mirovî û anîberkirina rewrewkê dihêle dirindî nexweşiya mirovê niha be, ti çare nîne ji bilî ceng ve ji alîkî û niştecîbûn ji alîkî din ve, bi pîrozkirina gendelî û sitemkariyê, ev yeka tenê diyarkirineke bêhiş e ji lawaziya mirovî re, bêzariya wî ku bi lingekî qayîm ji bo jiyaneke baştir derbas bibe, bê girtinheviyên wêrankirî, dibe bazdan mîna alavekî bergiriyê be li hember mirin û sertiya jiyanê, palpiştina wê mîna lîstoka belavbûyî ye li hember rewşên pepûk ên dibin e rastiyên hebûnê, ewê dagirtî kelem û nakokî, li gel wê em bi demê re nirxê kêliya ê ku em wê dijîn winda dikin.**

**Demborîn ji bîrê niştecî dernakeve, ew penaberiyê hilbijartibû mîna derbirînekî ji gewrebûna xeman di cem xwe de, ji ber vê axaftin li ser kêşeya koçberîkirinê û veguhêztinê divê me bi rêve bibe li rêyên felsefî û me vegerîne ji babetê yê em li dor wê dizîvirin , ew tirs û mirin e, herdû dibin tek bûyer mirov bi rêve dibin li zêdetir ponijîn ji êşên henas û encamên wê bi felekê re.**

**Ev pêvajoya lêkolînê mirovê Kurdistanî dikir di talîzoka serkotkirin û tirsê de , herwiha penaberî dibe aliyê din ji jiyana wî ve, ji ber ew di talîzokeke cûda de li hundirê welêt dijî, li vir bîranîn û bûyerên berê ji deroniya koçber ve venaqetin û bermayên tiştê ku di bîrê wî de mayî dijî, çendîn tirs ji mirin an pişaftinê an jinavbirinê bi serdestbûna tek çandê li ser komek çandan ve an hewildana hêzeke siyasî ji qirkirina komeke mirovî metirsiyekî mezin bû li cem takekesan û bijardeya berketî bi taybetî ve , ji ber vê dima metirsiyeke cîgir divê mirov li ku derê be lê birame,**

li welêt an li derve, ev yeka bû cureyekî ji rikberiya dijber ji reweştên êrîşkeran re bi çewisandina kesên din ji bo bêne jinavbirin, ji ber vê em takekes dibînin bin siha ricîma dûrkariyê tê birêveberkirin û ji rastiya jiyana xwe yê ku li ser metirsî û tirsê cîgir bûye tê razandin, ew tu carî ji van tiştan qut nabe, tevî ku li penaberiyê be, nikare bi lez ji derdên xwe rizgar bibe, dibe ku li ser tehtên xewina xwe yê binpêbûyî li rojhilatê xwe yê pepûk bijî , berhinde çendîn nakokî di navbera takekes û sitemkariyê de heye, ev yeka me dehf dide ku em helwestekê li hember zorkariya bûyerê li ser deronî û kiryarê bistînin, ev zorenga dijwar di navbera ramanan de mirov dihêle ku ji rewşa xwe qut bibe , li hember wê serî hilde, bi rêya berdêlkirina vê rewşê bi rewşeke din , berhinde takekesî dibe mîna barekî li ser henas , dema ji komê û hatinrêza xwe qut bibe, tevî bosta azadî, derbirîn û tekbûyînê , em wê pevbendiyê û vê dudiliya a ku ketiye kûrahiyê dibînin , ev gizorîbûn di henas de em wê parçe parçeyî dibînin, hemî tiştî têdighe û hemî tiştî hembêz dike, ev pabendîbûn ji komkara civakî bêhtir rêxistinkirî û bi rêk û pêk e li ber rewşa zengarî li warên me, li gel wê mirov di rewşeke ji rûbirûbûna hengemiyê ve dijî , bîngeha çêbûna xwe li ser dijminatiya nirxên rabûna naverokî ye û geşepêdana rastîn e ji civakên ên rastî binpêkirin û qirkirinê bi cudabûna rengên xwe ve tên, li vir çi hebûn ji kokê ve ji wê takekesîbûna a ku dewletên cîhana sivîlbûyî şehnaziyê pê dikin nine, çi civak ji alozî û tengaviya xwe aram bimîne nîne , di derbarê peywendiya di navbera jin û mêr de, berhinde peygirtina mirov bi takekesî û ezeziya xwe ve ferztir e ji zarokê ê ku bê xwediyên xwe dijî, di dema ku yase tê pêkanîn ji yê ku

rolekî dabû ji nirxên takekesiyê re, serpereştî erkekî dewletî bû, ta nirxên takekesî sebaret ji xuristiya jiyanê bi tevahiya xwe navend bin, ew sirûştiya ya ku li ser kirdeyên civakê û kiryarên takekesên wê rabûyî ye, di dema ku yase dibe mîna dara nerim yê ku ew û din berhelist dike, rê dide ji pêkanîna desthilatekê bêhtir bi tiştên xwe ve û peywendiyên xwe ve bi derdor û saziyan re heye, tevî ku takekesî mîna şoreşekî bû li Ewrûpa ye, hemî bi rêya wê bi berhemên azadî, maf , erk û mafê baweriyê dijîn, lê vala nabe ji destxweberdanê bi wêna ta asta ezezî û hejariya naverokî, tevî ku ew ji ramanên totelîter dûr in lê ew jî bi awayê xwe ve gelek bi cinava komî ve ta asta tundirewiyê hatibûn e girêdan, derketin ji komê û serkêşiyê li hember wê derî vekir ji guhertina naverokî re, bi palpşitbûna li ser nûbûna ramanan û jîndariya wan, û nepejirandina xwe ji oldarî , pîrozkirin û bişanhildanê , tiştê bi awayê wê ji dîmenên alîgiriyê ve girêdayî, ev bişanhildana ji ez re ji meraqa kûr ji derbaskirina pevbendiyê re vedigere, mirov dihêle bibe alavekî ji bîraweriya mirovî bi tiştan ve, berhinde nabe ji civakê rojhilata navînî ku li pey Ewrûpiyan bikeve berve takekesiyê ve bi awayekî kevinşopî, berhinde pêdiviye ew dayîna rewşenbîrî û hizrî hebe ji bo temamkirina vê hewildanê, guherîn pêwîstiya xwe bi naverokekî wêrek û guherbar ve heye , bi girîngiya wê bawer be, ev yeka wê bi zehmetî pêkwere bi kêmanî li wê devera barketî yê ew armancekî sitratîcîk e kevin e ji çavbirçiyan re bi hatinên wê, ew raberî û berketî ku li zîndanên alîgirtin û guhdanê dimînin, dibin şerekî bêsînor , ji ber vê yekê pêwîst e civak bi aliyê bîrdoziya yeksaniyê ve here, pêdiviya xwe bi girîngiya zanîn û jiyana azad a

**hevseng ve heye, berhinde zanyar pala xwe li ser bijardeyekî baştir didin bi karîbûna wan ku bên e girêdan bi wê takeksiya ya dijî ezeziya neyînî derdikeve bi baweriya wan bi binema malbata şad yê ku stona wê evîn û jêhatîbûn e, ji bo ezberkirina rehetiya henas yê dibin jêdera geşiya mirov û bilindiya wî, berhinde zanistvanê aborî a Nemsawî Firêdêrik Fun Hayik 1 1899- 1992 di pirtûka xwe de (rêya li koletiyê) dibêje:**

**(Ji bo avakirina cîhaneke baştir, divê em wêrekiyê bi destxwexin ji bo rabûna bi destpêkeke nû ve, divê em astengiyan ji holê rabikin, ewê ku hovîtiya mirovan li rêya me dema dawî dagirtibûn,divê em jî hinirên baş yên li cem takekesan berdin.**

---

1- **Firêdêrik Ûgust Fun Hayik, xelata dostên şehnaziyê û hevaliya ekadîmêka Birîtanî di 08.06.1899-23.03.1992 de wergirtibû, bi tîpên navê wî yên yekem hatibû naskirin F.E.Hayik, ew bîrnas, zanistvanekî aborî Nemsawî Birîtanî ye, bi piştgiriya xwe ji lîbraliya kevinşopî re navdar e.**

---

**Binemaya rêvebir di her hewildanekî de ji bo afirandina cîhanekê ji mêrên azad divê wisa be : siyaseta rizgarkirina takekes ewa tek siyaseta pêşvero a rastîn e.)**

**Em ji rastiya girtinheviya ramanî ewle nabin , ku pişt re me bi rêve dibe ji berzbûna ez û çûna wê bi aliyê vê serxwebûnê yê ku li ser rewşa xwe derbirîn dike wekî rêyekê ji tenahiyê re û hestbûna bi bêpariyê ji hezkirina mêr û jin bi hevdû re yekgirtî ji bo zarokan, ji ber ku**

**takekes pêdiviya xwe bi lihevhatina malbatê heye, ji ber ew bîngeheke ji avakirina wî ye, ji malbateke ku ked dide bi lêkolînkirina wê û pişt re avakirina wê bi rêya têgihiştin û bawerî ku şadî li ser dostaniyê cîgir e , zanîn bi girîngiya yekîtiya mirovan û balabûna wan bi peywendiyê ew rêyeke ji têgihiştina hebûnê ,ew hêz û hinirên xwe ji dostaniya microvan werdigre, ne ji pevçûn û girtinheviyê, divê em di rû mirin û tirsê de rawestin ji ber herdû cihê xwe di hundirê me de digrin di kêliyên tenahiyê û kêliyên awerte de, berhinde hewildana takekes ji yekgirtinê re ligel ên dijê xwe re di zayendê de ew hewildana ji bo hêz û şahiyê ye, derbaskirina hestê neman û sawê ji wê tenahiyê re, ev yeka koçberiyê tîne, berhinde Funhayik diyar dike ji bo serpereştiya jiyana baştir divê ew kelem bên e jinavbirin , ewê ji bo astengkirina jiyanê hatibûn e avakirin li hember rêgirtina hiniran yên ji bo geşepêdana jiyanê dixebitin.**

**Pesindana raperî û şanan pêdiviyeke herî bê sînor e ji hebûn û jîndaran re, ji ber vê yekê dîtina me ji tirsê re mîna diyarkirina me ji rastiya êşên mirovan û serpêhatiyên wanî têkçûyî , rengê mirinê li ser wê hatibû danîn, ji me re mirina gewdehî ne pirsgirêk e, ew ku pala xwe dide li ser veguhêztina mirovan ji wêneyekî ta din, bi qasî ku mebesta me bi wê yekê ew taliya jiyanê , ew li pêş xewin û kabosên xwe ne û bûyerên ên bûn e sedemekê ji xemsarî û bêzariyê re, tiştê wan hîştibûn ku wekî miriyan bin, ji ber vê em takekesî dibînin mîna hêzeke moralî û giyanî, pepûkî û xemsarî jêdibe, ev naye pêkanîn ji derveyî dostaniya ê ku perweran didin e malbatê, ev dostaniya wijdanî pêknaye ji bilî dema em bi evîn û zanînê bi heman**

demê bêne girêdan, tengbûna rêyên gotûbêjê bi yê din re bi demê re dihêle tirs binyad bibe , zora hiş û wijdanê bibe, em di jêderên êş û derdê dibînin destpêkek ji rizgarbûnê re, berhinde wateyekî ji vê vînê heye a armanca xwe pêkanîna aştîbûna xweser e , li gel wê xwebûn an awaz mîna vegera li henas e di balatir dîmênên xwe de, ji ber tiştekî ji mirina bi pergalê tirsê ve metirsîdartir nîne, ji ber ku pêdiviya xwe bi vînek e moralî bi zorbazî bîrawer heye,ji ber ew ne tenê mirin e , ew raman û berdewamiya jiyanê kuntirol dike , herwiha sirûştiya kiryaran û bersiva kirdeyê yê ku kiryarê mirov kuntirol dike bi giştî ve ,dema mirin dibe bîrdozî an olekî, desthilat li paş wê bi harbûn radiweste , bergiriya wê dike, neperoşkên xwe dixe di hiş û qirikên civakên xwe de bi rêya tires ve, xortan artêş dike, bi rêyên curbicur ta têkevin di zorengên bê dawî de armanca wê mayîna ew desthilata pîroz, mîna pîrozbûna ol û bîrdoziyê, li rexê din ji tirsê ew pirsîn dimîne, çima dijîm , ev me dehf dide ku em valahiyê şîrove bikin a ku bedewbûnên jiyanê di hizran de çinî dikin, jiyanê bi tevahî dihêle bibe xapandin, berhinde ew zorenga pirreng mirovan dehf dide li meydanên bê jimar, bi hezkirina mirov bi têkçûna din ve girêdayî ye, a din di rexê xwe de destikek nahêlîne û bikartîne ji bo kûrkirina wê têkçûnê, ma ev yeka dibe nîşanekî li ser xwesteka mirov ji mirinê re bi rêya belavkirina xwe ji mirinê re, herwiha tiştê ku nakokî û bihevketin ancam dide gerentiya ceng û pevçûnan , ti jîndar an kevir jê bi ewle nabe, em çi girêdanê di navbera çanda rojhilatî yê bi werîsê bavanî ve qayîm e û di navbera çandeke takekesî guhê xwe nade li ser sirûştiya peywendiyê ta pê re jiyan bike eger çawa be nabînin , berhinde em

**gelek û bi dirêjî li ser derdê ol û netewê axivîn, herwiha girêdana kor bi welî, mêrê ol û serwerên siyasî ve, di dema ku em vê yekê li Ewrûpayê nabînin , axaftin li ser mîna bîranîna dîroka kevin e, ev rewanîbûn yê li pêş wê ew serxwebûn disekine , ev tundirewî û tirs ji axaftina bi tiştê bi sernavê ol, zayend û siyaset bi hêsanî di civaka sivîlbûyî de belav e, ev tişta me dibe ku em tirsê têbighin ji dûriyên wê ya felsefî a ponijînî , di xwe de seyrana mirov di nav jiyan û nehêniyên wê û tiştên veşartî de kurtas dike, ji ber tirs amana bîr a fireh e , piralî ye, di jiyana mirovahiyê û seyrana wê ya zehmet de ,bi rêya qenalên taliyê û girtina asoyên çareseriyê, an bi rêya afirandina hêviyekê û kirina wê mîna armancekê bi xwe.**

**Û kêşeya tirs kevin e kevinê têkiliya mirov bi desthilatê ve , metirsiya heyînî ji mirinê, herwiha pêwendiya mirov bi xweser û armanc, bîr û pîrevkên xwe ve, eger mirin li gor derbirîna Şopînhawir ew bîrbûna rastîn be ,ew xêvzana felsefê ye, tirs mîna gotûbêja bîngehîn e ji pêwendiya bîrnas pê re, herwiha ew gêrînga metirsiya bîngehîn e ji hobûn û ramandinê re li dor rastiyên henas û nehêniyên wê, hemî nakokî û rewşên mirovî li dor dijminatî, nankorî, heznekirî, derewîkirin,şadî û sawêr ve dizîvirin, tiştê li dor diyarbûn û nepeniyê tevdigerin, ji tiştên ku berdewam berbara sawêra zorkar li ser ramandinê aşkere dike,herwiha destnîşanên yên ku deriyên gumaniyê bi her tiştê ku di eywana pirsînê dizîvire vedike, berhinde ew pêşbirka kor di navbera cîgîrbûyîn û veguhirtiyê de destpê dike, bi qayîlkirina vaca mirov di şorbûn û behirkirina hevrazbûna ramanî û qezencî , herwiha radeyên çûna wî dişopîne bi aliyê**

**bedenketîbûn û nemanê ve, ew valahiya vê veguhirtiya lezgîn dizane, lê ew ranaweste, ji ber di veguhirtiyê de armanca xwe dibîne, di hevrazbûna hizrî de wek hewildanekî zanyarî azadbûyî dibîne,di dema ku candarî berve zêdetir lavakirin û jiyankirina reftaran diçin ji bo gihiştina pileyên baweriya bilind, yê di reweşta wana de wateya xwe piştrastbûn e,herwiha em di tirsê de nîşanan dibînin ,di hest,raman û şîretan de têne naskirin, herwiha di ricîmên fermandariyê de , di metirsiyên fermandaran de bi mayîna di desthilatê de, xwe dixin e mirinê ji bo parastina destketiyan û ne xem e ji wan re welat wêran bibe û gel neman bibe, tevî çiqas li ser tirsê hatibe gotin , bandora wê li ser radeyên jiyana mirov, lê ji metirsî û şopên wê yên dirêj li ser henas nehatibû dûrxistin, ji ber ku tirs ketibû berketî û têgehên mirov, bi demê re wan vexwaribû, ta bibe jêre ricîmekî mirov jê nikare veqete, kelemê mezintir yê ku di rû şadiya mirov û xwestekên wî radiweste di tirsê de berz dibe, bi dîmenên cur bi cur diyar dibe, ew dudilî û pepûkî ye, metirsiya ku mirov li pêş zorengên deronî datîne, jê ked, raman û hestbûna bi dayîn an serkeftinê distîne, li pêş jiyana rojan e dibe kelem,lê ew bibû rewşek e ragihandinî, ekranên ragihandinê torandîbûnên tirs û sawê li hember hevdû belav dikin ligel kiryarên zorkariya meydanî ên rojane, tevî gotinên felsefeyê lê ew jiyanek e ji tirsê vala dadimezrînê, lê aliyê felsefî tevî çiqas bi hişmendî û babetiyê ve biçe lê ew nikare wek merc serkeftinê pêkbîne û bibe berdêlekî parastî ji tirsê re, ji ber vê em ji tirsê re sim û naperûşk dibînin, dibe piştrastbûn mîna ramanê yê li dor xwe dizîvire di nav êş û metirsiya henas de di belavkirina hevçûyîn û razberên wê**

**de beranberî heyîneke veguhirtî û gorek, ji ber ku hevçûyînek berdewam heye ji girtinheviyê re , şikênandina vînan ji berjewendiya rabûna vînên hişk û serketî ve ye, ev yeka hestê tirsê li cem bijardeyên çevsên zêdetir dikir, di koçberiyeke demdirêj û metirsiyeke rastîn de ew dijîn, di dema ku Binyamîn Firanklin dibêje: ( yê ku dev ji azadiyeke bîngehîn ji bo ewlehiyeke demkî berdidin, ne hêjayî azadî û ewlehiyê ne.)**

**Wisa tirs tê belavkirin ta pişt re pîroz bibe û bê guman tirs destpêka neyartî û şaşîtiyan e , tiştê ku em wekî orispîtî binav dikin , ew ji tirsekê ji rûbirûbûna henas ve derdikeve , çûna bi wê berve rastiyên berçav , ji ber vê Firanklîn Dîrozfilt 1 got :( Tek tiştê ku divê em jê bitirsin ew tirs bi xwe ye.) ji ber dikare celew, serkot û bandorê bike , ji ber ew dikare mirovan bêhtir û bi hêsanî bi bumbe bike û biteqîne dema ku ew bixwaze , herwiha xelk tê xapandin bi rêya gefxwarinê û mezinkirina berzkirina vê sambûnê û hîştina xelkê hest bibin ku tirsa mirovî parçeyekî naye veqetandin ji rêbaza xwedê di sizakirina mirovan de.**

**Di vir de divê em hundirê vê êşê vekolin, ji bo em wê nas bikin bi rêya vê kesayeta ê ku ji hêsiran toq nabe û bi tiştê ku li dor diqewime mijol dibe herwiha tiştê ku di hundirê wê de çêdibe ji xwezî û kederan li ser jiyaneke bûye sehneyekî ji êş û bîranînan û rawestgehekî ji bazdanê ji rewşeke tije kembaxbûn, eger cîhan mîna ku Şopînhawir dibêje ramanek be li gor têgihiştina babetî jêre bi rêya zanînê em baş berdikevin ku çendîn ew êş raseyî ye, dibe ku êş li vir kilîteke ji vekolîna rastiya hatinrêza mirov ji heyînê**

**re be, rastiya jihevketina civakî yê ku desthilata serkotker bû jêre sedemekî bi dirêjî dema mayîna xwe û kiryarên wî yên neyînî li ser takekesan ji bo fetisandina xweziyên wan ji jiyaneke baştir, ji ber vîn meyldarê hêviyê ye tevî ew ji xemsarî û êşê ve nêzik e, hemî zoreng ji bo berzkirina vînê bi yekbarî û pêşveçûna wê ye, axftina li ser navdariyên mirovan dema ku çêbûn e me hêdî hêdî dehf dide raperînê li hember wan sirûştiyên hilgerî  û banga ji bo jiyaneke baştir, lê zêdetir pêdarî di rû bobelatan de, an guherîn  ji bo civakeke baştir zelaliya mayî li cem zanyar ezber dike, ev guherîn ji têkçûnên deronî vala nabe , penaber wê dijî ligel êş û xewinên xwe yên binpêbûyî li welatên xwe, welatên tirs û xemsariyê,  bazdan bi xwe cureyekî ji rûbirûbûna bêçarîtiyê  ji rewşeke nû re , berhinde em wê wekî rewşeke tal binav dikin , neçar in wêna ligel tunebûna nîşanên çareseriyê bijîn.**

**Em dikarin sirûşta mirovî pesindan bikin ku ew vedenga sirûşta gerdûnî ye , eynika wê ye, wekî ku darên herî xurt û kokên xwe qayim di kûrahiya erdê de bêhtir dikare di rû bê , bahozan û felekê de xwe bigre, mirov jî herî xwedî bar û kanîbûn bûyerê hembêz dike , ew yê hêja ye,çaksaz e , dikare bimîne serdestiyê li ser  bermayê hêmanên mirovî yê kêm yekbar dibin bike, ev rewşa cîgehî eynî wê di rastiya zorenga pêşîn de  di nav mirovan de diyar dibe, ji berê de koçberiya mirov kevin û nû û veguhêztina wî ji welatê xwe yê rastîn ve li welatê nû ew mîna hewildana bidestxistina xweseriya talanbûyî ye, danîna lekeyekê li ser jiyan û aramiyê , tekesiya me ku em parçeyekî ji hebûnê ne eger em li ku bijîn û herin an bimirin, em vedigerin ji ew**

**malzaroka fereh ê ku jiyanê durist dike, herwiha derdên me nûnertiya naveroka wê dike, ew dûrre dûbare nûnertiya şirûştê di guhertin û guherîna wê de, ma ew vîn neman dibe tevî dilêşiya zehmetiyan û hatina bobelatan?!.**

**Ev pirs me dihêle ku em bi mirinê biramin ji ber ew guherîneke takekesî ye û ne nemaneke komî ye, herwiha ji bo ponijîna tirsê ji ber ew kelemekî bîngehîn e di rû guhertinan de,lê ew di her dem û qonaxî de tê şikênandin, sikestina wî naye wê wateyê dawiya wê, metirsî beşekî ji bûyîna jîndar e di girtinheviya wî ji bo heyînê, serweriya hêmanekî li ser hêmanekê zorenga sirûştî li ser heyînê berz dike, bi nemana hêmanên herî xuloxe û lawaz, ev bazdan ji bo serkeftina vîna takekesî ye ,ew diket bin paşguhkirin, binçavkirin û serkotkirinê bi destika wan desthilatên ewlehî dewsa ku xweşiya mirov pêkbînin û mafê wî biçespînin û erkên wana rêxistin bikin, bûn metirsiyekî deronî naçe, tenê bi xwestina nemana wê, lê dima destikek dûrxistin û nixûmandinê ji jiyana ku li ser yeksanî û rêxistina pêdiviyan rabûye, wekî Fûyirbax 1 di pirtûka xwe de (Ponijînên bi mirinê ve) dibîne :**

**-------------**

**1- Ludvîg Fûyirbax bîrnasekî intirbiyologîk Elman e, bi pirtûka xwe yê bi nav ê : naveroka xiristiyanîbûnê navdar e , têde rexne li xiristiyanîbûnê kiribû, bandora xwe bi nifşên ji ramanvanên pêş kiribû,mîna Karil Marks, Firîdêrik Encliz , Rîtşard Fagner û Firêdêrik Nîtşe.**

**ku hemî xebatên mirovî ji evînê pêktên, em dibînin nemana rastîn ji hezkirinê re di tirsa mirov de ye ji tiştê ku li dijî bûyîna jiyana xuristî radiweste , bi pîrozkirina**

**nediyariyê aşkere dibe , pêşkêşkirina reftarên dilpakiyê yê tirsnak ji desthilatên sitemkar re, ne tenê wisa lê koletî jêre, bi vî rengî naveroka afirandinan li cem mirov têkdiçe û jiyana wî dibe şevpestekî demdirêj, berxwedaniya mirov û xwesteka wî ji bo bighe jiyaneke baştir beşekî ji baweriya xwe bi hêvî û evînê ve ye.**

**Û  felsefeya nemir em dibînin ku bandorekî xwe yê xurt heye û bê alî ranaweste li pêş pirsînin mirov li ber aloziya tirsê, ew wî dihêle  di qonaxa bêcaniyê de be,wî dixe bin serweriya ew dêwlaxî yê diyar nabe tenê di pergalê mirinê de ,ewê nûnertiya dawiya cîhanê bi rengê xwe yê naskirî li cem mirov dike, felsefeya a dikare serkêşiyê li hember reftar û tivîkirinên mirin û sazkerê wê bike  bi girêdana rastîn di navbera mirin û zanînê de diyar dibe, ev yeka erka lêkolîna heyînê li cem zanyar li ferehiya hebûnê hêsantir dike.**

**Bedtirîn rengên mirinê ew rabûna sînorekî bilindtir ji tirsê re di rû jiyan û siberojê de,  rewşa gellên buhara Erebî bibû niştecîbûn û têkçûn,bi sedema çaxên koletiyê ,ew bi temamî li ser gellan hatibû pêkanîn, bermayê desthilata serkotker bi hêsanî mêtibûn, hevdû serkot kiribûn, ji ber vê mirin di dîtina min de ew nemana cergbûnê ye, duristbûna tirsê li hemî warên jiyanê de,tiştê bijardeyan hîştibûn berve çekdariyê biçin,ta bibin êzing ji cengên vala re, navê pîroziyê lê hate danîn , ew çi têkiliya wê bi pîrozbûnê re nîne, tenê pîrozkirina hovîtî û bêhişiyê  ,ev  bû ji navdariyên civaka nezan, û fîdralîzimê mîna parçebûnekê binav dikin, hevbeşî wek pilanekê , demukratî mîna**

**pilaneke Ewrûpî , sitemkarî mîna tivîkirineke ezmanî olî, ev çavpestkirin bi serketibû civakên tîjandî bi gewrekirinên netewa olî li kêmnetewan dinêrîn bi nêrandina li koleyên kedkar ji bo ji wan re xewina yekîtiya Erebî an gewrebûnên şahînşahiya Osmanî an Farisî pêkbînin, ev hemî li ser hesabê milletekî resen reseniya rojhilatê û ewa gelê Kurdistanê ,ewê mîna zinarekî sekinî di rû bêrolkirin , pişaftin û dûrkariyê de, tevî hatina qirkirin û komkûjiyan li ser, û banga ji bo şikênandina gemkirina tirsê ew mîna şikênandina mirinê ye, wek têgehekî nêzî vemirandin,bêcanî û bêliviyê.**

**Ew vaca sawdar qirkirinên rewşenbîrî û siyasî encam dabûn, asta metirsiyê li cem takekesan bilindtir dikirin ji bo gihîştina jiyaneke ewle û civakeke zanyar, ewên neqşe û sînoran danîbûn pala xwe li ser rijandina xwînê dabûn û xistina civakan di qelibandineke dijwar û zehmet de, ji ber ku bîrdoziyên xwînî bi rastiya xwe ve tenê derbirînek in ji çavkarî û rûhişkirinê re û xwestekekê ji serdestbûnê li ser hatin û samanê , ligel wê Kîrkêgor dibîne: ku tunebûn û netebitîbûn bi hevdû ve girêdayî ne, bandora tunebûnê ew ji encamê netebitîbûnê ye, û derbasbûna mirov ji binkeftinê re ji ber ku bi dijwarî rastî helwestên zehmet hatiye, jê hatibû xwestin ku bihna hilma nemanê bike bi zorê, ji ber ku xewin , hest û hêviyên nigaşî hemî ji lezdanên jiyankirinê di jiyanê de hatin e,li ser bîngeha ku bên e pêkanîn, û tenê megirtî ragehekî bedewbûyînî ye mirov dihêle ku nûnertiya dîtinên baştir bike ji cîhaneke bêhtir qayîm û hemîyan hembêz dike, berhinde çûna mirov bi netebitîbûnê re nasekine li her deverekî ku ew têde niştecî**

dibe, û rewşa pepûkiyê bi wê kesayetiya ya ku pepûkî jê hêz û hinira xurt dimije girêdayî ye, û bêhêviya yê ku mirovê rojhilatanavînî lê derbas dibe ji wê hinira neyînî tê wergirtin yê bi rêya wê her kêliyê dimre, ew tirs mîna hişbirekî dixwe û ji tamê wî hez dike, û timî li cem tiştek heye ku xwe jêre bitewîne, eger melle bin ku li ber destên wana dibe şagirt an rêberên yên ku ji bona wan derdikeve û bi navên wan bang dide,eger ew tişt ji hezkirina wî ta asta koretî û sofîbûnê ji wan re be an ji encamê tirsekî dighe asta mazoxiyeke beloq, û wateya vê yekê bilindbêjiyeke bi tirsê û xwe derxistina bervajî wê, ji bo parastina ew quretiya sexte, herwekî Can Bul Sarter dibêje ku ew raste hebûn radighîne ku mirov bi netebitîbûn dijî û rastî netebitîbûnê tê ,ji ber vê em tirsê dibînin mîna tevinê yê li dor tevgera mirov xwe dipêçe, û jêre rêhevalekî pêwîst e, û ew gelên yên ku li erdnîgariya tirsê dijîn ,em wan dibînin bin siha firtone û cengên bê dawî dijîn , xuristiya mêjiya destjikar hilgirtî derdixînin yên ku ji bona wê ew hatibûn e avakirin, û dibe ku ew ramanên comî û nijadperestiya navdar ji xuristiya ew hişê ji temar û tembeliyê têrbûyî derkeve,ji ber ku nezaniyek bi jiyanê û rêya jiyankirinê heye, ji bilî ew tunebûna yê ku li dor wê jîndar tevina xwe dirêsîne, baweriya mirov bi hişên desthilatdaran û devberdana wî ji xweseriya raman , şêwe û xêza jiyana xwe heye, ew asta hestê xwe bi nemanê ve di xulek û hurgiliyên hebûna xwe de bi derbasbûna qonaxên curbicur leztir kiribû, berhinde metirsî destpêka pirsînê ye û pêşgotina wê ye û ew sedema pêşîn e ji pirsê li ser naverokên hundirî li cem zanyar, û ev koçberî ji encamê guhertin û veguhêztinê ye ji çaxekî ta çexekê, û ew li cem yê din meraqa ketinê li

**cîhana hunerê xwarin dide , li gel wê pêşveçûn dûrî hênikî di ramandinê de û ketina di lawaziyê de heta dawiyê, û dibe ku mirin ew tirsa mezintir be li cem mirov, ji ber wê felsefa Hîdger dizîvire bi dayîna ew mirina mezinbûnekî li ser mirov serdest e, berhinde çi reşbînî li paş wê rewşek e siyasî gendel heye, û her felsefeyekê bi danasîna tunebûnê an penaberiyê an metirsiyê ve peywendîdar e, nûnertiya çêjekê hatiyê têkbirin dike, bi rêya gendeliya bijardeyê fermandar yê ku rolekî girîng ji guhertina raman, huner û wêjeyê dilîze.**

**Zanîna engîzên kar bi ramaneke bi xwe ji paldariyên fişara daringî ya aborî ye, û ev teqandina bicihbûyî di hundirê mirov de ji ber serkotkirin û celewkirinê ye, û di hundirê wê hevgariyê de yê ku bi rewşa kesayetiya ya ku pepûkiya cîgirbûyî û reftarên bavanî dikşîne re diçe,em wê reşbîniyê mîna dîmenekî sextebûna wê hatinrêza di navbera takekes û civakê de aşkere dike, bin siha tirsa yê bi awayê xwe gelek qulan di meydanên jiyanê de hemî vedike, û ew herwiha derbirîneke li ser wê dûriya girs di navbera takekes û rastiya rewşa wî ya ji derd û xizanî têrbûyî, ligel ku ew di xwe de xweseriya xwe yî neyînê dijî heta di civakên yê ku têde dibe nişetcî, ev bêhtir pirsîna ku ji kûrahiyeke bi êş û penaberiyê cîtengbûyî xurtir dike, azadî çiye?!, çendîn ew zoreng li ser mirov zor bû ,ta asta ku ew matmayîbûn bê sekinandin, nîgar dibe di nîşan û çavan de ,li pêş holên xwînê ku ên bi derbasbûna dîrokê berdewam berfireh dibin, ev hemî ji bo piştgiriya tirsê û pîrozkirina wê , ji bo piştrastkirina mijolbûna hizra mirov di demên dirêj de bi serdestbûn û berzkirina hêza leşgerî û bidestxistina**

erdnîgariyê , ji bo berjewendiya rabûna hêmana serwer tenê, berhinde netebitîbûn li cem civakên mirovî leztir dibe , bi taybetî komînên gundan ji biveya gemarbûnê ,ji encamê alava cengê rodayî, ma çi azadî ye , desthilatdara serkotker ji bo rûbirûbûna dijminê xwe yê din dihilîne?!!, gelek caran pêre dikeve lihevhatinê ji bo parvekirina sewikê, ev yeka dihlêle ku gel ji mal û mafê xwe yê xuristî bi sûdwergirtinê bê par bimîne , li vir em têgeha malgirtinê bi hêz ve girêdayî dibînin, ev yeka rê dabû ji bijardeyên serdest ku tirs û bizdankirinê di şerên xwe yên xwînî de bikarbînin, van koman piştî gelek gavên cenga binkeftî baskşikestî û penaber derdikevin, di vir de em ti derfet di jiyankirinê de nabînin bin siha çavkariya desthilatdar û xwestina xwe ji girtinheviyê re, çawa wê tirs bi dîmenê xwe yê cîgirbûyî bê hilkirin?!, li gel wê xuya dike ku ew narvîna civak û gelên yên li nasname û taybetmendiyên xwe digerin bin siha derdorekî dagirtî cengên hundirî û lihevhatinên derveyî, ev hebûna heyî têra xwe fereh e, lê bi hinek gellên yên bi çandên xwe ve girêdayî teng dibe, ji bo ku newin pişaftin, ji ber vê jiyankirin tiştekî ne hêsan e , çêdibe bin siha serweriya tirsa pîroz, tirs naye jinavbirin ji bilî vîna mêjî û diyarkirina vac, ji ber vê şer dergehên xwe bi temamî dimîne ve vekirî ne, maf mîna ramanekî dimîne, li dor wê tenê bijardeyên ên bi wê girêdayî ve xwe dicivînin, li rex bijardeyên bi hevdû re dikevin rikberiyê , her alî ji xwe re maf dibîne , dike bihane di rû hevdû de, wisa herdû alî şerekî çarenûsî li hember hevdû pêktînin, ev şera nemanê ye, ji ber vê yekê hevrikî û girtinhevî di nav bijardeyan de ji encamê nemafiyekê ye ji alîkî û xwestekekê ji bo serwerî û serdestiyê ji alîkî din ve ,lê serkeftin dibe para xwediyên

**pêkanînên lojistîk û teknîkî li ser xwediyê hinira maf û baweriyê pê.**

**Em li vir dibînin ku dîmenên pepûk ew têgeha tunebûn û tirsa pîroz pêşde biribû, ta bû girêkekî herî talanker ji mêjî û dilan re herdû, ji ber ceng û bobelat yê ku jê tên nîşaneke ji binyadkirina çanda mirinê girêdayî bi tundirewiyê ta ji civakan re bibe nanekî, ew civakên yên bûn e piroje û êzing ji cengên nemanê re, gefê xwe li ser kevir û mirovan dibarînin,lê bawerî bi armanc û kar ji bo pêkanîna wê ta bibe rewşekê dima xwestekek qayim vîneke bîrawer aşkere dike û zêde tebitî di rû zehmetî û pîlanan dimîne , ewê yên dewletan pêktînin ji bo birina parçeyên ji welatê dagirtî tirs û bergirî, li ser wê hêrsa ya ku hêrsdaran nikarîbûn wêna berz bikin ta bikin destikek rizgarî ji tirsê re, ji ber dimîne rêbendekî di navbera mirov û rizgariyê, li gel hebûna rizgariyê wek ramanekî lê rêxistina tirsê xwe bi huner û wêjeyê re meşand, mora xwe bi xurtî li ser aliyên jiyana mirovê rojhilatnavînî danîbû, ramana rizgarîbûnê ji wateya wê ya naverokî nediyar bû, kesê bawermend bi wê nikarîbûn wêna mîna hêzekê ji bo rizgariyê bikarbînin, wisa em dibînin civak bin siha desthilata serkotker digiha kirêtirîn pileyên têkçûn û nizmbûnê, ew di rastiya xwe de mîna zengilekî ye banga bi teqandina rewşê dike , wêraniya wê dewletê an rêxistinê, ji ber vê yekê sitemkarî bi serketibû bi parçekirina tiştê jihevketî bêhtir û parçekirina tiştê parçebûyî li gor hevpeyman û deqên mîtingeriyê, berhinde tiştê naskirî bi Sûrî, Îraq, Lubnan û Urdin ji çêkirina Ferensa û Ingêltrayê bû, her parçeyekê ji Kurdistanê dabûn e çar dewletan û ew: Sûrî,Îraq,Îran û**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Tirkî, ta neqşe ji gellên ku ji binî ji derveyî bergê derneketibûn  û ne ji destwerdana ricîmên serkotker ên bi pîrozkirina derve hatibûn çêkirin, di nav destên wana de têne berdêlkirin, wisa têgehên sitemkarî û sertiyê û ragehîbûn bi reftarên xwe yên dîrokî kûr ketibûn e nehestbûna komî.**

**Ma ne pêdiviyiek me yê xurt heye bi şoreşên hizrî rizgariya civakan a ramanî bike bîngeh  ji armanc , binema û regezê xwe re, girîngtir naveroka rabûna wê ew şikênandina qedexebûna yê tê naskirin bi serdestbûna tundirewiya olî a pîroz, ew hilgirê hemî nexweşiyan e , cihê çi duriwtî û bedkariyê ye, ji bo vê armancê em di pêşbirkeke dirêj de ne bi demê re ji bo gîhiştina bi jiyana nûjen li cihê aramiyekê bi rêya rizgarbûnê ji dîlbûn û koletiya nirxên demborîna puç, ev yeka naye pêkanîn bi hêsanî an ji derveyî gotûbêja di nav gelan de , ne di nav siyasetmedarên koledar û bindest , ji ber ku hebûna wan di navendên fermandariyê bi erka wanî bi pasdariyê ji desthilatên dewletên serdest, ji bo qezencê ketine pêşbirkê ve girêdayî ye, ew berpirs in ji girsbûna tirs û serkotkirinê li welatan ,  ji ber ew şivanên ragehîbûn û rehiyê ne (Cîhana Erebî) , û derdê takekes ne tenê di çarçoveya kiryarê wan ji zordarî,serkotkirin û dûrkariyê ve lêbelê bi diziya civakê bi rêya nuhvekirina gendelî û bêkariyê, ev yeka bû encama pişûdaneke hundirî û valabûna hiniran bi lez (koçberiya hişmendiyan), ev yeka ji me re rewşa windabûnê diyar dike ,ew hîşt ku rê bê windakirin û hestbûna bi lawaziya hatinrêzê beranberî henas û komê, bazdan ji her tiştî dibe xwestekeke rastîn û zehmet, bersivdana sert li ser tirsê mîna berzbûneke ji**

qonaxa teqînê bi sedema qerpolî û fişareke mezin, gellan hîştin berve diyarbûna vîn û niyaza  xwe ji guhertina ricîmên xwe biçin, tevî ku bi zehmetî tê pêkanîn, lê belê rêya raperînê venagere li paş dema destpêkê , narvîna xwe ku bêhtir toj û diyartir bibe,berhinde tevgera cemawer bi pêdiviyên rêxistinkarê neqşeyan ji bo guhertinê girêdayî ye ,li gor pêwîstiyên bi hatin û hevsngiyên nû, herwiha bicîkirina li ser rewşa hêrsa cemawerî ew nîşaneke ji nemana serdema tirs û bêdengiya reş yê gelekan dehfdan ji bo li ser tirsê biserkevin, wisa qonaxa duyem a girîng ji bo civakê durist dibe , li gor wê raperîn ji bo guhertina desthilatê tê pêkanîn tevî guhertina nexweş ji hiş û xwestekên hilbez.

Û şopa zordariyê li ser civakê ji zaroktiyê çêdibe ,bi dan û standina zarokan bi cîhana mezinan re û reftarên wan li gel wê reftarên sert ên destwerdanê dikin bi pêşesazîkirina hizr cem zarokan, perwerdeya sert wan berve zordariyê dehf dide, wek bicîkirina armanc û mebestên sazkerê mirin û cengê ,berhinde civak mafdariya xwe bi hevjiyanê ji dest dide bi cîgirkirina têgeha xwedîtinê , hevkêşiya serwer û kole, herwiha serdestbûna efsanê hîşt ku dergehên zordariyê vekirî bimînin li pêş kesên ên dixwazin rengên nezaniyê û belavkirina têkçûnê li jiyanê zêde bikin, berhinde mêtina zarok çêdibe ji çi tiştê ji derve tê bi rêya wergirtinê, ji aliyê mezinan ve  tê sepandin, ewqasiya êşê berz dike ji cueryên perwerdeya çewt , bi derbasbûna me bi gavên zaroktiya zehmet bin siha ricîma civaka nêrîtiyê, divê em bizanibin bîngeha serkotkirinê û celewkirina nêrika afirandinê li cem zarok ji dema rojbûna wî û

**baweriyan destwerdanê dikin di sazîkirina deroniya takekes de ,heta astekê dihêle çarenûsa wî bê naskirin , di şahiyê an jarbûna wî de diyar bibe, ji ber wê em girtîbûn bêhtir dibînin ku bi hêsanî derbasî henasên civakê dibe , bi têgehên wê dileyze, ji ber vê setembarîbûn ne tenê hesteke , lê ew jiyankirin e , jiyaneke rewşên mîna dîlbûn û qutbûnê ji dema niha û siberojê ve hembêz dike, sedemên kargêrîkirina çevsênîkirinê ji aliyê ricîmên navendî a gelemperatî peyda dibe, ev sîsteman di astengekirina gîhiştina civakê de ji bîraweriyeke tê xwestin dîtibûn rêyekê ji belavkirina tirs û serkotkirinê û çandina sawê, dîtibûn ku ji berjewendiya xwe ne ku mirovan têxin bin kontirolkirina xwe û çandina sawbûnê di hundirê wan de ji çaxî zaroktiyê ve, ji ber vê pêwîst bû çêkirina wê girêdanê û binavkirina wê di nav reftarên civakê û reweştên wê de û di nav desthilatê de, ji ber ew du nîşan in temambûyî ne , ji çandeke dîrokî stona wana zordarî û nezanî ye, ji ber vê reftaran rolekî di perwerdekirina takekes de dilîzin, bi mêtina tirsê bi rêyên bi seyr ve, beşadar dibin bi pêşwazîkirina bêhtir lêdanan yê xuristiya civakê derdixîne holê.**

**Gustaf Lobun şiyarî dabû ji vê bidûketina cemawerî a ne hişmend li gor binavkirina wî, ku bangên guhertinê dibe ku bêne guhertin û tenê slogan bimînin , jê rêxistin û cudabûn kêm bin, ji ber di wê kêlîkê de civakan hewayên sertbûn û nîşanên wê bi dû xwe ve wê bikşînin, di pêvajoya tirsa bi rêk û pêk ve ên desthilatên gelemperatî wêna birêve dibin bi awayekî bê sînor û mîna şerekî stratîcîk berê nehatî rodan, bi encamê wê pêleke ji koçberiya sert**

**diqewime, herwisa çi çare li pêş cemaweran nîne ji bilî ku tirsê bişkînin û serî hildin li hember çi tiştê ku destdirêjî dighîne rûmeta takekesên wê, berhinde tewrîvanê sosiyalîst ya Elman Karil Kawtiskî 1 wisa dibîne : ( Êdî wek diyarbûna rojê diyar dibe ku zorengên siyasî û aborî di demê me yê niha de û bi plieyên herî zêde ji kiryarê cemaweran e.)**

**Û cemaweran bi hemî pîlanên serdestên xwe bandor dibin , herwiha bi pêşesazîkirina nerîna giştî jî, ev yeka nema nehêne ye, ew bi piştrastîbûn êzinga xuristî ye ji tiştê ku li ser wêna tê sepandin ,li gorî xuristiya rewşa wê û rihê jiyana wê ya jiyanbûyî, ev yeka erk datîne li ser bijardeyên wê yên ronakbîr ku hewildanê bikin ji bo rizgariya wêna ji windabûna wê bi bermayên hişmendiya gerewbirî ji her roparteke desthilatî armanca wê zêdebûna stûxwarî û kedîkirinê, berhinde em cemaweran dibînin ku ew hinek guhên vekirî ne ji bo pêşwazîkirina çi nerînê û bi wê awayekî bi rolên xwe yên cuda radibin, beranberî vê rastiyê desthilatên zorkar li rojava an li rojhilat hewil dabûn ku tewriyan saz bikin ji bo stûxawrkirina tofekê û serkeftina tofê herî zane bi sirûştiya cudahiyê di davbera civakan de, li gorî pileyên têgihiştina wê ji jiyan û alavan û bê guman ku derketin ji berfermankirinê zehmet bûye bin siha çavbirçîbûna ekranên raghandinê di pêşesazîkirina hewayê guncaw ji ceng û girtinheviyê re bin reng û navên cuda, ji ber vê nîşankirina vê yekê bûye erkekî zanyarî zanyarên ne gerewbirî xwezî dikin wêna aşkere bikin, li pêş fişarekî girs û şerekî dijwar ,konîvan û mêrên aborî wêna kontirol dikin, ji bo sersimakirina nirxên jiyana xuristî beranberî**

**bicîkirina zordariyê li cem cemaweran û sepandina şer li ser wan, veguhêztina rewşê bi awayekî pepûk û bi êş ve tenê ew dîmenekî rastîn e ji awanteyekê wê biqewime ta cemaweran jê encaman wergrin, taku têkiliya wê ya nû bi ricîma fermandar re diyar bibe, bi vî rengî şêweya sîstema lawaz aşkere dibe piştî awanteyeke ku zuha û şîn bişewitîne, berhinde em cemaweran dibînin ku roparta desthilatî dimêtin bi awayekî bi seyr , xwe aşkere dikin bi riwê şivanê wê desthilata hişmend bi berçavkirina ajanan li gorî binavkirina wê, em dibînin ku çendîn har xuya dike di derbarê şerê bijardeyê din, ev yeka di raperîna Qamişlo de di 2004 de diyar dibe, çandina desthilat çinî kiribû diyar kir bi gurkirina rewanê serî û xwebînî di henasên cemawerên xwe de bi awayekî bîrdozî giyanê kîn û tolhildanê li cem bijardeyên xwe bervajî kiribû ên ku bi roparta wê meşiyan bi rengekî bi lez, wisa em tundirewiyê mîna nanekê kifikî dibînin , ji bo civakên ên li gorî ragehê desthilata sitemkar jiyabûn bi mazoxî û sadiyeke dikeve cihê matmayîbûn û tires.**

**Berhinde cemaweran li gorî kiryarên fermandarê xwe diçin, bê guman şofîniyet û mezinayîya dîrokî hildigrin li hember gellên kêlek an ên bi wan re dijîn, û**

**--------------------**

**1- Karil Kawtiskî : bîrnas, rojnemevan û konîvan, û tewrîvanekî sosialîst Elman û Tişîkî ye, li bajarê Birag di 16.10 de sala 1854 de jidayik bûye û li Emistirdamê di 17.10.1938 de mir. Rêveber e di partiya demukratî ya sosialîst a Elman de bû, û yek ji navdartirîn tewrîvanên Mariksî li Ewrûpa yê û cîhanê piştî mirina Firîdrik Engliz.**

**zehmet e ku karibin guhertineke naverokî saz bikin, ji ber bi zorê hatin dehfdan ji bo bibin êzing û bikevin xefka**

**desthilata serkotker ,ê cemaweran bikartînin ji bo bibin dijminê hevdû, ji ber vê yekê em beravêtina zehmet dibînin cîgir e li pêş gera zanyaran ji bo bergiriya li hişên nifşê nûbûyî bikin , wana bi wateyên ramandina afrênerî û rexina sert têr kirin, ji ber ew hijmarê girs bi şerên ketibûn e di deronî û çêja bawermendên derdên desthilatiya sitemkar dorpêçbûn e ,ewê ragehîbûn û netewbûnê ji xwe re kiribûn cilekî pîroz, ji ber vê pirnetewa Erebî a bi tewriya sitemkarê dadmend ve bawer dibe ew roparta netewî efiyonkêş kiribû ,dema ji bilî Ereban mîna şaneyên ku dewletê lawaz dikin binav dikir, dibin astengiyekê li pêş xewinên dîrokî ên xweş ji yekbûn û berdewamiya serdestbûnê, herwiha em Tirkên netewperest û Firsan dibînin dema ragehîbûnê carne bikartînin û carne netewiyetê ji bo bi wana binkeftina siyasî ya hundirî binixumînin, ew razankirina desthilatdarî ji cemaweran re dîrokê li çaxa zivîrandina di cihê xwe de bi rêve biribû, cemawerê ê bi -tîma Fitiwwê - re çûn yarîgeha Qamişlo di dema raperîna Qamişlo de sala 2004, dest bi şer kirin û banga bi jiyana zorkarê berê Seddam Husên kirin, ew eynî wan in yên li hember koledarên xwe derketin bi sloganên pûç bang bi roxandina ricîma serkotkar kirin ên diho jêre koletiyê kirin ( Gel dixwaza ricîmê hilweşîne), wisa em ên ku sitemkariyê li ser cemaweran meşandibûn dibînin çawa mîna hev in ji ber armancên wan weke hevdû ne bi xapandina cemaweran û cîgirkirina nezanîkirina wan, ji ber wê ew ricîma hişê hemûyî biribû ,ên xwe gerewkirin e ji roparta desthilatên gendel ve , ewên bûn e rûnivîsekî çermok jê re, ji ber peywendiya xwe bi kenalên desthilatê bi baskê wê ya alîgir û dijber di eynî demê hebûn, ta tirs**

**hevserê xwe bi hêsanî bi wan re danî û ketibû di wijdan û hundirê cemawerên rojhilatnavînî de, ew dorpêçkirina desthilatên totelîter çêkiribûn , bi kokê xwe yê tiyoqratî ew yê ku rê dûz kiribû ji çêbûna hingemeyê mîna encamekê ji wê serkotkirin û celewkirina berdewam li hember hişmendî û hêzan hatibû pêkanîn , ew hêz û mêjiyan sînor danîbûn li hember binpêkirinên bobelat ên wijdan û jiyana cemaweran hejandibûn, ma gelo nehêneya şîrovekirina girêdana van cemaweran bi serdangeh , goran , serokên nîşan û kesayetên partîtî û olî çi ne?!, ew ji wê rebeniya a ku ji desthilatan û şaneyên wêna yên biçûk (Partî, komeleyên bi wê ve girêdayî,dezgehên ragihandinê) derdikeve, ji bo têrkirina giyana valabûn û tembeliya hişmendî di nav hînckarên wêna de ên naxwînin û tênagihin, bi çi ropartê re ku ji jor ve tê dimeşin, heta ricîma sazmanî dibe ku ji hewayên wan biyan be, berhinde şîrovekar û ravekar bi zêdebûna xwediyên derdan bêhtir dibin bi awayekî bi saw, kêşeya rastîn a ku lîstoka desthilatdar aşkere dike dema qirêjtirîn rolên xwe dilîze di xapandinê de , ev yeka bi serweriya xwe berz dibe, dema li ser textên felsefe, çaksazî û guhertinê di serdema me yê niha de rûdine, serdema şoreşên hevrrik, yê ku kêmaniyan hembêz dike û nexweşiyê nûjentir dike û çareseriyan çêdike bê zanîna bi aliya nîşankerê an bê sewadîkirina wê, ev yeka nîşanî me dide bi rolên çêkerê aloziyan bi guhertina civakan ta bibin firtik, berhinde em sînorê bandorkirina ropartên rewanbêjiyê dizanin li ser sewda û wijdanên xelkê ji ber ew bi dû huş û sewdayên xwe dikevin ji paş çi roparteke karger bê ku li paş wê roparta gelêrî binêrin, ev yeka bi xwe sînora penaberiya xwe ji pêşesazîkirina kiryarê**

**rikkhev aşkere dike , bi wateyeke din kiryar alîkariya me dike ji bo em tiştan ji hevdû cuda bikin , jimarvanîkirina kesên ên li bilindî rûniştî ne, li gel wê aşkerekirina bandora çîrokên gelêrî li ser deroniya zarokan ew rehnîkirineke li tirsê ji destpêka ketina wê di henasan de , ta mirovê wergirtî têkeve di tirsê û bandora wê li ser kesayeta mirov û serdestkirina qonaxên mezinbûn û çêbûna wê û bandora cîgehê li ser û pişt re peywendiya wî bi a din re, sînora kanîbûna wî ku hestên xwe bi bizdan û bêzariyê derbas bike, sêwir û rewrewkan hîştibûn bibin mîna dermanên çurûk, têne birin ji bo piştrastkirina goşeyên tires, ji ber vê em girêdanê dibînin ku tê xwarinkirin bi rêya kiryarê serwerîbûnê li ser komek mirov bi rêya hizrên wan amade bibin ji pêşwazîkirina tirsê ji zaroktiyê ve, ev pêvajo dibe rêyek e bi sûd ji bo qutîkirina civakê û bikaranîna wê mîna destikekê ji nûkirina desthilata serkotker û binyadkirina wê bi rêya perwerde û xwendina çîrokan ên ku dayîk û dapîran ji zarokan re digotibûn, ta sêwirên wana tevbidin, pişt re bi demê re alava ragihandinê (Tilfizyon) derketibû ji bo bi vê erkê rabe, berhinde civakan bêhtir ji rastiya xwe tên e dûrxistin, herwiha komên çewtî û parvekirinan ên bûn e kelem li pêş têkelbûna xwebexşî di nav gelan de, li gel wê ricîmên wê dibin e kelem li pêş wê têkelbûnê, li ser qayilbûn û başdarîbûnê tê duristkirin , ji ber gendeliya ricîmê tê wateyê wêranbûna civakê, berhinde lîstin li ser davika nijadan ew rê dûz kiribû ji çêbûna cengên navxweyî re ,ew bermayê neqşeya welatê çatbûyî jihevxistibûn, tirs di nav civakan de bê hebûna yaseyekê ji bo jiyana wan biparêze tebitî.**

## 3- Totelîter derxistkerên aloziyan in

**Zorengên civakî ji karê desthilatên totelîter in, li gel wê yaseyên xwe kirin şevpestên nayên jinavbirin, lekeyên xwe li ser berketiyên takekesan û guhertinên wana dihêlin, ta li ser alîgirtinên wana jî bi demê re, ji ber vê emê nikaribin rastiya parçebûnê di nav cemaweran de nasbikin ji ber girêdana wan bi ricîmekî desthilatdar ve bi xurtî xebitî ji bo belavkirina kanîbûnan û tarûmarkirina kedên zanyarî, hinek mînak li ser vê yekê kiryarê dewleta netewî wêranî û talankirinê (Talankirina Kiwêtê ji aliyê Sedam Husên ve û berî wê êrîşa li ser Polendayê ji aliyê Hitler ve , herwiha talankirina Lubnanê ji aliyê Hafiz Elesed ve.)**

**Ma gelo rizgariyek rastîn û makî heye ji jehr û nexweşiyên ku desthilata serkotker ji bijardeyan re vegûhêztibû, ewê Gustaf Lobun wê mîna tewanbar binav kiribû.**

**Ew desthilata berî xwe dide têkbirina xewin û hêviyên cemawerên xwe bi azadî û guhertina demukratîk ve dema dest bi ajotina milletan dijî hevdû dike, rewşa gellên rojhilata navîn û cîhana Erebî pêdiviya xwe bi zêde ramandin û lêgerîn heye li dor diyardeya ajotina cemawerî ji ber vê yekê encamên bi ziyan dighîne netewan, ciyawaziya roparta olî ya ragehî ji yê netewî tevî ku pir caran dibin e yek di hinek armancan yên girêdayî bi xapandina cemaweran û qefaztina li ser xwestekên wêna yên naverokî ,yên bi demukrasî, mafên mirovan û serweriya zagona sivîl berz dibin, lîstokên desthilatê naye rawestandin li ser hesabê bêzariya cemawer û bê pîlana wê**

**û tunebûna hebûna vîneke cemawerî zîrek wê dihêle li hember hevdû de bin ne tenê ji berjewendiya desthilatê lê ji berjewendiya ecnîdeyên dewletên herêmî ve ,ewên ji veguhêztina çi rabûneke cemawerî bi aliyê xwe ve ditirsin.**

**Ew bi hevanîna misoger û neçarbûyî di navbera ricîmên dewletên rojhilata navîn û bi taybetî ve ên ku Kurdistanê parve dikin, bi heman nakokiya berjewendiyên xwe ve dixebitin ji bo hişmendiya bavanî ya totelîter bihêlin û destketiyên xwe yên tofî biparêzin, eger çi bê xwestin û destên xwe dirêjî dewletên mezin xwedan girîngiya stratîcîk dikin ji bo xebata hevbeş bi xapandin û kedîkirina cemaweran li gor pêdivî û berjewendiyên hevbeş, hebûna mêjiya cemawerî di gêjbûnekê de û dûrî kirdeyê şaristanî ya zanyarî dimîne , bê kanîbûna wê ku dev ji wê hişmendiya dûrkar û ramandina olî bi wateya wê ya siyasî ya kevinşopî berde, ji ber vê yekê mayîna wê hişmendiyê dibe asteng jêre taku derbasî qonaxa aştîbûna demukrasî bibe bi wateyê xwe yê naverokî ne pergalî, awanteya heyî di nihad û neberketîbûna wê de tirs hîştibû bibe mîna metirsiyekî giran û berçav e li pêş hizran , berhinde sirûşbûnên cemaweran û kêmbûna bîraweriya wan bi têgehên hevjiyana aştiyan e hîştibûn biçin bi aliyê xwestekê wê desthilata serkotker û tiştê ku ew desthilat derdixîne ji sawêr û xewinên lawaz, bi rêya wê cemaweran dibin agirdûmanên amasbûyî ji şerên hundir û derve re di heman demê de, berhinde mêrên ol berserketin di anîberkirina rageh û obeyan, mîna serkeftina desthilatdaran , ên ku serweriya tewriya şoreşgerî dikin dema cemaweran dihêlin bikevin sengerên beranberî hevdû,**

**wana ji zorengên bê dawî dihêlin , çendîn mildana kerî dijwar e ji bo pêkanîna armanc û mebestên serokan bi bandorê gotarbêjiyên wanî cingînî , ew bi dîtina cemawerên ku kiryar û desthilatiyên wana dipejirînin biserketibûn (Serkeftina Erdoxan di hilbijartina serokkomariyê 2023 de) ta ew cemawerên ên raman û bîrdoziyên wan bi hêsanî û xweşî mêtibûn ji wana re bibûn mertalekî, eger ricîmekî dîktetor an zorkarekî hat roxandin lê naye wê wateyê ku ew ramana a ku cemaweran mîna avê vexwaribûn tê roxandin , ji ber jêre dibin mîna bawerî û rêbazekî, boçûnekî ji nifşên serokkomarî ên wê ramanê radikin, berhinde bangên roxandina ricîmên beloq mîna guhertina cilên hundirî ne, ji ber ku roxandina ramana totelîter û jinavbirina nezaniya xelkê û jêbirina giyanê kerîbûnê ew yê divê bê hilweşandin bi vejînbûna şoreşekî hizrî giştî çi guman an lîstok hilnagre.**

**- Nezanîkirin: ricîmekî desthilatî ye totelîter e , ew ne eynî wê ew nezanî ye bi wateyê wê ya kevinşopî lê wateya xwe yê naverokî ew dûrketin e ji çi jêderekî zanyarî li cem cemawer pakiya hizr û derbasbûna ramanên azad li hişmendiyê sax dike.**

**- Nezanîkirin ew ricîma radestbûnê ye ji raman û felsefeya serokê xêvzan û nîşan e, di nav keriyekî mirovî dilive û cemawerê yên ku li pey kesekî ve mîna pez dimeşin, şagirtên wî rêberî sofî ne,bê hiş in ji çi ramanî derveyî ramanê wî dûr in, dîtinekî ji derveyê dîtina wî naye peydakirin,ew ricîmeke ji reftarên reweştên olî hatî ye, bi bişanhildana xwediyên pariyê, nikare ti astî ji demukrasî û**

**vebûna li ser a din pêkbîne, ew mildan û pejirandin e ji çi tiştê ku desthilata bîrdozî derxistibû ye, yê ku ew xerman e yê li dor kesayeta rêberê feylesof berz kiribû, yê peyker û wêneyên wî li eywan û meydanên mezin hatibûn e danîn, berhinde ricîma totelîter bi vî rengî bibû tirsa mezintirîn, windabûna takekesan di nav vekokên binçavkirinê an kuştinê an bazdanê de û ew dibû gefekî li pêş pêvajoka cemaweran di jiyana xwe de.**

**- Niyazên pesinbûyî pêdiviyê xwe timî bi hişên ronakbîr hene bi zanînê bawer in, li ser ricîma tirsa pîroz biserdikevin, dibe ku şoreşa herî bi pêtîbûn û rastîbûn ew e ê ku ji baweriya mirovê bi hiş ve dibişkive û kanîbûna wî bi pêkanîna erkên zehmet bi hemahengiyeke komî bîngeha xwe dan û standin e, pêdiviya me bi niyazên demkî nîn in yên ku ji hestên belavbûyî nehatiye xwendin derketî, berhinde ji civakên tires re ew dîtinên zanyarî kêm in, ewên bi kar û barên pêşerojê ve mijol in bêhtir ji tiştên girêdayî bi demborîn û nediyarbûnê, bi hiş û giyan ve pêş dikevin dewsa hildana nîşanên qedexekirinê, mîna baweriyekê bi rizgariya a ku di zanîn û evînê de heyî , bi bedewbûn û bilindbûna hebûna endezyarî ve diyar dibe.**

# Zanyar li Kurdistana bakûr

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

# 1-Pêşgeh

**Em ceng dewsa vegerandina nasnameyê ji destekî êrîşker dibînin, hewil dide wê nasnameyê têkbibe.**

**Biryardayîna rûbirûbûnê mîna çareyekî misoger e , vê yekê rewşa hovîtîbûna neteweyatiyê ji aliyê bijardeyê fermandar ve sepandibû, mîna hewildanekê ji jinavbirina taybetmendiyên netewan û êrîşkirina li ser bermayê wanî zanyarî û girêdana wan bi erdê xwe re, naxwe parastina hebûnê ew mîna bersivekê ye ji banga xurista hevseng di me de, bergiriya li hember rewşa gurbûna desthilatî li ser zanyaran sepa dike erka ezberkirina destketiyên xwe ji neman û windabûnê ve, erka wan gellên saxlem ku bermayê mirovê hişmend bi rêya çanda rûbirûbûnê biparêzin, bergiriyê li hember biveya helandinê di nav ricîmên totalîter de ,ên berdewam dixebitin ji bo çêkirina cengên navxweyî û afirandina awante û aloziyan di nav gelan de, dehfandina wan ji pevçûnên vala bi encamê wê zêdetir rewşên jihevxistina civakî û malbatî rûdabûn, berhinde girêdana bi kokan ji bo di malzaroka çanda serdest de newin pişaftin ew bi xwe di rastiya xwe de nûnertiya pergalekî ji pergalên ezberkirina pêkanînên zanyarî dike, di sirûşta xwe de wateya şoreşekî zanyarî dide, rabûnekê hewil dide ku bi naverokên zikmakî pêş bikeve ji bo mirov û tiştê girêdayî bi hezkirina erd û ziman ji aliyê**

**axaftina û şehnazaiya bi wê erdnîgariya ên gelek komên mirovî li ser heman cudabûn û pir bijardeyên wê dicivîne, bê ku hewildanek hebe bên e tunekirin, bi rêya dehfandina wan ji pevçûnên bê sûd ve, tenê ew tişt bîngeha rewanî û naverokî lawaz dike, peywendiyên hatinrêzê di nav wan de têkdibe, ji ber ku dema bizdan û fişar di nav gel de belav dibe em dibînên ku çareyên jiyanê bêhtir zehmet dibin , tirs hewayên henasê digre , herwiha kesayeta tirsnak dikev xefka desthilatdar yê zêde sert û sermezin dibe bi zêdebûna kesên bizdayî an yên bidûketî ji bo pêşkêşkirina alîgirtiya xwe yê ji yekalî ve, jibîr dikin girsbûna tewanan yê ku ew desthilat pêkanî bû, herwiha ew tîjandina bêdeng berdewam dibe ta bibe navnîşana wê qonaxê, civakên tirsê hêdî hêdî ji qonaxa lawazî û tirsê ta qonaxa şikênandina bizdan û hêzê li hember terora dewletî tên e veguhêztin.**

## 2- civak û terora dewletî

**civakên tirsok nikarin xwe ji nezanîbûnê qut bikin û ev yeka wan berve xizanî û paşketinê dibe, sertiya terora dewletî li ser cemaweran xelkê dûrî dema niha dixe û wan dihêle ku di tenahiyê de bin û ji jiyan û cîhana sivîl û guhertinên girs yên rewşê bi lez diguhêrin dûrbikevin, di rewşên zorengê de ti pêngaveke xuristî di jiyana civakan de pêknaye,berhinde desthilata netewî ya nijadperest bi lepê xwe yê hisinî movikên jiyanê digre, li gel wê em cîgehên herî sert dibînin mîna qurbanekî bi rêya bazirganî bi ol an windakirina hiş bi rêya wî, ew cîgeh rastî paşguhkirina rajeyî û hînkerî tên û ji lepê dezgehên salixgerî derd dikşînin, yên takekesên wêna kirin sîxor dijî hevdû,**

**berhinde hemû tişt têkdiçe bin siha gurkirina girtinheviyê, felsefa najî bin siha komên ên rastî gefxwarinê tên , hêz , ewlehî û jiyana xwe têkdiçe bi rêya binçavkirina desthilatê ji wê re ji ber ku ew gel dijî nasnameya xwe ne û mîna metirsiyekê ji xwe re dibîne.**

**Armanckirina guhertin û guherîna demukratîk bi rêya sepandina hêzeke mîtafîzîqî bi têgehên olî ve têkel dibe ,civak bi wê ve tê dorpêçkirin ,helbet raman û felsefe ew ji takekesê wêrek ve nêziktir e , bi heman rewşê kesê bi saw û bizdanê ve dûrpêçkirî wê nikaribe felsefe û vaca guhertinê têbighe ,tenê dema tirs tê puçkirin û qulên wê tên e girtin, berhinde ol li cem tirsok pêwîstiyeke, desthilatdar dizane ku ol pêdivî ye ji bo kuntirolkirina cemaweran ta bibin destikekê ji bo pêkanîna armancên wanî dûr, bi vê vacê , bi rêya wê civaka Kurdistanî li Kurdistana bakûr hatibû hişbirkirin, naveroka ramana faşî binyad bû , ew ramanê yê hemî netewên ne Tirk dibîne Tirk bi rêya sepandina ziman li ser wêna û pêdîvîkirina wê bi vê yekê bi cudahiya awayên neçarkirinê.**

**Tundrewiya netewî bend û baskên xwe yên giran li ser milê pêkhateyên ne tirk danîbû, hîştibû berve pişaftina giştî an qirkirinê bi heman rengên xwe biçe an wê hîştibû berve çiyê ve here, bi berxwedanî û bergiriyê di rû vê harbûna yê qet nehatibû naskirin, ev dikeve di warê avakirina kokelê nefretê di nav civakan de di demeke dirêj de, ev kokel ricîmên sitemkar yên faşizm dehf dide xirênê û hingemeya mezin û dihêle bibe derxistkerên giştî ji şerên navxweyî û aloziyên aborî re , berhinde desthilat rolekê mezin dilîze bi**

têkbirina nirxên rewiştî di nav gellên xwe de, ji tirsê hestbûna bi windabûn û koçberiyê derdikeve û ketina di nav sûdgirtîbûn, kedxwarî û malgirtinê de bêhtir û bêhtir, tenê emê sawa pepûkiyê dibînin , ku belav dibe li ser kesên ên dibin nêçîrên hêsan bi destê çeteyê gendelî, firoşgeh û hilweşandinê ve , ev yeka dibe nîşanên wêranbûna ricîma dewletî a netewî , ku hevdû dixun û bi demê ve tên e roxandin.

Wisa em dibînin ku başî di siyasteta nijadperest de nîne ji ber ku bi karên dirindî radibe di dermafê zaroktî û mirovan de bi giştî ve, berhinde em ceng dibînin ku pêktê bin bihaneyên baş ,peywendiya xwe bi kiryarê pêkhatî li ser erdê nîne , li gel wê hezkirina erd û baweriya bi xwedê bikartînin ji bo pê niyazên xwe yên rastîn binixumînin, bi binaxkirina xweda û welêt bi hevdû re û rakirina wan bi darbesta çavkariyê li gorên wanî dawî.

Berhinde em timî zordarî dibînin derbirîneke li ser rewanê ezeziya komî , ew ji navdariya bijardeyên desthilatê ne ji rêvebirina kerî berve pîlanên xwe yên herî zîrek, nêzik em cemaweran dibînin bi alavên desthilatê ve dilivin , bi hûrbînî şîretên wê yên dagirtî baweriya kor pêktînin ,radestbûna ji desthilata heyî re ku ew mîna xwestekeke narvînî û xwedayî ye çênabe mirov li hember wê raweste, beranberî tofekî tolhildar xwe dide bi aliyê dejberê wê desthilatê , ew jî bi awayê xwe kerî bi rêve dibe, ev yeka ne rasthatineke , lê tevderbasbûneke naverokiye ji sirûştiya herdû ropartan ên ji bîngehekê dertên û ew pêşbirka li ser malgirtin û serdestbûnê bi rêya roparta

**xwedayî a nêrîtî , ku di paşûla xwe de gurzekî ji pîlan û lîstokan rahijtiye ji bo dehfandina cemaweran li hingemeya xwe yê naverokî , berhinde şerê takekesîbûnê û nirxên wê yên rewiştî ew ji karên wan desthilatên netewî û olî ne ji ber ew li ser dîtina pergalên bedkar dijîn ,ji bo ricîmên fermandariya xwe û şêweyên rêveberîkirina wê ji saziyan re , serkotkirina wê ji çi kesê ku ricîmekî demukartîk û azad armanc dike, berhinde em demukrasî û azadiyê dibînin ku herdû du reftarên negîhayî ne bin siha dorpêçkirina vê desthilatiyê ji cemaweran re û qedexekirina xwe ji naskirina berketiyên takekesên xwe , ên hewil didin guhertina demukratîk pêkbînin, ev yeka wê azadiya jin û mêr ji bo sazîkirina jiyaneke nû pêkbîne, bê serkotkirina nêrîtî an serdestbûna reftar û reweştan ên tim hewil didin bibin rêgir li pêş hebûna nifşekî nû bi azadiya hilbijartin û xebatê bawer e, çûna çiyê ew bi xwe ji bo pêkanîna vê girêdana rastîn e û beşdariya bi çêkirina jiyanek e azad bi rêya cenga mêr ligel jinê ji bo pêkanîna civakeke azad ku bikare bibe bîngehekî babetî ji destpêkirina jiyanek e hevpar ji bo sazkirina welatekî armancbûyî, di vir de derbirînek e li ser vîneke naye jinavbirin ji mirovekî bindest bin siha koletiyê bi dirêjî neqşeya Kurdistanê di her çar parçeyên wê bergiriyê dike.**

**Em dibînin cemawerîbûna kizîr ji xwe re bi rêya takekesên wê yên zanyar dikare cihderekî bibîne ji aloziyên partîtiyê ên bibûn derdekî derketî ji hilweşîna desthilatî re ,a li jor cîgir e , li ser cureyê ramanê û pergalê wê xwe vegirtî ye, derketin ji gendeliya partîtî û siyasî bi rêya (cangoriya Kurdistanî) derbirîneke ji hebûna komkarekî cemawerî ,**

**dikare pergalên desthilatî bimrîne li pêş pêla cemawerî a ji bo demukrasî û jiyana baştirîn dixebite.**

**Zelaliya hizrê şervan û bîrêkirina wî ji dayîna çi tiştê buha ji bo guhertina rewşa koletiyê û koletbûnê mîna derbirînekî ye ji giyanê pêngava berve pêş ji bo jiyaneke bîngeha xwe yeksanî û azadiye, û li pêş sertiya fermandariya desthilatî mirov nikare tekoşîna siyasî bê a leşgerî bidomîne.**

**Em dibînin hêz pir caran xêzên çareseriyê û çarenosên xelkê diguhêrîne û carne li ser ricîma faşî a ku li birca xwe yê dûr rûniştî sepa dike ku rêya rêzê bigre ji hêza dij re, rastiya vê girtinheviyê cîgir e mîna nîşanekê ye ji wê girtinheviya kevin û girîng di navbera hêzên parizgehê û hêzên pêşveçûnê de, gelek tê dayîn ji bo çeşpandina hindikekî di gelek caran de, û li pêş wê ezeziya a kokdayî hundirê cemawerên dabeşbûyî bi awayekî giyanî û di warê zanînê de wêranbûyî em xêzên çareseriyê û xebatê netebitî dibînin, li gorî rewş û encamên rûdanê, ji ber vê binavkirina kêşeya heyî di rastiya hizra cemawerî de têkçûyî ye bi encamê derzîkirina wê bi derziyên pîrozbûna olî a girêdayî bi rastiya ola siyasî ve a ku bi dirêjî çaxan derketin û fermandariya fermandarê tam bilind kiribû, ev yeka gunokirineke zanyarî durist kiribû ji civakên kelepçekirî re , ên gendelî û koçberîbûn ji her alî ve wê dorpêç kiribû, lê cemawerê ên bin siha alavên zorkariyê dijîn fêr bibûn ku vê yekê di hişê xwe yê kur de vexwin, bi hêsanî nikarin bi cureyê alavên ramanî ên nû bawer bibin ,nexasim ku bin siha nakokiya diyar di navbera**

**alavên şêwazê, kîjanî jê ji guhertinê ve nêziktir e û kîjanê ji demborînê re vedigere.**

**Ew demborîna di rastiya xwe de li ser bîngeha qutkirina ji demê niha ve cîgir e, û razana li ser palgehên dîrokê naskirî ye .**

**Li gor vê yekê em dikarin berbikevin ku cureya jiyana civakî pêdiviyê xwe bi demê ve heye ta bê veguhêztin û dibe ku li gor alavên wê tam ji fişara ricîma bavanî rizgar nebe, bi awayekî ji awayan wê bê girêdan, di vir de em dikarin berbikevin ku vîna zanyarî a di giyanê cemawerê xort de ew dikare civakan ji serdemên bavaniya fermandar ve rizgar bike û ji cure û alavên kirdeyê xelas bike, ji ber ziyanên xwe li ser xêza guhertina demukratîk di demeke ne diyar de dihêle û bi rêya şîrovekirina me ji rastiya rahijtina çekê ji bo bergiriyê li erd û destkeftiyan me dît ku rastiya wê derbirîneke ji giyanê zanyaran yên bi kokan ve girêdayî ne li hember metirsiya jinavbirinê an qirkirinê bi herdû şaxên wê yên gewdehî û rewşenbîrî ve, çendîn netew li berxwedabûn ji bo heyîn û şaristaniya xwe û ne di hizrên wana de bin serwerî û serdestiyê li ser malên ji bilî xwe û çendîn ceng hebûn armanca wêna jinavbirina şopên netewên şareze , berhinde zoreng li ser erdnîgariyê di sirûştê xwe de zorengekî desthilatî aboriye, mafiyayên ên li ser pere û çek serdest in wana birêve dibirin beranberî vê yekê cemaweran bin siha gefxwarinê tên e guhertin, li gor wê rewşê li çareyên xuristî digerin ji bo vejîndana mirovê nû yê bi kokên xwe ve bawermend û ezberkirina avakirinê çareya komên aştîxwaz ji girêdana xwe ve bi jiyana hevbeş**

**ve û bi rengê xwe beşdar dibin bi bandorkirinê bi awayekî rasterast di naveroka hişmendiya rojhilatnavînî de, çare ne tenê hindek şîret û gotin in li ser tabloyên rêklaman û bernameyên partiyan ên tên e danîn, lê ew derbirînek in ji vîna jiyanê li cem gellên ku hewil didin di tebat û bergiriyê xwe de biserbikevin, li hember ricîmên ên bibûn reşxewinekê di jiyana wan de û di ramana takekesên wêna yên nû de.**

**Û dibe ku girêdana bi kokan serkeftin be ji mirovê zanyar re û nirxên wî yê heyî li ser bîngeha avakirin û weşandina bedewbûnê di cih de bi rêya dîtina peywendiyên sirûştî di navbera xwe û henasê de yê hewil dide rizgar bibe bi rêya bikaranîna raberî û berketiyên xwe bê bend û celewkirin.**

**Û dibe ku em li gor vê yekê  cêwîbûna peywendiyê di navbera erd û mirov bi rêya zorengê ji bo hebûnê diyar bikin , ji hewildanên desthilatdarên nû ji bo saxkirina nêrîtiya pîroz dema bi olî û netewî re têkel dibe , ev yeka di çaxa buhara Erebî de hatibû xuyakirin , bi taybetî di rewşa Sûrî de, ji ber vê em derbirîn li ser cureya vê zorengê dibînin ku ew di rastiya xwe de serkeftinekî mezin e ji nirxên şaristaniyê re li ser nirxên dirindîtî û koçeriyê , berhinde mirov mezin dibe bin siha vê zorenga zindî û bêzarkirî di sirûştiya xwe de ,ew gelek pirs bi xwe re tîne ji cureyê du jiyanan yek cîgir e li ser rikberiya mirov di hêz de, jiyan û aramiya xwe de û a din dij e li ser bergiriyê li hember wan hêzên ên ku kedkarî û mirandina giyana serkeftinê li cem wî de durist dikin , di vir de em dikarin bihane bidin  vê zorengê ji bo rizgarkirina maf ji baskê**

**deqa pîroz ê ku desthilat bi naverokên wêna dilîze ji bo kawşkirina kesên bê agahî ji nandoziyê re taku bên e bikaranîn mîna agirdeyên vala , ji ber vê yekê xebata azadîxwazan bin siha erdê ewa pêgirtina bi rastiya nirxên ên bi bergiriyê ve girêdayî ne û dayîna çi buhayê ji bo diyarkirina hewildana zanyarî bi berzkirina afirandinê mîna rastiyekê ji xwesteka jîndarê azad re ji xebat û avakirina welêt, û xweda li gor rastiya vê pêgirtinê di evînê de cîgir e û ne di deqên xwînê yê mirov dihêvoje li nefret û pevçûna bi kesên cuda re, lê ew hebûn e bi bedewî afsûn û reseniya xwe ve , ewa zanîn e bi rêveberina civakan ji rêyên geşepêdan, rengirtin û xebata li gorî mercên rabûn û avakirinê .**

**Û bi vegerandina me ji axaftinê ve li ser peywendiya başî bi siyasetê re ,em dibînin ku ew nikare koman biparêze ên ku derdê birçîbûn , cengên navxweyî û aloziyên herêmî dikşînin, berhinde hêzên aborî cengan birêve dibin, hewildidin têgeha parastina xweser red bikin ê ku bijardeya binketî hewildana vê yekê dike , ji bo berjewendiya serkeftina têgeha qezenc û sûdwergirtinê misoger bike .**

**Ligel wê demukratî dibe wek sloganên gotinî , binpêkirinan li vir û wir dinixumîne, li gel wê ceng di naveroka xwe de liyangiriyeke ji aliyê serkeftî re, li pey xwe şopa dijwar dihêle ji neman, koletî û wêraniyê ve, ji ber vê pêşesazîkirina êş û mirinê ew vergirtin in , desthilatên gelemperatî ji cemawer û partiyên xwe re veguhêztibûn, bibûn cureyekî ji bê rûmetkirina giyanî û ramanî re , ji bo**

**pêşkêşkirina zêdetir ji qurban û gorînan re ji berjewendiya hebûna sitemkariyê ê bû kovanekî penceşêrî mezin , em dikarin li ser bêjin ku ew berberê kevin e ji çi derdekî civakî an rewşenbîrî an aborî re cîhan vê yekê piştrast dike, bê guman ku gotina cîhana sivîlbûyî an azad gumanî li ser heye , ji ber gelek car pabend dibe bi hîştina ricîmên zorkar ta berjewendiyên wê bên e parastin, ta veşartina tewana kujer û kuştî bibe jêra mîna karekî bêçaretî hevyaz.**

**Bêzarbûna ricîma dewletî ,ji bo van ricîman biguhêrîne, pêdiviya xwe bi legerînê ji berjewendiyên wê yên daringî heye, di navçeyê de bi palpiştina xwe li ser tiştê ku ew ricîm encam dide ji kort û tîjandina mezin di navbera gellên vê navçeyê de di demeke dûr de.**

**Van kortan di nav xwe de nakokiyên olî  yên xwe nû dikin xwedî dikin û pevçûnên desthilatî zikmakên xwe ji demborîna dûr  werdigre têne nûjenkirin ji bo mêjî bi rêya wê bêne bergekirin.**

**Naxwe vejînkirina demborînê bi dîmenên wê yên dirindî hêzên mezin wana çêkiribûn  bi palpiştbûn li ser paşkîtiya gellên rojhilata navîn û nehestbûna wî ya komî, ji ber dîmenên kuştin , sotandinê  , lîstina bi kelaxan , birrîna serî û destan, hatibûn nûkirin ji jêderên dîroka kevin a li ser pevçûna desthilatî hatibû cîgirkirin , ew diyarbûneke zelal e ji hişmendiya desthilata nûjen bi dehfandina gellan li hêlûnên bizdan, tirs û reşepêşbûna hundirî,  ji metirsîdartir tiştê ku tê belavkirin  ji ezmûnên dîroka tije zorengên sert hatiye birin, ên xwestin cemawerên kirtanbûyî vegerînin**

**zikê demborîna dirindî li ser heman kirêtbûn û sertiya xwe,ji ber vê hebûna ricîmên yên ji navendiya netewî û comî dixwin ew mîna rikberiyekê ne di riwê cîhanê teva de, eger newin tekoşînkirin, tiştê bi seyr ku hinek dewlet li dor wê dicivin bin bangeşpêça tekoşîndariya teror û tundirwiyê , ew dewlet bi xwe jêrder û biperebûyê herdûyan e, li pêş vê yekê pênûs nikare ti guhertineke berçav pêkbîne û çavên desthilatî ên xwedan hatin û serwerî tenê berve çawaniya kolegirtina gellan diçin û xwestinên wê taku azadî û vebûnê sînordar bikin.**

**Wêrankirina jiyanê û dûbare dabeşkirina komên bazdayî û bicîkirina wan bi rêya guhertina neqşeyan, vê yekê bi giştî bandora xwe li ser ricîma nirxên rewiştî dike,wê berve wêranî û windabûnê dibe, bi encamê reşepêşkirina çêbûyî di cengên navxweyî de û zorenga li gel ricîmên sitemkar, em girsbûna lekeyên neyînî li ser civakê bi hemî bijardeyên wê dibînin, dema em bûyerên bumbebaranê li ser gundên nêzî çiyê û çekdaran,qirkirina komek ji xelkê mîna diyarbûnekê ji berzbûna bûyerê dibînin .**

**Dirindîtiya desthilatê û terora dewleta tirk mîna felaketeke rastîn e e ji çi terorekê re ku em li ser biaxivin di derbarê komekê an rêxistineke bi xwe,ji ber ti dewlet nikarin wêna mîna tewanekî terorî binav bikin mînak ( Yekîtiya Ewrûpa) dema di navbera wê û Tirkiyê de têkiliyên aborî qezencî hebin, ji Tirkiyê re rê vedike ku her tiştî bike , mînaka herî diyar hewildana wê ji qirkirina gelê Kurdistanê bi derbasbûna dîrokê herwiha qirkirina Ermen,Kildan û Aşûriyan di dema desthilatdariya Osmanî de, em vê dîroka**

**xwînî binyadkirî û dirêjbûyî ta dema niha dibînin, vê yekê bêdengiya dewletên xwe dibînin demukrat û li ser mafê mirovan xwedî derketî ji Tûrkiya re vê yekê rewa dikin ku binpêkirinan berdewam bike .**

**Bi vî rengî em dikarin duriwtiya navdewletî têbighin, herwiha şopandina êşa gellên ku hewil didin timî êş li ser milê xwe rabkin bi rêya bergirî û berxwedaniyê.**

**Armancên sitemkariya siyasî vejînkirina tirs û parçebûna civakî di navbera cemaweran yê ku li ser roparta desthilatê dijî , bişanhildanên netewî belav dike û pêdiviya miqatebûnê ji pêkhatiyên derve ên wêna pesindan dikin mîna biveyekî li ser welêt , ev yeka roparta netewî a Erebî pesindankiribû dema pêkhatiyên ne Erebî binavkiribû mîna ajan û ên hewildidin keysa xwe bînin ji xewinên yekbûnê ve, herwiha bi peywendiyê ligel dijminên welêt ji bo parçekirinê xwe amade dikin, herwiha roparta Tirkî a nijadperest ê hemî gellên ku li Turkiya dijîn mîna tek gelî binav dikin, ji bilî dîtina gellên ne Tirk mîna gellên binî , ew xwe kirin e Tirk û rehê xwe ne pak in bervajî kesên ku bi zikmakê xwe pak Tirk in , herwiha roparta Farisî yê hemî gellên ne faris , mîna gellekî Farisî dibîne, li pêş wê bermaya bîrdozî a ku bîngeha xwe nefretbûn û parçebûna giyaniye di nav gellan de, em ceng û nakokiyan dibînin berdewam in û herdemî ne, li pêş gurbûna wê zanistên mirovî hewil didin ku bi erkê çaksazê şermok rabin , bê guman ku roparta olî yê ragehî karîbû bi awayê xwe ve awantebûn û wêraniyeke girs durist bike, li hember vê pevçûna bizyayî em ti rol ji zimanê ronakbîrî re nabînin bi**

kanîbûna wê an bandora wê li pêş belavbûna penceşêra Islama siyasî a netewî ên herdû bi rêya desthilatên ku li berjewendiyên xwe digerin li ser qehfên hênikan  ceng û nakokiyan gurtir dikin .

Koçberî zêde dibe û hevgirtina civakî lawaz dibe dema tirs mîna derziyekê dibe bin sihên wê qêrîn tên e helandin, ta cemaweran bibin bê ziman û berketin ji bo qet zorkarî li ser ranebe, ji ber rewşên qirkirina rewşenbîrî û bîrdozî ê ricîma totelîter bi riwê xwe yê faşî sepa kiribû, jihevxistina civakî bi rewşên herî bedkar di dîrokê de derbas kiribû,ta bê nemankirin û bidawîkirin bi rêya ropartên ku bange şer dikin ji bo zêde dûrbûn di navbera pêkhatiyên wê, mîna mertalên mirovî an êzing ji cengên hundir û derve hatibûne bikaranîn.

Cenga ku desthilatdaran bi ser Kurdan ve tînin   tenê ji ber ku Kurd in û bi zimanê xwe dipeyivin , li ser axa xwe dijîn ew mîna berbadeke nijadiye navdar e bi derbasbûna dîrokê , hesta bi milhurî û zorbaziyê zêdetir dike û hesta bi nefretê tojtir dike , gellên vê rojhilatê dibin jêre qurban, ji ber reşepêşkirina a ku ricîmên wan li ser wana sepandibûn , ew li ser wê wêneya niha ji wan tê xwestin ku gewdeh û hişên wan bikin alav bi destê wê ricîmê ve  ji bo berdewambûna vê cenga bê hempa , berhinde xemê desthilatdarê netewî kirîna henasan e , zêdebûna alîgiran ên xwe kiribûn peykerên pîroz ji van şerên bê wate re, em çûna berve parçebûn û girtinheviyê dibînin mîna nihadiyeke nûbûyî di nav gellên Rojhilata navîn de mîna dirêjiyekê dighe  rojhilata binî û dûr, lê rehnîkirina me ji

rohihilata navîn re mîna naskirina aloziyên wê ye yên herî tevlîhev û bi girêk ve ,nexasim ku çarem kevintir netew di navbera çar dewletan de parçebûyî dijî.

Hebûna Kurdistanê parçebûyî li ser navçeyê nearamiyeke demdirêj sepa dike, ji bilî girtinheviyên comî  ên gurbûyî li vir û wir, herwiha bêzariya roparta netewî a desthilatdar ku çareserî jêre bibîne, binveçûna wê ya dijwar ku pêşeroja gellan dehf dide li heldêrê.

Em suriştiya parçebûnê jî diyar dibînin di nav civakên Rojhilatnavînî de bi giştî û a Kurdistanî bi taybet ve, ji ber ew navçeya gurbûyî dihêle bibe felaket li ser hevdû bê ku bighe  jiyaneke bêhtir rêxistin ta li hevdû rûnin  ji bo pişrastkirina xalên hevbeş  ê ku lawên tek pirsgirêkê an tek zimanî ji hevdû nêziktir dike,lê çareya zanyarî ji derbaskirina hişmendiya netewî de ye bi naveroka wê ya desthilatî ji bo vebûna hevbeş di nav van gellan de ên cîran û bi hevdû ve derbasbûyî bi sedemên dîrokî û erdnîgarî.

Dûrxistina huneran ji civakan ve ew derbirîneke bi kirina wê mîna êzing ji aloziyên ku ti kes têde bi sernakevin, berhinde çêdibe em zorengên Rojhilatnavînî  têbigin ku ew di beşeke mezin de jê mirinkirineke geleriye ne bi rêk û pêk e ji hilweşandina ricîmên sitemkarî bi awayeke bê hêvî tije şikestin û hevgarî,  beşê din tê diyarkirin bi teqîna nakokiyên hundirî ji xuristiya ricîma siyasî û têkiliya wê bi derveyê herêmî  û navdewletî re, ev yeka bervajîbûneke bedkar dide civakên tar û mar ên li ser misoger dibe ku bi metirsî, pepûkî û mişextî bijîn, em dikarin vê yekê

**bizanibin bi derketina çi şoreşgerekî hatiye çiyê û li paş wî çîrokeke pepûk heye, an bûyerên ku jêre piştrast kirin e ku çi rê ji rizgarî ji duriwtiya civakê û paşverotiya wê nîne jibilî dergeha sirûştê li wir zelaliya a hatibûye winda peyda dibe , çendîn niştecîbûna mirov li deşt û zozanan destikek bû ji bo jibîrkirina hevgariyê din û zora wî, li pêş ew fişara desthilatî bi rêya şaxên wê yên dirêjbûyî ,mebesta min ji vê yekê kedîkarên reftar û rewşetan, em tenê kesên bazdayî an derdkêş dibînin yên kokê kêşeyê têdighin, koka kêşeyê: desthilata serkotker e ji ber ew serketibû di garyayîkirina civakê bi pere, ol û bahatînê û bizdandina wê bi destikên zordarî ,serkotkirin û jinavbirinê, li pêş vê fişarê ê tê pêkanîn ligel guhertinên demê û gîhiştina civakan ji jêhatîbûnekê bi giringiya tevgerê û armanckirina rabûn û guhertinê , em hêvî dibînin pêş dikeve û berve ew pêla bi liv û rizgarbûna armancbûyî ve diçe , li gel wê zorenga dîrokî di navbera cemaweran û desthilata serkotker de li qonaxên din tê veguhêztin, di nav de tevderbasbûnekî di navbera berjewendiyên dewletên herêmî û navdewletî pêktê û serdestbûna aborî û guhertina neqşeyan li gor serweriya xwedî hêzê li ser desthilatê ê li ser hemî deverên Rojhilata navîn dabeşbûyî ye, lê belê guhertina ramanî a zanyar bi kelemên rikberiyên serkotkirina desthilatî ve derbas dibe, ew rikberiyan ta radeyekî mezin van civakan dereng hîştibûn, zorkarî bû reweştê ricîmên Rojhilata navîn û Kurdistan bibû meydana herî kelyayî û tîjandî bi demê re, li gel dewletên ên hatibûn e çêkirin ji 1916 ve li gor hevpeymana Saykis Bîko, ê hîn bermayên wê wêraniyê di deroniya civakên tarûmarbûyî çêdike, ew hew dikarin ricîmên xwe biguhrin ji bilî bin sihwana destwerdana**

**derveyî û xwestina hêzên mezin di guhertina neqşeyan de li gorî berjewendiyên xwe, şûnda şanên rêxistinî ên dijber ji van desthilatan eynî reftarên sitemkar li ser takekesên xwe pêkanîbûn , ew tevlî xebata têkoşerî bibûn ji bo armanca dûrxistina zorkariyên civakî û siyasî ê xwediyên hişmendiya nêrîtî a sert pêkanîbûn, hebûna xwe pişrast kirin ji hebûna ricîmên navendî ên bihane dabûn e serweriya hişmendiya bavanî hundirê yek malbatê, ev hemî buhaya ew xortê derketî dabû yê ti kunekî hêviyê nedîtibû dikare bi rêya wê têkeve hundir, li gel wê ê dîl fêrî kiryarê zîndanavan bû û li ser kesê ji xwe lawaztir pêkanîbû û herwisa.**

**Ev reftarên sitemkar mîna agir di gîhayê de di hundirê kirdeyê mirovê paşdeçûyî hatibûn e veguhêztin , tiştek li pêş wî nabe rêgir ku fermandariya xwe pêkbîne, ji ber ku bindestiya wî rê nedayekî ku li pêş de here lê bi kesên din re vê yekê dijî û herwisa.**

## 3- Di rexnekirina netewîbûna Tirkî de

**Û dibe ku ji reweşta netewên desthilatdar be ewên xwe bi demborîneke xwînî ve biçek dikin ku pêşde biçin ji bo bindestkirina gellên ên ji serweriya wan re xwe ditewînin, ev yeka di hişmendiya sîstema Tirkî û çanda wê ya rabûyî de ye li ser nefret û hilkişandina gellên ne Tirk û pişaftina wan di pergalê xwe de,ev hizr dimîne kelemeke mezin li pêş guhertina demukratîk û çûna li pêş bi gavên pêşdemayî.**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Pirûjeya a dibêje bi pêdîvîbûna weşana giyana evînê li heyînê, serkeftina li hember efsanê bi rêya zanînê, ew nefretbûna a ku serkotkirina berdewam weşan dibe mîna diyarbûnekê ji sawa nezaniyê re, mirovê zanyar li heyînê dorpêç dike, ta amadekirina şerê rûbirûbûnê li hember dijminê gefxwar ji nirx û jiyana gellekî resen re li ser erdê xwe yê dîrokî dijî, di eynî demê de bi rahijtina jinê ji çek re li rex mêr tê diyarkirin, li gel wê ceng ji bo guhertinê ye û pêkanîna dadmendiyê bi wê xwesteka ji azadbûna erd ve tê pêkanîn, azadbûna erd naye pêkanîn ji bilî azadbûna henas û rizgarbûna wê ji kêmanî û hilweşandinê, xwestina wê ku rizgar bibe û ji talîzoka koçberiyê û hestbûna bi bêzariyê ve derkeve, ceng ji bo yeksaniyê bin siha baweriya mirov bi xwe pêktê ,kanîbûna wî bi pêkanîna serkeftinê bi rêya beşdariyê ji sazîkirina jiyana nû re.**

**Pir axaftin li ser hevgariya civakê bin siha desthilata faşî ew tiştê ku romana rastîn baş dikare li ser raweste û dikare bûyerê bike belgenameyeke wijdanî ji bo bandorekî baş li ser çêja wergirtî bike, taku tehliya jiyanê pesindan bike bin siha zor û gendeliyê ên ketibûn e movikên jiyana civakî û siyasî li Kurdistanê bi giştî ve û li bakûr bi Tirkiyê ve girêdayî bi taybet ve.**

**Kêliya hêrsa cemawerî zêde dibe bi zêdebûna hestê xwe bi zora sitemkarî û zorkariyê ve ê di dermafê wê de bi demê re tê duristkirin, ji ber hilkişandin û pişaftina berdewam hîşt ku tirs bibe nanê dewleta Tirk ê ku dide civakên ne tirk bi navê ku ew civak divê bawer bibe ku ew Tirk e, ji bilî vê**

rêyê mafê wê nîne ku li vê cîgehê bijî, ev sitemkarî bi bîrdoziya nefret û bîzandina nijadperestî ve dorpêçkirî ye, di hizrên nifşan de tê çandin, dihêle ku bermaya zorkariyê ji serdemek ta serdemekî ve bête veguhêztin, ev hişmend eger newe guhertin wê gelekan dehf bide ji bo bibin êzing ji vê cenga bîrdozî re a ku aramanca wê setimandina nîşanên hevjiyaneke hevbeş , berhinde çêdibe kirîna cemaweran bi rêya peran û dehfandina wan ta bibin kirêgirtî hevdû bikujin, û eger naxwazin vê yekê pêkbînin wê di zîndanan de bêne çekirin, pere tê wateyê pişaftin e di nav Tirkan de, tirs ango mirin an berçavkirin e, ji ber vê van milhuriyan gellan hîştibûn di rêyeke tarî de biçin, li gel wê me êdî naskir hovîtiya van sîstemên totelîter ên hêza wana cemawerên paşdeçûyî derbas kir, ji ber vê yekê gel tenê nikare van ricîman hilweşîne.

Tenê bi rêya destwerdana derveyî û sûdwergirtina ji nakokiyên dewletên mezin ricîma milhûr li rojhilata navîn tê roxandin( Îraq- Lîbiya) jibilî wê zorkarî naye dehfandin , herwiha jî guhertin naye pêkanîn.

Û di vê derbarê de ez dikarim bibêjim ku ti gerentî nîne ku duristbûna destwerdana derveyî û hingemeya cemawerî wê karibe van sîsteman ji naverokê wan ve biguhêrîne, pêdiviya vê yekê bi gelek şoreşên dijwar hene ta çaxê em bikaribin li ser raperîneke hişmendî ji bo hişmendiyê biguherîne biaxivin, ev yeka jî zor e.

Dijminatiya gellan wêrankirina wê bi demê re zêde dike, ji ber ku ricîmên navendî bernakevin ku qet û qut cemawer

bi alavên kevinşopî ve nayên tewandin, herwekî nezanîkirina milletan û hişbirkirina wan bi rêya ol wê zêde bibe alîkar ta bibin alavên pêkanîna pîlanên dewletê li derveyî sînoran, derxistina aloziyên herêmî ew ji berhema babidestî û bêzariya van dewletan e ji bo aloziyên xwe hembêz bikin, mayîna Kurdistanê mîna mêtingerekê di navbera van dewletan de wateya wê guhertina naveroka wana ta demeke ne berçav, ji ber gellekî heye naye pişaftin û bi hemî awayan tekoşînê dike , zor û sitemkariyê dikşîne û radest nabe, ew hertimî pêşve diçe wekî gelên cîhana azad , tiştê ku ragihandina milhur pala xwe didêkî ew kirina jinê mîna destikêkê ji têkiliya zayendî ve û kelupelkirina wê bi awayekê ku bihêle gilêza dilbijînkeran bête xwarê,ango bibe bi pileya lawir, li rex vê yekê dîtina olî a siyasî ji jinê re li gor dûrbîna dewleta netewislamî ku ew destikeke ji nermkêşkirina zayendî û zaroanîna berdewam re ye.

Ev hîşt çav bi dû aliyê surişţî ve biçin, ji ber bandorek xwe heye li ser guhertina takekesan ve berve beloqbûn û sertiyê, ev yeka ekranên ragihandinê parastibûn ji bo mijûlkirina cemaweran û bindestkirina wan ta demeke dirêj.

## 4- Medyaya netewî û reşkirina henas

Derxistina reşepêşkirina deronî vexwendin e ji gunehê re ,li gel wê ragihandin dixebite di lîstina hartirîn rolên xwe de ji guhertina çêjdarê û mijûlkirina xelkê ji kêşeyên xwe yên rastîn ve û mijûlkirina wê bi tiştên bênirx ve, ne tenê wisa lê korkirina wê bi rêya islama siyasî ve wekî ku niha pê tê

**lîstin, li gel wê em palderên hêviyê di guhertinê de dibînin ji kesên ku çek dirajin, li çiyan bûn e niştecî taku ji devberjêrên wê yên asê barûyên ji bo rûbirûbûnê saz bikin, bê guman herdû aliyên zorengê di girtinheviyê xwe de pirsgirêkên desthilatî û kêşeyên mîna hev radikin, nêzik hevdû dibin bi qasî kanîbûna wan ku cemawer bi şêweyên pirhijmar ve qezenc bikin.**

**Em nimûneya generalê Tirk yê bi sertiyê ve kovanbûyî di eynî demê de bi darbestên leşgeran zêde bandorbûyî xwe diyar dike, lêbelê ev bandorbûn tenê li pêş kamêreyê ye ta bigrî û hêsiran bi xemgînî birjîne, tenê xweziyê ew general ku di bilindtir pile de bimîne û serçûna wî ,bê hewildanekê ji bo rawestandina cenga bê encam tenê zêdekirina neman û kuştinê ,ji ber berjewendiyên tofî a desthilatî serê kêşeyê di hebûna milurî û gendeliyê de ye ta wekî xwe bimîne , li ser binemaya hebûna desthilatî û rî sipîbûnê li ser hesabê hebûna nefretê di nav civakan de, ne tirk bi azadiya Kurd qayil dibe û ne jî Kurd dikare çavê xwe bigre ji tewan û cefayên ku ji destê tirk ve dibîne, mebesta min di vir de ew ricîma desthilatiye ligel alîgir û kirêgirtiyên xwe yên mîna alavên vejînkirina nefret û kînan ta demek e dirêj têne bikaranîn,berhinde ji bo dîtina çareyekê ji kêşeya demukratî û azadiyan berdewam tê paşxistin, ji bo xwestekên cemaweran û rêxistinên wan jî li ser tê zîvirîn, soz dibin ji reweştên wê desthilatê ta berdewam bimîne.**

**Ew sozên hilbijartinê fereh in û dema dighên desthilatê li ber bayê diçin, bê ku guhertinên bi çûk jî di kirdeyê dewletê de beranberî gellên xwe bête pêkanîn, lê bermayê**

sitemkarî û pişaftinê naye guhertin ji ber ji dewleta Tirk û Îranî re bûye baweriyek, di nav herdû naverokên roparta xwe de alîyekî nijadî û ragehî radikin, li pêş rewşa xapandina ragihandî em hêvotina gel li hember hevdû tiştekî hêsan dibînin beranberî şiyarkirin û vexwendina wî ji bo rûbirûbûna milhurî û kesên wê.

Em dikarin li sirûşta girtinheviyê di nav du hêzan de meyze bikin: a pêşî hewil dide serwerî û nemanê bike û a din hewil dide bergirî û berxwedaniyê bike û nasnameya xwe yê bindest piştrast bike, dibe ew rûbirûbûn hêzên heyî neçar bike ku her çaxekî li xwe vegerin ligel wan hêzên ku hewil didin hebûna xwe cîgir bikin û sûdê ji cengên nemanê bibînin, ji bo xwestekên xwe di navçeyê de di demeke dûr de bidestbixin .

Ev ne tenê ji van ricîman re dibe metirsî lêbelê wan dihêle ku cengên qirkirinê berdewam bikin bê ku guhê xwe bidin van gellan û jiyana wanî hevbeş bi hevdû re, berhinde netewên lawaz ji yê bi hêz ve cuda dibin dema bi hêviyê kor ve tên e girêdan, dibe pêşbirka netewên desthilatdar a bi felaket ve ji bo lêgerînê ji hebûna wê ya faşî re bin siha derxistina hêza xwe yê bê rewişt ta li ser dirindî ,ezezî û nijadperestiya xwe bimîne.

Dîroka dagirtî dirama di xwînê de ji serî ta binî ve niqûm dibe, ev yeka ji kiryarên tîbûnê ji xwîn û çavkariyê re ji bo guhertina neqşeyan û derbiderkirina belengazan, dûrxistkirina wan ji cîgehên wana ve, ev yeka li ser zanyaran sepa dike ku li hember ev rûtkirina har ji wijdan

**re rawestin ji ber wijdan bi çarenivîsê ve girêdayî ye, yekbûna wijdana zanyarî li cem xwedî raberî û bîraweriyan , ên li hember terora dewletî an rêxistinî radiwestin pêdiviyeke girîng e li hember pişaftin, dûrkarî û sertiya a desthilatên dirindî li rojhilata navîn sepa dike, em îro cîhanê dibînin mîna gundekî derdan dikşîne ji kesên ên ji kirdeyê xêrê ve bêkar in li hember tofekî bi zehmetî jidayik dibin ji nav tehtan ve hêdîka mezin dibin, ji ber vê yekê em zoreng berve baştirînê dibînin ew tiştê ku hizrên berketiyan dadigre, bi pêwîstiya alîbirina giraniyê bi aliyê başkirina têgihiştina jiyanê û serkeftina maf,xêr û bedewbûnê.**

**Ji ber ceng rewşa têkçûnê derbirîn dike ,mirovê serkotker li jiyanê di nav sirûş, mirov û jîndaran de belav dike.**

**Berzkirina wêraniyê û hewildana dûrketinê ji wê, piştrastkirineke ji surişta heyînê ê ku jîndar ji bo parastina ewlehiya xwe dihilîne, li hember êrîşên serkotkirin û celewkirinê ,ewên jiyana gelekan dixistibûn e di metirsiyê de.**

**Ajotin li ser diljêçûn û xuyanîkirina wê mîna kirdeyekê di mirov de, ji sirûşiyeke suriştî bi rêk û pêk ve derdikeve ,ew kar dibe çandeke binyadkirî, ew desthilata dûrkar jehrê xwe davêje ji bo bi rêya wê cengên navxweyî jiyana gelek kesên hejar têkbibin , li gel wê belavkirina wê di bingeha xwe de nûnertiya aloziya desthilatê dike û dikeve di movik û giyanê saziyên ragihandin û fêrkirinê de , tê çandin di derbarê perwerdê û rewşenbîriyê de , ev yeka**

**civak dihêle li ber ketinê be, ji ber teqîn têde misoger e , timî dighe asta xwe yê herî bilind ,hetanî ku bi hêdîka ev yeka pêkwere, bi derbasbûna demê ve, tirs di xwe de dibe di hundirê takekesê tirsok de mîna nefretekê , bi demê re mezin dibe ta bi wêrekî bête derbaskirin.**

**Derbaskirina berhema tirsê tê piştî tîjandineke mezin, bê guman cemawer bi kirdeyê tirsê ve wekî ku çawa bi roparta diljêçûnê bi herdûkan bandor dibin, timî desthilata comî xwe digerîne bi qateke cemawerî çekdar bi peran tê kirîn, armanca wê serkotkirina bijardeyên barketî ên derdê zorkarî û koletiyê dikşînin, rêya xwînê ji ajotina desthilatê ji civakê re ye, ev yeka dihêle naverok têkbiçe û sazî jihevkevin, welat parçe bibin û bibin firtik, ev yeka dikeve bi dawî ji berjewendiya hêzên berpirs li ser wêraniya dewletan û pêşesazîkirina aloziyan.**

**Bê guman ku çi ricîma desthilatekê li ser diljêçûneke rehî an ragehî hatiye damezrandin, civak û desthilatê dibe berve wêranî û parçekirinê, li gel wê aloziyên mezin dibişkivin ji ew vaca wêranker ve û hingeme tê duristkirin bi vegerandina jiyanê ji rewşek nîv baş ta rewşa destpêkî û dirindîtiya mirovî ve.**

**Lîstina bi laş ve û sotina wê bi mebest ve encamekî ji encamên wê diljêçûna rêbazbûyî ye , desthilata Tirkî saz dikir  dema xwe kiribû dirindeyekî girs diranê xwe xistibû di civakê hemî de, pir car kesên hajnemayî buhayekî giran didin ji  vê diljêçûnê bi giştî ve, ev tundî xuristiya aştiyan e di mirovan de jê nefret dike , rewanê desthilata serwer**

**serdest dike, sertî jêre hebûneke herdem misoger dike, bin siha gerdûnekî dagirtî girtinhevî, lawaz têde paşde dimîne û neman dibe , serkeftin têde ji kesê serkotker e, ji ber ew fêrî pêgirtina bi tewriya hêz û bizdankirina giştî û hertimî bûy e.**

**Desthilat li vir xwe vediguhêzîne ji weşankirina hêza xwe ta anîberkirina diljêçûn û çandina wê di refên civakan de,bi rêya gewrekirina serweriya rehî û kirina wî li jorî nijadên din, dema nijadên ne desthilat netivîbûyî û şikesî dimînin, ji diyarbûnê ditirsin, ji wê dûr dibin ji ber dibînin ku ew sedemeke ji hatina bobelat û felaketan ve.**

**Ev nerîna kesê bi hêz ve ye li kesê ku jê lawaztir, ew ne hêjayî jiyanê ye heta ku lawaz û pûç bimîne, ne hêjayî jiyana baştir e, li gel wê gellên lawaz ewê neman dibin û dîrok wan dadiqurtîne li pêş tundî û sertiya gellên dirindî, li vir em gellan ji hevdû cuda dikin: du cure li pêş me hene lawaz û dirind, a lawaz xweşî û aramî û bedewbûna cîgehê wan hîştibûn bibin pariyek e xweş di nav lepê bijardeyên dirind de yên li jiyana xweşî digerin û ji beyar û çolên xwe yên xizan bazdabûn, ji ber têde jiyan nabe , pêdiviyên bîngehîn têde nayên dîtin, taybetmendiyên xwe yên dirindî jê naçin eger çiqasî li erdeke zengîn bijîn lê serweriya xwe berfirehtir dikin, lêbelê dirindîtî jê re dibin taybetiyeke bîngehîn ji xusletên wê re.**

**Ew dirindîtî bikartînin ji bo desthilata xwe pê biparêzin û lingê xwe bi derbasbûna serdeman bicî bikin, ji ber ew tundî û diljêçûnê ji xwe re mîna destikekê dibînin li hember**

gellên ên ku erdê wan dagirkirî ne, pêre dighin astekê ku pişaftina xwe ji civakan re qayimtir bikin ji ziman , reweşt û kiryarên wan bi rêya kirîna xelkê bi pereyan an belavkirina tirs û sertiyê, bê guman sîstema desthilata Tirkî, Îranî û Basiya Erebî taybetiyên xwe yên dirindî parastibûn bi cîgirkirina diljêçûn û anîberkirina wê ta demek e ne diyar, dima diljêçûn ji van desthilatan re mîna reweştekê û êzingeke baş ji heyîna wê re sûd girtin ji van sînoran û dûrbûnê civakî ên bi xwe nakokiyan kûrtir kirin li gel vekirina rêyan berve aloziyan û cengên hundirîn , ev yeka cemaweran jihevxistibûn, ev bûn jî nîşanên jihevketin û parçekirinê, roparta diljêçûnê dewletê dibe hilweşînê,bin siha serweriya hêz û tunebûna dadmendiyê.

Ev yeka bijardeyên bindest dehf dide ji bo mafên xwe bixwazin, serî hildin ,ev yeka jiyanê dike di talîzokeke tevderbasbûyî de, ji ber bijardeya ronakbîr wê nikaribe çi çare pêşkêş bike ji ber ew rastî gefxwarin û qirkirinê an surgûnkirinê tê, ev yeka desthilatên faşî dehf dide bi dîtina qateke rewşenbîrî bi wê ve girêdayî, dikare roparta wê bi rengekî nerm weşan bike, ji bo kedîkirina cemaweran bi rêya pere û karbidestkirinê ,an bi rêya tundî û serkotkirinê, ev yeka çênabe dûrî hevkariyeke bi giştî ve di navbera dewletên herêmî de bi rêya devgirtina civakên xwe ve û zêdekirina nezanîkirinê û dorpêçkirina wê bi gelek şêweyan ve, çendîn lihevhatinên navdewletî hewildabûn ku jiyana serkotkirinê di civakê de tebitî bihêlin, dema ew hevkarî di nav xwe de bête kirin ji bona parastina berjewendiyên aborî û stiratîcî, çi vebûn durist nabe bin siha wê destêkelkirin û têgihiştinê û hewildana ku mirov bindest

**bimîne, wisa em Tirkiyê dibînin serkotkirina gellan pêktîne li pêş çavên dewletên ên ku li gel wê têkiliyên aborî û leşgerî hene, wekî ku çawa Erebistana Siûdî û Îranê dike, dîtina tevgereke cemawerî serkeftî û berhemdar zehmet dibe, eger berjewendiyên van dewletan ji hevdû dûr nekevin, dema nakokî di nav dewletên herêmî de derdikevin dîtina deriyên serkêşiyê hêsantir dibe, gel di wê demê de dikare sûdê ji van nankokiyên navdewletî bibîne.**

**Ceng ji encamê vê fişara komeserhevbûyî ye, ew xuyabûneke ji çend kînên mirovî ne , bi dijwariyê serkotkirin û devgirtinê ve mezin dibin, ew peymana reşepêşkirî di navbera fermandar û fermanber de û genîbûna pêkhata civakî û gendeliya wê bi naveroka xwe ve ji  qonaxên zorbaziya mirovî  û demên çavkariya desthilatê û hovîtiya wê vedigere , venêrtineke hûrbîniye ji derdê mirovê Kurdistanî li ser erdnîgariya welatê wî ya berebûyî, tevî setemkêşiyên civakî  ên çendane û ew zinatkariya bi rêk û pêk ve, em hêviyê dibînin di henasên şerkeran de ,ên bi erkên xwe ve radibin ji diyarkirina bergirî û rûbirûbûnê li rex wê dirindîtiya pêkhatî ve.**

**Miqatebûna ricîman li ser nezaniyê û rebenîkirina cemaweran ew ji bo amadekirina wana ta nakok bimînin, ev tişt hîşt cemaweran bi desthilatê re  tundiyê bikin, di xalên hevbeş de nêzî hevdû bibin, ta bi hevdû re dijêçûnê bê encam pêkbînin , ev yeka dikeve ji berjewendiya desthilata serkotker ve û destketiyên wêna yên bijardî, herwiha hîştina cemaweran ji bo bibin êzing  ji paradana jimaran dihêle rêjeya xelkê dakeve berve jêr li ser jimara çûna**

**hatinên sirûştî û gencêneyan bi destên tofên ên aborî û diravê serdest kirin e, em dikarin bibêjin ku mirovahî rastî zorengeke kûr tê, êzinga xwe ew komên ewle ne, neçar dimîne ku bi alavên asan ve bergiriyê li ser xwe bike , wê nikaribe metirsiyê hest bike , ji ber zorenga ji bo malgirtina hatinên avî û petrolî ew gêrînga kirdeyî ye ji kêşeya tundirewiya netewî, ragehî û olî re.**

**Girêdana diljêçûna nijadî ji milletên lawaz re qayîm û hevgirtiye ji ber dîrok kesê bindest xistiye di vê rewşê de û koşyarên cengê berdikevin ku gîhiştina li gencêneyan ji dergeha gurvedana girtinheviyên tund ve derbas dibe bi herdû baskên wê yên netewî û ragehî ve li hemî Rojhilata navîn , bi vî awayî cemaweran bê agahî an bi bîrawerî ve buhayên vê cenga dijwar didin, berhinde cemaweran li hember hevdû vala şer dikin, ji bo para westandina xwe wergrin .**

**Ew hêzên ku hewil didin serweriyê bikin, nerîna giştî birêve bibin ,lê pênûsa afrênerî hewil dide mirov vegerîne hizra ronakbîr dûrî holên koçberî û nemanê li ser rehniya vê yekê azadperweran bi têgehên sirûştî şad dibin wana vedigerîne zelaliyê û evîna erd , ziman û taybetmendiyên jîndarî ên navika civaka sirûştî dayîkî saz kirin, ev yeka jî dibû bersivekî işk li ser civaka bavanî, li vir em zoreng dibînin şaxdayî dibe û aliyên girîng ji têgihiştina me yê kevinşopî ji zorengê re derbas dike, ji deriyê ku ew zoreng Kurdî Tirkî ye , an Kurdî Erebiye an Kurdî Farisiye, lê zoreng tê têgihiştin wek ku zorengekî dîrokî be di navbera du hêzan de, yek jê dixwaze bi rêya milhuriyê û**

**setimandina demukratiya jîndarî  bimîne û a din hêzeke bi pêkanînên xwe yên sînordar ve bergiriyê li ser xwe dike, timî derdê pepûkiya bextê xwe û zehmetiya têkoşînê dikşîne, lê berdewam hebûna xwe berz dike li ser sabara xwe yê dîrokî Kurdistan, li cîhaneke bi tora xapandin,lîstok û pîlexwariyê ve dorpêçkiriye.**

**Xewin diyar dibe mîna alavekî tebitî di bîr û henasên cemaweran de ên bi hevgarî giranbûyine bi encamê lîstoka dewletên ku Kurdistanê ligel xwe parve kirin, ew hîştibûn xewina Kurdistanî bi sanc û ezmûnên zehmet ve derbas bibe, li ser sehneya bûyeran ,dewletan erdnîgariyeke bi pepûkiyê û paşveçûna partîtiyê ve bindest parve dikin, li gel genîbûna  xebata rêxistinên Kurdî ên di nav xwe de millet kirin mîna komên lawaz, li ser xwe dabeş kirin, rêvebirên van rêxistinan xwe kirin mîna melle û alîgirên wê bûn jêre hînckar ango Mirîd.**

**Berhinde pêvajoya jêbirina pîrozbûnê û jinavbirina wê zehmet bûye ,metirsiyên mezin tîne rojevê, bin siha meraqa desthilatan bi cîgirkirina wê ve ta ciyawazîtiyên xwe biparê zin , ji ber hebûna pîrozî û binyadkirina wê di çanda civakê de soz dide bi cengên nû ve , komên leşgerî êzingên wê kesê n ne gihayî ne, ên bi xwediyên rêxistinên bapîrî ve dorpê çkirî ne, ewên girêdayî bi desthilatên milhûr ve, li gel wê em Siûdî, Qeter û Tirkî dibînin mîna nimûneyên herêmî ne piştgir in ji van rêxistinan ên jêre hebûneke dem dirêj pê ktînin û kanîbûneke mezintir ji pûçkirina tevgera civakan û kirtankirina wan di warê hişmendî de, ji bo mirandina**

hestê demukrasiyê li cem wana, ji berjewendiya berzbûna faşîzmê û tundirewiya olî, lê rola ronakbîriyê û hişiyarkirin ê dima şermok di hemî derbaran de û nikare nifşan dûrî xefkên desthilatên bavanî dûrxîne ên di bernameyên karê xwe de bêrêzî li azadî, demukratî û rabûna mafên mirovan bi diyarbûnên wê yên mezin û giştî dikin.

Girsbûna aloziya nasname û hatinrêzê û berzbûna pirsgirê kên çendane ew ji encamên van siyasetên desthilatî ne, civakan parç kiribûn û hîştibûn winda û jihevketî bimînin, bi vî rengî deverên sertiyê zêde dibûn di astekê de naye heytebûkirin, ev yeka jiyan  têkçûyî û jihevketî hîşt, bi aliyê hingeme û hilweşandinê ve bir .

Ev rewş li banî biseravê diket hertimî , bi civakên barketî ve dilîze, bi derbasbûna qonaxên felekê ve , wisa em dibînin parçekirin hestên nefret, bêzarî û diljêçûnê berz dike, di nav takekesan de gurtir dibe, wan dihêlin ku

---

bingehên genî û dijhev saz bikin bi awayekî bi lez ve, nikarin li hember desthilata faşîzim bibin xwedî hêzekê, berhinde ew hevciviya bi tenê û geverî yê taybetiyên diyar jê kêm dibe, ew ji sîstema desthilatî ve bi rêya wê cuda dibe, rolên cemaweran parçebûyî dimînin bin siha wê pêşbirka hişk ji berhemkirina milhûriyên çendane, barê derketinên wê herdû aliyên girtinheviyê parve dikin.

---

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Hel û mercên cengên biçûk ,çekdarên li çiyê pala xwe didinê pir zor û zehmet in, lêbelê ew ceng berdewam e, dikare bêşkiran di terxên ezmûnê de pêkbîne , ew dikin palpişt di belavkirina tirs û bizdanê de, berhinde tunebûna hevtayiyê di navbera herdû aliyê zorengê pêdivî dike ew şêwe ji rûbirûbûnê ve, bi heman demê ve girtinhevî êşeke mirov nikare sînor jêre deyne , di rewşên ku desthilat cemaweran desteser dike bi rêya tirs û gefxwarina bi kuştinê ve, lê ew ceng dibe tek rêyekê ji vekirina deriyên zengarî û girtî ji bo aştiya dûr, tevî sirûştiya rewşa Kurdistanî û parçebûna wê li bakûrê Kurdistanê lê rêya herî tebitî di wê beraberê tevgirêk de li wir ew berdewamkirina bergirî û berxwedaniyê ye, nedana bihinberdanekî ji desthilata faşîzm re ta dadmendiya pirsgirêkê têknede, bê guman ku ji vê çareyê re wê encam û guhertin li ser qonaxên tevgerê li gorî guhertinên navçeyê bi giştî rûbidin .**

**Rabûnên diljêçûn û nefretê di hundirê civakên tîjandî de peyda dibin têde pîvanên jiyana beşdarbûyî hene, herwiha dijêçûn jiyaneke li ser bêdadî û gendeliyê qayim dibû, hewayên demukratiya naverokî têde kêm dibe,ev yeka hîştibû jiyaneke metirsîdar dagirtî berçavkirin û rewşên awerte saz bibe,ji bilî ên ku pariyê xwe ji gendelî û genîbûnê dixun, ji ber ew rêberên movikên van saziyan in û belavkerê sertiya civakî ne bi rêya pêgirtina wan bi bermaya ramana gelemperatî ve û çavkaniyên wê yên yekem, ji ber ku fermandariya nijadî civakan hîştibû di metirsiyekê de bin, zoreng ji bo dehfandina zorkariyên ên rengên xwe çendane bûn , tê duristkirin bi armanca**

**qirkirina siyasî û rewşenbîrî ji gellekî sax re û naxwaze bê jinavbirin, timî di rûbirûbûna pişaftinê de ye bi derbasbûna rikberiyan û cureyên fişaran, dibe ku nimûneya cenga partîzaniyê derbirîneke ji rastiya xwestina azadî û serxwebûnê be tevî pêkanînên hindik û belavbûna hêzan li ser dirêjî welatê parçekirî.**

## 5- Gotûbêja zorengê ji bo Piştrastkirina nasnameyê:

**Sirûşta şer li çiyan ew giyana a bi maf ve girêdayî berz dike di derbarê gera ji bo jiyana baştir de ji derveyî hewayên sitemkarî û tîjandinê ve.**

**ji ber seyrana hewildanê ji pariya nên û bergiriyê li hember leşger û sirûşta işk ve ev hemî erk zehmetir dike, hewildana ji bo dîtina nirxekî ji cengê re nepeniye, û gera ji bo rizgariya naverokî mîna hewildana biservebirina derziyekê di komek aş de.**

**Koçberîbûna ji bêzariyê ve derdikeve mîna hestkirina bi mestiya zorê ye ji derdekî pirdêm encam dide , mîna hevdû dibe bi derbasbûna wê ve di kûrahiya mirov û hûrbiniyên jiyana wî de, li gel wê Hîgil dibîne ( Ew qutbûn cûdabûna henasa miroviye û sabareke giyanî ji hebûna wî re ye mîna jîndarekî civakî ) , em li vir dibînin di cihekî din de dibêje : (Ew liberdînana mirov ji serxwebûna xwe re yê xweserî re ,yekbûna wî bi naveroka civakî re.)**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**Ev diyarkirineke ji rewşa çekdaran re ên dev ji xweseriya xwe berdabûn beranberî têkveçûna bi pirsgirêkê ve û armanca a ji bo wê civiyabûn, windakirina jiyana pêfêrbûyî û asayî ji ber serkotkirina rêbazbûyî ,desthilata totelîter pêkanî û ji mandelekirina nasnameyên gellan bîngehekî ji xwe re dîtibû ji bo qayimkirina desthilata xwe , ev yeka hîşt tofên serkotbûyî bi çareyên din ve biramin taku li hember êş û sertiyê ve bi sertiyeke dijhev ve şer bikin ,mîna derbirîneke ji pêvdiviyên xuristî û pêdiviya bi serxwebûn û rizgariyê ve ji pêrewiyê re mîna têgehekê û ricîmeke heyî.**

**Li gel wê ti guhertin ji naverokên nexweşiyên civakî re nînin , ji ber zikmakê wê derdê desthilatiye, bi palpiştina li ser vê yekê çi geşepêdanek di kêşeya mirovê nediyarkirî li rojhilata navîn wê çênebe dema sertiya pîroz bête nûkirin bi palpiştbûna li ser deqa olî ya şaxdayî bi şîroveyan ve ta bibe cil û bergekî ji deshilat û civakê re di eynî demê de.**

**Ji ber vê divê rola mirovê zanyar bête danasîn di nav wê zorenga işk de di navbera hêzên ên dixebitin li ser mirandina wijdana berketî li cem cemawer û hêzên ku dixebitin ji bo rakirina badanka mayînan di civakên ên zehmetiya bendan dikşînin,bi rakirina bask û bendan ji ser hişên ku bi derziyên pîroziyê ve hişbirbûyî, derbasî milhûriya a civakan dehfdabû li zorengên vala hest û meraqên hêzên herêmî livandibûn bi fermanekê ve ji aliyê hêzên derveyî ên di van welatan de mêtingeriyên xwe yên kevin dîtibûn ,bi rengekî nû ve wana**

nûjentir dikin, jihevkirina dewletan û parçekirina parçebûyî mîna destikekê ye ji hebûna wanî ne rasterast re, li gel wê zordariya bi rêk û pêk ve kînan dibişkivîne û berketî û raberiyên takekesan têkdibe, wan dehf dide berû zorengên civakî desthilatî qet ranaweste, pirbûna rengên zordariyê gelek hevgarî derdixîne holê , dibe ji kiryarê Kurdistanî re navdariyek, ev dibû riwê giştî ji jiyaneke re bi zoreng û hevketinê ve cîtengbûyî, ji ber xwestina van ricîman ku sertî û terorê belav bikin bi rêyên ku peywendiyên civakî ve hildiweşînin û qurbaniyan zêde dikin, tiştê ku dihêle sazî û civakan parçe bibin li gel roxandina baweriyê di nav xwe de, di vir de karê mêrên ayendê pir dibe di qeyseriyên van desthilatan de ji ber rolên wan xurt û bi bandor ve ji rewakirina zordariya pîroz re, parçekirina çi tiştê ku dihêle aramî û hevgirtina malbatî û navçeyetî çêbibe, ta têgeha hatinrêzê rastî neyarkirin û gumanê were ji aliyê qata ê movikên jiyanê tev de desteser dike ,berhinde vexwendina ji sertiyê re bi bihaneye parastina bîrdoziyê ew destika gerentor e ji hebûna milhûrî û milhûriya dijhev re (dijberî) li gel wê em zoreng dibînin mîna amanekê ye di nav xwe de sertiya pir alî û hatinrêz kurtas dike, dihêle jiyan sehneyeke xwînî be , têde welat bi bobelatên ên ji cenga mirov li hember mirov encam dide dagirtî be, ji berjewendiya wêranî û windabûna rê, ji ber ku sertî li rojhilata navîn bû nimûneyekî ji pêşesazîkirina tundirewî û milhûriyê re.

Têr nake em bêjin ku hebûna gencêneyên av û petrolî ew sedem in ji hebûna desthilatên milûrî re, lê em dibînin ku ew ji cîgeha dîrokî ji sertî û zorenga olî û ragehî ve ye, ji

**bilî hebûna gellekî nêzî 55 milyonan e di nav çar dewletan û cîhanê de, ev hemî dihêle ku ew cih bi cengên navxweyî û herêmî ve çalak be , jê yê li kêlek dijî naye parastin û alozî ji hundirê wê ve dibişkivin û li deverên din tên e veguhêztin, deverên ku eynî alozî dikşînin, berhinde gîştpirsîna ya ku li herêma Kurdistana başûr(Îraq) 1 di Êlûna 2017 de gelê Ketelonî 2 dehf dabû ji gîştpirsînê re ji bo serxwebûna xwe ji Ispaniyayê ve wergrin, giyana netewî li cem Iskutlendiyan û Filamenkan geş kiribû û ji bilî wan ji gellên ên li erdê xwe yên dîrokî dijîn bê ku sabareke dîrokî taybet ji bo wan hebe.**

**-----------------------------------**

**1- Kurdistana Îraq an herêma Kurdistanê bi Kurdî ,herêmeke Kurdî ye li bakûrê Îraqê dikeve û xwedan fermandariyeke fîdralî ye.**

**2- Ketaloniya : navçeyeke lî herî bakûrê rojhilata mîna girava Îbêrî dikeve, rewşa wê ya destûrî nakok e di navbera şanişîna Ispaniya yê a ku wê dibîne navçeyeke xwedî fermandariyeke xweser e hundirê sînorên wê û desthilatiya Ketaloniya yê xwe dibîne mîna desthilatiyeke serbixwe de.**

## 6- Dîtinekê li Tirkiya

**Ne çareserkirina pirsgirêka Kurdî li bakûrê Kurdistanê ew nîşana binveçûn û bêzariya desthilatên Tirkî ne, ên bi dû hevdû ve derbas dibûn, bi hişmendiya mandelekirinê ve girtibûn , bi mandelekirinê ve bi mafê Kurdî re didan û distandin, ev yeka ji wan re bibû metirsiyeke bi saw ve an şevpesteke hertimî di hizran de derbas dibû.**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Wisa bi wê hişmendiyê ve ew dever derbasî qonaxa demukratiyê nebû bi hebûna gellekî hijmara wî zêdetirî 20 Milyonan e, li ser sabar, wêje û taybetmendiyên xwe li welatê xwe nikare derbirîn bike.**

**Ew welatê ê bibû dîlê hevpeyman û girtinheviyên navdewletî û herêmî, ji ber vê hebûna leşgerîtiyê mîna hişmendiyeke heyî li Tirkiya yê ew mîna xencerekî bi jehr e di pişta demukratiyê de, ne li Tirkî tenê lê li hemî Rojhilata navîn.**

**Ev dihêle kêşe girs û berdewam şaxdayî be û tiştê divê bête nîşandan ku hewildanên ricîmên totelîter ji bo yekîtiyan di nav xwe de çêbikin ji bo beravêtina çi hewildanekê bi aliyê guhertin û gorîna demukratîk ve, wekî lihevkirina ricîmên Erebî , Tirkî û Farisî di derbarê serkotkirina rabûna Kurdistanî berve azadî û demukratiyê bi rêya sazkirina rengekî ji rengên demukaratîbûna a nûnertiya wê nimûneya dewleta yekbûyî û ne navendî dike, ew ricîmên serkotker giraniya xwe didan belavkirina kedan û nemankirina wan li her parçeyekî ji perçeyên Kurdistanê ve, li gel wê gorîna Tirkî ji zanistdariya Kemalîstî ve yê hebûna gellên ne Tirk mandele dike pêşî gelê Kurdistanî , ta Islamiyeta Erdoxanî ya eynî rêbazê didomîne, ew mîna nîşaneke nêzik e ji girtina ew dewleta totelîter ta bighe jihevketin û hingemeyê .**

**Çi sûd heye ji xwarindina hewaya giştî bi tîjandina rehî ve? ev yeka piştrast li hember hevjiyanê ye, bêhtir rê ji lawaziya dewletan û jihevketina wana re vedike, berhinde**

**belavkirina sertiyê û jiyankirina wê ew yek ji sedemên heyî ye ji zêdebûna aloziyên naverokî , rewşenbîrî û deronî ve ji civakên ne diyar ji rewşa xwe ve, li gel wê zanyarên wê derdên rengên dûrbûn û paşguhkirinê dikşînin, li gel wê dîtina aloziyên dewletan ku ew mîna pîlaneke derveyî ye têkbirina rastiya zanîstî û reşkirina wê ye, ji ber ramana bîrdozî a netewî an ragehî bîngeha xwe ji çand û bermaya pîrozbûna deqa olî wergirtibû,lê ev yeka pêdiviya xwe bi xwendineke babetî heye ta bête belavkirin, ta xelk bixwîne û lêkolîna rastiyên nehêne bike, lê tengavkirina takekesan û dehfandina wan bi mebest ve li pergalên ramana totelîter, mirov ji henasê xwe dûrxist,jibilî dûrketina ji babetîbûn û şîrovekirina kûr , vexwarina çanda desthilatê û dîtina wê mîna çandeke pîroz pala xwe li ser piştgirteke olî û fermaneke xwedayî dide ,berhinde bêberiya zanînê di nav cemaweran de xuya dibe, roparta desthilata derbiderkirinê pê xweş dihatin û ji nifşek ta nifşekî re pêman kirin, li gel wê aliya deronî a ji helçûn û hemdegiyê re bi roparta ne hênik re amade dibe, ji ber dikare cemaweran bi rêve bibe dema bixwaze , wê bike êzing ji şerên desthilatê re, li gel wê bikaranîna Islama siyasî a netewî di siyaseta Erdoxaniya Tirkî de pala xwe dide li ser bicîkirina serkotkirinê li hember Kurdan ta xwestekên wan bi wergirtina azadî û demukratiyê ve bicî nebe, wekî em kedxwariya roparta ragehî li Îranê dibînin û ya netewî li Sûrî û Îraqê, ji ber vê yekê aloziyên naverokî ranawestin bi hebûna ceng û sertiya siyasî û rûkirina cemaweran berve diljêçûnê.**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Girtinheviyên rehî têne nûkirin bi nûbûna roparta rêncbûyî û hajûtandî li ser işkiyê ji bo berdewamkirina desthilatê li ser hesabê xwestekên takekesan ji jiyaneke xweş û baş ve wek cîhana şarnişînê.**

**Ev yek me dehf dide pirsînê li ser kesê berpirs ji girsbûna vê girtinheviyê û nûjenkirina wê bi derbasbûna deman ve bê ku li ser bête rawestandin û çareyekê jêre jidil bête dîtin, lê em berjorkirinek û tîjandineke rehî timî dibînin bi encamê wê ve zêde qeliş û heldêr rûdidin ji rewşa mandelekirin  û paşguhkirinê ve, ev yeka tûnêlekî tarî û şaxdayî saz kir, di eywanên desthilat û cemaweran de û hewildanên desthilatê ji berdewamiyê re li ser şopa pêşiyên xwe berve avakirina bermaya serkotkirina rêbazbûyî.**

**Ev pêdara tundirew li hember serkotkirina tundirew e, mîna rêbazeke sirûştiye takekes li ser diçin ji bo rabûna xwe û armanckirina rizgariyê li hember zorkariya bê hampa, li gel wê zanyar bergiriyê li hember dijminê derve û hundir dikin, hewildana berzbûnê bi cil û bergê berger ve ji nirxê zanînê re tevî pêşbirka desthilatê û surişta derketinê û pîrozkirina serok li ser hejmara kesên dixebitin bi hemî dilsozî û pakî ji bo piştgiriya naveroka doza ên pê ew bawer dibin .**

**Ew dikevin û radibin û hebûna xwe piştrast dikin mîna komekî zordayî tevî pêkanînên xwe yên şeromk û hindik hundirê tevgerên ên li hember desthilatên milhûr radiwestin, herwiha ew şaneyên razayî ne hundirê**

cemawerên ên rastî paşguhkirinê tên li ser dirêjî deverên Rojhilata navîn û li cihên ên têde sîstema totelîter serwer e.

Ew çalak dibin li gorî aloziyan, dibînin ji parastina destketiyan ên sazbûn e bi derbasbûna serdeman ve pêdiviyeke zanyarî qayîm e , dibe bîngeha hevgirtina civakan û hevjiyana wan bin siha civaka rabûyî xuya dibe di dema hingeme û xwînê de ta bikeve cihê civaka qirbûyî ,yê ji çanda desthilata fermandar û dijber mêtibû , herdû jî çanda dûrxistinê kedî dikin û ji roparta netewî a ragehî vedixun.

Ev yeka diyar dike ji rengên sîstemên serkotker li ser giyanê cemaweran li ser dirêjî deverên Rojhilata navîn û welatên ên bi zimanê Erebî diaxivin.

Ev ricîm bûn mîna pasvan û cîgirekî ji bo parastina paşveçûna ramanî, siyasî û aborî û beşbirekî rewa ji gendeliyê re çax dû çaxekî.

Li gel wê em rojhilata navîn dibînin bi berzbûna têkoşîna gelê Kurdistanê mîna lêvrêjekê ji cengên navxweyî re, nayên seknandin bi sedema xwestinên kesên sûdwergirtî ên herêmî û navdewletî ve,mayîna wê meydana cengeke bîrdozî di kokên xwe de ji aloziyên herdû cengên cîhanî re vedigerin, ên bîçimên çerxa bîstan nuxumandibûn, li gel wê em bi sonda Eteturkî 1 biramin, ên li dora wê şagirtan her sibehê diciviyan, ta bi hevdû re wêna bixwînin:

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**( Ez Tirk im, rûmetdar û xebatkar im, nimûneya min parastina kesê bi çûk e û rêzgirtina kesê mezin e, taku ez ji welat û netewa xwe bêhtirî xwe hez bikim, armanca min rabûn û pêşveçûn e, ey Eteturkê gewre, ez sond bi çûna li pêş dixum, li rêya ku te ji me re duz kiribû û vekiribû û pêkanîna armancên ên te ji me re danîbûn, wê hebûna min ji bo wêzimkariya hebûna Tirkiyê de be, çendîn ew şad e yê dibêje ez Tirk im.)**

**Bin siha vê nemûnebûna bêgur em hewildan û jimirnebûna desthilatê ji nezanîkirin û bumbekirina civakên xwe dibînin, bi rêya rûtkirina nirxên sirûştî ji naverokên xwe ve û guhertina wêna li gorî rastiya wê bêgurbûnê û desteberkirina cemawer ta bibin kerî li dor peykerê yê zordar xwedî dike bizîvirin, guherandina welêt ew deverê dagirbûyî bi derbasbûna qonaxan ve taku bibe meydana girtinheviya bê dawî , mirovan bi baş û ne baş û şad û ne şadê xwe ve têkdibe, berhinde cemaweran bi pîrozbûn û alîgirtinan ve dorpêçbûyî ne, ev dibe kelema herî metirsîdar li hember demukratîbûn û xweşiyê, bawerî bi nijadperestiyê ve û belavbûna wê rêya desthilatên milhûr in ji bo têkbirina gellan bi aloziyan ve, taku pûç bimînin û dûrî dema niha û pêşerojê bin.**

-------------

**1- Mustefa Kemal Eteturk: 19.05.1881- 10.11.1938 serokê komara Tirkiyê ye 1923- 1938 , ew dameznerê Tirkiya nûjen e, rêberê tevgera Tirkiya yê niştîman e yê piştî cenga cîhaniya duyem rûda, bi encamê artêşa Yonanîstanê binkeft di cenga Tirkî – Yonanî de 1922, piştî vekişîna hêzên alîgiran ji erdên Tirkî ve Enqere bû paytext, û komara Tirkiya a nûjen hatibû damezrandin, cihnişîna Islamî hatibû têkbirin û zanistdariya dewletê hatibû raghandin, ew zanistdar û netewperest bû, siyaset û tewriyên wî bi navê Kemalîzmê hat e naskirin.**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**Bi vî rengî civak nikarin bi hevdû re bijîn ji ber ku nirxên nijadperestî a desthilatê bi derbasbûna dîrokê bûn olekî pîroz û mebesta min bi gelên dirindî ew nijadên fermandar in ên bibûn riwê rastîn ji Rojhilata navîn re, desthilatên dîrokî gerentî dabûn ku cemaweran bikin êzing ji cengên navxweyî re berdewam şaxdayî dibin ji bo ew koçberî û babidestî ji nirxên zanîn û şaristaniyê ve diyar bikin , ên zanyaran ji kevin ve wek mizgînî dabûn.**

**Ev dûrgeşteke ne hemta ye di navbera gellekî naxwaze neman û winda be û desthilateke rehî xwe dike her tiştî, li erdnîgariyeke bi xwîn, işkî, guhertina demugrafîk û weşandina tirsê xwe berfireh kiribû, herwiha artêşkirina bijardeyên barketî mîna parizvanê gundan li hember bijardeya ya ji bo azadiyê û rakirina milhûriya civakî şer dike, di rewşên jiyana işk de hinirên takekesan belawela dibin û civak jihevdikeve, berhinde dewleta totelîter sûdê ji hebûna paşguhkirin, serkotkirin û azarkirinê dibîne ji berjewendiya rabûna berxweran ji kesên xwedî erd ve li gundewarên Kurdistana bakûr, desthilata leşgerî serweriya xwe li ser movikên jiyanê li Tirkî û Kurdistanê danîbû, têkoşîna zanyaran ya zehmet li gorî rehniya van rikberiyan hêmin nabe di warê siyasî an leşgerî de bi rêya lêketinê bi dadgehên soraxvana kemalîzmî a tundirew ve, li gel wê em zanyarê Tirk Ismaîl Bêşekcî 1 bînin ziman ê di sala 1971 de hatibû binçavkirin ji ber ku bindestiya Kurdistanê şermezar kiribû .**

**Herwiha zanyarê Kurdistanî Yeşar Kemal 1 ê kiryarên desthilata Kemalî dermafê Kurdistaniyan mehnegirtibû li**

**gel wê di Adara sala 1996 de hatibû dadgehkirin, bi encamê ve ketibû zîndanê û di vê derbarê de gotibû: ( Di vî welatî de ne demukratîbûn û ne yase heye.) herwiha bûyera zîndankirina berlementera Kurdistanî Leyla Zana ji ber ku sonda xwe ya zagonî bi herdû zimanan Tirkî û Kurdî gotibû, ev lêketina sert di navbera parastvanên leşgerîbûna a nijadperestiya Tirkî ve ye a bergekirî li hember çi kesekî Kurd bi armanca jêbirin û pişaftinê nasnameyê û tunekirina nîşanên cidabûna pêkhateyan li Kurdistan û Tirkî , ji ber koçberiya xweser ne babeteke bi takekes û cîhanên wî ya taybet ve tenê girêdayî ye, lê ew zorenga li ser erdnîgariyê nîşanên penaberiyê di navbera takekesan de nîgar dike, wana dixe di xelekên girtinheviyê de.**

**Siyaseta erda sotî a ku dewleta Tirk birêve biribû bi sotina gundan û bumbebarankirina wana mîna ziwakirina deryayê ji bo qedandina masiyan.**

-------------------------

**1- Kesayetên Tirkî yên piştgiriya kêşeya Kurdî kirin, xebatker û Ekadîmisyen Ismail Bêşekcî di sala 1939- 1961 de, lêkolîneke meydanî li ser zimanê Kurdan û dîroka wan kiribû.**

**Masî ew xelkê wê erdê û şoreşgerên wê ne, ji ber vê tîbûn, birçîbûn û mirin kona xwe li Kurdistana bakûr vegirt , ji bo kuştina masiyan, wêrankirina naveroka binî ya Kurdistanê, taku di perîşaniyeke dijwar de bimîne, ligel kêmaniyeke diyar ji guzarîkirinan ve, herwiha dewlet bermayên dîrokî (Hesekêf) 2 wek nimûne wêrankiribû, ji bo têkbirina ked û destketiyên zanyarên pêşîn ên li Mezopotamiyayê jiyabûn.**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**Cenga ji bo azadiyê nasekine, seyrana hewildanê ji bo jiyaneke baştir bi metirsiyên bi ziyan ve û zehmetiyên girs ve girêdayî ye, nexasim ku girtinheviyên xwînî pêvajoka takekesan bi aliyê jiyaneke baştir ve zehmet û nepenî dike, nasîna henas ne tiştekî hêsan e bin siha hebûna sedemên rehetî û xweşiyê, lê ew ezmûn di çarçoveya girêktirîn rewş de pêktê , herwiha çêdibe naskirina xwesera takekesî ji nêzik ve bi rêya lêketina wê bi kelem û talîzokan ve, li gel wê Cêrmî Bintam 3 di xweşî û êş de dibîne mîna du rûdaneke babetî, lê Markîz Dî Sad 4 dibîne ku êş xwedan rewişt e, çaxa mirov rewşa ewlehî û saxlemiya tebatî winda dike, li rê ne digere ji bo pê sersaxiya xwe bike.**

**Em li vir dibînin dermanê koçberîbûnê di rûbirûbûna giştî de ye ji desthilata serkotker re û lawaziya berzbûyî di jiyaneke bi tirsê ve girêdayî.**

------------------

**1- Kemal Sadiq Çûkcelî (Çûkcelî ji rengê Hêşinê Ezmanî ye) ew romannivîsekî Kurd e nivîskar û çîroknivîs e, rojbûn di sala 1923 de, ew yekemîn nivîskarekî Kurd e ji bo xelata Nûbil di wêjeyê de hatibû hilbijartin, di 28 Sibatê sala 2015 de koça xwe kiribû.**
**2- Bajarê Hesekêfê yek ji kevintirîn bajarên cîhanê ye, dîroka wî vedigere nêzikî 12 hezar sal.**
**3- Cêrmî Bintam: di navbera 15 Sibatê 1748 û 6 Hizêranê 1832 de jiyabû, ew zanistvanê zagonê ye û bîrnasekî Ingilîzî ye û çaksazekî yasayî û civakî ye.**
**4- Donata Elfûns Firanswa Dî Sad ( 2 Hizêran 1740- 2 Berçele 1814) şoreşgerekî Ferensî ye her wiha romannivîs e.**

# Zanyar û kêşeya azadiyê

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Can Cak Rûso di pêşgotina pirtûka xwe de (Hevpeymana civakî) dibêje :**
**( Mirov azad za lê tevî vê yekê ew di bask û bendan de ye li her cihî.)**

**Naxwe em Hinekî bipirsin, azadî çi ye?!**
**Lihevpirsîneke kevin e, kevinê diravbûn û desthilatê , destpêkirina zorengên xwînî li gel wê daçikîn ta bibû kêşeya azadiyê, li cîhana siyasetê hatibû ajotin mîna rageheke siyasî û aborî (Lîbralîzim).**

**Xortên derketî bi navê wê ve serxweş bibûn, bi rêya bangeşiya partiyên şoreşgerî (Çepgir) û geh jî bi rêya vexwendinê ji bo sînordarkirina koletiya sermedarî .**

**Ev bangeşî milyonên xelkê kuştibû, bi rêya cengên ên ala azadiyê hildabûn, lê azadî dîtina rêyên xweşiya hevbeş e bi rêya wê hişê zanyarî dikare rabûnên şadiyê biafirîne, ji kevin ve ceng bihaneyên gelek standin ji bo parastina desthilatê an erdê, azadiya a bibû sihekê bin wê bijardeyên serkotbûyî radiwestiyan ji bo bergiriyê, li rex desthilata a alîgirên wê bin siha wê sekinîn ji bo destên xwe deynin li ser erdan û şahînşahiyan berfereh bikin, ev yeka pêş ket ta gîha dema niha bi avakirina şahînşahiyên teknûlojî û medyeyî ve û artêşkirina xortan di rêxistinên teror de bi rêya berferhkirina çata aloziyên aborî ên pencikên xwe di ewlehiyên dewletan û aboriyên wê de xistibûn.**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Di navbera cenga ji bo azadiyê û cenga ji bo desthilatiyê kêşeyeke rastîn e li ser rêza xwestinên netewan berve xweşiyê û pêkanîna hêzên jiyanperestî û giyanî , herdû riwên pêrgîbûyî encamên ciyawaz pêktînin ,di navbera qayimkirina erêniyan û neyîniyan de di eynî demekê de xwe dixingilînin.**

**Cengên nûjen ên bi rengê azadiyê û rizgarkirina netewî ve hatibûn e bergekirin zirneyên netewî û ragehî berhemdabûn, bi navekî din ve hatibûn e veguhêztin armanca wê rizgarkirina ji wan zirneyan, bi rêya qonaxa buhara Erebî ve a şîn û işk şewitandibû , van gellan ji sengera bergiriyê ji desthilatê ve li hember mêtinger ta sengera hilkişandina desthilatê ji ber ku ew mêtinger û berekar e ji her mafî re vegûhêztibû.**

**Li gel wê desthilatên milhûr berhem in ji temareke ramanî û koçberiyeke giştî re ji çi tiştê ku diqewime, hebûna wê berdewamkirin e ji cîgirbûna bêkariya ramandinê re û hestbûna bi pêdiviya rûbirûbûna kêmaniyên ên ji jêvebûna naverokên civakî û windabûna nîşanên wê ve encamdan, bi rêya pejirandina tewriya pîlanê an batîkirina wê bi rêya bawerbûna bi rageha azadiyê ve.**

**Berhinde tevgerên şoreşgerî, olî, netewî û hişê zanyarî ji ser alîgirên xwe rakiribûn û wana li meydanên girtinheviyê mîna koleyan rêvebiribûn, wana hîştibûn li sawêran bigerin, giyanê pîrozkirin û limêjkariya kesan derxistibûn li gel şîrovekirineke bêber ji sermedariyê re ta sehewdanekî bimîne , têgihiştina wê bi babetîbûn û zelelî bête**

**qedexekirin tenê li gorî hişmendiya tewrîvanên wê, bi vaceke bergekirî bi nemûneyekî boş ve, her hişekî an ramaneke azad dibêje na tê gunokirin.**

**Ew pîlexwariya sosiyalîst e yê civakan di şikeftên gêjbûn û tenahiya ramanî de hîştibû, taku ji cîhanê û destkeftiyên zanyaran dûrbikevin.**

**Zanyar ji taybetiya zanînê mîna destikekê dibînin ku dikare badanka sawêrên bîrdozî a req jêbike û vexwendina ji cîhangeriya afirandin û rabûnê re, dewsa pepûkiya sloganan û baweriya bi ramanên bi metirsiyên xwe ve ne kêmî biveya derdestkirina olî bi komek durişm û reweşt ve , ji ber vê azadî bi rengê xwe ya rastîn ve xwestekeke civakî ramaniye bi rêya vekirina rê ji ekranên peywendiyê re di navbera hemî bijardeyên civakan de, ne tenê sloganeke behrîneye fereh e armanc jê artêşkirin,pertalkirin, kedxwarî û cemkirin e li ser xwestekên rewa, û duristkirina dûrxistinê bi rêya şêwazên çendane mîna lîstina bi zagonê ve , li gel wê azadî li Rojhilata navîn bûye girawa xefkê ricîmên totelîter , ên tenê rewrewkan pêşkêşî gellan kirin, bi rêya strandina xwe ji durişman re ên ramandina rexnî li cem bijardeyên ciwan betal kiribûn, bi rêya danîna rêbazên nezanîkirinê û westandina xortan bi bêkariyê ve, taku kedekî afrênerî asta jiyanê pêşde bibe nekin.**

**Û zanyarên ne liyangirtî ne ji tewşiyên desthilata nezanîker ve, ew azadiyê naskirin bi rêya kanînbûna wan ku tiştan ji hevdû ve cuda bikin û biafirînin ,bi dîtina berdêlan û**

**çareserkirina diyarde û kêmasiyên cuda hundirê bijardeyên civakê bi sedema fişara malgirtinê ve.**

**Bi rêya diyarkirina tegeha azadiyê ve û rakirina bask ji ser mêjiyê ,herwiha piştrastkirina azadiya mêr û jinê, hew pertalkirina jinê û kedxwarîkirina wê bin bangeşpêça rizgarkirina wê.**

**Û qey aloziyên Rojhilata navîn û cîhana Erebî û hinek têgehên wê yên bi reweşt û reftarên olî ve girêdayî ,şêweya xwe yê siyasî ji girêdana xwe bi fermandariya xwe yê milhûr ve distîne û derxistina aloziyên hundirîn ji derve re ( Bazirganî bi pirsgirêka Felestîn û bikaranîna wê mîna destikekê ji bo hebûna li desthilatiyê û derketina bi dîmenê parizvanê paşmêr ve) an (Êrîşbirina li ser kêlek wekî dema Seddam Hissên di cenga xwe de bi Îranê re û talankirina Kiwêtê) an ( Destwerdana Îranê û piştgiriya wê ji komên ragehî re li Sûrî, Îraq,Yemen û Libnanê û piştgiriya wê ji tevgera Hemas re li hember Israîlê) an ( Berferehbûna Tirkî û ricîma Erdoxan li Sûrî,Îraq û Lîbiya yê û destwerdana wê ji girtinheviya Ermenî û Ezrebîcanî re.)**

**li gel wê nezanîkirin :rê vedike ji berdewamkirina milhûrî û kedxwariyê re, bikurtiya aloziyan bi destêkelkirina mêrên siyasetê ligel mêrên ol û aboriyê ve ji bo parvekirina hatinên giştî ên ew komên pêdiviyên gelan in û pariyên wê ne, berhinde serdestkirina mêrên qezencê ji ewlehiya civakê re ji bo parastina desthilatê û pêkanîna qezencên diravî li ser hijmara pêdiviyên piraniyan in.**

---

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**Ji ber ku pêwîstiya sazîkirina desteyên zanyarî sazmanî ji bo rûbirûbûna nexweşiyên desthilatî dibû pêdiviyeke tam ji bo rawestandina cengan û girtinheviyên navxweyî û bihevketinên ragehî û partîtî û rawestandina gendeliya kargerandî.**

**Despakiya ya ku li ser milê jina zanyar hatibû danîn ku nebe çêker û alavê mêrê desthilatdar û nebe hevparê çewtiyên wî di pîrozkirina gemarbûnê de.**

**Têkbirina girêdana mêyatî ji mêr re ew rêya jinavbirina giyanê desthilatiye li cem , berdana binemaya beşdarbûyînê di jiyanê de ew vegereke xuristiye ji nirxên şaristaniyê re û çêkirina biryara hevbeş di nav herdû zayendan de ew mîna vegerandina çalakirinê ji nirxên jiyanê re ji malbatê pêşî ve derbasî navendên jiyana siyasî, aborî, rewşenbîrî û leşgerî, ew nîşaneke ji raperînê re li hember bermayên malgirtin, dûrxistin û duriwtiyê , ji ber parastina nirxên sirûştî erka mêr û jinê ye ji damezrandina civaka xuristî re ê li ser serweriya zagona sivîlî hatibû avakirin.**

**Serkeftina jina zanyar diyar dibe bi rêya bikaranîna wê ji çeka bedewbûna xuristî re ê ji kanebûnên wê ve dertê û sirûşt ev yeka dabûyêkî û çeka ramana ronakbîr bi bergiriyê li ser xwe ,mêr û zarokan ve, ji bo nebin qurbana paşguhkirin, meznayî û koçberiyê.**

**Û avakirina civaka zanyar ew bişanhildaneke ji azadiyê re mîna nirxeke sirûştî ne ji bo çêkirina ricîma mafiyayî û**

**razandina gellan û sawkirina wan û zêdekirina zordarî û nezanîkirinê.**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e felsefeyeke rêça civaka dayikî berdewam dike bi taybetmendî û navdariyên xwe ve û dirêjiyeke ji serdemên şaristaniyê re, dema jina zanyar li pêş komeke girs ji şagirtan ve radiwestiya ji bo tewriyên gerûdnî wan fêr bike ê ku behsa Betlîmus û zanistên wî di gerdûnê de û zivîrandina erdê dike, ew jina zanyar bi ser navê Hîpatiya 1, ya bibû yek ji qurbaniya işkbûna dêrî ve di wê demê de, di serdema wê pirtûkxaneya Iskenderiya hatibû şewitandin, a di wî çaxî de hezarên pirtûkên ronakbîrî hembêz kiribû.**

**Û zanyar îro di serdemeke mîna reşiya berê disekinin, li gel wê civakên Rojhilatnavînî ketibûn e di nav sindana serkotkirina ricîmên milhûr û çakûça tundrewiya Islamî û nezanîkirina ragehî de , em nîşanên geşepêdana zanyarî dibînin di hebûna jin û mêr de bi hevdû re li Rojava û başûrê Kurdistanê, ji ber karîbûn hinek ji nîşanên rabûna zanyarî bidin xuyanîkirin bi avakrina raperîna hizrî, berhinde zanyar bawer dibin ku pêşesazîkirina çarenivîsê ew ji pêşesazîkirina azadiyê ve ye bi rengê wê ya giştî ve û ew kilîta hevgihîştina gellan e li ser bîngeheke zanyarî hebûnê diparêze.**

-----------------

**1- Hîpatiya ya Skenderî 350-370 berî zayînê ew feylesofeke bi felsefeya Efletonî ya nûjenbûyî ve taybetmend bû, ew yekemîn jin e di dîrokê de navê wê wek zanistdareke bîrkariyê hatibû naskirin wekû ku di fêrkariya felsefe û feleknasînê de çeys bû.**

# Zanyar û partiyên totelîter

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Zanyar di rewiştê de dibînin  ku ew binemaya herî bilind e ji têgihiştina zanînê re, ew bişanhildaneke ji hezkirinê re, ji evînê dibişkive mîna xwedayekê ji çi nirxekî rewiştî re, rewişta ên partiyên gelemperatî ji xwe re dikin rêbazekê ewa li gorî zanyaran tenê hinek yaseyên peykerî ne armanca wan bi wan reweştan ve valakirina naveroka takekesê endam e, ta tenê mirovekî ji çi vîneke zanyarî rewiştî ve rût bimîne,ta jîndarekî kedîkirî be  bi stûxwarî ve nêzî binemayên partiyê bibe bê ku ji xwe re guman bibe ji çi benemayekê ve ew ji xwe re dibîne nemûneyekî nemir, ji ber vê yekê partiyên totelîter dixebitin ji bo  valakirina naveroka takekes û alîgirên xwe ji vîna zanyarî û evîna xuristî ve, ta tenê bawer bibin ku çi rewişt jorî rewiştê partiya wan nîne û ti azadî ji derveyê partiyê ve nîne , bi vî awayî partiyên gelemperatî dixebitîn li ser binpêkirina rewişta bilind û vîna zanyarî û ew hêdî hêdî têkbiribûn bi rêya pêşkêşkirina nimûneyên boş mîna : Mirovê partîhezê rastîn, partîvanê netewî, partîvanê şoreşger, partîvanê sosiyalîst, partîvanê Lîbralîst, olî, navnetewî, û ji bilî wan ji pergalên totelîter ên bê lebat û bê tevger, ji ber vê yekê em bi pergalê totelîterî ve mijol dibin û dighên encamekê ku ew nimûneya herî  navendî û girtiye bi derbasbûna dîrokê ve, li gel wê takekesê partîhez ê totelîter takekesekî stûxwar û reben e, jinê di partiyê de dema dev ji nirxên xwe yên takekesî berdide jineke durist û pak e bi bihaneya ku azadiya takekes bi azadiya civakê ve diqede, dighe asta ku her tiştî bide ta bibe urispî an ajaneke stûxwar, wisa partiyên gelemper mirovan dikirin û difroşin ta bibin alavekê, ji ber şehnaziya giyanî û naverokî li gorî dîtina**

**alîgiran di partiyê de ye ne di takekesan de, ewên bi maf û taybetmendiyên xwe ve û erkên zanyarî ên li ser wan , hevjînê keça Karil Markis jiyana xwe bidawî kiribû û Lînên 1 yek ji serwerên sosialîzma avabûyî di derbarê wê de wisa axivî û go : (Mirovê sosialîst a partiya xwe ye, mafê wî nîne jiyana xwe bi dawî bike.)**

**Hişmendiya totelîter nepeniye li paş wê armanc û berjewendî vedişêre tenê bijardeya bilind sûdê jê digre, a vê sîstema durrû birêve dibe û berpirsî lê dike, em dibînin ricîmên totelîter mîna Çîn û Koriyaya bakûr çawa xwe di tenahiyeke siyasî de hîştin û siyseta birçîbûn û dorpêçkirinê li ser gellên xwe pêkanîbûn,taku wê sînorê di navbera xwe û derdorê de biafirîne, kiryarên wê nehêne dimînin.**

-------------

**1-Filadîmêr Ilitiş Lînên di sala 22 Nîsanê 1870 de jidayik bû û di 21 çele sala 1924 de koça xwe kir şoreşgerekî Rosî Marksî bû, rageha Lînênî ya siyasî damezrandibû.**
**2- paqijkirina Partiya Baes di sala 1979 de bi sernavê komkûjiya hevalan , serokê komara Îraqê birêve biribû di 22 Tîrmehê sala 1979 de piştî binkeftina yekbûnê di navbera herdû baskên partiya Baes bi serkêşiya serokê sûrî ya berê Hafiz El Esed û serokê Îraqê yê berê Ehmed Hesen El bekir.**

**Bijardeya karker timî bê beranber dixibite û rastî gefxwarinê tê , parî nan û karê wê dikeve metirsiyê, di tirs û bizdanekê de dimîne , dema Seddam Hisên desthilatiyê bi destxwexist rabû dest bi komkûjiya hola Elxild kir 2 di sala 1979 de, hevalên xwe qirkiribû bin bihaneyên pûç ji bo ji berkepên xwe xelas bibe.**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Xwedî dîtin û helwestan bi pêşdebirina kesên derewker ve li ser wêrekan ên hewil didan partiyê di naverokê xwe de pêşdixînin bi rêya girtina wan bi guhertin û çaksaziyê ve, bê guman ev yeka bi dewlet û serwerên wê ve girêdayî ne.**

**Wisa em dibînin berjewendî û bîrdozî herdû dixebitin ji bo lawazkirina hişmendiya endamê partiyê ta bibe bê vîn ji bo karguzariya rewiştên bîrdozî a rêjeyî ên partiya totelîter wê dibîne mîna nirxên xwedawendî nayên gotûbêjkirin an gumanpêkirin, ji ber wateya vê yekê derketin e ji rêya partiyê ve, ji ber vê yekê vîna takekes tenê ji bo parastina berjewendiyên partiyê ne û têkbirina hatinrêza mirovî bi rêya neyarkirina wê.**

**Ev girtinhevî di navbera pasvanê kevin û vexwenderên guhertinê de di her çaxî de berdewam e, ji ber vê yekê piranî tofên partîhez bi koratî û bi şehnazî ve bergiriyê dikin ji bo parastina nezanîbûn û paşdemayînê bi paşguhkirina hişmenda rexinegir ve û gotûbêja avaker û dan û standinê, ji ber ku rexne û hişmendiya avaker tiştê nû derdixîne meydanê di her astî de û pîvanên rewiştî di siyasta rêxistinên gelemperatî hêdî hêdî êdî diçe bi rêya dan û standina xwe yê kirêt ve bi gellên xwe re, ew siyaset sawêr dibe ku bi rastî dikare bihêle cemaweran û alîgirên xwe mîna şagirtên tembelhizr , dijiminên xwe yê hundirîn her zêde dikirin, li gel wê alîgir di nav refên rêxistinê dest bi nandoziyê dikin ta endîza wê rêxistinê daxur bibe û avahiyên xwe bête derizandin, herwiha jî rolên nirxî hundirê cemaweran belawela dibin, hestên bê baweriyê di**

**nava civakê de belav dibin, bê guman ziyankarê rastîn ew civak e ,mîna parîpariyê di nav vê hingemeyê de diyar dibe.**

**Armanca herî bilind ji mirovê nû re yê divê ji xwe re bike nimûneyekê mîna girêdana wî bi hêz û şehnaziyê ve ew di zanîna rêxistinkirî de ye.**
**Ji ber ku şêwaza komê partîhez tenê ji bo wêzimkariya tofê herî hindik û girêdayî ye, ev yeka li ser hijmara beşê parizvan e ji partî û binemayên wê re , ji ber vê yekê kom bi giştî ve du tof in:**

**-Tofê qayim ya bi bîngehên partî û binemayên wê ve girêdyî, ew tof rastî zehmetirîn fişar tê ji gefxwarina bi kuştinê ve an daxistina pileyê û cihê rêxistinî û neyarkirin, reşkirin an dûrkirinê.**

**-Tofê dûvdehol ê di partiyê de ciyawazîtiyekê dibîne û berjewendiyên wê yên diravî a keysbazî têde tê parastin ji bo zêdebûna xweşî û dewlemendiya wê.**

**Ew tof xurt e , li ser hevdû ve binpêkirinên xwe vedişêrên, alîgirên guhertinê nikarên refên wê derbas bikin, ji ber ku guhertin ne ji berjewendiya wê ye, ji ber ku çi rêxistin an dewlet dema ava dibe têde girtinheviya heyînî di navbera parizvanî û guhertinê de çêdibe, herwiha di navbera resenî û pêşveçûnê , vebûn û girtîbûnê de, bi vî rengî ve binemayên partiyê dibin mîna depên bê can nayên guhertin .**

---

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Em meyze dikin metirsiya vê tofê ku bandorê xwe li ser dezgeha bilind ji partiyê ve dike û dibe sedemekê ji hebûna partiyê re ji bo berdewamkirina qezencê û zêdekirina nezanîkirina xelkê û hişbirkirina wê dirêjtir dem, ev yeka di pergalên partiyên totelîter de bi rengekî taybet ve diyar dibe.**

**Zanyar xwe bilindtir dibînin ji xwestina berjewendiyan ve bi heman ast û rengên wê ve , ji ber ku zanebûn ew berjewendiya bilind e ên zanyar ji bo wergirtina wê dikevin e pêşbirkê, herwisa selîqeya partîtiyê yê ji rengê partiyê ve û şêweya dan û standinê wê derketî ew ji reweştên nezanî ,windabûn û girtîbûnê ve ne, zanîn bi mirov ve hewil dide ku berve rêxistina xuristî ve biçe.**

**Zanyar hebûna xwe ji bo zanînê dijîn, ji ber ku wê wek nameya xwe yê sirûştî dibînin, yê çi kedxwarekî dilreş an nezanekî nikare biçewsîne, di zanînê de tundirewî peyda nabe, lê tundirewî dikeve di olan de û serkêşiya wê kesên tundirew dikarin bikin, zanîn mîna ramana netewî ya nijadî an erdnîgarî nabe, û nijadperestî an şofînizmî nakeve hundirê wê,mîna ketina wê di nav rêxistinên partîtî ya netewî û navnetewî de, an di pêşdemiya olî de, ji ber ku zanîn bi rewşa wê ya xuristî bilindbûn û serketin e dûrî desthilatiya netew,ol, rageh û nijadan, ol di rewşa xwe ya xuristî de tenê peywendiya mirov ya rewiştî ye bi ya din re ji bo xwedê ango Evîn.**

**Netewbûn di rewşa xwe ya sirûştî zanyarî de girêdana takekes bi komê ve ye ji bo hebûna taybetmendî,**

nirx,reweşt, ziman û dîrokê, zanîn van taybetmendiyan û nirxên hevbeş betal nake, ji ber ew zemîna civakî ne ji pêşveçûna civakan re li gorî berketin û pêşveçûna wan berve zanînê.

Zanyar lîstina bi olan ve nevîtî dike ji ber  ol nûnertiya peywendiya giyan bi ezmên re dike, û şofînîbûna netewî nevêtî dike ji ber ew reşkirina rastiyan e û biçûkirina rola koman e ji bo pêşvexistina taybetmendiyan û geşkirina jiyana azad, zanîn bîngeha derketina ramanên pak e , ew dihêle mirov nêzî jiyanê bibe bi berketîbûn û gehîbûn ve

Partîhezî mirov dihêle ji hewaya azadiya zelal ve bê par bimîne û bibe dîlê hinek zanyariyên ên xwediyên bîrdoziyan li dor wê rûdinin, xwe bi parçeyên kêşeyan ve dorpêç dikin.

Zanyar rewiştê di hundirê zanînê de dibînin,  maf û erkên civakî ji mirov re mîna bîngehên qayîm  in ji çi avabûneke zanyarî re ji bo pêkanîna pileyên herî bilind ji şadî û xêrê ji mirovahiyê re bin siha hebûneke gulgulî û bi pêşve diçe, heyîneke zanyar wê pîroz dibînin, wê dibînin jiyana gerentor ji xweşiya mirov û azadbûna wî re ji alavên pêşesazîkirina mirin, gemarbûn û tundiya xwînî ve.

Zanîna xuristî têrbûneke tekûz e bin siha  cûrebûna komên cuda ên bawer dibin bi sirûşta hevjînbûyî li  hebûnê .

Barê zanyar giran e ji ber ku gizorîbûna evîn û zanistê nameyeke pêşîn e li ser milê kesê berketî û ramanyar ji ber

**ew tenê bedewbûn û nirxê maf û xêrê dizane kar dike ji bo parastina hebûn û evînê bi rêya gera henas li tiştê wê dihêle li pêş hebûna lihevhatî bilind bibe.**

**Zorenga mirov bi nezaniyê re dirêj û tal e û hevgirtina zanyaran û yekîtiya wan hêzeke dikare afirandinê biafirîne û berdewam zindî bihêle bi derbaskirina peykera a ku di pergalê partiya totelîter de heyî û şerê sîstema nezanîbûna belavbûyî di nav de  û hestbûna bilind bi bedewbûna heyînê ve bi rêya welêt ve û gerentîbûna wergirtina pêkhateyan bi bilindtir mafên xwe ve, ji ber ku welat hebûn e û hebûna giştî ew welatê zanyaran  a mezin e.**

# Zanyar û kêşeya pîrozbûnê

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Netewîbûn ji berhema hestekî komiye bi pêdiviya civînê ve, pêdivî misoger ji sedemên zehmet an sirûştî ve encam didin, mîna hestbûna bi sitemkariyî û nijadpersetiyê ve an xwesteka pêkanîna berjewendiyên pêwîst û bi encama zorengên xwînî ve têgehên netewî rêzimanî binyad bûn, nexasim di serdema netewbûnan de li Ewrûpayê û veguhêztina wê li cîhana Erebî û Islamî.**

**Siyasetên mandelekirin, pişaftin û têkbirinê belav bûn mîna pêşveçûnekê ji zorenga êlî ve.**

**Bîrawerî bi komê ve , girîngiya wê bi hevgirtinê ve di hundirê tevina komî de pêdiviyeke xuristî ye bi rêya yekbûna ziman û dîrokê ve ji ber cîranbûn û hevjiyanbûnê di çarçoveya cîgehê de.**

**Zanyar li pêş berdana henasên wanî pêşîn mizgîniyê bi peywendiyên bêhtir xuristî û kokdayî didin ji her kesekî re bîriya evîn û zanînê dike herwiha jî vekolîna zanînê, ji ber ew di heyînê de dibînin tevina giştî û komkiriye ji mirovahiyê re, ji ber giyana çetetiyê nûnertiya rastiya jiyanê û armanca wê ya bilind nake, zanîn mîna neteweke fereh û nû dibînin ne bîrdoziyekê an olekî an ragehekê dikare wana ji hevdû dûrbixîne, ji ber ew evîn dibînin rêyeke ji zanîna heyînê re a ewa mîna lutkeya hatinrêza sirûştiye , ji ber vê yekê têgehên serxwebûn û rizgariyê û avakirina dewlet û herêman di qonaxa piştî seretayiya sirûştî de diyar bû .**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Kolekirina mirov bi rêya kedxwarkirina hinirên wî yên gewdehî ve destpêbû, ji mafên xwe ve bêpar mabû, ew mafên ku qonaxa seretayî jêre parastibû, ji dabeşkirina giştî ji destikên berhemkirinê re, wisa malgirtina taybet diyar bû û bi rengekî ne baş hatibû bikaranîn ji bo bibe tenê ji hinek tofan re li ser hijmara pepûkî û bêzariya tofên barketî ên rastî gefxwarinê hatibûn.**

**Pêdeçûna mirov bi malgirtinê ve hîşt derdên ezeziyê zêde bibin ji encamê nezanî, bê xwendin û birçîbûnê ve di heman reng û dûriyên xwe yên koçberî de,navendiya gelemperatî ji wê çaxê ve hatibû bicîkirin,ev di deroniya tofên barketî de hestên sitemkarî, koçberiya giran berz kir, li rex destpêkirina hewildanên avakirina raperînên zanyarî ji bo bidestxistina mafên rewa ên sirûştî , ew hatibûn e xwarin, pişt re tofên barketî ji têgeha netew ve û hatinrêza ji erdê re mîna destikeke dijber dîtibûn li hember gefxwarina bi koletiyê ve, têgeha netewbûnê ji bo berjewendiya koma gefbûyî bi jêbirina hatinên wê durist bû, ji ber vê yekê têgeha netewî gewretirîn şoreşeke zanyariye ji kevinê dîrokê ve û ola a di çorçoveya peywendiya takekes bi xwedê re ango hêza nepenî ew felsefeya giştiye a ku ewlehiya hebûnê li hember netebitîbûna sirûşta gerdûnî a cîhanî diparêze .**

**Ev felsefeya komî dixwaze mirov hêzdar bimîne , bi heyîna dadmendiyeke xwedayî pê girêdayî be ta sawa mirinê li ser kêm bibe , ji bo hêzbûna henasan û berdewamkirina şerên maf û rûmetê , ligel maf û rûmetê xêr zêde dibin û xweşî**

belav dibe ta mirovê zanyar nêzikî bedewbûn û şadiyê be bi hestbûna hevgirtinê bin siha komê, ji ber ku pêdeçûna di baweriyê de ziyanê dide û dibe piştgiriya zorkariyê bi şêweyên wê yên bilêvkirî, deronî û gewdehî ve.

Ev yeka nûnertiya encamê bilind dike ji zorkariya bawerî re, wateya vê yekê ku rizgarkirina ji desthilata pîrozbûnê ve mîna rikberiyeke mezin e, ji ber bi dû wê ve encamên civakî desthilatî hene, berhinde di ol de reweştên herî kêm hene ên bi rêya wê civak tê kuntrolkirin, ji ber ew ji çêja giştî re dibêje erê, ji ber vê yekê civak di warê ramanî geş nabe, bi sedema bandora olî li ser wê û ev yeka bi derbasbûna nifşan ve pê xweşdihat .

Reftarên olî ketin hundirê partî û ropartên totelîter, bîrdoziyên wan pîroz bûn wek ku ji ezmên ve bên e xwarê bi vî rengî ve pîrozbûn cîgir bû û bi ramana netewî û a çepa şoreşgerî re bû yek , berî xortan dabûn e tundirewiyê , ev yeka di tevgerên cîhadî de li ser dirêjî cîhana Erebî û Islamî de belav bû, koka diyarbûna xwe ji dîrok û çêja navçeyî ve ji wan gellan ve wergirtibû, ên baş tundirewî li dibistan, zanîngeh û mizgeftan fêr bibûn, buhara Erebî bû goristana xwedî hiniran dema bibûn êzing ji pîlanên navdewletî re, li gel wê şûnmaya girtinheviya olî tê nûkirin bi barên wê yên giran ve ji dîrokê ve, ev ji encamê girêdana mirov bi pîroziyê ve ye bi rêya deqa olî ê zehmete şoreş li hember wê bête lidarxistin, ji ber bibû derdê dijwar û har li hember çi ragehekî ronakbîr û rikber, vedixwînê ji şiyarbûna zanyarî re û çalakirina hizr ê pergalên baweriya zengirtî wêna derizandibû.

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Ji ber vê yekê şîretên olî bi giştî ve bi destê qata fermandar ve ye ê keriya civakan birêve dibir, nerîna giştî saz dikir, û gellan kuntirol dikir ên xizanî û desthilatbûnê dikşînin û bibûn lîstokekê bi navê cenga pîroz ve, cîhad û xweda, (Talanên Islamî û xaçî).**

**Bawerî berve sertiyê tê rêvebirin, ne tenê di çarçoveya pêywendiya takekesî di navbera mirov û xwedê de,li gel wê em sedan erkranên olî û ragihandinî dibînin beranberî tevgerên olî çi veşartî û çi çalak têne birêvebirin li gor xwestinên kesên serwer, li gel wê hebûna mîkrûba baweriyê bikartînin, bi kûrahî û rêk û pêk ve derbasbûn e li hundirê hişên tofên civakê , bi rêya hebûna wê xort tên e artêşkirin û dehfandin ji zorengên cuda, ragihandina berçav wêna xwarin dide, eger ew bandora dîrokî li ser civakê neba wê ew hêzên ên li ser aboriyên dewletan serdest wê bihane ji cengê re bi derbasbûna dîrokê ve nedîtibana , ji ber vê yekê deqên pîroz mirovan birêve biribûn li koçberiyeke komelgî ji dema niha ve, dibûn kelem li pêş derfeta dîtina alav û rêyên sererastkirinê û rêvebirinê û hevjiyana di navbera mirovan de.**

**Ev deqên têr ji sertî û bizdanê vexwaribûn ne tenê bi bûyerên dîrokî ve girêdayî ne lêbelê hatibûn e belavkirin û kûr bi nîşanên wê ve hatin girêdan ta li ser taybetiyên oldaran û kiryarên wan serdest bin , li rex reftarên wana jî , li cem wan amadebûnekî suriştî peydabû ji dijminatiyê re , em tengbûna asoyê dibînin herwiha bersiva tund ê aşkere dike li ser evqasiya bandora ol li ser çêj û şêwaza jiyana**

bawermend, ji ber ew amade ne ji tundiyê re , ji ber vê yekê zanyar dixebitin li ser rizgarbûna xwedê ji têgehên mirovî ve ê bi rêya wê xwedê hat e mirovkirin bi awayekî ve ta li gor vê yekê xelk li ser sertî û diljêçûnê bên e dehfandin.

Rojhilata navîn di nav argoşa kelbetana hevgirtina dîrokî a pîroz de  ên di  navbera herdû ragehên Islamî Şîe û Sunne de û hebûna ragihandineke olî berçav rêyên girtinheviyê birêve dibe, cemawerên xort xwarin dide ji bo bimînin êzing bi rêya deqên ê xwînrijandinê pîroz dikin, mêrên ol li hember zanyaran û zanistên wana sekînin, li dijî felsefeyê derketin, bê guman ev yeka encamên wê hene li ser civak û navnetewan, civakên Islamî êdî di tenahiyekê de dûrî sivîlbûnê dijîn, bi lez  dibin qurbaniyekê ji siyasetvanên desthilatdar ve li hemî Rojhilata navîn, desthilatên serkotker di bandora olî de dîtin gerentiyekê ji serdestbûn re û hebûna li desthilatiyê , piranî deqên olî piştgiriya bişanhildana fermandariyê dikin, bihaneyên pîroz ji bo serweriya  fermandarê navendî ya totelîter didan  ji bo berdewamkirin serdestbûnê  û rewakirina gendeliya tofî.

Damezrandina jiyanê li ser bîngeha zanînê ew damezrandina mirov e bi rêya rizgarbûna wî ji nexweşiyên tevlîheviyan û desthilatiya ya bihêztir, bi vegera nirxên şaristaniyê ji nû ve, ji bîraweriyeke nû ve û jiyaneke baştir ji hemiyan re û rêxistineke bi hebûnê ve lihevhatî , rêxistinkirî û bedew  , yê jîndarê mirovî bi nirxan ve ew xwedî dike, evîn di vê derbarê de dibû xwedayekê ji hemî nirxan re mirov ji heyînê ve wergirtibû bi derbasbûna rêya wiya dirêj û zehmet ve.

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**Berdewambûna goçeriya zehmet ji mirovê şaristan re ew berdewamkirina nameya evînê û bilindkirina zanînê ye, çi avahî eger li ser tekûzbûna evîn û zanînê newe damezrandin ew avabûneke şêweyî ye mîna hilweşandinekê ye bi awayekî ji awayan ve, ji ber vê yekê pêdiviye vegera li evîn û zanînê û miqatebûna hebûnê ta jîndar hebe, tekûzkirina evînê bi rêya bicîkirina rewişta a ji mirov re destketî û bermayê wî ezber dike, ev yeka bi miqatebûna li cîgehê tê pêkanîn bi rêya rawestandina ceng û genîbûna cîgehî ve.**

**Zanyaran bawer dibin ku bedewbûn di xêrê de ye, ji ber wê dixebitin ji bo jinavbirina çavkaniyên metirsiyê, bawer dibin ku ti rev ji derbaskirina wî nîne, bedewî di xêrê de diçînin û di wan de tîrêj dide, di tiştên pûç de dibînin ku ew têne jinavbirin bi rêya dîtina ramanên sirûştî ve, ji ber vê di hinira hundirîn de dibînin ew hêviya tek e ji nûkirina henas bi zanînê ve.**

**Zanyar bi afirandinê ve li pêş dikeve, ew di afirandinê de dibîne mîna zanista sazkirina azadiyê û rêyeke nû ye ji bikaranîna alav û tiştan re başî û miqatebûna bedewbûn û nivîştê li cem aşkere dike, ew li pêş tê, bi bedewî û giyanekî pak ve berve guhertina tiştê ku dereng ma û nehate guhertin, timî bi pêdiviya bihinferehiyê ve di derxistina biryaran de bawer dibe.**

**Ew bi jiyanê ve radibe ji ber jiyan bedew e di sirûştiya xwe de, wê bedewtir dibîne dema destê xwe li ser datîne.**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**Zanyar xuristî ne ji xwestinên xwe ji jiyanê re, derbasî saziyan dibin û xwe hêja dibînin bi guhertina sazî, partî, komel û komkaran ve ta bibin navikekî nû nûnertiya giyanê hebûn , zanîn û evînê dike.**

**Ew dibînin di çi rêxistinî an sîstemeke civakî an aborî de eger zanînê ji bo evîn û hebûna giştî ji xwe re neke armanceke bilind , ew dibe mîna hêzên tarî , ji bo hingeme, tîjandin û diljêçûn û belavkirina cengan dixebite, ê bi nezanî , paşveçûn û tundirewiyê ve peywendîdar e , ev nirxên bedewbûn, xêr û mafê têkdibin.**

**Derketina zorengan bi derbasbûna dîrokê ve mirov ji taybetmendiyên xwe yên xuristî ve dûrxistin ,ewên bîngehên pêşîn in ji hebûna mirov re mîna jîndarekî azad civakî û bi zanebûnê ve girêdayî, wergirtina mirov ji hemî mafên xwe yên sirûştî û rabûna bi erkê xwe ve ji taybetmendiyên jiyankirina zanîn û evînê ne û nêzikbûna ji rastiya zanyarî ve ,yê bi yekbûna hebûnê ve tê diyarkirin.**

**Şoreşa rastîn di jiyankirina evîna sirûşî de cîgir e, ji bo hebûn û parastina wê, û baweriya rastîn bi binemaya hevjiyana aştiyane ve di navbera gellan de.**

**Kuştin ew kuştina mirovahiyê ye û birrîna başiyên wê ye û nankoriya bi destkeftiyên wê ve ye û sitemkarî mandelekirine ji jiyana xweşiyê re û hevkarî bi bobelatê re ji binpêkirina bedewbûn û niviştê ve ne ên ji nirxê rûmetê**

**ve derketî, û ev yeka ji dilsoziya mirov bi xwe re û bi a din û tev jîndaran re derdikeve.**

**Tewanbarî nezaniyeke kor e û derdekî mezintir e îro li pêşiyê lêkolîner sekiniye,ê li pêşveçûna ramanî, deronî û rewiştî digere, ji vir ve hebûn û evîn bû û zanîn jî herwiha peydabû.**

**Û erkên zanyaran pêşî ku çi kesê aramiya cîhanî û hestbûna bi reseniyê ve winda kiribe biparêzin , ji ber ew tişt di evîna sermedî û nû de heye ji jiyan, erd û komê re ê jîndaran bi hevdû ve girêdidin, hevgirtina di navbera koman de pêwîstiyeke jîndarî ye ji bo pêşveçûna bi bedewbûnê ve, û zanîn li ser yekbûna mirovahiyê dixebite taku taybetmendiyên xwe yên cuda bin siha jiyanê bijîn.**

# Zanyar û serokê nîşan

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Zanyar di zanînê de dibînin nîşaneke hêjayî zanyar e , ew di siyaseta kerî û xwedawendiya serok dibînin ku ji kêmaniyên fermandariyê ne, fermandarî û rêvebirina civakan, li gel wê civakên kevin serok mîna xwedayekî an cîgirê xwedê li ser erdê dibînin.**

**Xêzanavê mêrê bawermendan ango cîgirê pêxemberê xwedê a li ser erdê, û xêzanavê Baba nîşan e ji cîgirê Mesîh li ser erdê, piştre tewrîvanên şoreş û çaksaziyê bûn e zorkar, şoreş li ser nîşanên desthilata ol pêdivî bû ji bo vegûhêztina civakê li rewşeke sivîlî bilindtir, lê nîşanên zanistdarî ên piştî şoreşan desthilatiyê kirin ketin di eynî xefkê de, qonaxa desthilatkirina civakan bi navê netewbûn û sosiyalîzma navnetewî ve destpê kir , navdariya pîrozbûna olî hate veguhêztin û serokên wê demê fermandariyê bi awayekî zorkar ve durist kiribûn, sitemkarî civakan dehf dabû li rêyên girtî, ev yeka di qonaxa herdû cengên cîhanî de diyar bû bi hatina hêzên milhûr li rojava û veguhêztina vê rewşê li rojhilat û cîhana Erebî û Islamî mîna encamekê ji serdestbûna hêzên pêşesazî a li ser wan gellan sehwkirî .**

**Bandora neyînî ên rêberên nîşan belav kirin bi rêya hildana wan ji slogana şoreşê re û belavkirina gotina parastina dewletan ji parçebûnê ve, ev civak hîştibû di nav tirsekê de bijî, herwiha têkbirina moralî a giyanî belav bû, dema xwe li paş gotina ezberkirina serkeftin û destketiyên kesayetî veşartibûn, gotina wan ku ew destketî netewî ne, ew li pêş civakan bûn e kelemekî ji bo neghin pileyên**

**pêşveçûn û şaristaniyê û jiyankirina demukratî û wergirtina zanînê û avakirina civaka hebûnê.**

**Ol pikaranîn mîna saziyekê rê ji wana re dûz dikir ji bo rewakirin kuştin û gendeliyê, herwiha alîgirên xwe kirin çete, rola wan bû wêzimkariya tofa serkotker û gendel , şerê dengên bêpar dike.**

**Kêşeya nîşanbûna serok ji navdariya pîrozkirina olî re vediger, serok di demê kevin de mîna xwedayekî hatibû nîşandan mîna Feronê xwedawend herhiwa kesayeta Gilgamiş  li gorî efsanê nîv xwedawend û nîv mirov, li gel wê cihekî pîroz ji rêber re hebû, ew yeka hîşt têgeha girêdan û qayilbûna kor û stûxwariya giştî bicî bibe, belavbûna van têgehan û kokbûnên wan bi rêya ol û gotarbêjiyan ve , nimêjber gotarên xwe li ser serên tewandî dixwendin, ew kesên ên naramin û hişê xwe bikarnaynin lê xwe radestî yek ji zirneyên desthilatiya milhûr dikin , ew zirne dûwanderê ol e û nimêjberê wê ye, xwedawenda dayik navdariya pîrozbûnê wergirt , herwiha mêr di serdema olên ezmanî de nîşanê desthilatiyê bidest xwe xist bi pêdivîbûna ku jin pabendî fermanên wê bibe , berhinde navdariya nîşanbûnê dima heya roja îro, cihê xwe yê xwedayî li cem civakê girt, desthilaiya fermandarê Osmanî bostê herî bilind ji cihê olî a tekûz wergirt li dor wê mêrên ayendê civiyabûn,bang û axaftinên xwe li mizgeftan bi navê serdar dikirin wekî serdemên Diravbûyî , Qeyser û baronan, berhinde  ji wan re desthilatiya giştî û pîroz  hebû bi piştgiriyê Baba û şêx ve, bicîkirina hişmendiya qayilbûn û tirsê li cem xelkê  pêrewî û têgehên wê di demên dirêj de**

**û bi dû hevdû ve li ser civakan terxan kiribûn, li gel wê ew civak pîrozbûn û qayilbûn vexwaribûn, li gel wê ev tişt bû wêneyekî ji civakan re bi giştî ve çi Islamî û çi zanistdarî, lê bi hebûna zanyaran ve li navendên fermandariyê û vegûhêztina desthilatiyê û danîna rexneya dijwar ji fermandaran û rêveberiya çendane re yekaliya desthilatiyê û gelemperatiya wê têkdiçe û tirs tê jinavbirin û ew nerîna dijminane ji aliyê desthilatên paşdemayî ji gellên xwe re bidawî dibe.**

**Zanyar ji rêvebirina jiyan û saziyan ve dibînin ku pala xwe dide li ser zanînê û zanîn fêrkirina perbirsyariyan e ê ew hunera rêvebirina civakan berve rêyên jiyana baş, xweşiyan hertimî û pêşveçûna berdewam, dema civak û rêveberiyên xwe ji hişmendiya kevinşopî ve rizgar bibin di derbarê dan û standina bi desthilatî û fermandariyê re, ji ber peykeriya fermandar gellan gelek westandibû, mîna keriyan hîştibû, li gel bê ramandin an pêşveçûn an avakirinê lê nezanîbûneke bi dû hevdû ve di jiyana gelan de û derengmayîna hertimî ji şaristaniya zanyarî û pêşveçûna rewiştî ve, rêberên nîşan di sloganên hişbirî de dîtibûn mîna destikeke bi sûd ve ji bo hebûna li desthilatiyê .**

**Civak vê yekê ji wan re erê kir wekî ew xwedawend bin û piranî bi wan qayil bibin bi rengekî nezan ve ji ber xwe ji sertiya wan biparêzin ê bi dezgehên saloxgêrî ve diyar bibûn, ji vir ve erka zanyaran bicî dibe di hundirê wan naverokên civakî de taku ji dîtina pêrewî rizgar bibin li gel dan û standina wê bi jiyan û mirovan re,bi rêya bicîkirina çanda evînê ê tê naskirin bi hezkirinê di navbera lawên**

**hebûna welat û ji vir ve li hebûna mezin, bi rêya malbata sirûştî, rêvebirên milhûr bervajiyekin ji paşkîtiya rizandî re.**

**Civakan xwe pê bawer dikirin bi derbasbûna serdemên milhûrî û sertiyê ve , erka zanyaran di civakan de ku bixebitin ji bo bicîkirina rêbaza evînê li heyînê bin siha bangên ku mafên xwe dixwazin di berketin ,xweşî û afirandinê de, hiş û giyan rizgar nabin eger hişmendiya qayilbûnê newe têkdan, bi pabendîbûna dijwar ve ji felsefeya yekbûna bi hebûnê ve di nav hembêza hezkirina bîrawer de û zanîn di xwesteka baştir û bi sûdtir ve ji bo birina rêyeke rehnîbûyî ji jiyana ku ji çi pêrewî an radestbûnê ve vala dibe berve sivîlbûn û avabûnê.**

**Û evîn di rehniya felsefeya (Evîn hebûn e û hebûn zanîn e ) de ew hebûna a nûnertiya rehjena hemî jîndaran li ser pişta gerestêrkê dike, ew dara a ji wê ve hemî şaxên jiyana sirûştî û mirovî jidayik dibin.**

# Zanyar û civak

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Zanyar dibînin ku pêdiviye piştrastkirina rastiya zorengê yê di henasê mirovî de di her derbarê de tevdigere bi rêya nakokiya yê di takekes de bicî dibê ve, çendîn bawerî berfereh bibe û bi rastiya hezkirin û çakdîtinê ve dijwartir be beranberî vê yekê ezezî û kîn bicî dibe , wisa timî em nakokî di her helwest û derbarî de diyar dibînin, lê serkeftina rastîn di pêşdebirina xêra giştî de ye li ser ya taybet  û hewildana ji bo zanînê  ji ber ew bîngeha çi tevgerekî sirûştî ye, li gel wê zanyar civakê dîtibû, û jêre diyar bû ku xwebînî sedem e ji dîtina xelkê li binî ve mîna lîstok û bejinkurt , ji ber vê yekê pêdivî ye ku em ji banî ve dakevin xwarê berve çêkirina tevgerên sazmanî sivîl piştgiriyê dide ewlehî û berdewamiya civakan ji gihîştin,xweşî û saxlemiya wê ve bi aliyê mayîna bedewbûnê giştî ve yê di civak û sirûştê de û pêgirtina bi pend û babetîbûnê ve ji çûyîna bi vê pêla civakî ve berve zanînê û ev tişt zanyar dixwazin ji nifşan re bighînin û ew rawestandina li ser rastiya jiyanê ji deriyê ku ew girtinhevî ye ji bo pêşdebirina zanînê û rawestandina zorkarî û gemarbûnê ji ber herdû talan in li ser hebûnê bi giştî ve bê cudakirina bostekî ji wê ve.**

**Em dikarin desthilatiya malgirtinî hêdî hêdî cuda bikin bi rêya pêkanîna şoreşên hizrî qonaxî ve di refên cemaweran de û kêmkirina rola ricîmên yên di nakokiyên xwe de xeniqîn, bi rêya derbasbûna di saziyan de ve û pêdivî ye cudakirina maf ji erkan ve , ji ber ku dewletbûn malgirtin e û çi desthilatî bi xuristiya xwe ve malgirtin e.**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Cîhangeriya ya divê bête pêkêşkirin ewê li ser danasîna bi hinira hilbez ve li cem gelan avabûyî ye, yên li ser ragihandina taybetiya xwe dikevin e pêşbirkê, lê hêza leşgerî xwe berdabû bi destê bîrdoziyên tundiyê ve yên tewrîvanên wê rê jêre hêsantir kiribûn li pêş komên aborînasan yên li qezencê digeriyan bi rêya gefdan û pûçkirina aboriyên dewletan û afirandina aloziyan,berdêla pêşkêşkirina pirojeyên geşepêdanî yên dikarin sînorekî ji azariyên girs re deynin ji bo hinir û pêkanînan bi hevdû re beşadar bibin ji bo başkirina bajaran û ji bo avakirina hebûnekî bi hinira afirandinê ve hêzxistî ne bi wêranî û têkbirinê ve jihevketî.**

**Hişmendî eger xwe ji nirxan re bernede zehmete tiştekî biçûk di bermaya mirovahiya dewlemend de rizgar bike, taku demukratî diyar bibe mîna perdeyekê li paş wê hilweşîn tê veşartin, hebûna wê mîna gotinekê tewrîvanên sosiyalîst û sermedar wê mîna benîştekê cotibûn bi guhertina kedan ve .**

**Ji bo ku demukratî birastî têkeve di wêzimkariya civakê de bi rêya vejînkirina rêbaza hevbeşdarîbûnê ji sazkirina biryaran ve ji derveyî maska ezez ve yê serdest a li pêş civaka xuristî sekinî bi rêya miqatebûna li ser nezanîkirin û kuştina zanyaran û hîştina civakê li ser şemîtokên tundî,tîjandin , têkbirin, hingeme û wêraniya giştî .**

**Avakirina ramana zanyarî pêdiviyeke îro ji bo têgihiştina sirûştiya serdemê, li gel wê sosiyalîzm nehate pêkanîna mîna ricîmeke pêkhatî û palpişt , bi liva moriyekê jî nelivî**

**ji derveyî têgeha xwe ku ew hêsan ramaneke hat e hilweşandin dema kete di nav têkbirinê û derketina ji derveyî xêza xwe ve berve avakirina dewleta netewî a milhûr ê di dema îro de bibû xwedayê sermedariya nûjen.**

# Zanyar û sazî

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Zanyar bawer dibin bi pêdivîbûna cengbaziya nezanîkirinê ve û sînordarkirina berferehbûna kembera dadoka wiya gelerî û dîtina berve çêkirina civaka zanînê a berdêl e ji civaka zorkar re, ew li ser yaseyên mafxwar û sloganên birsîn avabûye, lê zanyar di nav xwe de qala dîtina xalên hevbeş û baş di navbera cemawerên olhez ên vekirî û cemawerên hizrên heyînî de ango dîtina tiştên ku herdû wana dicivîne,li gor komkara hişmendiya bilindtir ji ew girêdanên kevinşopî xwînî û olî ve, taku bi xuristî ve bi encamê kiryarê zanyarî ve bawer bibin, tevî pirbûna dîtinan ji çawaniya gîhiştina wê û dûrketina ji dîtina serçilîbûyî a dijminane ve ji devdanên tofekî bi xwe ve, ji ber çi kesê ol li xwe kirî dikare ava bike an hilweşîne û çi kesê ku ala diravîtiya heyînî hildide jî dikare hilweşînê an avakirinê bike, tundî bi aliyê zanistdariyê an pêşîniyê ve herdû çalakbûna tunebûnê ji hestbûna bi metirsiyê ve li cem takekes belawela dikirin , her jîndarekî mirovî li ser sirûştiya ezeziya a ku di xêra wiya taybet de dijî, zanyarî hewil dide dîtinekê li ser evînê wek nasnameyekê û zanînê mîna armancekê ava bike, ji bo zanyar li ser pileyên pend û ramandinê bi hebûna lihevhatî ve rabibin, taku kirdeya evîn û baweriya bi heyînê ve li cem wan geş bibe ligel encama kiryarê mirovî di heyînê de a bi destketiyê ve tê naskirin bi rêya :**

1. **Bidawîkirina serdemên kuştin, tîjandin û sextekirina bîrdozî û cengbaziya nezanîkirina xelkê.**

2. **Bidawîkirina çaxên milhûriya totelîter û bermayên wê yên neyînî li ser zanyaran.**
3. **Parastina hebûna jîngehî bi awayekî aştyane ve bi rêya vexwendinê ji kongirên mirovî û zemînnasî re ji bo barên bazdayî û barketiyan bi encamê ceng û girtinheviyên çekdarî ve sivik bikin, herwiha liberrabûna cîhanî ji hezên terorê re û çareserkirina diyardeyên xuristî û rawestandina li ser nexweşiyên vegirtî û belavbûyî û sînordarkirina belavbûna wê.**
4. **Bicîkirina têgeha beşdarîbûn ,pirjimarî û hevjiyana aştiyan e.**
5. **piştrastkirina komkariya zanyarî a heyînî yê kedên zanyaran biyek dike bi aliyê pevguhertina zanyarî ve li ser hemî astan, kelîna erdnîgarî derbas dike, ji bo sazkirina kombûneke cîhanî ji hemî zanyaran re çi ramanyar, zanistvan, wêjevan û hunermend ji hemî derên cîhanê ve û bawerî ku zanyaran neteweke belavbûyîne ji ber vê yekê divê di sazî û komcivînan de bêne komkirin ji bo pêkanîna civaka zanebûnê.**
6. **Piştrastkirina girêdanên hevbeş ji gellan re bi rêya xalê hevbeş ê di navbera wan de bi sernavê şaristaniyê ve, ji bîngeha biratiyê pêşî ve di navbera girêdanên şaristaniyên mirovî de û bermaya wê a hişmendî û dewlemend û destketiyên ên bandorên xwe li ser hebûna giştî dike.**
7. **Danasîna taybetmendiyên gellên saxlem ji bo berferehkirina navendên ronakbîr li hemî deverên cîhanê û piştgiriya hînkirina zimanên herî belavbûyî**

**ên mezintirîn hijmarê mirovan bi hevdû ve naskirin didin.**

8. **Pirkirina navendên ronakbîrî, komcivîn û komeleyên rewşenbîrî, civakî, hunerî,teknîkî,tendirûstî û geşepêdanî li rex pirojeyên geştyarî, bazirganî, qezencî bi giştî ve û hemahengî di navbera wan de.**
9. **Bidawîkirina têgeha partîtiyê an komçetîtiyên ên dijminatiya aştîbûna civakî dikin ji berjewendiya sazîkirina konfidresiyon û encûmenên ên gelek bijarde li xwe digrin û piştrastkirina li ser rola zanyaran ên piranî wan jiyana xwe ji dest dabûn bi destê partî an desthilat an dijminên welatên xwe ve.**
10. **Piştraskirina ku zanyaran ew vexwenderên guhertinê û sazvanên wê ne û çengbazên xuristî ne ji hişmendiyê girtî re, ê bi têgehên tund û tojiyê ve rizîbûyî û ew rêberên resen in ji çi rabûnekê re a li hemî navçeyên hebûna endezyar diyar dibû.**

**Bi rêya van xalan ên me anîn ziman em dikarin binasin ku sîstem li sirûşt û gerdûnê heye bervajî herdûkan tunebûn e , rêxistina serkeftî jêre berdewamî bi demê re pêktê, her rêxistinekî pûç misoger dikeve, bi encamê hewildana takekesên wê ve berve berjewendiyên takekesî ên awante û tunebûna baweriyê berdewam tînin, mînaka vê yekê şahînşahiyên ên ketibûn, bi encama hingeme û gendeliyê ve di çarçoveya naveroka wê a navendî de derbasî sazî û endîzên ên li binî wê, tenê zanîn sîstemê diparêze, mîna ku zanyar Mustefa Barzanî 1 binavkiribû, ew baş vê rastiyê têgîhîşt û wisa digot:**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**( Xwe bi zanist û zanebûnê ve çekdar bikin , ji bo rizgariya gellê xwe ji bê xwendiyê ve, kedên xwe bi yek bikin .)**

**Wateya vê yekê ku her civakek an partiyekî pêdiviya xwe bi zanînê ve heye mîna mercekî bîngehîn ji bo çalakirina sedemên çi rabûneke siberojî bi rêya çareserkirina hemî şaştî,kêmanî û gendeliyên kesayetî ên xwebînî ,desthilatî û serserîtî tîne di dan û standinê de ligel helwestên ên pend û rabêjbûn jêre divên ne dagîrkirina biryarê û gorîdanê bi çarenivîsa komelgî ve, bi rêya xebatê ve û civandina zanyaran di her saziyekî de û bi çalakirina wan saziyan ve çêdibe weşandina şêweyên tevger û nermiyê di hundirê rehjena cemaweran û alîgirên xwe de, çalakirina wê bi rêya vejînkirina ramana sazmanî ve ê dadmendiyê dike armanc û hiniran derdixîne û berdewam çalak dike, ji bo yekbûna vînan di rêveberiyan de ji bo gîhiştina li civakeke vala ji bêxwendinî , gemarên nezanîkirinê û mîlên qirkirina rewşenbîrî, civakî, aborî û zanistî ve.**

----------

**1- Barzanî di 14 Avdarê de sala 1903 de li navçeya Barzan jidayik bû,bi birayê xwe yê mezin re Ehmed Barzanî re beşdar bû di rêvebirina tevgera şoreşgerî ya Kurdî ji bo xwestina mafên netewî ji Kurdan re, lêbelê ji aliyê desthilata qiralî ya Îraq û hêzên Birîtanî ve ew tevger hatibû vemirandin û di 1 Avdarê sal 1979 de koça xwe kir.**

**Ev rola zanyaran e wekî zikêş li ser destketiyên civakî bi belavkirina felsefeya tevgerê a şiyarbûnê bi xwe re tîne herwiha naskirina pêdivî û xwestinên cemaweran ji vînên çalak re û rêberên dibêjin û dikin û bi gellên xwe re xewin û xwestekan parve dikin ji bo pêkanîna xwesteka rastîn bi hebûneke ewle û gellekê azad û saxlem ve û jinavbirina çi dest jê berdanekê di hundirê tevgerê de , zanyar dibin**

**beşek jê li hemî partî, sazî û dewletên xwe ji bo pêkanîna nameya zanînê.**

**Kesê ku tewriya totelîter datîne armanca xwe pêşî balkêşkirina kesan e ji xwe re dema dibêje ku çi tiştê berî wî hatiye reşepêşkirin e , kesê vê yekê dibêje ku ew jiyan têkçûyîbû berî hatina tewriya wî ew hişmendiyeke pêpelî û piropûgendî ji bo belavkirina asoyên dîtina xwe yê yekbar belav dike tevî berketina xwe ku rastî di çarçoveya heyînê de rêjeyî ne.**

**Çi tewrî û felsefêyên ku zanyaran wêna heta niha afirandibûn ji encamên sawêr û dîtinên pêşiyan in, ew penda naskirî li ser yek ji perstgehên Etîna ve hatibû dîtin ( Ey mirov xwe nas bike) nîşaneke ku hemî şaristanî û behwerî bi rêya zanîna mirov ji xwe ve derketibûn, bi rêya komek pirsîn, ez kî me ,em kîne, zanîn ew rastiya a bi encamê pirsînê ve derketî, ew ti carî nabe ji malê bawerî an komekî bi xwe ve, ew pirsînekî kûr û berdewam e bê dawiye ta jiyan hebe, û diyardeya zoreng û tundiyê ji encamê malgirtinê ve ye, malgirtina zanînê û hewildana çarçovekirina wê bi komek pîrozî û qedexebûnan ve, li gel wê ti dîrokekî rastîn nîne ji destpêkirina zanînê re , ew piştî biservebirina zimanan bi rengê xwe yê rastîn ve hatibû diyarkirin.**

# Kombûna zanyaran ji bo parastina hebûnê

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Zanyar berdikevin ku ew nûnertiya nirxên sirûştî dikin, ew nirx ji naveroka şaristanî ve hatibûye wergirtin , ew naverok di gellan de ye, bi piştrastkirina li ser pêdiviya civandinê ve li dor heyînê ji bo parastina wê bi rêya kombûna zanyaran ve bi rengên hemahengî û naverokên rêxistinî ve li hemî deverên heyînê, timî ew tekes dikin li ser pêgirtina rêbaza zanyarî ,ew ji cudabûnê ve dibînin ku çavkaniyeke ji berhemdan û zayînkirina ramanên avaker e, çi dîtineke tundirew berve zanistdariya radîkal an pêşînîbûna radîkal napejirîne, ji ber herdû dighêjin hev bi nebaşiya pêkanînê ve,ji ber zanyar ji rizgarkirina heyînê ji biveya a hêzên zorkar û nankor ve nûnertiya wê dikin ew dibînin ku mîna pêwîstî û erkeke zanyarî niştîmaniye, ligel piştraastkirina rastiya zorenga sermedî di navbera hêzên hilweşîn û avakirinê de, ên di zanîn û nezanîbûnê de xuya dibin.**

**Mirov nikare piranî bermayê mirovî têbighe ên şaristanî û nirx nûnertiya wê dikin dema bi hebûnê re mîna yekbûnekê nakok be , evîna xuristî ew felsefeya hebûn û tevgerê ye , divê ji tevlîheviyên henas û tevderbasbûnên wê bête rizgarkirin, bi rêya felsefeya Evîn hebûn e û hebûn zanîn e ve em dikarin têbighin rastiya cudabûn û ramanên nû ên ji vebûnê ve derdikevin, divê bête ziman ku rikberiya a li hember têrhatiya mêjiya mirovî radiweste, ew lagirtin û xwedîkirina nezaniyê bi rêya belavkirina nezanîkirin û devgirtinê ve aşkere dibe, ji ber nezaniya kor ên deverên tîjandî bi awayê ragehî û netewî ve bi taybet ve li Rojhilata navîn dikşînin mîna mînakeke diyarbûyî ye dibû metirsiyeke belavbûyî .**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Belavkirina zanebûnê bi rêxistinkirina hiniran ve girêdayî ye, ew li ser rastiya civandinê û çandina nirxên xuristî di hundirê hemî sazî û rêxistinên rizî de derbirîn dike, ji bo çêkirin û guhertina wê , rizgarkirina wê ji bêkarî û lawaziyê ve û bi rengekî rehet ve ta qonaxa rehetbûnê.**

**Û rêbaza zanyaran rêbazekî rewiştî û civakiye, heye bi xwe ve, nirxên ku behwerî,tewrî û şepêlan bang pê kiribûn kurtas dike, ew nirx, tewrî û şepêl bandorek wan hebûn li ser bermaya şaristanî a dewlemend, giranî xwe dide ji vegera mirovê zanyar ji bo bi giyanê şaristaniya zanyarî bigre, zanyar timî amadebûn bi dîmeneke diyar di dijwartirîn rewşan de û di tarîtirîn zehmetiyên sert de, ji bo rastiya mirov bergiriyê lê bikin, li hember ên bi kiryarên xwe yên ezez û nankor ve mirovan têkbiribûn, li pêşde diçin berve pêkanîna pêşveçûn û aştiyê , ji ber bawer dibin ku zanîn lihevhatina mirov bi azadiya xwe re ye.**

**Û dijminatiya xwe bi koletiyê bi ser heman rengên xwe ve didomînin, ji ber vê yekê Spartekos 1 a zanyar bi vê rastiyê ve bawer bû dema hemî koleyên bindest li meydanên Romayê civandibû, wan ji lepên bazirganên firotina mirovan ve derxistibû, ji bo hovîtî û dirindîtiya a ku bi Roma re dimeşiya li rex pêşveçûna wê ya avadanî têkbibe, ta bibe mînakekî rastîn ji dilêrbûna zanyaran re û nemiriya helwestên wana ên banga yeksanî û pêşveçûna hevbeş dikirin ji bo xweşî û jiyana ewle li heyînê bi baweriyeke rastîn bi serkeftina zanînê a têkber ve li hember hêzên nezanî û milhûriyê.**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**Rabûna zanyarî ew şoreşa berdêl e ji çolîbûn û bêcaniyê re ên bi desthilatdar û tofên barketî ve ketibû, ewên bi tirs û devgirtinê  ve bindest in, ji ber vê yekê zanyar  dixebitin  ji bo evînê bikin felsefeya hevjiyanê, taku ji rengê xwe ve mîna  huş û sewdayeka hundirîn li cîhanê derkeve û bibe kûrbûnekê ji nîşanên jiyanê re û dehfandina mirov bi rêya wê ve taku bighe bi rêya civîna zanyar ve li hemî heyînê , ji bo gotûbêja li ser çarenivîsên gellên bindest bin fişara hêzên serdest mîna desthilatên milhûr ên xelkê koçber dan e kuştin û talan kirin, herwiha hemahengî ji bo parastina cîgehê ji gemarbûn û metirsiyên  ceng û girtinheviyan ve bi danîna çareseriyan ji bo sînordarkirina wana û jinavbirina tîjandin, sertî, hilkirina teror û tundirewiyê bi piştrastkirina li ser girîngiya hevjiyana aştiyane, divê berdêla lawaziyê çalakirina encûmena ewlehiyê be û pêdîvîkirina dewletên mezin ji bo tekeskirina rastiya heyînê û çarenivîsa xwe yê yekbûyî û girêdayî bi rawestandina cengê ve û belavbûna çekên qedexebûyî û tekoşîndariya terorê û danasîna azadiyan û aloziya mafên mirovan û binpêkirinên wê, pêkanîna aştiya cîhanî ew ragirekî bîngehîn e ji ragirên pêkanîna nameya zanînê re.**

**Mebesta zanyaran ji yekbûna hebûnê ve bervajî nerînên ayîndaran e ew hebûn a jîndarên cûrbecûr anîbûn, ew têgerîn û têkelbûn  pêşdeçûn û guhertina berdewam durist kiribûn.**

**Zanyar evînê dibînin  ji berhema wê têgerîna berdewam , ew xwegêra a ku mirov bi rêve dibe  bi aliyê berketina tiştê zêde  ve ên ji zayabûnê ve ranaweste, ew zêdebûna**

**dewlemend û şaxdayî û tevgera jîndaran û hebûnê ve girêdide.**

**Ew têgerîn ji heyînê re vedigere ji ber ew xwedaya hiniran e bi rengên xwe ve, ew têkelbûn du cûre ji hiniran ve derxistibû mirovê zanyar nav lêkiribû daring û giyan, herdû xuberdan in ji pêvajoyên dijwar di navbera mirov û jîndaran de, giyan ji hebûna daringiye li heyînê û têkelbûna herdû hinirên giyanî û daringî ew xwesteka lêgerîna hebûnê û bedewbûna wê a endeyzarî geş kiribû,**

**--------**

**1- Spartekos: 71 B.z - 111 B.z , koleyek ji koleyên şahînşahiya Romanî ve bû, herwiha serwerekî şoreşger bû, bi zikmakê xwe ve ji dewleta Tiraqiya ya kevin ve ye, lêbelê dîroknasên kevin ji bo zikmakê wî nakok in.**

**Ev yeka ji hebûna mirov û berdewambûna bernasiya wî ve dibû gerentiyekê.**
**Û destikên ên zanyar bikartînin ji bo belavkirina ramanên xwe ew destikên zanyarî ne dûrî şêweyên sertî û zoriyê , lê pala xwe didin li ser dagirtiya bîraweriyê ji çalakirina dan û standinê ve ji bo afirandina dîtin û ramanên nû, zanîn raman in bi evînê ve bilind dibin ji wan perwazên bîrdozî ên wêranker ve, vexwednerên nezanî û dûrkariyê wana belav dikirin, berdana pirsîn û dîtinên nû ew tiştê herî zanyar wêna hêvî dikin ji bo pêvajoka nifşê sozdar, ew bi hebûnê ve têkildar in eger li ku derê bin di bin siha yek komkarî de, dem li gorî tevger û têgerîna wan bi cih re tevdigere, li gel wê welat ji derzandinê ve ewle nabe û bi roxandina welatekî li rex wî ve ewle nabe û rastiya a ku mirovan serweriya wê dikin rêjeyî ye ji ber lêkolînkirina**

**wan ji hebûna tekûz re a bi zanîna tekûz re diyar dibe,hemî vexwenderên zorengê di navbera şaristaniyan de zemîna girtinheviyê damezrandin bi rêya têgehên sazbûyî ji bo armancên girêdayî bi serdestbûnê ve, têgehên zorengê ji komek rewş û encaman ve hatibûn e wergirtin, ji cihek ta cihekî ve li heyînê cuda dibe, rastiya a gerentiya jiyanê dide ew di pêkanîna nameya zanînê de ye bi aşkerekirina serpoşa xapînok ji bihaneyên zorenga xwînî ve ji bo girtinheviyê û wêrankirina hebûnê û valakirina naveroka diyardeya şehîdbûnê û bikaranîna wê ji bo armanc û arezûyên fermandaran û lîstina bi pîvanê şehîdbûnê ve an dijwateya wê xiniziyê, li gor berjewendiyên bîrdozî qezencî , nirxa şehîdbûnê ji naveroka wê ve hatibû valakirin a wateya wê şehnaziye,di dema şehîdbûn mîna nirxekî zanyarî bilind e divê bête nirxandin ji bo çi zanyarekî jiyana xwe dabû bi bilindbûna welatê xwe û rizgarkirina wî ji stûxwarî û diyarkirina şehîdbûnê mîna nirxekî zanyarî niştîmanî heyînî û parastina wê ta nebe têgehekî siyasî di nav destên lîstikvanên nirxan de û bikaranîna wê ji wêzimkariya qezencên ezez re, mînaka vê yekê rêxistina Elqaîde û tiştê ku dikin ji mêjîşiştina xortan û gotina ku mirina wan mîna nirxekî ezmaniye wê wan bighîne buhiştê.**

**Berhinde zanyar dibînin şehîdbûn diyardeyeke zanyarî mezintirîn e dibe bîngeheke kirdeyî ji çi rabûnekê ve, dibe mîna guher û buhayekî divê mirov bide ji bo dehfandina paşdemanî û sitemkariyê, ew dibînin mîna bîngeha pêşveçûna jiyan û têgehên bilindiyê ên mirovahiyê hîştibû ji çaxa koletî û mildanê ta çaxa azadî û şehnaziyê ve bête veguhêztin, ligel wê şehîdbûn ne sîwareke bi destê çeteyên**

**mirinê ve yên bûn e sedemên qirkirinên mirovî, li beranberî qezencên malgirtinî û cengên wê yên li hember gellan , ew nirxekî bilind e.**

**Têgeha şehîdbûnê zikmaka xwe ji ol ve wergirt, ji ber ku ol şehîdbûnê mîna nirxekî bergir ji behweriyê re taku neman û winda nebe bikaranî ,pişt re ji tof,kom, partî û navnetewan re hatibû veguhêztin ta nîşanekî bistîne û bi armancên koma heyî ve a li ser cîgehekê bi xwe ve girêdayî be, a ji bo hebûna xwe dijî û li hember koletiyê bergiriyê dike, ji ber vê yekê zanyar tenê nemir e bi rêya şopa yê bi dû xwe ve dihêle di jiyana netewa xwe de û bandorên yên bi wê re diçe li ser netew û cîhanê.**

**Mînaka vê yekê rehnika elketrîk e û ew şoreşekî zanyariye ji Tomas Edîsûn 1 re vedigere û gîhiştina şanoyê li Şamê piştî hewildanê Bavê Xelîl Elqebbanî 2 bû ji bo vê buhayekî giran dabû ji bo şano bicih bibe û herwisa.**

**Zanyar li ser kiryarê destketiyê belge kir, bi berdewamiya qenciya desketiya afrêner ve di pêşdebirina jiyanê de, bi rêya jêbirina bendan ve di navbera zanyaran de pêşî ji warê cîgehî ve ta tîrêja xwe dirêj bike û bandora xwe berve cîhanîbûnê sepa bike , ji ber ziman têgerîn afirindibû di navbera têkilekê de di siha erdnîgariyê de, ew destika derbirîn û danûstandinê ye ji bo pêkanîna berjewendiyên kesênên bi wê zimanê ve diaxivin û fêrbûna wan erkeke bedewî jîniye, lê helandin di zimanê hêztir an serdest de rengekî ji rengên rikberiya cûrebûnê ve ye û radestbûn ji desthilatiya yê hêztir ve, ew destikeke danûstandin û**

**gotûbêjê ye ji bo gîhiştina sivîlbûna sirûştî bi rêya rizgarbûnê ve ji alavên roparta pasfinde ve yê li ser şaşkirinê û derbasbûna li nezanîbûnê miqate dibe, ev dibû sîwareke ji cengan re û berdana valabûn û baweriya bi leylana nediyar ve, ji ber ku cûdabûna şîrovekirinê ew tiştê ku bi pêvajoya weşandina felsefeyê ve dimeşe û li vir divê tiştê diyar bêne pêşxistin ne tiştê nepenî di têgehê an ramanê de taku nebe dîlê reşepêşkirinê an daxistina ji nirxê ramana ragihandî ve, wekî ku gelek behwerî rastî binpêkirin û reşepêşkirinê hatibûn, ji ber vê yekê divê ji wan têgehên ên li ser hevkuştin, girtinhevî û binpêkirinê dehf didin bête rizgarkirin, ew binpêkirin li hember heyînê ye bi giştî ve, çi nijadekî serkeftî li ser ya din nîne bi qasî ku rastiyek heye bi hêza hişmendiya zanyarî ve girêdayî ye bi derbasbûna wî ve di hundirê afirandinê de û duristkirina ked û yekbûna zîrekbûna tewrî bi a kirdeyî ve bi rêya kombûna pêkanînan ve bin siha hebûnê û çalakirina vê yekê ji bo bilindkirina nirxên sirûştî ji jiyanê re berve dîtineke diyar û bilind jêre, berve binemayeke komkirî hebûn û jîndar ji wêranî , ceng û bobelatên xuristî ve biparêze.**

**------------------**

**1- Tomas Ilfa Edîsun:( 11 Sibatê 1847- 18 çiraya pêşîn 1931) ew nûder û mêrkarekî Emrîkî ye, di dema rêvebirina wî de ji beşgeha xwe re bi ser navê Edîsun General Ilketîk ve berî ew beşgeh bi Tomîsun Hiyostin Elketrîk re têkel bibe, gelek amûran nûder kiribû, ev yeka bandora xwe li ser mirovahiyê teva hebû mîna : pêşdebirina amûra tomarkirinê û alava wênegirtina sînemaiî li gel rehnika Elketrîkî a dirêjdem dimîne,ew gelek amûr pêşde biribû mîna biyisera hinira elkîtrîkî û peywendiya cemawerî û tomarkirina deng û wêneya livok, binema berhemkirina giştî ,zanistên rêxistinbûyî û xebata komelgî bi awayekî berferh ve pêkanîbû ji bo pêvajoya nûderiyê, kardîtgeha Mînlo Park ji bo lêkolînên pêşesazî di sala 1876 de saz kiribû .**

**2- Bavê Xelîl Elqebbanî: 1833- 15 Çeleyê 1903 ji navdariyên Sûrî ye pêşdara şanoya Erebî ye û rêzana şanoya romentîk e a Erebî ye, ew Ehmed kurê Xelîl e kurê Mihemde Axa kurê Hisên Axa Aqbîq li şamî jidayik bû Sûrî û li wir koça xwe kir.**

**Zanyar pêşî ji bawerî û dilsoziya bi bîraweriyên xwe ve li heyînê destpêkir, ji ber çi nakokî di navbera têgehên xweser û babetî de nîne, ew herdû têklî ne ji bo lêgerîna rastiya zanyarî a bê sînor re û nûnertiya yekbûna hebûnê.**

**Yekbûna hebûnê a ku em wê têdighin di rewşa tekûz de di warê siyasî,aborî,rewşenbîrî û stratîcîk de em wê meyze dikin û bi qasî bandorê diyardeyan ve li ser gerestêrkê û tiştê lê xuya dibe ji pêşveçûnên di cihekî de destpêdikin ta cihekî din , pirbûna diyardeyan nîşana yekbûna heyînê ye, dema cihekî dikeve bandorê ew bandor derbasî cîranê wê dibe û berferh dibe li gor kûrbûna aloziyê ta hêdî hêdî bête veguhêztin ji ber vê zanyar berdikevin rastiya hebûnê bi rêya bîraweriya xwe jêre mîna yekbûneke tekûz û giştî, ew baweriya xwe bi giyanê ve tînin mîna hêmanekê ji tevgera daringî ya zabûyî ve, ew tevgera daringî di navbera mirov û derdora heyînî de têkelbûyî û têgerînbûyî ye bi giştî ve, pêşdebirina civaka mirovî ji wan nakokiyan ve derdikeve û zanyar di vir de ne partî an şepêl in an xwedî baweriyekî ayîndî ne, ewên bi serbixweyîya zanînê ve ji hemî dîtinên dijminan e ên teng ve bawer dibin, ew dîtinên dijminan e pîroziya hebûnê binpêkiribûn.**

**Ewên bawermend ji tekoşîndariya tundirewî û malgirtin û sertiya desthilatê ve bi rêya weşandina çanda nakokiyan ve yê li ser bîngeha evînê saz dibe.**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**Û hebûn di seyrana zorenga dirêj de ji bo bidestxistina mafên mirovan ji mafê çarenivîsê ve û gera ji bo azadiya a bi azadiya vîn û rizgariyê ve diyar dibe ji dîlgirtîbûna dûrkaran ve ew zorenga hemî zanyaran e ji bo xwestina çarenivîsa gellan û gerentiya hevgirtina wan bi rêya azadî û serxwebûna pirojeya wan ve.**
**Û divê têgehên ên ji derveyî perwazên kevinşopî ve nûderketî ji civakan re bêne terxankirin ew perwazên kevin ên rol û vaca hişmendiya rexnegir veşartibûn û hîştin takekes girêdayî be, ew têgeh divê ji vîna civakî ve derkeve bin siha civakeke takekesên wê bi cûdabûnê ve bawer dibin û bi pêdivîbûna jinavbirina rêbendan di navbera dewlet û herêman de bi rêya hevcisnî ve û dûrbûna ji derbiderkirin û şofînîbûnê ve, li gel wê civakên zanyarî bi rêya cûdabûnê ve şad dibin bi pêşkêşkirina pirojeyên aborî geşepêdanî ve û pevguhertina rewşenbîrî ve a gel pê radibe ji bo hebûna xwe ava bike ne ji bo avakirina berjewendiyên aborî,ezez û malgirtinî ,saz û bicih dibin li ser hijmara tunekirina gellan û li vir rola zanyaran diyar dibe ta bibin navikeke rastîn ji civakeke zanyar re bi jiyana nûjen ve bawer in.**

**Hişyarbûna dewletan û şermezarkirina wan ji bikaranîna çekên qedexebûyî ve bi rêya êrîşbirinê ve li ser kesên wê erkekî zanyarî ye li ser milê dewletên mezin ji bo rêgirtina li pêş têkbirina heyînê bi giştî ve, ji ber ku parçeyekî li ser bi giştî ve bandor dike û bervajî , şaristanî li ser destê mirovê zanyar a şiyane derketî, lê ligel destketiyê hertimî destên nehêne hene wê destkeftiyê ji xwe re dibin û ji bo tunekirina gel an şaristaniyekê, ramanên baş ên di**

**xuristiya civakan a heyî de ew dikin û serdikevin bi xuristiya kirdeya zanyarî ve zanyaran desthilatdariyeke nûnertiya civakê dike dixwazin bi nirxa qezencên xwe re lihevhatî be, mirovê binketî rahênan bike , di hundirê wî de nirxa serketin û pêşveçûnê biçîne , piştgiriya wî bike, desthilatekê nûbûna ramanan diyar dike, û bi xwestekên bilind ve lihevhatî dibe ,ji bo gellên xwe bilind dibe bi berdewamiya pêşdebirina daringî û giyanî ve ên bi rabûna zanînê ve girêdayî ne ew zanyaran wêna li heyînê belav kiribûn.**
**Ol û tewriyan ji xuberdanên zanyaran in ji bo başkirin û şopandina kiryarê mirovî û çêkirina kanîbûna hevjiyanê bê duristkirina tundiyê ên dûrî wijdan û hevsengiya hundirîn e, wêna jiyan dikin û çi ricîmekî buyaxekî olî an netewî radike di naveroka xwe de derbideriyê hildigre, li dijî cûrebûna civakî , olî û netewî derdikeve, tiştekî ne baş e giştîbûna sîstemeke bi serê xwe bi navdariyeke totelîter ve tê naskirin , li ser civakeke cûrbicûr û dewlemend tête sepandin, ji ber ew pirsgirêkan di nav civakê de durist dike , em dikarin bibêjin ku kiryarên desthilatî ên tund kiryarên takekesî ne ji derveyî çavdêriya civakê ne , timî kêmaniyê dike di peywira xwe yê rewiştî de , terora navdewletî belav dike, yê encamên bive li ser hevgirtina civakê dike , tevina wî qirçûkî dike.**
**Ji ber vê yekê zanyaran dikarin sîstemên çendane demukratîk ji fermandariyê û vebûna aborî re damezrînin, bi vekirina rê li pêş anîberên geşepêdanî ji bo pêkanîna xweşî û başiyê ji hemî civakan re û sînordarkirina xizanî û bêkariyê ve û beşdarkirina pêkanîn û hiniran di piştgiriya aboriyan de.**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**Zanyar buhayekî mezintirîn dabûn ji bo rizgarkirina civakên xwe ji hemî cûreyên sitemkariyê ve, eger li desthilat an ragihandin an werzeş, aborî, çand, an kar û barên leşgerî û saloxgêrî be, li gel wê bandora wan diyar dibe di hemî sazî û desthilatiyên navnetewî de bi derbasbûna dîrokê ve, buhaya helwestên xwe yên ramanî û felsefî dabûn bi rêya qirkirin an penaberîkirin, an reşkirina bi neyartiyê ve, em feylesofê zanyar Manî 1 tînin ziman yê cûreyên azarî û serberjêrkirinê kişandibû li ser destê şahînşaha Sasanî Şahbora duyem 2, herwiha Mensûrê Elhellac 3 (Şehîdê ayîndariyê) nîşanekî zanyariye ji evîn re ji ber ku bi rengekê pîs ve hatibû işkencekirin û kuştin ji aliyê desthilatiyên Islamî ve û em tînin bîr jî zanyarê Îtalî Giyar Dano Birono 4 yê bi bêolîbûnê ve hatibû tewanbarkirin di sala 1600 de, piştî ku ramana wî dibû destpêkeke guhertinê di serdema wî de û efsanê Çînî Biroslî 5 yê bi hemî zarzariya xwe yê zanyarî ve nehêneyên lîstoka Kongfo 6 ji xeleka şaristaniya Çînî ve ta cîhanê veguhêztibû û rastî şer hatibû ji aliyê tundirewên Çînî ve ,ew dikarîbû bi vî rengî helwesteke zanyarî tomar bike**

**û mînak bi dawî nabin li ser gewrebûn û zarzariya zanyaran ji bo yekbûn û serxwebûna gellên xwe û bandora wan li ser heyînê ji xwecihiyê ta cîhaniyê ve.**

**Zanyar li hemî deverên hebûnê çepera xwe yên qayîm çê kiribûn ji bo têkoşîndariya hêzên nezaniyê ango dadgeha soraxvanîkirinê yên hijmarên girs ji wan kuştibûn, ewên r êbaza saxlem nîgar kiribûn bi rêya raman û helwestên xwe**

**ve, ji ber ku hebûn bi zanyarên xwe ve pêşve diçe û gulgulî dibe, bi ezezên xwe ve tune dibe û tête jinavbirin .**

**Girîng e bête naskirin kedên avakeran yên rolekî wan hebû ji bo hembêzkirina mirovan bi çi tiştê baş û buha ve bi rêya girêdana rewişt ve di afirandin û sîstemê de û girêdana bi naverokên jiyanê ve.**

**Zanyar bi felsefeya zanyarî a ku ji yekbûna heyînê ve dibişkive bawer dibin , ew xwe dibînin nîşanên saxlem ji mirovê nû re yê timî rastiya nirxan piştrast kir û kanîbûna wî ku welêt pêşve bixîne bi rêya anîberkirina alavên xwe ve û çalakirina pêkanînên xwe, ew ne tenê tewriyeke nimûneyî ye, lê ew dibe bîngehên kirdey û reftarî zanyaran dikarin pişta xwe bidnê ji bo dûrketina ji cengan ve û herwiha nimûneyên desthilata genî yê vîna zanyarî tê kbiribû û miovahiyê ji talanên ceng û birçîbûnan û çê kirina çekên pîs ve dehfdabûn, ji bo çêkirina rêveberiyên zanyarî rastîn naveroka civakê û nirxên wê derbirîn dike, ji xwendina bîngehên avakirina şaristaniyan ve rêyekê dibîne ji bo sazkirina sîstemên rastîn û sirûştî ji bo civakeke xuristî qayîm e stona xwe beşdarîbûn û yekîtî ye di navbera hemî civakan de ,sînora cîgehî, herêmî û navdewletî derbas dike bi giştîkirina ricîmên bêhtir fereh û dewlemend û giştî di warê aborî, siyasî û rewşenbîrî de.**

----------

**1- Manî : dameznerê ayînda Manîşî ye di çerxa sêyem de li rojhilata navîn.**

# Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**2- Şabora duyem: 309-379 yek ji padîşehên Farisan e, ew Şahbor kurê Hirmiz kurê Nersî ye.**
**3-Mensûrê Elhellac : 858-922 , helbestvanekî Îraqî Ebbasî ye ji rêzanên ayîndariyê ye li cîhana Erebî û Islamî .**
**4- Giyar Dano Birono: 1548-1600 , feylesofekî Îtalî ye navdar e.**
**5- Biroslî:27 Mijdarê 1940- 20 Tîrmehê 1973 bi ejdehayê biçûk ve navdarbû lîstikvan û mamosteyê hunerên şerkerî ye.**
**6- Kongfo : werzeşekî şerkerî ye li Çînê hatibû sazkirin.**

# Azadiya ramana zanyarî
# di rû nezanîkirina bi rêk û pêk ve de

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

## 1- Leylanbûna deronî:

**Noqbûna di xewin de ne tenê metirsiyeke giştiye ji nivîsandinê re ,sawêrbûn ji armanckirina rastiyê ve bi cil û bergekî hunerî ve dûrtir naçe, divê dûrtir biçe berve tekeskirina ramanên hilgir ji serguhabûna yekbûna mêjî û wijdanê ve , ji bo diyarkirina nirxên mirovê zanyar, ji ber xuristiya ramana bêcan bi rengekî ji laşgiraniya hizrî ve diyar dibe û radestbûna ji desthilatiya a bi hêztir re , ê ku bi bandora olî û afsanî ve çakdarbûyî ye, li gel wê em encaman ji hevcêwîbûna roparta desthilatî û pêkenoka zorkariyê ve werdigrin, herdû civak bi rengekî sade û xuristî ve wana fêrbûye,herdû jî parek in ji ramanên felsefî û sûdê didin e me, girêdayî ne bi van derdên ên takekesên wê cîgehê ve ji çaxê zaroktiyê ve dibînin bi rengê rahijtina Sêzîf ji zinnarê re , li gor Eristo (Endîza karê hevgarî divê ne tenê hêsan be lê aloz be û divê nûnertiya bûyerên ên tirs û diltenikî geş dikin bike.)**

**Ji ber vê yekê em hewildana jînî ji nivîsandinê re dibînin di pêkanîna şopê li ser henas de diyarbûyî dibînin, dibe ku ji berhema serpêhatiyên çendane be, bi vekirina ekranên dan û standina herî geş ve ne di xuyakirina henasê zirz de lê bi dîtina henasên têgerînbûyî ve, herwiha ketina di hundir de, ji ber sirûştiya guhertinên civakî a di ricîma dewleta serkotker de desteka wê ya dirêj heye di avakirina wê de, ew dibû li pêş rûbirûbûna bahatîna rewiştî kelemekî,tiştê hîşt civakan di talîzoka xizanî û nezaniyê de bijîn.**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

Li gel wê têkbirina çandan ji berjewendiya rabûna tek çandê ye , yek bijardeyekî fermandar ve ye, civaka binî hîşt bêhtir xuya bibe, berhinde nîşanên hevgirtin û şaristaniyê diçin ji berjewendiya belavbûna gendeliyê ve bi heman rengên xwe ve li her cihekî, li gel wê nirx li vir dibin dîlê lîstina bi wê ve, berhinde ên bergê partîtiyê li xwe dikin têgehên tev bihane çêdikin ji berjewendiya partiya totelîter re , li dor wê komek mirîdên sersam dicivin, ên ji ava rewrewkê ve vexwaribûn li rex mildan û rêzbûna peyrew li kêlek berjewendî û karbidestxistina hemî li hember hezkirin û meraqa guhertinê û bergiriyê li hember tundirewiya bîrdozî a dilreş , ew kes dibin aliyekî pir gendel, û dibin e mîna dewleta a di hundirê dewleta serkotker a giştî de, dewsa ku bi erkê xwe rabin ji rêxistinkirina cemaweran û bijardeyên ciwan ve dibin kelemekî işk li pêş huş û sewdayên takekesan û kar û barên wana, bi navê sloganên boş ve ên dûrî rewşa jiyanbûyî, -Leylankirina deronî - bikartînin , ew cûreyekî ji cûreyên lîstin û bandorkirinê bi xortên negîhayî ve ta bibin alavekî fermanan bi awayekî nihadî fêrbûyî vê yekê werdigrin , slogan û ropartên tije soz û hêvî bikartînin taku wana berve xewinên nigaşe dehfbidin, ta ramana rexnegir a azad di nav mirîd û şagirtên xwe de bimrînin ji bo ti carî wê darêjdankê derbas nekin.

Bi vî awayî ve em leylankirin mîna tevineke herî qayim dibînin , li dor cemawerên jihevketî tevdigere , di nav desthilata totelîter a serkotker de dijî, herwiha di nav sindana partiyên totelîter de ên herdû cil û bergê desthilat û dijberiyê lixwedikir, li vir aşkerebûneke zelal e ji kêşeya

**rêxistinê ve û neyîniyên ramana bîrdozî ê xwe bi slogan û tixtixkirina hestên cemawerên sade ve xwe dişon , ên ji dîrokî ve ew ji reftarên ayîndariyan ve dixwarin ji pîrozkirina deq û reftarên wêna  û peyrewiya ji serwer û melleyên wana re tiştê ku ramana azad vê yekê xweş nabîne, ew dibîne yek ji girîngtirîn kelemên ên li hember rêya rabûna zanyarî û ramana azad li hemî hebûna endezyar radiweste, ji ber ew timî çi tiştê bêcan nagre,ew hewil dide wêna darêjdank bike, mînaka vê yekê evîn û peywendiya xuristî di navbera mêr û jinê de, ev hemî ji bo serkeftina ramanên serokê rêzdar, berhinde vîna takekesê zanyar li hember metirsî û wêraniyê radiweste ê ji rêxistina neyînî û netêgihîştina hinirên xortan ên hizrî encam dide, bi rêya xistina wan ve di zorengên hundirîn de, hinira wanî afrêner vala dikir û ji wana aramiya jiyana baştir distîne, herwiha lêkolînkirina  serpêhatiyên civakan ji rûbirûbûna wê de ji hêzên leylankirin û nankoriya qezencî ve ,ev rastiyekê dide nîşandan ku zorengekî giran heye di navbera hêzên zanîn de beranberî nirxên ên li ser nemana nirxan xwe jiyankirin didin.**

**Ew nirx dibin bîngeha hebûna hevgirtina civakan û bilindbûna wan berve pêşveçûn û şaristaniyê, ji ber derketina takekesan an koman  ji hundirê partiyekê ve û damezrandina partiyeke din çalakiya bawerî û destketiyê têkbiribû, li gel wê bijardeyên pak hîştibû têkevin di tenahiya siyasî de, ê bi rewşên normal de rewşeke mîna dînbûn û bê aliyê diafirîne.**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Derketina girtinheviya hundirîn bijardeya ciwan fetisandibû, li cem bilindtirîn raberiyên wê neman kir, ji rêvebirina jiyanê ve , wisa nîşanên koçberiyê bi xortî ve diyar bûn , parçebûn di naverokên civakê de destpêkiribûn, tof û bijardeyên wê yên ciwan hatibûn e têkbirin, berve qurzîkbûn, têkbirin û windabûnê, ligel koçberiya takekesî.**

**Ew parçebûn bi encamê kevinşopiya ramanê ve ye li rex zûhabûna giyana afrênerî û serdestbûna serwer û keysbazan û derbasbûna wan di çi rêxistinekî de, ev tişt wê hîştibû bi dawî ve bibe dîla hingeme û peyrwiyê, xortan hîştibû bibin e ji qurbaniyên vê perçebûna berdewam ve, ji bilî milhûriyê û pêgirtina desthilatiyê an fermandariyê di vaca civaka bavanî de ,yê diyar dibû di naveroka partiya totelîter de û nediyarbûna rolên ciwanê zanyar ji guhertin û xebata ji bo wê,ev hemî civakê berve awanteyê biribû û girtina asoyên çareseriyê, ji sedema bêzariya ricîmên totelîter di pêşkêşkirina çareserî û berdêlên karker de, ji ber ku çalakiyên siyasî bibûn pirojeyên qezencî û diketin ji wêzimkariya tofa nepenî a serdest ve li ser naverok û biryarên partiyê, nediyarbûna demûkratîbûna naverokî tofên cemaweran hîştibûn bimeşin bê ku bizanibin li ku derê diçin û ne dizanin armanca xebata wan çiye, herwiha bi rastiya kesên ên wana bi rêve dibin ve nizanin, wisa jorîbûn û paşguhbûn diyar dibe,ezezî û nezanîkirina giştî berz dibe li rex paşguhkirina xwestekên xortan û xwîngermiya wana û ne hembêzkirina hinirên wan an berçavgirtina xwestin û ramanên wana ên nû ji guhertin û avakirinê re li rex jihevketina hevalan, herwiha dîlbûn bi encamê belavbûna nezanî û xizaniyê ve ye, li rex**

**veguhêztina di bin fişarê rewşên awerte de, ji kesekî hêzên ewlehiyê wî binçav dike ta kesên din penaberiyê jiyan dikin , ew hesta penaberîbûnê henasan dagirtibû bin siha tunebûna azadî û bijardinê, herwiha dûrketina takekes ji sirûştiya xwe ve û mandelekirina xwestekên xwe ew ligel hewildana rêxistinên totelîter ji bo valakirina naverok û hinirên takekesên wê ji çi vînekê ve diçe, taku ji bijardin an rexneya rastîn ve bê par bimîne, herwiha dûrketina rêxistinê ji armancên xwe yê ji bo wê dixebite ,dûrî di navbera nifşan de afirandibû, ew çalakbûna ramandina rexnî pûç kiribû, afirandinan belawela kiribû, tiştê hîşt takekesan di rewşeke diljêçûn û ne lihevkirinê de bimînin, penaberî li hemî bijardeyan de belav dibû, xelk dibûn wisa mîna qaqilkên fişekan li ser erdê belavbûyî, ji ber vê yekê axaftin li ser kesayetê û dûrketin ji biname û nirxan ve di kêlîk kiryar de li ser sirûştiya wê hişmendiya nevêtî ji pêşwazîkirina ramanên baş aşkere dike, lê ew her zarzar dike ji bo pejirandina wan ramanan bi rengê gumanên pepûk û sexte ew hîşt civak dîlgirtî darjêdankan be an li talîzokên tije mij û moran bijî.**

## 2- Civak û gendeliya bîrdozî li Kurdistanê :

**Berzkirina binkeftinê di parastina evînê de ew diyarkirineke ji dorpêçkirina civakê re û qayîmkirina bendên nezanîkirinê li dor wê, ta ew dûrbûna malbatî zêde têkçûyî be û windabûna girêdanên xuristî di navbera tof û bijardeyan de çêbibe, herwiha ew nîşaneke li ser têkçûna sazî û rêxistinên wêna di bin siha wêraniyê de û nediyarbûna pirojeya wê ya heyî di guhertinê de ta ji bo**

**sûdwergirtina diravî bergiriyê li armancên xwe bike, ji ber ew têde hebûna xwe dibîne, her ew sûdê ji leylankirina deronî ji civakê re dibîne, herwiha dûrxistina zanyarên wê berdewam in, bi rêya şer û paşguhkirina wana mîna ku rêxistina serkotker a fermandar wêna dike, ligel wê ew mîkrob girstir dibe bi berdewambûna kêmaniyan ve, ta pileyekê têde koçberî bi dîmenên wê ya takekesî û komî ve di nav civakê de bi giştî ve belav bibe, li gel wê girêdana windabûna hezkirinê bi windabûna mafên siyasî ve ew ji bo gîhandina hinek nameyan e :**

- **Diyarkirina rizgarbûna civakî ku ew bi gerentiya mafên siyasî ve girêdayî ye û berzkirina nasnameya netewî a di çarçiqên koçberî , peyrewî û destdayînê de binavbûyî ye.**
- **Berzkirina şêweyên desthilata serkotker a miqate li ser gurkirina diyardeyên diljêçûnê dibe di hundirê civakê de bi rêya dehfandina wê ji perwaza nezanî, efsanîbûn û xizaniyê ve.**
- **Têkoşîndariya bijardeya zanyarî a ciwan û têkbirina wê bi rêya dehfandina wê ve ji lêketinên deronî re di navbera wê û malbatê de û qirkirina wan di warê giyanî û ramanî de û têkbirina wê bi rêya parastina reftarên heyî li ser bîngeha qezenc,ezezî û sitemkariyê.**
- **Berzkirina pepûkiya aliyê perwerdehî û tunebûna hebûna alavên çaksazî û nû derbasbûnên ên rastî zarokan tên eger li dibistanê be an derveyî wê sînordar dikin.**

- **Gendeliya rêxistinên hilgir ji giyanê parçîtiyê re di hişmendiyê xwe de, û bêzarbûna ji şopandina xwestinên gel ji rabûn û azadiyê ve, kiryarê wê bi desthilatiya a ku li dijî wê ve radiweste bi rêya dûrkirina wê ji xortan re ên ji bo guhertina naverokî hewil didin.**
- **Diyarkirina sirûştiya civaka nêrî û sîstema bavanî ên rêveberiyên partiyên Kurdistanî li Sûrî pala xwe dabûn li ser û encam û şopên wê li ser bijardeya xortan , bi palpiştbûn li ser sloganên sexte ve ên xwediyên tewriya pîlanê berdabûn ji bo veşartina binkeftina xwe yê ramanî û nezanîbûna wan ya aşkere.**

**Em serdestbûna peywendiyên qezencî li rex pêwîstiya komserhevbûyî û êşa kûr dibînin, li gel wê zehmetiya jiyanê û xizaniyê û gendeliya saziyan û biserveçûna milhûriyê di malbatê an dibistanê de, ji ber gendeliya saziya perwerdehî bi herdû şaxên wêna rahênan û fêrkirinê takekesan di rewşeke parçebûnê de hîştibûn û malbatê jihevxistibûn,li gel wê tirskirin, desthilatbûn û milhûrî di nav takekesan de belav dibe û tundî rêxistina malbatî têkdibe, wan ji hevdû ve dûrdixîne, tiştê ku van civakan dighîne pêkanîna cûreyekî  ji tewanbariya xweser ve an li hember a din birêvebûyî ye, axaftin li ser xêza zordariyê û encamên wê li Rojhilata navîn me dibe ji vekolîneke kûr re ji vê diyardeyê ve yê ku ziyanên dijwar bi ser civakan ve anîbû, berhinde tundî jêre dibe nan û penage, bê guman ku ji tundî re şaxên dîrokî,civakî,deronî û desthilatî heye, dihêle civak û rêxistinan wana pêkbînin, li gel wê bihevketin û girtinhevî**

herdû rolekî mezin ji çirandina malbatê û jihevketina wê ve dilîze , desthilatiya serkotker ji bo berdewambûna serdestbûna xwe wê binyad dike , bi fermanrewakirina mêjiyê ve, bi rêya çandina tirsê û perwerdekirina wê di nifşan de bi rêya dibistanê ve, li gel wê diyardeya tundiyê li hember zarokan tiştekî navdar e ,di her saziyeke perwerdeyî de, ta yaseyên qedexekirina tundiyê li hember zarokan, ma wisa tokelî, kedxwariya wana bi heman rengî ve ranewestî, ji ber komên têkçûnên deronî rolekî ji guhertina kiryarê ve lîstibûn bi awayekî neyînî di hemî aliyên jiyanê de, mayîna saziya perwerdehî di binkeftiyeke dijwar de ew yek ji erkên ricîmên totelîter û milhûr ve, berhinde malbat mîna perwazekî biçûk nûnertiya asaîşeke ewlehî biçûk dike ji bo fermanrewakirina zarokan ji dema çêbûna wan.

Zêdekirina rêjeya nezanîkirin û ne xwendiniyê û şerpezekirina bijardeyên perîşan bi derdê tundî û desthilatiyê ve, civakê dixe di bin siha dîlgirtin û tenahiyeke xengoyî de, ji ber vê yekê êdî em tundirewiya olî û netewî bi riwê xwe yên şofînî ve dibînin, ev yeka encamên bobelatî pêkanîbûn ji pêşesazîkirina hişmendiya zîndanbûyî ve, li gel wê xelkê hîştibûn  di sertî û stûxwarî de bijîn , beranberî vê yekê em desthilatiyekê dibînin bi dijwarî ve şîn û işk dişewitîne ji bo di fermandariyê de bimîne, nîşana tundiya malbatî û binkeftina ji wê peyda dibe rengekî aşkere ye ji rengên rexnekirina desthilata serkotker ve, li gel wê tunebûna yeksanî û pîvanên perwerdehî cûreya çêbûna mirovan ji dema zaroktiyê ve piştrast dike, herwiha windabûna jinê di navbera herdû arçeyên penseya tenahiyê

**de û hestbûna berdewam bi pêwîstiyê ve, ji wê temara zorbazî a dayikbûnê derdê wê dikşîne encam dide, di qonaxên perwerdekirina wê ji zarokan re, em li pêş kul û kêmaniyên dîrokî ne, bi awayên nû ve, guhertinekê bi rengê kolebûna xwe ve çêkiribû, bi cil û bergeke tenik ve rizgarbûneke biçimî diyar dikir,sihwana nêrîtiya qezencî derbas nake, berhinde em wê hevpeymana desthilatî a sitemkar di navbera bilindî kokelê û biniyê wê de bi rêya tewriyeke nîgaşî ve dibînin, bi avakirina hevpeymaneke civakî ve li ser desthilatiyeke xweser ji gel dertê , ew dîtin dikeve cihê gumaniyê ,ku çar e ew e dema ku biryar ji gel ve bê ne ji jor ve bê sepandin , berhinde hevpeyman toveke em dikarin alîkar bin ji bo vebûna wê dema em bi rengekî ramanî ve lê miqate bibin, ne bi rêya rewrewkirina cemaweran ta bighe asta em bêjin ku ew raman ji serokê xêvzana ve bişkivî, lê ew bi rastî li ser bîngeha sirûştiyeke giştî tê avakirin, hemî tofên cemaweran têde beşdar dibin bi rêya qonax û rêbazên ramanî ên cûrbecûr, qayimbûna xwe ji hevgedandin ve di navbera reng û qatên civakê de werdigre, bi ser heman cudahiyên berketina xwe û cîgeha wê ya qatî ve, piştî jêbirina baskên nêrîtiya a ku di henasan de binyadkirî de,ew bi zêdebûna kêşeyên desthilatî û civakî bi rengekî siwarbûyî ve diyar dibe.**

## 3-Gotûbêja mirov û cih

**Vekolîna li nirxa hatî wergirtin ji bermaya peywendiyê di navbera mirov û cih de suda wê ku çi hêz nîne dikaribe têkiliyên nehêne di navbera henas û kokê de qut bike,ji ber ew mîna dîtineke pendyar e ji jiyaneke bedewtir re, ji ber**

**di pîvana huner û karê afrêner de dîtin ji dem û cih re bêhtirî rewşê bi giştî ve tête guhertin, ew rêyên zorengê di navbera mirovan de di çarçoveya qezenc û sûdan de di demeke nêzî hevdû de diyar dibe, berhinde di hizrê takekes de dûbare dibe pêkanîna vîna xwe a dibe mîna serkeftinekê ji parçeyekî hindik ji dadmendiyê re, di dema ê beranber dibîne ku wekhevî ji ber peyketinê bi dû pêkanîna wê parçeyê ve nehate pêkanîn , çendîn kêşeya hebûn aloz e di warê têgihiştinê de li gorî surištiya mirin û mayînê, berhinde takekes bi takekesiya xwe ve hest dibe bi rêya ramandina xwe yê ponijîn ve a wî bêhtir ji firînê re dehf dide, ji ber ku wateyên cîgirbûyî di hizr de dibin desthilatekî xwe li ser heyînê sepa dike û li ser pêdivî dikin vê şerî ta dawiyê berdewam bike, dawî di vir de ew encama dûr e, ji serpêhatiyên ên di hizr de çêdibin têne wergirtin, ji bo dehfandina ramanan ta bêhtir bi ponijin , ev yeka huner e ê bi henas û hebûnê re hevepeyvîn dike, bi rêya ên din û livên wan, dûr diçe ji bo ji her bend û baskî an yaseyî ve rizgar bibin, ew bend û bask li pêş azadbûna tevgera hişmendî li pêş hizrê bi zanînê ve gurvedayî dibe kelemekî, ji ber vê em dibînin ku hinira a ku zanyar ji girêdana xwe bi hebûnê re werdigre bi rêya qonaxên xwe yên destpêkê ta qonaxa gîhabûna berdewam diyar dibe , ligel ev ramandin û rabûna wî pirsîn xuya dibe a ku husteyîya jiyankirina hunera jiyana veşartî dike, zanyarê afrêner timî dixwaze bi rêya alavên xwe yên taybet ve beserve wê bibe, em dikarin bibêjin ku ew yekem hewildanên mirov e ji rizgarbûnê re ji wan bendên gezencî ve ên bi encama hevpeymana a ku di navbera desthilat û civaka bavanî de durist dibin , li gel wê em matmayî dibin bi vê zelaliya dagirtî ve bi servebirina li**

ser zikmaka ponijînê ve û kanîbûna wê ku hizr derbas û dorpêç bike bi hemî hinirên lehiya ramandina berdewam ve a ne pabend ji hemî fermanên ên hatibûne girtin re, yê ew gurvedanê pûç dike.

Em li ber xweseriyekê ne , bi rastiya nemana zelal re dibe yek, ku gewdeh dihêle  û tiji kurm dibe, ji ber vê yekê hijmara mirovê çavekirî di hilbijartina wateyê de ye, ji bo wê dijî bi bedewbûneke hilbijartî û pêjineke hunerî ve, pîvanên ku li ser evînê û qayimbûna girêdanê di navbera mirov û cih de radibin bîraweriya zanyarî saz û xort dikin, hemî kedên ên mirov li ser sehneya cih dide bi wê dawiya gewdehî ve li cem mirov diqede, ew ked ken û nehêne bi xwe re tîne, li gel wê berketina naveroka nemanê tiştekî aloz e li ser têgihiştinê , mirov li deriyên girtî misoger bi rêve dibe ,herwisa di bin siha feleka kin de ê mirov para xwe têde dibîne, ji ber vê yekê hebûn ew hola bê sînor e a mirov têde nemaniya xwe ya taybet jiyan dike.

Kovaniya mirov bi sîstemê ve bi qasî kovaniya wî bi wêraniyê ve ye, wek ku avakirin û hilweşandin du pêvajoyên pêrgîbûyî û hemsûyî bin, hilweşîn nîne eger niyaz ji bo avakirinekê nebe  dewsa wê hilweşînê, berhinde mirov  hemû alavên xwe pêktîne ji bo lingekî xwe bicî bike li rex hijmarê ê hewil dide hevsarê kontirol bike, cîhana rastî gelek guhertinan û gêrevêrên şaxdayî tê li pêş çavê bîrawer bûye metirsî û ramanên ku li hember hevdû şer dikin, berhinde em zanyar dibînin ku ew hêjayê serwerîbûna heyînê ne ji ber ew şerm nakin ku jêre bibin

**karguzarekî bi rêya bikaranîna wijdan û mêjiyê bi rengekî bi rêk û pêk ve.**

**Xapandin mîna ragehekî takekesî û rêxistinî berz û belav dibe taku bêhtirî karên nimûneyî binixûmîne, ji ber ku lîstin ranewestî bin siha bê agahiya xelkê û birçîkirin û dorpêçkirina wan bi awayekî ramanî ve û mijolkirina wan bi pêşkêşkirina seqayên guhdan û alîgirtinê ji kesên serkêş re , ji ber vê yekê sazkirina yaseyên sivîl mehderiyê nade wan civakên ên fêrî stûxwarî bûn e û hertimî guhdanê didin kesên xwedî hêz û tundî, cengên desthilatê bi dawî nabin, eger me rastiya girtinheviyan di navbera mirovan de şopand bin navên hênik, wana li karên ne hênik dehf didin , berhinde ti cîgîrbûn ji kiryarê totelîter re nîne di warê siyasî de tenê bi berdewambûna nandoziyê ve û çi azadî bin siha bendan nîne, timî pîlan heye tê pêkanîn ji derveyî kesên din ve ên li gor baweriyên xwe yên xuristî xebatê dikin , çi sîstemeke totelîter bi çalakbûn ve dilive bi sedema hebûna kesên bê agahî ji çi xap û lîstokên siyasetvanên ên cihê herî bilind girtine , ji ber ew li gor baweriyên xwe tevdigerin û ji bo hinek armancan dixebitin û dimrin,lê bi heman rewşê ve karguzariya tofeke serdest dikin, ji ber vê yekê dibin agirdûyên hemî cengan bi derbasbûna dîrokê ve, ew tofên bê agahî ên şer dikin ji bo hinek armanc bi rengekî hestiyar ve li pey tofekê ketine û di çarçoveya asoyeke teng de tevdigerin,ji ber vê yekê ceng bûn e ji reftarên ên behsa rizgariyê dikin, ji mirin û hilgirtina darbestan re aheng û tilîliyan saz dikin, herwisa em dibînin ku rastiya girtinheviyê pêşengtiya cûreya jiyana tofên derdkêş dike , derdê rêbaz û rêya şaş û tunebûna vac û ked**

**dikşînin, ew  çeviya ji desthilatiya bê sînor re ,hîşt gendeliya desthilatî zikmakek be ji çi gendeliyeke civakî, rewiştî an rewşenbîrî re, ti rê ji derbaskirina wê re nîne ji bilî rêya mikûrhatinê bi wê ve û xebatan ji bo jinavbirina wê, ji ber ku kiryara ezez serdestiyê li takekesan bi lez ve dike bi rêya desthilata ê bi aliyê gencîneyê ve diçe ji bo çespandina wê ji pariyê komê pepûk ve, bin siha nediyarbûna ramana rêxistinî û zanîna rewiştî, van keleman diyar dibin li pêş rêya rabûna zanyaran û xwestekên wan berve siberojê, tiştê ku dihêle pêşeroja nifşan di bin metirsiyekê de be, li gel wê gendelî ji kokê ve naye hilkişandin , lê çêdibe metirsiyên wê bête sînordarkirin.**

**Gendelî bûye alavekî ji kuştina xewin û xwestinên xort, dibe ku gendelî xwedayê rêxistin û desthilatan be li Rojhilata navîn û cîhana Erebî, ev tişt  ji belavbûna milhûriyê re vedigere bi rengekî rêbazbûyî ve bi rêya xwarindayîna wê bi bihaneyên ol, netewî û ragehî ve, tiştê ku zehmet dibe rizgarkirina civakê ji vê awanteyê ve, heta tevgerên dijber ji wan desthilatan re bêzar in nikarin wan bixînin, ji ber opoziyonên wan dewletan girêdayî hêzên derveyî ne ew jî kar dikin ji bo berjewendiyên wana, ezmûna buhara Erebî mînaka herî diyar e li ser vê yekê , ew dibû mîna zengila agahiyê a renewestî û zengilê xwe lêketibû lê hin gellan guhê xwe li ber  ker kiribûn  û hinek desthilatdariyan guhan berçav kiribûn, cemaweran bi encamê vê yekê ve man li bayê daliqandî, hewildana ji bo serdestî û tekbûnê ew parçeyekî ye ji derdê ramandina mirovê Rojhilatnavînî re  û ev yeka dibe xerabkerê rastîn ji berzbûna çi rabûneke ronakbîr xwedî çalakî û bandor ,**

**serkotkirin û dûrxistin ew ji parê zanyaran e ên bes nakin ji aşkerekirina kêmaniyên desthilatê û rola wê ya neyînî li ser jiyan û pêşerojê .**

**Û dibe xapandina bîrdozî ya ku slogana sosiyalîzm û wekheviyê lixwekiribû bibû çengekî ji vê tewanbariya rêxistinbûyî di dermafê civak û tofê wê ya xort de, lê eger baweriyên xuristî bibin tenê gotin û ropartên çingînî wateya vê yekê ku mirov çare li pêş wî nema ji bilî tenahî û xemsariyê, ev yeka wî berve dîlbûna di xelekeke girtî de dibe û li dor wî kes hene sertî û tundiyê dikin ji bo qelşandin di navbera malbat, jin û mêr de bêhtir û bêhtir fereh bibe, li gel bê dilovanî, bê hezkirin, lêbelê tundiyeke berdewam û dûrbûneke mirovî.**

# Li ser rojhilata navîn û rêyên çareseriyê

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**Kiryara zanyarî a bîrawer xwe radestî efsanîbûnê nake û ji bo rizgarkirinê ji bend û baskên wê ve dixebite, wek ku destketiya rabûnî bi civakan ve pêşdikeve wêna ji qonaxa nediyariyê ta qonaxa geşepêdan û berzbûnê vediguhêzîne, tevî belavbûna tundirewiyê di nav civakên dorpêçkirî de bi kelepçeyên cengê ve û derketina aloziya desthilata serkotker têde, lê rolên zanyaran di nav de girs û rastîn in, ji ber hişmendiya rojhilatnavînî li ser tembelî hatibû kedîkirin ligel rûniştina li dor maseya demborînê, hêdî hêdî li pêş sazîkirina zordariya pîroz hatibû jinavbirin, carek din hatibû berhemdan ji bo têkeve di wêzimkariya xwediyên pirojeyan de, ên xwe dikin paşmavên rewa ji erdên fereh re, gellên wê nikarin bi xwe fermandariyeke cîgirbûyî dadmend û gulgulî têde saz bikin, lê miqatebûn ku van gellan  bixapînin,bi rêya dîrokeke pûç ve li ser şaştiyên desthilatî durist dibe, li rex girtinheviya di navbera pirkesên ên xwe fermandar dibînin ,pala xwe didin li ser bermayekê ji serdestbûnê ve di fermandariyê de û beranberî kêmkesên ên xwe di koletî,dubendî  û pêrewiyê de dîtibûn.**

**Ev yeka girtinheviyê di navbera mafên netewî a dîrokî binyad kiribû, hişmendiyan bi  pîrozbûna beloq ve hatibû xwarinkirin, cîgirkirina kula penceşêrî di hundirê mêjiyên Rojhilatnavînî û cîhana Erebî de, taku gel di bersîdan û ne hestbûna xwe ya komî de bindest bimîne, di navbera gulmên kelbetana tundirewiya olî û ragehî de, yê dijminatiya her tiştê nû dike , di navbera zivîrandina li dorî bîrdoziyên partiyên totelîter ên li ser sloganên ayîndî nanê**

**xwe dixun, herwiha bişanhildana serwerîtiyê bi giyaneke êlî ve û xwedawendîkirina mirinê, taku bibe berdêl û dirêjiyekê ji ricîmên têkbûyî re ,ên ketina wan bûye rastiyeke guncan, ji ber tundirewiya a di navbera du rewşên binyadgir de beranberî dijî wê (çepgira nûjenbûyî ) ji berhema hevgadanekî reşepêş ve avlimekeke rakutayî anîbû, berdewam li ber mirinekê ye, ji bo lîstina rola xwe yê nû di kirtankirin û koçkirina xwediyên raberî ji gellên ên taliyê dikşînin bi sedema jihevketina şaneyên wê hêdî hêdî ve.**

**Ew tişt pêdivî dike li ser zanyarên agehdar ku bi hevsara bandorkirina kirdeyî a erênî ve bigrin li pêş zorengekî li ser wan hatiye sepandin li ser hebûna wan bûye gefekî, li gel wê belavbûna berbedeniya ramanî û siyasî bi taybet ve di nav cemaweran de rewşeke bêzar û neyînî di hemî derbarî de sepa kiribû, bê guman ku aloztirîn erkên ên dikevin li ser milê zanyar ku hişmendî û hevsengiyê di tarîtirîn qonax û çaxî de birêve bibe.**

**Cîhan îro hewila girêdana gerdûnî bi hevdû ve dike bi rêya ragihandinê, teknûlojiya nûjen û ekranên peywendiya civakî a çendane ve, ev yeka nîşan dide ku sînor di navbera gellan de ew sînorên siyasî qezencî ne, ji ber ku çi sînor di navbera hiş û hişekî , rabûn û rabûneke din de nîne,di vir de em dikarin li ser zanyaran û rolên wanî nû biaxivin ên divê berz bibin ji bo parastina hebûnê ji têkçûn û sêlaxên qirkirina rewşenbîrî û civakî ve, li gel wê ew rewşa a xwe derbirîn dike bi dîmenên çekdariyê ve li Rojhilata navîn ji genîbûna desthilatê û pêrewiya wê re vedigere, hêlînbûna**

wênegirtinên bîrdozî ên hişmendiyên cemaweran nediyarkiribûn û bîraweriyên wan têkbiribûn bi rêya binyadbûna fermandariya ragehî,netewî û olî ve ê bi kiryarê wî ve pirsgirêk û kortal di navbera hemû pêkhateyan de kûr kiribû, herwisa zanyar dibe armanckirî , dûrxistkirî û çêwirandî bi hemî destikan ve û ev yeka kirdeya civakî derengxistî dike û alavên saxlem di her civakekê de  parîparî dike, ji bilî ku aloziyên navendî ên civakên barketî derdên wê  bi sedema cengê ve dikşînin, dighe çi saziyeke pêşketî , herwiha vegirtina van aloziyan nîşanên wê li deverên pêşketî jî derdikevin, tevî ku ji deverên gûrbûyî bi rengekî erdnîgarî ve dûr bin (Teqîna li Parîsê).

Diyardeya tundirewiyê ne ji serdema niha ve derketî ye lê ew çirûsîneke hatibûye gurvedan bi rengekî rêbazbûyî ve di henasên mêjiyan de yê pişûdan û bêkarî wêna dorpêç kiribûn, lê bi derbekê ve dîtibûn kî vê pişûdanê li cem dagire bi rêya dehfandina wê ji darjêdankên gelek kirêt ve bi rêya rêxistinên cîhadî ên bobelatên bizdan û tirsê weşandibûn (Daiş) (Rêxistina gurên xalîrengî) ( Hemas û Partiya xwedê) taku jiyanê dagrin xircir, hingeme û xwîn,ev yeka dibêje ku qet û qut çênabe afirandina jiyaneke nûjen bi gelorîkirina aloziyên gellên barketî ve ên bes nekirin jiyankirina rolên qurbaniyê bi rengekî cûda ve û bi derbasbûna qonaxan ve, bi rêya bicîkirina ricîmên netewî a milhûr li ser dirêjî neqşeyên wê, westandina wê bi gêleşokê ve û valakirina rûberên erda wê bi neçarîkirina wê li ser niştecîbûn û bazdanê , bi rêya pêlên koçberiyê berve bakûr

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**(Ewrûpa) ( Koçberîbûna Sûrî, Efrîqî û Efxaniyan di herdû salên 2015,2016 de.)**

**Belavbûna sertî bi rêk û pêk ve aloziyên bê dawî durist kiribûn , dibe ku bi êşeke kûr ve derbasî bîra gellên bazdayî dibe bi rengekî hevgarî ve, ev hemî li pêş çavên dewletên pêşketî  diqewime,ên divê niha û berê berpirsyarî rahiştana bi vegerandina cîgirbûn û aramiyê ve ji navçeyên alozîbûyî re di warê siyasî de bi rêya bidawîkirina fermandariya milhûran û têkoşîndariya tundirewiyê, herwiha çalakirina alavên hevpeyvîn û xebatê bi rêya rêxistinên sivîl ve  û amadekirina nifşekî bi hêz ve ji bo xebat û avakirinê, ji ber  bikaranîna zimanê tundrewî ji zorkariyê re û bervajîkirina rastiyan û rêşepêşkirina wê civakên Rojhilatnavînî hîştibûn di neşiyarbûnekê de bijîn dûrî rizgariyê, ta siyaset bû destikekê ji reşepêşkirin ,derew û gendeliyê ve (Dijêçûna Cihoyan) (Şeytankirina Kurdan) , derbirîn û têgehên rêbazbûyî ketibûn e di xêzên rewrewkî gendel û bazarsarî de ji bo girtina hişmendiyên xortan  û xistina wan di xeleka  windabûneke bê dawî de bi bandora rewrewkbûna bicîbûyî ve yê pêkanîna berzbûna hişmendiya rexnî lawaz û pûç kiribû.**

**Wisa dîmenên penaberiyê bi rengê xwe ya hevgarî ve diyar dibe, ta koçberî û niştecîbûna ji deverê ve bibe bijarekî ji bo parastina tiştê hindik maye û piştgiriya wê li hember hêzên ku tundirewî bi heman rengên xwe ve belav dikin û bi rakirina slogana: (Dema qurşîn radibe hişmendî kehr dibe û kaniyên dil û ramanê zuha dibin).**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Çendîn kêşe li ser pileyeke bihevketî ji alozkirin û şaxdayîbûn be wê hişmendiya azad rêyan her bibîne ji bo jihevvekirina van girêkên berzbûyî, dema rolên xelkê li deryayê civakî destên xwe bidin hevdû û têkiliyên xwe yên zanyarî di tek hiş û dilekî de hevjînbûyî bin, lê dema em jihevketinê bibînin û têkiliyên civakî bi strihên girtinheviya nemanî ve dorpêçkirî bibînin ên akranên ragihandina kirêgirtî vê yekê xwarin didin, wisa bi dijwariya zorengê ve hemî pîvanên hevgirtina a di evînê de di navbera civakan de nediyar dibin, li gel wê ji Kîrkêgard re bavê heyînizmê ve vê rastiyê aşkere bû dema go: (Çi destketî an avahiyeke bilind bi nemanê ve bindest e eger çiqas dem lê derbas bibe.)**

**Berhinde em Roma û şaristaniya wê nabînin piştî sertbûn û dewlemendiya wê û hebûnekî ji Aşoriyan re nabînin tevî hezkirina wan ji bazirganî û serweriyê re.**

**Zanyarên ên ji wan avakirinê tê xwestin ewên li ser hebûn, ewlehî û aştiya wê berpirs in bi taybetî ve zanyarên xwedî biryar û desthilatî, ên vedeng û bandora wan li ser dîtina giştî heye, ji pêwîstiya kar li ser vegerandina aramî û ewlehiya kirdeyî ji Rojhilata navîn re, eger jiyan jêre bête peydakirin wê di rastiya xwe de bibe devera xewin ji bo siberojeke baştir , ew dever bi rengekî ji rengan ve wê pêşengtiya xwe yê şaristanî a ronakbîr vegerîne û bandorek xwe cuda hebe li ser dora xwe û cîhanê bi giştî ve, piştî ku ji desthilatên xwe yên faşî a têde cîgirbûye ve rizgar bibe herwiha ji milhûriyên têkçûyî ve azad bibe, ta kengî?!**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**Ji vir ve divê em bi çareyan ve biramin bi rêya vê pirsê ve, bê guman ku hişmendiya zanyarî a şaristanî bi tiştê baştir soz dide bi rêya destûrxwestina derbasbûna wê li rastiya van civakan û rawestandina li ser kêşeyên wan bi rêya van xalên bingehîn jib o pirsgirêkên deverê bêne çareserkirin:**

1. **jihevvekirina girêdanên zorkar ê hevpeymana Saykis Bîko wê nîgar kiribû bi vexwendina ji bo nîgarkirina sabarên hevgirtî ne cihêbûyî (Herêma Kurdistana Îraqê wek nimûne) (Herêma başûrê Sûdanê) ( Israîl û desthilata Filistînî) bandoarên xwe li ser berjewendiyên cîranan û serweriya wan nake bi rêya hilgirtina şêweya fermandariya xweser an Fîdralî an Konfidralî, wê ew yeka geşepêdneke aborî û civakî bide dewletên navçeyê bi parvekirina rolên xwe ve dûrî navendiya bilind û awayên fermandariya takekesî ê mafên hemî kêmnetewan piştrast dike herwiha gellên ên helistên dewletbûnê lê tên ji erd, ziman û çand ve.**

2. **Binecîkirina siyaseteke aborî geşepêdanî giştî ji dadmendî û parvekirina samanê li ser gel ve mîna pîvanekê datîne û dezgeha jimarvanî,çavdêrî û karê sazmanî mîna pîvanekî ji jiyana beşdarîbûyî û hevkar re datîne.**

3. **Têkoşîndariya ragehîbûnê û rêbazkirina siyaseteke zanistdarî zanyarî û kar li ser belavkirina çandên gellên Rojhilata navîn ji bo zêde hevgirtinên wê bi rêya dibistan û peymangehan ve li ser xwendina**

**bermaya wê ya şaristanî dixebitin û vekirina rêya azad ji pardariyê re ji bo rabûna civakê û piştrastkirina yekbûna çarenivîs û hevjiyana aştiyane di navbera wan gellan de.**

4. **Vekirina rêyên hevberîna rewşenbîrî, aborî û teknîkî di navbera gellên navçe û cîhanê de, ev yeka rê dide ji bo avakirina navçeyê û piştgiriya wê bi hemî rêyan ve ji bo avakirina wê û alîkariya barketiyan taku vegerin li cihên xwe ta navçe vala nebe û avakirina rêyên jiyan, ewlehî û pêşveçûna deverê.**

5. **Vekirina hemî rêyan li pêş jinê ji bo xebata li ser rakirina hemî zorkariyên dîrokî li ser û yeksaniya wê bi mêr re di her tiştî de.**

6. **Jihevveqetandina ol ji navendên dewletê û hemî saziyên jiyana perwerdehî û civakî ve jihevveqetandineke giştî û xebatê ji bo bicîkirina rastiya dewleta sivîl a yekgirtî.**

7. **Cengaweriya terorê û hemî dîtinên liyangirtî bi rêya hemahengiyeke ewlehî saloxgirî navdewletî ve û vexwendina ji komcivînan re radiwestina li ser belavbûna diyardeya tundiyê bi ser heman rengên wê ve û pêdîvîbûna têkoşîndariya wê.**

**Bi rêya vexwendina ji kombûna zanyarên azad re em dikarin kombûnê danasîn bikin ku ew kombûneke bawer dibe ku zanyar li hemî deverên hebûnê li ser heman**

**cûdabûna nijad,ol û aliyên xwe neteweke hişmendî ne afirandin û dîtina rêyên nû wana bi hevdû ve girêdide, armanca vê kombûnê :**

- **Komkirina zanyaran di yekîtî û komkaran de li ser asta heyînê ji bo danîna çareseriyan ji kêşeyên gellan re û danîna sînorekî ji zorengên ên ji çêkirina mirovan an sirûştê ve duristbûn .**

- **Vexwendina ji vegera mirovê zanyar re ,avakerê şaristaniyan ji bo kargêrîkirina rola xwe yê pêşeng a kevin û nûbûyî li hember liyangirtîbûnê bi hemî rengên xwe ve û vexwendina ji aştiyê re û rawestandina cengan û sînordarkirina malgirtinê.**

- **Damezrandina komên zanyarî û vexwendina ji bo civîna zanyaran a mezin li ser asta cîhanê ji bo pevguherandina zanyarî di hemî rêyên zanistên mirovî, nojdarî û teknîkî de.**

- **Têkoşînkirina terora navdewletî û terora koman û çêkirina hêzên jihevveqetandinê di navbera girtinheviyên çekdarî de.**

- **Parastina bermayê zanyaran a mirovî û vekirina rêyên cûda ji bo pêşvebirina afirandinên zanyarî û belavbûna wê û danasîna cîhanê bi kedên wana ve.**

- **Çêkirina yekîtiyeke dadmend di navbera zanyar û desthilata siyasî de bi rengekî azadiyan têknabe li**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**ser binema pêşvebirina jiyanê û wêzimkariya mirov ji bo pêkanîna civaka xweşiyê.**

**Ji vir ve em dikarin bibêjin dema em li ser van çareseriyan rawestin wê pêşerojeke rastîn sozdayî ji lawên navçeyê re diyar bibe , bi rêya wê em dikarin bighine bîngehin bilind ji jiyaneke bilind re , bê guman xwestinên zanyaran berve rastiya jiyana avaker ew pêdivîbûneke dîrokî ye bi rêya wê hemî raman û xwestinên xwedî pênosên ronakbîr gîhabûne hevdû ji bo bi civakan ve li pêş biçin berve sazkirina bingehên aştî û demukratîbûnê.**

# Rêyên zanyarî ji tekoşîndariya nijadperestî, koçberîbûn û totelîteriyê re

## 1- xuristiya sîstemên Rojhilatnavînî

**Rojhilata navîn li seranserê neqşeya xwe ricîmên mîna mafiyayê têde berz dibin, rewa ne di warê navdewletî de, terorê li pêş çavê cîhana sivîl pêktînin, guhertina wê bi destê destwerdana derveyî ve ye, ne li ser xwestek û vîna cemaweran e, li gel wê ew dewletan tundiya kor pêktînin ji bo serkotkirina çi tevgereke gelerî armanca xwe guhertin e, li pêş newêrekiya van desthilatan û sertiya wan ji kolekirina cemaweran û dûrxistina wan ji şêweyên têgihiştina jiyanê ve, dema jehrên xwe yên netewî û ragehî ji gellên xwe re dihêlin bi rêya wê ve fermandariya xwe ji civakê re berdewam dikin carne bi xapandinê ve û carne din bi hêzê ve,li gel wê em dikarin bibêjin ku vexwenderê guhertinê ( Dijberiyên çekdar) ne rastbûn bi vexwendina xwe ji guhertinê re, ew têgeha guhertinê tênegihîştin ji bilî guhertina kesayetan û danîna kesayetên din dewsa yên berê, xemên ên nû tenê berdewamkirina rêbaza pêşiyên xwe yên zorkar (Hilbûna Sûrî) (Îraq piştî ketina Seddam Husên.)**

**Herwisa ev beza dijwar bê dunde û armanc dibe, li rex gêjbûna mêjî û koçberiya wî, taku ji encama vê yekê ve bibe êzingekî ji cengên navxweyî re**
**ew ceng tiştekî li pêş xwe nahêlin, mirov û keviran jinavdibin,ji ber vê yekê pêdivîbû zanbûna guhertinê, wate û çawaniya wê, ma ew ji bo nûjenkirina jiyanê û demukratîbûna wê ye an ew derbirîneke li ser sernigûnbûn û lotikînê li paş ve?**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Ji ber vê li hember zordariya desthilatê bi hovîtiyeke berdêl têkirin, ne kêm pepûkiye ji aliyê zorkar ve, ji ber ku cengên çekdar ji berjewendiyên dewletên herêmî û navdewletî ve ne, bingehekî ji kontirolkirina rêyên wê re çêkiribûn.**

**Ew cengeke bi hevgariyê ve bindest e, van ricîman dibin têde husteya pêkanîna cûreyên komkûjiyan (Komkûjiya Helebçe 1) ( Komkûjiya Hema2) û çêkirina aloziyan û belavkirina hingemeyê ( Serbestberdana ricîma Sûrî ji girtiyên Islamî re dema vêketina bayê gelerî li Sûrî 2011) li gel wê tundî û dijtundiyê ( Ricîm û dijberiyê) dihêle xelk di nav deryayeke xwînî de melevaniyê bikin, gunehên yên berve saman, desthilatî û gendeliyê de diçin aşkere dikin bi rêya çûna berdewam û rabûna li ser xwestekên xelkê û mafên wan (Hevdûgirtina Sûrî 3.)**

**-------------**

**1- Komkûjiya Helebçe: hêzên ricîma Îraqê li hember Kurdan li bajarê Helebçe ya Kurdistanî li başûrê Kurdistanê 1988 pêkanîbûn.**
**2- Komkûjiya Hema: komkûjiyeke di Sibata 1982 de çêbû dema hêzên bejî a Erebî Sûrî û bêlûkên Piştevaniyê bajarê Hemayê dorpêçkirin li gor fermanên serokê welêt Hafiz Elesed 27 roj ew dorpêçkirin berdewam kir ji bo qirkirina raperîna Elixwan Elmuslimîn li hember dewletê.**
**3- Hevdûgirtina Sûrî ji hêzên şoreş û dijberiya Sûrî ew hemahengiyeke ji komên dijberiya Sûrî pêkhatibû.**

**Û di bin siha windabûna dîtina cûda de kom bê rêber diçin û ji hevdû ve mîna libên tizbiyê belavbûyî belav dibin,li benda kî wê bi rêve bibe, bê ku alavên rêveberkirinê binasin, di bin siha nediyariya guhertinê lê pala xwe dide li ser ramanê û çalakirina ji rêveberkirina wê ve bi rengekî kirdeyî ve  bi rêya gotûbêja bi mêjiyan re û şiyarkirina wan ve bi rêya têgihiştina wê ji sirûştiya rewşa wê ve, li gel wê civak derbirîneke ji rengê sîstema desthilatî re ye dema di**

**dîmenê wê de rewşekî diyar dibe têde maf û erkên takekesan tête daqurtandin, ji sedema bikaranîna tirsê mîna alavekî ji derbirînê li ser sertiyê ve, wê çawa mêjî rabibe û zo mezin bibe bin siha kêmanî û pêdiviyê, lê bê guman ku qonaxên mirov a yekem ta radeyekî mezin kesayeta wî ava dikin, ji ber ku fişara civakî û hestbûna bi sêwîbûnê ve û kêmaniya mezin ji nermiyê re dikare kesayeteke bê par têkçûyî ava bike , derdê êş û pêrewiya mezin berve tundiyê dikşîne , ev yeka dihêle hestekî ji tolhildanê ve diyar bibe û gera li ser mafa a windayî bi rêya xwestineke dijwar ve ji xwestina wê re bi rengekî nankor û çavbirçî ve.**

**Ew yeka dihêle kiryarê gunehbariyê carcaran durist bibe, xwedîkirin dibe amana bingehîn ji pêşwazîkirina hemî reftar û kiryarên ên zarok wêna dimêtê ji destpêka çêbûna wî ve, tewrîvanên çepgir dibêjin ku sermedarî ew tekbare yê divê li hemberê wê şer bête lidarxistin bê ku bibêjin ku totelîteriya navendî ew kargeh û bingeha sîstema hebûna wê ye û divê pêşî bête jinavbirin û guhertin, ji ber ku navendiya totelîter ew naveroka sermedarî a bingehîn e ji çi hilweşandineke civakî a hatî re .**

## 2- hewildanekî ji têgihiştina koçberîbûnê re

**Seyrbûna mirov ji tiştekî re ji derveyî tiştê ku di destê wî de ew dihêle zêde biêşe, ev yeka me dihêle em vegerin felsefeza Hindî a banga têgeha negirêdanê dike, û dibêje ku derd çêdibe dema mirov bi tiştekî ne a xwe ve tê girêdan, em dikarin wisa rêwîtiya mirov di nav koman de bi**

**derbasbûna xwe ji qonaxên çêbûna wê vegerînin ,ku ew serpêhatiya girêdanê ye, têkreçûna têgihiştina wî ku ewê din bi me ve ne girêdayî ye ew tiştekî ne diyar e ji derveyî refê takekes ve û çûna wî ya xweserî û xwesteka wî ji girêdan û pêketinê re, ji bo nîgarkirina rewşa têkiliyeke jiyankirinê armanc dike, ji ber ku di bin siha wê civakê de ,em azadiya biryarê dibînin ku ne diyar e ji henas re di bin siha ricîmeke nêrîtiyê de, xuristiya ramana a jiyanbûyî ew ê qelşanê kûr kiribû bi sedema harbûna hêmanên tirs û pêdiviya dijwar ve di navbera tofên civakî de, ji ber peywendiyên mirovî bi têkreçûn û qutbûnê ve bindest in,tirs ji şadiyê ve û dûrketin ji gera ji bo wê , ev yeka wateya wê ketina di lawazî û hingemeya henas de ye, li gel wê zoreng natebite, di vir de kêşeya azadiyê aşkere dibe,li gel wê yaseyên sert ên mêjiyên takekesan dişon û wan dihêlin bê can û mirî bin an mêrên rîbût bin, nikarin çi guhertinê pêkbînin,tenê têkreçûn û awanteya a ku hişên ên li ser her tiştî serdest aşkere û nehêne dike, li gel wê ramanvanê Rosî Nîqolay Eliksenderûftş Birdayif dibêje : ( Çi tiştê ku ji civakê ve dertê nêzî koletiyê dibe, lê çi tiştê ku ji giyan ve dertê banga azadî û derperînê dike.) bi vî rengî ve em gotinê wî dibînin berztir dibe di rewşa vê civaka dorpêçûyî de bi bend û baskên xizanî û milhûriyê ve.**

**Bê guman ku wêjeya zîndanan ( romana Şeytanok- a Mistefa Xelîfe) nûnertiya diyarkirinekî ji rewşa zîndanî a deronî re dike, li pêş lêdan, işkence û kişkişandinê ê ku ew wan jiyan dikin , ew fêrîkirineke ji aliyê deroniya wî re ye, herwiha hestbûna xwestina mirinê bi sedema azarbûnê ve, an çi tiştê ku êş û bindestî û tirsa heyî radiwestîne,**

**berhinde ji êş re qonax û çaxên berve bedkariyê li kirêtirînê radibin ta tiştê herî bi saw û bi dînbûn ve, li gel wê azarbûna pîroz heye a ku di deqên olî de diyar dibin bi rêya gotûbêja soz û gefdanê ve , li gel wê tiştekî ji hestbûna bi azadiya xwedayî  bi saw ve nîne ji ber ku tê pesindan bi rengekî bi bandor ve dikeve di hest û hizrê kesê pêşwazker yê bawermend de ta li wî pêdivî bike ku bitirse ji bêzariya a di jiyanê  û piştî mirinê  de. (Azariya gorê û  Dojehê.)**

## 3-Bandora cîgeha nû li ser  niştecî

**Em peywendiya niştecî bi cîgeha nû re dibînin ku bi temamî ve cûda ye ligel cîgeha a ku  lê nû penageh dibe, bi sedema bêhoşiya wî û xastina wî ji mîl û helwestên demborînê ve, ji ber ku guhertina têgeh û reftaran pêdiviya xwe bi demê ve heye,ev ji bo kesên bilyan in ên ezmûnên bi êş ve berî penaberiyê jiyabûn, lê ew nikarin bibin beşekî xuristî ji civaka nû re  di derbarê têkelbûnê de, eger em wan bi zarokan ve daneberhev bikin, zarok zo têkel dibin bi awayekî rehet û hêsan ve.**

**Reweşt fermandariyê dikin li ser wan kesên ên zehmetiyên têkelbûnê li cîgeha nû  dikşînin, ev yeka ne bi pêwîstî ve mirov bighîne encamekê bi çêbûna qayimbûnekê ji yekgirtinê ve bi xuristiya welat  yê lê ew kes têde niştecî dibe, têgihiştina mirov bi palpiştbûn li sirûştiya vegûhêztinên wî ve û şîrovekirina guhertinan li gor rewşên bandorbûn û bandorkirinê ê jîndarê mirovî wana pêşwaz dike bi sûd in ji bo diyarkirina peywendiyê di navbera mirov û erdnîgariyê de bi rêya pevxurîna wî bi kesayet û**

**alavan ve û wergirtina wî ji serpêhatiyên sûdmend re û beşdariya di avakirina kesayeta takekes de û avakirina zanîn û berketiyên wî bi rêya peywendiyê bi derdorê re,lê ev yeka ne hêsan e ji xwedî serpêhatiyên hevgarî ên serkotkirineke desthilatî û civakî di eynî demê de jiyabûn, ev yeka rolên têkelbûna wan di cîgeha nû de asteng kiribû, li gel wê komên serpêhatiyan ên takekesên penaber werdigrin sînora pêkanîna wan ji şopandina mercên guhertinê re ligel rewşê sînordar dike, li gel wê serguhabûna ramanî , wijdanî û viyanî di bin siha derdora nû de bi rengekî xwebexş pêknaye, li gel miqatebûna bi takekes ve û şîrovekirina paldarî û kiryarên wî ji ber ku gelek girîng e ev yeka ji bo naskirina aliyê nehêne ji kesayeta wî ve, ya armanca jiyaneke baştir dike, lê rikeberiyên rewşê û bendên jiyanê û fişarên wê ,herwiha çendayîyên ên rolekê ji nîgarkirina nîşanên jiyana mirov dilîzin mirov birêve dibin ji gîhandina rastiya a dibêje ku mirov lawê wan xêzên bêçare ne û ew li ser rehniya xuristiya rewşan mirovekî ne azad e û azadî dimîne nîgaşek, hizr mijol dike û pir caran ne xuya ye, wateya wê çi ye?**

**Çawa mirov pê şad dibe bi awayekî giyanî an daringî ve!?**

**Ev pirsînên yên di hizrê takekes de dilivin di dema gera wî ji bo penageyeke aram ta têde bijî, cîgeheke ku têde bê tirs û metirsî tevbigere, lê metirsiya mirov timî di hizr de dimîne , dema hebûn tune dibe û mirov dîlgirtiyê demborînê dimîne bi helwest, bûyer û bîrovebûnên wêna li ser henas ta demekî dirêj ve .**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Takekes timî di bîranîna demborînê de  ji reftarên xwe ve qutnabe, bi taybetî ve eger ew demborîn têde saw û têkreçûn hebe, ji ber ku lêdanên ên derbasî takekes dibin bi demê re neman nabin, lê di ne hestbûnê de cîgir dibin û tevlî koma sêwirên takekesî dibin,di hundir de dimînin, di nav xwe de dijîheviyan hembêz dikin, dema takekes bîra erdê dike, hewayên hêdî ne rêncbûyî dibin pêşkerekî ji jiyaneke baş re, têde geşbûn û ferehî gelek peyda dibe, bi vî rengî em dikarin takekesê penaber têbighin dema xwe li dor zincîrekê ji helwestan dipêçîne, wî hîşt tebitî be û li dor demsalên demborînê û peywendiyên wê pê re bizîvire, bi awayekî dudil ve, ew metirsî parçeyekî naye veqetandin ji henas ve, dihêle hensa fêrî sêwirên xwe bibe, vekişîna berve ez û dûrketina ji nakokiyên din ve bi wê re, tenahî hîşt bibe nanê jiyanê a bingehîn, ji bo em henasê binasin divê em têgeha piran di navbera xwe û  din de saz bikin, ji ber ku reqbûna a ku penaber bi ê din re dijî wî dihêle tam ji aramiyê  qut bibe, jêre xuyakirin dide ku jiyan tenê şeytanokeke li ser xwe ve dizîvire , rastî çi ye?, bi rêya tiştê ku mirov ji jiyana xwe dixwaze  tê berketin,ango tiştê wî dihêle geş bimîne û wateyên ferehiya cûrbecûr bijî.**

**Serpêhatiyên mirovan encameke girîng in ji takekes re ji bo bikaribe henasa xwe geş bike bi rêya guhertinên girîng di derbarê pêşveçûna kirdeyî de, têgihiştina vê yekê alîkariyê dike ji bo têgihiştina zikmaka rastiyê bi palpiştbûna li ser seyarana girtinheviyê ji bo baştirînê.**

## 4-Nasnameya serketî di rû nasnameyên barketî de

**Cengên nasnameyan bê guman di her cihî de û ji derveyî sînoran ve diqewime, lihevketin di kokên xwe de kêşeyekê radike naveroka wê hewildana desthilatên netewî a navendî ji binyadkirina girtinheviyên navxweyî ên gerentiya hebûn û serdestiyên wê di dewlet û civakên xwe yên resen de didin, li gel wê em Tirkên alîgir ji rêbaza Islama siyasî re a ku ( Erdoxan 1 nûnertiya wê dike) dibînin, tevî ku gelek ji alîgirên wî li Elmanyayê jidayikbûn e di nav derdoreke demukratîk de ku bi maf û erkan ve bawer dibe,lê ew tevî vê yekê şêwaz û nerînên netewî ên teng a li hember her tiştekî demukratîk derdikeve weşan dikin.**

**Ew nakokiya a cîgir di nav vê tofê de ,şopîner li matmayîbûnê dehf dide, ta bipirse li ser dûsereyîya ramandinê, eger tu bi milhûrekî desthilatdar ve bawer dibî û li pey wî diçî, çima venagerî û li welatê ku ew têde serok e najî!?, dewsa tu bi binemayên yeksanî û demukratiyê ve li van welatan şad dibî?!!.**

**Welatê ku ew têde mezin bûn e û bi civakên wê re têkelbûn e, çawa em dikarin vê şîrove bikin û vê cihêbûna ramanî têbighin dema tu piştgiriyê milhûrî û navendiya dewletê dikî di eynî dema tu li welatekî li ser bîngeha sazî , ricîma yekbûyî a ne navendî û yaseyê avabûye de dijî!**

**Ev yeka me dihêle em agehdar bibin sengerkirina parastvanê nijadperestiyê bi ramaneke li hember jiyanê û hevjiyana hevbeş napejirîne û li hember nerînên cûda**

**tekoşînê dike ji berjewendiya yekalîbûna nerîn,raman û gelemperatiya wî.**

**Em cengên nasnameyê dibînin mîna bersiveke ji suriştiya girtinheviya mirovî dema bi rêve diçe ji bo parastina taybetmendiyê bi rêya jêbirina taybetmendiya ê beranber ve an pişaftina wî di nav xwe de, li gel wê zorenga nijadan li ser nankoriya malgirtinê derbirîn dike,dagirkirina erdnîgariyê, hatinên xwarinê, gaz û avê .**

---------------------

**1- Receb Teyib Erdoxan 26.02.1954 hatibû dinê, siyasetvanekî Tirkî ye û serokê duwanizdemîn e û niha ye ji Tirkî re ji sala 2014 ve.**

**Ev rê dide aliyê serkeftî ku destê xwe deyne li ser samanê, wê hilîne û anîber bike li ser hesabê stûxwariya nasnameyên biçûk ê helistên bergiriyê li cem wan nîne taku bikaribin li berxwe bide, ji ber ku navçe bi girtinheviyan ve cîteng bûye, li ser nanê diljêçûnê jiyan dike, berdêla vê yekê pêkanîna pirojeyên têkoşîndar û jînî û vexwendina li civakeke zanyar ,xwesteka karê sazmanî dike mîna destikeke rizgarbûnê ji cenga nasnameyan a vala, eger agirên cengên gewdehî  û devên agir û gullebaranê rawestin, lê wê bi hêsanî şopên agirên gûrbûyî newe jinavbirin, ên bi xwe re heznekirî û kînê tînin, li ser tê avakirin ji aliyê ew ricîma a ku bi movikên dewleta Tirk ve ji  damezrandina wê ve girtiye, li ser bingehên nijadperst û totelîter, çi nirxî ji netewên ên pê re dijîn nade, serweriya nijada Tirkî û binyadkirina wê mîna çandeke bingehîn li dibistan, peymangeh û zanîngehan û kûrkirina daberizka ez û bişanhildana diljêçûnê bi rêya vê yekê, kûrkirina girsbûnê**

di ez de li cem nijada Tirkî bi fermaneke desthilatî ve nûbûyî bi rêya hatina ricîmên faşî, ew xatirkariyeke ji tewriya hêz re ye, kolekirina pêkhateyên lawaz, rûtkirina wan ji rabûnên hebûna xwe re,ji erd, nasname,ziman û şopên şaristanî re, pişaftina rêzimanî ê ricîmên Tirkî pêkanîbûn gerentî dabû ji pişaftina gelê Kurd di nav zimanê Tirkî de, gelek hatibûn e pişaftin, nikarin dûbere li zimanê xwe miqate bin, an nirxekî baş û
rastîn bidne zimanê xwe, bi bihaneya ku dem dereng ket û êdî nema ev yek çareser dibe, an bi rêya bihaneyên ne girêdayî bi pêwendiya ziman bi hatinrêzê ve, wisa em dibînin ku rewşa xemsariyê hatibû dîtin mîna hewildanekê ji bo hembêzkirina pişaftinê an pejirandina û rewakirina wê, ev yeka dibû ji alavên serkeftina qirkirina rewşenbîrî re, li rex hewildanên dewleta Tirk ji roxandina kevineşopên dîrokî û konewarên şaristanî li bakûrê Kurdistanê (Hesekêf) wek nimûne û kevineşopên li Amedê ya kevin (Diyar Bekir- Taxa Sûr) û wêrankirina kevineşopên (Eyin Dare) li Efrînê, ji derveyî paşguhkirina wêzimkarî li navçeyên Kurdistanî û belavkirina Islama kevinşopî têde, binyadkirina rewşa çetîtiyê a bi saloxgeriyê û artêşa Tirkî re hevkar e ,herdû gelek kiryarên wêranker li hemî deverên Kurdistanê pêkanîbûn, ji bo bazdana xwedî war û valakirina navçeyan ji xelkên wê ve û koçkirina wê ya berdewam bi aliyê bajarên Tirkî ên mezin ,hîştina Kurdistanê paşgukirî wek kavilên bêkesmayî, ji ber vê yekê armanca tewriya hêzê ew guhertina kiryarê ye di derbarê takekes û koman de ,ger bi cengên derveyî ve û qirkirinên gewdehî ve dewlet avabûn wê pişt re bête veguhêztin li qonaxa miqatebûna ji bermayên van cengan ve li ser civakê,

**bi çandina tovên têgeha serweriyê li ser jîndarên lawaztir, gotinekî oveye bicî dibe naveroka wê ku( Hêza wan pêkhateyên lawaz û bindest xurtir bû wê rikberiyeke metirsîdar li ser dewleta netewperest a bi hêz ve bikin), ma çawa dewleta Tirk hebûna xwe mîna neqşeyeke siyasî parast!?, bi rêya kirîna kesan bi pereyan ve , ji nêzikirina hinek rêvebirên êlên Kurdî ve (Hawarxwastina Eteturk ji axeyên êlên Kurdî ve di dema cenga serxwebûna Tirkî de) an bi rêya kuştin û serkotkirina şoreşan ve (raperîna Şêx Seîd Bîran sala 1925 pişt re serhildana Seyid Rîza 1937-1939), bi rêya ajotina êlên alîgir ji dewletê re li hember van şoreşan û ev kiryar tê nûjenkirin ji aliyê neviyên Toranî ve ta roja me ya îro ( çeteyên parastvanên gundan li hember partiya karkerên Kurdistanê.)**

**Ji ber vê em tekoşîndariya nijadperestiyê mîna kedekî zehmet dibînin dema dewlet mîna alavekî parastî jêre be, wî ji hewildanên gewirîn û serkêşiya cemawerî diparêze, ta bibe destûr û rêyeke jiyanê, bobelat û cengên navxweyî ta dema dûr bi dû xwe ve tîne tevî ku cîhan bûye gundeke gerdûnî biçûk ji pêşketina destikên xweşî û peywendiyan ve, lêbelê ramanên netewperest têkneçûn, lê têne çalakirin û xwarinkirin berdewam in (Rasta Millî li Ewrûpayê) û dehfandina cemaweran ji lêketinên vala ve bi dawiyê ve hatin û xêrên wê neman dibe, ji ber vê yekê ked didin di rû bivveya derbasbûna tewriya netewî û kirina wê mîna sedema parçekirinê hîn têr nake bi taybetî ve ku desthilatên xwedî moreke totelîter li hember çi hewildaneke demukratîbûnê li hundirê wêlêt an ji derveyî sînoran ve radiweste, mînaka vê yekê tiştê ku Îran û Tirkî dike ji**

**guhertina rê û aliyê van şoreşên Rojhilatnavînî ve û xwarkirina wê berve xefka Islama siyasî bi herdû şaxên wê yên Sinnî û Şêî ve, lê hewildana zorkariya fermî ji dewleta serkotker re ji bo bicîkirina xwesteka cûdaxwazî an serxwebûnê diyar e bi rêya pêngavên tunekirin û paşgukirina gellan yên dijberiyên siyasî ji van ricîman re eynî rêbaza desthilatê bikaranîn li hember pêkhateya Kurdî bi rêya berdana roparta serketinê, tiştê hîşt xwesteka cûdaxwazî an serxwebûnê xwestekeke lezlêkirî û serkeftî be dema ku bi xwestekên navdewletî re lihevhatî be, ji ber ku rastiya dîtina civakeke demukrat pêknaye di bin siha hebûna zorkariya fermî ên van dewletan pê êrîş dikin û di navbera hevdû de timî li ser piştrast û erê dikin tevî çiqas nakokî û rewşên aloz, ev yeka jî derî vekir ji destwerdanên navdewletî û zorengên herêmî re ê bêhtir gelê Kurdistanê buhaya wê ya giran dida.**

## 5- Tekoşîndariya nijadperestiyê û berzbûna civaka zanyar

**Pîşesaziya azadiyê bi rengekî kirdeyî ve bi şoreşa mêr û jinê ve girêdayî ye di eynî demê de, û rêbaza zanyariya rastîn ew ji bo jêbirina kêmaniyê û hestbûna bi jêrîtiyê ve li pêş yê serkeftî an serçûyiya hilgir ji reftarên desthilatê ve yê pê hatinrêzên xelkê dixe di bin gefê de, divê ew şoreş bê têgihiştin pêşî ji pêdiviyeke bê sînor ve ji ezgerkirina mirov ve ta dûrî kêşeyê girêdayî bi bîrdozkirina wî ve be li gor rêbaza desthilatê.**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**Berketina me ji kêşeyên kûr ya civakê ve û baweriya me bi sûdê guhertina wê û rakirina jêrîtiyê ji ser jina rojhilatnavînî ve dibe sedemekê ji zayîna ramanan re û avabûna kesayeta ne pêrew , ji ber ku takekes pêşî li dayika xwe dinêre, mîna mînakekê di destpêka çêbûna xwe de, û li alava desthilatdar a sert dibîne çawa ku dixebite ji bo perwerdekirina mirovan li ser rageha şiyarbûn û tirsê , bi mebest ve hizr mijol dike bi rêya bêkarî, xizanî û paşgukirina wêzimkariyan û belavkirina gendeliyê mîna rêyekê ji belavbûna hingemeya civakî ve, ji ber vê yekê em zanyarên mêr li rex zanyarên jin dibînin parçebûyî , ji hevdû cuda ji bo çarenivîsê xwe dixebitin, çi sazî wana nacivîne û derdê parçebûnê dikşînin, ev yeka jîniya netewê lawaz dike, wê dihêle di nav dabeşbûn û parçebûna xwe yê siyasî de be, ên ricîmên totelîter li wan bi rêya tirs û kirîna kesan ve sepa kiribûn.**

**Zanyarê azad bi kirdeya mehnedanînê û vexwendina ji tekoşîndariyê ve bawer dibe mîna rêyekê ji şiyarbûna tirsokan ve, sazîkirina naverokekê ji pirojeyên ên dikarin ji takekesan re bosteke fereh çêkin ji bo rabûnê.**

**Rizgarkirina ji hestê kêmaniyê li cem jin û mêr ve bi rabûna zanyarên jin ve destpê dike ên dikarin erkên çarenivîsî bi zanyarên mêr re parve bikin ji rêvebirina civakê ve û perwerdekirina nifş li ser rageha azadîbûna takekesî ji desthilata bîrdoziya partîtiyê an desthilatiyê ve di qata bilind de bi rêya pesindana zanyarê azad û beskirina bişanhildana tek serokî ji bo berhemdana serokên ên wêzimkariyê dikin û bêdeng dixebitin.**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Malgirtina bîrdozî ew hewildana darjêdankirina dilniyabûn û ciwanîkirina wê bi raçête û dagihêjîtinan ve ,pêrewîkaran hewil didan cilê rastiya a gumanî pê nabe lêbikin, di dema ku zanyarên jin û mêr li hember van hewildanan ji kevin ve radiwestin, gelek ji wan jiyana xwe jidestdabûn li pêş dadweriyên soraxvanîkirinê ên bi husteyî ve wana azar kiribûn û berhemên wana sotandibûn, eger çendîn şîrovekar xwestin desthilatiyê ciwan bikin û cilê çaksaz û feylesofan li wana bikin lê ew bi serneketin.**

**Mildana cemaweran bi koratî ve ji pirûpogandeyê serokê birêz û pendiyar re binyadkirineke ji gendeliya giyanî û reşepêşkirina ramanî re ye bi rêya rewakirina mildanê û kirina wê mîna erkeke niştîmanî, herwisa zanyar di metirsiyeka mezin de dimînin, tên e dabeş û parçekirin , zehmet dibe anîna wan li ser peyv û nerînekê, beşekî ji wan dibin pirojeyên pêrew tenê gotinên xweş dibêjin û dibin layîngiriya desthilatê tevî (diljêçûna wanî veşartî jêre), beşekî din bi giştî ve dûrî dîmenê vedikşin bi rêya koçkirina ji welêt ve an bêdengiyê an carne serserîtiyê dikin bê hemahengî an pêkanînên ku karibin guhertinê pêkbînin, kesê çevsênîbûyî bîra xwe bi xwe re radike eger berî xwe bide ku derê, bîr dibe amaneke hemî dîmen û bûyerên mirov kurtas dike di hundirê welatê xwe de bi taybetî ve qonaxên çêbûna wê ya yekem, ji ber vê yekê yek dibêje ku cîhan tevî ku di warê erdnîgariyê de bête dabeşkirin di navbera rojhilateke giyanî û rojavayekî hişmend de lêbelê hatina koman û tevderbasbûna wan bi hevdû ve wê erdnîgariyê tebitî nehêle û ne jî çavkaniyên zanînê lê wê her**

**tiştî bimîne di nav têkelbûnê de , ji ber vê yekê em guhertinên deronî dibînin ku berve vebûnê di navbera çandan de çalak dibin, ta erdnîgarî bimîne bin siha şoreşên pêwendiya civakî (Fêsbûk,Tiwîtter,Instagram , Youtûbe û Whatappê ) li pêş hemî hatinrêzên nû wê vekirî bin , wê ropartên nijadperst nikaribin têkelbûn û hevdîtinê sînordar bikin.**

**Desthilatbûna a li ser civakê pêkhatî, tenê jehrên xwe di hizrên takekesan de berdide ta wan bike qurbaniyên lîstoka rev û bazdanê ji rewşa lêketinê ve.**

**Nijadperestiyê mîna şepêleke ji aliyê hevjiyana hevbeş ve nevêtî dibe .**

**Ew ji bermayên ceng û girtinheviyên navxweyî ne ên di navbera pirkes û kêmkesan de çêdibin, şopên xwe yên deronî di hundirê xelkê de dihêle ,ên rastî serkotkirinê tên, dibe ku koçberiyên ên ji zorkariya siyasî ve encam didin bi rastiya rabûna nijadperestiyê ve peywendîdar be, mîna binemayeke jiyanê partî an dewletên ên li berbijariyên mezintir û destketiyan digerin lê xwedî derdikevin, di baweriya xwe de ku ew xwedî bişanhildana dîrokî ne û timî ji serdariyê re di her çax û qonaxekî de şiyandar in ,ew komelbûyîn mîna hewayeke lihevhatî saz dike ji bo rabûna nijadperestiyê û hestbûna bi cûdabûnê ve ji rengên civakî yên heyî re, herwiha dibe metirsî li ser çand,desthilat û navendîbûna fermandariyê.**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Tirsa Tirkan ji kurdan ve ji baweriyekê ve pêktê ku Kurd metirsî ne li ser welatê Tirkiya yê ê ku beşekî mezin ji erda wanî dîrokî ve li gel dewletên cîran hembêz dike , ji ber ku sabara Kurdistanî mîna şevpestek e li hember wê û divê pîlanên berdewam bêne amadekirin li hember hewildanên wê ya berdewam, ji ber vê yekê nijadperstiya rojhilatnavînî dijminê demukratîbûnê ye û piştgirê dewleta netewperest a saloxgêrîtî ye , ê timî ol bi awayê xwe yê ragehî ve bi xwe re têkel dike mîna destikekê ji fermandariyê re û gerentîbûna pêrewiya bêhişan bi rêya dergeha Islama siyasî ve.**

**Nijadperestiya Ewrûpî bersivek bû li hember penaberên ên li welatên wan niştecî dibin, mebesta min ew nijadperestiya nûjen ê her û her hêdî hêdî bi derbasbûna demê ve bilind dibe, bê guman cenga navxweyî li Sûrî, girtinheviyan ji derveyî sînorên wê ve şiyar kirin, ger li Tirkî an Îran an li cîhana Erebî û welatên Islamî bi giştî ve ên derdê xizanî,gendelî û bêkariyê dikşînin.**

**Ew dibûn naverokeke dewlemend ji rabûna komên Islamî re ên sînoran derbas kirin .**

**Çûna bi aliyê tekoşîndariya nijadperestiyê ve di zanîna zimanan de û peywendiyê de ye bi gellan re, li gel wê ramana parçekirina xelkê di navbera tofên bilind û nizm de xwestekeke rêbazbûyî ye ji bo rêvekirina li pêş girtinheviyê û bergekirina wê bi awayekî bîrdozî ve, ta bibe rêyekê ji dagirkerî û serdestbûnê re bi rengekî hêsan ve, ji ber ku çi bihaneyeke hişmendî ji gotinê wî Elmanî re nîne dema Êmanoêl Kent 1 1724-1804 dibêje (wekî zêdekirina li ser**

**tewriya wî ya zanyarî ve bi dabeşkirina zayendên mirovî li gor reng), gotibû ku zayendên bêhtir jîr û pêşveçûyîn û beşdarbûn ji avakirina şaristaniyan re ew zayendên sipî ne, pişt re zayendên zer tên ,dûrre reş lêbelê zayendên sor û hindiyên sor û gelên parzemîna hindî mîna bedtirîn zayend tên ji aliyê jîrbûnê ve û kêm pêşdikevin li gorî derbirîna wî!.**

**Feylesofên pêrew ji kar û barên desthilatên xwe re timî bihane didabûn e wan ji bo xwe berfereh bikin û serweriya xwe berdewam bikin.**

**Em yê Engilîzî Dêvid Heyom 2 1711- 1776 dibînin dema dibêje bi dûrxistina nijadên ne Ewrûpî ve û wisa diaxive :**

**( Ez qet guman nabim ku reşik û hemî cûreyên mirovan ew di xuristiya xwe de ji mirovê sipî ve jêrtir in.)**

**Yojîn Fîşer 1874-1967 banga paqijkirina mirovan û kuştina dilovan ji seqetan re û qirkirina Cuhûyan kir, van helwestên tarî ji binî naghe rastiya mirovê zanyar, lê bervajî gemiya mirovahiyê û aştiya afrênerî diçe, ê mebesta min bi wê avakirina stûnên huner ,pêşesazî û afrêneriyan ji bo jiyana mirovî a yeksan û pêkanîna geşepêdanê ji bo xêra hemî qat û bijardeyan û parastina destketiyên mirovê hişmend li hemî deverên hebûna lihevhatî.**

**Ewrûpa ramana ne jinxwaziyê bi gellên din re derbas kiribû, bervajî gotina ewê Ferensî Arthir Gûbîno 1 1816-1882 ê guman dikir ku tekelbûna nijadan û**

**jinxwaziya wan ew sedemek e ji têkçûna şaristaniyan ve dema dibêje : ( Arîbûn têkdiçe bi rêya têkelbûna bi hunerê n reşikan ve.)**

**---------------**

**1- Êmanoêl Kent: Ew fêlesofekî Elman e ji çerxê hejdemenîn e 1724-1804 , jiyana xwe hemî li bajarê Kunisgbêrg li şanişîna Birosiyayê bihûrand, ew dawî fêlesofên bi bandorbûn li ser çanda Ewrûpî a nûjen.**

2- **Dêvid Heyom: di 26 Nîsanê sal 1711 de jidayikbû û di 25 Tebaxê sal 1776 de koçkiribû, fêlesof,dîroknas, û aborînasekî Iskutlendî bû û kesayeteke girîng bû di felsefa rojavayî û dîroka ronakbîriya Iskutlendî de.**

**3- Cûzêf Arther Gûbîno: 14 Hizêranê 1816- 13 Çirya pêşin 1882 xanedanekî Ferensî ye, pêşdebirê tewriya serkeftina nijada Arî ye.**

**Em îro têkelbûn û pirbûna çand û şaristaniyan dibînin ku hinira raberî,raman û berzbûnê li cîhana bê bend û sînor berdide , li gel wê zanyarê Birîtanî Tişarliz Darwin 2 1809-1882 di pirtûka xwe de (zikmakê cûreyan) tewriya xwe pêşdebiribû û nexwest xelkê di navbera tofên bilind û jêrîn dabeş bike, ji ber vê zanyarên ên berketin û raberiyên xwe ji bo civakek e zanyar bikaranîn ewê di xwe de taybetmendiyên ku wana dihêlin hebin û serbikevin bi wê xweşrewş dibûn, lê ew tofên ku bi jehrên tundirewiya olî û netewî ve têkçûyî mabûn timî bi tembelî û jêrîbûnê ve bindest in, ji ber dibin barekî zêde li ser heyînê, dema li ser diljêçûn û nijadperestiyê û xewinên serketina diravî a nijadî dijîn, ew rêberên dirindîtî ,kuştarên giştî û koçkirina bi zorê ne, nikarin têkelbûnê bi giyaneke nûjen ve têbighin, ji ber ew ji zanyariya a ku bi rewişt ve yekbûyî ye dûrketibûn.**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Hebûn tenê ji zanyarên jin û mêr re ye ên li pêş rêya xwe astengiyan radikin û bi binema yekîtiyê di navbera jin û mêr de bawer dibin, bê pêrewî û kêmîtî, ji ber ku hebûn para afrêner e , ev yeka rizgariya hebûnê ye û dawiya desthilatî û pilana li ser mêjiyê ye, ji dergeha sazkirina tirsê ve.**

**Netewperestên rojhilatnavînî ji Ereb,Faris û Tirk û jibilî wan gellên ne li gor xwe mîna çeteyên girêdayî bi derve ve dîtibûn û divê bêne hilkirin, serkotkirin an pişaftin li gor berketiyên xwe.**

**Va zanyar Curc Terabîşî 3 dibêje : ( Pir tewrîvanên netewperest gîhan astekê ji mendalekirina kêmnetewan ku wana danasîn kirin ku ew kêmnetew ji çêkirina mêtingeriyê ne, ji ber ku kêmnetewan hebûnek wanî bi xwe nîne, lê ew di rewşên herî baştir ve tenê derzên dîrokî ne, lê entîke ne divê carek din têkevin di yaseya helandin, parçekirin û piştre têkelbûnê, ew tu carî bi çi rewşî ve nabin nîşana cûrebûn û çavkaniya dewlemendiyeke şaristanî.)**

**Wisa civak hatibû parçekirin û bizdan di jiyana xelkê de weşandin, zorkarî mîna bergekî giştî diyar bû, desthilata netewî wê mîna rûpêçekî li xwe kiribû.**

**Zanyarên Ewrûpî berî xwe dabûn e penda cûrebûnê, hevdîtina mirovî û pêguhertina rewşenbîrî di navbera netewan de, ji nirxê mirovê hişmend li hebûnê bi serketibûn, va em zanyarê Ferensî Kilûd Straws 1 1908-**

**2009 dibînin tewriya nijadê bi rengekî dij saz dike û dibîne :**

**------------**

**2- Tişarliz Robert Darwîn: zanistvanê dîroka xuristî û ciyolocîk e, li Engêltrayê 12 Sibatê 1809 jidayik bû, 19.Nîsanê 1882 koça xwe kir.**

**3- Curc Terabîşî: 1939- 16 Avdarê 2016 , ramanyar,nivîskar, rexnegirekî Sûrî ye.**

**4-**

**( Cûrebûna çandên mirovî divê bi awayekî bêcan ve newe berketin, ji ber ku civakên mirovî ne bi tenê ne, dema di asta herî dûr de ji pileyên cihêbûnê ve dimînin dîsa jî pergalên parçeyan an koman distînin.)**

**Berhinde ev piştrastkirineke li ser serkeftina nirxên ronakbîriyê beranberî lawazbûn û pûçbûna gumanên nijadperestan û tengiya asoyê wan.**

## 6- Dîtinekê ji awayên sazbûna sitemkariya siyasî ve

**Têkiliyên mirovî hatin guhertin taku di navbera alîgirtinan de bêne dabeşkirin, û nirxê xuristî ji peywendiya xuristî ve li pêş hezkirina desthilatî û têkalîna peyrewan li dor hevdû kêm dibe.**

**Ev guhertin û dabezîna di rewşê de amadebûna dirindî li cem mirovê pêşbaz ji bo limêjkeriya hêrsê piştgîr kir, peywendiyên qezencî dewsa peywendiyên xuristî cihê xwe girtin û dêmên mirovê diravî pir bûn û ji dema hêsanbûna jiyana wî ya destpêkê ve zehmetir bibûn, êdî li pey rewşeke li ser sertiyê ve cîgir e dikeve û wê bişanhildan dike, ta bibe**

**mîna eynikekê jêre an pîvanekê ji têgihiştina başbûnê ve û çûna bi dû wê ve.**

**Dirinde li vir serwer e û li ser vînan serdest e, ew wan bi dîmenên hêz û şehnaziyê ve dinixûmîne, taku bedewbûn, xweşikbûn û ciwanî bibe dîmeneke nerm ji dirindiya jiyana nûjen re ê gelek mirov xwe pê girêdidin bi bihaneya nûjenkirina jiyan û nirxan ve.**

**Ev yeka berzbûnekê saz kiribû bi aliyê harbûnê ve ji pêşbirk û zorengê ve herwiha ji malgirtinê re, berhinde komkirina girtiyan di zîndanê de û pêşwazîkirina wan bi rêya afirandina cûreyekê ji azarkirinê ve bi sernavê ahenga pêşwazîkirinê (girtîgeha Tedmur1) dibe yek ji ferehkirina pêşesazîkirina dirindî ve.**

**Guhertina mirov ta bibe jîndarekî tevlîhev di kar û kiryarê xwe de, şîn û işk hildikşîne, dibe wêranker, bi rêya azarkirina wî ji rêya dergeha zorbazî û tolhildanê re, ji ber diyardeya girtiyê siyasî di xuristiya xwe de derbirîneke li ser pêşesazîkirina dirindiyê, girskirina bizdanê di jiyana takekesan de wana berve dawiya wan dibir.**

**-----------**

**1- Zîndana Tedmur: zîndaneke leşgerî bû nêzî bajarê Tedmurê a çolî dikeve li rex kavilên wêna yên navdar piştî 200 Kîlometran bakûrê rojhilata paytexta sûrî Şam, di sala 1966 de hatibû vekirin, di bîngeha xwe de ji bo leşgeran hatibû çêkirin di bin rêveberiya asaîşa leşgerî de ye, navê zîndanê bi navnokitinê ve girêdayî ye, di sala 2001 rêxistina lêborîna navdewletî raporekê belav kiribû wê zîndanê pesindan kir ku (hatiye çêkirin ji bo mezintirîn zorbazî, tirs û derd di dermafê girtiyan de pêkwere.)**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Azarkirin hat bikaranîn bi gumana gera li rastiyê û naskirina gunehkar di kevin de, li Yonanistanê û di dema Islamê de û berî wêna, herwiha di serdemên navîn de, mîna destikekê ji parastina keşeya katolîkî ve hatibû bikaranîn, li gel wê di salên şêstan de ji çerxa buhirtî ve zanistvanê deronî Stanlî Mîlgram 1 ezmûnekê li zangoya Yayil pêkanîbû ji bo têgihiştina pêvajoyên Holûkustê ên leşgerên Nazî li cenga cîhanî a duyem pêkanîbûn û zanistê deronî a Emrêkî Filîb Zimbardo 2 ezmûnekê li zîndana Stanfordê pêkanîbû , gîhabû encamekê ku kesên azariyê pêktînin divê pabendî fermanan bibin ji ber ew baş bawer in bi ricîmekî bîrdozî cihekî xwe yê civakî û sazmanî girtî ye û mirov di sirûştiya xwe de bi awayekî suriştî ve fêrî derdora civakî a ku têde dijî dibe û armanca ricîma Baes a serkotker ew sînordarkirina afrêner û ramanyaran û radestbûna wan bi sedema azarkirin û sixêfan ve yê rastî wana dihatin, ji ber vê yekê terora dewletî li ser çi teroreke dijî wê zêdetir dibe û bi kirêtî cihê xwe di dîmenê dîrokê de distîne, ji bo ku desthilat xwe ji roxandinê ve rizgar bike sertiya bê sînor pêktîne, pêşesazîkirina terora dewlet, partî, komên biçûk,Komelêyên nepenî, Mafiya û malbatê ew li ser xwe parve dikin, li gel wê teror ji ramanekê ve ku di henas de bi lez ve tê mezinkirin destpê dike, ta bibe binemayek an zagonekî.**

**Rastiya vê yekîtiya dîrokî di navbera mêrê ol û desthilatê de gelek derdên dirindî bi xwe re derxistibûn, tirsê piştrast kiribûn wekî dibistan û zanista çêkirina mirov bi herdû şaxên wî ve a oldar û ji fermandar ve pir tirsok .**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Ev yeka rê dûz kiribû li pêş berzbûna ricîmên bi hêz û serkêş gelek pispor in ji eyarkirina kelejana cemaweran ve, stonên çandeke gelemper û olî binyad kiribûn taybetmendiyên xwe ji efsanîbûn û rewrewkan ve distandin, ên bibûn rêbaza jiyana rahênanî a li ser şagirtan ji zaroktiya wana ve hatibûye sepandin, ev bijardeyên xort dehfandibû ta bi çi tiştê vala biramin ji bilî mijarên guhertin û demukratîkbûna naverokî .**

**Bê guman ku avakirina nimûneya zanyarî li cem takekes di bin siha vê rewşê de pêdiviya xwe bi berzbûna navendên ronakbîrî mezin heye bi cemaweran re dikeve di dan û standinê de bi rêya wêje, raman û hunerê ve, pêdiviya vê yekê bi saziyên xurt ve heye gotûbêjên xwe ligel desthilata siyasî kûritr bike , ji bo bi pêşesazîkirina biryar û çêja giştî ve beşdar bibe, bê vê yekê şoreşa zanyarî pêknaye, ew şoreş aştyane ye ne sert e û di sirûştiya xwe de gendeliyê napejirîne.**

**-----------**

1. **Stanlî Mîlgram: (15.08.1933-20.12.1984) zanistvanekî deronî civakî Emrêkî ye, gotar û xwendinên cûrbecûr pêşkêş kirin.**
2. **Filîb Zimbardo: rojbûn 23.03.1933 li Niyûyûrkê Emerêka, zanistvanekî deronî ye û mamoste ye li zanîngeha Stanfordê, di sala 1971 de navdar bû bi rêya pêşkêşkirina wî ji ezmûna zîndana Stanfordê a navdar , gelek pirtûk û gotar di warê zanista deronî nivîsandibû.**

**Desthilata siyasî rewşeke qayim e di xuristiya xwe de, lê hişmendiya desthilatî mirov dikare kêmtir bike bi rengekî ramanî ve bi rêya vekirina derfetan ve ji hemî zanyaran re ji bo di bîngeha wê de ji jor ve ta binî ve têkel bibin .**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**Ev yeka dibe kelem li pêş diyarbûna dirindîbûnê , em wêna bi berdêla bi sûd ve binav dikin, berhinde hişmendiya gelemper naye şikestin tenê hêdî hêdî û bi rêya ramandina bi geşepêdana hişmendiya afrênerî ve li cem takekes kêmtir dibe , taku bi rê û hunerên rêvebirinê ji zaroktiyê ve huste bin, ramandin ji derveyî bişanhildan û guhdana desthilatiyê bûye tiştekî zehmet, berhinde hişmendiya afrênerî li cem zanyarê jin û mêr mijol e bi rêyên rizgarkirinê ve ji kulbûnên desthilatî û derzên wêna li ser hizr ve, jihevekirineke diyar ji aloziya ramandina toj ve nîne, ê ku mirov bi tenê wêna jiyan dike di dan û standinê de bi pirsên xwe re û sînorkirina derbasbûna xwe di hundir de ta nebe pişt re sedemekî xuristî ji rikberî û raperînê re, berhinde reşbînî û dilzariyê nûnertiya riwê giştî ji jiyanê re dikin, di çarçoveya wê de windabûna mirovê rojhilatnavînî di nava windabûnê de encam dide û radestbûna wî pişt re ji qamebûneke ramanî pasfinde re, ji tembelbûneke giyanî û hizrî tê ,nayê derbaskirin tenê bi zehmetiyekê ve, bê guman ku wêje û huner bi pêvajoya lihevketina desthilatî ve bandor dibin, li vir em dikarin bibêjin ku zanyar dûrî destwerdanên desthilatan û fişarên wana radiwestin , ji dîmenê ve bi giştî ve dûrnakevin, tenê bi awayekî ve dîtinên wanî bê alî xira nake bi aliyê geşepêdana ramanên nû ve, ger bi desthilatê ve civiya an li hember wê sekinî.**

**Ma gelo em dikarin têgehên desthilatê ji nehestbûna komî ve jêbibin?!**

**Tenê bi derketina rêveberiyeke nû ve?!, ma derketina tewrîkirineke bîrdozî kêşeyê çareser dike ta bibe berdêlekê**

**ji desthilatiya berê re!? ,an ew desthilatiya nû divê hinek reftarên wê desthilatiya berê bihêle ji ber ku henas fêrî cûreyekî ji fermandariyê bûye, nikare bi hêsanî jê veqete, tenê piştî salên ji perwerdekirin û rahênanê ve?!**

**Xalek din heye diyar e û girêdayî ye bi rêyên naskirina pêşerojê ve ji bo derketina dirindîbûnê ( Şoreş) , ji ber ku Foltêr 1 berî mirina xwe 1787 behsa şoreşekê dikir dema got:**

**(Xort wê rewşa wan şadtir be ji ber wê tiştên ciwan bibînin, Ferensî timî dereng tên, lê ew di dawiyê de tên.)**

**li gel wê di reweşta desthilatê de hinek zanyarî hene rê jêre vedikin ji bo zêde serdestbûnê li ser xelkê pêkbînin û li rexê din zanyarî hene xelkê bêhtir bi girsbûna bobelat û felaketên ku li ser wan dimeşin şiyar dikin ,pişt re tevdigerin taku hewil bidin mafên xwe bistînin, berhinde em paşketina ragihandinê dibînin ta pileyekê qedexebûna Setelaytê li Sûrî di dema serokê berê Hafiz Elesed de ta sala 1995 û li hin deveran de mîna Koriyaya bakûr û Îranê ta dema niha qedexeye, herwiha destikên peywendiya civakî mîna Fecebook û Youtubê li Sûrî berî 2011 hîn qedexebûn, tevî ku niha bê bend e lê di bin çavdêriyeke dijwar de ye herwiha li Tirkî hinek dewletên Islamî, li gel wê jiyana takekes li ser Intirnêtê rikberiyeke ji desthilatiya totelîter re çi netewî an olî.**

**Cenga desthilatan li hember rewaniyîbûna gellan û hewildanên wana yê têkçûyî ye ji avakirina tiştê ku tê**

**hilweşandin ve, hemî stonên cîgirbûn û ewlehiyê têkbiribû, tofên berketî ji dijwariya rewşê ve , hîştibûn berve bijareyên bê dunde û westiyayê biçin, an berxwedanî an bazdan ango derketina bi zorê ve, bi vî rengî ve valahî di nav cemaweran û ricîma siyasî de kurtir dibû a bi awayê xwe ve destê xwe li ser meydanên jiyanê datîne û rêbaza hingeme û bizdanê di navbera tofên portbûyî de bi ewlehî û tebata wê ya deronî ve didûme, ji ber cîhana qamebûyî ew armanceke ji ramana serkotbûna berpêşbûyî ve, afirandina jiyaneke nivyayî bê can ji armancên hişmendiya totelîter e, berhinde helweşîna naverokên xelkê a hatinrêzî nûnertiya alava berdewamiya desthilatê dike û gerentiyê dide cîgirbûna wê, dewleta Baes gewdehên xwe yên bi jehr di nav civakê de çandibû, rêbazên xwe di hişmendiya zarokan de çandibû, bi vî rengî bi salan ve li ser pirupûgendeya Baes û ramanê wê ya bêgur ew zarok xwedî bûn ,helbet wê nikaribin şoreşekê li hember wê birêve bibin, (Riyad Hicab 1) (Rifet Elesed 2) (Ebdulhelîm Xeddam 3) (Esed Elzûbî 4) û ji bilî wan wek nimûne.**

**Lê berî vê yekê divê pêşî ji bêguriya netewî rizgar bibin û nirxên sivîlbûna nûjen vexwin, ev yeka li ser wan pêdivî dike ku hewayên xweşî û pirjimariya nijadî û olî biafirînin, ev yeka nema şiyan e di bin siha vê awanteyê de a her tiştî tarûmar kiribû û cîgeheke xuristî ji çete û teroristan re afirandibû ,ên ji her alî ve kom bibûn taku ramanên Islama siyasî a pûç belav bikin (hevgirtina Sûrî û baskên w êna yên leşgerî) dewsa desthilata Baesa fermandar, ji ber desthilatiya Baesî hemî jêhatiyên azarkirinê wergirtibûn ji têkbirina şoreşa girtiyê siyasî ve û hewildanên wê ji**

**guhertinê re , hemî van destikan ji wê xêza dîrokî ji serkotkirina ricîmên siyasî ji cemaweran re wergirtibû, û serdestkirina li ser coş û sewdaya wê, nêzikbûna desthilata milhûr ji mirandina jiyanê ve di çêja cemaweran de li ser dostaniya xwe bi dîroka dirindî re derbirîn dike ta astekî**

----------------

1. **Riyad Ferîd Hijab: rojbûn Dêrezzor 1966, endezyar û siyasetvanekî Sûrî ye,serokê wezîran bû li Sûrî, herwiha wezîrê çandiniyê bû.**
2. **Rifet Elî Silêman Elesed: rojbûn 22.08.1937, cîgirê serokê komara Sûrî a berê bû, birayê serokê Sûrî bû.**
3. **Ebdulhelîm Xeddam: 15.09.1932- 31.03.2020 yek ji navdartirîn hevalên serokê Sûrî a berê bû.**
4. **Esed Ezzûbî: rojbûn 1956, ragir û firokvan bû tevlî Ekadîmiya hêzên ezmanî bû di sala 1974 de li Sûrî û di sala 1977 de jê derket.**

**pir metirsîdar, dema aliyekî girêdayî bi dîroka kevin ve vejîn dike , ji xwedawendîkirina serok û avakirina peykeran jêre li kolan û holên giştî, hijmara wêne û gotinên ku li ser dîwaran nivîsandî wê serok neke nîşaneke ronakbîrî lê lekeyeke reş di dîroka mirovahiyê de, li gel wê ew milhûriya hizrî a ku rojane tê pêkanîn dihêle bawerî di navbera bîrawerî û hişmendiyan zehmet be bi sedema tirsê ve, ji ber ti pêwîstî nîne ku takekes bi amadebûna serok birame ji ber ku serok nûner e li ser huner, raman û bedewbûnê.**

**Perwerdekirina şerûdiyên dijminane û xwarinkirina wan bi ufkufî û diljêçûnê ve ji kiryarê desthilatên totelîter in, dema ramandina rexnî dibirrin ji berjewendiya radestbûnê ve ji resenî û bilindbûna serokê xêvzana re, taku çi şitilekî şîn hişk bike, ji ber zorbazî timî tevgerê lixwedike û beranberî wî jî zorbaziyeke dij derikeve,tundî bi her tiştî ve girêdayî**

**dibe, yek ji balatirîn rengên wê ew yaseya tivîkirî, berhinde yase bi sertiya xwe ve tête naskirin û bi pêdivîbûna hêzekê wê sepa bike û kesên ku wêna binpê dikin jî siza dibin, saw bi xuristiya peywendiyê ve di navbera takekesan û ricîma a ku saziyan birêve dibe de tevderbas dibe li kêlek jihevketina cemaweran a giyanî yê koman dehfdabû berve hingemeyê.**

**Berhinde rewşa Kurdistanî di bin siha ricîmên ên Kurdistanê dagir dikin de cihê matmayîbûn û serybûnê ye, li gel wê serkotkirin rêxistinên dijber birêvebiribû taku ji xewina avakirina sabarekî azad û serbixwe dakevin ta xwesteka erêkirina axaftinê bi zimanê dayikê ve an sivikbûna tenahiya xwediyên nerînê, ev hemî bi encamê kevirbûna wê desthilatiya rêxistinî ve û pêrewiya wê ji ricîmên herêmî re, ji ber li ku derê bêhiş hebin kedxwar hene.**

**Rewşa Kurdewarî tê berketin gelek caran ku ew ji encama wê hevpeymana hevbeş ve ye di navbera desthilata fermandar û rêxistina dijber de , ango mînaheviya alavan û şêweyên pêşinyarê em wê dibînin bêhtir nêzî pişaftina xwebexş bi Tirkbûn, Erebûn û Farisbûnê ve ye û çûna bê ageh ji qalibûna totelîter di talîzoka perestbûna takekes de û ev yeka ji nîşanên nezanîkirin û gunûkirina cemaweran ve ye, ev yeka taybetiyên ku bi hilketin ve girêdayî di herdû saziyên olî û partîtiya totelîter de çêbûne têknade , ev dimîn e bersiveke diyar ji rewşên windabûn û koletiya çêbûyî ve bi dijwarî ve, dema hatibûn e damezrandin li gorî**

**pêwîstiyên qonaxê, wekî çaxên destpêkên çerxa bîstan di parzemînên cîhana kevin de.**

**Em dibînin ramana netewperst û Islama siyasî a comî ên têkdayî bîçimên jiyana demukrat li cem gellên Rojhilata navîn têkbiribûn, ji ber vê yekê pêdivîbû nêzikbûna ji pirsgirêkan ve mîna rastî, rêje û aşkerekirinê .**

**Ev yeka sûdtir e ji bo bidestxistina baweriya cemaweran bi rêveberî û rêxistinên wêna ve, berhinde vejînkirina roparta salên heştiyan a şoreşgerî û hewildana nûkirina wê mîna hewildana saxkirina laşekî gendbûyî ye, ji ber cemawerên arandî bi bandora roparta desthilata netewî ve bi baweriya ku serok xweda an pêxemberekî hatibûye şandin ew bervajî gotina feylesofê Ingilîzî ye Cun Lûk 1 ê gotibû :**
**( Serok rêncbereke li cem gel û mafê cemaweran e wî paş ve bidin eger desthilatiyên xwe derbas kiribe.)**

**Tiştekî vîna komî û takekesî têknabe ji bilî du tişt : gendelî û reqbûn, li gel wê em di vê derbarê de dibînin ku tekoşîndariya ramanî ji neyînî û kiryarên cemaweran ve baştir e ji ketina di xefkê rikberî û girtinheviya zîzbûyî de, bin siha gengeşekirinê , ji ber hebûna reftarên desthilatî mîna ricîma seroktker a dewletî ye, takekesan girêdide û li ser dûrxistina afrêneran dixebite, çênabe gengeşkirin bi mêrê olî re a rojhilatnavînî an bi partîvanekî totelîter re, ji bîrdoziya partiya xwe ve dûrtir nabîne, ew herdû li ser yek xêzî dimeşin parastina ayîndariyê, li gel wê mêrê ol û partiyê totelîter jiyana xwe terxan kirin ji bo parastina giyanê bavaniya malbatî û bi çêja civakan û gunokirina**

**wan ve bi derbasbûna dîrokî ve lîstibûn, li gelek cihan de cemaweran kiribûn mîna çepikvan bi bandora tirs an reweştê ve.**

**Huner ji derveyê wê ve stona hebûna mirov di zelalî û ramanbûnê de saz dike û di hundirê xwe de rikberiyekê nîşan dide li hember rewrewka tirsê a ku desthilatiya totelîter li ser hişmendiya hundirîn a cemawerana sepa kiribû, berhinde zimanê babetî timî berve dan û standina bi nêran re ji bilî mêyan diçû, pêdivî bû timî piştrastkirina li ser ku ew yekîtiya zanyarî saz nabe an bi sernakeve bê yekbûna zîrekbûna ramanî a bingeh in wêna jin li rex mêr radike, bê tenêbûna bi roparta nêrîtiyê a bi şêwazên zimên ve berz dibe û alavên wê a hevdûdanî ,yê berî xwe dide mêr ji ber ku ew serdestê lemlateyî ye.**

**A girîngtir di vê derbarê de , em bi cîbecîkirina destketiyên mirovê hişmend li her meydanî bibînin wê berî vê an piştî wê hewildanên rahênana ramanî ji tofên sert re pêkwere , ên kiryarên zordar an gunehkar kiribûn bi rêya ol an netewê ve hatibûn e xapandin, mebesta min bi vê herdû zayendan in, cîhana jin û mêr, li gel wê vekişîna rêxistina dewleta Islamî mîna mînakeke nêzik bi dû xwe ve hezarên dîl (kampa Hûl) hîştibû, bi taybetî ve jinên ên dibûn e navenda bi kêşe ve ên ku dikarin tundirewiyê bi dilsozî ji zarokan re veguhêzînin, ji ber vê pêwîst e ew jin bêne perwerdekirin bi derbasbûna wan li gelek qonaxan ta**

**---------**

1- Cun Lûk : feylesûfekî, siyasetvan û ramanyarekî Ingilîzî ye 1632-1704.

**qonaxa rehetbûnê, ji ber vê yekê dirindîtiya desthilatî û dirindîtiya malbatî di naveroka xwe de yek in, çi rûbirûbûn li gel desthilatê pêknaye bi rêya takekesan ve,an bi biryarên yekalî sînordar ve, lê bi rêya kanîna mirov ku van lêdanan derbas bike û li gel rewşê jiyan bike.**

**Ramandina bi tekoşîndariya vê zorkariyê ve û damezrandina tovên lihevhatineke rastîn û germ takekesên ronakbîr dehf dide, ji bo bi azadbûn birêkevin û bi rengekî bi rêk û pêk ve, ji ber nêrîtî pêdiviya xwe bi girêdana nîşanî heye bi têgeha başiyê ve, bêhtir bi girêdana wê bi têgeha sêgariyê ve, li gel wê nêrîtiya a zanyarî wateya wê nazikbûn û tenikbûn e û bi dan û standina herî xweş re bi zayendê din re, mêyatiya zanyarî ew bersivdana aşkere ye ji nîşanên evînê re .**

**Û vexwendinên wê ji hevpariyeke rastîn re , bi rêya wê tovên ricîma desthilata totelîter têkdide û bermayên wê yên neyînî jêdibe a ku di komek reftar û reweştên girêdayî bi Islama siyasî ve bi rengekî rasterast ve berzbûyî dibe.**

**Beşdariya zanyarî li gorî ( Evîn hebûn e û hebûn zanîn e) li dij bijara tevgera Femînî radiweste , lê timî hewil dide tovên xurt weşan bike ji bo berhemkirina rabûnekê bi yekîtiya herdû zayendan ve pêktê, ji ber bi têgihiştina me ji bijardeyên zanyarî a bi hêz ve di desthilatê de, em dikarin bibêjin bi pêdivîbûna bicîkirina nîşanên sîstemek e azad ku bi tundî ricîmên fermandariya comî xwedî rengeke netewî têkdibe bi rêya vejînbûna civaka zanyar ,ew dikar e ji**

**dezgehên rêvebirinê ve dûrnekeve lê pê re bimîne û kêmaniyên wê sererast bike , berhinde lobiyên civakî dibin rengekî berdarkirî ji rêveberiyên navendê û pêkhateke pêwîst ji pêşveçûna wêna re li gorî pêdiviyên berjewendiyên cemaweran û sûdên wan sererast dibin, hinek zanyarên jin û mêr demeke xwe li gel ol an partiyekê ve derbas kirin û bi hinek rastî û binemayên mehnegirtinî ve derdiketin ji bo bibin berdêlekî bi sûd ji têgihiştina jiyanê ve ji derveyî şirikên têgeha (ku tu ne ligel min bî tu li dijî min î, an tu çeteyekî pilanbazî bi heman rewşê ve), bê guman zanyar hewil dide ku her tiştî têbighe a xuya û a nepenî di eynî demê de, berhinde sîstem tên e guhertin û aborî têne roxandin bi sedema nakokiyên qezencî ve ne zêdetir, li gel wê teror tê bikaranîn ta bibe destikekê ji bicîbecîkirina desthilatiya diravî bi rêya cîgirbûna desthilatê ve di cihê xwe de û çalakirina rêxistinên wêna a rewşenbîrî di hundirê bijardeyên afrênerî de ji nivîskarên desthilatdar ve û hunermendên pêrew ên girêdana xwe pêşkêş dikin beranberî berbijariyên demkî a ku desthilat dide wan, li gel wê desthilat pêkhatiyên afirandinê têkdibe û hinirên dilsoz talan dike ta bibe xwelî û tovên mezinayî û desthilatî li cem rewşenbîrên desthilatê diafirîne, ên dev ji afiradinê berdabûn û palnerên malgirtina diravî li cem xwe xurt kiribûn û li peyketina bi dû tiştê ku desthilatê ji wan re çedike ketibûn ji sextebûnên xapînok a girêdayî bi navdarî û rehnîkirinan ve.**

**Çima zanyar nişteciyê tenahiyê dibe bê ku derbasî hundirê tevgerê bibe û bi erkên xwe ve rabibe, ji tekoşîndariya**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

**qalib û bedkariyên ramandinê ên ji peywendiya desthilata serkotker bi civakê ve dibişkive?!**

**Ev pirs xwe pesindan dike di çarçoveya lêgerîna me ji kêşeya dirindîtiyê re a belavbûyî bin bandorê fişara dezgehên ewlehiyê li ser civakê bi giştî ve.**

**Ew tenahiya civakî têgehên têkçûyî derxistibû ,takekesan bi rêya reftar û rewştên xwe ve ew wê vexwaribûn, de em bi gotinê nivîskarê Kurdistanî Yehya Silo 1 ve mijol bibin di pirtûka xwe de bi ser navê : zimanê çiyê R18 :**

**(Takekesê ê ku pêkanînên xwe yên xweyî û afrênerî bikarneyne bi demê re dibe tenê alavek pêkanînê, takekes tê perwerde û hînkirin di van hel û mercên ku têde hestên wî yên mirovî vedikşin û suriştî wîna kuntirol dike , bi awayekî ji awayan ve ew ji hest, wijdan , hêza mêjî û ramandinê ve xizan dibe.)**

**Desthilata milhûr kanîbûnên xweser li cem mirov asteng kiribû, şerê zanyarên jin û mêr bi hemî rêyên nerm û sert ve kiribû, şopandina takekesan û kar û barên wanî rojan e ji bo bîrkirina wan bi rastiyeke reş ve ku ew li zîndanê ne, zîndanekî mezin navê wî welat e, welatekî takekesên wêna tiştê ku desthilat weşandibû -ji jiyaneke bê bawer ve-dûbere dikin.**

**Dijminatiya mêrên desthilatê bi ronakbîran re dîrokiye û bi xwe cîgir e , mîna rastiyeke aşkere , gumanî pê nabe, pêşvexistina dûrkarî û serkotkirinê ji karê wêna ye ,**

**afirandin û sazkirinê celew dike, yek ji armancên wê ew serkotkirina dirindî ye mîna sîstemeke jiyanî, li vir em dikarin tekoşînên zanyaran têbighin ku ew berdêleke şaristanî û parastî û heyî ye li rex sertiya terora dewletî û partîtî û çêkirina wan ji dû desthilatan re mezintirîn û biçûktirîn bi hevdû re dixebitin li hember xwestinên takekes ji pêşveçûnê re, berdewamkirina ji kiryarê rêbaza serkêşî û berxwedaniyê ve pir caran sîstema desthilata biçûktirîn bi awayekî kirêt bersivên wê dabû ( Partiya dijber) ji armancên girêdayî bi cûdakirina desthilatî û xwestina bi berzbûna qezencî ya ezez ve li ser hesabê binema û berjewendiyên gelerî .**

**-----------**

**1- Şêwekar, romanivîs û Karîketêrîstekî Kurd e**

**Zanyarê Ispanî helbestvan Lorka 1 ê di destpêkên şerê navxweyî de sala 1936 hatibû sêdarkirin, herwiha Bîkaso 2 ê dijwariya cengê berz kiribû, tabloyên wî li ser berxwedaniya zanyaran ji desthilatiyên milhûr re derbirîn kiribûn, di vir de Dêvid Heyûm dibêje:**

**( Felek tenê cîgirbûn dide mafê fermandaran, bi rêya fêrkirina hêdîka ji hizrên mirovan re ta wan bi çi desthilatê ve nêzik bikin, piştî ku bihêle ew xuya bibin mîna desthilateke dadmend û hişmend.) lêbelê Dîyonîsûs 3 dibîne ku ( hêza siyasî li ser bîreke têkçûyî hatibûye damezrandin, jibîrkirin ew dermanê bi hêz e ê ku rê dide şaristaniyan ku bi awayekî çalak ve bixebitin.)**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Ev hemî me dihêle ku em bawer bibin ku vîna cemawerê bîrawer a ku bi vînên takekesên afrêner û çalakvan ve girêdayî dihêlin kovan bi demê re bêne jinavbirin û rê vedikin li pêş nifşên ronakbîr taku hevgarî û felaket bi demê re jinav bibin, azadî tenê dirindeyeke desthilata serkotker ji henasên girtî û cemawerên xwe yên hêrsdar ve derxistibû, berhinde henasê hêrsdar azdiyeke dirindî di xwe de hîştibû taku derbixîne û ji hinavên xwe agirên sor berde ,hemî tiştî disotîne, li gel wê Hîgil 1 di pirtûka xwe de ( Finomînûlociyaya giyanê) gotibû:**
**( Nediyarbûna cûdabûnê bi hêza mirinê a wêranker ve girêdayî ye an bi tiştê ku nav lê dibe terora mirinê.)**

**Desthilatiya Esed a bav û Kur karîbûn herdû ev nimûne bi demê re biafirînin , desthilatiya Baes a Sûrî mîna a Îraqî li ser mirovan siwar dibûn bi cûdabûnên netew,alî û hatinrêzên wan , civakê parç kirin , li hember hevdû ve bikaranîn, ew tiştê ku navê wî welat kiribûn girtîgeheke mezin tirs têde cîteng bibû ta ku bi dawî ve herdû welat bûn e gerava hingemeyeke bê dawî, di qonaxa buhara xwînî de, ew dirindîtiya a ku desthilata comî lê miqate dibû di hundirê girtîgehên xwe de di dîrokê de diyardeyeke ne nû ye, lêbelê tête pêşvexistin bi demê re bi rêya afirandina şê weyên azarkirinê ve ji bo çinîkirina bersivekê di çarçoveya perwazeke rêbazbûyî de dikeve di wêzimkariya desthilatê de ji bo rûbirûbûna berkepên wêna yên dijwar.**

---------------

**1- Fîdrîko Garsiya Lorka: helbestvanekî Ispanî ye û nivîskarekî şanogir e herwiha şîwekar û awazvanê Piyano ye, danerekî awazjen bû di 05.06.1898 de hatibû dinê.**

**2- Pablo Ruyz Bîkaso: 25.10.1881- 08.04.1973 şêwekar, nîgarvan û hunermendekî Ispanî ye.**

**3- Dîyonîsûs: Papayê Iskenderiya ye û betiryarkê Kerazeya Merqisî ye 248-265.**

**4- Hîgil: Cûrc Filîhilm Firîdriş Hîgil : 27.08.1770- 14.11.1831 feylesofekî Elmanî ye li Şitûdgart jidayik bû, yek ji girîngtirîn feylesfon Elmanan e , yek ji girîngtirîn dameznerê nimûneyîya Elmanî ye di felsefeyê de.**

## Berhinde berdana Islamiyan ji zîndan û girtîgehan ve ( Zîndana Sêdnaya) 2

**raperîna gelerî ji destpêkên wêna ve têkbiribû, bi rêya slogana (Xweda mezintir e) , rabûna komên serhildayî ji mizgeftan ve di her Înê de , ev yeka ne rasthatinek bû lê pilanekî hatibû amadekirin ji bo binaxkirina tevgerê û gunûkirina wê, mînakên zorkariyê ji pirtûkên pîroz ve hatibûn e wergirtin, rodanên girêdayî bi qonaxên çêbûna ol pesindan dikin ta bi rengekî siyasî hatibûn e bicîkirin û rewşên ên hîştin cihê xwe di jiyanê de bigrin , berhinde hişmendiya takekes bi alavên teqandinê ve dagirtî ye di derbarê malbatî û hînkerî de, herwiha dan û standina wê bi ên din re, tiştekî xuristiye ku desthilatiya siyasî vê yekê qezenc bike û sertiyê bikarbîne bi rêya xistina wê di rêbaza perwerdeya hînbûnê de ,a şagirtin wêna radikin ji dema çûna wan li dibistanan û tevlîbûna wan ji perwerde û hînkirinê ve.**

**Ricîma Baes xwe parastibû dema Islamiyan ji girtîgehên xwe derxisitibû taku bi rêya wan şoreş bête têkbirin bi rêya jinavbirina xwedî hişmendî ta kolan û nerîna giştî nexin tevgerê û sûd bi awayekî ji awayan dîtibû ji rabûna Islama**

**siyasî ve li Tirkî a ku bi rengê xwe ve Islamiyan bikaranî ji bo armancên xwe bidestxîne.**

**Li Sûrî , Misr, Lîbiya û deverên din bi rêya bikaranîna komên Islamî ve**
**mîna destikekê ji serweriyê re herwiha Îran wisa kir bi rêya artêşkirina komên Şêeî, herwiha dirindîtî bergekî Islamî comî li xwe kiribû bi bandorên kîn û**
**diljêçûnê ve têrbûyî ve , bi navê roxandina ricîmê ve gel hatibûn roxandin , malên wan hatibûn e hilweşandin ,serên xelkê hatibû birrîn bin nav û bihaneyên gelek, ev yeka bi awayên kuştina dîrokî ve hatibû xwarindin, ligel şêwazên nûjen ji terorê ve, ev yeka dihêle serweriya yekalî li ser cîhanê berdewam bibe, berhinde teror bi rewişt û yaseyê re nakok dibe,bi azadî û demukratîbûnê re jî cûda dibe, gendelî biserdikeve ji ber ku ji encamên parîparîkirina giyaniye ji civakê re, wisa xweda hatibû têkbirin bi navê belavkirina ayîndeya Islamî bi hêzê ve, herwiha yase hatibû jinavbirin di bin navê vexwendina roxandina ricîma siyasî de, şoreş naye kurtaskirin bi bersiva kirdeyî ve beranberî kiryarên desthilatekî bi xwe ve lê ew komek vîn û raman in hewil didin derbasî civaka serkotbûyî bibin taku bibin e naverokekê ji guhertinê re ne tenê têkbirinên desthilatî ne di navbera aliyekê hewil dide serweriyê bike ta ku bibe desthilatdar , desthilatekê ne cûda ye ji a din ve.**

**Kurtaskirina şoreşê bi guhertina bilindiya desthilatê bi hinek din ve ew têkbirineke zorbed e ji rastiya civakî re û hewildaneke bilh e ji cemkirina li ser xewinên xelkê ji dadmendiya civakî û guhertina demukratîk re.**

--------------

1- Zîndana Sêdnaya: zîndanekî leşgerî ye nêzî paytexta Sûrî ye li Şamê, zîndan hatibû bikaranîn ji bo destbiserkirina hezarên zîndaniyên siyasî, ji wan endamên komela Ixwan Elmuslimîn û siyasiyên Islamiyên din.

**Ev mirindina ji bo gîhiştina desthilatê bê guhertina naveroka wê, gendeliya civakî hişt ku mezin bibe li ser hesabê bijardeya bîrawer a ku li rêyekê ji guhertina naverokî re digere bi dîtina pirojeyên geşepêdanî ve ku dikarin rewşê biguherînin bi afirandina rewşekî baştir , lê ew têkçûna li her derê belav e û paşveçûna aborî û wêrankirina naveroka binî bibû asteng li pêş gîhandina aramncê.**

## 7- Dîtinekê li girtina siyasî

**Aramancên girtina siyasî ew ji bona celewkirina hişmendiyê ye taku nerame, ev yeka ji desthilatiya comî re hebûnek dirêjdem di fermandariyê de misoger dike, taku civak bibe du par alîgir û dijber jêre, herdû êzing in desthilatiya gelemperatî dema pêwîstiyê xwe bi wan germ dike, ji ber milhûrî civakeke mîna xwe çêdike,ta ku li hember tofê beranber derkeve.**

**Bivveyên herî zehmet ji aliyê jinavbirina wê, dema ku milhûrî bibe baweriyeke civakî, ji ber bi navê parastina welêt ji pîlanên derveyî ve civaka alîgir ji desthilatê re li paş roparta desthilata gelemperatî disekine li hember tofê dijber ê ku li bin konê niştecîbûn û penaberiyê de dijî, ew parçekirin çi kedên takekesî tune dike ji bo tekoşîndariya**

sîstema siyasî, berhinde zorenga civakî di navbera tof û bijardeyan de ji bo berjewendî û hebûna wan ji sedemên ne zindî ne ji girsbûna desthilatê û berdewambûna wê ji dûrkariyê re û cenga wê li hember demukratiyê, li gel wê em rêbaza siyasî têdighin ji ber ew xwe mirandineke ji malgirtina aboriyê re û bişanhildana gendeliyê mîna xwedawendekî dîrokî , bê guman milhûrî ji xwe re bihaneyan dibîne taku bimîne weke xwe bin gelek nav û bîrdoziyên çirûsîn, rewşa wê mîna rewşa darê şîn e ê bê ber ( Milhûriya Birûlîtariya) 1.

Bê guman ku Baes li pey xwe ve cewrik kedî kirin ku li gor wê tevdigerin û li ser bumbekirina cemaweran bi rêya sloganan dixebitin , li ser werîsê bêhtirî meymûnan dilîze, li gel wê cotbûna sertî û stûxwarî hevcêwiya desthilata Baesî û civaka pepûk e, ji ber zordariya şoreşgerî bi lez dibe zorkariyeke desthilatî û dibe destikek wêrankirin ji civakê re, binpêkirina berketî û raberiyên takekes dema hewila jiyaneke baştir dike, lê dema hinek xelk hene ji bo rêberê rêzdar dimrin wateyê vê yekê hebûna terora dewletî mîna ricîmeke serkotkirinê wek rastiyeke aşkere dimîne, ji ber vê yekê teror bi wan kesên ên xwe ji serok re kirin qurban re girêdayî ye ,ên laşên xwe kirin mertalekê ji bo parastina sîstema nêrîtî a petoyî.

Ev ricîm armancên xwe yên hundirî pêkanî, ji afirandina civakeke desthilatî li ser xwe parçe dike û derdê jevbûnê dikşîne bi rêya ramanên ên nimûnebûneke dûrî jiyanê armanc dike, ji ber ku xewinên yekbûna Erebî civakan hîştibûn ta demekê bawer bibin ku Baes ew bîngeh e ji

**rabûna civaka Erebî re, mîna ku hinekan bawer kiribû ku komînist rizgarîbûn e, an Nazî ew rêyeke ji nijadekî zelal re û bi hêz ve , ji ber vê yekê avakirina dînbûna komî binyadkirineke ji terorê re bi derbasbûna dîrokê ve û hêzên milhûr zincîrên karbonî ne ji tek armancê xwe dûrnaçin û ewa qutkirina takekes ji rewşa xwe ve taku bibe mirovekî ji xwe dûrketî .**

**Sîstemên milhûr di jihevxistina perwerdeyê de heta radeyekî mezin biserketibûn û tiştê ku em îro li Sûrî , Îraq û deverên Rojhilata navîn dibînin ji komên tundirew dijberên ricîmê û hin din jêre alîgir û şerê wanê dirindî li hember hevdû , em baş têdighin kiryarên desthilatê ji wêrankirina pêvajoya perwerdehî û bumbekirina wê ji kokên wê ve beranberî derketina sertiya dijwar .**

**Zarok hatibûn e xwedîkirin ta bibin şêrzadên Seddam Husên li Îraqê û şêrzadên Esed li Sûrî herwiha şêrzadên ji şêrê Sunne re Erdoxan, ew di rastiyê de qurban in ji hebûna sitemkariyê re û hebûna serdestên bi mirov û mêjiyan ve, welat bi dû hevdû ve hatin roxandin û sitmekarî kole û beniyan zêde kirin, bûn e kargeh ji berhemdana wêraniyê re û şuştina mêjiyan û berdana gendeliyê.**

**Saziyên Islama siyasî çalak bûn ji berhemdana zaroktiyeke pepûk re bi diljêçûn û hingemeyê ve kelepçekirî , mîna dirêjiyekê ji saziyên netewî a Etetûrkî û Baesî re di gunokirina mêjiyan de û wêrankirina raberiyên afrênerî bi rêya weşandina zorbazî , kedxwarî û stûxwariyê ve û**

encam ji vê yekê cengên navxweyî bê rawestan û bazarên qezencî ji firotina çekan ve û terorek e parzemînan derbas dike çi kes jê bi ewle nabe.

Zanyar li deverên Rojhilata navîn lêgerîn dikin ji bo pêşesazîkirina şoreşa zanyarî a bi raman û şaristanî û reseniyê ve girêdayî, pişta wan ji vê yekê re mihrivaniya gellan e û berketina wan ji bîraweriyên takekesên wêna ên afrêner ve ên nayên pişaftin an çewisandin, ji ber ku çendîn dem derbas bibe çendîn erkên li ser milên xwediyên raberî zêdetir dibin, taku bibin xetîreyên rizgariyê ji civakên xwe re li hember hêzên faşîzmê ên dixebitin ji bo kuştina wê giyanê , li gel wê zorenga hêzên zanîn û ronakbîriyê li hember hêzên nezanîkirin û diljêçûnê di cenga Tirkî de li hember hewildanên rizgariya Kurdistanî berz dibe, piştgiriya gellan wekî takekes bê ew desthilatî, nîşanek e li ser jîniya hişmendî û wijdana mirovî ji zarzariya wê re ji bo pêşesazîkirina biryara civakî.

Piraniya tevgerên şoreşgerî ên pişt re bûn e desthilatî, em wan dibînin ku sloganên rakirina kedxwariyan li ser netewê rakirin ji bo rizgarkirina wê ji lepên mêtingeriyê ve, di eynî demê de ew dikevin di xefkê reweştên desteserkirina civakê de taku dirêjtirîn dem bimînin, û bi qasî ku tê desthilatiya diravî û aborî pêkbînin, ji bo bikeve di berjewendiya tofê fermandar de, berhinde dewletên netewî ji bo pişaftina pêkhateyên nijadî di xwe de bisernakevin, herwiha dirêj nakin, ji ber  teqandina rehperestiyên xwecehî û hevçûyînên ragehî û berjewendiyên kesên di fermandariyê de nakok dibin û ew hevpeymana berjewendî

belav dike bi hebûna lobî û dezgehên ku di nav hevdû de şer dikin, ji ber cûdabûna heyî di karê wan de û parvekirina samanên welêt, ew rewş di hundirê desthilatê de pêşî diteqe û bijardeyên civakê di vê pêvajoya lêdanî de têne bikaranîn, ji bo tov şerê hevdû bikin bin gelek navan, yek jê rabûna nirx û belavbûna gendeliyê û vexwendina ji bo guhertina ricîmê ta roxandina wê, berhinde hemî têgehên desthilatî ên milhûriyê dikin bîngehekî ji bo hebûna dewletê bi vî awayî  saz dikin , civakeke zorbaz ava dikin, ew nikare li hember wê zorbaziya rojan e çi tevgerê bimeşîne.

Ev yeka bervajî gotina zanistê lawiran Torlîf Şildirb a Nerwêcî dema dibêje : ( Milhûrî ew binema bîngehîn e ji bo civîna mirovî , lawirî, sebinzeyî û bêcanî , ew ramana bîngehîn e ji cîhanê re.)

Şoreş mîna pesindaneke zordar e  wateya wê cengeke navxweyî ye bi awayekî ji awayan ve, cenga xwediyên vînên nû li hember xwediyên vînên heyî, vîna civakî li gor vê yekê vînek e pêrewî ye li gor xêzên artêşkirina tofî,netewî û ragehî tevdigere, xwe radestî fişarên derveyî dike û kar û barên wê a ku hewila  guhertina ricîman bike an ji bo fişara aborî li ser wêna, di vir de cemaweran dibin e êzing ji guhertinên dewletan re û ji wan destwerdanên derveyî re li ser wêna  ji bo guhertina wê bi demê re an roxandina wêna bi rêya bijarên xwepêşandinên aştyane ve û piştî wê cenga navxweyî tê, bi vî rengî Rojhilata navîn binav dike di çirava windabûnê de, ji Îraqê ta Yemenê , Sûrî û Libnanê û bi dawî ve Îran û Tirkî , gel di xwîna xwe de digevize, dirinde

bumbebaranê dikin , dikujin û wêran dikin ji bo armancên xwe di heyînê de misoger bikin, nakokiya berjewendiyên navdewletî bîngehekî ji awanteyê re diafirînin, dibin carne paş rabûna ricîman li ser hesabê ketina ricîmên din, ew berjewendî şerpîna xwînê û dijwariya wêraniyê jêre nabin xem, lê ew diridî gurtir dikin  li gorî geregiya xwe bi dewletê ve, ji ber wêraniya wê a aborî dihêle jihevbikeve û bi demê re parçe bibe, hebûna pirsgirêka Kurdî bê çareserî rê bêhtir vedike ji tevderbasbûnên berjewendiyan û dûbare amadekirina navçeyê li gor xwestekên dewletên mezin ji bo desteserkirina li ser hatinan.

Mebesta me bi rabûna gelerî a desteberkirî ve ewê hatibû çêkirin li gorî hevpeymana Saykis Bîko li ser kavilên desthilata Osmanî, ji ber ji van welatan re çi sabarên rastîn nebûn ji dema ku ew erd desthilatên diravbûyîyan di navbera xwe de dabeş kiribûn li Şamê û Misrê  herwiha Mexol li Îraqa niha de, lê Kurdistan di navbera Osmanî û Sefewiyan de hatibû parçekirin, ew parçekirin civakeke xurist û lihevhatî durist ne kiribû, lê ew ricîmên fermandar ji wan deveran re kêşeyên civakî afirindibûn herwiha kêşeyên ragehî , mîna şerên navxweyî li Lubnanê û lêdanên leşgerî li Sûrî, Tirkî , Îraq û Îranê, serdestbûna partiya Baes li ser desthilatê li herdû welatan Sûrî û Îraqê û şerê desthilata Esed bi Biraderên Misliman re û herwiha dagirkirina Esed ji Libnanê re û dagirkirina Seddam Husên ji Kiwêtê re  û mijolbûna wê bi şerê bi Îranê re ,alozî li van deveran qet nesekinî, ji ber ku sabarên Rojhilata navîn mîna hevdû ne herwiha ricîm û hişmendiya gellên wê û hîn mane mîna parêzgeheke navnetewî.

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Metirisya bîrdoziya netewî xwedî rengê nijadî a bêgur bi bergê ragehîbûnê ve diyar dibe, ew sabara destkarîbûyî kir mîna mayîneke mezin hindik maye biteqe di kîjan kêlîkê de bi sedema kiryarê derveyî an fişarê aborî ve , ji ber milyonên xelkê bê kar in û li ser xêza xizaniyê de dijîn, bêkarî şaxdayî dibe û berdewam girstir dibe, li rex ku gendelî bi herdû simên xwe ve hemî saziyên ewlehî digere herwiha a karguzarî jî.**

**Ev yeka hemî di çarçoveya wê sabara hejiyayî, rewşeke xirab e bi dijwarî li hemî meydan û derbarên jiyanê, wisa bi derketina lawazî û binkeftinê, bi nediyarbûna têgeha yekîtiyê û têkçûna wê ji berjewendiya berzbûna komên tariyê ê sûdgir ji  têkçûna giyanî û civakî ve.**

**Ola siyasî ew cûreyeke ji cûreyên terora rasterast e tê naskirin bi sertiya xwe yê ku pala xwe dide li ser deqên ku mirovan dehf didin ji sertiyê re, jinê mîna destikekê ji kêf û lîskê re dibîne, hizran vedigerîna li qamçîbazîkirin û birrîna dest û xwestina bacê bi zorê an bê wê şer e, ma gelo di vir de çi felsefe di ol de heye û çi wate jêre heye ji derveyî terorkirin û beherandinê ve?! ,wekî ku Enton Seade 1 di pirtûka xwe de çêbûna netewan de guman dike: R 69 ( Ol ji aliyê hişmendî ve cûreyekî ji cûreyên felsefeyê ye di şîrovekirina diyardeyên gerdûnê û encamkirina dawiya wê û çarenivîsa henasa mirovî.)**

**bîrdoziyên netewî hewildabûn çîrok û efsanên dîrokî bibêjin ên ku biserketina nijadî aşkere dibin,  ji bo bibin**

**çekekî dirêjkirî li hember netewê cîran, dîrokê bikaranîbûn mîna alaveke gurbûyî û helankirî ji bo şer û tevlîheviyê ligel netewên din, wisa dikarîbûn bi hêsanî ve desthilatiyê bi dest xwe xin, bi rêya qestkirina xewinên cemaweran û gurkirina agirên balabûn û biserketina netewî ve, ji ber vê yekê ricîmên netewî bibûn çekekî dirêjkirî li ser ew gellên ên xwe bala dibînin bi xwe jî, bibûn bihaneyekî ji van sîsteman re ku bimînin bi hebûna desthilat û milhûriya wê, herwiha bicîkirina ragehiyê li paş bergê netewbûn û şerê mêtingeriyê, Impiryalizmê û Cihotiya navnetewî , û tiştên mîna van gotinan ji sloganên ku kolana Erebî bi rêya wan hatibû xapandin û ew hîştibû mîna koran biçin berve koçka gurandin û binkeftiya moralî, li gel wê di hundirê wê erdnîgariya şaxdayî kêşeyên gelek mezin hebûn, di nav xwe de pir pêkhateyên zimanî nijadî helandibûn di nav tek zimanî de, jibilî paşketina wê roparta a bi Islama Siyasî ve hatibû deqdan, ji ber vê teqadina gelerî nêzik dibe û girtinheviya qezencî dibe pêdiviyekê û têkdana rewanî û jihevketina civakî dibe rewşeke misoger, bi derketina cengên navxweyî şaxdayî li deverekê bi xwe de çêdibe ta bighe deverên din û ferehtir bibe .**

**-----------------**

**1-Enton Seade: 01.03.1904- 08.06.1949 , dameznerê partiya Sûrî netewî civakî.**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

# Dûmahî

**Zanyar tekoşînê dikin ji bo nirxên rewiştî bi derbasbûna dîrokê ve biparêzin bi rêya pêgirtina wan bi erka mirovî ve tevî kelemên gelek ên li pêşiya wan derdikevin.**

**Û bi vegera me ji pirtûka (Terora pîroz a Tîrî Êgiltûn) 1 em dikarin rexên diyardeya pîrozbûnê û kokên wê yên dîrokî bêhtir bişopînin, tayhevbûyiya babetî li pêş vê yekê ew berzbûna mirovê zanyar e bi hestekî bilind ji berpirsyarî û rûbirûbûnê ve li hember hewildanên kesên xwe kirin e xwedawend ji bo binpêkirina nîşanên şaristaniya mirovî .**

**Bi rêya vexwendinê ji damezrandina civaka zanînê re ê ku rê vedike li pêş derdana hebûna aram, serkeftina zanyar Nêlsun Mandêla di jiyan , xebat û helwestên xwe yên zelal de û pabendîbûna bi nirxên zanînê û netivîkirina zordarî û nijadperestiyê mînakek baş e li ser berzbûna zanebûyînê, ji ber ew helwest bingehên rabûnê binyad kiribûn pêşî ji yekbûna çarenivîsan û bawerî bi aştiya cîhanî ve, bi palpiştîbûna li ser kurteencama serpêhatiyên mirovî ên li dora wê destûr û yaseyên rewiştî û yasegeriyên civakî civiyabûn, ji bo rêgirtina li pêş têkbirinê û gîhiştina jiyana balatir a stûna wê têgihiştin, bîrawerî û baweriye.**

**Li gel wê tevgera rewşê ji pevxurîna mirov bi alavên hebûna xwe ve dertê û civandina wî bi kesên din re ên bi wî re pêdivî,nirx û hestên bilind parve kirin, pêdivîbûn bi hebûna nirx û mînakên rewiştî ve taku bibin rêgir û mertalekî li pêş hewildanên dirindîbûna mirovahiyê,**

**berhinde em gelek mirov dibînin bi derbasbûna dîroka kevin ve li ser dû beşan ve têne dabeşkirin: Zanyarên xwedî hişmendî û hostetî ên kedê didin ji bo wêzimkariya jiyan û mirovan li pêş ezezan ên li dor gendelî, bedkarî, hingeme û malgirtinê bi hemî dûrî û destikên wê yên bed ve civiyan, lê zorengekî berdewam û qayim di navbera herdû tofan de heye , ew zorenga heyî li ser westandina berdewam.**

**Felsefeya Evîn hebûn e û hebûn zanîn e encameke dibişkive ji rastiya nirxên xuristî ve mîna vexwendineke ji mirovê nû re taku ji çi tiştê ku peywendiya wî bi a din û cîhanê ve têkdibe rizgar bibe ji bo pêkanîna xweşiya hertimî .**

**--------**

**1- Tîrî Êgiltûn: rexnegirekî Birîtanî ye,di 22.02.1943 de jidayik bûye.**
**2-Nêlsûn Mandêla: 18.07.1918- 05.12.2013 siyasetmedarekî li hember sîstema nijadperestiyê li başûrê Efrîqiyayê rawestiya, di sala 1994-1999 de dibû serokê başûrê Efrîqiyayê.**
**3- Can Cak Roso : li Cinêfê, 28.06.1712 jidayikbû û di 02.07.1778 koça xwe kiribû, nivîskar û feylesofekî ferensî ye.**

**Ramanyarê zanyar Can Cak Roso pêşenga nimûnebûnê bû û pirtûka wî (Hevpeymana civakî) dibû Incîlekî ji şoreşa Ferensî re , ew piştrast kir ku çi şoreşekî radibe bêhtir berz dibe dema naveroka xwe ji nirxên sirûştî digre, ji ber ku çûna çi tevgerekî rabûnyî lêvegera xwe yê bingehîn nirx in.**

**Nimûnebûn nakeve, pêdiviya xwe bi dîtinekê ve heye ji bo avakirina kirdeyekî an sazîkirina xêzên raman û nerînan û ji ber ku mirov bi mirin, rewrewk û tirsê ve bindest e, nimûnebûna giyanî bibû berdêlekî suriştî ji têkçûn û êşê re.**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

## Jiyangeriya Rêber Hebûn

- **Ew Rêber Adil Ehmed e**
- **Rojbûn 02. Mijdarê. 1987 li bajarê Munbicê- Sûrî.**
- **Zimanê Erebî li zangoyê Helebê xwendî ye.**
- **Ji sala 2015 ve li Elmanyayê ye.**
- **Dameznerê malpera Kombûna zanyarên azad e ji bo weşandina pirtûkên Elkitronî.**
- **bi herdû zimanên Kurdî û Erebî dinvîsîne.**
- **Rojnameyekî bi sernavê : Evîn hebûn e û hebûn zanîn e derxistibû.**
- **Gelek gotar û xwendinên xwe yên belavbûyî hene li gelek malper û rojnameyên Kurdî û Erebî .**
- **Beşdarî gelek çalakiyên wêjeyî û ramanî bû li Sûrî, başûrê Kurdistanê û Elmanyayê û gelek hevpeyvînên wê yên telefizyonî , Radiyoyî Kurdî hene li rex vîdiyoyên ku têde berhemên xwe yên wêjeyî û ramanî pêşkêş dike bi rêya destikên peywendiya civakî ve.**
- **Endamekî berê bû di komîteya rêvebir de di yekîtiya rewşenbîrên rojavayê Kurdistanê de.**
- **Endam e di yekîtiya cîhanî a rewşenbîrên Ereb de.**
- **Dameznerê navenda Dûsseldorf a rewşenbîrî ye.**
- **Endam e di yekîtiya nivîskar û rojemevanên Kurd li Sûrî**
- **Pêşkêşvanê bernameya zanyar bi zimanên Kurdî û Erebî ..**

## Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

**Berhem**

**Di helbestê de:**

- **Dîwana Qêrînên roniyê bi zimanê Erebî 2016.**
- **Dîwana Qêrînên roniyê bi zimanê Kurdî 2020.**
- **Dîwana sirûda Gêlasan bi zimanê Erebî 2023.**

**Di pexşanê de :**

- **Leylan û nerîn bi zimanê Erebî 2017.**
- **Narînbendên Kurdistanî bi Pinar Kobanî re bi zimanê Erebî (hevbeş) 2019.**
- **Rewrekên xwînî bi zimanê Kurdî 2019.**
- **Leylanên xwe dixun bi zimanê Erebî 2023.**

**Di çîrokê de :**

- **Mikûrhatinên mest bi zimanê Erebî 2023.**

**di romanê de:**

- **Erdhej bi zimanê Erebî 2023**

**Di rexneyê de :**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

- **Jihevekirina simbûl di romanên Helîm Yûsiv bi zimanê Erebî 2020.**
- **Kilîtên nivîsa bi bandor ve ji dûrbîna felsefa evîn hebûn e û hebûn zanîn e ve bi zimanê Erebî 2023.**
- **Bi kûrbûn binivîs e ji dûrbîna felsefa evîn hebûn e û hebûn zanîn e ve bi zimanê Erebî 2023 .**
- **Rabûna afirandinê ji dûrbîna felsefa evîn hebûn e û hebûn zanîn e ve bi zimanê Erebî 2023.**
- **Çawa tu nivîskarekî rastîn bî bi zimanê Erebî 2023.**
- **Kanî ew nivîskarê rastîn bi zimanê Erebî.**

**-Di ramanê de :**

- **Evîn hebûn e û hebûn zanîn e bi zimanê Erebî 2021.**

**-Pirtûkên ku bi awayekî Elkitronîk ve hatibûn e weşandin:**

- **Nîşanên li paş deqê di cîhanên Mehmûd Elweheb – xwendinên rexnî – bi zimanê Erebî.**
- **Vedengên dilsariyê – Helbest -bi Erebî.**
- **Leylan- Deq, bi Erebî.**
- **Qêrînên roniyê- Helbest- bi Erebî.**
- **welatekî û jinekê- Helbest- bi Erebî.**
- **Tilîliyên pênûsekî ji agir- nivîsên Elkitronî- bi Erebî.**
- **Ramanên biqircir- Hevtayî- bi Erebî.**
- **Zanyar – Guftûgo- bi Erebî.**

**-Di warê wergerandinê de :**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

- **Pirtûka helbestvan Ismaîl Ehmed,Evîn kernevalekî xwedayî ye.**

**-Di warê amadekirina pirtûkan de :**

- **Xwendinekê ji dîmena siyasî re li rojavayê Kurdistanê.**
- **Efrîn berxwedana serdemê**
- **Barîn Gerdena Zeytûnê**
- **Tundirewî**

**Di rojname û malperan de:**

1. **li ser weşandina rojnama Evîn hebûn e û hebûn zanîn e de xebitî.**
2. **Gelek gotar,lêkolîn û xwedinên rexnî û ramanî ên wî li ser gelek rojnameyên pelgî û Elketronî û malperan hene.**

**Di çalakiyên wêjeyî û ramanî ên cûr be cûr de:**

- **li dîdara wêjeyî a yekemîn ji bo helbestvanê Munbicê beşadar bû 2008**
- **gelek komcivîn, semîner û şevbuhêrkên wêjeyî li Sûrî, Kurdistanê  û Elmanyayê beşdar bû li gel gelek hevpeyvînên radiyoyî û Televizyonî Kurdî.**
- **Endamekî rêvebir e berê ye di yekîtiya rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê de.**

**Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**

- **Demeznerê komcivîna Dûsseldorf a rewşenbîrî.**
- **Endamê yekîtiya cîhanî a nivîskarên Ereb e.**
- **bernameyekî rewşenbîrî bi herdû zimanan Kurdî û Erebî li ser Zoomê pêşkêş kiribû.**

**https://reberhebun.blogspot.com/**
**https://reberhebun.wordpress.com/**
**reber.hebun@gmail.com**

# Jêder û çavkanî


- **Wîkîpîdiye.**
- **Bul Rêkûr, ji deq ta kirde, lêkolînên şîrovekirinê, wergerandin: Mihemed Birade, Hessan Bûriqiye.**
- **Dîtineke rexnî ji diyardeya paşketina siyasî a Kurdî re li Sûrî, Mişel Timo, navenda Celadet Bedirxan a rewşenbîrî, Qamişlo.**
- **Enton Seade, çêbûna navnetewan.**
- **Mirin di ramana Ewrûpî de, danerkirin: Cak Şûrûn, wergerandin: Şewqî Celal, seredan: Sidqî Hettab, cîhana zanînê.**
- **Mirov û zanista deronî, danerkirin: Profîsor. Ebdusettar Ibrahîm, cîhana zanebûnê.**
- **Metirsiya mirinê, Profîsor. Ehmed Mihemed Ebdulxaliq, cîhana zanînê.**
- **Aliyên liyangirtîbûyînê, danerkirin: profîsor. Mûtez Seyid Ebdullah, cîhana zanînê.**
- **Tewriya civakî ji Barsunz ta Habirmas, danerkirin: Îyan Kirîb,wergerandin: Profîsor: Mihemed Husên Gilûm, seredan: profîsor Mihemed Isfor, cîhana zanebûnê.**
- **Çima mirov çand goşegîr dike?, çêbûn û cudabûna wê, danerkirin: Maykil Karizres, wergerandin: Şewqî Celal.**
- **Susiyolojiya azadiyê, Ebdullah Ocelan.**
- **Ebdullah Ocelan parêznameyên pêşkêşbûyî ji dadgeha mafê mirovan a Ewrûpî re.**

# Evîn hebûn e û hebûn zanîn e


- **Ebdullah Ocelan li ser şêwaz û xêza rastiyê, Ekadimiya Ebdullah Ocelan ji zanistên civakî re.**

- **Cunsan Randil, netewekî nakok, rêyên Kurdistanê mîna ku ez têra çûme, malxaneya Roj.**

- **Essadiq Enneyhom, Islamek li hember Islamekî, Riyad Erreyis ji pirtûk û weşandinê re.**

- **Zîncîra ramanê, dijminên gotûbêjê, sedemên ne lêborîn û dîmenên wê, Maykil Englo Yakûbûtşî, pêşkêşkirin: Embirtû Îko, wergerandin: Profîsor: Ebdulfettah Hesen, pirtûkxaneya xwendinê ji hemiyan re.**

- **Mirovahî û heyînizmê di ramana Erebî de, danerkirin: Ebdurrehman Bedewî, malxaneya pênûs,Beyrot -Lubnan.**

- **Ûlifiyêh Riwa, Nezaniya pîroz, dema olekî pê çand, malxaneya Saqî, wergerandin: Salih Eleşmer.**

- **Ayatên Şeytanî, Silêman Ruşdî.**

- **Gustav Lûbun, Sîkoluciyaya cemaweran, wergerandin û pêşkêşkirin: Haşim Salih, malxaneya Saqî.**

- **Profîsor Elî Elwerdî, pêkenoka hişmendiya mirovî, malxaneya Kovan , Lendon, çapa duyem 1994.**

- **Tîrî Êgltûn, Terora pîroz, wergerandin: Usame Isbir, destpêkan ji çapkirin, weşandin û belavkirinê re, Ceble , Sûrî.**

# Evîn hebûn e û hebûn zanîn e

- **Evîn hebûn e û hebûn zanîn e**
- **Raman**
- **Rêber Hebûn**

**Weşanên Rêber Hebûn**

**reber.hebun@gmail.com**

**Hejmara çapê:98 Berçele 2024**

**ISBN: 978-977-85964-2-7**

**KOMBÛNAZANYARÊNAZAD"**

**LÎNKA WEŞANXANEYÊ:**

**https://reberhebun.wordpress.com/**

**NAVENDA MALPERÊ:**

**https://kulturforumdusseldorf.wordpress.com/**

**MALPERA RÊBER HEBÛN:**

**https://zanyaran.wordpress.com/**

**BLOGGER:**

**https://reberhebun.blogspot.com/**



- Naverokên pirtûkê têkileke ji raman, felsefe û siyasetê bi rengê nêzîkbûneke civakî aborî vala nabe ji şîroveyên têgihiştina sirûştiya bandora deronî ji rewşa ku em wê dijîn.
Hesen Xalid -Lêkolîner.

- Di "Evîn hebûn e û hebûn zanîn e de hemî çand, navnetew, Erdnîgarî û dîrok li rex hevdû dibin, evîn hemî hebûnê saz dike.
Hemûd Weled Suleyman - Rexnegir.

- Armanca danerê pirtûkê berferehkirina giroveriya zanîn û zanistê di nav rewşenbîran de û zanyarên azad li cîhanê bi rêya tevgereke civakî zanyarî têkoşînê bi nezanîkirinê re dike .
Amal Abû Faris- Nivîskar .

978-977-85964-2-7